

Keyifli Okumalar Dileriz

Binlerce kategoride milyonlarca PDF e-kitap, ders kitapları, dergiler ve romanlara platformumuz üzerinden ücretsiz ulaşabilirsiniz.

RESMİ WEB SİTEMİZ

<https://rantey.org>

Yedek ve Duyuru Kanallarımız

Sitemize erişim engeli gelmesi veya adres değişikliği durumunda aşağıdaki kanallardan güncel giriş adresine erişebilirsiniz:

- Telegram: <https://t.me/birkitapbir>
- WhatsApp Kanalımız : <https://whatsapp.com/channel/0029VbDHv8uE50Us4lvMoc0Y>



RONÎ MÎNA EVÎNÊ TARÎ MÎNA MIRINÊ*

MEHMED UZUN, (1953-2007) nivîskarê pirzimanî, pirçandî û wergêr. Di sala 1953'an de li Sêwrega Rihayê hatiye dinê. Wî çîrokbêjiya Kurdî ya qedîm bi zimanê nivîskî li hev anî û bi vî awayî hem ji zimanê Kurdî re û hem jî ji Çand û Hunera Mezopotamyayê re xizmeteke mezin kir û herweha bû yek ji hûmê edebiyata kurdî ya modern. Piştî Muxtiraya 12'ê Adarê bi hincetên siyasî hat hepiskirin. Di Girtîgeha Leşkerî ya Amedê de bi beralîkirin û şîretên Mûsa Anter bala xwe bêhtir da ser zimanê bav û kalan. Di 1974'an de bi hevkarîya heval û derdora xwe, Weşanxaneyê Komalê ava kirin. Dema ew Rêvebirê Weşanê yê Giştî yê Kovara Rizgariyê bû, ji ber nivîsên xwe careke din hat girtin û hê di pêvajoya darizandinê de bû, wekî koçberêkî çû li Swêdê bi cih bû. Di 1981'î de ji ber nivîsên xwe yên li ser girtina Sendîkaya Nivîskaran a Tirkîyê û hepiskirina nivîskaran a piştî derbeyê, ji hemwelatîya Tirkîyê hat biderxistin. Ji wê û bi şûn de li sirgûniyê ma. Di sala 2006'an de vegeriya welêt.

Piştî ku li Swêdê bi cih bû û hingê di rojnameyên wekî *Dagens Nyheter* û *Aftonbladet*'ê, di kovara edebî ya bi navê 90-tal de, *Rizgariya Kurdistan*, *Kurdistan Press*, *Kurmancî*, *Berbang* û di kovara Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, *Hêvî* de, nivîsandina xwe domand. Bi navê mustearê E. Ferzînd Baran helbest û nivîsar nivîsandin. Endametiya Lijneya Rêvebirîya Yekîtiya Nivîskarên Swêdê kir û paşê di Klûba PEN a Navneteweyî û ya Swêdê de cih girt û bi awayekî çalak xebitî. Herweha ew, Endamê Yekîtiya Rojnamegerên Swêdê û Cihanê bû. Di avakirina PEN a Kurd de wî kedeke mezin da. Di nav gelek xebat û afirînên xwe de, wî donzdeh berhem bi kurdî, yê din jî bi tirkî û swêdî nivîsandin. Hemû berhemên wî –hema çi bigire– di serî de zimanên wekî îngilîzî, fransîzî, tirkî, swêdî, farisî, alemanî û hwd, li bîst zimanên cihanê hatin wergerandin.

Ji ber pirtûkên xwe yên bi navên, "*Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê*, 1998" û "*Nar Çiçekleri*, 1996" di bihara sala 2001'î de li Tirkîyê hat darizandin, lê ber'et bû. Bi dû re, çapkirin û weşandina pirtûkên wî yên bi navên "*Bir Dil Yaratmak*" û "*Destpêka Edebiyata Kurdî*" hatin qedexekirin. Heman salê, Yekîtiya Weşangerên Tirkîyê, xelata ku her sal dida, ya bi navê "Xelata Raman û Ravekirinê" û ji ber ked û xebata wî ya pêşvebirina romanê, Enstîtuya Kurdî ya Berlînê "Xelata Edebiyatê" danê. Ji ber helwesta wî ya di warê azadiya edebiyat û gotinê de, wî xelata herî girîng û bi prestîj a Skandinavyayê "*Torgny Segerstedt*" a bi navê "Xelata Pênûsa Azadiyê" û di sala 2002'yan de, ji bo keda ku di ber çanda Swêd de daye, xelata Akademîya Swêd a bi navê "Xelata Erik Lundberg" stand. Di sala 2005'an de xelata rûmetê ya Herêma Kurdistan a Iraqê û xelata rûmetê ya Şaredariyên Diyarbekirê stand. Di 11'ê cotmeha 2007'an de, ji ber nexweşiya penceşêra mîdê, li Diyarbekirê wefat kir.

Berhemên Mehmed Uzun ên çapkirî:

TU, Roman, 1985; *Mirina Kalekî Rind*, Roman, 1987; *Siya Evînê*, Roman, 1989; *Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê*, Roman, 1991; *Destpêka Edebiyata Kurdî*, Lêkolîn, 1992; *Hêz û Bedewiya Pênûsê*, Pexşan, 1993; *Mirina Egîdekî*, Destan-Zêmar, 1993; *Världen i Sverige* (Li Swêdê), Antolojî, digel Madeleine Grivê, 1995; *Antolojiya Edebiyata Kurdî*, Antolojî, 1995; *Bîra Qederê*, Roman, 1995; *Nar Çiçekleri*, Pexşan, 1996; *Ziman û Roman*, Hevpeyvîn, 1997; *Bir Dil Yaratmak*, Hevpeyvîn, 1997; *Dengbêjlerim*, Pexşan, 1998; *Ronî Mîna Evînê-Tarî Mîna Mirinê*, Roman, 1998; *Zincirilenmiş Zamanlar Zincirilenmiş Sözcükler*, Pexşan, 2002; *Hawara Dicleyê*, Roman, 2003; *Ruhun Gökuşağı*, Vegotin, 2005; *Küllerinden Doğan Dil ve Roman*, Hevpeyvîn, 2005; *Ölüm Meleği ile Randevu*, Pexşan-Hevpeyvîn, 2007; *Bir Romanın Hatıra Defteri*, Rojnivîsk, 2007.

Ucfelesiz PDF Kitap Arsivi - <https://rantey.org>

***SEL YAYINCILIK**

Kuloğlu Mahallesi, Turnacıbaşı Caddesi,
No: 17, Beyoğlu – İstanbul
Tel. (0212) 516 96 85

<http://www.selyayincilik.com>

e-posta: halklailiskiler@selyayincilik.com

SATIŞ - DAĞITIM:

Çatalçeşme Sokak, No: 19/1

Cağaloğlu – İstanbul

e-posta: siparis@selyayincilik.com

Tel. (0212) 522 96 72 Faks: (0212) 516 97 26

***SEL YAYINCILIK: 1064**

ISBN 978-605-772-864-7

**RONÎ MÎNA EVÎNÊ
TARÎ MÎNA MIRINÊ**

Mehmed Uzun

Roman

© Zozan Uzun, 2020

© Sel Yayıncılık, 2020

Genel Yayın Yönetmeni: İrfan Sancı

Yayına hazırlayan: Ferhadê Mihemed

Kapak tasarımı: Aslı Sezer

Sayfa tasarımı: İklime Yılmaz

Birinci Baskı: Ekim, 2020

Baskı ve Cilt: Yayıncılık Matbaası

Fatih Sanayi Sitesi, 12/197-203

Topkapı-İstanbul, 567 80 03

Sertifika No: 44865

Mehmed Uzun

Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê

Roman

NAVEROK

1. Mirin.....	9
2. Koç.....	28
3. Zayin	49
4. Dawet.....	72
5. Veqetîn	91
6. Şev	106
7. Biyanî	133
8. Sûzenî.....	156
10. Xwîn.....	203
11. Tîrs	241
12. Jan.....	257
13. Awir.....	277
14. Hafîza.....	297
15. Rêwing.....	323
16. Ronahî.....	335
17. Mirin.....	353

Gilgamiş bi gotina Dûpişk-Merivî kir;
 di nav daristanê de, xwe da ser riya royê,
 ber bi aliyê çiyayê ku ro jê hildihat.
 Wî, bi qasî qonaxekê rê birî,
 tarîtiya ku dora wî rapêçabû, hîn bêhtir bû.
 Ronahî nîn bû, Gilgamiş pêşiya xwe, paşiya xwe nedidît.
 Wî du qonax rê birî, lê tarî zêde bû.
 Ronahî nîn bû, Gilgamiş pêşiya xwe, paşiya xwe nedidît.
 Wî sê qonax rê birî, tarî zêdetir bû.
 Ronahî nîn bû, Gilgamiş pêşiya xwe, paşiya xwe nedidît.
 Wî çar qonax rê birî, tarî hîn zêdetir bû.
 Ronahî nîn bû, Gilgamiş pêşiya xwe, paşiya xwe nedidît.
 Wî pênc qonax rê birî, tarî hîn zêdetir bû.
 Ronahî nîn bû, Gilgamiş pêşiya xwe, paşiya xwe nedidît.
 Wî şeş qonax rê birî, tarî dîsan zêdetir bû; ne pêşiya xwe,
 ne paşiya xwe dikaribû bidîta.
 Wî heft qonax rê birî, tarî dîsan hîn zêdetir bû;
 hew dikaribû pêşiya xwe, paşiya xwe bidîta.
 Gava wî heşt qonax rê birî, bi ax û wax qîriya;
 ne pêşiya wî, ne paşiya wî dixuya.
 Piştî qonaxa nehan, hênika hiya bayê bakur bi rûyê wî ket;
 lê tarî giran û kûr bû; ne pêşiya wî ne paşiya wî dixuya.
 Piştî qonaxa dehan, êdî ew gihîştibû dawiya rê.
 Piştî qonaxa yanzdan, tîrêjên berbangê xuya kirin.
 Û piştî qonaxa donzdan,
 tîrêjên royê mîna lehiyekê herikîn.

Destana Gilgamiş

1. Mirin

Baz.

Kevok.

Em ê ji yekî re bibêjin Baz, ji ya din re jî Kevok.

Baz û Kevok. Du nav, du însan; zilamekî navsal û jineke ciwan. Du nav, du însanên sereke yên romana me. Romana me dê qala serbûriya Baz û Kevokê bike.

Belê, Baz û Kevok. Baz; zabitekî leşkerî ku umrê wî li dora çil û du salan e. Kevok; evîna ku derketiye ser riya Baz, evîndara rojên şikestî û bêgav ku umrê wê li dora bîst û du salan e. Baz û Kevok; pêwendiyê balkêş –heye ku evîneke balkêş– ku ji bêgaviyê hatiye pê, bi bêgaviyê jiyaye û ji ber bêgaviyê dimire. Baz û Kevok; du rêwing, du rêwindayî, du girtî û du qurban. Baz û Kevok ê bimirin. Em ê bi mirinê, bi mirina wan dest bi serpêhatiya wan bikin: Ew ê bîn kuştin. Ew niha ketine ser riya mirinê.

Baz bi vê dizane, ji tecrubên xwe dizane ku ew ber bi mirinê derin. Kevok hê pê nizane. Mîna gelek tiştên din, Kevok bi vê yekê jî nizane; mîna gelek tiştên din, ew naxwaze bi vê yekê jî bizanibe.

Em li welatekî mezin û fireh in ku ji çend welatên biçûktir hatiye pê, ku aliyekî wî deryayên kesk û şîn, aliyekî wî zinar û çiyayên serî di esmanan de, aliyekî wî jî çolên germ ên bêdawîn e. Em li welatekî welê ne ku hertim, her çar demên salê tê de tê jiyîn. Em niha, di destpêka romana xwe de, li payitextê mezin a

welêt, tevî Baz û Kevokê, di nav minûbuseke reş de ne û derin. Her çar aliyên minûbusê girtî ye, bi tenê li her du milên wê, li jor, du pencereyên biçûk hene. Pencere, bi caxên hesinî, qehûm, rapêçayî ne. Di minûbusê de, ji bilî Baz û Kevokê, heft kesên din hene; şofor, du kesên din li kêleka wî û çar kes jî, dido dido, li herdu aliyên Baz û Kevokê. Kincên wan sivîl in û sisê ji wan bi simbêl in. Ev heft kes Baz û Kevokê ber bi mirinê ve dibin.

Kevok; çivîkeke stûxwar, keçeke stûxwar. Westiyayî û nexweş. Ew, bêdeng, li ber xwe dinihêre. Çavên wê di kortê de, stûyê wê xwar, rûyê wê zerbûyî ye. Guliyekî wê di ser mil re ber bi jêr bûye. Guliyên dirêj û reş mîna şopa du stêrkan e ku di şeva reş de dixuricin. Kevok bêdeng e, her bêdeng e, mîna axa reş, mîna stêr û heyva çirûsî, mîna gora sar, mîna kêlê goristanê yê sar.

Baz û Kevok; bi qasî hefteyekê ye ku ew, li milê deryan ê vî welatî, hatine girtin, bi qasî hefteyekê ye ku xew neketiye çavê wan. Û Baz, serê wî diêşe, janeke kambax ew dîl girtiye. Serê wî tev de mîna ku bi zompan hinciqandibin, ji êşê teviziye. Baz girtî ye. Lê belê ne girtîbûnê, êşa mîgrenê ew xistiye. Ma jixwe ne ji ber vê êşa mîgrenê bû ku ew hatin girtin?

Bi temamî hefteyek e ku ew hatine girtin. Ew li gundekî biçûk ê masîgiran ku li qiraxên deryan e, hatin girtin. Ji wir jî, di şeveke tarî de, destgirêdayî, di nav jîpeke leşkerî de, ew hatin paytextê, warê her tiştî, dilê herkesî. Tam hefteyek e ku ew, di du jûrên tarî de, ji hev veqetî, li hêviya bersivê, lebatek mane. Lê niha payina hefteyeke nediyarî û girtîbûnê êdî xelas bûye. Ew ketine rê, ketine ser riya dawîn.

Kê dizanibû ku ew ê weha bûya, riya wan a fetloke dê weha biqediya!

"Kevok, Kevokê" Baz dibêje, nerm, melûl, westiyayî, azar. Bi dengê nizm, qels. Kevok serê xwe radike û li Baz dinihêre, hêdîka, bi nermahî.

"Kevoka min!"

Kevok, hêdîka, lêvên xwe yên zuwa dilivîne, -mîna axa zuwa ku li hêviya baranê ye, axa ku avê dixwaze. Kevok dixwaze bikene, tevî her tiştî bikene, bi evîn, bi germahî bikene, kenê evînê nîşan bide. Baz dinihêre; bêpayan nerm, bêpayan germ, bêpayan bêçare. Ew li çavên Kevokê, li bîbikan, li kûrahiyên çavan dinihêre. Ji nêrîna wî dixuye; ew dixwaze, bi çavan, Kevokê têxe kûrahiyên dilê xwe. Di jiyana Baz de tu carî hîsên evçend zîz, evçend kûr û evçend tenik di hundirê wî de pêl nedane. Tişteki weha tu carî neqewimiye. Tu carî ew di bin pêlên weha xurt de evçend dîl neketiye û bêgav nemaye. Kevok, sebeb Kevok e. Kevok; qedereke têkel, geş û reş, kaniya jîyanê, kaniya mirinê. Û Kevok; kaniya sebrê. Kevoka ku her sebir kir, hertim, li her derî, li hember her rewşê. Di şevên ronî yên xwendin û xwendegehê de, gava rondikên veqetandinê di hundirê wê de gêr bûn, wê sebir kir. Gava berf û pûk û sawa mirina sar li serê çiyayên serî li esmanan, bi ser wê de hat, wê sebir kir. Gava ew bi rojan, di nav zinar, taht û kevirên reş de, di bin tava germ de, li ber tîrêjên mîna tîrên agir ma, wê sebir kir. Gava xwîna germ û şor jê çû, ew birîndar ket, wê sebir kir. Di zîndanên tarî, sar û şil de gava wext û jîyanê mana xwe winda kirin, wê sebir kir. Di bin rengê helesor ê hingûrên danê êvaran de gava hevalên wê hatin kuştin, wê sebir kir. Gava deng û pêjnên hevalên wê yên mirî, mîna siya wê, ketin pey wê, wê sebir kir. Di rev û veşartin, tirs û sawa girtin û kuştinê de, wê sebir kir. Niha jî, li ser riya mirinê, ew, dîsan, bêdeng, her sebir dike. Kevok; kahniya sebra ku bi mirinê hatiye hûnandin û bi tenê, bi mirinê dimiçiqe.

Nêrîna Baz, niha, li ser riya dawîn; Baz nikare xwe bigire, çav şil dibin, hêstir dikevin çavên wî. Çend dilop ji çavên wî gêr dibin. Baz bi çavên şil li Kevokê dinihêre û dikene. Na ew nakene, awirê kenekî li ser rûyê wî digere.

Ken û girî. Kenekî kesertijî. Jîyan, lîstikên jîyanê. Daf û kemînên jîyanê. Bêgaviyên jîyanê.

Şerm? Na, Baz ê êdî ji çi şerm bike? Ew dizane; riya ku ew li ser in, bêveger e. Rê ber bi mirinê, geliyê kûr ê mirinê ye. Êdî hemû pêwendiyên jiyîn û jîyanê li pey mane; ew wextên miyesser ên xwendinê, ew demên mesûd û kêfxweş ên jîyanê, ew şevên hezkirinê, ew coş û heyecana nêzîkbûna bedenên tazî, ew şehweta mirin û kuştinê, ew pêlên kîn û nefretê, ew hêrs û rik, ew dijminahiya bêpayan, ew şevên bêdawîn, ew jîyana tarî ya şevên xwîntijî, ew girîn û qîrîna însanî, ew çavên bêhejmar ên sawtijî ku li ber mirinê bûn, ew bedenên ku bi berikan bûbûn mîna seradê û li erdê gevizîbûn, ew xwesteka hilweşîn û kavilkirinê, ew daxwaza yekîti û avakirinê, ew berpirsiyariyên pîroz ên parastinê, ew şewat, ew hîsên şewitî, êdî ew hemû bi tenê şopeke zirav û nediya a du umrên bêkes û bêçare ne. Belê, ew bi tenê niha bîranîneke zerbûyî ya du umrên bêpişt û xerîb in. Êdî her tişt li pey maye. Êdî şerm çima?

Baz nikare xwe bilivîne. Ew ne dikare xwe bilivîne, ne dikare hêstirên çavan paqij bike û ne jî destê xwe bibe ser guliyê Kevokê û gulî ber bi paş bavêje. Herdu destên Baz, ji paş ve, girêdayî ne. Herweha destên Kevokê jî. Dest bi piyên hesinî yên kursiyên minûbusê ku ew tê de ne, kelemçekirî ne. Herdu li hember hev, girêdayî, rûniştine û li hev dinihêrin, -bi nêrîna evîndaran- bi nêrîna birîndaran.

Lê Kevok zahf westiyayî ye. Kevok diêşe. Bêxewî, sergêjî û sersemiya rojan wê diêşîne. Kelemçeyên ku bi bazindên destên wê ketine, wê diêşîne. Minûbusa ku dere, wê diêşîne. Halê ku Baz tê de ye, wê diêşîne, zahf diêşîne. Sebeba vî halî, Kevok e. Kevok weha bawer e. Eger Kevok nebûya, eger Kevok nebûya bar, eger ew li hêviya kaxizên sexte yên Kevokê nemana û Baz bikaribûya pasaporteke sexte ku her tiştê wê bi Kevokê dişibiya, bi dest xista, heye ku ew nehatina girtin û ev hemû tiştên kirêt nehata serê Baz. Û serê wê. Çavên Kevokê dîsan ber bi jêr dibin.

Minûbus dere. Ne bi lez, hêdîka. Mîna ereba cenazê, giran. Baz ji dangan derdixe; ew di bajarê mezin, di nav paytextê welêt re

dibihurin. Na, ew nabihurin, hêdî hêdî ji bajêr derdikevin. Dengê terembêl, otomobîl, teksî û ereban tê. Dengê kamyonekê tê. Şoforek diqîre. Yekî din ê taksiyekê deng li rêwiyên xwe dike. Dikandarek bi qîrîn erzaniya meyweyên xwe bi şêniyan digihîne. Yek qirawatên hevrişimî, bi erzanî, difiroşe. Otomobîlek ji nişka ve disekine, dengê zîz ê firênê tê. Dengê lingên kesên ku dimeşin tê. Ji radyo û hoparloran dengê marşên leşkerî tê. Dengên têkel ên bajarê mezin tên. Ew di nav dengên de, bêdeng, derin.

Ew derin, di nav dengên rojane yên bajarê kevnar de, ber bi bêdengiya mirinê derin.

Baz, niha, difikire, gelo ew biqîre? Feyda wê dê çi bibe? Kî dê dengê wî bibihîse? Eger deng were bihîztin jî, kî dikare were hawara wan? Ew ji serbûrî û kirinên xwe yên berê dizane; tu kes, êdî tu kes nikare were û arî wan bike. Li vî welatê zahf fireh ku hertim li milekî ba û bahoz, li milekî tav û tîrêj e, êdî tu kes nikare wan xelas bike. Ew ê nehata girtin, niha piştî girtinê hew kesek dikare alîkariya wan bike. Fermana wan hatiye birîn, êdî çare nûn e. Lê Kevok? Qet nebûya Kevok xelas bûya.

Çawan? Rê divê, çare divê. Lê çawan?

Danê êvarê ye. Li derve, ji aliyê rojavayê bajêr, li ser çemê boş ku hemû bajar seranser, lê fetloke dibire, roj diçe ava. Tîrêjên roja danê êvarê xwe di caxên hesinî yên minîbusê re digihînin hundir. Kulmek tîrêj li ser por, enî û rûyê Kevokê şewq dide. Rûyê Kevokê ronî ye, "mîna melayketan", Baz, bêdeng, difikire. Germ e, tevî ku roj diqulipe, dinya germ e. Erebe, hundirê erebê germ e. Kevok xwîdan dide, binçengê wê, berzikê wê, stûyê wê şil dibin. Xwîdan jê dere. Kirasê wê bi bedena wê ve zeliqiye. Çend dilopên xwêdanê ji eniya wê gêr dibin.

Bajar, paytext, bajarê kevn ê tarîxî. Bajarê çemê zêrîn. Bajarê Baz, bajarê zarokatiya Baz. Baz li vî bajarî mezin bû, xwend, zewicî. Li vî bajarî, wî li pey gogê bazda, li çîrokên qehremaniyê guhdarî kir, di şer û pevçûnan de serê wî, ji çend cihan, şikestî, li qeraxên çem, di meş û piyasan de, tahm û germahiya

lêvên keçekê ku jê hinekî dirêjtir bû, bedena wî, cara yekemîn bi kela şehwetê, hezand. Li vî bajarî, li aşxane û meyxa nê qeraxên çem, wî xeyalên xwe yê mezîn ên rojên bê di mêjiyê xwe de risandin. Di cade û bûlwarên fireh û kolanên teng ên vî bajarî de Baz, carina serwxêş, carina kêfxweş, carina behnteng, geriya. Li taxên derve yê vî bajarî, Baz ket pey keçên xama, çû kexxanan. Li kexxana mezîn a vî bajarî, ew ket hembêza Maderê, yara wî ya qehîm, dosta wî ya axretê. Li vî bajarî, bi dîsîplîneke bêpayan, ew perwerde bû, xwe nasî û dil, mêjî û ruhê xwe xist nav qeydên dîsîplîneke bêpayan. Li vî bajarî wî, her û her, di berbangên sibeyan, di nîvên şevan de, marşên leşkerî, bi dengê berz, gotin û şîkur li Xwedê, li welat, li millet, li dewlet, li ordî û li serekê welêt û dewletê kir. Li vî bajarî eşqa şevê, eşqa heyvê, eşqa stêran kete dilê wî, ew bû peyayê şevê. Li vî bajarî wî, cara yekemîn, kincên nû yê leşkerî yê bi apolet li xwe kirin, kumê zabitan danî serê xwe. Mala wî, zarokên wî ku wî ji mêj ve ye, nedîtine, hê jî, li vî bajarî bû.

Bajar; xwediyê çemê nazenîn, xwediyê germahiya tavê û ronahiya heyvê. Bajar; xwediyê gor û goristanan.

Belê, ev bajar bû qedera Baz; bû rengên qedera Baz; bû kêfxweşiya wî, bêhtengiya wî, jan û keserên wî. Bi wext û demên dirêj, bi dirêjahiya salan, di berf û baranê, ba û bahoze, tav û germê de, vî bajarî Baz, gav bi gav, anî pê, Baz kir Baz, Baz kir bazekî nêçîrvan. Niha, li ser rîya mirinê, bajarê ku ew kiribû Baz, bêdeng, şahidî li çûyina wî dike. Niha ew hemû rabirdûya dirêj a Baz a vî bajarî, di dil û mêjiyê Baz de, bûye hîseke tenik, zirav û zîz; bûye hîsek ku umrê wê bi qasî kêliyê ye.

Kevok? Pêwendiya Kevokê û vî bajarî? Kevokê jî li vî bajarî xwend, pênc salên wê yê ciwanîyê, pênc salên ders û xwendinê yê xwendegehê, di vî bajarê têkel û balkêş de derbas bûn. Li vî bajarî ew pêrgî hezkirê xwe yê xort ku paşê wînda bû, hat; coş û besteke nedîtî bi bedena wê ket. Cara yekemîn li vî bajarî, wê ruh, can û bedena xwe da ber hilma evîn û hezkirinê, dest û

tiliyên hezkirê wê li ser bedena wê geriyan. Li vî bajarî ew li xwe û li reh û rêçên xwe vegeriya. Li vî bajarî, cara yekemûn, hîsên nû yên tirseke bêsinor kete dilê wê, di nav girse û şeniyên bêhejmar de, ew bi tenêtiya xwe hesiya, çendîn car tayekî sar ê xofê hemû bedena wê lerizand. Êvaran, di bin ronahiya lampayên bûlwar û kolanên vî bajarî de, fikr, hizr û gumanên nû, teze û rengîn, mîna dilopên barana ku di nav ronahiya lampayan de diçirîsîn, dilê wê vegirt. Di odeya biçûk a pansiyona xwendegeha vî bajarî de, di bin ronahiyeke qels a çirayekê de, wê rûpel li pey rûpel, kovar li pey kovar, kitab li pey kitab, xwendin û bîr, bawerî û dîtinên nû nasîn. Li vî bajarî wê însanên nû, civateke nû, zimanekî nû, çandeke nû nasî. Li vî bajarî wê rê û rêzik, heyin û hebûnên xwe dan ber yên nû û xwe hîn çêtir nasî û rê li ber xwe rast kir û kete ser vê riya ku niha êdî diqede.

Rê diqede, kutahiya rê tê. Riya du umrên ku qet ne mîna hev in, mîna roj û şevê ji hev cihê ne, lê belê li ser rê pêrgî hev hatine û qedera xwe kirine yek, niha, êdî, diqede.

Niha ew li kû ne, li kîjan aliyê bajarê mezin in? Baz guhê xwe dide ser dengên. Dengê marşên leşkerî ku danê êvaran dest pê dike, niha, li ser hemû dengên e. Ji dengên dixuyê, şeniyekî boş dere û tê. Li milê der ê minîbusê xelk kar û şixulên xwe yên rojane xelas dîkin û derin mal û warên xwe. Bajar haziriya êvarê dike. Danê êvarê diqulibe. Ro, hêdî hêdî, bi tîrêjên hêlesor, dere ava. Bêdeng, bêpêjn. Ro, di mîlên penceran re, silavên xwe yên dawîn dişîne hundirê minîbusê. Ro, ronahiya royê ji wan xatir dixwaze. Baz dizane; ew dikevin hambêza şevê, ew ê hew ro û tava rojê bibînin.

Heye ku ew niha li doralîyên Salona Zabitên Ordîyê bin? Baz hêdîka serê xwe radike û li caxên zirav ên pencera li hember xwe ya minîbusê dinihêre. Bêguman, ji şewqa tîrêjan pê ve, ew tiştekî nabîne. Pencere gelekî li jor e. Dengê marşan tê. Salona Zabitên Ordîyê... Li kêleka meydana herî mezin a bajêr, navenda bajêr, çaralîyên wê bi dîwarên qehûm û bilind rapêçayî. Li çaralîyên wê

leşker û nobedar. Keleheke mehkem li meydana mezin a bajêr. Bêguman, li meydana jî heykelê serekê welat û dewletê. Bi heykelekî reş î granîtu ku bi qasî çar mîtroyan e û rûyê wî ber bi Salonê ye, di nav kincên leşkerî de, serek tiliya xwe ya mezin a destê rastê ber bi bajêr kiriye û rê nîşanî xelkê xwe dide. Bi nêrîn û awireke tûj. Bi simbêlên boq. Teyrekî mezin ê dirende li ser milê rastê. Serek... Çendîn caran Baz, bi ken, bi serbilindî, bi rêzdarî, li wî heykelê mezin nihêribû. Çendîn caran Baz li wê salona zabitan rûniştibû, xwaribû û vexwaribû! Çendîn caran wî li wir hevalên xwe yên zabit dîtibûn û bi wan re li ser çek û pûsadan, mirin û kuştinê, evîn û hezkirinê, jin û keçan peyivîbû. Çendîn û çendîn caran behs hatibû ser qehremaniyê, hevalti û biratîyê, ser dijminên welat û dewletê û fedakarî û xurtiya li hember dijminan... Û zewaca wî, daweta wî ya rengîn û geş li wir, li Salona Zabitan.

Niha, bi ihtimaleke mezin, ew di ber heykel û dîwarên bexçe yê salonê re dibihurin û derin.

Mala Zarokên Sêwî, avahî û warê ku Baz lê mezin bûbû, niha, tê bîra Baz. Eger ew niha li doralîyên Salona Zabitan bin, hingî Mala Zarokên Sêwî li aliyê din ê çem û bajêr dimîne. Ji mêj ve bû ku Baz dixwest, carekê, biçe wê malê, warê zarokatiya xwe, berpirsiyarên malê ziyaret bike, hin diyariyan bide zarokên sêwî, oda mezin a ku ew jî tê de radîza, bibîne, tevî zarokên sêwî yên nû, li aşxana malê firavîne bixwe û çend saetan bi wan re be. Wî pir dil fikir, danê êvarekê, gava ro hêdîka diçû ava, li bexçe Mala Zarokên Sêwî, di bin wan darên mezin û kevnare yên çinanan de, pal bida û bi dengê pelan û bayê sivik ê danê êvarê, di xew re biçûya û dîsan xwe bigihanda xewnên xwe yên masûm û zelal ên zarokatiyê. Lê nebû. Lê ew ê nebe, êdî qet nebe.

Jina wî ku jîyan lê herimandibû, herdu kurên wî ku, niha, bi ihtimaleke mezin li aliyê din ê çemê bajêr, li malê ne, çi dikin? Haya zarokan heye ku bavê wan hatiye girtin û niha ew ê bi destê hevalên wî yên kevn bê kuştin? Ma ev bûne çend sal ku wî zarokên xwe nedîtine? Dido? Sisê? Bêguman, bejna lawê mezin

niha gihîştiye bejna Baz. Heye ku rih û simbêlên wî jî derketibin. Lawikê biçûk ku hertim di nav cih û nivînan de dihate hembêza bavê xwe û dixwest pê re, li kêleka wî raze, niha, bejn avetiye? Cara dawîn, gava Baz hatibû serîdana malê, qama wî digihîşte destê deriyê oda razanê. Niha?

Û piştî vê êvarê? Êdî ew ê hevdu qet nebînin. Ev misoger e. Lê piştî vê êvarê ew ê çi bifikirin? Ew dizanin, bavê wan endamê ordiyê bû, zabitekî bijarte bû, canfedayê welêt û dewletê bû, xwediye berpirsiyariyên mezin û giran bû. Lê wî çi fikir, çima nedihate malê, çima wînda bû? Zarok ê li hember van pirsan çi bibêjin, çi bersivê bidin? Gava zarok mezin bibin, ew ê jî mîna wî bibin zabit? Ew jî wê bi şixulên parastina welat-milet-dewletê rabin? Û paşê? Dawî dê çawan were?

Mader, dosta jiyana wî ya li kerxanê ku êdî pîr bûye, niha, çi dike, çi difikire? Madera ku carina ew bi marşên leşkerî, carina bi stranên erzan ên kerxanê dilorand, wê niha bi qedera Baz bihese?

Û ev marşên leşkerî ku hê jî mîna xwîna wî, mîna dengê dilê wî, di reh û damarên wî, di ruh û mejiyê wî de diherikin û olan didin... Baz bi van marş û stranên leşkerî xwe nas kir, bi wan mezin bû û îro jî, mîna leyistikeke siûda wî ya têkel, bi van diçe mirinê. Gava Baz di Mala Zarokên Sêwî de, hê, pariyekî zarok bû, ew hînî van marşan bûbû. Zarokan bi van marşan dest bi rojê dikirin, bi van marşan diketin nav nivînan. Bi dû wan salên zarokatiyê re jî, di dibistan û xwendegehan, di Akademiya Leşkerî û jiyana leşkerî de, roj û şevên Baz, her û her, bi dengê marş û stranên maxrûr ên şer, qehremanî û fedekariyê hate risandin. Her û her, Baz, jiyana Baz, umrê Baz bi marşan, bi hemd û şukra welatê ku milekî wî deryayên bêdawîn, milekî wî jî çiyayên serî li esmanan e, bi stranên leşkerî derbas bû. Her û her ew li hember ala ku ji sê rengan, rengê sor, spî û kesk hatiye pê û li her aliyê welêt, li tixûban, li ser banên garnîzonên leşkerî û di bilindahiyên avahiyên de hêl dibe, radiwesta û bi dengê berz, gur û xurt, wî marş digotin. Bi bawerî, bi hez, bi coş.

Lê niha, di bin perda bilind a dengê marşan de, deng ji Baz dernakeve. Ne bawerî, ne hez û ne jî coş maye. Bi tenê niha hîsên têkel ên zîz mane. Kevok maye, hîsên ku Kevokê û hebûna Kevokê veguhezandine wî, mane. Hilma mirinê maye. Dengê dilê wî ku hildavê, maye. Baz dîsan li Kevokê, rûyê wê, bala wê dinihêre. Hundirê minûbusê, hema çî bigire, tarî bûye. Ne tav, ne jî ronahiya tîrêjên wê mane. Di vê tariya tenik de, rûyê Kevokê, bi rengê qemerî, dibiriqe. Kevok, bi por û guliyên xwê yên dirêj, awirê xwe yên sakîn, çavên xwe yên reş, birû û mijangên xwe yên dirêj, lêvên xwe yên fireh û tijî û stûyê xwê yê mîna stûyê xezalekê, niha, mîna periyeke destanan, periyeke xewnan, dixuye. Mîna ku Baz di xewnekê de be, mîna ku di nav derya sêran de be, welê matînayî û zîz, ew li evîndara xwe dinihêre. Reşahiya hingûrê û destpêka êvarê ku rengê qemeriye vekirî reşandiye nav minûbusê, Kevok qulipandiye ser periyeke xweşik a xewnan. Kevoka westiyayî û nexweş, niha, di nav bedewiyeke nedîtî de ye. Ji bo Baz, ew welê dixuye. Berê jî Baz dizanibû ku Kevok bedew e. Lê evçend! Ev narînî, ev nazenînî, ev bedewiya sade û sakîn! Ev delaliya bêdeng! Ev gula sor a ku di nav xwînê de hêşîn hatiye! Kevok; hîsa evînê ya Baz a bêsînor, bêhesab; germahiya agirê evînê ku di dilê Baz de vêketiye. Kevok, dilê westiyayî ku mîna dilê wî, niha, li hember wî, hildavê; hêviya Baz, êdî her tiştê Baz, bela serê Baz, mirina Baz. Kevok, dîla bêziman; bextiyariya Baz, îspata jiyîna Baz û mohra mirina Baz. Baz şaş maye; ev çî hîsên xerîb in ku bi ser wî de tên? Ev, xewn in, xewnên însanekî ku bi taya evîne ketiye? Ev, pêjnên mirinê ne ku bi ser wî de tên? Baz çî bike, çî bibêje?

"Kevok", Baz, hêdfika, dibejê. "Kevoka min..." Kevok stûyê xwe yê xwar, hinekî, rast dike û bi çavên hinekî vekirî, li Baz dinihêre. "Kevok", Baz dîsan dibêje. Lê hewqas. Dawiya gotinê nayê. Baz ê çî bibêje, xwe çawan îfade bike? Ew ne bi tenê ne. Ew girtî ne, westiyayî û nexweş in. Ji devê wî gotineke din dernakeve. Wext, ne wextê gotinan e. Qîmeta gotinê li hember ras-

tiya mirina sar çi ye? Wext, wexta hûs û pêjnan e, -hûs û pêjnên nediya- nexuyayî ku di dil û ruh de pêl didin, bi pêlan nefes li qurbanan diçikîn.

Baz difikire, eger ew nehatina girtin û neketina ser vê riyê, heye ku Kevok bibûya dê. Heye ku Kevokê zarokeke, bêguman mîna xwe bedew, zaroka Baz, bianiya dinyayê. Di nav keft û left, tirs û reva mehên dawîn de, xwesteka herî mezin a Baz ev bû; zarokeke ronî ku encama hîsên bêpayan, coş û tirsên bêhempa bû. Ew ê ji vî welatê ku jê xwîneke boş dere, biçûna. Li welatekî dûr, nû û xerîb maleke wan ê çêbûbûya. Kevokê, heye ku hingî, giloka zêr li wî welatê nû bianiya dinyayê. Şer, pevçûn, mirin, kuştin, rev, tirs û her tiştê jiyana bihurî dê li pey bima. Heta nav û nasnavê wan, her tiştê wan ê nû bûya. Wan ê nav û nasnavê xwe biguhertina û dest bi jiyaneke nû bikirana. Baz ê dest bi karekî nû bikira. Karekî nû ku tu pêwendiya wî bi kar û şixulên kevn nebûya. Baz ê, piştî karê xwe yê nû yê welatê nû, bihata malê. Ji mitbexê bêhna şîva germ a Kevokê bifûriya, şîv ê hazir bûya. Hingî Kevokê, li oda razanê, di xew de bûya. Kevokê wê hêdîka nefes bigirta û bida, bi îhtimaleke mezin, zikê wê yê mezin ê hêdîka rabûya û daketa. Hilma wê ya xweş a jinên biheml ê ode vegirtibûya. Baz ê, hêdîka, bêyî ku Kevokê hişyar bike, bihata û destê xwe li ser zikê germ ê Kevokê bigeranda. Wî dê zik mist bida û bi tevgerên zarokê ku di zik de bû, bihesiya. Germahiya Kevokê, tevgera zaroke ê dest, beden û ruhê Baz germ bikira. Baz ê bi ramûsaneke biçûk Kevok hişyar bikira. Kenekî jiyana nû li ser rûyê wan, wan ê dest bi êvara xwe bikira. Xewneke weha. Xewnek ji xewnên demên dawîn.

Di vê êvara germ a çûyinê de, dewsa gotinan, ev tiştên hanê ku Baz, çendîn caran, bêdeng, lê fikirîbû, niha, tên bîra Baz. Baz dikene.

Û Baz digirî. Çend rondikên nû ji hinarikên wî ber bi jêr dibin.

Lê na, Baz divê negirî. Li nik van kesên ku heta do jî hevkarên şixulên wî bûn, ew divê xwe rabigire. Heta berîniha bi çend me-

han jî, Baz, xurt, bêtirs, qehûm, sert û jîr, ew îdare dikirin û karên van digerlandin. Baz li wan hukim dikir. Niha ev ê, girîna Baz, ji sistî û qelsiyê bizanibin. Na, Baz divê negirî, xwe sil neke. Baz û Kevokê, bi zanîn, dabûn ser vê riyê. Wan dizanibû, li ser vê riyê, mirin jî dikaribû pêrgî wan bihata. Wan mirin jî qebûl bû. Hingî ew jî divê mirinê, bi aramî, mîna ku Kevok dike, qebûl bike. Ma pêwendiya wan ji hilma mirinê nehatibû pê, bi hilma mirinê ne risiyayî bû? Ji ber bêhn û sawa mirinê wan xwe li hev negirtibûn? Ma ne ji ber tirs û reva mirinê bû ku nefesa wan a germ têkelî hev bûbû û her cara ku wan çavê xwe girtibûn û ketibûn xewê, ew her li mirinê fikiribûn? Ma siya mirinê, hertim, di roj û şevên wan ên germ ên veşartinê û sar ên revê de, ne li dora wan bû? Ma ji mirinê, saw û tirs mirinê, serma û jana mirinê pê ve û ji bervajiya wê, evîna wan pê ve, di jiyana wan de, çi mabû? Hingî? Baz xwe dide hev. Ew çavên xwe yên şil, çend caran digire û vedike, stûyê xwe, pihê, ber bi herdu milan, diqirpîne û sîng û qama xwe rast dike.

Çavên Baz ê êdî şil nebin, keser ê li bîbikên çavê wî venenişe, rengên payizê yên dilsoj ê li ser rûyê wî negerin. Ew ê li van demên dawîn ên ku tevî her tiştî maneyeke nû dabû jiyana wî, bifikire. Ew ê li evîndara xwe ya westiyayî, li evîna xwe ya westiyayî bifikire. Ew ê li wan stranên zelal ên Kevokê ku wî jê fam nedikir, bifikire. Ew ê li gotinên stranên germ ên şevên wan ên dirêj bifikire. Û ew ê li stranên ba û tebiyetê bifikire.

Ew dizane; ew ê bi dengê stranên ba û tebiyetê bikevin ser axa reş. Stranên ba û tebiyetê dê bibe kefenê wan û wan rapêçe...

Ew heft kesên ku wan dibin, napeyivin û li wan nanihêrin. Baz wan nas nake. Digel ku Baz û ew di nav eynî pêwendiyên de bûn, hevalên eynî riyê bûn, Baz ew nedîtine. Ji bal û runiştina wan a sert dixuye; ev kes hosteyê karê xwe ne. Ew dizanin ka Baz û Kevok kî ne û divê çi bi serê wan de were. Baz li wan dinihêre, lê dizane ku bi wan re peyivîn vala ye. Bîranîna hevaltiya kevn û qala qehremanî û fedekariya yekgirtî ya rojên bihurî vala ye. Lava û tika vala ye. Behsa bext û wîjdanê, yekcar, vala ye.

Niha ew gihştine kû? Ew ji bajêr derketine, dengên rojane yên bajêr li dûr mane. Du lampayên biçûk, li herdu milên minîbusê pêketine û ronahiyeke qels direşînin hundirê minîbusê. Deng hê ji tê, xufe xufa dengên bajêr ku bi dengê lawirekî dirinde dişibe, hê jî, bi ber guhê wan dikeve. Lê ew niha gelekî dûrî bajêr in. Dengê marşên leşkerî, tevî ku ew ji bajêr bi dûr in, hê jî, di ser hemû dengan re xwe bi wan digihîne. Baz nizane ka ew bikene yan bigirî. "Li vê siûda teres binêre", Baz difikire, ji nav hemû rojên Xwedê, ew ê îro herin diyarê rehmetê! Îro! Dengê tîz ê marşên leşkerî ne bêsebeb e; îro, roja salvegera desthilatiya serekê welat, millet û dewletê ye. Berî niha bi bîst û sê salan, roja îro, serekê ordiyê, yanî serekê welêt û millet –ku em ê jê re bibêjin General Serdar– hukmê dewletê xiste destê xwe û bû serekê dewletê jî.

Ew roja hanê ya coş û heyecanê, hê mîna do, niha, tê bîra Baz. Hingî Baz nû bûbû zabit. General Serdar, tevî birayekî xwe yê general, du zava, hin xismên wî yên serbaz, kurmamekî wî ku serbazekî navdar bû û hevalbendên wî yên zabit, di şevgura sibeyeke payizê de, bi tangan êrîş biribûn ser qesra qral, qral û hin pispor û alîgirên wî, di cih de kuştibûn, kontrola ordî û dewletê bi dest xistibûn û hatibûn ser hukim. Sedema serhildan û cunta wan gelekî hêsan bû; welatê fireh û mezin ji hev diket, welat ji dest diçû. Welat, ku em ê jê re bibêjin Welatê Mezin, ku ji gelek welatên biçûktir –welatê jor, welatê jêr, Welatê Çolê, Welatê Deryayê, Welatê Çiyan...– hatibû pê, bi qewlê General Serdar û hevalbendên wî, li ber xetera perçebûnê bû. Yekîtiya welêt diviya. Parastina yekîtiya welêt diviya.

Ew rojên mahşerê ku ala li ba dibûn, tang diçûn û dihatin, dengê balafirên jet hawîrdor vedigirt û mufrezeyên bêhejmar ên leşkerî li her aliyê welêt, bi postalên xwe, erd dihejandin, niha, tîna bîra Baz. Baz bi General Serdar bawer bû, ji herkesî bêhtir pê bawer bû. Bi dil û can, bi ruh û hebûna xwe pê girêdayî bû. Ji bira, kurmam û zava û ehlê General Serdar bêhtir. Ji jin û keçên

wî pirtir. Ji bavê wî yê kal, diya wî ya pîr zêdetir. Baz, canfedayê General Serdar bû. Her gotineke General, her awirekî wî, her desthildaneke wî, ji bo Baz, fermaneke misoger, ayeteke pîroz bû. Belê, welê bû.

Belê, îro, roja salvegera hukimdariya General Serdar e.

Belê, îro, di roja pîroz û pîrozbahiyê de, ji qesra General Serdarê ku êdî kal bûye, hinekî bi dûr, Baz û Kevok ê bên kuştin.

Baz kesereke kûr, bêyî ku haya wî jê hebe, bi deng, dikişîne, stûyê xwe xwar dike û li ber xwe dinihêre. Bi qasî kêliyekê ew welê dimîne, paşê ew serê xwe radike û ji kesê girs ê mîna pehlîwanan ku li kêleka wî, bêdeng, rûniştîye, bi hêdîka, cixareyekê dixwaze. Lê ji kesê kêlekê deng dernakeve, çendekê dihere, tu gotin, tu lebat jê nayê. Kesê kêlekê lê nanihêre û guh nadiyê.

Baz ê çi bike? Qet, qet tiştek ji destê wî nayê.

Bi qasî demeke dirêj, ew, welê bêdeng, derin. Ji dengê motora minûbusê pê ve tu deng nayê. Çavên Kevokê girtî ne, guliyên wê, di ser herdu milan re, li ser fîstanê wê yê tenik ê havînê ne, stûyê wê jî xwarbûyî ye, -mîna ku ew çûye cîhanêke din, mîna ku ew di xew re çûye. Mîna ku ew, ji niha ve ketiye xewa kûr a mirinê, ne êşa bedena wê, ne westa meh û salan li ser rûyê wê dixuye, ne şopa sûzenî û gumanan, ne ya endîşe û heyecanan, ne jî ya kêfan dixuye. Ne dengê, ne pêjnek jê tê. Sadeyî, zelalî û aramiya awirê Kevokê, dîsan, bala Baz dikişîne. "Lê, bêşik, serê wê jî, niha, mîna serê min, diêşe", Baz li Kevokê dinihêre û difikire, "serî giran bûye, serî diêşe, serî hew dikare van bûyeran hilde..."

Baz hê welê difikire, ji nişka ve, minûbus radiweste. Gelo ew gihîştine cihê ku ew ê bigihîştinayê? Bi qasî kêliyekê, ew welê rawestî dimînin. Paşê ew herdu kesên ku li kêleka şofor rûniştî ne, ji minûbusê peya dibin û di paş re tînin û herdu deriyên mezin ên dawîya minûbusê vedikin. Ronahiyeke qels hundirê minûbusê vedigire. Hingî Kevok jî çavê xwe vedike. Ew kesên ku li kêleka Baz û Kevokê rûniştî ne, kelemçan vedikin û wan ji minûbusê peya dikin. Peşî Baz, paşê jî Kevok ji minûbusê peya dibe.

Êvar e, êvareke germ a havîneke kelîjî ye. Ew ji bajêr gelekî bi dûr ketine. Êdî tu dengên bajêr nagihê wan. Lê ji dûr ve, ronahiya lampên bêhejmar ên bajêr, mîna pilpilingên rengareng ên biharê, diçirisin. Bajarekî evçend spehî û mezin! Baz nizanibû ku bajar evçend mezin û fireh bûye. Heta ku çav, ji dûr ve, dibîne, li her alî, bêserî û bêdawîn, lampe diçirisin. Baz û Kevok bazindên destên xwe yên tevizî difirkînin û li aliyê bajêr dinihêrin. Li jêr çirîskên bêdawîn ên lampeyên bajêr, li jor jî çirîskên bêdawîn ên stêran dixuyin. Di esmanê zelal de tu ewr nîn in, kom û keriyên stêran, bi rengên şên û germ, diçirisin. Û heyv... Heyva ronî, mîna şefê okestrayekê, cumbuşa ronahiyê îdare dike. Ronahiya jêr û ya jor a bedew bûne hevalbendê hev û tebiyetê. Ronahî bûye hevalbendên Baz û Kevokê.

Di esmanê zelal de, stêreke zer û zirav, xêzeke zêrîn li pey xwe dihêle û bi qasî çendekê dixuriçe. Ji dûr ve, ewte-ewta hin segan tê. Dengê segekî, bi qasî demekê, olan dide. Dengê beqan tê. Li doralî hin mêş û mozên şevê vize viz dikin. "Kevok", Baz dibêje, "li vê şeva evçend spehî binihêre... li vê şeva spehî û li vê qedera teres binihêre!.."

Ew heft kes li dora wan in. Sisê hinekî ji wan dûr in, lê ew çarên ku di minîbusê de li kêleka wan rûniştibûn, gelekî nezîkî wan û demançeyên tazî di destên wan de ne. Û tilî di nav qevanên demançan de ne. Û pêçî li ser lingên demançan in. Tevî ku demançe baş naxuyin, Baz celebên wan dinase; dido ji wan bar-etta in, yek walthera almanî û yek jî mîna demança Baz baretta. Ew li kêleka rîyeke asfalt ku jê bêhna ziftê tê, rawestiyane. Baz rê dinase; ew li aliyê bakur ê bajêr in. Çemê yekta ku di bajêr re derbas dibe û bajar dike du bir, bi qasî çendekê ji rê dûr, paralelî rê diherike. Baz li jor, li heyv û stêran, li dûr, li şewqa çirûsî ya bajêr, li doralîyê xwe, li kesên ku bi wan re ne, dinihêre. Bi çavên şil, bi awirê hawarê. Baz alikariyekê dixwaze, bext û efûyekê dil dike. Baz mûcîzeyekê hêvî dike. Baz dinihêre, li çavên kesan dinihêre. Lê bê havil e. Di vê êvara ronî de, tu çiriska hêviyê nîn e.

Di bin vê ronahiyê de, hundirê wî tarî ye, bi tenê tarî, lal, tirstijî û şikestî. Keys nîn e, çare nîn e, rê nîn e. Lê belê, dîsan jî, ew xwe dide hev, rûyê xwe ber bi wan herdu kesên ku li ber deriyê pêşî yê minûbusê rawes-tane, dike û dixwaze tiştekî bibêje. Heye ku tiştekî biqewime. Reng e ku mûcîzeyekê were pê. "Tu gunehê Kevokê tune", ew dibêje, "ew bi qedera xwe razî bû, lê min ew mecbûrî revê kir. Wê berdin. Ew nexweş e.. Kevokê berdin..." Tu deng dernakeve, tu tevger nîn e. Baz tu bersivê wernagire, -mîna ku wî ji axa reş, esmanê ronî lavelav kiribe. Careke din, careke din, Baz li wan dinîhêre, dipeyive, tîka dike, li ber wan digere. Lê qet... Ji dengê beqan û dengê dûr ê hin heywanan pê ve tu teng dernakeve. Bêdengî ye, bêdengiya mirinê ye, êdî bêdengiya mirinê kirasê xwe rakêşandiye ser wan, ser axa ku ew pê lê dîkin. Bêdengiya mirinê wan ji jîyanê, reh û rêçên jîyanê, ronahiya jîyanê bi dûr dixîne û dibe mirinê. Heyv û stêr ê êdî bi tenê şahidî li bêdengiya mirinê, li perda wê bikin.

Kerb, qehr, hêrs, şaşbûyin, bêgavî, zîzî û hûsên din ên têkel... Baz kelegirî dibe, çavên wî yên şil tijî hêstir dibin û piştî kêliyekê rondik ber bi jêr dibin. Baz naxwaze ku ew bi giriyê wî bihesin, lê nabe. Baz digirî, pêşî bêdeng, paşê bideng. Bedena Baz dilerize, li ser çokan, hêdîka, dikeve erdê. Lê tevî ku ew xwe mîna telisekî vala, cendekekî werimî hûs dike, ew radibe ser piyan, xwe dide hev, careke din li wan dinîhêre. Lê êdî Baz napeyive, hew ji devê wî gotinek derdikeve. Bi tenê ew difikire, "naxwe, hûsên mirinê, jan û hizna bêtarîf a hûsên mirinê ev in", bêdeng, ji xwe re, dibêje, "naxwe, ew însanên ku min şandin mirinê jî, beriya mirinê, ev tişt hûs kirin..."

Dido ji wan çar kesan tên û dîsan, ji paş ve, bazindên destên Baz û Kevokê li kelemçan dixînin. Û bîyî ku tiştekî bibêjin, wan dahf didin.

Ew dimeşin, dido ji wan kesên demançe di destan de li pêş, dido jî li paş wan, ew ji rê bi dûr dikevin. Heçî ew diduyên din ku li kêleka deriyê pêş ê minûbusê rawestiyane, li nik minûbusê

dimînin. Baz û Kevok û ew herçar kes dikevin nav erdekî qiraç û bêdeng, dimeşin. Erd tijî qîş û kevir in, cih bi cih, li der û dor qûç û şikêr hatine pê. Giya û kulêşên ku bi qasî çend bostan bilind in, li lingên wan digerin. Gavên wan deng derdixin. Ji hawîrdor bîhna giya, pûş û rêşî tê. Kevok li milê çepê Baz, jê bi qasî gavekê li pêş, dimeşe. Mîna ku haya wê ji tiştêkî tune, serê wê rast, ew li pêş xwe dinihêre û bi gavên gelekî tekûz û hêdî dimeşe. Pêlavên wê yên gewr ên spor, bi tekûzî, pê li axê dikin. Fîstanê wê yê dirêj û tenik, hêdîka, li ba dibe. Morîkên gir ên turkuwaz ên di gerdena wê de û gerdeniya zîvîn, hêdîka, deng derdixin. Şewqeke tenik li ser rûyê wê yê esmer e, mîna ku ronahiya heyvê ji rûyê wê, ji çav û lêvên wê radimûse; mîna ku stêr, bi tîrên xwe, por, kezî û guliyên wê şeh dikin. Kevok; keça hov, kûvî, keça bêqusûr, keça esmer a evîna ronî û mirina tarî. Kevok; keça rêz û rezdariyê, keça şehwetê. Kevok; keça heyvê, keça stêran, keça esmer a axa rêş.

Ji nişka ve tiştêkî tê bîra Baz; wî tu carî, bi gotinan, hez û evîna xwe ji Kevokê re negotiye! Tevî ku ew ketin ser vê rîya man û nemanê, tevî ku niha Baz ji bo Kevokê, diçe mirinê, wî tu carî jê re negotiye ku ew jê hez dike. Niha? Ew niha bibêje? "Kevok", ew dibêje, "Kevoka min..." Lê hew, ji bilî vê, gotin ji devê Baz dernakeve. "Kevoka min..."

Kevok zimanê xwe, dîsan, çend caran, li ser lêvên xwe yên zuwa digerîne, lêvên xwe dilebitîne, lê bêtî ku ew bersivê bide, li Baz dinihêre, bi çavên ku bûne mîna du çirûskên êgir, bi rûyekî sakîn, bi nîvken, bi daxwaz.

Niha, ji dûr, çem dixuye û dengê ava çem tê. Çem di nav zerahiyeke bêpayan de ye, ronahî jê diherike. Heyv û stêr li ser ava çem dîlan girtine; çem bûye kaniya geş a ronahiyê. Ew ber bi çem derin. Bi qasî pêncî mîtro ji çem bi dûr, ew radiwestin. Baz, dîsan, carina bi hêrs, carina bi lavan, li ber wan çar kesan digere. Bi keser, bi jan, bi qîrîn, bi girî, bi nermî, bi ken, bi hemû awayên ku niha tên bîra Baz, ew dipeyive û dixwaze gotinekê, qet

nebe gotinekê, ji devê wan kesan derxe. Lê ew dike, nabe, nabe. Deng dernakeve. Heçî Kevok e, ew xwe nalivîne, bêdeng, bêlebat, radiweste û bala wê geh li ser şewqa çem, geh li ser ronahiya heyv û stêran, bêhna ax, giya, çem, dar û beran ku ji hawîrdor difûre, bi nefesên dirêj, dikişîne hundirê xwe. Bêhna tebiyatê, ji bo Kevoka pir westiyayî, ji hemû van gotinan, însanan, hatin û çûyinan, ken û henek, jan û keserên însanan çêtir e. Tebiyet; mader a yekem ku her tişt jê dizê. Tebiyet; mader a dawîn ku her tiştî di hembêza xwe de dike xew.

Lê hingî dengê teqînekê bêdengiya tebiyeta sakîn perçe dike. Dengê teqîna berikekê hawîrdora aram û zelal vedigire. Baz û Kevok li hev dinihêrin. Baz? Kevok?.. Ji nişkave, Kevok diheje, mîna ku bi elektrîkê bikeve, bedena wê, pihê, diheje û ditevize. Rûyê wê diêşe, şewatek bi rûyê wê dikeve. Û paşê jî ew, hêdîka, ditewire erdê, pêşî li ser kabokan, bi dû re, li ser rû, di nav pûş û giyan de. Bêhna giya, qirş û pûş... bêhneke tirşokî ya xweş, ya jîndar. Mîna bêhna hirmî û sêvên gundê zarokatiya wê. Serê wê, difn û bêvila wê di nav giyan de, bi qasî çendekê, ew nefes digire û dide. Mêşine esebî li ber serê wê dikin vizeviz. Şewata li ser rûyê wê, pêl bi pêl, hemû bedena wê vedigire. Lê ecêb e, tevî şewatê, ew her tiştî hîs dike û difikire. Serê wê ecêb zelal û aram e, mîna tebiyeta vê êvarê. Ew hinekî serê xwe radike. Hema çî bigire stêr li ber serê wê ne. Ev nêzîkî, ev bedewî, ev xewn!.. Kevok divê stêran hembêz bike, bi destan, wan mist bide. Ew hewl dide xwe ku rabe piya. Nabe. Lê hingî tê bîra wê ku destên wê jî, ji paş ve, kelemçekirî ne. Lê ew divê rabe pê. Eger ew nikaribe stêran, bi destan, bigire jî, qet nebe, ew dikare rabe pê û bi rû û lêvên xwe wan hîs bike û ramûse. Bi janeke bêpayan a bêdeng, bi hîsên têkel ên tirs, hêrs û keserê, hêdî hêdî, ew radike pê. Serî û bedena wê, çend caran, ber bi pêş û ber bi paş, dere û tê. Lê ew, dawiyê, li pê, qama wê rast, mîna siyeke dirêj a di nav mij û dûmanan de, radiweste. Ew li wan kesên dora xwe dinihêre. Baz jî li wir e. Mîna ku ew wan, cara pêşîn, bibîne, welê bi dîqet,

bi meraq, li wan dinihêre. Hingî dengê qîrîna Baz jî tê guhê wê; "Kevok!.." Kevok... belê, Kevok, ew e. Ew, Kevok e. "Kevok!.." Baz diqîre, di navbera du kesan de ku nahêlin ew xwe bilivîne û xwe bi Kevokê bigihîne. Kevok, bi nermahîyeke kûr, pir kûr û bi ken, li Baz dinihêre. Bi ken? Ji ber êşa rû, Kevok baş pê nizane, lê ew dixwaze, bi ken, li Baz binihêre.

Hingî dengê teqîneke nû tê. Kevok çirûska agir ku pêdikeve, dibîne. Bi çirûska êgir re, şewateke nû, îcar, dikeve gewriya wê. Tiştekî ron ê germ ji gewriya wê diherike. Bi qasî kêliyekê, ew welê, li pê, rawestiyayî, dimîne û paşê, ji nişka ve, serpiştê, dikeve erdê. Piştî ku ew dikeve erdê, dengê teqîneke nû li hawîrdor olan dide.

Û ew çar kesên demançe di destan de, ji milên Bazê ku bi qîreqîr digirî, digirin, wî di nav xwe de dikişînin û vedigerin. Ew ber bi mûrûbusa ku li kêleka rê, li benda wan e, derin û ji Kevoka ku di nav giyan de, li ser piştê razaye, bi dûr dikevin, wê li pey xwe dihêlin.

Kevok, li ser axê, di nav giya û pûşan de dirêjbûyî, li heyv û stêrên esmanan dinihêre, –bêyî ku êdî tiştekî bibîne, tiştekî hîs bike, tiştekî bijî.

2. Koç

Baz...

Kevok...

Kevok hate kuştin. Baz jî ber bi derine nediyar ve tê birin. Çima?

Baz? Kevok? Kî ne ew? Çima ew hatine girtin? Çima sê berikên mirinê dev û çengeyê Kevokê ji hev xistin, di qirika wê de kaniyeke boş a xwînê vedan, tasa serê wê pekandin û Kevok şandin diyarê rehmetê? Mêrkujê Baz bi kû de bibin, çi pê bikin?

Em ji Baz dest pê bikin. Ji serî, ji destpêkê. Mîna ku tê gotin, her jîyanekê, her serpêhatiya jîyanekê destpêkek heye. Eger em ji destpêkê dest pê bikin, divê em vê bibêjin; çîroka serpêhatiya Baz, şevêkê, di şeveke şil û tarî de, dest pê dike.

Li kû? Dîsan li welatê me yê fireh. Di nav Welatê Mezin de, li welatekî ji wan welatên biçûktir ku perçeyên Welatê Mezin in: Li welatekî bi tenê û jîbîrbûyî. Li Welatê Çiyan. Herwekî ku di çîrokên efsanewî de tê gotin; hebû tune bû, li pey heft çiyan welatek hebû... Çîroka serpêhatiya Baz jî li welatekî li pey heft çiyan, welatekî xwediyê çiyayên bilind, serî li esmanan, dest pê dike.

Û kengî? Çil û du sal berî wê êvara ku Kevokê, di bin ronahiya heyvê de, bédeng, bi tenê bi nêrîna çavên keltijî, ji Baz xatir xwest. Tam çil û du sal berî ku Kevok bi sê guleyên ku di enî, dev û qirika wê de teqiyar, kete erdê û serê xwe danî axa rehmetê.

Yanî çil û du sal berî şeva mirinê. Û çil û heft sal berî nivîsîna van rêzan. Serpêhatiya Baz, bi qasî çil û heft salan berî van rêzên ku niha hewl didin ku serpêhatiya jiyana Baz bînin zimên, dest pê dike.

Em dest pê bikin û niha ji wê êvara heyveronî ya çûyin û mirinê bi dûr kevin û herin şeveke tarî ya wan salên bihurî yên destpêkê. Hingî umrê Baz, em ê bibêjin, bi qasî du sal-du sal û nîv e û em li welatê çiyayên bilind, li gundekî qûntarên çiyayên in: Dinya şereş e. Şeveke şilî û tarî daketiye ser welatê çiyayên bilind. Baran hêdî hêdî dibare, baran porê daristanên welatê bêrê û bêbihur şeh dike, rehmetê dixê zikê axa hezar salan. Axa zuwa baranê dadiqultîne. Bêhneke teze ji axê difûre. Ax dinale.

Xwediyên vê axê yên hezar salan gundê xwe, axa xwe terk dikin. Ew, îşev, bi dilekî sotî koç dikin û diçin. Hêdîka, bêdeng. Bi keser. Êdî tu çara wan nemaye, divê ew ji gund derkevin û herin; ber bi zikê çiyayên xwe, newal û geliyên xwe. Ew divê xwe bispêrin wan deran, warên lawir û teyran. Wan heta îro sebir kirin, li ber xwe dan, lê ji îro pê ve êdî li ber wan tu rê nemaye. Dijminên wan, yanî ordiya Welatê Mezin ku ew jê re dibêjin "biyanî" ku bi zimanekî din dipeyivin, bi zimanekî din fermana wan rakirine, bi zimanekî din li wan hatine xezebê, dor li wan teng kirine. Ew êdî ne dikarin li ber xwe bidin, ne jî li gund bimînin. Ew bêgav mane, bêçare ketine. Bi tenê du rê li ber wan mane; riya mirinê û riya çiya û geliyên nas.

Yanî riya revê.

Ew derin. Pîr û zarokên wan li ser hesp û mehînan, xêşî, têr, xîrar û telîsên ard, genim, ce, garis û zad û zexîreyên din; kîsik û xurcîkên şekir, xwê, birinc, savar û dîzik, kûzik û meşkên rûn, hingiv û dimsê li ser piştê bergîr, hêstir û keran, bi strana dengê baran û bayê sivik, ew derin. Ew bûne çar qor; qorê pêşîn egîd û şervanên wan in ku hem rê vedikin, hem jî di xetereke nediyar de dê wan biparezin. Qorê dudiyar kal û pîr û jin û zarok in. Yanî ew in, yanî rabirdûya wan, pêşeroja wan. Qorê

sisıyan senetkar, şıvan, gavan û nobedarên wan in ku hin pez û dewarên ku ew dikarin bi xwe re bibin, dane ber xwe û li pey herdu qoran diçin. Qorê dawîn dîsan xort û çekdar in. Lê serekê wan ê eşîrê, dengbêj û sazbandê wan ên gund, kalemerê wan ê ruhanî, necar, hesinker, koşkar, remildar, du serpaleyên gund û çend aqilmend û zanayên wan jî tevî qorê dawîn in.

Kerwanê wan bi rê ketiye, ew diçin; şikestî, birîndar, bêkes, bêpişt û bêhêvî. Bi tenê ew dixwazin bijîn, ne zêdeyî vê, bi tenê bijîn. Li ser axa xwe, mîna berê. Lê niha ji bo jîyin û jiyanê rev divê, terkkirina axê divê. Ji welatê xwe, axa xwe, gundê xwe, gor û goristanên xwe rev divê. Ji kesî deng dernakeve, ji tiştên pêwîst pê ve kes tiştêkî zêde nabêje, tiştêkî zêde nake. Mîna ku dest û piyê wan qeydkirî, zimanê wan qufilkirî ye. Di dewsa wan de ba û baran dipeyivin, baran hêdîka dibare, ba xwe li ba dike, hesp, mehîn, ker, bergîr û hêstir deng derdixin, pez û dewar xwe dilivînin. Û hin zarok, zarokên ku haya wan ne ji xezeb û şewatê, ne jî ji koç û revê heye, digirîn. Zarokên ku nizanin war û welat, dewr û dewran, mirin û mayin çi ye, zarokatî dikin.

Seg û taî, belê seg, taî û cewrikên wan jî hene. Meriv divê seg û tajiyan, hevalên wan ên herî nêz, herî wefakar, herî kevn ji bîr neke.

Zivistan bi ba û baranê xebera hatina xwe dişîne; çile li rê ye. Berî çilê ew divê xwe bi stariyekê bigihînin. Stariyek ku bikaribe wan di sar û seqema çilê de bihewîne. Stariyek ku nêzîkî teyr û lawiran, lê dûrî biyaniyan be ku biyanî nikaribin xwe bigihîne. Du sal in, bi temamî du sal in ku ew li ber xwe didin, geh derin hawara cîran û xismên xwe, geh li ser rê, çûyin û hatinên biyaniyan kemînan datînin, dimirin û dikujin. Lê niha êdî bi tenê rev divê. Ji ber ku ordî yanî biyanî li rê ne û berî ku berf bikeve, ew ê xwe bigihînin gund.

Di destpêka payizekê de biyanî, ordiya Welatê Mezin, bi leşker, çek, top û cebirxanên xwe, hatin. Çima ew hatin? Wan ê çi bikira? Kesî bi van yekan nizanibû, lê ew hatin; bi zor û şidet,

bi ferman û qîrîn. Çima zor û şidet, çima bi van yekan? Kesî pê nizanibû, lê tiving teqiyân, ji lûleyên top û mîtralyozan agir bi dar û daristanan, dahl û gundan ket. Mirinê kemîna xwe veda. Bêdengiya ku bi sed salan hukimdara Welatê Çiyân bû, bi carekê, winda bû û dewsa xwe berda qîrînê: Qîrîna wan û biyaniyan ku ji zimanê hev fam nedikirin; qîrîna xort û çelengan ku bi berikên xedar ên mirinê diketin erdê; qîrîna jin û pîran ku ji ber keft û leftên şer hew wext didîtin ku reşa xwe girêbidin û li şîna xwe rûnin; qîrîna şervanan ku mîna pilingên wan çiyân di nav gelî, newal û çiyân de geh gêr dibûn, geh hildikişiyân, geh dilezandin da ku rê li hatina biyaniyan bigirin; qîrîna teyr û tilûran ku ji dar, daristan û dahlên ku dişewitîn, bi dûr diketin. Qîrînê û encamên qîrînê welatê çiyayên bilind vegirtibû.

Lê belê, tevî her tiştî, rûniştevanên axa qedîm bi hêvi bûn; ew li ser axa xwe, di cih û warê bav û kalan de bûn. Bavê wan, kalên wan, bapîrên wan li van deran hatibûn dinê, li van deran ji dinê xatir xwestibûn. Ji heft, ji heftê û heft bavan û vir ve, ew xwediye van diyaran bûn. Tava germ, heyva ronî, sterkên çirisî, barana nerm, berfa spî, çiyayên serî di esmanan de, axa rehmetdar, kanî û lehiyên biharan, teyrên eylo, hemû alem şahidên vê yekê bûn. Vî esmanî, van çiyân, van çem û geliyan şahidiya jiyanê wan kiribû. Dengê wan ê toq hê jî di newal û geliyan de olan dida. Bayê sibê yê bakur hê jî dengê stran û destanên wan bi her aliyê welatê çiyayên bilind digihand. Di bin kîjan kevirî de çi lawir heye, di kîjan hêlîn, gom, kun û qulê de çi hêk heye, li ser kîjan tahtê çiyân çi teyr heye, li ber kîjan çemî çi şitil hêşin tê, di kîjan avê de çi masî heye... wan bi van hemûyan dizanibûn. Heta wan bi înikên masiyên co û kaniyan jî dizanibûn. Belê, welat welatê wan bû. Biyanî dê biwestiyana û biçûna. Wan weha bawer dikir.

Wan weha hêvî dikir.

Payiza ku biyanî hatibûn, qulipî ser zivistanê, zivistan qulipî ser biharê, bihar ser havînê û havîn jî ser payizeke nû. Lê biyanî neçûn. Ji berevajiyê, ew hîn zêdetir, hîn kûrtir, hîn nêzîktir ha-

tin. Êdî dengê wan ê xerîb, zimanê wan ê biyanî bi ber guhê wan diket. Bayê seqem dengê stranên biyaniyan bi wan digi-hand. Di nav du salan de biyaniyên ku bi hewalê şer û pevçûnan dizanibûn, bi dewlet û ordî, bi çek û pûsad bûn, ew şikandin û nefes li jiyana wan a kevnare ya çiyayê çikandin. Xwediyên axa Welatê Çiyayê xurt bûn, li ber xwe didan, dibezandin, dilezandî, lê nezan û bêgav bûn, bêtevdîr û bêîmkan bûn. Ew mal bi mal, binemal bi binemal, bav bi bav, eşîr bi eşîr, dever bi dever dijiyan. Mîna berê, mîna berî hezar salan. Ne yekîtiyeke wan, ne zanîna wan a şer û pevçûnê li dijî ordiyan, ne çek û cebirxanên wan hebû, ne jî haya wan ji dinê. Kemînên wan, kozik, çeper û sîperên wan, hêvî û mirazên wan, yek bi yek, hatin hilweşandin, yek bi yek têk çûn. Biyanî ne mîna eşîrên cîranên wan bûn, şerê biyaniyan jî ne mîna şerê wan ê navxweyî bû. Xeleka li dora wan, roj bi roj, tengtir bû.

Û niha, di vê şeva baranê de, biyanî bi qasî gaveke rê ji wan dûr in. Yanî biyanî evçend nêzîkê wan in! Berxwedana du salan şikest xwar û dewsa bêhna barûdê, bêhna xwînê hawîrdor vegirt. Dar, daristan, dahl, gelî û newal bûn gor û goristan. Li her derî nas û xism, meriv û dost, heval û hogir ketin. Rengê xwînê tevî rengê spî yê ava çeman bû. Dar û daristan, war û gund şewitîn. Sêdar bilind bûn, kesên ku hatin girtin, bi fermanên ku wan jê fam nedikirin, xeniqîn.

Biyanî hatibûn û jiyana wan a ku bi hezaran salan hertim mîna xwe mabû, bi darê zorê, têk didan û wan ji war û axa wan bi dûr dixistin.

Şev, şeveke weha ya koç û revê ye: Gundî, xwediyên vê axê, jî gund bi dûr dikevin. Qorê yekemîn jî gund gelekî bi dûr ketiye, bi qasî bêhnekê maye ku ew xwe bigihîne piştê çiyayê ku ber bi esmanên tarî bilind dibe. Qorên duduyan û sisiyan di navbera qorê yekemîn û gund de bi aramî, bêdeng, diçin. Qorê çaran jî gund derdikeve. Mîna ku hemû qorên din kirine, kesên qorê çaran jî niha, berî ku bi dûr kevin, vedigerin û li gund dinihêrin. Di

bin tariya şevê de, mîna sî, mîna xeyal, mal û xaniyên wan, hewş û hevşoyên wan, bîra wan a meydên, darên wan ên spîndar, gûz û hêjîran, bîr û bîranînên wan, deng û pêjnên wan ên rojên çûyî, umrê wan, ruhê wan li wir, li pey wan, li gund dimîne. Wan çavê xwe li malên bi kevirên reş avakirî yên gund vekirin. Bêhna mîz û rêxa pez û dewaran li axurên gund bi difnên wan ket. Wan ji erdên gund zeviyên xwe yên serîzerbûyî rakirin, hesp û mehîn li ser vê axê xar dan, li piştta van çiyar derketin seyda ask, xezal û lawiran, çûn nêçîra teyr û çivîkan, li piştta gund, li qûntarên çiyar xefik û kemûnên gur û roviyan, baz û eloyan danîn, bi masiyên çemên gund zarokên xwe têr kirin. Di şevên vî gundî de, piştî ku zarok ketin xewan û kundan dest bi xwendinê kirin, dilê xwe dan ber pêlên kêf û henekan, kel û coşa bedenên aşt kirin, di rojên germ ên havînên gund de ew rabûn dîlanan, dawet li dar xistin, dengê stranên dengbêjên wan gihîşte stêran. Lê ew niha diçin, van tiştên xwe; deng, pêjn, bîranîn û hebûnên xwe hemûyan terk dikin û derin.

Ji malên wan hê bêhna dû û dûmana argûn û tifikên wan digihe wan. Hê jî pisîk, seg, mirîşk û dîkên wan di navbera xaniyên wan ên neçar de, bi tiralî, digerin. Hinên wan, bi hêdîka, digirîn, hin jî, şermok û bêdeng, keserên kûr dikişînin û careke dawîn li gund dinihêrin.

Veger? Vegera vê çûyîna şeva tarî heye? Ew ê kengê vegerin mal û warê xwe, reh û umrê xwe?

Gava biyanî çûn. Belê, hingî ew ê vegerin ser ax û zeviyên xwe. Ew ê dîsan gund şên bikin, agirê tifikan dîsan geşt bikin. Şev ê dîsan bi nalînên wan bedenên wan ên bêdeng û tirsoke binale. Beroş ê li ser agir bikelin, dûman ê bi serê çiyar, bi esmanan bigihe.

Biyanî dê herin. Ew ê li van derên kevir û kepir ku ji dinê û çerxa dine dût e, çi bikin? Ew ê herin, îro nebû, sibê. Sibê nebû, du sibê. Sê sibê. Rojekê zûtir yan derengtir ew ê herin bajarên xwe yên mezin, malên xwe yên germ ên apartmanan. Ew ê he-

rin nik hezkirên xwe yên nazenîn. Ma yar û evîndarên biyanîyan nîn in? Ma wan yar, evîn, hez û hezkirin navê? Ew ê herin. Rêwing weha bawer dikin.

Ew weha hêvî dikin.

Koça gund dere. Ew di ber erd û zeviyên xwe re derbas dibin. Bêhna axa şil ji erdê radibe. Hê heta vê payizê jî ew li ser erdên xwe bûn. Wan zevî rakirin, bender danîn, zêrzmûnên malên xwe bi zexîreyên xwe yên zivistanê tijî kirin. Lê ew niha terka erd û zevî, zad, zexîre û xwarinên xwe yên zivistanê jî dikin.

Baran dibare; hem hawîrdor şil dike, hem dinya dişo û paqij dike. Eger meriv dengê gelekî dûr ê hin lawir û kûzekûza wawîkan nehesibîne, bi tenê dengê baranê hevaltiya dengê lingên wan û heywanên wan dike. Tarî ye, tariya şevê ye. Esmanên wan ên ku hertim bi comerdî ronahî direşandin, îşev di nav taritiyê de ne. Ji bo koç û revê, ew li benda şeveke weha bûn. Şeva revê diviya tarî bûya; kes bi wan nehesiya, kesî ew nedîtina. Lê eger kesî ew bidîtina jî, wan bikaribûya xwe li ber çavê wan winda bikira. Çiya, çiyayên wan bûn, bi qasî hirç, gur û roviyên wan çiyên wan jî çiya dinasîn û bi hewalê wan dizanibûn. Lê baran, rehma baranê ne di hesêb de bû. Şeva tarî bi baranê hat. Çare nîn bû, wext li wan teng bû. Ew ê bi rê biketina.

Baran; paqijî, şûştina her celeb gemariyê. Rehmet, bereket. Nermahiya tebiyetê. Baran; di dilopan de ronahî, keskesorên ronî, tovê jiyanê. Madera jiyanan. Baran ê co û cobarên wan ên zuwabûyî tijî av bike, piştî zinar û çiyayên wan mist bide, rehma rehma zikê ax, newal û geliyên wan. Baran ê hevaltiya wan bike, wan ji kesp û kospan, dahî û kemînan biparêze. Baran bêhneke teze ya taybetî dide ax û der û dorê. Bêhna ax, dar û ber, pûş, giya, zibil, pişkul û heywanan ji hawîrdor difûre.

Di bin baranê de ew gund li pey xwe dihêlin, hevşo û mexel, çêre, erd û zevî tê de ku tov diçandin û jê simbil radikirin li pey xwe dihêlin, cihên bender û seyrangêhê li pey xwe dihêlin, bexçe û rezên ku jê tirî dixwarin li pey xwe dihêlin û diçin. Riya wan

dirêj e. Pêşî ew ê ji du bihurên dirêj û fetloke yên navbera çîyan derbas bibin. Paşê ew ê hilkişin çîyayekî bilind û bi dû re jî ew ê xwe berdin jêr, nav newaleke bêbinî. Ew ê dakevin û dakevin da ku ew xwe bi cihê ku wan daye ber xwe bigihînin.

Baran dibare, ba dilive, şev diherike û ew ji war û welatê xwe vediqetin û diçin. Rê ne xuya ne, teng in, nîn in, tijî kevir in, kelim, dirî, sitrî ne, xîç in, qîş in. Rê dişwar e, rê dirêj e; xuloxwar e, bi çîv e. Zinar li pey zinar, gir li pey gir, pal li pey pal, pozik li pey pozik, kuç li pey kuç, kaş li pey kaş, çal li pey çal, dar û devî li pey dar û devî, av û co li pey av û co tên. Hin rovî, wawîk û gur kûze kûze dikin, hin teyr, hertim, li der û dor, vîçe vîçe dikin. Kund dixwînin. Bûm û kund dibin hevalên koçerên şeva tarî.

Bi xêra Xwedayê alemîn ku bergîr û qantirên wan hene. Rênas û gernasên herî jîr ên wan bergîr û hêstir in. Bergîr û hêstir rê vedikin, rê li ber wan rast dikin û wan ji pekîna gelî û newalan xelas dikin. Hin ji wan, kal û pîr diwestin, bêhn li wan diçike, jin û pîrejîn, bêdeng, digirîn û strana koç û veqetîne ya bi keser, bêdeng, dinehwirînin. Şervan, egît û xort, tevî seg û tajiyan, di navbera qoran de diçin û tên, geh ber bi pêş, geh ber bi paş. Xort û mêr alîkariya siwaran dikin geh wan peya dikin, geh siwar dikin. Di nav bêhnên têkel ên şevê de kerwan, giran giran, dimeşe.

Mij û dûmaneke tenik jî, perde bi perde, dadikeve. Çavên westiyayî û bêxew pêşîya xwe nabînin. Kerwan dirêj e; pez hene, dewar hene. Kal û pîr hene, zarok hene, jin hene. Û ew divê, berî ku tîrêjên tavê yên rojê nû hîlbên, xwe bigihînin stariya xwe. Çend kavir û mî ji kepirekî geliyan gêr dibin. Canûyeke yekta ya kumêt û hespekî seglavî hew dikarin herin, sim û gûzekên wan di nav xwîne de ne. Çend zarok dikuxin û dilerizin, li wan re sar e. Kulav û cil û bergên rîs têrî ba û baranê nake. Çi divê? Li kêleka serpala zinarekî bilind, li ser tahtekî nîvzuwa, ew disekinin. Êdî ji vir û pê ve riya wan berejêr e. Lê şiverê dirêj, pir teng û aliyekî wê newaleke kûr e. Gaveke şaş mirin e. Siwar peya dibin, dê şîr didin zarokên xwe yên berşîr. Kal û xort ji titûneke sor

ya teze ku bêhneke xweş jê difûre, cixare dipêçin. Hin şervan li ser kulavên xwe ên stûr pal didin û bêhna xwe vedidin. Şivan û gavan destmalên xwe yên nan, penêr, toraq û sewzê vedikin. Û serekeşîr, aqilmend, rênas û dewrannasên wan li hev rûdin û bi hev dişêwirin; çi divê? Veger nabe, qet nabe. Lezandin nabe, rê dest nade. Terkkirina hin tişt, pez û dewaran jî nabe. Zivistanekê dirêj li ber wan e, pêşerojê nediya, nenas li ber wan e. Biyanî li pey wan in. Hingî? Hingî ew divê bibin du beş. Beşekî divê zûtirîn wext xwe bi cih bigihîne. Beşek jî bide dû wan.

Qor, ji nû ve, tîr pê. Kal û pîr, zar û zêç, nexweş û nesax, li ser hesp û mehînan, tevî çend şervan û egîdan, bi rê dikevin. Ew tiştên pir pêwîst, pir pêdivî jî bi xwe re dibin. Qorê dudiyan jî dide pey wan. Ew diçin, ber bi geliyên kûr berjêr dibin.

Şev diherike, wext diherike û bi dû rêwîtiyêke direj a hemû şevê, bi dû gir, zinar û çiyayên bilind, newalên kûr û geliyên teng re, qorê pêşîn, di berbangê de, çaxa dinya û tebiyet hişyar dibe, xwe bi cih digihîne. Piştî demekê, çaxa tîrêjên tavê xwe bi pişt û palên çiya û daran digihînin, qorê dudiyan jî tê. Baran sekiniye. Dinya ronî ye, tîrêj şewq didin. Ji ber bextê çê, ba hew xwe li ba dike. Ew westiyayî ne, niha tî ne, birçî ne. Hinarikên wan sor, lêvên wan terikîne. Gewriya wan zuwa, devê wan tahl e. Dest û piyên wan hew dikarin bi tişteki bigirin. Cil û berg, postal û pêlavên wan ên çermîn qetiyane, teqiyane, qul bûne. Cil û bergên rengîn ên jinan û kum û kolos, şal û şapikên mêran ên tarî şil in, ji delingên şapikan dilopên şeva çûyî ber bi jêr dibin.

Lê rawest navê, ew divê zûtirîn wext bi cih bin. Ew nikarin tevdirê ji dest berdin. Piştî bêhnvedaneke kin, ew barên xwe vedikin, zarokên xwe hembêz dikin, pez mexel dikin, çend ji wan dewar û hespan dibin ser avê û çêrê û paşê jî, ew, bi bejn û bala xwe ya dirêj, bi rû û rûçikê xwe yê qemerî, li der û dora xwe dinihêrin. Ew di bin newaleke gelekî kûr û gelekî dirêj de ne. Herdu aliyên wan bi zinar û çiyayên pir bilind rapêçayî ne. Pişt û berpalên çiyên dar û dahl in. Gelek ji dar û daristanan rût

in, pelên daran weşiyane, daran kirasê xwe yê bihar û havînê ji xwe kirine. Lê li hin deverên sermilkên çiyayên bilind û kêlekên newal hêşînahiyeke tarî renekî taybetî dide hawîrdor: Darên çam ê ku hertim xwe li ber xusûsiyetên demsalan radigirin, hawîrdor dineqîşîn: Zînde, serbilind, bi baleke şox û şepal û bi renekî helekesk.

Esman dûrî rêwingan e. Ew divê serê xwe rakin da ku bikaribin, di navbera çiyar re, esmana zelal a vî danê sibê bibînin. Esman çikî sayî ye, bi tenê du ewrên biçûk, bi renekî gewr, lê ne.

Di ber wan re, di navenda newalê de, çemek diherike. Newalê bihurek di zikê rêza çiyar de vekiriye. Çem jî, raser, di zikê newalê de. Çem hemû newal seranser dibire. Çem diherike, ne mîna lehiyekê, lê bi alîkariya barana şeva bihurî, boş diherike. Digel vê yekê, av zelal e, ewçend zelal e ku rêwing dikarin tê re masiyên biçûk ên tê de û xîç û kevîrên biçûk ên binê avê bibînin. Herdu qeraxên çem kevîrên mezin, pal û bilindahîne. Ji çem hin qelîşek derdikevin û tîşikên biçûk li vir û wir tînin pê.

Li milê ku wan barên xwe danîne, li ber lingê zinaran şikeft û ziving hene. Zinar tijî şikeft in. Ew ê li vir, di nav van şikeftan de bi cih bin. Heta ku biyanî herin û ew vegerin gundê xwe, êdî, mal, war û welatê wan ê, ji îro pê ve, ev der be.

Ji devê newalê yê rojhilat, ro, mîna teyfikeke sor, hiltê. Tîrêjên wê li ser piştê zinaran, li ser ava zelal a çem û darên çamê leylan didin. Ronahiyek û şewqeke nedîtî ku bi tenê di çîrok û efsanan de heye, îro, xêrhatî li wan dike. Hawîrdor şil, ronî, zelal û aram e.

Ew gihîştine cihê xwe, gihîştine bihuştê veşartî ya zikê welatê çiyayên bilind. Kî dê, ji wan pê ve, bikaribe xwe bi van deran bigihîne? Kî dê bikaribe wan li vir, di nav van kevîr, gir, zinar, çiya, dar û şikeftan de bibîne? Lê ew dikarin xwe bigihînin her derî. Ew bi rê û xaçerê, newal û gelî, hal û hewalê welatê xwe dizanin. Her kengî ku ew bixwazin, ew dikarin, mîna lawîrên dirinde yê vî welatî, di nav zinar û çiyar de bipengizin û herin û werin.

Serekeşîr û aqilmendê wan, bi rûkenî û serfirazî, li hev dinihêrin. Wan bîr bi vî cihî biribûn. Ew bi ser ketine, bê qeza û bela, bêyî ku tiliya yekî birîn bibe, wan gund anîne vê bihuşta veşartî. Ew divê bi cih bin, zûtirîn wext, mîna ku ew li gund, li jûrên xwe yên teng û tarî, rûniştine, divê ew li nav şikeftan rûnin û dest bi jiyana xwe ya rojane bikin. Mîna berê, mîna ku ew ji hezaran salan û vir vê dikan. Xort û mêr barên xwe hildigirin û dibin ber devê şikefta herî mezin. Serekeşîr, aqilmend, çend kalemêr, dengbêj, necar û hin kesên din jî dikevin nava şikeftan û digerin. Şikeft, ziving, kov, qul û qelîşek zehf in. Ew li kû û çawan bi cih bin? Di rêza şikeftan de, li destpêkê, şikefteke zehf fireh, dirêj û kûr heye. Şikefta herî nêzik a avê jî ew e. Devê şikeftê fireh û ronî ye. Şikeft ne bi tenê têra ehlê gundekî, têra ehlê deh gundan jî dike. Piştî ku ew der û dor dibînin û bi hev dişewirin, ew biryara xwe didin; ev şikefta stûr ê bibe warê wan ê mayînê. Dewsa ku ew şênîyên xwe di nav şikeft, kepir û zinaran de belav û peregende bikin, welê çêtir e ku ew li ser hev, li nik hev bin. Zivistan û çile li rê ye. Lawirên kovî yên dirinde, hirç, piling, gur, keftar, beraz hene. Saw û talûka biyaniyan heye. Belê, weha hîn baş e, ew ê şikefta mezin, li gora xwe, sererast bikin û tê de bi cih bin. Şikeftên kêlekê jî ji bo pez û dewaran sererast bikin. Û ew ê li vir bijîn.

Biryara wan weha ye. Ev biryara wan a hanê dibe şaşiya wan a yekemîn.

Şikeft kûr, tarî û dirêj e; sar e, bi saw e. Çend gavan ji deriyê şikeftê bi dûr, cihekî ar û argûnê heye, tê de xwelî û çend êzingên reş ên nîvşewitî hene. Bêguman, masîvan, seydivan û nêçîrvan hatine û li şikeftê mane. Ji şikeftê bêhneke genî, bêhna axê, bêhna ka û pûşê, kufik, xwîdan û mîzê tê. Ne xem e. Ew ê bêhnê biqulipînin ser hilm û bêhna însanan a germ.

Ew dest pê dikan; erdê şikeftê rast dikan, çiqilên daran, dep, pûş, rêşî û giya û di ser wan re jî kulavên xwe radixînin; ji bo mal û malbatan, bi alîkariya qorên kevirên reş, kutek û spar-

tekan navber lêdikin; li ber devê şikeftê argûnek, bixêriyek û midbexekê lêdikin; hin aliyên dîwarên şikeftê sêwax dikin; li ber devê şikeftê şipaneyeke dirêj çêdikin û ew çûl, mehfûr û doşegên xwe radixin.

Û ew agirekî gur vêdixin. Agirekî ku dê qet venemire, geh bi êzingan gur be û ronahî bireşîne ser şikeftê, geh di bin xweliya ber destê sibê de, nobedarî li xewa kûr bike û li hêviya geşbûnê be. Û ew, koçer û derketiyên welatê xwe, di şikefteke kûr a binê geliyên welêt de, li kêleka agirê gur, hîn bêtir nêzîkî hev dibin, hîn bêhtir dengê axîn û nalînên wan, xewn û xeyalên wan digihe hev, hîn bêhtir jiyana wan a neçar dibe yek ku hew kesekî dikare wan ji hev veqetîne.

Û hîn bêhtir qedera wan dibe yek.

Ava wan heye, nanê wan heye, pez û dewarên wan hene, li doralîyê wan masî, ask û xezal, kew û teyr, dar û berên wan hene. Ew ê li vir bijîn, li ber perê vî çemê ku di zikê newalan de fetlokan dide xwe û dirêj dibe û bi rengên zelal ên vekirî hertim leylan dide. Ev der, ev çiyayên ku her û her di zikê hev de, li pişta hev, ber bi esmên bilind dibin, ev newal û geliyên bêbinî ku bi dengê çûkeke biçûk jî olan didin, ev darên dirêj ên spîndar û bî ku, bi rengê xweliyê, mîna tayên spî yên porekî geş, regekî kevnare li rengan zêde dikin, ev teyr û tilûrên ku hertim vîçe vîçe dikin, ev tebiyeta hov, bixof û rengîn, belê ev der ê bibe welatê wan.

Roj û şevên wan, rabûn û rûniştina wan weha dest pê dike. Carina kulmeke tîrêjên tava berbangan, li ber devê şikeftê, li ser rûyê wan şewq dide, carina bayê sibê yê sar wan ditevizîne, carina dilopên barana himbiz a piştî nîvro ji por û simbêlên boq ên mêrên wan ber bi jêr dibin, carina hingûra sor a êvaran wan dike kelegirî, carina stêr di nivê şevan de dibin heval û guhdarên stranên wan, carina jî taveke negerm rengê rû yê wan ê qemer diqulipîne ser regekî tarî yê qehweyî.

Roj diherikin, şev diherikin, hefte diçin, meh diçin. Pêşî baran tê, bêwest, bêrawest. Bi rojan, bi hefteyan. Bi dû baranê re, çile dadikeve. Sar e, pûk e. Paşê jî berf tê. Pêşî hêdî, hindik, mîna kepekê. Paşê jî her kuliyeke wê mîna gûzekê. Mezin, qehûm, giran ku kete axê hew jê radibe. Rengê spî hawîrdor vedigire. Berf kulavekî gewr û spî radixe ser bedena hawîrdor û tebiyetê dike mîna bûkeke bedew a çikî spî. Berf; di zikê welatê çiyayên bilind de cîhana kevnare ya dastanan, çirîskên ronî yên li ser av û lehîyan, stêrkên çirîsî yên dar û dehlan, taca dewranên tenê, bêgav û tirsok, stariya ruhê dudilî û neçar û kirasê spî yê xewên wan, xewnên wan.

Û ew di şikeft û zivingên xwe de ne, li nik hev, navbir bi navbir, çavik bi çavik. Çavên wan tîr girtin, ew dikevin xewan. Çavên wan vedibin, ew ji xewnan hişyar dibin. Ew di tariya şikeftê de dihejin, di tariya şevê de vediciniqin. Ew kêr dixwin, kêr vedixwin, kêr xwe dişon, kêr dipeyivin, kêr derdikevin derve, ji zarok, kal û pîran pê ve, kêr li hev dinihêrin. Ew li cîhanê di nav cîhaneke nenas û jîbîrbûyî de dijîn. Haya kê ji wan heye? Çi bi serê ehl, gund û eşîrên doralî hatiye? Çi bi gundê wan bûye? Kî niha wan bi bîr tîne, navê wan hildide? Kesekî ku wan meraq bike, li ser wan û qedera wan bifikire û li wan bipirse heye? Biyanî niha li kû ne, çi dikin? Biyanî ji wan çi dixwazin?

Biyanî... berê jî wan dibihûst ku welatê wan perçeyekî welatekî firehtir bû, welatê wan di bin destê biyaniyan de bû, biyaniyan li welatê wan hukim dikir. Lê ew dûrî biyaniyan, biyanî jî dûrî wan bûn, -ji stêrkên esmanên wan jî dûrtir. Wan ne biyaniyek dîtibûn, ne jî cendirmeyek û leşkerek. Di nav çiyayên xwe de, li gundê xwe, ew di halê xwe de dijiyan. Lê berî niha bi du salan biyaniyan bi ser wan de girtibûn û hatibûn. Ji nişka ve, û bi dû re jî hêdî hêdî, giran giran.

Û niha ew di şikeftê de dipên; bi dengê dengbêj ronahiya stêrkan diqulipînin ser ronahiya tava sibê, bi dengê çîrokbêj şevên dirêj ên çile li pey hev rêz dikin û dipên.

Sohbet û axaftinên wan kêr in, peyv û gotinên wan kêr in. Lê dengbêjê wan distrê, çîrokbêjê wan vedibêje. Ne ew, lê dengbêj û çîrokbêjên wan in ku hosteyê gotinê ne; ku xwediye bi sedan û bi hezaran stran û çîrokên wan ên li ser neçarî, bêgavî, tenêti, keserkûrî û evîndariyê ne; ku bi awaz û ahenga gotinên pir kevn ên dîrokê, şevên wan ên tarî û qedera wan a reş dineqîşînin; ku kilamên balkêş û zîz ruhê wan ê xembar bi rengên kevnare dixemilînin. Bi roj seyde û nêçîr, feq, daf û kemîn e, bi şev stran û destan e. Bi roj ronahiya berf, roj û tavê ye, bi şev ronahiya gotinan e. Bi roj sar û seqemên ba û bahoze ye, bi şev germahiya serpêhatî û vegotinên bav û kalên wan, qedera wan a kevnare ye. Stran, serpêhatî û vegotinên ku li kêleka agirê gur ê êzingan dilê wan li kel dixê, bêdawîn in. Herwekî çemê li ber devê şikefta wan a tarî. Herwekî jiyana wan a şikeftê, wextê wan ê binê gelî û newalan.

Di wext û zemanên wan ên bêdawîn de ew dipên; çavê wan li devê şikeftê, li çem, li qûntarên çîyan, li berpalên çîyan, li dar û daristanan, li lûtkeyên çîyan, li esmanan, ew her û her dipên. Li şikefta ku wan bi hilm û bêhnê bedenên xwe germ kirine, ew li hêviyê ne ku vegerin koxikên xwe yên gund, vegerin ser erd û zeviyan xwe, bax û bexçeyên xwe.

Di berbanga rojekê de, çaxa ciwanmerdekî wan, hinekî ji şikeftê bi dûr, li ber devê çem, avdesta xwe dike, ew di çal û kortan de giyanermikên serîrakerî dibîne. Giyanermik hêşîn hatine; bihar li rê ye, germahî, geşî û hişyarî li rê ye. Tîrêjên tavê kulavê spî yê berfê difirkîne, berf hêdî hêdî dihele û radibe. Baran tê, xunava demsalên germ tê. Av û lehî radibin, qeşa û seqemê, qirş û qalşan didin ber xwe û dibin. Jîn bi reh û rêçên dar û dahlan dikeve, dar kirasekî nû yê hêşinahiyê li xwe dîkin. Pel hêşîn tînin, kulîlk dibîşkovin. Û rojekê jî, çaxa keçên wan ên xama, kûz û cêr di destên wan de, dadikevin ber çem, refekî teyrên boz û belek ji ber perên avê difirin. Teyrên koçber hatine.

Çem rabûye, diherike. Bêdengiya mehan, xem û kesera mehan li pey maye, çem, tê de masiyên leyistok ên piştbelek, bi coş

û heyecan, bi xufe xuf, bi renegekî çikî spî, zikê newalan diqelişî-
ne û ber bi jêr, ber bi ronahiyê dere. Çemê ku bi mehan bêtevger,
bêlebat bû, niha, bûye kaniya jînê, di bin tîrêjên helesor ên tavê
de bûye kaniya rengên têkel ên jînê.

Jîn li rêwîngan vegeyriyaye. Ew jî divê êdî li jînê vegeyin.
Desteyek ji xortên wan tê pê. Xort cil û berg û pêlavên xwe yên
çermîn dişidînin, çek û pûsadên xwe hildidin û ber bi kaş û lût-
keyên çîyan hildikişin. Ew ê herin gund, li halê gund binihêrin,
hewalê dinyayê fam bikin. Heye ku biyanî ne li wir in, çûne.
Heye ku wextê vegeyriyê hatiye. Piştî çend rojan, bêyî kêmanî, hin
fîraq û tiştên pêdivê li ser piştê bergîran, destê vedigere. Wan tu
kes nedîtine, tu tevger nebihîstine. Gundên doralî jî hemû vala
ne, pêrgî kesî nebûne. Lê belê welê dixuye ku hin kes hatine
gund. Deriyên malan vebûne, sandokên wan şikestine, di argû-
nan de ar hatiye vedandin, xwarin çêbûye, zad û zexîrên dîz û
kûpan kêmbûne, kadîn vala bûne. Bêguman, kesên ku hatine
gund, biyanî ne. Lê wan tu biyanî nedîtine. Û bêyî ku kes wan
bibîne, ew bi dizîka çûne û bi dizîka hatine.

Rast e, kesî ew nedîtine. Lê xortekî ji destê tişteki kiriye; berî
ku destê ji gund derkeve, ew egîd li kêleka dîwarekî xaniyekî
kevîrên reş rûdine û avdesta xwe dike. Paşê jî ew bi kevîrekî xwe
paqij dike, radibe ser piyan, şapikên xwe hildikişîne, doxîna xwe
girêdide, li gulokên germ ên avdesta xwe ku jê dûman radibe,
dinihêre û bêyî ku ew bi kevîr, ya pel û pûş serê avdestê bigire,
ew simbelên xwe ba dide û bi rê dikeve û xwe digihîne hevalên
xwe. Deste, egîdên destê, bi her kitekitê, behsa çûyin û hatina
xwe dikin, lê xort qala vê yeka xwe nake, heye ku ew hewce
nabîne, heye ku şerm dike.

Avdesta vî xort hanê yê simbelbadayî dibe şaşiya wan a du-
diyan.

Çi divê? Ew dîsan li hev rûdinin, bi hev dişewirin, li hev
guhdarî dikin. Remildarê wan remil davêje, "ez teyr û tûr
û heheçikên ku îsal zû hatine, dibînim" remildar dibêje,

"kewroşkên avis dibînim, teyrên eylo li ser çiyayên bilind dibînim... Dinya di dîlanê de ye, ji ber giya, gul û kulîlkên rengîn, ji ber bêhnên xweş, دنیا har bûye. Evçend xweşî, evçend bedewî, evçend spehîti... na, na, bextê me tu carî evçend çê, evçend rind nebûye... na, em dive bi tevdîr bin." Û ew biryareke nû distînin; ew ê li cihê xwe bimînin û bipên.

Heta niha, bêyî gilî û gazine, bêdeng, wan pa, xwe li ber ba û baranê, berf û pûkê girtin. Bêhna wan, sebra wan, sebata wan mîna çiyayên wan bû; metn û fireh. Ji roja ku ew hatin vê şikeftê û vir ve, du kalemêr û sê pîrejinên wan wefat kirin. Du xortên wan di bin berfendeyeke bêpayan de man û winda bûn. Egîdekî wan ji kaşekî ket û piştî xwe şikand. Sê zarokên wan, du keç û kurek, hatin dinê. Wan tu carê dengê xwe bilind nekir, serê xwe dan ber hev, li qedera xwe fikirîn, li dengê dengbêj guhdarî kirin û pan. Niha jî ew ê bipên.

Û rojek ji wan rojên payinê tiştêkî diqewime. Jiyana rojê nû, bi tîrêjen tava sibê, dest pê dike. Tîrêj dîsan li ser ava çem dibiriqin. Xweşiyê nedîtî, bi rengan, bi bêhnên, hawîrdor har dike. Keç û jin, di nav cil û bergên rengîn de, kiras, derpê, cil û bergên paqij, di bin çengê wan de, ber bi çem derin. Ew mîna askekê, bi nazenîn, li ser kevîran dipengizin, mîna topeberfekê, nermik, di ser çal û kortan re digindirin. Ew ê serê xwe bişon. Hinekî ji şikeftê bi dûr di daldeyê qûntarên çiyê de, li ber çem, ew kincên xwe ji xwe dîkin, tevî kiras, xwe bi sabûnê, bi ava sar a destê sibê ku mîna cemedê ye, dişon.

Lê hingê dengî tên. Dengî ecêb, mîna dengê ba û bahozê. Dengî ku hufe huf, xire xir dîkin, dengî xerîb ku li dengên hawîrdor nayên. Ji aliyê bakur, di ser çiyayê re, du tiştên reş ku bi teyrê eylo dişibin, dixuyin. Lê ev du tişt jî teyr gelekî mezintir, gîstir in. Di navbera çiyayê re, ew ber bi jêr difirin. Ew stûrtir dibin. Ev çi ne, çi tişt in, çi teba ne? Jin û keç li van tiştên ecêb ku ber bi wan dibe, dinîhêrin. Mêr û xortên wan jî ji şikeftê, ji şikêr û kendalan derdikevin û li van tiştan dinîhêrin. Kesekî ji wan ev

tişt nedîtine, nebihîstine. Ew dest li van tiştên firoke dikin, keç û jin cil û bergên destê xwe hêldikin. Tişt di bilindahiyên çiya û geliyan de, di ser wan re difirin û derin. Lê careke din, îcar ji milê başûr, ew vedigerin û di ser wan re difirin. Hingî aqilmendê wan bîr bi tiştên firoke dibe, "balafir..." ew dibêje, "ev balafir in, bi bayê difirin û yên biyaniyan e... bila ew we nebînin, zû xwe veşêrin, xwe bidin alî..."

Lê êdî dereng e. Balafir, mîna teyrê eylo, du caran di ser wan re dizîvirin, difirin û winda dibin.

Ev desthêldana wan dibe şaşiya wan a sisiyan.

Di ser firîna balafiran re rojek dibuhure, lê tişteke naqewime. Du roj dibuhurin, sê roj, hefteyek, du hefte, lê tişteke nabe, kes naxuyê. Bi dû hefta sisiyan re, egîdên ku li ser gupikên zinarên devê gelî nobedarî dikin, vedigerin, şivan pez derdixin çêrê, seydvan derin seydê, dengbêj li ber perê çem li tembûra xwe dixê û keç û jin, dîsan, derin ber devê çem û xwe dişon. Jiyana, dîsa mîna berê, di bin esmanê zelal û heyv û stêrkên ronî de dewam dike. Hilale û sosin dibişkovin, gul vedibin, dar xwe dineqîşînin.

Bi qasî bîst rojên din, jiyana wan, weha bi aramî, dewam dike. Lê piştî bîst rojan, em tîna roja dawîn a jiyana wan. Roja dawîn a jiyana wan, em dikarin bibêjin, weha ye; dinya êdî baş germ bûye, êdî mêşên hingiv li dora şikeftê difirin, marên cû xwe gulok dikin û didin berojka tava germ. Rojê nû, bi hemû jîndarî û bedewiya xwe dest pê dike. Tav, hêdîka, hiltê. Jiyana li ser ava çem û berpalên çiyana şewq dide. Ava ku bi tîrêjên tavê diçirise û diherike, şewqa xwe digihîne ser berpal û kendalan. Rojê dawîn bi cumbuşa rengên tebiyetê yên zelal dest pê dike. Ji bilî dengê sivik ê avê û vîçe vîça şox a çivîkan tu deng tune. Esmanê dûr û bilind, bi rengekî çîkî kesk, dibiriqe. Tu ewr, tu teyr naxuyin.

Egîdekî xort ê girs, bejndirêj, simbêlbadayî, şal û şapikên risandî yên rengîn lê, di devê şikeftê de dixuye. Bi qasî bîstekê, ew li der û dora xwe dinihêre. Ew dikene. Ev bêdengî û aramî,

ev bedewî, ev spehîfî, ev xweşîya ku xwîna merivan dikelîne, ev war û welat, ev tebiyeta bakîr, hemû, yên wî ne, yên wan e. Êw hinekî xwe dide hev, doxîna xwe dişidîne û bi gavên giran ber bi jêr, ber bi çem dibe. Li ber devê çem, li ser du keviran, ew li ser totikan rûdine û destê xwe yê rastê dixê avê. Hemû bedena wî diheje. Destê wî ditevize. Av ewçend hênîk e, ewçend zelal e. Xort, hêdîka, bi herdu destan, dest û rûyê xwe, paştûyê xwe dişo. Ew radibe ser piyan, bi milên şal û kirasê xwe rûyê xwe zuwa dike û simbelên xwe badide. Hingî dengê teyrekî tê. Xort serê xwe radike û li esman dinihêre. Teyrekî belek, jê hinekî bi dûr, di navbera daristan û çem de, difire. Teyr nade bask û perwazan, mîna ku ew jî dixwaze li gora aramiya vî danê sibê yê zêrîn bifire. Teyr hinekî ber bi xort difire. Xort nikul û çavên biçûk ên teyr dibîne. Belê, teyr baz e, bazekî belek ê van çîyan ku kela dilê nêçîrvanan radike. Xort dikene û ber bi şikeftê dizîvire da ku vegere şikeftê.

Lê hingî dengê teqînekê tê. Hingî dengê teqînekê hawîrdor vedigire. Hingî dengê teqînekê, car bi car, car bi car, di nav gelî, zinar û çîyan de olan dide. Hingî bi dengê teqînê, bêdengiya hawîrdor diqelişe û teyr û tilûr, ji nişka ve, difirin û bi dûr dikevin. Hingî şewateke kambax bi hundirê xort dikeve. Pêşî xort fahm nake ka ev deng çi ye û ji kû hatiye. Ew, matmayî, li der û dora xwe dinihêre, lê tu kesî nabîne. Bedena wî germ dibe, giran dibe. Şewatek ku wî hîç nedîtiye, bedena wî vedigire. Tişteki germ û şil jê diherike. Ew destê xwe davêje zikê xwe; xwîn e, belê, xwîn jê dere. Ew hewl dide xwe, dixwaze xwe bilez bigihîne şikeftê. Ew çend gavan davêje, lê beden giran e, girantir dibe. Bêhna wî diçike. Ew, hêdîka, li ser çogan, hildiweşe erdê. Bi qasî kêliyekê ew welê, li ser çogan, dimîne, bi lez û kûr nefes digire û dide, li dar û dahlên rengîn dinihêre, li esmanê zelal dinihêre, li devê şikeftê dinihêre. Baz? Baz dikeve bîra wî. Çavên wî li baz digerin. Ew dîsan hewl dide xwe, destê xwe yê rastê datîne erdê, bi taqeta xwe ya dawîn, radibe ser piyan û ber bi devê şikeftê

dibe. Gavek, du gav, sê gav. Lê hewqas. Teqîneke nû aramiyê perçe dike. Paşê yeke nû. Û yeke nû. Û xort, bi dev û rû, ditewire erdê. Û xort ji erdê hew radibe.

Hingê çend xortên din, bi awireke şaşbûyî, bi rûyê qedîm ê kesertijî, tiving di destên wan de, ji şikeftê derdikevin. Ew li der û dora xwe dinihêrin. Qet kesekî nûn e, naxuyê. Kê weha kir? Kê hevalê wan, birayê wan, lawê wan ê mîna çiyayekî, di destpêka vê roja ronî de, xiste ser axa reş?

Kî? Çima ?

Ew tivingên xwe radikin û berik dajon devê tivingan û li doralî dinihêrin. Dudo ji wan ber bi xortê li erdê diçin. Lê berî ku ew xwe bi xort bigihînin, dîsan dengê teqînê radibe û olan bi çyan dixîne. Îcar bi lez, li pey hev, bi hev re, tekûz. Îcar dengê teqîna berikên mîtralzyozan hawîrdor vedigire. Egîd, yek bi yek, dikevin, -bêyî ku ew dest bibin tivingê û berikekê biteqînin. Li kêleka ava ku dibiriqe û bi şewq diherike, niha, xwîn diherike. Ji egîdên ku peregende li erdê ne, xwîn dere. Hinên din hewl didin ku ji şikeftê derkevin, lê hew keys dibînin. Hemû li ser hev, mîna mirîşkên koxikekê, di şikeftê de asê dimînin.

Û ew, yanî biyanî, yek bi yek, qor bi qor, ji paş dar, kevir, pal, bilindahî, şikêr, zinar û kozikên xwe dixuyin. Kincên leşkerî yên hêşîneke vekirî li wan, bi çek, rext û pûsad, hêdi hêdi, dor li şikeftê teng dikin. Ew, bêhejmar, pir in. Her der ew in, biyanî ne. Çend zabit li herdu milên devê şikeftê, ji şikeftê dûr, leşkerên bêhejmar îdare dikin. Ji devê şikeftê çend berik diteqin, lê hew-qas, jê pê ve, êdi tu deng nayê. Biyanî dengê wan dibirin, nahêlin ew dest bibin xwe. Ji her milîbiyanî devê şikeftê gulebaran dikin. Bêwest, bêrawest. Pêşî bi tivingan, paşê bi mîtralzyozan û dû re jî bi du topên biçûk. Car bi car.

Heta nîvro, heta tav tê û li ser şikeftê radiweste û şewqa xwe ya mîna teyfikekê, bera zikê çem dide, teqîn dewam dike. Ji hundir, ji şikeftê deng nûn e. Mîna ku ew qet nejiyane, ne dengê, ne pênek, ne şopek. Bi tenê çend leyistokên textîn ên zarokan

û çend mehfûrên li ber devê şikeftê ku niha jê duman radibin, hebûna wan diyar dikin.

Piştî nîvro leşker, hêdî hêdî, ji herdu milan, ber bi devê şikeftê dibin, qirş û rêşî didin ser hev û agir bera wan didin. Devê şikeftê di nav agir, dû û dûmanê de dimîne.

Qirş, qal, rêşî, devî û agir. Qirş, qal, rêşî, devî û agir. Û dû û dûman. Û carina teqîna mîtralîyoz û topan.

Agirê gurr ê ku ji lûleyên mîtralîyoz û topan derdikeve... Du topên ku her yek li milekî devê şikeftê, agir û mirinê dibarînin...

Ber bi êvarê, çaxa ro, bi rengê sor, xwe digihîne milê din ê newalê, leşker disekin. Leşker westiyane. Ji nişka ve, dinya dîsan dibe aram. Lê hawîrdora zelal û bêdeng êdî qulîpiye ser qada şer. Bihuştaya veşartî qulîpiye ser dogehê. Dar dişewitin, ji doraliyên şikeftê dûman radibe. Laşên pez, dewar û bergîran, perege, li doraliyê gevizîne. Dinya germ e, pir germ. Teqîna tîving, mîtralîyoz û topan dinya kiriye kozêke agir. Êdî ne dengê teyr û lawiran tê, ne jî bêhna gul û kulîlkan. Bi tenê bêhna barûd, xwîn, xwîdan, dû û dûmanê tê. Bi tenê bêhna mirinê tê.

Zabit û leşker, tiliyên wan li ser lingê tebançe û tîfîngan, hêdî hêdî tînin ber devê şikeftê. Lê kes nakeve hundir, ew li wir radiwestin û guhê xwe didin şikeftê. Deng nîn e, ji şikefta ku jê dûman radibe, tu deng nayê. Êdî her tişt qediyaye; êdî ne veşartin e, ne payin e, ne hêvî, ne veger, ne hesret, ne keser, ne guman, ne tîrs û ne jî haletên din ên însanên bêgav e. Xelas, her tişt xelas bûye.

Lê piştî bîskekê tiştêkî ku di efsanan de tê pê, diqewime; ji nav dûmana devê şikeftê reşahiyeke dixuye. Cewrikeke biçûk, bi kûze kûzek ku bi zehmetî tê bihîstin, ji nav dûmanê derdikeve. Bi dû cewrikê re jî reşahiyeke din; zarokekî biçûk ku bi zehmetî gav davêje.

Zarokê ku em ê bibêjin, bi qasî du sal-du sal û nîvî ye, bêdeng, tîrs li ser rû û li ser çavan, ji şikeftê derdikeve. Zarok law e. Kirasekî çerm li lêwîk e, porê wî qusiyayî ye. Bêhneke giran a xwîdan, dû û mûzê ji lêwîk tê. Rûyê wî biçûk, çavên wî biçûk

mîna libên nûskê ne. Gava çavê wî bi zabit û leşkeran dikeve, ew destê xwe hildide û dixwaze tişteki bibêje lê deng jê dernakeve. Hingî zabiteki berik dibe devê demançê û tê li ser lêwîk disekîne. "Ji wan tu kes, tu şop, tu deng, tu reh, tu rêç divê nemîne" zabit, bi zimanê xwe, dibêje. Zabit weha difikire. Haya lêwîk jî zabit û fikrên zabit nîn e, ew destê xwe dibe ser piştê cewrika belek û pê re dilîze. Lê zabiteki din ê simbelqîst nahêle ku zarok bê kuştin.

Zabîtê simbelqîst zarok radike, hembêz dike û bi destê xwe yê rastê, bi ken, serê wî yê hûr mist dide. Zarok jî bi çavên ku tu tiştî îfade nakin, li zabit dinîhêre.

Belê, ev zarok, Baz e.

Belê, serpehatiya Baz weha dest pê dike.

3. Zayin

Serpêhatiya Baz ku ew ê, bi xwe, bi misogerî, tu carî pê nizanibe, weha dest pê dike. Bi mirin û xwînê, saw û tirsê, sar û sermê.

Ya serpêhatiya Kevokê?

Serpêhatiya Kevokê jî, em ê bibêjin, bi qasî bîst salan bi dû serpêhatiya Baz re, dîsan li Welatê Çiyan, di rojê germ a dawîya biharê de, dest pê dike. Li bajarekî mezin û tevlihev ê Welatê Çiyan. Li îstasyona mezin a trêne.

Em niha li ber trêneke reş, dirêj û leşkerî ne. Em dîsan li rê ne. Em ê li trêne siwar bin û herin, dîsa herin, –ber bi deverên nediyar, nenas, ber bi deverên xerîb. Îstasyona kevnare û der û dorên wê tijî meriv in. Kal, pîr, zarok, jin, mêr ketine nav hev, li ber deriyên kesk ên wagonên trêne rêz bûne û li bendê ne ku navê wan bê xwendin da ku ew li trêne siwar bin û herin. Li ber her deriyekî trêne çar zabit û hin leşkerên çekdar rawestiyane. Li ber deriyê mezin ê îstasyonê leşkerên çekdar rawestiyane. Li hundirê salona îstasyonê û li ber gîşeyan leşker rawestiyane. Li der û dora îstasyonê leşkerên çekdar rawestiyane. Dora îstasyonê bi tank û jîpên leşkerî hatiye rapêçandin. Ji hoparlorên îstasyonê dengê marşên leşkerî, perde bi perde, bilind dibe.

Roj, ne rojê normal e. Roj, roja leşkeran e; roja haşer û maşerê ye; roja barkirin û koçkirinê ye.

Roj, roja sirgûnê ye, sirgûna ber bi diyarên xerîb...

Belê, roj, roja leşkeran e, generalan e. Berî niha bi du mehan, li Welatê Mezin, şevê, piştî razana segên kuçan û berî hişyarbû-

na dîkên malan, generalan, di bin serekiya serekê giştî yê ordiyê de (ku em ê jê re bibêjin General Serdar), li hember qral û hukîmeta wî, serî hildan û hukim xistin destê xwe; generalan û leşkerên wan qral û hin pisporên wî di cih de kuştin. Serekwezîr û hemû wezîrên hikûmetê jî girtin û avetin zîندان. Û dengê radyoya neteweyî, heta pêla dawîn, vekirin û desthilatiya xwe, bi marşên leşkerî, bi Welatê Mezin û cîhanê gihandin. Perda destpêka serhildana wan weha bi xwîn vebû. Dûmahîkê jî bi xwîn dewam kir; tevgerên karker, ronakbîr, xwendevan û zehmetkêşan hatin qedexekirin. Şanzdeh ji serekên wan hatin bidarvekirin. Yên din ketin zîندان. Mafên grew, lokawt, xwepêşandan, meş, civînan rabûn. Gelek rojname, kovar, kitab û weşan hatin qedexekirin. (Yên ku diweşin, bi çavênîya pisporên generalan, diweşin.) Li hemû welêt hukmên awarte yên generalan li dar ket.

Û îro herkes, hemû gel divê li gora van hukman rabe û rûne, here û were, bixwe û vexwe, razê û hişyar bibe, bifikire û bipeyive.

Û li welatên biçûktir ên Welatê Mezin jî, ji du mehan û vir ve ye, li jor balafirên leşkerî li esmanan, di nav zîkê ewran de, çûv didin, li jêr jî bi hezaran, bi deh hezaran, bi sed hezaran tank, top, leşker, jîp û erebeyên leşkerî her û her li ser riyan, di nav bajaran, li ser çiya û zozanan, di deşt û geliyan de çerx dibin. Tevî çek û pûsadên giran. Tevî marşên leşkerî. Tevî xwepêşandana quwet û zorê, gur û fortê.

Li welatên biçûktir, ronakbîrên wan ên pêşewa, navên wan ên zana yên siyasî û nasyonalist hatin girtin. Tevger, komel û pêwendiyên wan ên çandî û siyasî hatin qedexekirin. Dudo ji navdarên Welatê Çîyan hatin xeniqandin. Niha jî General Serdar û hevalên wî fermaneke nû derxistine; hema çi bigire hemû sergewer, mal û malbatên mezin û giregir ên Welatê Çîyan ê ji cih û warên xwe bên derxistin. Ew ê herin deverên nû, herin sirgûnê.

Îro roja çûyinê ye, roja vê sirgûnê ye. Îro, roja fermanê ye.

Roj germ e. Tevî ku ro hê baş bilind nebûye, dinya germ e. Esman şîn, ewr gewher in. Tav mîna yaqûteke sor dibiriqe, ewr

mîna kevirên mercan ên çîkî spî dixuyin. Ronahî û zelaliya rojê li roja dilsoj a fermanê nayê. Lê fermana însanên Welatê Çiyan rabûye, ew ê herin. Însanên Welatê Çiyan ku dê niha herin, di nav xewnekê de ne, —mîna ku ew di nav xewnekê de ne, mîna ku ew kabûsekê dibînin. Ew hê tînegihên ka çi dibe, hê bawer nakin ku bi sedan mal û malbat ê tevî zar û zêçên xwe, di demeke weha kurt de, ji cih û warên xwe, ji reh û rêçên xwe, bîr veqetandin. Ew hê fam nakin ka çima ew ê herin. Çima? Ji bo çi? Lê îro, roja wan a herî dirêj a jiyana wan, ne xewnek e. Ev roja germ, ev leşkerên çekdar ên maxrûr, ev trêna reş a ku mîna cinawirekî çiling dixuye û hatin, hebûn û rawestana wan a vî derê, îstasyonê, rastî ye. Rastiya wan e. Ew tu kabûsê nabînin, lê kabûs bûye jiyana wan, qulipiye ser jiyana wan. Însanên Welatê Çiyan û jiyana wan; tenê, belengaz, nezan; rûyên qemerî, simbêlên badayî, bejnên şox û gerdênên zirav; hezkarên zinar, çiya, zozan, newal û geliyan, hezkarên tebiyetê, hezkarên tenê û tenêtiyê; merivên serhildêr, merivên şer û şervaniyê; qederek ku hertim di şer de ye hertim di berxwedanê de ye, hertim ferman lê rabûye, hertim di nav pêlên kabusekê de dere û tê.

Mîna niha. Ew li ber deriyên wagonên trêna rêz bûne û dipên. Stûxwar, westiyayî, çavqerimî. Leşkeran du roj, bi tenê du roj wext dan wan ku ew haziriya xwe û çûyînê bikin. Berî du rojan zabit û leşker hatin ber mal, war, kar û cihên wan û biryara fermana generalan ji wan re gotin; "hûn ê, ji bo demeke kurt, bar bikin û herin. Gava dinya haş bû, aram bû, hûn ê dîsan vegezin malên xwe... Ferman weha ye..." Ji bo demeke kurt... Lê heta kengî? Herin... Lê ber bi kû, bi çî, çawan? Gava dinya aram bû... Kengî, çawan, bi çî şeweyê? Kî dê biryar bide ku dinya aram bûye an na? Aramî? Çawan? Li gora kê? Û di nav çil û heşt saetan de ew ê, ji bo çûyînê, hazir bin. Ew çî, bi xwe re bibin? Ew çî bikin? Birevin, xwe bidin alî, derkevin ser çiyên? Mîna ku bav û kalên wan kirine, ew jî xwe bispêrin gelî û newalên xwe? Paşê wê çî bibe? Dawî? Çil û heşt saet... Çil û heşt saetên keft û leftê,

çûn û hatinê, geremolê, fikr û gumanê û pirs. Çil û heşt saetên ketin û bindestiyê, teresiya bêgaviyê. Ne tişteki din, bi tenê ketin û bindestiyê. Bi tenê bêgaviyê...

Piştî çil û heşt saetan, spêde, di berbanga sibê de, zabit û leşkerên çekdar ew ji mal û cihên wan wergirtin, li terembêlên leşkerî siwar kirin û anîn îstasyona trêne. Wan ê çi bikira?.. Qet, qet tişteki... Ew bi qedera xwe razî bûn. Bêyî ku ew, şeva dawîn, serê xwe deyinîn ser balîfan, xew bikeve çavê wan, kincên wan li wan, sandûq û walîzên wan hazir, di destê sibê de, bi dengê dîkan re, ew li benda hatina leşkeran bûn. Bi tenê sandûq û walîzên wan ên biçûk bi wan re bûn. Ji çend taxim cil û berg, zêr û zînet, pere û pûl, morîk û kevîrên buha pê ve, wan tu tişteki xwe bar nekirin. Ne sandûqên cil û bergan, ne aman û firaqên malê, ne kûp û dîzikên rûn û xwarinan, ne boxçîrên lihêf û balîfan, ne kedik û meşkên şîr û mastan, ne tûr û kîsikên yadîgaran, ne ref û rehleyên kitab û defteran, ne kitab û defterên dizî yên li paş dîwar û kadînan, ne jî resim û lewheyên bav û kal, hezkir û qedirbilindan. Û ne jî hespên kihêl ên seglavî ku li deştên kesk û zer û li zozanên hêşîn û spî, bi lez û beza xwe dibûn teyrên eylo. Û ne jî segên gurêx û tajiyan belek ên zirav ku di nav newal, gelî, zinar û çîyan de dibûn piling. Û ne jî kerîyan pezên mêşîn, dîkên sor ên kumikdirêj, kew û kevokên belek... Û ne jî tişteki din. Di bin çavênîya leşkerên lîbaskesk de, wan terkî malen xwe yên germ, warên xwe yên bav û kalan kirin û ketin rê.

Ew ne li benda fermaneke weha bûn. Ji bervajiyê, ew li hêviyê bûn ku dinya hinekî haş bibe, leşkerên li ser kolan, cade û gundan hinekî kêmtir bibin, ew vegehin barakayên xwe yên leşkerî. Di ser cûntayê re du meh derbas bûbûn. Generalan wekî xwe kiribûn, daxwaza xwe anibûn pê, her der, bi darê zorê, kontrol dikirin, her gotina xwe, biryar û fermana xwe, bêyî dengê muxalîf, liberxwedaneke xuya, bi cih dan. Hingî wan ê çima, bi ferman, zor û şidet, desthilatiya xwe bişidandina? Merivên Welatê Çîyan, wekî her carê weha saf, lê şaş, difikirîn.

Mîna her carê, îcar jî ew dîsan ketine ser rîyan; ew niha li rê ne. Zarok geh digirîn, geh di xew re diçin, geh ji delingên diyên xwe dikişînin. Kal û pîr li ser kursiyên dirêj ên li ber deriyên îstasyonê û li ser kevîrên reş ên perona îstasyonê rûniştine. Kal qelûn û cixare dikişînin, pîr diponijin. Hinên wan jî li ser bankên îstasyonê xwe pal dane, dihênijin û heye ku li rojên borî, li fermanên borî, li şer û pevçûnên borî û li qir û qetliyamên borî difikirin. Heye ku ew qet li tiştekî jî nafikirin, naxwazin li tiştekî jî bifikirin, yan jî em weha bibêjin, heye ku ew li jiyana xwe ya dirêj û valahiya wê, bêkêriya wê, bêmanebûna wê difikirin. Herçî mêrên wan ên rûtirş, jinên wan ên rûgirtî, xort û ciwanên wan ên rûqemirî ne, ew di rêzên li ber deriyên wagonan de li dorê ne. Bi beden û mêjiyên westiyayî, bi çav û ruhên westiyayî.

Lê çav, çavên wan. Bi taybetî çavên wan; xem, kerb, endîşe, west û tirs. Nemaze tirs. Tirs a aloziya îro. Tirs kirin, qewimandin, bûyer û serboriyên do. Tirs nezaniya pêşerojê, mij û dûmana ku li ber wan e, pêşiya wan biriye. Bi tenê tiştekî van însanên ku niha li rê ne, dike şîrîkên hevdu; tirs û qedereke yekgirtî ku ji tirsê hatiye pê. Ji bilî vê yeka muşterek, ew hevûdu nas nakin. Her yek ji van mal û malbatan ji derekê anîn. Hinên wan beg û axalerên gundan in, ji gundan hatine. Hinên wan eşîr û serekeşîr in, ji bajarên biçûk ên Welatê Çîyan hatine. Hinên wan şêx û se-rekên wan ên ruhanî ne, ji warên xwe yên dûr ên zikê çîyan hatine. Hinên wan jî xwendeyên wan in –bijîşk, awukat, muhendîs, dermandar..– ku piraniya wan ji malên xwe yên vî bajarê mezin ku ew ê niha bi trêne terk bikin, hatine.

Belê, ev trêna pêşîn e ku wê niha here. Kî dizane ka çend trênen din ê rabin! Ji ber ku fermana bilind fireh e. Bi sedan mal û binemal dikevin ber fermanê. Trêne hê bi rojan, bi heftan, heye ku bi mehan herin û werin, bar bikin û peya bikin.

Niha, gava tîrêjên tavê êdî xwe digihînin ser qermîten sor ên banê îstasyonê, ji nişka ve, dengê tîz ê marşên hoparloran disekine. Bi qasî bîskeke dinya bêdeng dimîne. Bi tenê çend zarok

digirîn, hin kal û kokim dikuxin, hin jin bisemt dinihîrîn û leşkerekî, bi dengekî berz, li dûr, hin kesên nûhatî, dixê rêzê. Herkes, pirs, şik, guman li ser rûyê wan, dipê. Piştî payina bêdeng a çendekê, ji deriyên mezin ên îstasyonê generalek li pey wî jî şeş zabit dixuyin. Bi saw, bi xof, cidî. Zabit û leşkerên îstasyonê xwe didin hev, qama xwe rast dikan û li silavê disekinin. General û zabit, giran giran, çavê wan li ser şênîyên li ber deriyên rawestiyane, tên û li navenda perona îstasyonê disekinin. Bi qasî kêliyê General, bi nêrîneke sert, maxrûr û serbilind, li der û dora xwe, li herdu aliyên dirêj ên trêne dinihêre û paşê dosya ku di destê wî de ye, vedike û lê dinihêre. Zabitên ku li dorê ne, hinekî din nêzîkî wî dibin û ew bi hev re li dosyê, li kaxizên nav dosyê dinihêrin. Paşê jî, sê zabit, hin kaxiz di destên wan de, ber bi aliyê paşî yê trêne, sisîyên mayî jî ber bi aliyê pêşî, bi gavên revê, derin. General jî, pêda, çend leşker li dorê, hêdîka, berepaş, dere û li ber deriyê mezin ê îstasyonê disekine.

Niha koç dest pê dike. Zabit, li ber deriyên wagonên trêne, bi dengekî berz, nav dixwînin. Nav, navên wan, navên koçberan; paşnav, navê bav û bavik, kal û kalik, navê binemal û eşîr, navê war û wêran, navên kevnare yên sedsalan... Navê wan; qedera wan, fermana wan. Herkesê ku navê wî tê xwendin, bi qîrîn û bi zimanê zabitan, "li vir e" dibêje û berepêş dere. Tevî jin, zarok, sandûq û walîzên xwe yên biçûk û eger hebe kal û pîrên xwe. Ew tên ber derî, li pêşîya zabitan disekinin. Zabit careke din nav û paşnavê wan, war û wargehê wan dipirse, wan dihijmêre, li kaxizên destê xwe dinihêre, tiştina dinivîse û di rêberiya leşkerekî de wan siwar dike. Saetek-du saet bi vê heyteholê, bang, qîrîn, hatin û siwarbûnê derbas dibe. Paşê jî meydana îstasyonê, pêşîya peronên trêne, der û dora îstasyonê, ji nişka ve, vala dibe. Ew însan, ew mahşera berî çend saetan, bi carekê, winda dibin. Ew şênîyên boş nema dixuyin. Bi tenê segek-du segên bere-dayî, bi sistî, xwe li îstasyonê dilivînin. Û ew generalê maxrûr ku bi awirê însanên serfiraz li trêne dinihêre, bi qasî deh zabitan li dorê, destên wî li paş, hê li ber deriyê îstasyonê ye. Şixul

meşiyaye; koçberên Welatê Çiyan ketine nav trêne, trêne pişt a xwe daye Welatê Çiyan ê bakur û berê xwe daye deverên nû yên başûr. Dengê marşên leşkerî dîsa dest pê dike. Lê piştî çendekê dengê din ku di ser hemû dangan re, xwe bi hemû bajêr, hemû alemê digihîne, bilind dibe; dengê tîz û dirêj ê trêne.

Trên dikeve rê, hêdî hêdî, mîna şahmaraneke çîrokan ê heft qat binê erdê, xwe dilivîne û xwe dirêjî hesinên raxistî yên rê dike. Îstasyona kevnare ku bi kevirên mezin ên reş û şehkirî lêbûye, li pey dimîne. Qermûtên sor ên banê îstasyonê ku bi rengê tîrêjên tavê şewq dide, li pey dimîne. Bandûra ala Welatê Mezin ku bi sê rengan di bilindahiyên de li ba dibe, hêdîka winda dibe. Xaniyên kevn, perege û neçar ên bajarê mezin ku bi kevirên granît ên reş, bi du-sê qatan lêbûne, li pey hev tên û winda dibin. Şênîyên bajêr, meriv û xîsm, nas û nenasên koçberan ku bi cil û bergên xwe yên herêmî li kolan û kuçeyên bajêr digerin, li ber mal û deriyên xwe rawestiyane, li bexçe û parîzên bajêr rûniştine, qor bi qor, dixuyin û winda dibin. Çend dibistan û xwendegên ku zarokên koçberan bi zimanê zabitan perwerde dikin, li herdu milên trêne dixuyin û li pey dimînin. Û berî ku trên, bi temamî, ji bajêr derkeve, garnîzona leşkerî ya zabit û leşkerên ku derketiyên niha dibin, dixuye. Trên diçe, tang û top, terembêl û kamyonên leşkerî, bereqe û cebîrxane, komên leşker û zabitan, leşkerên nobedar û çekdar, war û meydanên temrîn û jîmnastîka leşkerî, talîmgeh û nîşangehên leşkerî, yek bi yek, li pey xwe dihêle û dere. Trên ji bajêr derdikeve, berê xwe dide aliyê başûrê welêt û dikeve nav deşteke hêşîn a bêser û bêber.

Trêna ku em niha tê de ne, ji yanzdeh wagonên dirêj hatiye pê. Vagoneke gelekî dirêj ji bo zabitan e. Yek jî aşxane ye. Yên mayî jî ji bo koçberan û pasewanên wan ên zabit û leşkeran in. Di her wagonekê de, bi qasî çil kesî hene. Rêwî bi cih bûne, herkes di kompartmana ku jê re hatiye nîşandan, rûniştîye. Em di wagona sisîyan a trêne de ne, -ku ji bo serpêhatîya Kevokê û herweha ya Baz girîng e.

Baz?

Belê, ji bo serpêhatiya Baz jî. Ji lewre Baz jî di trêne de, li eynî wagonê ye. Lê ne mîna yek ji rêwîngan, mîna çavnerê wan, pasewanê wan. Baz, nobedarê zabit ê wagonê ye. Di ser wê roja ku ji devê şikeftê agir û dûman radibû re bi qasî bîst salan derbas bûye. Niha umrê Baz, em ê bibêjin, bi qasî bîst û du sal, du sal û nîv e. Umrekî di ser wê roja şewat û mirinê re bihuriye. Sal bihurîne, wext bihuriye. Êdî ne dengê top û mîtralîyozên wê rojê tên bihûstin, ne jî dû û dûmana gule û şewatê dixuyin. Kes, ji me pê ve tu kes, nema bi wê rojê dizane. Ew roj ketiye ber pêlên tekûz ên wextê û ji bîr bûye. Lê Baz maye, mîna siya wê roja giran, mîna şopa mirin, şewat, windabûn, kîn û wahşetê.

Îro Baz zabit e, tegmenekî nû yê dilgerm, serîgerm e. Tegmenekî xort, maxrûr, bixwebawer, kekel, dûrbîn, jîr û serwext. Çawan weha bû? Çawan Baz di ordiya ku bav û kalên wî qir kirin de îro bûye zabit? Çîroka vê yekê ku em ê carina lê vegerin, dirêj e. Lê ew, îro, kumekî kesk ê leşkerî li serî, di nav kincên xwe yên tenik ên leşkerî de, li ber deriyê wagona sisiyan a trêne sekiniye, li rêwiyên ku teslîmî wî bûne, dinîhêre û bi serbilindî li erk û berpirsiyariyên xwe yên mezin û miqedes difikire; çavê wî êdî li pêş e, berê wî, bîr û bala wî, mîna vê trêna ku niha dere, ber bi pêş e. Rojên tenê, sar û diltengî êdî li pey mane. Ew ê êdî li pey xwe nenîhêre. Xewna wî bi cih bûye, ew bûye zabit, wî kincên leşkerî li xwe kirine, çek û pûsat girêdane û dest bi kar û şixulên giranbûha, pîroz kiriye. Jiyana wî niha dest pê dike, ew niha dikeve nava afirîn û avakirina jîyanê, sir û sêrên jîyanê. Ew ê niha jîyanê ava bike, jîyanekê, jîyanan biafirîne. Ew, zabit û kumandarê nûgihîştî, dê niha bibe kumandarê jîyanê... Ev trêna, ev însan, ev rêwî, ev rojên germ ên girîng ên Welatê Mezin... ev hemû gava yekemîn a xewna wî ne ku îro êdî dibe rast, dibe rastiya jîyana wî. Û ew ê, di rojên bê de, bibe rastiya jîyana welatê wî yê fireh jî. Ev rewî, wezîfa wî ya yekemîn e. Destpêk e. Destpêka kumandariya wî, desthilatiya wî. Ji niha ve, ew desthilat e,

hakîm e, fermanî e. Destê wî yê rastê li ser (qevdika) demançâ li ber wî, bi nizmahî, ew li rêwiyên xwe, na ne rêwî, li girtiyên xwe dinîhêre. Belê, ew desthilat e.

Baz; êdî ne zarokê mirinê yê berî bîst salan e, tegmenê xort ê desthilat e îro; bal û bejneke dirêj, awir û nêrîneke xurt û tûj; rûyekî qemerî ku bi rûyê girtiyên wî dişibe, rûyekî paqij, rîh û simbelên kurkirî, dev û levên dirêj û zirav; pozekî dirêj û zirav; eniyeke fireh. Û çav, çavên biçûk mîna du libên nokê, mîna çavên teyrê baz. Çav; xof, saw, bawerî, cidiyet, disîplîn, sar û rengîn. Çav; rengên sar ên tenêtiyê, rengên mirinê. Çav; tenêtiya dil û ruh.

Dil û ruhê tenê yê Baz... Lê ew nema tenê ye. Ew mensûbê ordiyeke mezin e, zabit û kumandarê hêzeke desthilat a hemû heremê ye. Mala Zarokên Sêwî, Dibistana Navîn a Dewletê, Xwendegaha Leşkerî ya Ordîyê û Akademîya Leşkerî niha tîr bîra wî. Mala wî, cih û warên wî ew der bûn. Ne maleke wî ya germ hebû ne jî dê û bavekî wî yê dilgerm. Ne xweh û birayên wî, ne ap û birazî, ne jî xal û xwarzî. Qet kesekî wî, qet tiştekî wî nîn bû. Ew bi tenê bû. Ruhekî tenê û stûxwar. Ruhekî sêwî. Belê, sêwî. Li gora ku wî dizanibû, li gora ku bi kite kit jê re hatibû gotin, bav û diya wî, gava ew hê zarokê gelekî biçûk bû, di qezayeke trafikê de miribûn. Kesekî wî nemabû, nîn bû ku lê xwedî derketa. Loma jî berpirsiyarên dezgehên dewletê ew teslîmî Mala Zarokên Sêwî kiribûn. Bi tenê, carina, zabitekî simbelqît ku ji dûr ve xizmê wî bû, di hate serdana wî. Jiyana wî ya li ser bîst salan weha, di nav çembera kûr û kambax a tenêtiyê de derbas bûbû.

Lê îro êdî her tişt guheriye, êdî ne bi tenê ye, ne jî sêwî. Jiyaneke dirêj, mîna vê deşta fireh ku ew niha tê re dibuhurin, li pêşiya wî ye. Erk û wezîfeyên mezin û giran, mîna çiyayên ku wan li pey xwe hiştine, li hêviya wî ne. Xweşî, başî, bedewî, îmkan û heyînen jiyane, yên welat, mîlet, dewlet û ordîyê li benda wî ne. Bextiyarî, serfirazî, xwarin û vexwarin, ger û lixweki-

rin, kêf û henek, keç û jin, evîn û hezkirin, mîna van darên ku ji pencereyên trêne dixuyin, dest li Baz dikin, bang li wî dikin. Û keç û jin, bi taybetî ji keç û jinên ku wî di şevên tenê û sar ên salonên razanê yên dibistan û xwendegehan de, di bin lihêfên tenik de, destê wî yê rastê di nav şeqan de, her û her, xeyal dikirin. Ax ew keç û jin, tahrîna jîyanê, reng û bêhnê hebûnê, neqşa cîhanê... Ew keç û jin... Ew bisk û guliyên wan ên hevrişim, çavên wan ên kilkirî, lêvên wan ên goştî, stûyê wan ê dirêj, sîng û berê wan ê vekişiyayî, memikên wan ên xweşik, ber û berzikên wan ên nerm û germ, reşahî û qelîşekên berzikê yên sir û sêrtijî, hêt û şeqên wan ên mîna piştê masiyan nerm, bedenên spehî û bedew... ev hemû li benda Baz in. Baz ê di guhê wan de, bi hêdîka, binîhiwêre, gotinên herî dizî ku wî bi salan dubare kiribûn, jiber kiribûn, bibêje. Ji guhê wan, ew ê, bi gotinên xwe yên mehrem, bi hilma xwe ya germ, dakeve bedena wan, dilê wan, ruhê wan. Baz wê wan bixwe, wan vexwe, bi hemû hebûna xwe, bi hemû bedena xwe bikeve nava wan û di nava wan de bimîne. Bi deqan. Na, ne bi deqan, bi saetan. Na, ne bi saetan, bi rojan. Belê, bi rojan, bi mehan, bi salan, bi dirêjahiya umrekî. Ew ê di nav wan de bimîne, li wir hêlînekê çêke û bimîne. Êdî Baz kê bixwaze, ji kîjan jînê re dest bike, ew ê, bi kêf, were û xwe li ber Baz bike erd. Êdî quweta Baz heye, aboriya wî li cih, apoletên nîşanên wî li ser mil, hêz û quweta ordiyê û dewletê li piştê wî ye. Hêdî hêdî, yek bi yek, kite bi kite, ew ê hemû van xeyalan, daxwazan bi cih bîne. Ne lez, ne ji bez, giran giran. Jiyana wî ya rastîn hê nû dest pê dike. Roja ku ew li bendê bû û dizanibû ku wê were, îro, hê nû, hatiye. Rojbaş roja nû, jiyana nû!

Û heyecana îro! Ji kêf û serbilindahiya Baz re payan nîn e. Coş û heyecana wî ya îro bêsînor e. Di rojên weha tarîxî de wî dest bi wezîfê kiriye. Ev yeka hanê nasîbê kê dibe? Leşker û ordî, îro, bi saya cesareta General Serdar, hukimdar e. Karê dewletê bi destê ordiyê digere, gotina ordiyê ferman e. Heke ordiyê qral û berdevkên wî ji hukim nexista, Xwedê agah e, çi dê bi serê

welat û dewletê bihata! Heye ku dewlet ji hev biketa, welat perçe bûya, şerekî navxweyî dest pê bikira. Lê ordiyê rê li hemû van îhtimalên neçê girt. Bi xêra ordiyê, îro, dîsan, rêkûpêkî û tekûz tê pê. Lê şixul giran e, berpirsiyarî mezin e. Tu şaşî navê. Dudilî, şik, guman, sûzenî, rûbadan, qelsî, sistî, sergêjî navê. Tevlîhevî, bêdûzanî navê. Bernama ordiyê divê here serî, çi dibe bila bibe, divê ew bi cih were.

Û ji ber bextê Baz ê çê, ew di rojên weha de dest bi xizmetê dike.

Ew roja ku wî diplomaya xwe ya leşkerî wergirt û pîrpirikên apoletên wî pê ve bûn, niha, li ber deriyê wagona sisiyan a trêna koçê, tê bîra wî; wê şevê xew nekete çavê wî. Dotira rojê ew ê bûbûya zabit! Ew ê ji vê jiyana girtî rizgar bûya, deriyên jîyan û cîhanê li ber xwe vekira! Ew ê bûbûya xwedanmesûliyet... Li ber destê sibê, berî ku hilma berbangê dakeve ser dinyê, ew ji nivînan rabû, ji cihê xwe yê razanê peya bû, li hevalên xwe yên razayî yên li salona razanê nihêrî, bêyî ku deng derxe, bi gavên sivik, berê xwe da cihê serşokê. Tevî ku meha gulanê jî êdî diqulipî, serşoka dirêj hênîk bû. Wî lampayên serşokê pêxistin û çendekê li ber destşokê rawesta û li neynika hember xwe nihêrî. Belê, ew bû. Ev kesê kêfxweş, xort, porqusiyayî û lihevhatî ku di nav bêcemê erzan ên leşkerî de lê dinihêrî, ew bi xwe bû. "Rojbaş" Baz ji kesê neynikê re got, "rojbaş tegmen... rojbaş zabîtê nû, serdarê nû..." Û ew kenîya, "rojbaş dinya, rojbaş jiyana derve, li hêviya min bin, ez tîm, ji bo daqultandina we, vegirtina we..." Bi dû re, ew çû li avdestxana ku jê bêhneke tunt a mîzê dihat, rawesta. Wî bêceme û derpiyê xwe, heta çokê daxist û li pêşiya xwe, tiştê ku di nav şeqan de diliviya û mîna "serbilindiya min" bi nav dikir, nihêrî. Ew kenîya û çend caran, bi pêçiya xwe ya mezin lê xist û "rojbaş ji te re jî, serbilindiya min" got. Bi destê xwe yê rastê, ew pê lîst, hêdî hêdî. Bi pêlîstinê, tiştê nav şeqan mezintir bû, serî rakir û piştî kêliyêkî rep bû. Baz dîsan lê nihêrî, bi heyret, bi maxrûrî. "Rojba te jî îro dest pê dike" wî

got, "em divê vê rojê pîroz bikin..." Paşê wî çavên xwe girtin, li periyên tazî yên xewn û xeyalên xwe yên salan fikirî û destê xwe yê rastê li ser û doralîyên mêraniya xwe, serbilindahîya xwe bir û anî. Pêşî bi giranî, paşê bi lez, heta ku hin dilopên avikê, mîna berikên demançayekê, ber bi qulika avdestxanê firiyan. Çavê wî girtî, hişê wî li bihuştên wî yên veşartî, ew hejiya, bi zelzeleyeke germ û kûr ket. Paşê, gava bedena wî hinekî aram bû, wî çavê xwe vekir. Dilopeke avikê negihîştibû cihê xwe, ew bi delingê bêceme wî ve zeliqîbû. Wî bi tiliya xwe dilop ji bêceme jêkir û ji nêzîk ve, lê nihêrî. Sir û sêrên vê dilopa bêreng çî bûn ku jê jiyanek, çend jiyan, gelek jiyan dihatin pê? Wî ava ron a li ser pêçiyê xwe bêhn kir. Na, jê tu bêhn nedihat, bi dû re, pêçî bir devê xwe û dilop tahm kir. Na, tahmeke wê jî nîn bû. Lê her çî jî bûya, wî dê ev av, ev avika ecêb bireşanda, mîna tovên zeviyê, ew di kûrahiyên tarî û germ de biçanda û jiyan jê rakira. "Rojê te ya jiyanê pîroz be, ey hukimdarê jiyanê" wî got, pêçiya ku avik lê bû, dilast û li ser kevirê lawaboyê rûnişt û bi qasî demeke dirêj xwe vala kir. Sakîn, bi aramî, bi hizûr. Ne tu bêhn dihate difnên wî, ne jî kevirê sar ê avdestxanê ew aciz dikir. Ji berevajiyê, wî, bi kêfxweşî, marşeke leşkerî fîtikand. Û bi fîtik, wî şixulên xwe yên din, kurbûn, şuştin, vegera salona razanê, bir serî. Gava ew vegeriya hundir, ew çû ber cihê xwe yê kincan ku li kêleka cihe wî bû. Wî hêdîka derî vekir; kinc li wir bûn. Taximekî kincên nû yên zabitan di dolabê de hilawestî bû. Xwedayo! Ji heyecanan, wî, çend caran, got "Xwedayo..." Dengê hilavêtina dilê wî dihate wî. Wî dê, niha, ev kinc li xwe bikirina. Ew kincên ku wî hertim xeyal kiribûn, niha, li ber wî, li benda lixwekirinê bûn. Li ber çavên wî kinc, mîna kincên keysaran bûn, mîna zirxên hebûn û parastinê bûn, mîna lîbasên siherîn ên biserketin, pêşketin û vegirtinê bûn. Mîna ku gava wî ev kinc li xwe kirin, her celeb daxwaz, xewn û xeyalên wî dê bihatina pê. Berî herkesî wî kincên nû û tenik ên kesk li xwe kirin. Gava hevalên wî hişyar bûn, wî di nav kincên xwe yên nû de, li bexçê yekta yê Akademiya

Leşkerî, dest bi piyasê kiribû jî. Bi dû sond, marş, xwirînî, talîm û jîmnastîka sibê re, ew hemû, qor bi qor ku ji çar kesan dihate pê, daketin meydana mezin a merasîmên leşkerî. Herkes li wir bû, generalekî ji serekatiya cûntaya ku nû dest bi kar kiribû, kumandarê Akademiyê, general û zabitên giregir ku li Akademiyê ders didan, du wezîr, bi dehan karbidestên sîvîl ên dewletê, serê belediya girava ku Akademî lê bû û gelek kesên din. Dora meydanê bi topên ku dibiriqin rapêçayî bû. Top bi ala sêrengîn hatibûn xemilandin. Di hemû aliyên bilindahiyên meydanê de jî ala, bi zehmetî, li ba dibû. Û marşa neteweyî ya dewlet û welêt, bi musîka orkestrayeke leşkerî, dihate xwendin. Wan ê li wir, di wê roja germ a destpêka havînê de, ala ramûsana, bi navê dewlet, millet û ordiyê sond bixwarina û nîşana xwe ya yekemîn a ordiyê, ji destê kumandarê Akademiya Leşkerî werbigirtana.

Dê, bav û xizmên herkesî, ji bo merasîmê, hatibû. Ji yên Baz pê ve. Kî dê bihata? Kî dê kincên xwe yên cejn û merasîman li xwe bikira û bihata? Çi kesê Baz hebû ku bihata? Lê ne xem bû. Wê rojê Baz dibû endamê malbateke pir mezin, mezintirîn a hemû cîhanê. Ew dibû mensûbê ordiyê. Ev mensûbiyet, ev aîdiyet têra wî û hemû jiyana wî dikir!..Ya ew dema ku generalê kumandar hate ber wî û lê nihêrî? Ma ew dem ê tu carî ji bîra wî biçe? Xwezî yekî fotografekî wê demê bikişanda. Wê demê, hingî rûpelekî nû ya jiyana wî vedibû, jiyana wî riyeke nû dida ber xwe. Qama wî rast, serê wî rast, nêrîna wî li pêşiyê, bi rawestaneke pir qehîm, bi rêz û rêzdariyeke mezin û bi heyecaneke bêsinor, wî şewqa nîşanên hesinî ku di destê kumandar de bûn, dît. Nîşan, yên wî bûn! Belê, wext hatibû, kumandar ê nîşan bi herdu milên wî ve kira. Paşê? Piştî wê kurte-demê, tiştêkî zêde nayê bîra Baz. Ji coş û heyecanê, êdî, çavên wî tu tişt nedîtin, êdî bala wî ne li ser tiştêkî bû. Nîşan pê ve bûbûn û ew bûbû zabit...

Trêna kevn, gemarî ya leşkerî, giran giran, bi dengên xwe yên taybetî, dere. Deşt, ji mêj ve ye ku li pey maye. Çend deştên din, erd û zeviyên din, dar û dahlên din, deverên çiyayî û rêzeçiyayên

din, av û çemên din, lehî û sîlavên din, ziving û gundên din, bajar û qesebeyên din li pey mane. Wext çûye, saet çûne, dan çûne. Rêwî gihîştine dawîya danê êvarê. Trê n gihîştiye ser tixûbên Welatê Çîyan ku bi çemekî fetloke vediguheze ser welatekî din ê cîran ê Welatê Mezin. Ew, niha, Welatê Çîyan jî li pey xwe dihêlin û di nav erdên Welatê Mezin de, ber bi jêr, ber bi başûr, ber bi welatên deşt û çolê derin. Welatê sar li pey e, welatê germ li pêş. Roj diçe ava. Dinya, hawîrdor, di nav rengekî çikî sor de, hêdîka, paralelî trê nê, diherike û dere. Keriye kî xezal û karxezalan, hinekî ji trê nê dûr, li ber devê daristanekê diçêrin. Gava ew trê nê dibinûn, bi lez, direvin û di nav daristanê de winda dibin. Di jor re, çend refên teyran, ji aliyê başûr ê trê nê ber bi aliyê bakur, cihê ku rêwî jê tèn, difirin û derin. Li dûr, li ber lingên zinarekî hespin, stûyê wan ê reş, spî û belek ber bi jêr, digerin. Û pişti kêliyêkê, ji hespan hinekî dûr, li aliyê çepê yê trê nê gundek dixuye. Gundekî neçar, kavi l, xaniyên wî ji kevirên gome lêbûyî. Ji bixêriyên hin xaniyan dûman radibe. Hîç kesekî ji gund der nakeve ber deriyê xwe û li trê na ku di ber gundê wan re derbas dibe, nanihêre. Haya wan ji koça însanên Welatê Çîyan nîn e. Koça însanên Welatê Çîyan bala wan nakişîne. Ew li gundê xwe ne, koçber jî li wagonên xwe.

Leşkerên nobedar ên wagona sisiyan, li her çar aliyên wagonê, çira vexistine. Ronahiya çiran, tevî ronahiya qels a dawin a tava ku li derve, li pişt a zinar û daristanan, winda dibe, şewqekê direşîne nava wagonê. Baz, li ber derî, li ser du kursiyên, paldayî, rûniştîye. Kursiyên wagonê ku textûn in, hişk in. Lê Baz, ji bo xwe, çare dîtiye; leşkeran du mînder danîne ser kursiyên Baz.

Şeniyên wagonê aciz in; cihê wan teng, hişk, û nerehet e; birçî ne, tî ne, westiyayî ne. Û ew hê jî nizanin ka ew ber bi kû de derin. Ji niha ve, bêhn, bêhna cixarê, bêhna vereşanê, bêhna xwîdana wan û gû û mîza zarokên wan ên berşîr ketiye ser wagonê. Hilmeke giran a bêhnbed wagon vegirtiye. Bêhna wan diçike. Pencereyên fireh ên wagonê, qehîm lehîmkirî, girtî ne. Herdu

deriyên wagonê ku nobedar li ber in, girtî ne. Bi tenê deriyê pêş ku Baz li kêlekê rûniştiye, carina, gava pir pêwist be, vedibe. Her der girtî ye; dor li girtiyan hatiye girtin. Xwelivandin, razan, paldan, rabûn, çûyin ne mumkin e. Ew dikarin, bi tenê, carekê, herin avdestxana trêne, -bêguman di bin çavênîya leşkeran de. Lingên pîrejînekê werimîne. Yekî ku kul û qînorên wî hene di navbera herdu aliyên wagonê de dirêjbûye, tevî ku leşker hewl didin, ji erdê ranabe. Zarok digirîn. Diyên wan, bi zimanê xwe, wan dilorînin. Kal û pîr, bi zimanê xwe, pite pitê dikin. Yekî xort, mîna ku tiştekî ne xema wî ye, mîna ku ew naçe sirgûnê û ne di nav vê wagonê de ye, her, bi zimanê xwe, hêdfika, distirê. Ev rêwîtiya nediya ê heta kengî, heta kû dewam bike? Welat, ev Welatê Mezin ku têra herkesî dike, çima weha ye, çima weha hertim aloz e, mîna ku bi zêzê ketibe, dere û tê? Çima ev welat nikare mîna van çiya, zinar, gir, gelî, dahl, daristan, gol, çem, deşt, erd, zevî, çol û kepiran, sakîn be, aram be, di cihê xwe de qehûm be, nekeve ber pêlên ba û bahozên civakî û siyasî? Sebeb çi ye? Sebeb kî ye? Ev leşkerên hanê? Ev zabîte xort ku li kêleka derî, bi pozbilindî, rûniştiye? General? Ordî? Qralê ku hate kuştin? Xelkên welêt? Ewana bi xwe? Kî? Kî?.. Heye ku ne tu kes. Heye ku ev hemû mûsîbet, bi tenê, qeder e, qedera wan e.

Êvar dadikeve. Tav dere, stêr derdikevin, yek bi yek, li vir, li wir, esmanan dineqîşînin. Ew, piştî wan, hestiyê wan ê qorikê, êşiyayî, li hev, li zarokên xwe yên razayî û li stêrên ku li dûr, gelekî dûr geş dibin, dinihêrin. Ma ev stêr, ne stêrên wan in? Ne stêrên zozan, gelî, çiya û newalên wan in? Niha çavê wan li stêran, ew ji zozan, gelî, çiya û newalên xwe bi dûr dikevin. Bi qasî dûrahiya stêran, ew dûr in niha û trêna ku bi xuşe xuş dere, wan hûn dûrtir dike. Ew ê kengî vegezin nava wan bêhnên nas ên zozan, gelî, çiya û newalan? Ew pê nizanin. Zabîte û leşker nabêjin. Kes, tu kes pê nizane. Lê ew derin, li ser rîya hesînî ya nediya, bêyî zanîna roj, wext û dewra vegeze, ew derin. Stêr, nebixêrên stêran dilê wan diguvişînin, mal û warên wan tînin

bîra wan; ağırlê sor ê tifikên wan, ava lehiyên wan, berfa spî ya çiyayên wan, hewa paqij a gund û zozanên wan, dûmana çay-xane û meyخانen wan û hilma şehwetê ya şevên wan ên stêrtijî tînin bîra wan. Û ne bi tenê evçend, stêrên bêdeng, aram û tenê qedera wan tînin bîra wan.

Xwarin tê, –eger meriv bikaribe jê re bibêje xwarin. Ji bilî hin tiştên sivik ku bi wan re bû, wan qet tişteke nexwarine. Niha leşker xwarin didin wan; serê merivî pariyekî nanê hişk, deh lib zeytûn û di nav taseke biçûk a bafûn de hinekî çay ku êdî sar bûye. Û leşker tembûh li wan dikin; wan tevdîr divê, heta taştê êdî tu xwarin nûn e. Ew çi bibêjin? Hîç, hîç tişteke. Bi hatina nan û zeytûnê re gotinên wan, dengê wan, pite pit û xirecirên wan, kuxik û xire xira wan tê birîn. Nan, nan e, çi germ çi sar, çi nerm çi hişk.

Baz, ku lingê xwe yê rastê yê tevizî, dilivîne, bi dîqet, li van merivan dinîhêre, li tevgerên wan, nanxwarina wan, rû û rûçikên wan dinîhêre. Ma ev merivên neçar, belengaz ku hê nizanin nan bixwin, bi çi cesaretî, dixwazin li hember dewletê rabin? Bi çi zanîn, hêz û quwetê, ev ê gotina dewletê bi cih neyinin û doza tiştên din bikin? Ma van hê zanîn, hêz û quweta dewletê fahm nekirine? Ma ev nizanin ku dewlet, ordî dikare wan, hebûn û heyinên wan, mal û mulk, war û welatê wan, bi leza birûskê, bi carekê, hilweşîne, bi erdê ve bike yek? Ma van ji tecrubên xwe jî ders dernexistine? Çendîn caran serê wan hatiye hinciqandin. Ma haya wan ji wan dersan jî nûn e? Ev reben û nezanên hanê kî ne ku dev davêjin yekîtiya welat, millet û dewletê? Baz divê wan binase, pir baş binase. Wî ev merivên ku ji rê derketine, hatine xapandin û bûne leyîstokên dijminên derve hîç nedîtine, di hemû jiyana xwe de, ne carekê hatiye deverên wan, ne ji wan kesekî nas kiriye. Lê wî li ser wan, alozî, teşqe le û xirecirên wan gelek tişt xwendine. Di Akademiyê de qal û behs hertim li ser wan û kesên mîna wan bûn. Ev jî perçeyekî wan dersên ku li ser yekîtiya welat û dewletê, dijmin û dijminahiyê, şer û parastinê

bûn. Ma ev merivên hanê, jixwe, ne yek ji sebebên hatina General Serdar û ordiyê bûn? Ma ev jî ne di nava wan dek û dolabên ku li hember dewletê dihatin gerandin, bûn ku generalan her behs dikirin? Niha ew derin. Heq û musteheqê wan e. Ders divê, terbiye divê. Tirs û dûzan divê. Pergal divê.

Baz, ji pencerê, li der dinihêre; heyv derdikeve. Heyva ku di şevên wî yên tenê de, hertim heval û hogira wî bû, niha, di vê rêwîtiya dirêj de jî dibe hevala wî. Hevaleke evçend dilsoz ku di her rewş, her hîsiyat, her cih û hertim pê re ye. Baz li dosta xwe ya sadiq ku niha di nav stêran de diçirise, bi germahî, dinihêre. Ev xweşikî, bedewî û ev dûrî, bihîstiyarî û zîziya ku ji dûriyê tê pê! "Eynî mîna şûrekî xwar û tûj ê ji kalanan kişandî", Baz, bala wî ya westiyayî li derve, difikire, "şûrekî tûj ku jê şewq radibe, ku hîsên rêz û rêzdarî, saw û tirs, serîdanîn û hurmetê tîne pê, ku nîşana quwet û qudretê, heq û edaletê ye..." Di nav hemû stêrên zêrhêlî de, heyv, aram, giran, zelal, vekîşiyayî, ji hemû stêran mezintir, bedewtir û xurttir, dibiriqe. Heyv; ronahiya şevên nerm û germ; serdara stêran, tarîfî û şevan; rêbera rêwingan, koçberan, kumandar û serdaran; nobedara dahl û daristan, zinar û çiya, deşt û gund, civat û bajar, însaniyet û însanan; şewqa Welatê Mezin ê bêdawîn ku wê her û her li ser lingan be, bimîne û xurt be. Heyv; li wir, li dûr; evçend bêdeng, evçend pêjnê xurt ê dangan, -ku di dil û hişê merivan de tîne pê.

Laşê Baz sist dibe, çavên wî tên girtin.

Lê trêna dere, cografya fireh a bêser û bêber, tabiyata bêdawîn, navçe û herêmên Welatê Mezin dide ber xwe, giran giran, dere. Êvar dibe şev, şev dibe sibe, sibe dibe nîvro, nîvro diqulipe ser danê êvarê, trêna, her, bi xuşe xuş, bi kufe kuf, dere. Hawa sar a Welatê Çiyan diqulipe ser hawa hênîk a navçeyên nû yên Welatê Mezin, hawa hênîk diqulipe ser hawa nerm, hawa nerm diqulipe ser hawa germ û hawa germ jî ser kelîjana germahiyê, lê trêna dûmana xwe li pey xwe berdide, diherike û dere. "Trêno, malkambaxo, ho trêno, riya te ber bi kû ye, lo trêno..." Niha, di vî danê

êvarê yê dudiyan ê rêwîtiyê de, ku tav, dîsan, bi rengêkî helesor ê aram û bêqusûr, dere ava, xortê ku bi zimanê xwe yê kevnar ê bav û kalan, hertim, stran digotin, bi şêwe û awazê bav û kalan, strana trêne dibêje, "azar û êşa dilê mîno, trêno, stûxwarî û rebeniya mîno, trêno, de bibêje, ez ketime bextê te, bibêje..."

Koçber aciz in. Ne taqeta wan, ne sebra wan maye, ne jî daxwaza xeberdan û qisê. Ji xortê dengbêj, çend kal û pîrên ku dinan li zarokên wan pê ve, deng, hew ji kesî derdikeve. Rûyên wan ên qemerî ku bi tîrêjên dawîn ên tavê ku xwe di pencereyên fireh re digihînin hundir, dibiriqin, di nava xwîdanê de ne. Dilopên xwîdanê li ser enî, cênîk û stûyên wan dibiriqin. Rû jar bûne, laş sist bûne, beden tevîzî ne. Û zik birçî ne. Lê ya herî dijwar, herî kambax, gewrî tî ne. Tî, pir tî. Heta niha, di hemû dirêjahiya rêwîtiyê de, wan, her yekî ji wan, bi tenê du tas av vexwarine. Taseke nû jî, dê, piştî bîskekê were. Lê ne tas, sitil û dewl jî nikare tîna wan bişkîne. Lêv, ziman û gewriyên wan zuwa ne. Êdî xwezî jî nemaye ku pê gewriya xwe, hînekî, şil bikin. Av, tasek av, dilopek av, çilkek av... Av... Dinya dişewite, hundirê wagonê dikizire. Wan cil û bergên germ ji xwe kirine, tiştên zêde, yek bi yek, ji xwe kirine, hema çi bigire bi tena kiras mane. Lê germ e, zahf germ. Êdî ne bilindahî û zinarek, zevî û deviyek, ne dar û dahlek ne jî av û çemek, li der û doran dixuye. Bi tenê erdekî qiraç ê boz ku leylan dide, dixuye. Av, ka ew ava co û gol, çem û lehiyên wan ên boş? Ka ew ava hênîk a kanî, rûbar û çîqên wan, ka dengê wan? Av, bi qasî kulmekê, mistekê... ji ava mend, pingav... ji çi dibe bila bibe, hînekî av... Ew însanên zînde yên çiyayî, niha, sist bûne, mîna ku li ber mirinê bin, hema çi bigire ji xwe ve çûne. Ji dengê nale nalê û ji dengê tewş ê stranê pê ve deng dernakeve; ew bûne mirîzindî.

Baz, li pê, li ber derî, lingên xwe dihejîne. Wî jî çakê tênik ê leşkerî daniye, bişkokên gomlegê xwe yê hakî ku hertim girtî ne, heta sîngê, vekirine. Dilopên xwîdanê di nav pirçên reş ên sîngê re, ber bi jêr dibin. Binçengê wî, berzikê wî, navranê wî, ji

xwîdanê, şil bûne. Baz aciz e, ji germê, hewa giran û gemarî ya wagonê, ji van însanên bêkêr û bêpergal, ji dengê wî xortê keleş, ji zimanê van ê hîç û pûç, aciz e. Lê ew nikare aciziya xwe diyar bike. Nabe, ne li gora ûsilên kargerandin û berpirsiyarê ye. Lê Baz bi wan re napeyive, têkilî wan nabe, nakeve nava wan, bi tenê, ji ber devê derî, bi lêhûrbûn û kûrahî, li wan hûr dibe. Belê, Baz ê xwe bigihîne kûrahiya dilê wan û têbigihê ka di kûrahiya tarî ya dilê wan de çi heye.

Yek ji wan ku li koşa herî dawîn a wagonê rûniştiye, ji cihê xwe radibe, tê û bi rêzdarî, herdu destên wî li ser hev, li ber Baz disekine. Baz xwîdana eniya xwe paqij dike, bêdeng, li vî zilamê dirêj, zirav, çavgir û simbêlzirav dinihêre. Ji zilamê ku hinekî stûyê xwe xwar kiriye, deng dernakeve, welê radiweste. Baz, bi esebiyet, "çi ye" dibêje. Zilam hinekî xwe dide hev, bi şermokî, bi zimanê Baz, "av" dibêje, "tegmenê birêz... hinekî av... ne ji bo min, lê ji bo bermaliya min ku li ber welidandinê ye... ew zahf giran e, bi zarok e, dixewire... îro, sibê... hema piçikekî av..." Gotinên nîvçe yê Zilam bi feraset in, devoka wî jî ne mîna devoka yê din xirab û şelto şehetî ye. Pantolon û gomlegê li ser, rawestana wî diyar dike ku zilam xwenda ye. "Tu, şixulê te çi ye? Çima tu di nav van de yî?" Baz, bi dengê nermtir, jê dipirse.

"Awîqat, awîqatî... Ez nizanim... diyar e, şaşiyek bûye", zilam, di nav xwîdanê de, bêtî ku xwe bilivîne, nîvê gotinan dadigultîne û dibêje û bi lava û minet li Baz dinihêre. Baz, bi çend gotinên kurt, leşkerê kêleka xwe dişîne aliyê aşxanê da ku ew tasek av bîne û zilam jî, bi paş de, dişîne koşê, cihê wî.

Jiyana trê û wagona sisiyan weha zîz ku gav bi gav ber bi mirinê dere, dewam dike, -ta ku em digihin gava dawîn a rêwîtiyê; roja sisiyan, piştî nîvro yê ye. Di ser rêwîtiyê re sê roj û du şev derbas bûne. Kes ji rêwîngan nemirîye, lê kesekî sax jî nemaye. Nîvmirî û bi hemû halet, xusûsiyet û aliyên kesên nîvmirî, ew ji trêne peya dibin. Ew gihîştine dawîya seferê û destpêka jiyana nû ya sirgûnê, gihîştine warê nû yê jiyana wan a welatê

xerîbiyê. Piştî qîrîn, ferman û gotinên zabitan, tiştê yekemîn ku xêrhatinî li wan dike, tav û ronahî ye, şewqa ronahiyê ye. Her der tav e, dinya di nav tavê de gêr dibe, hawîrdor di nav gere-mola tavê de ye. Şewqeke pir xurt nedîtî çavên wan digire. Piştî çendêke dirêj, ew dikarin çavên xwe, hêdîka vekin û li dora xwe, li warê xwe yê nû binihêrin. Ew li dora xwe dinihêrin, vedige-rin li hev dinihêrin û dîsan li hawîrdor dinihêrin û germahiyeke boş bi bedena wan dikeve. Bedena wan diheje, dil û mêjiyê wan diguvişe û kal û pîrên wan, li ser çogan, ditewirin erdê. Na, ne erdê, ser qûmê.

Belê, qûmê. Qûm, xîz, bi tenê qûm û xîz. Heta ku çav dibîne, esman dixuye qûm e, bi tenê qûm e. Qûmeke zer ku wan hîç nedîtîye. Qûmeke germ a sinorî ku wan bi tenê di çîrokan de bihîstine. Çoleke bêdawîn li ber wan leylan dide. Ne ax, hêşî-nahî, zevî, bax, bexçe, bostan, ne jî dar, devî, reh û rêç. Ne gol, çem, rûbar, lehî, co, lîç, kahnû û bîr, ne jî derya. Na, hîç tiştek, jî qûmê pê ve, hîç tiştek nîn e; ev hemû tiştên ku ew pê re, tê de hatine dinê, mezin bûne, nîn in. Ev hemû, li welatê wan mane. Siya kelehên kevnare ku li gopikên zinaran û li ber devê çeman lêbûbûn, dahlde û stariya ziving û şikeftên wan ên di kûrahiyên newal û geliyan de, hênikahiya zozanên wan ên bilind ên hêşîn ku bi konên wan ên reş dineqîşîn, hizûra ziyaretgahên wan ên dînî ku ji hezaran salan mabûn, firehiya pîrên wan ên dîrokî ku li ser ava çem û lehiyan, riyên welatê bêbihur bi hev ve digihan-din, li dûr, pir dûr mane. Ruh û canê wan, jiyana wan li welatê wan maye. Ew hatine welatê çol û qûmê. Ew niha fam dikin; ew sirgûnî welatê boş ê windabûnê bûne, —da ku tê de winda bibin. Naxwe, ev welatê ku bi tenê ji qûmê hatiye pê, ev germahiya ku ne tenê laş û beden, ruh û mêji jî dikizirîne, ev ronahiya ku ne mûna ronahiya wan e û bi tîrêjên xwe hîs û hestên merivan diku-je, dê bibe welatê wan ê nû, bibe welatê wan ê tenêti, hilweşîn û windabûnê. Ew niha têdigihên; ev welatê bêdeng, bêav, bêsi, bê-dahl, bêjiyan wê bibe welatê wan ê mirinê. Ji kû heta kû! Ji bakur heta vê derê, dawiya Welatê Mezin, dawiya dinya û jiyane!

Çare? Çare nûn e. Ew, welê, hin li ser qûmê, hin li piyan, bi sedan kes, li welatê bêdawîn ê qûmê dinihêrin. Bayekî sivik ê başûr li rûyê wan ê matbûyî dixe. Lê ba jî, ne bayê wan e; germ e, bêhna wan diçikîne. Germahî, germahiya tav, ronahî, qûm û bayê wan dişewitîne, bedena wan, dilê wan dikizirîne, xwîna wan dikelîne û hêz û taqeta wan a dawîn, tafilê, ji wan dibe. Hin jin û pîrejînên wan, li ser qûma şewitî, li ser çogan rûniştî, şaşbûyî, beden û stû xwîdandayî, rû terikî, lêv qelişî, westiyayî, tî, birçî, digirîn û bi zimanê xwe, bi dengekî zîz ê şînan, dinehwirînin, "Çima? Gidiyê qedera bingorî çima?... Ma mirin ne ji vê çêtir bû? Ma me bi saxî bixistana gora sar a welatê zozanan, ne ji vê gora germ baştir bû?.."

Ne însan û mehlûqekî, ne jî teyr û tûrekî. Ji leşker û zabitan pê ve tu tişt, ne li esman ne li ser zemîn naxuye. Leşker û zabit wan, dîsan, qor bi qor, dîkin rêz, peyatî, ji îstasyona dawîn a xirbe a trêne bi dûr dixînin. Di wê germahiya dogehê de, piştî bîskeke, li pey girekî ku ji xîzê hatiye pê, çend darên ku rêwingan di jiyana xwe de nedîtine û baraqe dixuyin. Baraqeyek, dudo, pênc, deh, bîst, pêncî, sed... Û leşker, eger ne bi qasî qûmê be jî leşker, li pêşî, paşî, der û dorên baraqeyên textî dixuyin. Ev baraqe, malên wan ên nû ne. Ew ê li vir, di nav qûma mirî, welatê mirî de, bijîn.

Lê belê di destpêka jiyana mirî de, jiyanekê nû ya zindî heye; yek ji lehengên romana me.

Bi dû hijmartin, teslîmkirin û cîwarbûna koçeran re, dotira rojê, piştî seqema şeva çolê û berî germahiya rojê, berbangê, gava Baz û zabitên din ji baraqeyên zabitan derdikevin da ku bikevin rê û vegerin, Baz li ber deriyê biçûk ê baraqeyekê wî zîlamê simbêlzirav ê awîqat dibîne. Awîqat silav dide Baz. Baz silavê lê vedigerîne, ji koma zabitan hinekî vediqete û ber bi awîqat tê. Bêyî ku tu awireke diyar li ser rûyê wî bixuye, Baz halê awîqat û jina wî dipirse. "Xew neketiye çavê me û xismên me... zarokeke me hate dinê", awîqat, bi rûkenî, dibêje, "ji rehma

xwedê hêvî nayê birîn, meriv nîzane çî li ser riya meriv e... keçikeke me hate dinê..." Baz çî bibêje? Bi tenê li ser bibikên çavê wî çirûskeke kêfxweşiyê, Baz serê xwe dihejîne. "Fermo, were hundir" awîqat, bêyî ku li benda bersîvekê be, dibêje û xwe dide alî da ku Baz bikeve hundir. Hundirê baraqê ku ji mitbax û odeyeke biçûk hatiye pê, ronî ye. Jina awîqat li ser textê ku li koşê ye, dirêj bûye û şîr dide zaroka nûbûyî. Gava çavê wê bi Baz dikeve, ew xwe û dergûşa xwe ber bi aliyê din dike da ku Baz pêşîrên wê nebîne. Awîqat dere ba wê, zarokê, bi hêdîka, jê werdigire, tîne û nîşanî Baz dide.

Baz li zaroka hembêza bavê, heyirî û hinekî şaşbûyî, dinihêre; zarokek, pariyekî can... çavên we yên biçûk hê baş venebûne, rûyê biçûk ê gulover ronî dike, difn mîna difnên kîwroşka dile-rizin, destên wê yên biçûk dilivin, tilî û pêçiyên wê dilîzin, bêh-neke germ, tîrşokî ya taybetî ku Baz hîç lê rast nehatiye, jê difûre. Baz tiliya xwe ya mezin a destê rastê ber bi destê wê dike. Zarok tilî, pihêt, pêdigire û dixwe nava destê xwe yê çepê ku di bazindê de şanikeke biçûk a reş dixuye.

Belê, ev zarok, Kevok e.

Belê, serpêhatiya Kevokê weha dest pê dike.

4. Dawet

Serpêhatiya Kevokê ku ew ê paşê ji bav û diya xwe, bi kitekit, hîn bibe, weha dest pê dike. Bi welatê xerîbî yê mirinê, bi tav û germê, bi qûm û çolê.

Baz; zarokê mirinê.

Kevok; zaroka sirgûnê.

Niha?

Niha jî em vegerin bajarê mezin, paytextê Welatê Mezin, warê General Serdar. Heta niha em li dora serpêhatiyên koman bûn, niha em rûyê xwe ber bi kesan bikin û vegerin dilê welêt û herin Salona Zabitan û hinekî din nêzîkî li Baz bikin. Îro, vê êvara çîksayî ya payizekê, Baz dizewice. Ji navbera wan rojên yekemîn ên cûntayê, koç, çûyin û hatinên germ û îro, bi qasî deh salan derbas bûne. Bazê ku di wan rojan de, mîna tegmen dest bi jiyana zabitiyê kiribû, niha bûye serhengê navdar. Baz bilind bûye, nîşanên wî zêde bûne, hatina wî zêdetir bûye. Û ya herî girîng Baz qismek ji xewn û xeyalên xwe bi cih anîne, yên mane bi cih tîne, di armanc û hedefên xwe yên jîyanê de, pengav bi pengav, bi ser dikeve. Vê êvarê, di Salona Zabitan a paytextê Welatê Mezin de, Baz gaveke nû davêje û dizewice. Bi keçikeye hinekî gulover, porzer, gerdengewher, çavşîn, spehî û rûken re, –ku em jê re bibêjin Xanima Baz. Bi tenê Xanima Baz a porzer.

Êvarê dest pê kiriye. Mêvanên vexwendî ku hema çî bigire hemû zabit û malbatên wan in, hatine. Salona Zabitan a germ di nav ronahiya elektrîkê de dibiriqe. Her aliyê salonê, bi sûret,

kaxizên zêrhêlî, stêrên zîvhêlî hatiye neqîşandin. Orkestra leşkerî ku hertim marşên leşkerî lêdixe, niha, li kêleka pîsta dansê, li musîkeke nerm dixe. Li salona modern, bi qasî çil maseyên fireh û gulover, li gora dûzana dawetê, hatine danîn. Mase, hema çî bigire, tijî bûne. Mêvan, di nav kincên sîvîl ên paqij û nû de, li kêlekên maseyan rûniştine û şîva êvarê dixwin. Zava û bûk, yanî Baz û Xanima Porzer ku niha, piştî bîskeke, gava mehra wan hate birîn, wê bibe xanima Baz, li dora maseyeke biçûktir, li kêleka pîsta dansê, hinekî ji orkestrayê dûr, bi tena serê xwe rûniştine û xwarina xwe dixwin.

Her tiştî temam e, tu kêmanî nûn e. Salona ronî û germ, xwarin û vexwarinên herî baş, baştirîn orkestraya hemû ordiyê, musîkeke nerm û spehî, raxistin û neqşên bedew, pergaleke bi rêk û pêk, mêvanên bijarte yên hemû welêt, ahengeke yekta, germahî û xweşiya kêf, henek û hevaltiyê... her tiştî, vê êvarê, temam e. Bi tenê kêmaniyek heye; General Serdar. General Serdar nehatiye, lê wî xeber şandîye ku ew ê derengê şevê were. General Serdar jî wê were! Baz kêfxweş e. Baz bextewar, serbilind û serfiraz e; bi coş û bi heyecan e. Baz rûpeleke nû ya jiyana xwe vedike. Ew jiyana xwe bi biraziya zabîte simbelqît ku hertim, mîna bavekî, li Baz xwedî derketibû, dike yek. Ji vê êvarê pê ve, êdî nav, bejn û bal, tahm û reng, rabûn û rûniştina yeka din jî dê di nav rûpelên jiyana Baz de hebe. Jiyana wî dê êdî bibe jiyana du kesan.

Taximekî kincên reş li Baz e. Îşligêkî spî û kirawateke sor ê xalxalî lê ye. Solên wî yên nû yên reş dibiriqin. Rûyê wî yê kurkirî dibiriqe. Bîbikên çavên wî yên biçûk dibiriqin. Bûk, di nav cil û bergên çîkî spî yên bûkaniyê de, li kêleka Baz rûniştiye, di bin çavan re, bi ken, li Baz û li der û dorê dinihêre. Umrê wê ne zêdeyî bîst û yek, bîst û duduyan e. Herçî Baz e, gihîştîye sîhan. Destpêka jiyana zabîtiyê, ew rojên xêşimiyê, salên hûnbûnê li pey mane. Niha Baz, zabîtekî zane, têgihîştî, pêbawer û xwedanberpirsiyarî ye. Niha Baz, êdî ne şagirt, lê hoste ye. Û niha, di heyama xwe ya kamil de, Baz dizewice.

Ji kêfxweşî, heyecan û westa çend rojan a haziriya dawetê, Baz nikare şîva li ber xwe bixwe. Ew, carina, tîkeyekî goşt dibe devê xwe, hêdî hêdî dicû û dadiquiltîne, li dora xwe dinihêre û difikire. Kesên ku hatine ezimandin, zabit û kesên girîng ên ordî û dewletê ne. General, amîral, kumandar, serheng, zabitên giregir hatine. Di nav wan de amîr, kumandar û serbazên Baz jî hene. Hatina wan, tiştêkî nîşan dide; Baz bi ser ketiye, bi ser dikeve.

Li jorê pîsta dansê, li ser orkestrayê, bi herfên mezin û zer li ser cawekî sor ê fireh û dirêj, "pîroz be" hatiye nivîsîn. Belê, pîroz be... lawikê sêwî, kesê bêkes, pîroz be, Baz difikire. Ev gotin nîşan didin ku Baz tê hezkirin, Baz, endamekî bijarte yê malbata mezin, yanî ordiyê ye. Û di ser cawê sor û zer re jî wêneyekî mezin ê General Serdar ku bi destê resamekî hatiye çêkirin, hîlawestî ye. General Serdar, ji wir, bi çavên xwe yên nêrevanan, bi awirê xwe yê tûj, bi simbêlen xwe yên boq, li salonê û Baz dinihêre. General Serdar; welatparêzê herî mezin, xelaskar û rizgarê welêt; rêber û serdarê welêt; kumandarê mezin, sermiyanê welat, dewlet û millet. General Serdar; bavê manewî yê Baz; stêr û heyva şevên wî, tava rojên wî, rêberê jiyana wî. Û General Serdar ê were û şeref bide wî û daweta wî...

Belê, rûpelekî nû... Baz her tişt kir, her xwesteka xwe bi cih anî, hemû xewn û xeyalên xwe, yek bi yek, li dar xist. Niha rûpelekî nû vedibe. Na, venabe, ya nû li rûpelên ku heta niha hatine jiyîn, zêde dibe. Rûpelê çi? Rûpelên jiyana wî zahf in; rûpelê leşkerî û zabitiyê, rûpelê hevaltî û dostiyê, rûpelê kêf û henekê, rûpelê xwarin û vexwarinê, rûpelê jiyana civakî, rûpelê egidî û mêraniyê... Lê ya nû? Ya nû li çi zêde dibe? Keç û jin, li rûpelê keç û jinan. Li rûpelê herî girîng, herî rengîn a jiyana wî.

Di rojên wî yên tarî yên zarokatî û xortaniyê de, xewn û xeyalên wî, pirtirîn, li ser keç û jinan bûn. Jin, her û her jin. Berî her tiştî dê; dayikeke dilgerm, dilpak û dilbirehm ku hembêza xwe jê re vekira, bang bikirayê, ew bixista hembêza xwe û di nav pêşîrên xwe de bihewanda. Wî, hîs, hiş, dil, mêjî û jiyana wî da-

yikek diviya. Paşê jî xwehek, hekek, hevalek, yarek, hezkarek. Lê jin. Ji bo wî, ji bo mêraniya wî ya ku hişyar dibû, jiyana wî ya mêr, dinya wî ya mêr jin diviya. Ew salên wî yên Akademiya Leşkerî, yekcar, salên şewat û xezebê yên xeyalên keç û jinan bûn; salên xedar ên hişyarbûna bedenê, salên daxwazên bêpayan ên keç û jinan bûn. Belê, ew sal, salên serfirazî, serbilindahî û biserketînê bûn jî. Baz, di wan salan de bû Baz. Wan salan riya îro, vê êvarê, li ber wî vekir. Lê li milê din jî, şevên dirêj ên bêhejmar ên wan salan nedihatîni kişandin. Her şeveke, bi serê xwe, jiyaneke dojehê bû. Ew şev, ew şevên sar ên tenêtiyê. Umrekî ciwan, bedeneke xort û ew şevên tarî û vala. Jiyana Akademiyê, der û dora Baz û şevên wî, bi tenê, ya mêran bûn. Hevalên wî, xwendevanên ku pê re dixwendin, serzabitên wî, mamoste û kumandarên wî, aşxane, dersxane, serşok, salona razanê, hemû, mêr bûn, ji her derî, bi tenê bêhna mêran dihat. Lê wî jin diviya, jin, jin...

Baz bi xeyalên jinan dikete xew, bi xewnên jinan hişyar dibû; porê wan ê dirêj, rûyê wan ê vekirî, çavên wan ên nerm û germ, lêvên wan ên ku ji şekirên hemû cîhanê şîrîntir, gerdena wan, stûyê wan ê dirêj, pêşîr û memikên wan, sermemikên wan ên qahweyî, celebên pêşîran; mezin, biçûk, daketî, vekişiyayî, gulover, zik û berzikê wan, berzik; daristaneke biçûk ku şeqên mîna kevanê vekişiyayî dineqîşandin, der û dorên qelîşekan dixemilandin, reşahiya berzikê, navenda xewn û xeyalên Baz, cihê ku fantazyên Baz tê de winda dibûn, warê tarî ku Baz bi hesreta wî dimirî, hêtên gulover, şeqên mîna sitûn û bedenên jinan ên nerm û gewher... ev hemû aliyên wan ên spehî ku şox û şengên jiyana însanî bûn. Ewana; jin. Jin; hebûna Baz, jiyana Baz. Baz li wan difikirî, her û her, li her cih û warî. Nemaze, êvaran, nîvê şevan. Destê wî di nav şeqên wî de, tilî li ser "serbilindahiya wî", çavên wî girtî, ew li şeqên cûre cûr ên jinan difikirî. Wî şeq ji hev dikişîn, li navenda şeqan dinihêrî û paşê dikete navê, pêşî bi qasî tiliyekê, paşê bi qasî bostekê, paşê ew bi xwe hemû bedena wî, hemû hebûna wî. Û hingî dest û tiliyên wî şil dibûn, aveke tîr di

nav tilî û pêçiyên wî re diherikî. Carekê, du caran, sê caran, carina çar caran. Berî razanê, berî rabûnê, di serşokê de, li avdest-xanan, li her cihê ku wî keys didît. Gav bi gav hemû Akademî bi avika wî ya bêdawîn dihate avdan.

Piştî Akademiyê û salên xwendinê, rê li Baz vebû ku ew hemû xewn, xeyal û fantaziyên xwe bi cih bîne. Edî wext, wexta ceribandîn, tamandin û jiyînê bû. Wî êdî dikaribû serê hespê fantaziyên xwe berde û di meydana şehwetê de xar bide. Wî welê kir; keç nasîn, jin nasîn, beden nasîn, texlîd bi texlîd daristanên tarî nasîn, celebên memik, qelîşek û qul nasîn; çav û lêv nasîn; deng, axîn û nalînên şehwetê yên têkel nasîn. Şevên wî yên şewat û xezeba dojhê qulipîn ser şevên hênîk ên bihuştê. Tenêti xelas bû. Şev, hew sar û tenê bûn. Hertim, her car, gava Baz bixwesta, wî dikaribû ji nav çar, pênc, şeş keç û jinan yekê hilbijêre û bang wê bike. Li her alî û taxên paytextê ku Baz li wir, li Qerargaha Bilind a Ordîyê dixebitî, hevalên wî yên jin hebûn. Niha, gava ew tîkeyeke goşt di devê xwe de dicû û qedeha xwe ya cîn-tonîkê dibe devê xwe û li jina xwe ya rojên bê dinîhêre, ew li wan dost û hevalên xwe yên rojên rabirdû difikire.

Keçikeke porzer a xwendevan hebû. Dirêj, xama, lihevhatî û çavgir. Gava keçik, danê êvarê, ji unîwersîtê derdiket, Baz, li wir, bi kincên leşkerî, li ber deriyê gelekî mezin ê unîwersîtê, li benda wê bû. Keçik dikete otomobîla sîvîl a Baz û ew, hêdî hêdî, bi hev re ber bi mala Baz diçûn. Mala Baz li kêleka çemê mezin ê ku di bajêr re diherikî, li devereke leşkerî bû. Apartimanên sîteya leşkerî bi donzdeh qatan lê bûbûn û qata apartimana ku Baz lê dijiya, qata yanzdehan bû. Ji wir hemû bajar, çemê nazenîn ku bi şewqên şevê dibiriqî, otomobîlên cade û kolanan, lampayên bêhejmar ên bajêr, hemû, dixuyan. Baz keçik, heftê du caran, didît. Her cara ku wî keçik didît, jê re derpê û kirasên hewrîşim yên neqîşandî dikirîn. Gava ew digihîştin malê, Baz demanç a xwe ya baretta û kincên xwe yên leşkerî ji xwe dikirin, cil û bergên keçikê jê dikirin, ew tazî dikir û bi destê xwe, derpê

û kirasên nû lê dikirin û paşê wan, bi votka yan jî cîn-tonîkê, dest bi êvarê dikirin. Di wan şevan de, kêfa Baz bêpayan bû; wî cil û berg ji keçîkê dikirin, kiras û derpê jê dikirin û ew tazî dikir û lê dinihêrî, bi dedîqeyan, bi saetan. Vê yekê kela Baz radikir, kêfxweşî û şehweteke nedîtî didayê û bi wê kêfxweşiyê, wî, bedena keçîkê, sir û sêrên bedena wê, ji nû ve, keşf dikir. Car bi car, bi kêliyên dirêj. Û Baz, bi avika xwe ya tîr, keçîk, sir û sêrên wê yên veşartî û hemû bedena wê av dida.

Rojekê jî Baz li vê salona ku ew niha tê de bûn, jînikeke navsal a hinekî reşik nasî. Jinik, tevî hinên din, li maseyeke dûr rûdinişt. Danê êvarê bû, Baz ji kar derketibû, li wir, bi tena serê xwe, li ber pencera mezin a aliyê bexçe rûniştibû, li darên bexçe dinihêrî û votkayeke sar a bi leymon vedixwar. Welê dixuya ku jînikê, beriya wî, ew dîtibû. Ji ber ku gava çavê wî bi jînikê ket, çavên jînikê yên kilkirî lê bûn. Bi awireke heweskar, bi çavên kentijî û nêrineke dawetkar. Bazê ku serê hespê xwe berdabû û li pey nêçîrê bû, ev fersend nerevand. Dûmahîka wê nêrînê diyar bû; ew bûn heval. Jinik, hosteya şixulê xwe bû, di şevên zêrhêlî yên payitexta Welatê Mezin de, dest, tilî û zimanê jînikê hemû bedena Baz a xêşîm, dest bi dest, bost bi bost, terbiye kir. Tiliyên jînikê bûn merhem, zimanê wê bû derman û bedena wê ya hinekî gulover bû kaniya nalîna şehwetê. Bazê ku hê di hûnera hez û hezkirinê de şagirt bû, bi henek û listikên jîna zane û xwedantecrube, di demeke kurt de, bû hoste. Belê, jînikê bi karê xwe dizanîbû; wê Baz, hemû bedena wî, can û ruhê wî radikêşand hundirê xwe û bernedida çilkeke avika Baz vala here. Bazê ku hertim der û dor av dida, êdî bûbû hêsîrê jînikê: Jinikê hemû avika wî dadiqultand. Pêşî wan heftê carekê hevûdu didîtin, paşê bû du caran, paşê sisê û demekê hat, êdî jînik, hema çi bigire, her şev dihate mala Baz. Gava dengê zîlê du caran, tîz, li ser hev, lêdiket, hingî Baz dizanibû ku jînik li ber derî ye. "Ez hatim zabîte xwe yê çeleng bixwim", wê digot û bîyî gotinên zêde, dest bi karê xwe dikir. Bi dû demekê re, jînikê hevaleke xwe ku

hinekî jê kintir û qelewtir bû, bi xwe re anî. Êvarekê, gava Baz deriyê malê vekir, du jin li ber derî bûn. "Em hatin zabitê xwe yê çeleng bixwin" jinikê got û herdu ketin hundir. Ew bûn du jin. Du jinên ku bi kar û şixulê xwe dizanîbûn. Tu îtirazên Baz ji vê yekê re nûn bû; wî xwe û bedena xwe teslîmî tilî, dest û zimanên jinên hunermend dikir. Ew di hembêza jinan de, ji xwe ve diçû û diket nav xewa kûr. Piştî salek û nîvê, gava Baz, bi hênceta hin karên nehînî, çû Welatê Derya yê Welatê Mezin, Baz ji xewa nerm, germ û kûr hişyar bû. Lê xew, ne xirab bû, ji berevajiyê, mîna vê êvarê, xeweke geş bû!

Carekê jî, Baz, dîsa, keçikeke bejndirêj û xwende nas kir. Keçika esmer û xweşlihevhatî ji Welatê Çiyan bû û tevî ku ew xwende bû, pir baş bi zimanê Baz nizanîbû û bi devokeke jihevketî dipeyivî. Lê stranên wê gelekî xweş bûn. Ew di nav cihê perege de yê Baz de, tazî, rûdinişt û ji Baz re stran digotin. Baz jî geh cixare, geh qedeha votkayê di destan de, geh di hembêza wê de, geh li ser cihan dirêjbûyî, lê guhdarî dikir. Stranên hêsan, şên û geş ew kêfxweş dikir. Keçik neçar bû, bi bûrseke dewletê dixwend. Loma jî Baz, carina, perene hindik dida keçikê. Di demeke kurt de, keçik, bi her awayî, bi her tiştê xwe, bi Baz ve hate girêdan. Baz her tiştê ku wî dixwest, difikirî, xeyal dikir, bi keçikê re dikir. Tiştê ku Baz herî zêde jê hez dikir, girêdana keçikê bû. Baz ew carina dernixûn, carina serpiştê, tazî, radizand, dest û piyên wê, bi hesinên koşeyên textê razanê ve girêdida û pê her tişt dikir. Piştî demekê, keçik bi xwe jî hûnî vê leyistokê bû, êdî keçik bi xwe diçû oda razanê, xwe tazî dikir, li ser textê Baz dirêj dibû, destên xwe dirêj dikir û li hêviya Baz disekinî.

Ev macera hanê jî bi qasî salekê dewam kir, -ta ku keçik ji ber neçariyê, dev ji xwendinê berda û vegeriya welatê xwe.

Keç û jin... hûn çendîn keç û jinên din...

Lê di nav wan hemûyan de ya herî dildar, qîmetdar û hêja, ya kexana paytextê bû. Baz jê re digot "Mader." Mader; qelew, gulover, dirêj û pêşîrmezin. Hêtfireh, nuktedan û germ. Û nerm

û kûr. Hertim çav, lêv û dev boyaxkirî. Destpêka sala yekemîn a Akademiyê, dawiya hefteyekê, gava Baz û hevalên wî yên Akademiyê, derketin bajêr, Baz li kerxanê Mader nas kir. Baz û hevalên wîbi kincên resmî derketibûn bajêr. Ne kincên sivîl ên Baz hebûn ne jî pereyên wî yên pir. Lê hevalekî wî ku kurê zabitekî nas bû, hertim digihîşt hawara wî. Ew bi hev re diçûn mala hevalê wî. Li wir wan kincên sivîl li xwe dikirin û hingî dadiketin bajêr. Kincên hevalê Baz li Baz dihatin. Wi kincên hevalê xwe, ji bo rojekê, li xwe dikir û derdiket keşfên nû yên li bajêr.

Hingî, rojek ji wan rojên tatîlê, Baz Mader keşf kir. Na, ne Baz, lê Maderê Baz keşf kir. Baz û hevalê wî, bi hev re, çûbûn cihê ku wan her cara ku dadiketin bajêr, ziyaret dikirin; kerxane. Mader li ber deriyekî rawestiyabû û li şênîyên ku ji ber derî re diçûn û dihatin, dinihêrî. Gava çavê wê bi Baz ket, tafîlê wê bang Baz kir. Baz pê re çû oda Maderê ya biçûk ku di nav hilmeke giran de bû. Destpêka pêwendiya wan a dirêj weha hate pê. Roj bi roj, hefte bi hefte, Baz bi Maderê ve hate girêdan. Piştî ku Baz çîroka jiyana xwe, bi qasî ku wî pê dizanîbû, ji Maderê re, bi detay, got, Mader jê re bû jin, bû dost, bû heval, bû hogir û bû dê. Maderê êdî digot, "were, lawê min ê sêwî yê çeleng" û Baz dikişand ser xwe, serê wî dikir nav memikên xwe û bedena wî diguvişand. Carina, piştî coşa hezkirinê, bi qasî kêliyekê, Baz li oda Maderê ku bi lampayên loş ên sor hinekî ronî dibû û jê hertim bêhna parfumên erzan, xwîdan û hezkirinê dihat, di hem-bêza Maderê de, (carina jî di nav şeqan de) di xew re diçû. Ew kêliyên xewê, ji bo Baz, kurte-demên bihuştê bûn. Mîna çivîkeke biçûk ku nû, sakîn, bêperwaz û sivik, bi firê bikeve, Baz dikete nava xeweke hênîk a sivik. Ew bîhna mîz, avik, xwîdan û hezkirinê mîna bêhna misk û emberê bi difnê Baz diket. Piştî demekê Maderê hew pere ji Baz girtin. Dawiya dawîn jî wê dest pê kir û pere dane Baz. Yar, dost, heval, jin û diya ku Baz li pey bû, wî li kerxana paytextê Welatê Mezin peyda kir. Û ji roja yekemîn heta vê êvarê, pêwendiya wan a germ û jidil dewam dike û ew ê her û

her dewam bike. Hemû jinên ku Baz nasîbûn li milekî, Mader li milekî. Mader; hevala sêwiyan, yara kesên tenê, pardara siûdên neçar. Di rojên teng de, Mader li Baz xwedî derket. Di rojên ronî de jî Baz ê li Maderê xwedî derkeve.

Tevî ku Baz vê êvarê dizewice.

Jin; jîyan, xwediyên jîyanê, sebeba jîyanê, hebûna jîyanê, garantiya jîyanê. Keç û jinên Baz. Sebebên hebûn û jiyana wî. Tevî ku ew vê êvarê dizewice, keç û jin ê hertim sebebên hebûn û jiyana wî bin.

Baz li dora xwe, xanimên ku vê êvarê hatine, dinihêre. Xanim jî peyayan zêde ne. Xanim jî peyayan zêdetir bala xwe didin ser kêf û henekê, dawet û dîlanê. Xanima Porzer ku niha li kêleka wî rûniştiye, bi ûsûl, çavên xwe kil, lêvên xwe sor kirine. Piştî demekê, îşev, Baz ê van lêvên qelew bike devê xwe û wan bimije. Ev lêv, ev beden, ev keça xama dê ya wî be. Baz dilopên dawîn ên cîn-tonîkê jî vedixwe û hinekî esebî, "xwarina van jî tu carî naqede" dibêje.

"Dawet e", Xanima Porzer, bi ken, dibêje, "şeva kêf û şahiyê ye. Leza te jî bo çî ye?"

Baz jî gotinên wê hinekî eciz dibe, lê dengê xwe nake. Bi destan, ew bang yek jî garsonên ku di navbera maseyan de derin û tên dike û jê cîn-tonîkeke nû dixwaze. Gelo ev gava ku ew niha davêje, di cih de ye? Ev keça ku niha li kêleka wî rûniştiye, dê bikaribe wî fam bike, jê re bibe pişt û bi ya wî bike? Maderê jê re gotibû, "lawê min ê sêwî, baş bifikire, zewac qeyd e, heke carekê lingên te ketinê, hingî jê xelasbûyin, gelekî zehmet e. Baş bifikire." Gelo ew baş fikirîbû? Baz nikare iddîa bike ku ew vê keçika ku li kêlekê rûdine, zahf baş dinase. Belê, keçik biraziya Zabitê Simbêlqît e. Belê, bavê keçikê jî zabit e û keçik bi terbiya leşkeran perwerde bûye. Belê, Baz ew, car bi car, li mala Zabitê Simbêlqît, li vê salonê, li hin der û dorên din dîtiye, pê re bi dirêjahiya saetan peyiviye, gelek caran bi hev re çûne sînemayê, bi gotinên germ nêzîkî lê kiriye, bi destê wê girtiye û ew biriye li park, bex-

çe û parîzên paytextê gerandiye, ew hembêz kiriye, ramûsaye. Keçikê jî jê rû banedaye, ji berevajiyê, bi kêfxweşî, nêzîkî lê kiriye û ew xwestiye. Lê ev têrî zewacê dike?

Zimanê wê yê şêrîn, gotinên wê yên lihevhatî, zanûn û têgihîştina wê, adet û terbiya wê, lixwekirin û bal û bejna wê, rûgeşiya wê, ji kêf û henekê hezkirina wê, ev hemû aliyên wê bi dilê Baz in. Lê li milê din, pesn û fortên wê, maxrûrî û jixwerazîbûna wê, destgirtî û çikosiya wê, hezkirina wê ya mal û milk, zêr û pere û hin aliyên din ên weha ne bi dilê Baz in. Çavê wê hertim li pey mal û milk, zêr û diyariya ne. Her cara ku Baz û wê hevdu dîtine, wê bi tevgerên xwe, bi Baz daye zanûn ku ew diyariyên giranbûha dixwaze. Û her cara ku Baz xwestiye, jê re, behsa kar û şixulê xwe bike, wê babet guhertiye û aniye ser mal, milk, pere, xanî, otomobîl, ger, geşt û seyran, xwarin, vexwarin, lixwekirin, cil û berg, parfum û bêhn. Wê hertim xwestiye bala Baz bikişîne ser van tiştan. Loma, heta niha jî Baz, hertim, xwe dudilî hîs dike. Hertim dilê wî bi sûzenî hildavê, hertim di hişê wî de şik hene. Gelo? Dîsan gelo?

Lê, Zabitê simbêlqît ku pir dixwest ku ev zewac were pê, Baz îkna kir û ew xiste ser rîya zewacê. Evarekê, em ê bibêjin, berî vê êvara zewacê bi qasî şeş mehan, gava Baz, ji bo serdanê, çû mala Zabitê simbêlqît, piştî şîvê, Zabit Baz xewle kir û pê re li ser zewacê peyivî. Gotina dawîn a Zabitê simbêlqît hê niha jî, baş tê bîra Baz; "kurê min, êdî dev ji vê jiyana peregende, jin û keçên serserî berde. Bes e. Ma kê binê wan qul û kûrahiyên tarî yên jinan dîtiye ku tu jî bibînî? Bêbinî ye, dawî nîn e. Bes e. Bizewice, bibe xwedî mal, dezge, dûzan, zarok... û ji bîr meke, di ordiyê de şertê yekemîn ê biserketinê dûzan û disîplîn e, jiyana mal û malbatî ye." Bêguman, gelek sebebên din jî hebûn, lê di biryara Baz de van gotinên dawîn ên Zabitê simbêlqît gelek tesîr kirin.

Baz dizanibû ku Zabitê simbêlqît ku bi xwe kurdunde bû, êdî ji ordiyê teqawît bûbû û tevî jîna xwe ya hurme jiyaneke hêsan û girtî dibuhurand, mîna lawekî xwe, ji Baz hez dikir û gelekî

dixwest ku Baz bi biraziya wî re bizewice. Zabitê simbelqît ku hertim, ji zaroktiyê heta niha, li Baz xwedî derketibû, hertim ew pirsîbû, alîkariya wî kiribû, rê li ber Baz rast kiribû û rîya leşkerî û ordiyê jê re vekiribû, li ber dilê Baz gelekî hêja bû. Baz, bi rêz û rêzdarî, li gotina Zabit guhdarî dikir. Di mesela zewacê de jî wî welê kir; li ser gotinên Zabitê simbelqît fikirî û paşê jî biryara xwe da û herweha ew gihîştin vê êvarê.

Vê êvarê Xanima Porzer di nav cil û bergên bûkantiyê yên spî de, ji her carî zêdetir, balkêş û xweşik dixuye. Rû, ten û bedena wê ya gewr, vê êvarê, di bin şewqa lampayên krîstal de hîn gewrtir dixuye. Hêdîka, ew ji qedeha ber xwe ya şaraba spî vedixwe û gotin bi gotin dipeyive. Ew kêr dipeyive, di jor re li der û dora xwe dinihêre, hertim di navbera wê û kesên din, bûyerên din, pêwendiyên din de mesafe heye. Hertim ferq di navbera wê û der û dorê de heye, mîna ku ew pir paqij, der û dor pir gemarî be. Gava ew dipeyive, hingî gotinên wê, mîna gotinên ayetekê, giran in. Gotinên wê yên bijarte û giran, jî ber awirê wê yê sakîn û sar, nêrîna wê ya maxrûr, tesîr li merivan dike. Lê belê, Baz, leşkerê bêtirs, zabitê mahîr û însanê sebirdar jî bi karê xwe dizane; gava Baz cil û bergên wê jê kirin, ew tazî kir, di nav cihan de, bi dest, tilî û zimanê xwe, bedena wê ya gewher vegirt û xwe gihand kûrahiyên dil û bedena wê, hingî ne ev maxrûrî, mesafe û ferq ê bimîne, ne jî awirê sar û gotinên lihevhatî lê vala û pûç ên giran. Ev keça nazenîn û jixwerazî hê Baz baş nas nake, ev keça zane lê saf ê bibîne ka dinya, jîyan çi ye...

"Noş", Baz qedeha xwe ya nû ber bi qedeha wê dike û dibêje, "noş ji bo te, me, zewaca me û jiyana me..." Xanima Porzer, bi kêfxweşî dibêje "noş", bi zanîn, dest û piyên xwe ji normalê zêdetir li ba dike da ku zêr û zînetên dest, pî û gerdenê şewqê bidin û hêdîka, hemû şaraba qedehê vedixwe.

Xwarin qediyaye, tevgerêke piştî xwarinê ketiye nav salonê, şênîyên maseyan radibin, derin û tên. Orkestra niha musîkeke hîn xurttir lêdixe. Mêr û jinane ciwan rabûne, li pîsta dansê,

hêdîka xwe dilivînin. Garson di navbera maseyan de dilezînin û vexwarinên têkel bi mêvanan digihînin. Di nav çûyin û hatina mêvanan de komek însan ber bi maseya Baz û Xanima Porzer tên. Zabitê simbelqît, jina wî, bav û diya Xanima Porzer û çend kesên din. Gava Zabitê simbelqît û koma wî digihin masê, "êdî wext hat", ew, bi rûyekî kentijî û geşbîn, dibêje, "walî, serekê belediyê hatine, mehra we dê bê birîn..." Baz û Xanima Porzer ji cihê xwe radibin û berî ku Baz bikeve milê Xanimê, Zabitê simbelqît dilezîne, tê navbera wan, dikeve milên wan û wan ber bi aliyê din ê pîsta dansê dibe. Mehra wan ê li wir, li kêleka maseyê gelekî dirêj, tevî mêvan û şahidan bête birîn.

Şahidê zewacê yê Baz, Zabitê simbelqît, mamê Xanima Porzer e. Yê Xanimê jî waliyê leşkerî yê paytextê welêt e. Ew hemû li wir, yek bi yek, hevdu hembêz û pîroz dikin û li kêleka masê rûdinin. Serekê belediyê ku generalekî nas e, dê mehra wan bibire. Baz, li ser rûyê wî kenekî geş, serê wî bi qedehên cîn-tonîkê xweş, li dora xwe dinihêre. Ew roj, ew êvar, ew saet û dema ku Baz gelekî lê fikirîye û hema çi bigire bi serê her benîademî tê, niha hatiye; zewac. Her tiştê ku Baz dil dikir, niha, li nik wî ye, her kesê ku wî dixwest hebûya, hatiye. Zabitê simbelqît ku jê re bavîti kirîye li vir e. Bavê Xanima Porzer ê zabit û diya wê ya bêdeng ku niha wê bibin xezûr û xesûya Baz, li vir in. Walî û serekê belediyê, ev herdu generalên navdar ku hertim ji bo Baz bûne tîmsala xurtî, mêranî û welatparêziyê, li vir in. Serbazên Baz ku her pişt dane Baz, lê alî derketine, li vir in. Heval, dost û nasên wî yên din ên binemala mezin, yanî ordiyê li vir in. Mezinahî, serbilindahî, hêz û quweta dewlet û ordiyê li vir e. Kêf, henek, bêhn û jin li vir in. Û hevala wî ya pêşerojê, man û nemanê, niha li kêleka wî ye.

"Belê" Baz dibêje, gava serekê belediyê jê dipirse ka ew Xanima Porzer, mîna bermaliya xwe qebûl dike, "belê, belê..."

"Belê, belê, belê..." Û îmze, çepik, maç, hembêz û pîrozbahî.

Belê, piştî ku mehra Baz û Xanima Porzer ku êdî em ê, tê birîn, bi deng û çepikan, musîk dîsan dest pê dike. Baz û Xanima wî dest bi dansa yekemîn a zewacê dîkin. Bi tenê, di navenda pîstê de, bi dengê şênîyan, bi ahenga çepikan. Welê dixuye ku bextiyarî ev e. Baz, ji mesûdî û vexwarinê serxweş, li dora xwe, bêdûzan, bêyî ku heşê wî li ser ahenga musîkê be, hêdîka, çerx dibe. Şewqa lampeyan li rû û çavên wî dixê, dengê zêr û zînetên Xanima wî, mîna dengê şalûl û bilbilan bi guhê wî dikeve û dengê çepikan wî, bi temamî, sermest dike. Dengê çepikan; nêrdevaneke dirêj û bilind, ber bi esmanan. Nêrdevana qehûm, tekûz û bilind a jîyan, dewlet û ordiyê, Baz pêpelûkên nêrdevanê, yek bi yek, gav dike û ber bi jor dibe. Baz hildikişê, di nav dengê boş ê çepikan de, hildikişê jor, qata herî bilind û ji wir li girseyên çepikkêşan, bi ken, bi maxrûrî, dinihêre.

Baz tî dibe, dixwaze, bêrawest, vexwe. Ew derin û li cihê xwe rûdinin. Û hingî pîrozbahiya mezin û esasî dest pê dike. Mêvan, yek bi yek, kom bi kom, qor bi qor, tîn, Baz û Xanima wî radimûsin, hembêz dîkin, diyariyekê didin wan û vedigerin maseyên xwe. Yek, dido, sisê, pênc, deh, bîst, sîh, çil, pêncî, sed, sed û pêncî, du sed... Bi kêmanî du sed ramûsandin, hembêz, bi kêmanî bi hezaran gotinên pîrozbahî yên mîna hev, bi kêmanî hezar caran rabûn û rûniştin. Bi sedan rûyên cihê yên têvel, bedenên cûre cûr, dengên newekhev. Û di navberê de, bi qasî ku Baz keys dibîne, hin qedehên cîn-tonîkê. Baz sersem, sermest û serxweş e. Xanima Baz westiyayî lê kêfxweş e; dest, pêçî, pî, sîng û ber, gerdena wê, niha, tişt, zêr in. Ji niha ve, wê bi qasî umrekî zêr berhev kirine. Xanima Baz dikene, perwazên wê nûn in ku pê bifire.

Êvar diqulipe ser şevê. Şev û westa şevê perda xwe berdi-de Salona Zabitan. Kesên ku dans dîkin, kêmbûne, mûsîk giran e. Hin mase vala bûne, mêvan, hêdî hedî, derin. "Ev şev xelas bûya", Baz, serîgir, difikire, "biqediya, herkes biçûya, ez jî, em jî biçûna, min serê xwe bixista nav vê sîng, ber û gerdena

gewher..." Lê hingî tevgereke xurt dikeve salonê, tiştek diqewime. Ji bîstan zêdetir zabitên kincên resmî lê, dikevin Salonê û li der û dora salonê belav dibin. Walî û serekê belediyê û kesine din radibin û ber bi deriyê mezin ê salonê dibin. Baz ji tecrubeyên xwe yên bizavên leşkerî dizane; tiştekî qirîng diqewime. Zabitekî ji wan ên ku nû ketine salonê, tê nik Baz û hêdîka sedema lez û bezê, di guhê Baz de dibêje; General Serdar tê.

General Serdar tê!

Gotinên din hew tîna bîra Baz. Ew ber bi deriyê salonê dibezîne û dere li kêleka walî û serekê belediyê radiweste. Lê xanim? Ka xanîma wî? Serekê belediyê zabitekî dişîne hundir da ku xanimê bînin. Û piştî kêliyêkê şeş otomobîlên mercedes ên reş û mîna hev tîna, dikevin bexçê û li ber deriyê salonê radiwestin. Bi qasî bîst zabitan ji otomobîlan peya dibin û der û dora derî radipêçin. Paşê deriyê otomobîla sisiyan a kerwana otomobîlan vedibe û General Serdar peya dibe. General Serdar; bavê welêt, sermiyanê dewletê, pergala ordiyê; bejneke dirêj a qehîm, simbelên boq ên xurtiyê, awirê teyrên baz ê êrîş û parastinê.

"General Serdar, General Serdar, tu her bijî!.." Çepik, qîrîn, qîjîn, rêzdarî. "General Serdar, tava welatê me, stêra esmanên me, General Serdar..."

General Serdar, li dorê girsa zabitan, tê nik walî, serekê belediyê, Baz, Xanîma Baz, Zabitê simbelqît. Siya kenekî zirav li ser rûyê wî, General Serdar Baz û Xanîma Baz pîroz dike û nîşaneke biçûk bi sîngên wan ve dike. Nîşan, nîşaneke zîvhêlî ya ala sêrengîn a Welatê Mezin e. Paşê ew hemû bi hev re dikevin salonê. Gava General Serdar dikeve salonê, hemû şênîyên salonê dev ji sohbeta geş, kişandina cixarê û vexwarinê berdidin, radibin ser piyan û li çepikan dixînin. Berdevkên General cih li jor, li kêleka Baz û Xanîma Baz nîşanî General didin, lê ew rûnane. Wî wext, ji bo rûniştinê, nûn e. Ew li pêş, girse li pey wî, kom li salonê dizîvire. Ji aliyekî heta aliyê din. Çepik berdewam in. Kes nikare nêzîkî General be, ew destê xwe nade kesî, bi serê xwe,

silav dide şêniyan û bi dest silav dişîne kesên dûrî xwe. Piştî ku kom dizîvire û cardin digihûje ber devê deriyê mezin, hîngê orkestra dest bi lêxistina marşa neteweyî ya Welêt dike. Herkes li piyan, sîng, serî û rû ber bi General, bi dengêkî, bi aheng û gur, marşê dibêjin. Salon bi dengê tîz ê şêniyên salonê diheje. General, mîna heykelê xwe ya li meydana derve, bêlebat, li pê, di navenda şêniyan de rawestiyayî, çavên wî hinekî li jor, li marşê guhdarî dike.

Baz, bi dengêkî gelekî berz, heta radeya qîrînê, marşê dibêje. Belê, Baz mensûbî binemaleke weha tekûz e. Belê, ev binemal e ku welat û dewletê diparêze, yekîtiya welêt li ser lingan pêdigire, miyesserî û pêşketinê direşîne ser gelê welêt. Belê, General Serdar e ku bi hebûna xwe, bûye temînata hebûna welat û dewletê. Baz, bi heyecaneke boş, bi coşeke bêpayan, diqîre; "welat, ji bo te can feda. Ala rengîn, ji bo te, em heyran, xwîna me qurban... Serek, ey serek, bi can, bi dil, bi xwîn, em bi te re, ey serek..."

Paşê serek General Serdar, dîsan, bi lez, vedigere, dikeve otomobîlê û ji ber çavan winda dibe.

Êdî çi maye? Hîç. General Serdar jî hate şevê, bi hemû mezinahî û quweta xwe silav da şevê, şev rengand. Êdî herkes dikare, bi serfirazî, bi best û hesta ziyareta General, vegere mala xwe. Êdî şeva biserketî belav dibe. Hevalên Baz dil dikin zava û bûkê bibin û li bûlwarên ber devê çemê mezin ê bajêr, bi erebê, bigerînin. Lê ne Baz ne jî Xanima wî vê yekê dixwaze. Mal, zûtirîn wext mal, bi tenê Baz vê yekê dixwaze. Mala germ û heyecana vê şevê, perda duwemîn a vê şevê ku dê li malê vebe.

Du hevalên Baz, zava û bûkê dixin nav otomobîleke reş a leşkerî û wan dibin malê, mala ku nêzîkî stêran e.

Mala germ... mala ku Baz, ji nû ve, ji bo îşev, ji bo jiyana malbatî raxistiye. Mala fireh ku ji çar jûran hatiye pê, bi rêk û pêkî, hatiye raxistin. Tu kêmanî nîn e. Salon, midbex, serşok, odeyên mêvan û razanê û tîkber û firaqên wan hemû tamam in. Herdu pencereyên fireh ên salona fireh li çemê ku niha bi

ronahiya stêrên şevê diçirise, dinîhêrin. Di salona fireh de, tiştê yekemîn ku bala merivan dikişîne, portreyeke mezin a General Serdar e ku li dîwarê mezin ê salonê hilawestî ye. Li dîwarê din ê jî, li hember portreya General, aleke mezin a rengîn û çend sûretên Baz ên leşkerî di nav çarçeweyên basîd de, hilawestî ne. Li dîwarê kêlekê yê devê midbexê, koleksiyoneke kêr, xencer û şûran di nav kalanên zîv û zêrhêlî de hilawestî ye. Piştî ku Baz çakêt û qirawatê xwe ji xwe dike, bi qasî kêliyekê, ew li der, li çemê ronî mêze dike. Ronahiya stêran, şewqa pêtên ronî yên çem li ser pencerê dibiriqin. Baz hemû lampe pênexistine, hundir hinekî tarî ye. Xanim naxuyê. Baz li maseya biçûk a ku li kêleka pencerê ye vedigere û di nav şûşeyên ser masê de li şûşa cînê digere. Baz şûşê dibîne, lê tonîk, şûşa tonîkê nikare bibîne. Baz nikare, niha, li tonîkê jî bigere. Ew qedehekê tijî votka û ava leymonê dike û bi carekê, qedeh heta nîvê vedixwe.

Xanima Baz, dest û rûyê xwe şuştî, pelerîn û lepikên spî yên cil û bergên bûkantiyê ji xwe kirî, guliyên porê xwe yê dirêj berdayî, tê salonê. Di destên wê de, sêniyeke biçûk heye. Hinekî ji Baz dûr, ew sênî datîne ser masa salonê û bi ken li sêniyê dinîhêre. Wê zêr û zînetên ku îşev hatine da-yînê, xistiye nava sêniyê. Gustîl, guhar, bazind, gerdenî, bronş, fer bi fer, cot bi cot, di nav sêniyê de dibiriqin.

"Were ba min", Baz, li ber pencerê, li pê, jê re dibêje. "Tu were" Xanim, bêyî ku li Baz binîhêre, çavên wê li ser sermiyanên xwe yên jîyanê, dibêje, "were, li van, xweşiya van binîhêre." Baz ku ne li hêviya bersiveke weha bû, hinekî şaş dibe, lê bêdeng, dere nik Xanimê. Hê jî bêhneke gelekî spehî ji Xanimê difûre. Lêvên wê yên sor, ji kêfa, dilivin. Çend dilop av di navbera memikên wê yên mezin re ber bi jêr dibin. Baz Xanimê ber bi xwe dikişîne û destê xwe yê çepê dibe ser memikên wê. Xanima wî hinekî xwe dide alî, "na, ne îşev, ez, em gelekî westiyayî ne" dibêje.

Çawan ne îşev? Ma îşev ne şeva gerdekê ye? Çawan ne şeva gerdekê? Baz hinekî jê bi dûr dikeve û pir bi dîqet lê dinîhêre.

Ew dîsan dengê xwe nake, dere ber pencerê, radihêje qedeha xwe û votkaya mayî, heta dawiyê, vedixwe. "Bes e êdî, te îşev zehf vexwar" Xanim, bi dengekî hinekî esebî, dibêje. Bêyî ku Baz bersiv bidiyê, ew qedeheke nû ya votkayê tijî dike û dîsan hinekî jê vedixwe. Bi qasî demeke dirêj ew welê, Baz, çavên wî li ser çirîsk û pêtên stêr û avê, Xanima wî, çavên wê li ser çirîsk û pêtên zêr û zînetan, radiwestin. Paşê, ji nişka ve, mîna ku ew ji xew hişyar be, Xanima wî dibêje, "de em razên, em gelekî westiyayî ne" û bêyî ku li benda Baz bisekine, berê xwe dide oda razanê. Lê li ber deriyê odê, ew radiweste, mîna ku wê tiştek ji bîr kiribe, vedigere û li salonê dinihêre. "Berê jî ez gelek caran hatibûm vê malê, lê hingî mal ne ya min bû." Ew, çavên wê li ser dîwaran, dibêje, "lê niha mal ya min e jî. Divê mala me, mala min û te be, ne garnîzoneke leşkerî, ez van tabloyan, kêr, xençer, demançe û berikan, tiştên leşkerî li malê naxwazim."

Baz, matbûyî, xwîna wî vekişiyayî, li jîna ku berî niha bi qasekî bû bermaliya wî, wê bibe hevala jiyana wî, dinihêre. Çi divê? Baz çi bike, çi bibêje?.. Ev jîna hanê çi dibêje? Bi çi zimanî dipreyive? "Eger tu guh bidî ser gotinên min, tu dê jî fahm bikî ka ez çi dibêjim" Xanim, gotin bi gotin, dibêje. "Belê, tu dê fahm bikî, ezbenî... General Serdar, serekê me, sermiyanê me, her tiştê me ye, lê ne hewce ye ku ew hertim li mala me be jî" Ezbenî? Çima ezbenî? Xanima wî hem dersan dide, fermanan li pey hev rêz dike, hem jî dibêje ezbenî! Baz diheje, gewriya wî zuwa dibe. Piştî van gotinên dawîn, Xanima wî dere ber portreya General û portrê ji dîwar dadixîne. Hingî Baz hew dikare xwe rabigire, bi hîdet, dere ser Xanimê û sîleyeke sert lê dixê, "ker, keça keran!.." Bi tesîra sîlê, Xanim xwarî erdê dibe, lê ew xwe dide hev, bi awîrek ku Baz hîç nedîtiye, li Baz dinihêre û xwe davêje ser Baz û rûyê wî penc dike, "ker, kurê kerê, kurê bêkes û bêesilan." Rûyê Baz dişewite. Dilê wî, bedena wî, hemû hebûna wî dişewite. Ew destê xwe yê rastê hildide û bi hemû quweta xwe, sîleyeke hişk-tir li Xanimê dixê. Xanim bi dev û rû dere erdê, lê ji erdê radibe,

destê xwe dibe pozê xwe. Ji pozê wê xwîn tê. Ew dest bi qîrînê dike û li dora xwe dinihêre. Kêr û xencer... ew xwe li aliyê kêr û xenceran digire û xwe digihîne xencereke xwar. Lê berî ku ew dest bibe xwe, Baz xwe digihîne wê û ji bazinda destê wê ku xencer tê de ye, pêdigire. Bi qasî çend deqîqeyan, bi qîjîn û qîreqîr, bi çêr û gotin, ew hevdu dibin û tînin. Paşê ew dikevin erdê û li erdê gêr dibin. Mase, sandalye, kursî, maseya şûşeyan, şûşeyên li ser masê hemû tevlihev dibin, dişkên, belav dibin. Bi dû pevçûna dirêj a li ser xalîça erdê re, herdu ji hev vediqetin û ji hev dûr, radibin ser piyan. Êdî deng ji wan nayê, bi tenê, bi kîn û nefret li hev dinihêrin. Xençer naxuye, destên herduyan jî di nav xwînê de ye. Îşligê spî yê Baz û fîstanê spî yê bûkîtî yê Xanima wî di nav xwîna sor de ne. Bi qasî kêliyekê, li herdu milên maseya salonê, li pê rawestayî, bi çavên beloq vekirî, ew li hev dinihêrin.

Paşê Xanima Baz, mîna telîsekî vala, ditewire erdê.

5. Veqetîn

Kevok.

Niha jî Kevok. Niha jî em nêzîkî li Kevokê bikin.

Em dîsan li paytextê Welatê Mezin in. Dîsan şev e. Dîsan stêr li esmanan û li ser ava boş a çemê bajêr diçirsin. Lê ji navbera wê şeva zewaca Baz a bi xwîn û vir ve deh sal bihurîne. West bihuriye, kes cihê ne, lê tariya şevê û ronahiya stêran eynî ye.

Belê, tariya şevê û ronahiya stêran. Belê, tarîfî û ronahiya ruhê însanan.

Hundirê Kevokê, îşev, bi ronahiya evîn û hezkirinê tijî ye. Lê li milê din, hundirê Kevokê, îşev, bi tarîfîya zîz a veqetîn û tirsê tijî ye. Şev, şeva weda û veqetînê ye; şeva agirê beden û ruhan e; şeva seqema keser û xizînê, germahiya şehwet û hezkirinê ye.

Em li oda biçûk û peregende ya Kevokê ne. Niha umrê Kevokê li dora bîstan e, ya rastirîn, hinekî li ser bîstan e. Ji sê salan û vir ve ye, Kevok li xaniyê xwendevanan û niwêrsîta paytextê welêt, li odeyeke xwendevanan ku em niha lê ne, dijî. Kevok, yek ji wan çar hezar xwendevanan e ku li vê sîta mezin a xwendevanan dijî. Sîta xwendevanan ji sîta leşkerî ku mala Baz tê de ye, bi qasî sê taxan bi dûr e. Kevok û Baz bi qasî sê taxan ji hev dûr dijîn, –bêyî ku ew hevdu binasin, haya wan ji hev hebe.

Di oda Kevokê de Kevok ne bi tenê ye. Hevalê wê yê xwendinê, destgirtiyê wê yê jîyanê ku em ê jê re bibêjin Jîr, pê re ye. Kevok û Jîr xwendevan in. Herdu jî li zanîngeha Ziman û Edebiyata Fransîzî dixwînin. Jîr di sinifa çaran, Kevok jî di sinifa si-

siyan de ye. Xwendina Kevok û Jîr a fransizî ne bêsebeb e. Ziman û edebiyata fransizî ji bo Welatê Mezin ku berî niha bi qasî şeş salan, kêr-zêde, koloniyeyeke fransizî bû, gelekî girîng e. Dûzan û sazûmana îdarî, siyasî û civakî ya welêt, hema çi bigire, li gora ya Fransê hatiye pê. Bandûra ziman, çand, edebiyat, fikir û rêzikên fransizî, pir eşkere, dixuyê. Tevî ku welat azad bûye û ji mêj ve ye ku fransizan xwe ji welêt vekişandine, di kûrahiyên reh û rêçên gerandina karên curbicur ên welêt de siya fransizî diyar e. Têkilî bi Fransayê re, pêwendî bi ziman, çand û edebiyata fransizî re, nûşanên pêşketin, bilindahî û zarûnê ne, rîya biserketîne ne. Ji lewre ye ku Kevok, keça awuqatekî nas û dewlemend, û Jîr, lawê serekeşîrekî mezin ê Welatê Çîyan li zanîngeha Ziman û Edebiyata Fransizî dixwînin.

Niha, di vê şeva zelal a payizê de, bajarê mezin, bi perda tarî ya şevê ve pêçayî, razaye. Lampayên cade û kolanên bajêr ku mîna pêt û çirîskên êgir dibiriqin, nobedarî li şeva bajêr dikin. Çemê ku niha gelekî sakîn diherike, di bin ronahiya lampayên bûlwarên kêlekan de dibiriqe. Stêr li ser ava çem diçirisin. Bûlwar, cade û kolan, eger em segên tiral ên kuçan nehesibînin, vala ne. Deng hatiye birîn. Jiyan, tevger, lebat ji bajêr bi dûr ketine. Ro, tav, germahî hê dûr in. Şevgura sibê, berbang, rojeke nû hê dûr in. Şev e, bi tenê şeva ronî ye. Ê di vê şeva ronî de, dilê kesekî, dilê Kevokê zîz e, tişî xem û keser e.

Kevok ecêb ziravbihîstiyar e.

Di oda biçûk de, ku bi du findan ronî dibe, li ser textê razanê yê teng, Kevok û Jîr tazî ne. Ew bi hev re, di nav hev de ne. Jîr dirêj bûye, Kevok li ser Jîr e. Kevokê bisk û guliyên porê xwe yê dirêj vekirine, herdu şeqên xwe di ser bedena Jîr re birine, dirêj enî û çavên Jîr bûye û li rûyê Jîr dinihêre, mîna ku wê dil heye hemû dil û ruhê Jîr, bi hemû kite kitan, bibîne û binase. Çavên Kevokê mîna du stêrên stûr dibiriqin. Lê ne ken, ne jî kêfxweşî li ser çavan dixuyin. Bi tenê ew bi nêrîneke gelekî kûr li bîbikên, li kûrahiyên çavên Jîr dinihêre û wî, heta ku jê tê, dîsan, dixê nava

kûrahiyên xwe yên şil. Kevokê, herdu destên xwe di ser serê Jîr re birine, tilî û pêçiyên wê di navbera yên Jîr de, herdu destên Jîr, pihêt, pêgirtine û wan diguvişîne. "Jîr" Kevok, bi dengê zahf nizm, bi nalîn, dibêje, "Jîr, oxira te ya xêrê be..."

Jîr, di nav kûrahiyên Kevokê de, bêdeng, li Kevokê dinihêre, -ne bersivê dide, ne jî awireke xuya nûşan dide ku dikare bibe bersiv. Ew, bi tenê, bi hêz û coşa hezkirinê, bi kelkela germahiya kûrahiyên teng ên Kevokê, bi çavên vekirî, li yara xwe dinihêre; bi lava, bi minet, lê dinihêre. Deng ji Jîr dernakeve, heke ew bixwaze jî, deng nikare jê derkeve. Gewriya wî zuwa, hişê wî jê çûye. Bedena wî, dilê wî, ruhê wî, hemû hebûna wî ketiye ber pêlên giran, kûr û qehîm. Rehên wî yên ciwan vekişiyane, mêjiyê wî yê xurt û tekûz niha pêl dide. Jîr di nav pêlan de, mîna hêlekanekê, dere û tê, dere û tê.

"Jîr" Kevok, dîsan, kelgirî, bi nihirîn, dibêje, "Jîr, hişyar be, gotina min ji te re ye. Guh bide min... Oxir be, ez dibêjim... mîna ku dapîra min digot; oxira te ya xêrê be, bila Xwedê bi te re be... min seh bike Jîr... mîna ku di destana herî kevn a însaniyetê de hatiye gotin; bila lingên te, te zîndî û saxlem vegeirîne malê... here Jîr, here... û nihajîez bi dil û canê xwe, bi ruh û bedena xwe, bi hezkirin û evîna xwe, oxira te dixwazim... here..."

Jîr bersiv nade. Li şûna bersivê, ew hewl dide xwe, bêtî ku ji nava Kevokê derkeve, destên xwe ji tilî û pêçiyên Kevokê rizgar dike, hinekî hêz dide xwe û hêdîka xwe diqulipîne ser Kevokê. Jîr cih li xwe rast dike, şeqên Kevokê vedike û mîna ku ew bixwaze xwe bi binê kûrahiyên Kevokê bigihîne, bi quwet, li ser Kevokê dirêj dibe. Bê lebat, bê tevger, ew welê, çavgirtî, bi qasî çendekê, di nav wê germahiyê de dimîne. Destên Kevokê, bi ûsil, li ser piştê wî, hêtên wî, digerin. Dilê kevokê, pihêt, hildavê, zik û berzikê wê, ji ber kela hezkirinê, dilivin. Bedena Kevokê ku mîna cawekî hewrîşimî nerm, tenik û zelal e, bi hêdîka, dilive.

Di nava kûrahiyên Kevokê de, Jîr bi deng û pêjnên sivik û kûr ên hez û hezkirinê dihesê. Berê jî wî ev deng û pêjn hîs kiribûn,

bi wan hesiyabû. Lê ne evçend xurt û kûr, ne evçend ronî. Ronî? Belê, ronî, mîna ku niha di hundirê Jîr de birûskeke lêdabe, welê bi xurtî, hemû bedena wî, bi ronahiyeke zahf xurt, pêl bi pêl, tê vegirtin. Gelo jixwe ve çûyin ev e? Mirin ev e? An na, ev zayîn e? Lûtkeyên coşa evînê ev e? Binê kûrahiyên hezkirinê ev e? Piştî vê vedana birûska hundirî, piştî van pêlên ecêb xurt, ew dikare, bi hêsanî, bi rehetî, bimire. "Êdî mirin ne xem e, Kevok" Jîr, di bin guhê Kevokê de, bi nermahî, dibêje û guhê wê dimije.

Kevok, çavgirtî, hinekî ji xwe ve çûyî, mîna ku di xew de be, "bimire" dibêje, "di hembêza min de, di nav min de bimire." Kevok bi destên xwe yên ku piştî Jîr difirkîne, pihêt, hêtên Jîr, hinekî din ber bi zik û berzikê xwe yê xwîdandayî, dike. Eger niha mumkin bûya, wê dê hemû bedena Jîr bixista nava xwe. Wê dê bedena xwe û bedena Jîr bikira yek. Lê nabe, ew çî jî bike nabe. Berê jî çendîn caran ew û destgirtiyê wê li ser vî textê teng dil û bedenên xwe dabûn ber agirê hez û şehwetê. Lê îşev, ecêb e, îşev, şeveke awarte, şeveke nedîtî ye. Tu carî hîsên weha kûr ew dîl negirtibûn, tu carî wê bi daxwazeke weha bêpîvan nexwestibû ku Jîr tê de bûya. Îşev tişteki nû, nedîtî bi serê wê de tê. Di kûrahiyên beden, mêjî û ruhê wê de tişteki bêtaswîr diqewime. Hênika hiya rûbarên meha nisanê, serma kurşeyên çilê, germahiya tîrêjên tîrmehê, bi hêz û quweta berfendeyên Welatê Çiyan, nava wê tevlîhev dikin. Ev zizî, ev zelalî, ev germahî! Mîna ku lehiyeke boş di hundirê wê de çiv dide, mîna ku giyayekî nûhêşînhatî tê de, bi xurtî, bor dibe. Mîna ku birûsk di hundirê wê de vedidin. Kevok dişewite, rehên wê, bedena wê, rûyê wê, dil û cane wê dişewite. Dinya êdî nazîvire, wext nema diherike. Dinya, wext, heyam, hawîrdor, ev bajarê mezin, ev oda biçûk, ev bedenên zirav û ciwan, her tişt, herkes dişewite. Her tişt di nav ronahiya şewatê de, bi gulokên êgir, winda dibe. Kevok winda dibe.

Lê lehî jî radibin. Bedena Kevokê niha avzêya hemû kanî, çem û lehiyên cîhanê ye. Hemû ava cîhanê, niha, ji bedena

Kevokê dizê. Kevok tênagihê. Belê, ev evîn e, hez e, hezkirin e. Naxwe evîna ku tarîxan dihûne, qederan dirêşîne, merivan dişî-ne mirinê, ev e! Belê, Kevok têdighê, evîna man û nemanê ev e. Kevok hem têdigihe, hem tênagihe. Di nav têkeliyeke rengîn a şewetê de, Kevok dere û tê. Pêlên ronahiyeke bêpayan niha di hundirê Kevokê de jî radibin. Pêl, yek bi yek, gav bi gav, bedena wê vedigirin. Bedena wê, hêdîka, dest bi hejînê dike. "Bimire" Kevok, ji nişka ve, bi qîrîn dibêje, "niha bimire" û mîna ku bedena wê bi zelzeleyekê ketibe, mîna ku birûskek di dilê wê de vedabe, hemû bedena wê radibe û dadikeve. Carek, du caran... car bi car... bêdawîn. Kevok herdu destên xwe dibe rûyê Jîr ku ji jor re li Kevokê dinihêre û rûyê spehî yê xwîdandayî mist dide. Kevok, pesdeng, bisemt, li çavên vekirî yên Jîr dinihêre.

Ev hejîn, ev pêl, ev lezîn, ev vedan, ev vegirtin divê bêdawîn be, dewam bike, xelas nebe. Car bi car, cardin... cardin...

Lê Jîr di ser Kevokê re, hêdîka, diqulipe kêlekê. Sînga wî, pihêt, radibe û dadikeve. Destê wî yê rastê li ser memikên Kevokê yên şil, li kêleka Kevokê dirêjbûyî, "ez ê bimirim" Jîr dibêje.

"Lê li vir, li nik min bimire" Kevok dibêje û ji nav nivînên peregende radibe, di ser Jîr re gav dike, destê wê yê rastê di navbera şeqên wê de, ber bi serşoka gelekî biçûk dere.

Piştî kêliyekê, gava Kevok, di destan de destmaleke fireh û dirêj, bi niyeta xebirdanê, tê ber textê razanê, êdî Jîr di xew re çûye. Çavên wî girtî, rûyê wî, mîna rûyê zarokekî biçûk, sakîn, paqij û ronî, Jîr radizê. Bi qasî bîstekê, li piyan, bi alîkariya ronahiya qels a heyv û stêran, Kevok li Jîr dinihêre.

Evîndarê razayî... Dilê Kevokê yê hingavtî pihêt hildavê.

Jîr; ev çavên xweş ên mîna du lib tiriye reş ku hundirê Kevokê dihelînin, ev bedena xurt, zirav û lihevhatî ku êdî hîn bûye û bi bedena zirav a Kevokê ve dibe yek, ev dest, mil û pazûyên xurt û spehî ku bi zexmî bedena Kevokê hembêz dikin, navtenga wê ya zirav radipêçin, ev lêvên tenik û jîndar ku bedena Kevokê hişyar dikin û di hundirê wê de birûskan vedidin, ev însanê xort

ku dil ji Kevokê dibe, Kevokê digihûne lûtkeyên hez, coş, şehwet û kêfxweşiyê.

Jîr; lawê eşîran, lê ji zimanê xwe yê zikmakî yê eşîran bidûrketî, loma jî li hember ziman, çand û rêzikên welatê xwe şermezar; kûpa hêrs û xezebê, tîmsala xîretê; mîna navê xwe jîr, têgihîştî û dûrbîn, lê sergerm, serhildêr, dilgerm niha ev însan ê here, ji Kevokê veqete, Kevokê li pey xwe, li vî bajarê mezin bi tenê bihêle û here. Rojên wan ên ku bi baranê şil dibûn, heyamên wan ên ku bi berfê spî dibûn, wextên wan ên ku bi tîna tavê dikizirîn, şevên wan ên ku bi silavên heyv û stêran ronî dibûn û jiyana wan a ku bi nalîna hezkirinê dihate rengandin ê, niha, li pey bimîne.

Jîr.

Kevokê vî xortê ku niha hêdîka dike xure xur di destpêka xwendina zanîngehê de, rojekê ku ew bîhteng bû û xwe gelekî tenê hîs dikir, bi tesadufî, li aşxana zanîngehê nasî. Ew li kêleka eynî maseyê rûniştibûn. Li kêleka Jîr du hevalên wî jî hebûn. Ji xebardan û devoka Jîr, Kevokê fahm kir ku Jîr jî, mîna wê, ji Welatê Çiyan bû. Tevî ku Jîr bi zimanê resmî yê Welatê Mezin dipeyivî, şopa zimane Welatê Çiyan jî di devoka wî de dixuya. Pêşî çavên reş ên germ hevdu nasîn, paşê jî gotin û zimanê delal ê Jîr rê li hevdunasîna wan vekir. Ecêb bû... hema çi bigire ji bo her tiştî, li ser her tiştî ew mîna hev difikirîn, mîna hev hîs dikirin, mîna hev ji tiştan hez dikirin, mîna hev dikeniyên, mîna hev li ber tiştan diketin. Vê wekheviya balkêş û tişî heyecan rê li yekbûna bedenên vekir. Şevêkê, dîsan li vî odê, dîsan di bin ronahiya qels a findan de, bi best û coş, lê bi tirs û sûzenî, dilê wê –mîna pilpilingekê ku ketiye ber bayê gur– hingavtî, Kevokê xwe û keçîtiya xwe teslîmî dest, beden û ruhê Jîr kir. Û careke din wê xwe teslîmî wî kir, û careke din... Her tişt di nav wekheviyeke delal de ku Kevok pê sermest dibû, dewam kir, heta ku rojekê Jîr, bi awireke welê tûj ku Kevokê hîç nedîbû, teqîya û mîna ewrên reş guriya. Niha baş nayê bîra Kevokê ka ji ber çi se-

bebî bû ku Jîr ewçend hêrs bûbû, lê Kevokê ew aliyên nû yên Jîr ku di tarîtiyên dil û mêjiyê wî de veşartîbûn, nasîn. Belê aliyekî Jîr ê tarî jî hebû... Kevokê fam kir ku aliyên wan ên ne mûna hev jî hene. Wê dît ku wekhevî, hertim, di her mercî de, ne mumkin e. Lê ne xem bû, ma jiyan jî ne di nava hêlekana wekhevî û newekheviyan de diçû û dihat? Ma pergala dinyayê jî ne li gora vê qaydê dizivirî? Ya girîng hez bû, evîn bû. Kevok bi vê yekê bawer bû; hez û evîn dikaribûn kilîdên herî zingarî jî vekin...

Hez û evîn; zelalî û paqîjiya yekta ya hemû cîhanê...

Di zanîngehê de, Jîr salekê li pêş Kevokê bû. Jîr alîkariya dersên Kevokê dikir, êvaran di vê oda loş a biçûk de, piştî esran li rexên bûlwarên herdu kêlekên çem, şevan di bin ronahiya lampeyên bajêr de, di nav mij û dûmana rojên şilî yên payizê de, di bin tîna qiqiqî yên rojên havînê de, jê re, her û her, şîrên fransizî dixwendin. Piştî firavîn û şîvên basîd ên xwendevanan, piştî demên dirêj ên hezkirinê yên saetên dereng ên şevan ku êdî stêran jî xatir dixwestin û diçûn, ew li ser şoreşên fransizî, medeniyeta tarîxî ya Fransayê û nivîskarên navdar ên fransizî dipeyivîn. Ew dipeyivîn, hertim dipeyivîn. Bi van sohbetan ew diketin xew, bi van gotinên edebî coşa ruhê wan bilind dibû û kela bedena wan radibû. Ew; du ruhên ciwan, şên û lêger. Belê, lêger. Ruhê wan ê kekel li riyên rast, li îdealên mezin û bilind, li pîvan, bîr û nêrînên ku jiyan, cîhan dikirin wekhev degiriyar.

Li ser riya lêger û gerînê de, qonaxek ji qonaxên herî girîng, bêguman, welatê wan ê bav û kalan, Welatê Çîyan bû. Wan, ji Welatê Çîyan dûr, li paytextê Welatê Mezin dixwendin. Ev der jî welatê wan bû. Lê welatê wan, warê wan ê ku kesaniyek, şexsiyetek, huwiyetek dabû wan, li dûr, li bakurê welêt, di nav çîyan de bû. Ew, keç û kurên wan çîyan û wî welatê dûr û tenê bûn. Û halê welatê wan ne tu hal bû, -ne do tu hal bû, ne jî îro. Welat, welatevînî, welatparêzî, û gotinên wekî van, di keft û lefta riya lêgerîna rastiyan de, ji bo wan, gotinên hem bilind, hem jî bedew bûn. Heye ku loma wan, geh Kevokê, geh Jîr, şîra Victor Hugo

ku li ser welatparêziyê bû, bi sê zimanan, bi zimanê wan ê bav û kalan, bi zimanê Welatê Mezin û bi fransizî, hertim, di demên keser û xizîn, şadî û kêfê de, digotin. "Şan û mezinahî bi te dikeve / Welatê delal û abadîn / Şan û şeref bi wan dikeve / Yên ku qurbana te bûne..." Niha, Kevok, çavên wê yên kesertişî li ser Jîr, dîsan, hin rêzên şîra dirêj, mîna lorînekê dinehwirîne.

Şan, şeref, mezinahî, qurbanbûn... Kevok, piştî rêzên şîrê, hê li pê, difikire, şan û mezinahî û welatê wan... û ewana... Û lêgerîna wan... Ew li çi digerin? Tiştê ku ew lê digerin li kû ye? Ew ê kengî bikaribin xwe bi wî tiştî bigihînin? Çima bala ruhê wan ê xort tim û tim li tarîx û dewranên bihurî, li wext û demên nediyar ên bê ye? Di nav çîrok, serpêhatî, rîwayet û tecrubeyên tarîxî de, ew li çi digerin? Ew ê, di nav rûpelên kitabên erzan de ku bi çapên gelekî basîd weşiyane, çi bibînin? Çima koç, qetliyam, çûyin, veqetîn, keser, jan, mirin, xwestek, hêvî, heyecan û têkoşîn evçend bala wan dikişîne? Çima awirê sar ê jinên neçar, xwîdana eniya mêrên bindest, girîna zarokên jar, stranên dengên kal, piste pista neyînî ya şeniyên bêgav, qîrîn û berxwedana însanên belengaz evçend, evçend bi xurtî bala wan dikişîne? Û ev fikrên nû yên şer, têkoşîn, liberxwedan, serhildan û şoreşan ku ji vir û ji wir, nîvçe û kêr, lê pêl bi pêl bi ser wan de tên? Çima ew ku ji malbatên têr û dewlemend tên, evçend ji van fikiran re vekirî ne? Çima dil û ruhê wan bi heyecana van fikran ji xwe ve dere? Çima hişê wan hertim li ser deverên dûr, mekanên nediyar, çûyin û rêwîtiyên bi talûke ye?

Tiştên ku ruhê wan lê digere, li kû ne? Li dûr, li nêzîk? Li dûmahika rêwîtiyan? Heye ku li hîç derekî, heye ku ew bi tenê li pey xewnekê ne?

Jîr ê ku niha, piştî demekê, xwe bide ser riya lêgerînê û here, wê çi bibîne, pêrgî çi bê? Lê Jîr ê here, here welatê bav û kalan, here hembêza çiyayên abadîn, bikeve nava talde û stariyên tarîxî yên gelî û newalên Welatê Çiyan. Kevok dizane, ew çi jî bike, tewş e, Jîr biryara xwe daye. Welat, bi tenê welat û çûyina welêt

di hişê wî de ye. Welat, ku Jîr, car bi car, bêwest, bi heyecaneke boş, digot; welatê bedew; ronahiya çavan, spehîtiya li ber çavan; çiyayên bilind, geliyên kûr, avên zelal, lehiyên boş, dar û dahlên hêşîn, çem û golên gewher; rengên keskesorê, pûşiya spî ya berfê, devî û giyayên hêşîn ên şîfayê; xuşe xuşa kanî û avên herikî, dengê sivik ê pelên darên bî û spîndaran; berfende, ba û bahozên bêpayan; berbangên aram, hingûrên sor, şevên sayî, stêrên çirîsî yên sor; ziving û şikeftên hênîk, berî û deştên zer, her tişt, her tiştê ku bang li dilê kesên lêger dikin, li wir e, Jîr digot, li wir, li welatê bav û kalan e.

Jîr; evîndarê dilbir, dildarê evîna Kevokê, evîna welêt...

Di nav fikr û hûsên têkel de, Kevok ji Jîr bi dûr dikeve û tê ber pencera biçûk ku li çêrî dinihêre. Find xelas bûne, findank vala ne. Kevok, tazî, bedbîn, serê xwe dide perwaza pencerê û bi qasî kêliyekê li der dinihêre. Stêr kêr bûne, ji dûr ve, di ser xaniyên bajêr re, sorahiyeke tenik dixuye. Ava çem dibiriqe û pelên darên li kêlekên çem, bi bayekî sivik dilivin. Dengê sivik ê bayê sivik, hêdîka, bi guhê Kevokê dikeve. Gelo dinya weha kesertijî ye yan keser û tirsê ser dilê wê dinya weha kesertijî dike? Kevok nizane, ne girîng e ku ew pê bizanibe jî. Lê ew zîz e, hûsên wê ewçend zirav bûne ku bi dengê, bi lebatekê ew dikare, bi qîrîn, bi girî.

Jîr ê here. Jîr ê here serê çiyayê, here şer û têkoşînê. Li Welatê Çiyayê, di kûrahiyên zixur, gelî û newalan, di qûntar, çeper û lûtkeyên çiyayê de serhildaneke nû li dijî desthilatiya dewleta Welatê Mezin û hukumdariya General Serdar dest pê kiriye. Mîna do, mîna pêr. Welatê Çiyayê û serhildan; qederek ku bê rawest her berdewam e. Dîsan şerekî xwînî, şewateke kambax dest pê kiriye û xort û ciwan, yek bi yek, kom bi kom, mîna ku ew herin dîlanê, diçin û xwe digihînin wê. Niha jî Jîr ê here. Niha, belê niha, gava piştî bîskekê berbangê lêxist, êdî dengê stranan, zimanê şîrî, kêf û heneka bedenên bête birîn. Êdî ew ê hew, destên wan di nav hev de, li kêleka bûlwaran bigerin û behsa felsefe, nivîskar, kitab, bend û nivîsaran bikin. Êdî Kevokê hew

bikaribe guhê xwe bide ser dengê stranên Jîr ên bav û kalan ku bi zimanê bav û kalan tên gotin. Ew daxwazên wan ên zewacê, jiyaneke bi hev re, bextiyariya jiyana malbatî ya rojên pêş... ew hemû dê êdî, niha, li pey bîrnîn, bibin mîna nivîsarên ku li ser qûmê hatine nivîsîn.

Jîr ê here.

Di oda bêdeng de ku bi pêjnên rojên bihurî yên Kevok û Jîr tijî ye, Kevok, bê hemdê xwe, dest bi girî dike. Bi qasî çendekê, ew welê serê wê xwar, çav li derve, bêlebat, digirî. Rondik, yek bi yek, ber bi jêr dibin. Gelo ew ê bikaribin, dîsan hevdu bibînin? Çawan? Kengî? Ev çi qeder e! Qedera rêş a welatekî çawan dika-re, weha, qedera însanan jî bihûne. Qedereke girtî çawan dika-re, weha, qedera kesan jî bike girtî, bike dîl? Ev heyama ronî ya payizê dê, niha, weha bi veqetînê, weha tarî biqede? Bi huznekê ku dibe girî û nefes li Kevokê diçikîne, Kevok ber bi masa koşeya odê dere, ji çavikekê du findên nû yên dirêj û sor derdixe, wan tîne, datîne ser findankan û pêdixe. Find dişewitin, pêşî mîna du çirîskan, paşê mîna du gulokên zirav ên êgir. Ode hinekî din ronî dibe û siya findan li ser dîwarê spî û têkberên kêr û basîd ên odê dilive. Bi qasî demekê, li pê, Kevok, bi çavên şil, li findan dinihêre. Ronahî û germahiya qels a findan, libabûna êgir, siya wê û yekîtiya wan hemûyan, mîna ku ew deng û pêjn, bîr û xey-al bin, bala wê dikişîne.

Bi dû re Kevok, dîsan, vedigere ber pencerê. Şehêkî dirêj û rêş li ber devê pencereyê ye. Kevok, hêdîka, mîna ku ew di xew de be, radihêje şeh û pê porê xwe yê dirêj û rêş şeh dike. Bêdeng, bi semt, bi ûsil. Porê wê yê dirêj li bal û bejna wê ya dirêj tê. Bêhna wê teng, çavên wê tijî girî, Kevok porê xwe şeh dike. Şeh tayên nerm ên porê dirêj, hêdî hêdî, ji hevdu vediçirîne.

Ew ê here, Kevok, mîna ku ew şûrekê bixwîne, ji nişka ve, dibêje, ew ê here wî welatê bêyewm, warê mirin û windabûnê. Ew welatê ku kesî jê xêrek nedîtiye, hertim di nav mij û dûmanê de ye, hertim wekî çiyayekî ku li ber teqînê be, esebî û şidayî ye,

hertim tê de pevçûn, şer û xwîn heye. Ew welatê ku hertim bi xufe xufa ba û bahozê, bi xuşe xuşa baran û zîpikê dinale. Ma Jîr, ev xortê ku niha wekî melayketekî, razaye, nizane ku çûyina wî welatê heye, lê jê veger nîn e? Jîr, Jîrê bîrbir û têgihîştî, çima tu nizanî ku dûmahîka riya çûyina wî welatî gor e, goristan e, goristana kavil a bêkesan e? Jîr, evîndarê dilbir, çima tu eziyetê li dil dikî? Tu nizanî ku ev evîn, ev hezkirina bêdawîn, ev nalînên abadîn, ev gotinên te yên evînê, ev germahî û heyecana evînê dê, bi çûyina te, xelas bibin? Tu nizanî ku kenê te yê wekî gul bişkivî, çavên te yên wekî du lib yaqûtan biriqî, bedena te ya wekî xwedayên efsaneyên kevintirîn ên însaniyetê lihevhatî dê, bi çûyina te, bibin xatirayek? Ma tu bi van yekan nizanî?

Kevok, dîsan, lê îcar, bi deng digirî.

"Kevok..."

Pêşî Kevok deng nabihîse, paşê bi xwe werdiqile û serê xwe dizivîrîne. Jîr, li pê, li ber textê razanê, tazî, bi çavên xewarî, li Kevokê dinihêre. "Kevok... çima tu digirî? Tu çi dibêji? Were ba min..."

"Na" Kevok, çavên wê sor û qerimî, bîhteng, dibêje, "na, tu were... were, ez ji te re bibêjim ka ez çi dibêjim..."

Jîr dere nik Kevokê, destê xwe di stûyê wê re dibe û wê hem-bêz dike, "heval û hogira jiyana min" ew, bi ken, dibêje. Gava memikên Kevokê yên vekîşiyayî bi sîng û pirçên sînga Jîr di-kevin, dîsan, germahiyeke boş bi ser Kevokê de tê. Lê ew xwe radigire, hinekî xwe dide hev û "mere, tu divê nerî" dibêje. Bi dengekî hinekî bilind û esebî.

"Kevok", Jîr, bi nermahî, mîna ku ew lava bike, dibêje.

"Na, na û na, divê tu nerî... Piştî pênc, şeş mehan, êdî tu dê xwendina xwe bibî serî. Ev salên me yên xwendinê ku me şev û roj kirin yek da ku em bi ser kevin, ev tiştên ku em hîn bûn, ev hemû dê niha vala herin? Na, te çûyin navê..."

"Kevok..."

"Me behsa dol û zarokan, mal û malbatan dikir. Law û keçên me dê bi stranên zimanê me, bi şîrên me mezin bibûna. Te ev yek hemû ji bîr kirine? Tu nizanî ku çûyin, mirin e? Çûyin! Yanî terkkirin, veqetîn, keser, jan û mirin... Ma tu bi vê nizanî?"

"Kevok!..." Jîr, îcar, ji nişka ve, diqîre û dibêje. "Kevok, sistî li te nayê, şerm e, xwe bigire... Kevok!.. Ma mirin ji vê jîyanê ne çêtir e? Bibêje, ne çêtir e? Ma em çendîn caran li ser çûyînê nepeyivîne, me gotina xwe nekiriye yek? Bibêje! Azadiya me û welatê me heye? Na. Serbestiya me heye? Na. Em dikarin, bi rehetî, bi misogerî, bibêjin ku jiyana me, pêşeroja jiyana me û zarokên ku em lê difikirin, ronî ye? Na. Vê dewletê, van generalan, ev generalê ku xwe serdarê herkesî dizane û bi fortan çêla edalet û yekitiyê dike, jîyaneke adîl, bi edalet û wekhev dane me? Na. Na, na û na. Hingî? Bibêje Kevok, hingî?.."

Hêrseke boş Jîr vegirtiye. Ew hêrs û teqîna tarî ku Kevokê, çend caran li ser bîbikên çavên Jîr dîtibûn, niha, dîsan, dixuyin. Kî û nefret, niha, dîsan, hatiye û li ser çavên wî veniştîye. Çavên wî yên mezin vekirî, rehên qirika wî hema çî bigire li der, bi qîrîn, ew dipeyive. "Meqîre", Kevok, hêdîka, ji Jîr ê ku niha hinekî jê bi dûr ketiye û li nava çavên wê dinihêre, dibêje.

"Na, Kevok, na! Bibêje! Evana me nakujin, pêr nekuştin, do nekuştin, îro nakujin, ew ê sibê nekujin? Em, her û her namirin? Her roja ku em dijîn, ji mirinê kirêttir nûn e? Welatê me di bin lingan de nûn e? Zimanê me yê bav û kalan, çanda me, hebûna me ne di bin tehdîdên xedar de ne? Ew winda nabin? Ma em, ez û tu, niha bi zimanê wan napeyivin? Çima, bibêje çima? Wan em ji reh û rêçên me bi dûr nexistine? Zept û repta wan, wekî nîrê stûyê me, hertim, li ser me hilawestî nûn e? Wan cihên herî baş ên welatê me venegirtine, qesr, qonax, war, şar, ji bo xwe, ava nekiriye? Em jî, li welatê xwe dîl, wekî xerîbên vî welatî, ji derve, bi tîrs, bi xof, li wan nanihêrin? De bibêje na! Êdî tu behsa kîjan mirinê dikî? Tu bihesibîne ku min xwendin kuta kir, wê çî bibe? Çi biguhere? Tu tiştek, Kevok, tu tiştek..."

"Baş e, here, çi dikî bike, lê meqîre" Kevok, çend dilop ji çavên wê gêr dibin û dibêje, "here..." Bîhna wê teng dibe. Di vê oda biçûk de ew bi kû de here, xwe bavêje kû derê? Şeh ji destê wê dikeve, ew ji Jîr rû badide û dere li ser textê razanê rûdine. Kevok digirî. Bi qasî demeke dirêj, ew welê ji hevdu dûr, Jîr li ber pencerê, Kevok li ser textê razanê, di nav pêlên dinyayên xwe yên cuda yên hundirîn de, dimînin. Paşê Jîr, hêdî hêdî, gav bi gav, tê, li ber serê wê disekine, porê wê mist dide û bi dû re li kêleka wê rûdine.

"Ewrên reş bi ser welatê me de girtine" Jîr, bi nermahî, kite bi kite, dibêje, "welatê me yê bav û kalan, îro, tarî ye, bi perda tarîtiyê girtî ye. Aso, esman tarî ne, av, kanî, çem, bîr, sarinç girtî ne, çiyayên serîgewher girtî ne, mal, war, gund, bajar bûne warê kundan. Welat bi tenê ye, em bi tenê ne, însanên me yên bêpişt, bêpişk ku kêf, henek, hez û hezkirinê ji bîr kirine, bi tenê ne... ew însanên me yên reben ku ji hemû xweşî, mal û kêfxweşiyên jiyan û cîhanê bêpar mane, destşuştî bûne, îro, stûxwar in û li hêviya me ne Kevok, li hêviya me..."

Kevok li Jîr nanihêre, serê wê li ber wê, ew digirî.

"Kevok, tu meke, jixwe bîhna min çikiyayî, dilê min teng e. Ez rîca dikim, tu meke, min hîn bêhtir mexîne", Jîr dibêje, rûyê Kevokê ber bi xwe dizîvirîne û bi tiliyan rondikên çavên wê paqij dike. Jîr dikene, lê Kevok çavê xwe jê badide. Jîr, bi herdu destan, rûyê wê, hinekî ber bi jor dike da ku ew li Jîr binihêre. "Ez ketime bextê te, tu meke!"

"Pêşî tarî ye, Jîro, ma tu pê nahesî?"

"Lê ronahî li pey vê serhildanê ye, Kevok, zincîr li wir, li bilindahiyên çiyayên welatê me dişkên... lê tu xwe bigire, dax-waza min, bi tenê ev yek e."

Jîr rûyê Kevokê ber bi xwe dike û rûyê wê, gumikên wê, stûyê wê radimûse û paşê lêvên xwe li ser lêvên wê digerîne. Bi qasî çendekê ew lêvên Kevokê dimije. Kevok sist dibe. Ev ramûsanên ku destpêka birûskên hundirê Kevokê ne, dîsan, germahiya

birûskan a berî vedanê, di hundirê wê de tînin pê. Kevok, dîsan, hêdî hêdî, ji xwe ve dere, dikeve nav derya şehwetê. Dîsan çirîskên ronahiyeke bêpayan di hundirê wê de vêdikevin.

Kevok, bi herdu destên xwe, Jîr, hinekî dahf dide û wî, serpiştê, li ser textê razanê, radizîne. Ji Jîr hinekî bi dûr, li ber lingên wî, li ser ejnûyan rûniştî, li ser text, Kevok li Jîr û bedena wî ya tazî dinihêre. Bi qasî kêliyekê, bihust bi bihust, bi çavê nêrevan. Jîr ê here, bêyî ku, ji Kevokê pê ve, haya kesî jê hebe, bi dizî, bi rev, bi lez û bez, ew ê here. Ne gotinên wê, ne jî yên wî bikêr in. Gotin zêde ne, ne hewceyî wan e. Kevok dest pê dike, ji pêçiyên lingên Jîr heta jor, heta ser çavên wî, tilî bi tilî, Jîr radimûse, -bêyî ku ziman û lêvên xwe ji tenê ciwan ê Jîr hilde. Hêdî hêdî, qult bi qult. Her derê bedena Jîr, bi lêvên Kevokê ên germ û mezin, şil dibe. Paşê jî Kevok, îcar, bi porê xwe yê dirêj û şehkirî, ji jor heta jêr, li ser hemû bedena Jîr digerîne. Tayên porê reş û nerm, mîna pelên guleke nûbişkivî, li ser bedena Jîr digerin. Her tayekî zelzeleyekê di hundirê Jîr de tîne pê. Mîna ku bedena wî bi ceyranê ketibe, Jîr diheje.

Jîr dinale.

Kevok bêdeng e; çavên şil, bîhna teng, coşa hezkirinê, deng û pêjnên ku di dil û mêjiyê wê de olan didin wê, dîsan, dîkin sermest. Daxwazên bedena wê ya ciwan ku di bin ronahiya agirê findan de, bi ûsil, dilive, wê, dîsan, dike birçiya hezê, dike yara hez û hezkirinê. Kevok di xew de ye? Ew hişyar e? West rawestiyaye? West bi leza birûskê diherike? Pêlên kêf û hezê ne? Aramiya kaswet û keserê ye? Gelo ev yeka hanê mirin e? Gelo ev yeka hanê, berevajiyê mirinê, vejîn e? Kevok nizane. Kevok naxwaze pê bizanibe. Kevok, hêdîka, seqên xwe ji hev ve dike û hêdî hêdî li ser Jîr rûdine. Bi germahiya goştê Jîr, tîrên ronahiyekê di hundirê wê de vedidin. Ji jêr, ber bi jor, heta qirikê, heta mêjî. Tilî bi tilî, pêl bi pêl. Porê Kevokê li ser rûyê Jîr, tiliyên herdu destên wê di nav tiliyên Jîr de, Kevok, bi hêdîka, xwe dilivîne. Her cara ku ew xwe dilivîne, hêza tîran zêdetir, germahiya ronahiya hundir bêhtir dibe.

Kevok enî û rûyê xwe yê germ ber bi Jîr dike, li rûyê wî, çavên wî dinihêre. Mîna ku Kevokê careke din Jîr nebîne, welê xurt, li kûrahiyên çavên wî dinihêre. Mîna ku Kevok dil dike, hemû ronahiya germ ku di hundirê wê de pêl dide, bi kûrahiyên dil û hundirê Jîr veguhezîne, welê germ û nerm, xwe dilivîne.

Jîr dinale, "tol divê, Kevok, tola miriyên me divê", dibêje û li çavên Kevokê dinihêre.

"Huuuüşş, dol divê " Kevok, aliyekî beden û hêtên wê bi şewqa findan ronî, dengê wî dibire û dibêje, "piştî vê, tu jî bimre, here ba miriyan..."

"Ne dol, tol" Jîr, dîsan bi lava, di nav ronahiya tîrên ku di hundirê wî de vedidin, dibêje.

"Tov, Jîr, tov, bi tenê tov!.." Kevok, bi dengêkî ku ji nalînê xwe digihîne qata qîrînê dibêje. "Bimre, Jîr, niha bimre... Tov, ez ê bi evîna me tovê biçînim Jîr" Kevok, niha, bi qîrîn, mîna ku ew stranekê, yan jî destanekê bixwîne, dibêje; "bi ava te, ez ê biçînim. Bi vê germahiya hundirê xwe, ez ê tovê bihebînim, ew ê zîl bide, mezin bibe... Tov divê Jîro, tov" Kevok diqîre, -û heye ku dengê wê xwe digihîne aliyê derve yê pencera oda biçûk ku êdî bi lêdana berbangê ronî bûye;

"Tov divê."

6. Şev

Baz; zarokê mirinê, zarokê ku ji nav mij û dûmana mirinê derketiye, ku jê hatiye pê. Baz; zarokê ku ji zikê mirinê, ji nû ve, hatiye dinyê. Baz; zabitê mirin û kuştinê ku ji xumama şevên tarî yên mirinê hez dike. Baz; xeberdoxê mirinê.

Niha dîsan Baz. Em vegerin nik Baz.

Em li Welatê Mezin in, lê ne li paytextê welêt, ji paytextê welêt dûr, gelekî dûr, li deverên Welatê Çiyan. Demsal, wext eynî ye; bi qasî çend rojan bi ser wê şeva ronî ya payizê ya Kevok û Jîr re derbas bûye. Wext, dîsan wextên zîz, wextên pêlên hîs û pêjnan e, lê cih cihê ye; Kevok û Jîr li paytextê Welatê Mezin dil, ruh û bedenên xwe, bi hîs û pêjnên têkel didan ber birûskên ronî yên hezê. Herçî Baz e, niha li devekeke din, li Welatê Çiyan, li devekeke gelekî asê, bi hîs û pêjnên têkel, li ser tixûban e.

Belê, em li nik Baz in, li jîpa leşkerî ku ew lê siwar bûye. Em ji devê deriyên mezin ên garnîzoneke leşkerî ya bajarekî biçûk ê Welatê Çiyan ku li ser tixûb e, dikevin hundirê bexçeyê mezin ê garnîzonê. Di jîpê de Baz, şofor û du zabitên din hene. Baz, di nav kincên nû û paqij ên sivîl de, li kêleka şofor rûniştiye. Herdu zabitên ku kincên leşkerî lê ne, li paş rûniştine. Deng dernakeve, kes napeyive. Jîp, hêdîka, di nav toza hewşa fireh a garnîzonê de, dere û li ber xaniyekî ku bi keleheke betonî dişibe, disekine. Şoforê ku leşker e û kincên hakî yên leşkerî lê ye, bi lez, ji jîpê peya dibe, bi gavên bezê, tê û deriyê aliyê Baz vedike. Baz hêdîka peya dibe, bi qasî çendekê li dora xwe dinihêre û

bi destên xwe toza cil û bergên xwe dadiweşîne. Garnîzon di nav aramiya wexta danê êvarê de ye. Ji nobedaran pê ve, leşker, bêtî çek û pûsad, kom bi kom, li ber dîwarên garnîzonê rûniştine. Komeke biçûk a leşkeran, di destê wan de destmal û pêşgîr, ber bi derekê derin. Komek jî, hinekî dûrî meydanê, li koşeyeke garnîzonê woleybol dilîzin.

Dinya sayî ye, bayekî hênuk ê rojhilatê, hêdîka, xwe dilivîne. Ro, hêdî hêdî dere ava. Ro, bi rengê sor ê qemerî, jî dûr, jî kûrahiyên esmanan, ronahiyeke qels, direşîne. Baz li kêleka jîpê radiweste û geh li der û dora xwe, geh li jor, li esmanan û rengê taybetî yê danê êvarê dinihêre. Rojeke din diqulipe, şeveke nû dest pê dike. Pêlê nû li pêlên wextê zêde dibe, xelekeke din bi xelekên bêhejmar ên zîncîra umrê Baz ve tê girêdan.

Sal çend e? Umîr gihîştîye kû? Ev payiz, payiza çendan a jiyana leşkerî ye? Çend payiz, çend zivistan, bihar û havîn hatine û çûne? Eger ne kêmbê, divê ev payiz, payiza bîst-bîst û yekan a jiyana ordiyê be? Yan a bîst û dudîyan? Bîst û sisîyan? Baz dest û lingên xwe hinekî dilivîne, stûyê xwe çend caran xwar dike û herdu destên xwe dibe piştê xwe û pihê piştê xwe diqirpîne. Paşê ew destê xwe dibe rûyê xwe û bi simbêlên xwe yên hinekî dirêj dilîze.

Her çi be, payiza çendan be jî jiyana ordiyê berdewam e, wezîfe û berpirsiyariyên pîroz li dar in.

Mîna îro.

Baz; bejndirêj, qemer, lihevhatî û êdî navsal. Li ser rû aramî, sakînî û heye ku west. Qama wî rast, awirê wî sert. Porê wî reş û kurt. Rîh û simbelên wî reş ên dirêjbûyî. Simbêl hinekî dirêj, rîh kurt. Lêv fireh, poz narîn.

Baz; eniya wî fireh û bilind, li ser eniya şopên dewr û dewranan, hin xêz û qermîçokên ku hemû enî jî aliyekî heta aliyê din dibirin. Çav hûr, vajiyî qam û bala dirêj, mil û eniya fireh, çav biçûk. Mîna çavên teyrêkî baz hûr, kûr û hinekî hêc. Çavên hûr ên reş, –mîna komirê, yan jî em ê bibêjin, mîna du lib kevîrê ya-

qut ê reş ku dibiriqin. Birûyên çaven wî reş û gur, mijang dirêj. Birî û mijangên ku mîna kevanekê aliyê jor ê rûyê wî vedigirin. Rûyê wî yê qemerî hinekî dirêj, çenge û hinarikên rû fireh.

Bejn dirêj, rû dirêj, dest û pî dirêj, birî û bijang dirêj. Umir... umir dirêj?..

Û rû, bi ba û bahozê, bi berf û baranê, bi tav û germê qemerî û hinekî qermiçî.

Lê ya herî girîng nêrîna wî, awirê wî. Tevî aramiya li ser rû, nêrîna wî ya lêgeran e. Ya nêrevanan e. Ya sûzenan, tengezaran e, ya nêçîrvanan e. Ya bazê ku li pey nêçîrê ye. Awirê Baz; çapik, tûj, êrîşker, haydar, emîn û bi xwe bawer. Nêrîna Baz; kûr, hûr, qehûm, sert, lê li pey vê perdê sûzenî, binikî, endîşe, dudilî, fikir û guman.

Bejndirêj, lê hinekî xwar û xûz.

Baz hinekî serê xwe bilind dike û li esmên dinihêre. Li aliyê bakur girseyeke ewran, hêdîka xwe dilivînin. Li aliyê rojhilatê jî ewrine biçûk dixuyin. Rengekî sor ê gewher esman vegirtiye. Piştî bîskekê êvar ê dest pê bike. Piştî bîskekê, bi destpêka êvarê, jiyana Baz a rastîn ê dest pê bike.

Êvar ê çawan be? Şev? Vekirî, girtî, hênîk, sar, bi baran, bi ba? Êvar û şev di hembêza xwe de çi vedişêrin? Baz, hosteyê şevê û tariya şevan, ê bibîne. Tariya şevê her çi jî di hembêza xwe de veşêre, ew tiştê veşartî ya Baz e, ya xwediyê şevê û tariya şevan e. Baz bi vê dizane, ji vê emîn e.

"Ez ê hinekî binivim" Baz ji wan herdu zabitan re ku ji jîpê peya bûne û li kêleka Baz, bi dûzana leşkerî, sert, sekinîne, dibêje, bêyî ku li wan binihêre, "piştî saetekê min hişyar bikin... hingî deste jî divê li vir hazir be û hîn bibin ka hewa dê îşev çawan be..."

Baz, bi gavên sivik, ji deriyê mezin ê avahiya beton dikeve hundir. Nobedarên li ber derî, kesên ku li salona fireh a avahiyê derin û tîn, zabit û leşkerên ku li resepsiyona avahiyê ne, hemû, gava ku ew Baz dibînin, li cihê xwe radiwestin, zexm, pihêt, silav

didinê. Û ew welê, bi rêz û rêzdarî, hinekî bi tirs û xof, rawestiyayî dimûnin heta ku Baz di ber wan re derbas be. Bala Baz ne li ser wan e, ew hêdi hêdî hişê wî li dereke din, di korîdoreke dirêj, pir dirêj re dere. Ji gav û tevgerên wî xuyaye; Baz baş bi van deran, bi garnîzonê dizane. Di dawiya korîdorekê de deriyekî hesinî xuya dike. Baz dere û derî vedike. Li pey derî jî saloneke mezin ku gelekî baş raxistiye, heye. Hema çi bigire hemû aliyên salonê girtî ne, ne pencereyek ne jî cihekî vekirî. Li ser dîwarê ku li hember derî ye, fotografekî gelekî mezin ê General Serdar hilawestiyê. Li ser dîwarekî din jî ala rengîn û di binî de jî rêzek ku bi tîpên gelekî mezin hatiye nivisîn; her tişt jî bo serek û welêt.

Li koncê herî dûrî derî li ser mobîlyayên çermûn ên reş sê zabit rûniştine. Gava Baz dikeve hundir, ew hemû, bi carekê, radi-bin ser piya û li qam disekin. Baz bi serê xwe silav dide wan û di riya xwe de dere, ber bi aliyê deriyekî din ku li aliyê din ê salonê ye. Gava baz digihê ber derî, mûna ku tiştêkî, ji nişka ve, bi bîra wî ketibe, ew dizîvire û jî zabitan dipirse "Hûn dizanin ka hewa dê îşev çawan be?" Zabit li hev dinihêrin. Na, ew nizanin.

"Piştî saetekê yek ê were û min hişyar bike, bila bêyî wî tu kesê din min aciz neke", Baz dibêje, bi kilîdekê derî vedike û dikeve hundir. Cihê ku Baz dikeviyê, odeyeke teng, girtî, tarî û bêhewa ye. Baz pê li qumçika kêleka derî dike û lampa odê vêdixe. Di odê de, hema çi bigire hîç têkberek nîn e. Bi tenê textekî razanê, li jorê text, li ser dîwêr fotografekî rengîn ê General Serdar, li kêleka têxt maseyeke biçûk a textê razanê, li koşeyekê gardrobeke dirêj û li kêlekê jî kursiyekî textîn heye. Li ser masê jî cêrekî avê, îskanek, saeteke hûr, pakêteke cixarê, xwelîdankek û di nav çarçovê de fotografekî biçûk. Baz demança xwe, baretta ku dibiriqe, ji pişt a xwe derdixe, datîne ser masa biçûk, çakêt û pantolonên xwe, gomleg û qirawata xwe ji xwe dike, deriyê gardrobê vedike û bi dûzan wan datîne ser çavikeke gardrobê û tê, dikeve nava ciyan.

Baz westiyayî ye, bi jîpeke teng, ji riyeke teng, fetloke û bi xîç ku bi qasî çar sed kîlometir dûr bû, hatiye. Di nav toz û dûmanê

de, bêtî ku li derekê rawestî, bêhna xwe vedî, tiştê bixwî yan jî vexwî. Tîbûna wî tê bîra wî. Ew xwe hinekî dide hev, ji cêr hinekî av dixê îskanê û bi carekê vedixwe. Lê tîna wî naşê, ew îskaneke din jî vedixwe û dîsan dikeve bin lihêfê. Wî taqet nîn e ku ew li tiştê bifikire, li fotografê zarokên xwe binihêre. Di nav kêliyê de, ew di xew re dere û dest bi xure xurê dike.

Heta ku yek li derî dixê û bêdengiya kûr xira dike.

Baz ku ji xewê re gelekî sivik e, bi dengê derî, bi carekê, hişyar dibe. "Baş e, ez tîm", ew dibêje û ji nav cihan derdikeve. Hişê wî giran, xew li ser çavan e. Ode ronî ye, wî ji bîr kiriye ku lampê bitefîne. Bedena wî sist e, êşêke zirav bedenê sisttir dike. Aliyê çepê yê bedena wî hinekî teviziye. Ew dest û piyên xwe li ba dike, çend caran lingên xwe, heta ber serê xwe ber bi jor dike, piştî xwe, stûyê xwe diqirpîne û li kêleka textê razanê rûdine û îskaneke din av vedixwe.

Êvar dest pê dike. Jiyana Baz dest pê dike. Kar û şixulên Baz ên tariya şevê dest pê dike.

Baz; peyayê şevê, şevger. Baz; şevder.

"Şev, ez tîm", Baz, hêdîka, dibêje, dilopên dawîn ên îskanê vedixwe û radibe ser piyan. Gava ew radibe, nêrîna wî dere ser fotografê ku li ser maseya biçûk e. Di portrê de ew û herdu lawên wî bi hev re ne. Ew li navendê, herdu law li kêlekên wî. Ew li kamerayê dinihêrin û dikenin. Li aliyê rastê lawê mezin, li aliyê çepê jî yê biçûk. Baz dikene, germahîyeke xweş bi ser wî de tê. Divê ew carekê, di van nêzîkan de, here mala xwe, paytextê welêt û zarokan bibîne. Baz bêriya lawên xwe kiriye. "Ez ê bêm ba we jî" Baz, dîsan, bi hêdîka, dibêje û vedigere gardrobê.

Baz çavikeke taybetî ya gardrobê, bi kilîdê vedike û cil û bergên ku tê de ne, jê derdixe, tîne wan datîne ser textê razanê.

Belê, şevê, tariya şevê, cil û bergên şevê divên.

Cil û bergên taybetî yên şevê yên Baz; yanî yên xelkên neçar û belengaz ên Welatê Çîyan, ên şivan û gavanan, ên serhildêran ku niha li hember dewletê, li hember ordî û General Serdar, li

hember Baz serî hildane, yanî cil û bergên kesên ku divê serê wan bête hinciqandin, ên kesên ku divê qira wan rabe. Şalekî kevn ku ji aliyê jor fireh e, -da ku kesê şal li xwe kiriye, bikaribe bi hêsanî xwe tê de bilivîne, lê ji aliyê delingan teng, -da ku mar û dûpişk, kêz û moz nikaribin ji nava delingan re derbas bin, da ku di demên rev, lez û bezê de, devên şal li keviran, xîç, kepir û zinaran nekevin û leza revê nebirin. Kirasekî mildirêj û şapikekî fireh ê tenik ku di germ û tavê de hûnik, di baran û berfê de germ in, ku dest, pî, mil tê de, bi rehetî dilebitin, xwe digihûnîn tîfing û demançan, dar û beran. Coteke goreyên rîs ên rengîn û neqîşandî ku heta ajnûyan e û di meş, lez û beza nav kepir, zinar, gelî û gêdûkan de ling û ajnûyan diparêze. Û cotek pêlavên sivik ku serê wan ji çermekî qehîm, binê wan ji kawicikekî reş ê metîn û sert, bi destan, hatiye dirûn. Pêlavên ku li ber berf, baran, herî, teht, kevir, germ û sermayê, bi hêsanî xwe radigire, ne giran e û lixwekirina wan gelekî hêsan e.

Cil û bergên Baz ên şevê; kincên heyamên dijwar, wextên tarî û deverên asê û çetin. Kincên însanên ku hertim li rê ne, hertim di leza revê de ne.

Baz kiras û derpiyên li ser xwe jî ji xwe dike û tazî li ser milekî textê razanê rûdine û cixareyekê vêdixe û nefeseke kûr jê dikişîne. Dîsan şeveke nû dest pê dike, dîsan wext, wexta "nêçîrê" tê. Serê Baz, beden û laşê wî giran e. Wext weha diherike, sal weha dibuhurin. Weha di odeyên biçûk, tarî, genî, bêhewa de. Weha bi dizî, veşartî. Weha di tariya şevan de. Lê îşev girîng e. Îşev ew divê bi ser kevin. Baz çend nefesên din ên kûr ji cixara xwe dikişîne û paşê radibe ser piyan da ku xwe bide hev, cil û bergên li ser textê razanê li xwe bike. Lê berî ku ew derpiyekî fireh ê mintiqê yê gundiyan li xwe bike, ew li bedena xwe dinihêre. Pirçên ser sînga wî, hema çi bigire hemû spî bûne. Li dora berzikê wî jî mûyên spî di nav reşahiyê de dixuyin. Û serbilindahiya wî ku ew hertim pê serbilind e, niha, bi qasî libekî zeytûnê maye. Ev çendîn wext e ku serbilindahiya wî di nav şilî,

tarî û kûrahiyên jînekê de xwe nelivandiye û mîna şêrekî neoriyaye? Ma ew niha serbilindahiya xwe hinekî bifirkîne? Na, ne wext heye, ne jî hişê wî niha li ser vê yekê ye. "Te jî, mîna min, hewcedarî bi bêhnvedanê heye", Baz dibêje û derpiyê risiwayî li xwe dike. Paşê ew, cixare di dev de, kirasekî tenik ê çavçavî ku dîsan, mîna derpê, li van deveran, li gundan hatiye risandin, li xwe dike. Bi dû re kirasê pîdirêj ê neqîşandî, şalên hûnandî û şapikê rengîn ê neqîşkirî. Baz doxîna şal, bi çend girêkan saxlem dike û di ser doxîn û navtenga şapikê re jî pişteke cawîn a dirêj a reş girêdide. Û bêguman demançe. Piştî ku Baz cil û bergên xwe li xwe dike, xwe tê de dadiweşîne, ew li barettaê dinihêre, gundora demançê vedike, berikan jê derdixe û dîsan yek bi yek wan dixê gundorê, dîk, ling kontrol dike, ji gezik û nîşangê dinihêre û wê, di nav pişt re, bi piştê xwe ve dike.

Niha êdî her tiştî temam e, Baz ji şevê re amade ye. "Şev, ez tîm", Baz, dîsan, dibêje û ji derî derdikeve û bêtî ku li der û dora xwe binihêre, di salon û korîdora dirêj re dibihure, tê salona ber devê derî ku resepsiyon tê de ye û ji wir jî derdikeve derve. Kesên ku li rê pêrgî wî tên, tafilê, xwe didin alî, jê re rê vedikin û qamrast, li silavê disekinin. Gava ew derdikeve der, zabitekî, bi dengê berz, "dîqet" dibêje. Hingî kenekî sivik li ser rûyê Baz dixuyê. Belê, di vê destpêka êvarê de, destê li ber derî, li benda wî ye.

"Êvara we baş" Baz dibêje û bi gavên giran, ber bi destê dibe. Donzdeh kes û du serekên wan ên zabîtku hemû di nav cil û bergên mîna yên Baz de ne, li wir, li hêviya Baz in. Herdu serekên destê tên kêleka Baz, bi qasî du gavan jê dûr li pey wî disekinin. "Hûn amade ne?" Baz, bi dengê sert, ji wan dipirse. Herdu serek û destê, bi hev re, bi yek dengî, "belê" dibêjin. Baz, maxrûr, bi xwe bawer, qehîm û bi gavên pir giran, di ber destê re dere û yek bi yek, bi dîqet, li wan dinihêre. Hemû bi çek û pûsat, bi rext û fişek in. Çekên wan ên dirêj otomatîk, narîncok û bombeyên ku bi kemberên wan ve girêdayî, yên mirin û şewatê ne.

Demañçe, keleşkof, mîtralyoz û du çekên giran ên law, bi wan re ne. Ji pişt heta stû, wan, qor bi qor, rext girêdane. Demañçe, kêr û xencerên wan, di ber pişt wan de, dûrbînên wan li ser sînga wan in. Belê, ew jî amade ne, destê jî hazir e. Belê, nêçîr dikare dest pê bike...

Lê Baz li ber kesê herî dawîn ê rêzê disekine û bi qasî bîstekê, bi hidet lê dinihêre. Xortê nûgihîştî ku li hember Baz rawestiyaye, ne li Baz, lê raste rast li pêşiya xwe dinihêre. "Em derin kû?" Baz, bi dengêkî esebî, ji xort dipirse. Xort, hêdîka "em derin nêçîrê" dibêje. "Hingî?" Baz, dîsan, lê vedigerîne, "hingî, ehmeq... bibêje hingî?" Xortê ku baş tînagihê ka Baz jê çî dixwaze, deng nake. "Ka rîh û simbêlên te? Çi ne ev cil û bergên paqij?" Baz dibêje, "ehmeq, ma em derin seyrangehê, em derin dawet û dîlana bavê te ku te xwe weha xweşik kiriye, xweşik li xwe kiriye!" Baz li herdu serekên ku li pey wî rawestiyane, vedigere, "Vî kerî ji rêzê derxin, bi lez, yekî din bixin dewşê da ku em herin" dibêje û ber bi jêr, aliyê jîp û kamyonên leşkerî dibe.

"De bilezînin lê siwar bin, em derin..."

Û ew bi rê dikevin, —di nav jîpek û kamyoneke leşkerî de.

Baz, ew herdu zabitên ku niha mîna Baz di nav cil û bergên gundiyên Welatê Çiyan de ne, di nav jîpê de, destê jî, li pey wan, di nav kamyonê de, ew ji deriyê mezin ê garnîzonê derdikevin û bi rê dikevin. Garnîzon li kêleka bajarekî biçûk ê kevnare yê Welatê Çiyan e. Piştî ku ew ji garnîzonê derdikevin, li kêleka bajêr, paralelî bajêr, ew dikevin ser rîyeke asphalt. Dinya êdî tarî ye, lampayên bajarê biçûk vêketî ne. Ji bajêr deng tî, dengên zarok, seg, heywan, otomobîl û hin motoran dikevin nava hev, dengêkî têkel tînin pê û li hawîrdor belav dikin. Ev bajarê ku di wextên pir kevn de, li kêleka çemekî biçûk ava bûye û li ser tixûban e û pişt xwe daye çîyan, ji bo ordiyê, ji bo Baz û tevgerên Baz girîng e. Bajar, biçûk lê li hemû navçê nas e, navendeke aborî û bezirganiyê, çûyin û hatinê ye. Pêwendiya bajêr bi welat û dewletên din rejî xurt e. Kes, kom hertim tî û derin. Ordîya ku

dewlet, millet û welêt diparêze û kontrol dike, ji vî bajarê biçûk, hemû navçê kontrol dike. Baz jî, ji garnîzona bajêr, hemû tevgerên xwe li dar dixîne. Lê tevî vê yekê, hema çi bigire tu kes bi hebûna Baz nizane. Baz bi hebûna her tiştî, bi her celeb pêwendî, tevger û lebatên bajêr dizane, lê ne bajar û şêniyên bajêr ne jî kesekî din bi hebûn, tevger û şixulên Baz dizane.

Baz, cixareyek di dev de, li kêleka şofor rûniştî, destekî wî li ber devê pencera jîpê, li taxên derve yên bajêr û li lampayên kolanên taxan dinihêre. "Kontrola bajêr divê zêdetir be, merivên me divê bêhtir bikevin kûrahiyên bajêr, nav şêniyên bajêr," Baz difikire. Paşê, ji nişka ve, Baz ji zabitên li pey xwe dipirse, "bira hewa wê îşev çawan be?"

"Dinya wê hinekî sar be, hin ewr ê hebin û heye ku piştî nîvê şevê baran were", zabitekî, bi kurtebirî, jê re dibêje.

Rê li ber lingên çiyar, paralelî wan, dirêj dibe. Ev rê ne mîna piraniya riyên fetloke yên Welatê Çiyar e. Rê, rast, fireh û asphalt-kirî ye. Baz û desta Baz, di navbera çiya û çemê dirêj de, ji bajêr, dengên têkel ên bajêr bi dûr dikevin û li ser rîyeke dirêj, derin, ber bi hedefên nas ku di hembêza tariya şevê de ne. Ro, tav, roj çûye, tarî, mîna hûtekî, mîna devê tarî yê hûtekî, daketiye. Li esmên, di nav destpêka tariya êvarê de, hin ewr, peregende, dixuyin. Li aliyê çem mijeke tenik, mîna tûlekî hewrîşimî, der û dor vegirtiye. Li aliyê çiyar, li qûntar û sînga çiyar, dar û ber, niha, mîna siya şitilên rehanên li ber devê çeman ku di bin tîna tavê de ne, dixuyin. Kevir, qûç, gir, zinar, dar û berên çiyar ku Baz gelekî baş dinase, niha dîsan bi tarî û bêdengiya şevê ve tîna rapêçandin. Êvareke sakîn û bêdeng a payizê, dîsan, hawîrdor radipêçe. Dîsan Baz, zabit û desteya çekdar, bêdeng, di nav perda tarî ya êvarê de derin.

Ji êvara nû bêhna payizê, bêhna giya û nefelê hişkbûyî, pûş û ka difûre.

Baz napeyive, zabit napeyivin. Ji dengê motora jîpê pê ve, tu deng dernakeve. Her kes, her tişt, di nav bêdengiyê de ye. Baz

û desteya wî ku pir baş bi şixulên xwe dizane, tevgerên xwe, bêdeng, li dar dixînin. Ew hîn bûne, car bi car, ji wan re hatiye gotin, car bi car li wan tembûh bûye; karê wan ne gotin e, lê belê kirin e, bi tenê kirin.

Bi qasî saetekê ew di nav bêhnên taybetî yên payizê û tariya êvarê de, bi jîp û kamyonê, derin. Paşê li ber devê riyeke zahf teng a xîç ku li ber lingê çiyar e, ew disekin. Mîna her carê, şofor ji jîpê peya dibe, tê û deriyê Baz vedike, —da ku Baz peya bibe. Bi dû Baz re jî, zabit û deste peya dibin û tên li hember Baz dikevin rêzê. Baz li wan dinihêre û "li der û dor belav bin, em bi rê dikevin" dibêje û dide ser riya teng ku ji riya fireh a asfaltê vediqete. Jîp û kamyon vedigerin û dîsan ber bi bajêr derin. Baz û deste jî dest bi meşê dikin. Niha jî ew ê bi meşê herin, ber bi çiyar. Ew ê, bi meşê, hilkişin çiyar.

Dido li pêş, dido li paş, yên din jî li der û dora rê belavbûyî, Baz û deste di nav xîç û keviran de dimeşin. Dinya tarî ye, perda tarî ya êvarê dinya vegirtiye. Ev roj û şev, ev ronahiya rojê û tariya şevê! Ev lîstika ronahî û tarîtiyê ku hîç xelas nabe! Hemû dinya, her tişt niha bi rengê êvarê hatiye xemilandin. Êvar, niha bûye mîna zeryayeke bêser û bêber, bûye zeryayeke bêdawîn ku dinya, di hembêza xwe de, mîna filûqeyeke biçûk dibe û tîne.

Tariya êvarê, evçend boş, evçend stûr, evçend kûr û evçend bêdeng.

Û Baz, lawê tarîtiyê, lawê tariya êvar û şevan. Baz niha, di navenda desteyê, di nav erdekî bûr de, li kêleka şiverêya teng a gundan, bi gavên sivik û termûnkirî, ber bi çiyar, hildikişe. Hedef çiya ne, bilindahî û gopikên wan e, newal, gêdûg û kûrahiyên wan ên tarî ye. Baz baretta xwe derxistiye û demançe di destê wî de, tiliya wî li ser lingê demançê, li pêş, li bilindahiyên çiyar ku di nav tariya êvarê de mîna hûtan dixuyin, dinihêre û dimeşe. Endamên destê jî, li dora wî, keleşkofên wan, berik li dêv, di destên wan de, bi lez, bi gavên fireh, dimeşin. Rê çiv dide, gir û kaş derdikevin pêş wan, co, çavik û tîşik tên, gewriyên biçûk û

zinarên asê riya wan dibirin. Lê Baz û destê, peyayên şevê, hosteyên şixulên şevê, rê li ber xwe rast dikin û derin; mîna lawirên van çîyan, ew hildikişin ser kaş û giran, di ser av û kaniyan re, bi hostehî û bi dûzan, gav dikin, di kêlekên cihen asê re, bêyî tu zehmetiyê, dizîvirin. Riya asphalt li pey dimûne, şikêr û zinar li pey dimûnin, pişt û berpalên çîyan li pey dimûnin, dar û devî li pey dimûnin. Ew hildikişin, --da ku ew xwe bigihînin bilindahîyan.

Bilindahiyên çîyan; bi tenê warê teyrên dirinde, bi tenê cihê rêwing û şopwindayîyan, bi tenê deverên nêçîr û nêçîrvanan. Dinyayeke hênîk, na, ne hênîk, sar. Dinyayeke sar, tenê, sawtîjî, xoftîjî. Dinyayeke taybetî ku ji demeke dirêj û vir ve dinya Baz dihûne. Baz, bêhnçikiyayî, xwîdandayî, li kêleka paleke zinarekî disekine, hemû bişkovên şal û gomlegê xwe digire û "em hinekî bêhna xwe vedin" dibêje. Deste, ji hevdu hinekî dûr, peregende, disekine. Paşmêr û pêşmêrên destê xwê didin palên kevir û zinaran, yên din jî, bêyî ku ew bên nik hev, li cihên xwe rûdinin. Baz cixareyekê vêdixe, wê, bi hostehî, di nava kefa destê xwe de vedişêre û çavê wî li ser endamên destê, jê çend nefesên dirêj dikişîne. Dinya pir sar e, lê niha, gava ew ber aliyê din ê çîyan, ber bi jêr dakevin, serma jî wê bikeve. Bêyî tu zehmetî ew bi van deran gihîştin. Niha ew li serê çîyan in. Belê, kontrola van deran, serê çîyan û zozanên bêhejmar ên fireh ên van çîyan di destê wan de ne. Kontrola dewlet û ordiyê li vir jî heye. Hatina wan, hebûna wan a vê kurte-demê, îspata desthilatî û kontrola ordiyê ye. Lê belê tevî vê yekê, divê ordî kontrola xwe li van deran jî xurttir bike. Her gav, her bostê welêt, bêguman wê, di bin kontrola ordiyê de be.

Piştî ku Baz cixara xwe dikişîne, ew radibe ser piyan, "de em herin" dibêje û bi rê dikeve. Îcar di piştî aliyê din ê çîyan re, ber bi jêr. Deste, mîna berê, li çarmedorên Baz belavbûyî, dest bi çûyinê dike. Rê nûn e, şop nûn e, nîşandekên rê û çûyinê nûn in. Tevî vê yekê, ji meşa wan, tevgera wan diyar e; ew van deran dinasin. Rûyê wan li newalekê, ew ber bi jêr dipengizin, --heta

ku ew xwe digihûn hin zivingan ku di qûntarên çîyan de, li ber devê newalê ne. Ji dûr ve, ziving naxuyin. Eger haya merivan ji van deran nîn be, nemaze bi şev, ne mumkin e ku meriv bikaribe zivingan bibîne. Yek ji destê, hinekî ji zivingan dûr, bi lampeya destan, sê caran, ronahiyeke qels, direşîne hawîrdor. Piştî ku ji zivingan jî ronahiyek, se caran, vêdikeve û vedimire, deste, raste rast, dere ber zivingan. Heft kes li wir, li ber devê zivingan, li hêviya Baz û destê ne. Baz û deste li ber devê zivinga herî mezin, li ser keviran rûdinin. Niha heyv derketiye, dinya hinekî ronî bûye. Baz dîsan ji berîka xwe pakêta cixarê derdixê û cixareyekê pêdixê. Hingî birçîbûna wî jî dikeve bîra wî. Ji serê sibê ve ye ku wî hûç tiştêkî nexwariye! "Ez birçî me, em birçî ne" ew dibêje, "çi xwarinên we hebin, tafilê, bînin."

Çar ji wan kesên ku li hêviya Baz û destê ne, gundî ne, gundiyên van deveran, gundiyên Welatê Çîyan ku bi hal û hewalê çîyan baş dizanin. Yên din zabitên ordiyê, alîgirên Baz in. Cil û bergên wan hemûyan jî mîna yên Baz û destê ne. Nêrîna Baz li ser gundiyan, "rêberên şevê kî ne?" ew, mîna ku fermanekê bide, sert, dibêje. Dido ji gundiyan, hinekî, ber bi Baz dibin û "em in, kumandar" dibêjin.

"Ne kumandar, navê min ne kumandar e, Baz e, ji bîr mekin, Baz... Werin li nik min rûnin," Baz dibêje û bi destê xwe cihekî li nik xwe nîşanî wan dide, "Cihê nêçîrê li kû ye?"

"Hinekî ji vir bi dûr, li gundekî xirbe ye, Baz Beg", gundiyekî, bi zimanê Baz, ya rastirîn bi zimanekî ku ji zimanê Baz û ji zimanê gundyê Welatê Çîyan hatiye pê, lê bi devêkeke pir xirab û bi gotinên ku Baz hertim nabihîse, dibêje.

"Ne Baz Beg, bi tenê Baz... Hinekî ji vir bi dûr, li gundekî xirbe", Baz gotinên gundî, bi şeweyê gundî, dubare dike, "hinekî ji vir bi dûr... lê çiqasî dûr?"

"Bi qasî du qonaxan..."

"Bi qasî du qonaxan..." Baz, dîsan, gotinan dubare dike, "du qonax çiqasî ne?"

Niha jî gundî, hinekî heyirî, "du qonax..." dibêje, "du qonax... du qonax, em ê bibêjin, bi qasî wexteke kêşana deh cixaran e, heke em wexta pêçanê nehesibînin..."

"Bi qasî wexteke kêşana deh cixaran..." Baz, bi ken dubare dike, "de baş e, eger em vê wexta kêşandina deh cixaran biqulibînin ser wexta saetê, hingî çiqas dike?"

"Hingî çiqas dike?" gundiyê ku bersiv dide li gundiyê kêleka xwe dizivire û dipirse, lê jê bersivekê wernagire û bêdeng dimîne. Hingî alîgîrekî Baz ku li vê sohbetê guhdarî dike, li Baz vedigerîne, "do, bi şev, em çûn û me der û dorên gund kontrol kirin. Her tişt, bêkêmanî, ji bo nêçîrê, tamam e, gund ji vir bi qasî çil û pênc deqîqeyan dûr e."

"Hingî bila gundî herin nik nobedaran, destê û hevalên vê derê li vir bicivin, em careke din li êrîşê hûr bin."

Gundî radibin û derin nik herdu nobedarên ku her yek li aliyekî zivingan li nobetê ne. Endamên destê û alîgirên Baz jî, yek bi yek, tên û li dora Baz dicivin. Hingî kesê ku ji bo anîna xwarinê çûye hundirê zivingekê, sêniyeke fireh di herdu destên wî de, tê, "tişteki zêde tune, nan, penêr, goştê qelî û hinekî jî sebze" dibeje û sênî datîne ber Baz. Bazê ku mîna gurekî birçî ye, radihêje nanê sêlê yê gundiyan, tîkeyeke goşt û perçeyek pîvaz û îsota hêşîn dixwe nav nêr û dibêje "de dest pê bike..."

Alîgirê ku bersiva Baz dabû, dest bi salixdana êrîşê dike; rê, şeweyên çûyinê, nobedar, cihê rêberan, pergala destê, çek û cebîrxanên ku ew divê bi xwe re bibin, bikaranîna wan, gund, der û dorên gund, ew çend gundiyên ku di gund de dimînin, yek bi yek xaniyên gund, xanî û mala ku nêçîr tê de ne, rapêçana gund, kozik, payin, tevgerên payin û çûyinê û dawiyê jî êrîş, êrîşa dawîn a mirinê, her tişt, kite bi kite, tê gotin. "Derbe ya mirinê ye, divê ya mirinê be", alîgirê Baz dibêje û salixdana xwe ya gelekî dirêj bi dawî tîne.

"Gelo kes dil dike tişteki lê zêde bike, yan jî tişteki bipirse?" Baz dibêje û bi destê xwe yê rastê, devê xwe paqij dike.

Ji kesî deng dernakeve. "Hingî herkes bi karê xwe dizane" Baz radibe ser piyan û dibêje, "hingî em dikarin herin... çek û pûsadên min binîn... û hinekî jî ava vexwarinê."

"Ne pêwist e ku tu werî" alîgirekî Baz jê re dibeje, "tu dikarî li vir li hêviya me bisekinî. Em şixul bi rê dixin û vedigerin."

Baz dikene, xwe dadiweşîne, "ez dizanim ku ne pêwist e, lê ez dixwazim" dibêje û mîna ku tiştek ji nişka ve were bîra wî, ew rûdine, pêlavên xwe derdixe û çend caran wan dadiweşîne û dîsan dixwe lingên xwe. Ew cixareyeke nû vêdixe, "cara dawîn li çekên xwe binihêrin" dibêje.

Hingî çekên wî jî tîn; keleşkofeke dirêj a reş, çardexureke lûledirêj ku di bin şewqa stêr û heyvê de dibiriqe, sê taxim rextên çermûn ku tijî berik in, kêreke dirêj a dudevî, du narincok û cewdikek. Baz wan yek bi yek bi xwe ve girêdide û paşê li ling, maxzen, derzî, xizne û nîşanga keleşkofê dinihêre, berik dibe devê tîfîngê û çeperast davê ser milê xwe.

Deste jî, tevî rêber û alîgirên Baz ku li zivîngan, li hêviya wî bûn, niha hazir in, li rêzê rawestiyane û li hêviya fermana Baz in. Baz tê ber wan, yek bi yek li wan, li rawest, çek, cil û bergên wan dinihêre û paşê vedigere ser zabitekî ku pê re, ji garnûzonê, hatibû û dibêje, "sondê bixwîne..."

Zabîte ku niha dişibe gundiyeke, tekûl dide, sond dixwe, deste jî sondê dubare dike; her tişt jî bo watan, ji bo ala, millet û dewlet... ji bo serek... Serek, bi dil, bi can, bi xwîn, em bi te re ne, ey serek, ey General Serdar...

"De li gora pergala çûyinê belav bin, em bi rê dikevin", Baz dibêje û ew bi rê dikevin.

Ew bi rê dikevin; ber bi nêçîrê, yanî ber bi ewana, yanî ber bi kesên ku li hember dewlet û ordiyê serî rakirine, ku li pey doza perçekirin û jihevexistina dewlet û welêt in. Ewana; xort û kesên vî welatê çîyan ku hertim ji dewlet û ordiyê eciz in, ku hertim li hember dewletê bêbawer, bişik û biguman in. Ewana; serhildêrên ku di her fersend û keysê de, bêyî ku baş bi quweta

xwe û ya dewletê bizanibin, mîna niha, serî hildidin. Ewana; nezana û cahîlên pêncperan ku hîç ji tarîxa xwe, serpêhatiyên xwe, mirin û qetlên borî yên bav û kalên xwe dersan hilnadin. Ewana; serhildêrên ku divê di her qeyd û şertî, dewr û dewranê, cih û warî de serê wan bête hinciqandin... Ji çend salan û vir ve ye ku ewana, kesên van çîyan, dîsan, serî hildane û xwe spartine çîyan, –bi hêviya ku ew bikaribin bi heysiyet, şeref û rûmeta dewlet û ordiyê bilîzin, rûmeta ala û yekîtiya welêt têk bibin û hin xire cir û serêşan, ji bo dewlet û ordiyê, çêkin. Lê ew bi quwet û hêza dewlet û ordiyê nizanin, hîç nizanin. Ew nizanin ku lebat û serhildana wan, ji bo dewlet û ordiyê, mîna vize viza mozekê ye. Bi tenê evçend, dengê zirav ê mozeke ku bi destekî, bi nefesê ji holê radibe.

Lê belê, tevî vê yekê, di nav van çend salan de bi hezaran meriv hatine kuştin, bi sedan leşker, zabit şehîd ketine, bi sedan cih û war kavi bûne, bi dehan qereqol û garnîzonên ordiyê şewitîne û hema çi bigire li her aliyê Welatê Çîyan şerekî peregende, bêdûzan, lê zahf xwîndar, li vir û wir, li gora şeweyên serhildêran, tê pê. Stratejiya serhildêran diyar e; wan dil heye vî şerî raxînin nav wextekî gelekî dirêj û hemû xelkê Welatê Çîyan rakêşînin nav qada şer. Baz û ordî dizane; jixwe xetera herî mezin ev e. Dewlet û ordî divê tu carî rê nede vê yekê. Ne dewletê ne jî ordiyê evçend wext û keys heye. Zûtirîn wext divê serê wan bête perçiqandin, divê ev agir bête tefandin. Ji ber vê yekê ye ku Baz, yek ji serbazên herî berbiçav ê ordiyê, bi wezîfe û berpirsiyariyên gelekî girîng ên dizî hatiye navçê. Wezîfa wî, serekiya hêzên veşartî yên ordiyê ye, yanî erka tefandina êgir, hilweşandina serhildanê, têkbirina hest, daxwaz û coşa raperîne ye. Wezîfa Baz; di tariya şevê de nêçîr, nêçîra însanan, di berbang û danê êvaran de leza li pey rêç û şopên serhildêran.

Wezîfa Baz; kuştin...

"Ev serhildan jî wê bitefe", Baz difikire û di navenda çekdarên xwe de dere; mîna yên berê, ev jî wê bête perçiqandin,

jê şik nûn e... dûzan û pergala sakîn a adîl, rast û tekûz a welêt ê, dîsan, ji nû ve were pê. Ev mêrkujî, keleşî, dizî, şewat û bê-qanûniyên ku li van deran tên pê, dê, bi alîkariya hêza dewlet û ordiyê, ji meydanê rabin. Ev tevger, lebat û êrîşên şeytanî ku li hember mîlet, dewlet û ordiyê, mîna marekîxwe dilivînin, bêguman wê, bi erdê ve yek bin. Bi çi awayî dibe bila bibe, tê de mirin û kuştin, êş û jan jî hebe, serê mar ê bête hinciqandin. Wezîfe ev e. Ev yeka hanê, wezîfa herî girîng a man û nemanê ye."

Baz dere, serê wî li pêş, çekê mirinê di dest de, haletên mirinê li ser sîng, li ber pişt, bi gavên lezê, qehûm, xurt, maxrûr, dere. Bi quweta şewqa sivik a stêr û heyvê, bi hêza rêberiya yekta a gundiyan, bi baweriya çek û pûsadên çekdarên wî yên mirin û kuştinê û bi bîr û baweriya nemiriya dewlet û ordiyê, Baz dere. Baz hakîm e, desthilat e, hukimdarê her tiştî ye, heta hukimdarê lawir, dûpişk û marên nav van zinaran û teyrên van esmanan e. Ew hukimdarê man û nemanê, zayîn û mirinê ye. Her tişt jê tê pirsîn, divê jê were pirsîn. Baz, hukimdar; Baz, serdarê kêf û henekan, jan û êşê, quwet û hêzê; Baz, gernas û hunermend, gernasê şevan, hunermendê şewatan. Baz, dilekî xezebdar ku mîna çiyayê ku agir û şewat jê radibe.

Niha, ji nişka ve, leza desteyê giran dibe. Yek ji gundiyan rêber ku li pêş in, hêdîka tê, di navbera wan de digere, bi destan, yek bi yek, ji wan re tiştêkî dibêje. Belê, wan nêzikî li gundê xirbe kirine. Deste meşa xwe giran dike. Û piştî kêliyêkê, ji dûr ve, hin şewqên qels dixuyin. Herdu alîgirên Baz, bi çapikî, li herdu milên destê, di navbera endamên desteyê de derin û tîn û hêdîka çûyina wan bi rê dixînin. Ew, gav bi gav, ber bi gund ku di nav perda tarî ya şevê de ye, dibin. Bêdengiyeke ecêb boş, lê bixof, li hawîrdor heye; şev, tariya şevê, bêdengî, xof û saw. Lê bi tenê ew du-sê şewqên qels ku bi zehmetî dixuyin, hebûna gund, hebûna şênîyên gund nîşan didin. Lê belê ev bêdengî, ev aramî? Ev nîşana çi ne? Di nav vê bêdengiya boş, tarîtiya kûr de bi tenê dengê meş û çûyina kesên desteyê tê bihîstin. Bi tenê dengê pêlavên wan ên sivik ên van deveran...

Gund dixuye. Ew çend xaniyên xirbe yên gund dixuyin. Ew şewqên qels ku di tariya şevê de mîna çirîskan dilivîyan, niha, hîn çêtir dixuyin. Ji gund hinekî bi dûr, di kortalekê de, destê radiweste. Herkes bi karê xwe dizane, rêber, endamên destê, zabit û aligirên Baz, bi lez, belav dibin û her yek bi derek de dere. Baz, alîgirekî wî, zabitekî ku pê re hatibû, endamekî destê û gundiyekî, hemû bi hev re, li kêleka kortalê, li cihekî ku bi kozekeke tekûz dişibe, bi cih dibin. Cihê ku ew niha tê de ne, kort e, lê pêşî vekirîye. Ew ji cihê xwe dikarin hemû gund û der û dorên gund bibînin.

Belê, ew heta ber devê gund jî hatin. Niha jî ew ê bipên, ji bo derba dawîn a mirinê, ew ê li fersendê bigerin. Baz ê ku xwe gelekî westiyayî hîs dike, keleşkofa xwe datîne kêleka xwe, piştî xwe dide kevirê sert ê kozikê û li erdê, li ser giyayê ku êdî hişk bûye, rûdine. Piştî ku ew hinekî bêhnî xwe vedide, ew cixareyekê, di nav kefên destê xwe de, zahf bi dîqet, vêdixê û wê, di nav kefên destan de veşartî, dikişîne. Şev sayî ye, hawîrdor bêdeng û aram e, stêr û heyv, ji dûr ve, ronahiyeke sivik direşînin ser şevê. Hin ewr, bi giranî, ji aliyê bakur ber bi aliyê başûr dilivin. Mîna ku ev gund, xanî, Baz, destê ne li vê dinyayê, lê di nava zikê çîrok û destanan de ne. Haya kê ji van deverên sawtijî û jîbîrbûyî heye? Çima ev dever, evçend, ji dinyayê dûr in? Baz hinekî diricife, heye ku jîber hîsa tenêti û dûrbûyîna dinyayê, dest û piyên wî hinekî dihezin. Ew xwe dide hev, hêz dide xwe û serê xwe radike û bi dîqet li gund û xaniyên gund dinihêre. Xanî, hema çi bigire, pênc-şeşek in. Xanî li meydana, hema çi bigire, li kêleka hev in. Hinekî ji xaniyan dûr siya girseyeke darên dirêj heye. Pelên daran ku êdî hildiweşin, bi bayekî sivik, dilivin. Û li pey daran jî qûntarên tarî yên çiyayên bilind ên van deveran dixuyin. Bi gotina gundiyan e, xanî xirbe ne, ban û hin dîwarên dido-sisîyên wan hilweşiyane. Dido-sisîyên wan ên ku li nik hev in û ji pencereyên wan ronahiyeke sivik a çirayan dixuye, hinekî saxlemtir in. Xanî bi kevirên qor ên mezin lêbûne. Ji lewre êrîşa

ji dûr ve dê bêkêr be. Lê xanî ne zêde bilind in, nizm lêbûne û pencereyên wan ên fireh hene. Pencere jî gelekî nizm in. Ev nizmahiya xanî û penceran ê şixulê wan hêsan bike. Lê fersend û keys divê, ew divê wexteke baş a êrîşê bi dest xînin.

"Naxwe, ew ronahiya qels ku ji dûr ve dixuya, ev e, li vir e", Baz, hêdîka, ji alîgirê xwe re dibêje, "ronahî, ronahiya keleşan, ronahiya wan a qels... ev ronahî divê bête tefandin..." Van keleşan îşev derseke welê divê ku tu kes, tu carê, di tarîxa wan de, êdî, ji bîr neke. Derseke welê ku ew êdî tu carê ji bîr nekin ku li welêt bi tenê hêzek desthilat e; dewlet û ordî. Bi tenê dewlet û ordî dikare bipeyive, bibêje, ferman bide û bike. Bi tenê gotin û kirinên dewlet û ordiyê, mîna gotinên Xwedê, qehîm, misoger û abadîn in. Ev keleşên hanê divê bizanibin, bi dersan hîn bibin ku li hember gotin û kirinen dewlet û ordiye, bi tenê, riyek heye; îtaat. Ne tiştêkî din, bi tenê îtaat û qebûlkirin, bi tenê pejirandin û bicihanîn... Van û welatê van, îşev, derseke weha divê; li hember gotin û kirina dewlet û ordiyê çare nîn e, herkes, her tişt bêçare ye, bêgav e. Kesê ku vê yekê qebûl neke, divê bizanibe ku dawîya wan jî wê, mîna van be. Dewlet abadîn e, ordî abadîn e, gotin û kirina wan abadîn e. Û ew ê hertim welê be... Ders divê weha be...

Lê keys...

Hê Baz, çavên wî li ser xaniyên gund, weha difikire, deriyê xaniyekî gund ku jê ronahiya çirê diçirise, vedibe û du kes derdikevin derve. Ji nişka ve Baz xwe dide alî û li cihê xwe rûdine. Dengê kesên ku derketine heta ber guhê wan tê. Ew bi zimanê xwe, bi zimanê van deveran, di nav xwe de dipeyivin. Baz, bi destan, bêtî ku devê xwe veke, ji gundiyê nik xwe dipirse ka ew çî dipeyivin. Bi qasî bêhnekê, gundî, bi dîqet, guhê xwe dide ser dangan, lê na, welê dixuye ku gundî tînegihê ka ew çî dipeyivin. Gundî vê yekê, mîna Baz, bi destan, jê re dibêje. Baz, hêdîka, serê xwe hinekî ji kozikê bilind dike û li wan herdu kesan dinihêre. Ew, bi gavên giran, ber bi aliyê xaniyên xirbe derin. Di destên wan de tivingên dirêj hene. Heye ku tivingên wan jî keleşkof bin.

"Naxwe ew jî çekdar in", Baz difikire, hingî şixul zehmettir e. Gelekî zehmet e. Lê çare nîn e. Herçend li hember gotina dewlet û ordiyê çare nîn e, ewçend îşev jî çare nîn e; nêçîrvan divê şixulê nêçîrê bibin serî.

Ew herdu kesên çekdar, bi qasî demeke dirêj, di navbera xaniyên xirbe, der û dorên xaniyan de digerin, ber bi aliyên rojava û rojhilat, bakur û başûr, derin û tîn. Ew, bi qasî panzdeh, bîst mîtro ji kozika Baz bi dûr, di ber wan re jî derin. Paşê ew dîsan dizîvirin xaniyê ku ew jê derketibûn. Lê yek dikeve hundir, yê din li ber derî radiweste. Tiving di destan de, ew li ber derî, di navbera xaniyan de dere û tê.

"Niha şixul hîn diwartir bû", Baz difikire, xwezî gava em gihîştin gund, me, tafilê, êrîş bibira ser wan. Lê welê jî nedibû. Baz û destê niha çi bikin? Ders divê, derbe divê... tevî her tiştî ev yeka hanê divê, ne tişteki din. Ew ê bipên.

Payin; di bin perda şevê de payina mirinê, di nav kincên şevê de, bi daxwazên bêpayan ên dilê germ payina hilweşandinê. Di nav tariya boş a şeva payiza welatekî jîbîrbûyî de payina keys û fersenda xwînrijandin û kuştinê. Payin; bêçaretî û bêgaviyên tîkel û cuda ku bi tenê jê mirin û kuştin tê pê û her û her li van deveran li dar in... Payin, bi dizîka, veşartî payin, yanî li hêviya mohra tîkdan û tîkçûnê bûyin.

Û şev diherike. Lê tevî şevê, tevî tariya şevê, tevî girseya ewran ku xwe dilivînin, stêr hene, heyv heye, ronahiya wan heye. Şev divê tarî be, stêr divê wînda bin, heyv divê biçê ava. Ji bo êrîşê ev pêwîst e. Baz serê xwe radike û li esmên dinîhêre. Stêr, komên stêran li wir, mîna neqşên xalîçeyêke bi destan risandî, hilawestî ne. Kerwankuj diçirise, Leyl û Mejnûn, ji hevûdu gelekî dûr, li hevdu dinîhêrin. Gelawêj, sereka stêran, rêbera şivan, gavan, nêçîrvan, rêwindayî, keleş û mîrkujan, bi şewqeke zêrîn, rawestayê. Komika Sêwîyan li milê rojhilatê xwe dilivînin. Dîwana Eshaban ku li gora hejmartina Baz diwanzdeh stêr in, hêdî hêdî, ji rojhilatê ber bi rojava ve derin.

Û heyv. Û narîniya wê, delaliya wê, xeml û neqşên wê yên çirisî. Heyv, eynî heyv e, mîna heyva zarokatiya Baz a li mala Zarokên Sêwiyan. Di wan rojên tenê de jî heyv, weha, dihat û li ser serê wan hildwestiya. Baz û zarokên din ku xwediyê eynî qederê bûn, di bexçê fireh ê Malê de, bi saetan li heyvê û tevgerên wê dinihêrîn. Tevgerên heyvê, şêwe û şemalên wê, şeng û şoxên wê, celeb bi celeb bûn. Lê di nava wan hemûyan de Baz, herî zêde, ji heyveronê hez dikir. Heyva ku mîna sêniyeke zîv-hêlî dibiriqî û hawîrdor bi ronahiya xwe vedigirt. Hingî quweta heyvê temam bû, hingî heyv zexm û qehûm bû, hingî heyv desthelata hemû cîhanê bû. Di wan şevên heyveronê de, Baz stranê weha ku cêriyên malê li hev arûbûn, digot; heyveronê heyveronê, xwedîya şewq û şemala ronahiyê, lê binihêre heyveronê, teyr û tilûr, kîwroşk û simore li daristanan li govendê, bi ronahiya te ya delalê, lê heyveronê... Di Akademiya Leşkerî de jî hevala Baz a yekta ya şevên bêhejmar û bêdawîn, dîsan, heyv bû. Di wan şevên tenê û piraniya caran sar de, nemaze gava Baz li nobeta şevê bû, çavên wî her li ser heyvê û tevgerên wê bûn. Nobetên şevê tu carê xelas nedibûn. Her du şevan carekê, bi kêmanî du saetan, nivê şevê Baz li nobetê bû. Cixare qedexe bû, razan qedexe bû, peyivandin, stran, çûyin û hatin, xwarin û wexwarin, xwendin û nivîsîn û masturbasyon qedexe bû. Lê li heyvê, li stêran nihêrîn serbest bû. Û şevên ku heyv hebû û Baz li nobetê bû, Baz li heyvê dinihêrî, bi deqan, bi saetan û difikirî, li jîyan û rewşa xwe, li pêşeroja xwe, yanî li van rojên ku ew niha dijî, difikirî. Heyv, hevala wî bû. Hevala wî niha jî bilindahiyên çiyayên asê, piştî zinaran, daristanên bêdeng, tebiyeta rengîn a payizê û çemên zelal vedigire, mîna tûlekî hewrîşimî nerm, zarîf û kîbar wan radipêçe.

Lê îşev ev govenda heyvê ne di cih de ye, divê îşev heyv here, winda bibe. Baz, peyayê tarîtiyan îşev heyv navê, wî tarî, tariya şevê divê.

Lê heyv nare, di ser de jî yek ji keleşan ku di navbera xaniyan de dere û tê, li nobetê ye. Nobedar niha dest bi stranekê kiriye. Stranek ku bi maqamekî giran, awazeke kûr, bi dengê zîz tê gotin. Baz û yên din rûkarin gotinan ji hev derxin, lê dengê dirêj ê stranê, hêdîka, xwe bi wan digihûne. Baz vî dengî, vê celeb gotinê, vî maqam û awazê dinase. Wî, car bi car, li vir û li wir, li vî dengî û li vî maqamî guhdarî kiriye. Gava Baz hê zabitekî nû bû û nû dest bi şixulê ordiyê kiribû, hê hingî, cara yekemîn ew bûbû guhdarê vê awaz û maqamî. Hingî, dîsan ji van deveran, koçeke mezin li dar bû, bi hezaran kesên van deveran, bi trênan, sirgûnî Welatê başûr ê çolan dibûn. Hingî Baz ku kumandarê kompartîmana trênekê bû, li rê, di nav trênê de ev awaz bihîstibû. Xortekî ji koçberan di kompartîmanê de hertim bi vê awazê stran digot. Ev stranên çî ne ku di hembêza vê şeva bêdeng de tên gotin? Ev welatê jîbîrbûyî, ev çiyayên asê, ev tebiyeta hov, ev şeva sawtîjî ya bêdeng û ev stran... Awazeke kûr, dengêkî dirêj, bilind û zîz û gotinên ku hertim dubare dibin... Xusûsiyetên vê celeb gotinê çî ne? Çima ev însanên çiyayî her weha stran dibejîn? Ev, awazên efsaneyên jîbîrbûyî ne, yên destanan in? Ev, dengên kerbê ne, hêrsê ne? Yan jî ev maqamên kêf û kêfxweşiya van însanan in ku bêyî wan tu kes jê fam nake? Baz, kumandar û hakimê van deveran, van însanên çiyayî, divê, bi kite kit, vê yekê hûn bibe.

Lê ne niha. Niha wexta payînê ye, wexta bidestxistina keysekê ye. Wext dere, şev diqulipe, ewr derin û tîn, stêr kêr dibin, ro-nahiya heyvê kêr dibe, lê ew dipên. Alîgirên Baz derin û tîn, bi hev dişêwirin, dîsan derin û tîn, lê ew dipên. Fersend û keysa ku ew dipên, nayê. Dinya sar dibe, avî dikeve erdê, seqema aviyê jî pêlav û goreyên wan ên rîs ber bi jor, ber bi dil û canê wan dibe, ling û çogên wan ditevizin, çavên wan ên li ser xaniyan diqerisin, lê ew bi hêvî dipên. Tevî ku Baz, ji westan, li ber xewirînê ye, ew hê jî bi hêvî ye. Hêvî, tevî her tiştî hêvî, Baz hemû hêza xwe dide hev da ku hêviya xwe winda neke. Baz herdu destên xwe dixe paşla xwe, lingên xwe dilivîne, carina stûyê xwe, pişta xwe

diqirpîne û dipê. Bi hêvî. Jê bêhna xwîdan, toz, gemar, herî, giya û mîzê tê. Baz, gemarî ye, xwe mîna berazekî nava heriyê gemarî hîs dike. Birçî, tî, esebî, ecêb westiyayî, ew dipê.

Çi divê? Alîgir tên û jê dipirsin, rêber tên û çela tehlûkan dikin, zabitên din esebiyeta endamên destê bi wî digihînin. Û stêr, yek bi yek winda dibin, heyv winda dibe. Dinya, ji aliyê rojhilat, li pey çîyan, ronî dibe.

Êdî tiştê ku Baz bikaribe bike, nûn e. Ew biryara xwe dide; xwe bidin hev, em vedigerin.

Gava tîrêjên yekemîn ên rojeke nû li pey çîyan serî hildidin, Baz û deste jî, hêdîka, bi dizî, xwe ji çeperên gund vedikişînin. Bêyî ku Baz bi yên din re bipeyive, ji wan re tiştê bibêje, hemû bi hev re, peregende, dîsan rêber li pêş û li paş, endamên desteyê li hawîrdor belavbûyî, ber bi zivingan vedigerin. Heta ber devê zivingan ji kesî deng dernakeve. Çaxa ew digihên ber zivingan, Baz ji alîgirê xwe dixwaze ku ew taximê, tevî gundiyan, bicivîne. Taxim li ber devê zivingan, bi du qoran dikeve rêzê. Bi qasî kêliyekê, Baz, yek bi yek, li wan dinihêre û "Îcar nebû" dibêje, "rojeke nû dest pê dike. Lê vê roja nû şeveke nû jî heye. Em ê îşev dîsan herin. Niha bêhna xwe vedin û êvarê, gava tarî dikeve, dîsan, li vir, tevî her tiştî, hazir bin."

Paşê Baz, tevî zabitan, dikeve zivinga herî pêş, çek û pûsadên xwe ji xwe dike û li ser doşegên raxistî pal dide. Baz westiyayî ye, ewçend westiyayî ye ku ew nikare bipeyive. Zabitên ku li dorê rûdinin, jê re, li ser gund, xanî, der û dorên xaniyan û keleşan hin tiştan dibêjin, lê ew bi tenê guhdarî dike. Piştî bîskekê taştê ku ji çaya germ, nan û penir tê pê, tê ber wan. Baz du îskan çaya germ vedixwe û pariyekî nan û penêr dixwe. Û paşê, berî ku çavên wî bi temamî bêne girtin û ew di xew re here, mîna ku ew di xewê de be, bi nermahî, ji zabitan re dibêje, "hewa, ewr, stêr, heyv... baş hûn bin ka hewa wê îşev çawan be."

Belê, bi vî terhî şevêk dibuhure û rojeke nû dest pê dike. Di wexta destpêka roja nû de, Baz, dîsan, di tariyê de, tariya ziving

û xewê de, ji xwe ve dere. Roja nû, dîsan êvarek û şevê heye. Piştî ronahiya rojê, dîsan, tariya êvar û şevê dê dest pê bike. Û hingî Baz ê dîsan hişyar be, jiyana wî wê dîsan dest pê bike. Baz, lawê tarîtiyê, kumandarê şevê, wê dîsan xwe bide hev, çek û pûsadên xwe girêbide, bide rê û bikeve pey nêçîrê.

Welê dibe. Gava Baz ji xewa kûr hişyar dibe, dinya dîsan tarî ye. Hema çi bigire hemû bedena wî qerisiye, canê wî diêşe, gewriya wî ya zuwa dişewite. Welê, tevî cil û berg û pêlavan ew razaye. Ew radibe, dest, pî, mil, stû û lingên xwe, bi qasî çendekê, dilivîne û derdikeve ber devê zivingê. Komek ji destê, jê hinekî bi dûr, li ber devê zivingeke din, rûniştine. Gava çavê wan bi Baz dikeve, hemû bi hev re, bi carekê, radibin ser piyan û qamrast radiwestin. Baz wan, bi destan, dîsan, dide rûniştin û dizîvire dere paş zivingan û mîz dike. Bi qasî demekê ew hem mîz dike û hem jî li esmanan dinihêre. Dinya girtî ye, ewrên giran esman vegirtine. Kêfa wî, hinekî tê cih, "weha, weha girtî be" dibêje û vedigere nik komê. Piştî ku Baz koma ku dîsan radibe ser piyan dide rûniştin û bi xwe jî li ser kevîrekî teht rûdine, ew ji alîgirekî xwe dipirse ka hewa wê çawan be.

"Dinya girtî ye, wê girtî be û heye ku baran jî were", alîgirê wî dibêje.

"Hingî tu destê hazir bike, bila ew, piştî nîv saetê, tevî çek û pûsadan, hazir bin", Baz dibêje û ji gundiyan xwarin dixwaze.

Bi carekê re destê hazir dibe. Baz xwarina xwe dixwe, taliya goştê qelî yê mayî jî davê devê xwe û dicû, cil û bergên xwe dadiweşîne, doxîna xwe saxlem dike, demançe, çek û pûsadên xwe girêdide, cixareyekê vêdixe û tê ber destê. Bi dîqet, Baz li wan dinihêre, "di planên me de tu guhertin nîn in", dibêje, "her mûna şeva çuyî, em ê dirêjî gund bikin, li gora agahiyên me, ew ê îşev jî, çend şevên din jî li gund bin. Lê îşev divê em meselê safî bikin... Belê, hingî tekmîl bide", Baz ji alîgirê kêlekê re dibêje û çend gav bi şûn de dere.

Deste bi yekdengî, dîsan, sond dixwe; ... Serek, bi dil, bi can, bi xwîn, em bi te re ne, ey serek, ey General Serdar...

Ū ew bi rê dikevin. Mîna şeva çûyî, bi eynî pergâlê, ber bi eynî hedefê. Lê di rê de tişteki ku ji şeva çûyî cihê ye, diqewime; baran dest pê dike. Pêşî dilop bi dilop, paşê bi xuşînî. Ū tevî baranê, mijeke tenik jî dikeve erdê. Niha ji kêfa baz re payan nûn e. Dinya şil dibe, dinya hîn tarîtir dibe. Herî û celp tê pê, cil û berg şil dibin. Lê ne xem e, ji berevajiyê baş e. Baz kêfxweş e, "zû bikin, bilezînin" ew dibêje, "îşev Xwedê jî bi me re ye..."

Çaxa ew ronahiyeke biçûk ku bi qasî çirîskeke biçûk e, dibînin, ew hinekî radiwestin. Belê, gundê ku tê de îşev jî jiyan heye, yanî keleş lê ne, niha li ber wan e. Baz bang alîgirên xwe dike û bi wan dişewire ka ew ê çi bikin. Îşev, di bin vê baranê de, êdî, mîna şeva çûyî, ne hewce ye ku ew bipên. Eger nobedar hebin jî, ew ê dirêjî xaniyan bikin. Di vê baranê de, keleş ê nikaribin zêde dest bibin xwe û ji xaniyan derkevin. Belê, biryar weha ye. "De pêsmêran tevî rêberan derxin, qor bi qor belav bin. Em ê raste rast bigirin ser xaniyan", Baz dibêje û ew dîsan dest bi meşê dikin. Ew xwe digihîrîn kortala ku ew lê bûn. Lê ew li wir rana-westin, di rêdana pêsmêr û rêberan, ew ber bi xaniyan derin. Tu kes naxuyin. Ji dengê baranê pê ve tu deng nayê. Ji sê xaniyan ronahiyeke qels dixuye. Ew hinekî din jî nêzîkî li xaniyan dikin. Çend gavên din. Kes naxuye. Çend gavên din. Dîsan kes naxuye. Bêdeng çend gavên din û niha ew li ber pencereyên xaniyan in. Baz kêfxweş e, wî bawer nedikir ku ew ê, evçend bi hêsanî, bikaribûna heta vê derê bihatana. Li ber penceran, ew, bêdeng, radiwestin. Paşê her qorekî desteyê, bêdeng, bi gavên giran, dere ber pencera xaniyekî. Sê xanî, sê qor. Ji hundir deng tên. "Baweriya wan bi baranê gelek e", Baz dikene, "baran were, kes nayê... ehmeqino... fermo" Baz li kesên dora xwe, li qorên din, li paşmêrên ku xwe dane ber dîwarên xaniyên xirbe, dinihêre, bi dîqet, çend caran çavê xwe li wan digêrîne û paşê destê xwe yê rastê radike jorê û çendekê welê disekine. Deste, qor, endamên destê, hemû bi hev re, keleşkof, tivingên dirêj, mîtralîyoz û narin-cok di destên wan de, li hêviya Baz in. Hemû li heviyê ne ku Baz destê xwe yê hilawestî daye.

Baran, bi xuşe xuş, dibare. Ji aliyê rojhilat, di ser çiyar re, bayekî xurt baranê dide ber xwe û wê li ser gund direşîne. Çiya, zinar, dar û ber, kortal, gelî, gund, xaniyên gund, Baz, endamên destê, di bin barana bêrawest de, şil dibin. Qor, endamên desteyê di koşeyên xaniyan de, li ber penceran, di nav baranê de, li hêviya fermana Baz in.

Û Baz destê xwe, hêdîka, giran giran, ji jor ber bi jêr dike. Û dengê teqînekê hawîrdor vedigire. Û dengê teqîneke din. Û dengê teqînên din. Car bi car, bêrawest, ji penceran ber bi hundir. Dengê gulebaranê zora dengê baranê dibe. Ji hundirê xaniyan qîrîn tê. Lê dengê keleşkof, mîtralyoz û narincokan zora hemû dengan dibin. Di tariya şevê de, tevî barana zelal, agir dibare. Çirîsk, pêtî, gulok vêdikevin û vedimirin, vêdikevin û vedimirin. Hin dîwarên xaniyan hildiweşin. Çend kes hewl didin da ku ji deriyên xaniyan derkevin, lê serî li ber deriyan dikevin nava heriyê. Gulebaran dewam dike. Berik diqedin, yên nû pê ve dibin, jarjor diguherin, lûleyên tivingan sor dibin û tiving diguherin û berikên têkel ên çekên mirinê, di tariya şevê de, her, çirîsk û pêtî tînin pê. Dinya bi vêketina çirîsk û pêtiyan ronî dibe. Dilopên baranê di nav vê ronahiya mirinê de mîna lûlû û yaqûd dixuyin.

Bêhna barûd û agirê bêhna dar û ber, ba û baranê têk dide.

Heta kengî gulebaran dewam dike? Kes pê nizane, Baz jî pê nizane. Gulebaranê kesên ku gulan dibarînin dîl girtine. Lê piştî demeke dirêj, gelekî dirêj, Baz li xwe werdiqile û li dora xwe dinihêre. Deste ji xwe ve çûye, her ji penceran, ji deriyan, ji lojînan gule direşînin hundir. "Raweste", Baz, bi dengê bilind, dibêje. Lê kes wî nabihîze. "Raweste", ew diqîre, dîsan kes nabihîze. Ew, pihêt, ji milê alîgirê xwe ku li kêleka wî her gule dibarîne, digire û dihejîne. "Bes e", Baz jê re dibêje, "bes e, ji wan re jî bibêje, bes e..."

Piştî bîskekê gulebaran radiweste. Dinya dîsan, di nav tariya şevê de, aram dibe, dîsan bi tenê dengê baranê dimîne. Tu deng nîn e, tu lebat, tu tevger nîn e. Tiliya Baz û yên din li ser lingê

tivingan, bi qasî çendekê, ew welê bêdeng radiwestin. Paşê, "bi-kevin hundir" Baz dibêje. Endamên qorên desteyê, bi careke, di-kevin hundira hersê xaniyan. Bi dû wan re jî Baz dikeve hundir. Du odayên xaniyê ku Baz ketiyê, hene. Ji odeyan bêhneke giran a şewat û barûdê radibe. Ji hin koşeyên odeyan agirekî sivik radibe. Di oda mezin de çirayeke basîd a dîwarê ku hê jî vêdikeve, odê hinekî ronî dike. Lê Baz lampaya xwe ya destan jî berîka xwe derdixe û wê vêdixe û li dora xwe dinihêre. Bêhna xwîn û barûdê difnên Baz tijî dike. Herdu ode jî di nava xwînê de ne. Di oda mezin de çar kes li erdê ne. Yek jî wan hê sax e, dinale. Di oda din de jî sê kes hene ku dido jî wan hê sax in. Baz, yek bi yek, bi lampê, li wan dinihêre. Bêyî didoyan, hema çi bigire hemû xort in. Sisê jî wan heft kesan jin in. Jinek ku di oda biçûk de li serpiştê ketiye û hê dinale, hewl dide xwe ku bikaribe serê xwe bilivîne. Piyekî wê jêbûye, jî stû û navtenga wê xwîn dere. Banê xanî dilop dike û dilopên ku ji banê xanî, yek bi yek, tên, dikevin ser rû û çavê wê. Heye ku jiber vê yekê ye ku ew dil dike rûyê xwe jî dilopan bide alî. Ew nikare çavên xwe veke, lê dil dike, hinekî, serê xwe bilivîne. Baz, hêdîka, serê wê dilivîne û rûyê wê jî dilopan hinekî bi dûtir dixe. Û paşê, bi gavên giran, Baz ji deriyê ku ji hev ketiye, derdikeve. Alîgirên wî jî pê re.

"Em van birîndaran çi bikin?" alîgirê wî jê dipirse.

Baz bersiv nadiyê, serê xwe radike, rûyê xwe ber bi baranê dike û bi herdu destan rûyê xwe bi dilopên baranê dişo. Çend caran ew vê yekê dubare dike û paşê, "biku jin", dibêje, "hemûyan bikujin..."

7. Biyanî

Li bajarê mezin ê Welatê Mezin keçikeke ciwan ji Welatê Çiyan; Kevok.

Çend meh bi dû wê qetliyama wî milê din ê cîhanê. Li paytextê Welatê Mezin. Li nik Kevokê. Êvar û şeveke zivistana bajêr. Êvar û şevê ji jiyana Kevokê. Û êvar û şevê ji jiyana vebêjê vê romanê.

Belê, êvar û şevê ji jiyana min.

Heta niha em geh li nik Baz bûn, geh li nik Kevokê. Me geh çêla kesekî kir, geh komekê. Me geh dewr û dewranên jibîrbûyî, bi zimanê destanê, vegot, geh jî hîs û pêjnên, em ê bibêjin, jiyana roja me, bi zimanê îro vegot. Me hin deng û nefes ji wir, ji kûrahiyên wextên bihurî, hin axîn û nalînên keser û janê, yan jî evîn û hezkirinê ji vir, ji serpêhatiyên roja me, li hev anîn, –da ku yekîtiyeke lihevhatî ya romanê were pê.

Niha jî êvarek û şeveke zivistana paytextê Welatê Mezin –ji jiyana Kevokê û ji jiyana min– vebêjê romanê, –da ku yekîtiyeke lihevhatî ya romanê were pê...

Û dîsan, mîna beşên din, bi vegotineke dema nû.

Em, komeke nivîskaran ji çar welatên Ewrûpa Rojava, li paytextê Welatê Mezin in. Em heşt kes in, sê jin, pênc mêr. Du şaîr, şeş nivîskar. Rewşa hevalên me yên nivîskar, şaîr, hunermend, rojnamevan û ronakbîran li vî welatî ne baş e. Hinên wan girtî ne û roj û şevên xwe, meh û salên xwe li girtîgehên teng, tarî û kufikî derbas dikin. Hinên wan li ber devê deriyê meh-

keman in, -deriyê mehkeman ku li girtûgehan vedibin. Hinên wan jî pêûsa xwe şikandine, zimanê xwe kilîd kirine û bédeng, kelgirî, kesertîjî, rûniştine. Hin jî, bi hêza dawîn, mîna Don Kîşot, li ber xwe didin, li gora îmkanên heyî dinivîsîn, dibêjin, piraniya caran bi şeweyên alegorîk vedibêjin û carina jî diqîrin.

Em hatine paytextê Welatê Mezin da ku em hevalên xwe yên ku li pey deriyên zîndanên in, bibînin, li nik hevalên xwe yên zimankilîdkirî bin, dengê hevalên xwe yên ku li ber xwe didin, bibihîzin û piştgiriya xwe pêşan bidin. Belê, ji bo piştgiriye, lê bêtî ku em baş pê bizanibin ka tesîra wê çî ye.

Ew êvar û şeva ku ez ê, niha, mîna serpêhatiyeke basîd, vebêjim, roja me ya dawîn a Welatê Mezin e. Danê êvarê yê roja me ya pêncemîn e. Şixulê me, yan jî em bibêjin, bernama ku me dabû ber xwe, hema çî bigire xelas bûye. Sibê, gava berbangê lêxist, em ê vî bajarê mezin ku hertim di nav dengên têkel de ye û vî Welatê Mezin ku hertim di nav aloziyên dijwar de ye, terk bikin. Pênc roj in ku em li vî bajarî ne. Pênc rojên keft û leftê, dijwarî û zehmetiyê. Pênc roj in ku em hertim însanên cihê dibînin, her bi fransîzî, bi zimanê Welatê Mezin û bi zimanên din ên ewrûpî dipeyivin, her guhdarî dikin, her jî vî civînê dibezînin wê civînê. Di nav pênc rojan de, hejmara kesên ku me dîtine, bi qasî sêsed kesî ye. Sêsed kesên ku ji hevdu gelekî cihê ne; hinên wan destegîr û gerîndeyên şixulên dewletê, hinên wan nivîskar, rojnamevan, akademîsyen û ronakbîrên muxalîf, hin jî alîgirên kesên girtî, serhildêr û têkoşer.

Em westiyane. Ez westiyame. Bi hezaran, deh hezaran, sed hezaran peyv û gotinên cihê û li dijî hev dil, mêjî û ruhê me/mîn vegirtine. Li her derê wêne, portre û heykelên serekê Welatê Mezin General Serdar. Li her derê gotinên wî yên li ser welat, millet, dewlet, welatparêzî, şeref û heysiyetê. Li her derî ala sêrengîna Welatê Mezin. Ez westiyame.

Bûyera roja dawîn min, bi temamî, ji taqetê, dixîne; nivîskar û ronakbîrekî navdar ê Welatê Mezin, li mehkemê, li ber çavên

me, ji ber gotinên xwe, sê sal ceza dixwe. Na, ew ceza naxwe, ceza didinê. Celsa dawîn a mehkema wî ye. Danê sibê, berî celsê bi qasî nîv saetê, em derin dadgehê. Em ji derî, korîdor û salonên dadgehê ku bi dişibin, labîrentekê derbas dibin û xwe digihînin salona biçûk ku nîvîskarê navdar ê lê mehkeme bibe. Em li ber derî, li ser kursiyên rûdinin û li hêviya vebûna derî disekin. Derî venabe. Nîv saet derbas dibe, wexta celsê tê, derî dîsan venabe. Bi qasî nîv saeteke din jî dibuhure, derî venabe. Lê dawiyê, bi qasî saetek û nîv piştî wexta celsê derî vedibe û em dikevin salona mehkemê. Nivîskarê navdar ku umrê wî li dora şêstan e, bi bejna xwe ya dirêj û bedena xwe ya gelekî jar, li wir, li ber heyeta hakimî, li herdu aliyên wî leşkerên resmî, li pê ye. Piştî wî li me ye, ew me nabîne. Em li ser kursiyên ku li pey rêz bûne, bêdeng, rûdinin. Salon biçûk e, ji bilî du deriyan, deriyê ku em tê re derbas bûn û deriyeke din ku li nîv heyeta hakimî e, tu derî, pencere yan jî cihekî vekirî nîn e. Bêhneke giran a boyaxê ji salonê tê. Li hember me û nivîskarê navdar pênc kes ku hakim in, hinekî li jorî salonê, rûniştine. Li ser dîwarê ku li pey hakimî e, li ser serê wan, portreyeke mezin a General Serdar ku di nav kincên resmî yên leşkerî de ye, hilawestîye û di bin portra wî ya çarçovekirî de jî, bi du zimanan, bi zimanê resmî yê Welatê Mezin û bi zimanê fransîzî, çend gotinên wî hene; her tişt ji bo yekîtiya welat, millet û dewletê...

Welat, millet û dewlet, sê gotinên ku em, di nav van pênc rojên xwe de, heye ku hezar caran, dibihîzin.

Li ber hakimî ku li navenda hakimî rûniştîye, çend dosye hene. Hakim, bi giranî, berçavik li ber çavên wî, pêûsek di destan de, li rûpelên dosyayekê dinihêre. Tu leza hakim nîn e, pêûsa destê xwe yê rastê li masê dixê û hêdîka li dosyê dinihêre. Mîna ku wext rawestayê, naherike. Her tişt di nav bêdengîyeke kûr de ye. Kes napeyive, xwe nalivîne, li dora xwe nanihêre û ji bilî dengê pêûsa hakim tu deng nayê. Piştî çendekê hakim serê xwe ji kaxizan radike û li nivîskar, li me û li salona vala dinihêre.

"Belê", hakîm, bi dengekî gelekî zirav ku meriv ji hakimekî weha napê, bi zimanê resmî yê Welatê Mezin ku ez û du hevalên min ên nivîskar jî pê dizanin, dibêje, "belê, em gihîştine dawiya dawê. Herkesî gotina xwe got. Niha dora gotinê, ya me ye. Lê berî ku em gotina dawîn bibêjin, gelo gotineke te ya din heye?"

Hakim, kenekî zirav li ser rû, li nivîskar dinihêre û jê dipirse.

"Heçî tiştên pêwist bûn, min gotine", nivîskar, bi zimanekî aram û giram, bi dengekî kûr, dibêje, "berî gotina we ya dawîn, gotina min a dawîn jî ev e; divê tu kes ji ber gotin û fikrên xwe nekeve zîndanan, neyê cezakirin û ceza nebîne..."

Piştî gotinên xwe jî, nivîskar, bi giramî, li ser kursî rûdine.

Dîsan bêdengiyek salona bêhngiran vedigire. Em, bêdeng, li hev dinihêrin, bi meraq li dora xwe, li hakimî dimeyzînin. Hakimê navendê, dîsan, dosyan ber bi xwe dikşîne, yekê vedike û lê dinihêre, bi qasî çendekê, îcar tiliyên destê wî yê rastê li ser simbêlên wî, ew li rûpelên dosyayê hûr dibe. Wext dîsan radiweste. Saniye, deqîqe dikarin bê hîjmartin. Hakimê ku li dosyayê dinihêre, niha çi difikire, çi hîs dike? Hakimên din ku bi awireke vala, carna li me, carna li nivîskar dinihêrin, niha çi hîs dikin? Leşker? Ya nivîskar? Em? Hîsên girtiyekî ku ji hemû mafên xwe yê gotin û nivîsînê hatiye bêpar kirin, mecbûrî ji-yaneke tarî, tenê û teng bûye, çi ne? Hîsên desthilatên ku niha însanekî mehkûmî zîndanan dikin? Hîsên kesên mîna me ku dilê wan ji bo nivîskarekî girtî hildavê, lê ne girtî ne û bi tenê "nêrevan" in, çi ne?

Piştî hûrbûneke dirêj, hakim xwe dirêjî aliyê rastê dike û bi herdu hakimên aliyê rastê re, bi dengekî nîzm ku em nabihîzin, dipeyive. Paşê jî bi hakimên aliyê çepê re. Bi dû piste pista wan re jî hakim dibêje, "biryar." Û bi gotina biryarê re, nivîskar û em hemû radibin ser piyan. Hakim, bi gotinên taybetî û kevnare yê hiqûkî, bi hevokên dirêj ku meriv tînagihê, biryarê dibêje. Ew qala gotareke nivîskarê girtî, hin qanûnan, paragrafên qanûnan, edalet, pergal, sazûman, dûzan, welat, millet û dewletê dike. Ez

baş tēnagihēm ka ew çî dibêje, lê di dawiya gotinên wî de, du peyvên zelal hene ku baş tēn famkirin; sê sal.

Biryar; sê sal ceza, ji bo fikr û dîtineke cihê sê sal jiyaneke bend û hepsê. Ne jiyaneke normal a civakî, ne jin û zarok, ne heval û dost, ne nivîsîn û xwendin, ne jî gotin û peyivîn. Ne ger û meş, ne çûyîn û hatin, ne xwarin û vexwarinên ku meriv hil-dibijêre. Ne tav û roj, ne heyv û şev, ne baran û berf, ne germ û tîrêj. Na, bi tenê zîndan, tariya zîndanê. Sê sal, sed û penceh û şeş hefte, hezar û not û du rojên tecrîdkirî yên zîndanê. Biryar; yanî ferman, yanî ceza, yanî bêtehamulî.

Biryar; çend gotinên sar, bêruh, bêpêjn ên hakimekî ku nivîs-karekî mahkûm dike. Çend gotinên resmî ku li gora dîtinên resmî, gotinên nivîskarekî ceza dikin.

Piştî biryarê mehkeme xelas dibe. Lê gava leşker dil dikin ku nivîskar bibin, ew ber bi me vedigere û bi serî, ken li ser rû, silav li me dike. Em jî silavê lê vedigerînin, –bêyî ku em bike-nin, tiştêkî bibêjin yan jî nîşan bidin. Em nizanin ka em çî bikin, şaşmayî, matbûyî, bi tenê silavekê didinê. Bêçare, bêgav. Bi tenê silaveke nerm.

Niha, li oda xwe ya biçûk a hoteleke mezin a payitexta Welatê Mezin, li ser textê razanê, peregende, dirêjbûyî, ez li wî kenê te-nik ê nivîskarê girtî difikirim. Dîsan, bêçare. Bîhnteng. Şaşbûyî. Ew ken... gelo nîşana hêz û quwetê? Baweriyê? Rûmetê? Ara-miya ehlaqî? Kêfxweşiya dîtina me? Nîşana hîsên dostî û pişt-giriya navbera nivîskaran? Yan jî kenekî zirav û qels ku ji bêça-retiyê hatiye pê? Ji hêrs û kerbê hatiye pê? Nîşana hest û hîsên aloz? Xwezî îmkan hebûya ku meriv bi nîviskar re, li ser kenê wî bipeyiviya. Xwezî. Lê nivîskar niha li dûr, li pey deriyên girtîge-hê, li zîndanê, ez jî li vir, li oda hinekî hênik a hotelekê me. Û ez ê sibê, di berbangê de, vî welatî terk bikim û vegerim, herim. Nivîskar ê bimîne.

Dîwarên spî yên odê dibiriqin. Mîna ku dîwar, rengê dîwa-ran pêl didin û xwe dilivînin. Mîna ku dîwar jî dipeyivin û ew

gotinên ku me di nav van pênc rojan de hertim bihîstine, dubare dikin; alîkarî, piştgirî, azadî, serbestî, maf, heq, hiqûq, edalet, şer, pevçûn, serhildêr, keleş, welat, millet, dewlet, qanûn, dûzan, însaniyet... û edebiyat, hêza edebiyat û afirînê, nivîskar û berpirsiyariyên nivîskar, roman, quweta romanê, di welatekî weha aloz û yekdengî de zehmetiyên afirîna berhemên edebî... Di vî danê êvarê yê girtî de, mîna ku dîwar bi ser min de tîn û bi van gotinên ku jixwe dor li min teng kirine, bêhnna min diçikînin. Ez xwe dispêrim tariyê û çavên xwe digirim. Lê bêkêr e, gotin li der û dora min olan didin, ew kenê zirav, mîna xelekên şerîda fiilmekî, çav bi çav, di hişê min de dere û tê, dere û tê.

Ne bi tenê ez westiyayî û şaşbûyî me. Ne bi tenê bêhtengî û hîsa bêpayan a bêçaretîyê dilê min vegirtiye. Tirs jî heye. Ez ditirsim jî. Ez bi tenê me, li odê me. Odeyên hevalên min jî li kêleka min in. Ez ê sibê jî herim. Lê ez ditirsim. Mîna ku ez ketime ber pêlên kabûsekê, tirseke bêtarîf, tevî ku ez naxwazim, di hundirê min de, gav bi gav, fireh dibe.

Ez çavên xwe vedikim, xwe hinekî didim hev, jiber tirsê, bi ber xwe dikevim. Ez ji şûşa wîskiyê ku li ser masa biçûk a kêleka textê razanê ye, hinekî wîskî dixim nava qedehê û bi du caran, li ser hev, hemû qedehê dadiquftînim. Mîna ku pizoteke agir ji gewriya min ber bi jêr bibe, welê gewrî û hundirê min dişewite. Bi dû dilopên êgir re, ez radihêjim kitaba ku li kêleka şûşê ye. Kitaba ku ez, ji mêj ve ye, dixwînim, romanek e. Lê rûpelên romana ku ez bi kêfxweşî dixwînim û li ser vegotina Homeros a vegera Odiseus ava bûye jî alîkariya min nake. Rûpel nikarin min ji wan dangan, ji wî kenê tenik, ji serpêhatiyên min ên van pênc rojan û ji vê tirsê ku êdî bêhnê li min diçikîne, bi dûr xînin. Ne hesret û hêrsa Odiseus, ne keser û axîna Penelopê, ne hest û daxwaza Telemakos û ne jî vegotina bêpayan a Homeros û nivîskarê romanê dikarin min ji tora şik û xeman rizgar bikin.

Ez rûpelên sar û bédeng ên romanê digirim û radibim ser piyan. Gava ez derim ber pencerê û ji pencerê li çemê ku hinekî dûrî

min e, lê li ber min diherike, dinihêrim, ez bi tiştêkî dihesim; ez her çi jî bikim, ez ê nikaribim xwe ji van hûsên vî welatî bi dûr xînim. Ji lewre, ez divê, ji berevajiyê rev û dûrxistinê, herim ser van gotinan, van bûyeran, vê tirsê, -da ku ez bikarim van fam bikim. Û hingî, gava ku min ev fam kirin, heye ku ev tirs biqulibe ser hêviyekê, heye ku ev bêhtengî ronahiyekê bîne pê... Kî dizane!

Lê hewldan divê. Sebir û metanet divê. Cesaret, hinekî cesaret divê, -da ku ez bikaribim xwe bi kûrahiyên van pêwendî, bûyer û gotinan bigihînim. Yan jî ez weha bibêjim; hinekî cesaret divê, da ku ev hemû pêwendî, bûyer û gotin bikaribin, bi hêsanî, xwe bigihînin kûrahiyên dil û mêjiyê min.

Tava ku li pey ewrên giran e, dere ava. Tîrêjên wê yên qels ku bi hezar zehmetî di navbera ewran re diseridin, bi zehmetî, xwe digihînin çem û regekî zîvîn didin çemê qedîm ê bajêr. Di bûlwarên kêleka çem de otomobîl, lampeyên wan vexistî, derin û tên. Dinya tarî dibe û êvara min a dawîn a vî welatî dest pê dike.

Ez vedigerim ber masa biçûk û qedehê dîsan tijî wîskî dikim û tîm ber pencerê. Sûretê min, bi alîkariya lampa hundir a odê, li ser pencerê dixuyê. Piştî çend qultan, ez li sûretê xwe yê pencerê dinihêrim û bi deng, hinekî jî bi hêrs, "tirsok" dibêjim, "li xwe warqile, li xwe vegere... çi yê te ji van însanan, ji wî nivîskarî zêde ye? Bibêje tirsok!" Sûretê aliyê din ê pencerê li min dinihêre, lê heyret, ew bi ken li min dinihêre. "Hingî me li hev kir", ez dibêjim, dilopên dawîn ên qedehê vedixwim û ber bi serşokê derim.

Bernamea me ya êvarê ji du beşan hatiye pê; pêşî şîva êvarê li balyozxana welatekî ewrûpî ku mazûvaniya ziyareta me ya Welatê Mezin dike. Paşê jî, em ê, tevî musîkjen û stranvanekî navdar ê Welatê Mezin ku ez û du hevalên din dinasin, herin bara ku stranvan lê stranan dibêje.

Bi qasî şêst kesan, nivîskar, rojnamevan, parlamenter, dîplomat, siyasetvan, awukat, li şîva balyozxanê civiyane. Salona fireh a balyozxanê, ji bo şîvê, amade bûye. Lampayên spehî û

awîzeyên krîstal vêketî ne, li ser maseyên ku bi dûzan rêz bûne, teyîkên zêrhêlî bi nîşana qralê welêt dibiriqin, fîndên dirêj ên spî dişewitin, lampayên biçûk ên tabloyên qral û mezinên din ên welatê Ewrûpayê ku vê êvarê mazûvaniya me dike, reng-ekî têkel ê bedew direşîne ser tabloyan. Garson, di destê wan de sênîyên biçûk ên vexwarinên têvel, di navbera mêvanan de digerin. Û mêvan di nav kincên paqij ên spehî de, qedehên vexwarinên têvel di destê wan de, li ser piyan, bi hev re dipeyivin.

Şîva ku ji çeşnên lezîz ên midbexa welatê ewrûpî hatiye pê, jî, bi vî terhî, tê xwarin. Piştî xwarinê, gava mêvan dîsan radihêjin qedehên konyak, wîskî, vodka û celebên din ên vexwarinê, sefîrê bejndirêj û rûken, bi gotinên bijarte yên gotareke kurt, behsa serdana me ya Welatê Mezin dike. Bi dû sefîr re, hevalekî jî delegasyona me spasdariyên me hemûyan pêşkêşî sefîr, mêvanên ku hatine, kes û rêxistinên ku alîkariya me kirine dike û gotinê tîne ser nivîskarê ku niha li kuncêkî tarî ya girtîgehê ye. Hevalê me gotina xwe, bi gotinên nivîskar dawî tîne; tu kes divê, ji ber gotinên xwe neyê cezakirin...

Derengê êvarê, piştî ku gelekên mêvanan diçin, em jî, ji sefîr û kesên din ên balyozxanê xatir dixwazin û derdikevin şeva çiksayî ya zivistana paytextê Welatê Mezin. Tevî stranvanê ku di şîvê de bi me re bû. Şev sar e. Ewrên ku di destpêka êvarê de esman vegirtibûn, hinekî, belav bûne. Hin stêr dixuyin. Kolan, cade û bûlwarên fireh ên paytextê, bi şewqa lampayan, ronî ne. Otomobîl û taksî, bi dengêkî tîz, bêdengiya şevê diqelişînin û derin. Hin kesên peya di nav palto û mantoyên xwe de, li kêlekên kolan, dilezînin. Bara ku stranvan lê stranan dibêje, ne dûrî balyozxanê ye. Stranvan dil dike, em peyatî herin. Di şeva xerîb a paytextê xerîb de, em bi rê dikevin. Bi gavên lezê. Meraq, tirs, west û sîzenî li ser rûyan. Niha wext, ne mîna wê wexta dadgehê ye; wext, niha, bi lez, diherike. Deqîqe, saet derin.

Em derin.

Gava em di ber hotêlê re derbas dibin, çar hevalên me, ji me vediqetin û vedigerin hotêlê. Em, yên mayî, stranvan li pêş, em jî li dora wî, derin barê. Bar, bi du qatan e. Qata jêrîn mîna restoranê ye, gelek kes li dora maseyan rûniştine xwarin dixwin. Qata jorîn jî bar e. Bara zahf fireh heta dêv tijî ye. Bi sedan însan li dora maseyên biçûk rûniştî yan jî li ber barê, li piyan in. Hewa barê gelekî giran e, dûxana cixarê û hilma nefesên têkel ketiye nav hev. Qata jor mîna qata jêr ne ronî ye. Ronahiyeke loş ji koşeyên barê, bi zehmetî, barê ronî dike. Gava em dikevin hundir û çavê şênîyên barê bi stranvan dikeve, çepik dest pê di-kin. Stranvan herdu destên xwe bilind dike û silav dide şênîyan. Ez bi hatina xwe poşman dibim, lê êdî veger nabe. Em ber bi maseya ku ji bo me hatiye veqetandin, derin. Maseyeke fireh a gulover li koşeyekê li hêviya me ye. Piştî ku em rûdinin, garson hin şûşeyên vexwarinê û hin teyîkên xwarinê tînin û ahengeke xweş didin masê, yek ji pîsta barê navê stranvan dixwîne. Stranvan radibe, di nav çepik û dangan de, ber bi pîstê dere. Orkest-rayek ji çar kesan, tevî haletên xwe yên musîkê, li pîstê ne. Piştî çepik û dangan, stranvan dest bi stranê dike. Bi zimanê Welatê Mezin. Bi dengekî gelekî gur, bi rîtmeke coş û bi gotinên edebî.

Stranvan dibêje; çavên wî yên mezin tên girtin, bejna wî ya kin û qaling diheje, rîh û simbêlên wî yên gur dilivin, rûyê wî yê qemerî ber bi jêr û jor dibe. Herdu destên wî li ser mîkrofonê, mîna ku ew ji xwe ve çûbe, stranvan dibêje. Em lê guhdarî dikin. Şênî lê guhdarî dikin. Ew qîre qîra berî çendekê, niha, nûn e. Bêdengiyeke kûr, aramiyeke xurt daketiye ser salonê. Stranvanê ku her, bi gotinên basîd û pîrî caran vulger, henekî dikir, niha, qulipiye ser însanekî din. Însanekî ku tu pêwendiya wî û vê salonê, van însanan, vê dinyayê nûn e, tu gotinên vê dinyayê yên rojane ji devê wî dernakevin. Însanekî ku ketiye nav cîhana gotinên hunerê û ji wan dengên ku raste rast xwe digihûnin dilê merivan, ava dike. Çavên min ên westiyayî û mêjiyê min ê matbûyî bi vê guherîna ecêb jî şaş dimûnin. "Musîk", ez ji hevalê

kêleka xwe re, bi dengêkî pir nîzm, dibêjim, "li quweta musîk û hunerê binihêre."

Guh û çav li ser wî, stranvan dibêje.

Heta kengî ew dibêje, ez nîzanim, lê paşê, piştî demeke gelekî dirêj û gelek stranên dirêj, stranvan rîtma gotinê giran dike, hêdî hêdî stranê diqedîne û çavê xwe, bi ken, vedike. Stranvan, dîsan, li dinya ku em tê de ne, vedigere. Pêla çepikan dest pê dike û bi qasî bîskekê, bi xurtî, dewam dike. Paşê stranvan çepikan dibire, "îşev hin hevalên nivîskar jî bi me re ne" dibêje û me, yek bi yek, bi navên me, dide nasîn.

Stranvan tê û li nik me rûdine. Ez niha wî hûn çêtir dinasim, hûn çêtir bi hunera wî dihesim. Însan tîn ber masa me û stranvan pîroz dîkin, pê re dipeyivin. Piştî çendekê keçikeke bibejn û pordirêj tê. Pêşî ew stranvan pîroz dike, paşê ber bi min tê. Ew li ber min disekine, destê xwe yê rastê dirêj dike û bi ken, "bon-soir" dibêje, paşê jî bi zimanê Welatê Mezin didomîne, "ez we dinasim, min romana we xwendiyê."

Belê, romaneke min, "Tarîxa evîneke keserkûr", ku evîna kesekî jîbîrbûyî di nav cil û bergên tarîxeke kevn de vedibêje, berî niha bi qasî salekê, hatibû wergerandin û li Welatê Mezin weşiyabû. Lê min bawer nedikir ku yekê, îşev, were û qala romanê bike. "Spas", ez li keçikê, hinekî şaşbûyî, dinihêrim û dibêjim, "spas ji bo xwendina te." Ez nîzanim ka ez çi bibêjim, ji devê min gotin dernakeve.

"Zimanê wê gelekî xweş bû", keçik, li pê, dibêje, "lê li ser naverokê hin gotinên min hene." Belê, wê dil heye bipeyive. "Fermo", ez dibêjim, "fermo, were rûne" û ez kursiya kêlekê ya hevalê min ê ku çûye avdestxanê, nîşanî wê dikim. Ew rûdine.

"Evîn", ew, bi rûniştinê re, dibêje, "evîn... hûn qala evînê dîkin. Evîna kesekî, kesekî ku li pey mij û dûmana tarîxê maye. Hûn qala evînê dîkin û xwe dispêrin tarîxê..."

Ji devê min, bi tenê, gotinek derdikeve, "belê", ez dibêjim û di bin ronahiya loş de, bi dîqet lê dinihêrim. Keçik, xort e. Umrê

wê, em ê bibêjin, li dora bîstan e. Çavên wê yên mezin û gelekî xweşik, tevî qelsiya ronahiyê, dibiriqin. Çavên wê, porê wê yê dirêj û awirê aram ê li ser rûyê wê, tavilê, bala merivan dikişîne. "Evîn", ew, dîsan, dibêje, "evîn, îro, li vir, li vî welatî, bi hemû xurtiya xwe, bi hemû celebên xwe, tê jiyîn. Ne hewce ye ku meriv xwe bispêre tarîxê, vegere nav rûpelên zerbûyî yên tarîxê..."

Ez hinekî dikanim, "di nav van pênc rojên me yên vê derê de, me gelekî li gotina evînê guhdarî kir" ez dibêjim, "me ewçend lê guhdarî kir ku ez bawer im, heta demeke dirêj, gotina evînê dê ji devê min dernekeve."

"We ne li gotina evînê, li derewan guhdarî kiriye", ew, çavê wê li ser qedeha min a li ser masê, dibêje, "hema çi bigire hemû gotinên ve paytextê derew in, divê hûn guhê xwe nedinê. Evîn li wir, li aliyê herî dûr ê vî welatî, li pey wan çiyayên serî li esmanan tê jiyîn. Ez behsa wê evînê dikim, ne derewên van deran... Û li wir ne bi tenê evîn tê jiyîn, tarîx jî, ew tarîxa ku hûn ewçend jê hez dikin, ewçend behs dikin jî, îro, li wir tê jiyîn. Li wir..."

Ez têdigihê, "gelo tu tiştekî venaxwî?" ez dibêjim.

"Na, spas."

"Hingî tu ji wî aliyê welêt, ji Welatê Çiyan î?"

"Belê", ew li min dinihêre û dibêje, "ez ji wir im... ji welatê jîbîrbûyî... Hûn hatine vê derê, niha li derewên vî bajarî guhdarî dikin, sibê, du-sibê hûn ê vegerin û herin û hûn ê dîsan bikevin nav rûpelên tozgirtî yên tarîxê û çîroka evîn û tarîxê bibêjin... bêyî ku hûn wî welatê jîbîrbûyî bi bîr bînin, bêyî ku hûn bala xwe bidin ser evîn û tarîxa ku îro, bi xwîn, bi hemû celebên şidetê, tê jiyîn... evîn jî, tarîx jî li wir e, di nav xwînê de ne, bi xwînê tên avdan... Min dil kir, hûn bi vê yekê jî bizanibin..."

Ez hêz didim xwe da ku ez bikaribim bala xwe ya westiyayî û belavbûyî bidim ser gotinên wê yên tijî û xurt. Bi hemû dîqeta xwe, ez lê dinihêrim. Ew ji nêrîna min, hinekî, eciz dibe. "Navê te çi ye?" ez dibêjim, "tu li vî bajarî çi dikî?"

"Çi qîmeta navê min heye? Min xwest, ez hîsên xwe yên wê dema ku min romana we xwend, ji we re bibêjim. Navê min, em ê bibêjin, xwendevan e, xwendevaneke we ya amator."

"Tu çi dikî, bi çi şixulî mijûl î?"

Ew aciz dibe, li dora xwe dirîhêre, "ez xwendevan im", dibêje, "ziman û edebiyata fransîzî dixwînim". Ew radibe, dixwaze here. Heye ku ew, bi hatin û xebardana xwe poşman e.

"Çima tu dilezînî", ez dibêjim, fermo rûne, "romana min... tu nikarî romanekê mîna neynikekê bibînî, mîna rastiya jîyan û civakê bihesibînî... roman, edebiyat, bi îhtimaleke herî baş, utopya ye, xewneke pêkanî ya rastiyan e. Ne welê?" ez gotina dawîn, bi zarûn, dibêjim da ku ew belkî rûne.

Ez bi ser dikevim, ew dîsan rûdine. "utopya, xewn..." ew, gotinên min dubare dike, "lê utopya û xewnan hîs, deng, pêjn, hêrs, ked, keser, kêf, girî, bi kurtî, jîyan navê? Ew çi edebiyat e ku bê jîyan e, tê de jîyan nîn e, na? Edebiyat çi ye? Heke edebiyat nikaribe bibe strana jîyan û ronahiyê hingî mana edebiyatê çi ye?.. Eger edebiyat nikaribe ruh bide gotinan, gotinan jîndar bike û bi alîkariya gotinên jîndar jîyanê salix bide, hingî edebiyat ji bo çi ye? Wezîfa edebiyatê, *quand même*, bi baweriya min, ev e." Ew hin tiştên din jî dibêje, lê ez baş fam nakim. Musîkeke gelekî berz dest pê kiriye. Komek xort hatine û dora stranvan girtine, pê re, bi ken, dipeyivin. Gotinên keçîkê baş nagihin min. Ez serê xwe, dîsan, hinekî ber bi wê xwar dikim. Bêhneke xweş jê tê. Ew xwe vedikişîne, lê gotina xwe berdewam dike.

Lê hevalê min ê xwediyê kursî tê. Keçîk gotina xwe dibire û radibe ser piyan. Welê dixuye ku ew bi hatina hevalê min kêfxweş dibe. Dîsan ew destê xwe yê rastê dide min û bi fransîzî, ji min xatir dixwaze, "au revoir." Ez radibim ser piyan, "min dixwest li we guhdarî bikira", dibêjim, "lê..." Ez ê çi bibêjim? Keçîk kenek li ser rûyê wê, îcar bi serê xwe, xatir dixwaze, vedigere, bi gavên giran, porê wê yê dirêj li ser milan, dere, di kêleka barê re dibihure, xwe digihûnê aliyê din ê barê û winda dibe.

Gotinên keçika ku bi reverev çû, di hişê min de, ez li hevalên li dora masê vedigerim. Stranvan zikê xwe yê qelew dilivîne û dikene. Hevalên min ên din jî hewl didin ku bikaribin dengê xwe bigihînin hev. Musîk, bi gume gum, dewam dike. Mîna ku ez ne li wir bim, kes ne li dora min be, yan jî li wir ez bi tenê bim, ez qedeha xwe ya valabûyî bi şaraba spî tijî dikim, li pêlên biçûk ên nava qedehê dinihêrim û li gotinên keçikê difikirim. Di nav van pênc rojan de min hîç gotinên weha nebihîstibûn. Gotin min kêfxweş dikin. Na, ne kêfxweş, gotina kêfxweş ne di cih de ye. Gotin min didin fikirandin. Hêza gotinan, bedewiya wan. Quweta wan a gotinê, vegotinê, îknakirinê, pêwendî û diyalogê. Maneyên wan ên cihê. Mesela evîn... gotina evîna ku kesên vî bajarî bi kar tînin û evîna ku vê keçikê niha behs dikir. Çavên wê yên kilkirî yên kûr, gelekî kûr, bêguman evînê dibîne. Bêguman evîneke wê ya taybetî heye, evînen wê yên xas hene. Û gotinên wê yên li ser edebiyatê... rexne? Hîseke tarî ya şikestinê? Şîret? Bi tenê nêrevaniyeke edebî? Hest û kela keçikeke sergerm? Coşa xortaniyê? Daxwazeke taybetî? Tika?

Çiqas wext derbas dibe, ez nizamim, lê bi dengê stranvan ez dîsan vedigerim barê, dora masê. Tiliyên min li ser çavê min ê rastê ne. Ji dûxana cixarê çavên min dişewitin. Stranvan dipirse ka ez birçî bûme. "Na", ez dibêjim. Na, ez westiyayî me. Ez gêj im; mat im şaşbûyî me.

Ez dixwazim vegerim hotelê. Hevalekî min ê din jî dixwaze. Em radibin. Stranvan dixwaze me heta hotêlê bibe. Lê hotêl nêzîk e, li wir em ji wî xatir dixwazin, spasdariyên xwe dibêjin û bi lez, ji wê qîre qîra dengên boş direvin. Li der, li ber deriyê barê, bayekî sar î seqem, mîna kêrê, rûye min dibire. Ez diricifim, qumçikên palto digirim, herdu destên xwe dixim berîkên paltoyê, serê min li ber min, nefeseke kûr dikişînim. Ez û hevalê min, em ber bi cadeya mezin bi rê dikevin. Em napeyivin. Ne ez, ne hevalê min dil heye bipeyive. Tiştên ku em li ser bifikirin, gelek in. Dinya dîsan tarî bûye, ewran esman vegirtine, stêr

naxuyin. Li kolana biçûk ku em lê ne, şênî gelek e. Em, bi gavên giran, ber bi cadê derin. Em ê ji koşa kolanê bifitilîn û berê xwe bidin hotêlê. Gava ez serê xwe radikim ku li kesên kolanê binihêrim, çavê min bi sê kesên ku ji koşê difitilîn, dikeve. Du jin û mêrek.

Gelo keçikek ji wan, ew keçika barê nebe? Bejn û porê wê yê dirêj bi wê dişibe. Ez dilezînim, hevalê min jî bi min re. Lezandî nake, ez bi gavên revê derim û xwe digihînim koşê. Ez bawer im, ew e. Ji dûr, bi zimanê Welatê Mezin, "şeva we baş", ez dibêjim. Ew vedigerin û li min, kesê ecêb, kesê xerîb ku bi xwe jî nîzane ka çi dike, dirûhêrin.

Belê, ew e.

Ez xwe digihînim wan û destê xwe dirêjî keçikê dikim, "ji dûr ve min hûn dîtî." Keçik, ez bawer im kenek li ser rû, hevalên xwe bi min û hevalê min ku digihê me, dide nasîn. "Dinya sar e", ez dibêjim, "ez qefilîm, hûn bi kû de diçûn?"

Na, ew ne li ser rîya malê ne, li cihekî sakîntir digerin. Ez firsendê narevînim, dîsan destên min di berîkên paltoyê de, "fermo, em herin hotêla me, lobiya hotêlê sakîn û germ e..." Ew spas dîkin, wan dil nîn e ku ew werin hotêlê. Ez îsrar dikim, "min dixwest li te jî guhdarî bikira", ji keçikê re dibêjim. Hevalên wê dîsan dibêjin "na", lê ew deng nake. "Hotêl gelekî nêz e û lobî heta sibê vekiriye"

"Hûn çi dibêjin?" keçik ji hevalên xwe dipirse, "em herin?" Lê bêtî ku ew li bersiva wan bisekine, li min vedigere û "fermo, em herin" dibêje. Em, bêdeng, ber bi hotêlê, bi rê dikevin. Piştî bîskekê keçik û herdu hevalên wê hinekî li paş dimînin û dîkin piste pist. Hevalê min jî tê nik min û hêdîka, "ez westiyayî me, ez ê herim razem" dibêje. Gava em digihên ber deriyê fireh û otomatîk ê hotêlê, hevalê keçikê, "em neyên", dibêje, "gelekî spas."

"Çima?" ez, hinekî heyirî, dibêjim.

"Na, spas" lawik dibêje, "bila Kevok were, lê em ê herin malê." Naxwe navê wê Kevok e! Hevalên wê dê herin, lê ew ê

bimîne! Herdu hevalên wê ji wê û ji me xatir dixwazin, vedigerin û di nav şeva sar de winda dibin. Em jî ber bi deriyê hotêlê derin. Gava em derin ber resepsiyonê da ku em fam bikin ka kes li me geriyaye, hevalê min jî, bi fransîzî, xatir dixwaze, kilîda xwe ya odê ji resepsiyonê werdigire û ji me vediqete. Ez û wê ber bi lobiya fireh û spehî ya hotêlê derin. Lobî aram e, ji hin kesên ku li dora hin maseyên gelekî nizm, li ser kursiyên çermûn rûniştine, pê ve kes nûn e. Garsonêkî cih nîşanî me dide, lê em cihekî sakîntir tercîh dikin, li kêleka maseyeke hinekî ji kesên rûniştî bi dûr, li hember hev, rûdinin. Rûyê min ber bi aliyê cadê ye, yê wê ber bi dîwêr. "Em cih biguherînin" ez dibêjim.

"Na, ne hewce ye, weha baş e", ew, hinekî esebî, dibêje.

"Sakîn be", ez dibêjim, "gotinên te gelekî bala min kişandin, ez dixwazim li te guhdarî bikim, em bipeyivin..."

"Sakîn be" ew jî, bi ken, dibêje, "ji bo we gotin hêsan e, lê ne ji bo me. Li vî welatî gotin biha ne, mîna welatên aza û serbest ne erzan in. Di vê cehenemê de gotinekê dikare bibe sebebê jiyana mirov..."

"Naxwe, navê te Kevok e?"

"Bav û diya min, der û dora min, hevalên min welê dibêjin. Kevok, kevoka gundê çîyan, kevoka çîya û zozanan. Lê ez li zozanan nehatime dinyê, ji berevajiyê, li çoleke germ a qije qij. Ji Welatê çîyan, çîya û zozanan gelekî dûr, li sirgûnê, di germeke nedîtî de. Heye ku hesreta dê û bavê min a çîya û zozanan rê li vî navî vekirîye. Ji ber ku ew, em bi qasî sê salan li wan çolan mane."

"Tu naşibî gundiyan? Bav û diya te jî li vir dijîn?"

Ew dikene, "tu ji kû dizanî ka gundî çawan e?" destê xwe yê çepê davêje ser milê kursiyê çermûn, lingên xwe davêje ser hev, li min dinîhêre û dikene, "na, ez ne gundî me, lê birekî girîng ê jiyana min li gundekî çîyan derbas bû. Havînan em diçûn gund. Ez û diya xwe. Bavê min ê ku hertim meşgûl bû û hê jî welê ye, wext nûn bû, bi me re bihata. Na, bav û diya min li vir najîn, ew

li bajarekî mezin ê Welatê Çiyan e. Bavê min awukatekî navdar ê Welatê Çiyan e. Awukatekî navdar ku bûye şîrîkê derewên vî bajarî, vî camêrî..." ew dibêje û bi destê rastê tabloyeke rengîn û stûr a General Serdar ku li dîwêr hilawestiyê, nîşan dide.

Gava garson tê ber masa me, ew gotina xwe dibire û li masa ku ji fayansa şehkirî çêbûye, dinihêre. Garson di nav sêniyekê de qedeheke şaraba spî û fîncanek qehwe tîne, qedehê datîne ber min, fîncanê jî ber wê. Ez çend qultan ji şaraba spî vedixwim û bi dîqet, hê ku çavên wê li ser masê ne, lê dinihêrim. Keçika ku li hember rûniştîye, gelekî spehî ye. Çavên wê yên reş xwedî kûrahiyeke bedew û nêrîneke aram in. Çav mîna du libên tiriye reş ê gir in. Rûyê wê vekirî, lihevhatî û sakîn e. Awirê wê, yê kesên bixwebawer, jixwerazî, zana û têgihîştîyan e. Çend keziyên porê reş eniya wê ya fireh, mîna tabloyekê, dineqîşînin. Eniya fireh li rûyê vekirî tê. Porê wê yê reş, xelekî û dirêj, mîna pêlên deryayekê, dibiriqe. Heye ku wê porê xwe, bi regekî mor î qemerî, hine kiriye. Wê çavên xwe kil kirine; mijang û birûyên wê, bi regekî tarî yê gelekî xweşik, mîna neqş in. Li pey kûrahiya çavan, li ser bîbikan coşek dixuye. Belê coşek, lê di eynî wextê de keserek, xîzînek. Lêvên wê fireh û tijî ne. Kî van lêvan di nav lêvên xwe de dihebîne? Stûyê wê, mîna sitûnekê, dirêj e. Tilî û pêçiyên destên wê jî. Keçik; bejndirêj, pordirêj, stûdirêj, tilîdirêj. Şekil û bala wê ecêb lihevhatî ye, beden û endama wê, di nav bedewiyeke tabî de, bêpayan balkêş e. Ne hewce ye ku ew tu boyaxî li xwe bide, ji bo xweşikî û bedewiyê tiştekî taybetî bike. Welê dixuye ku ew jî bi vê yekê dizane, kil û boyaxên li ser rû, çav û lêvan ne zêde ne, di nav pîvaneke hesabkirî de tenik û sade ne. Zik, navteng û hêtên wê, mîna tîrên vekîşiyayî, balkêşiya bedewiyê derdixe kata herî bilind.

Niha, piştî ku wê mantoyê xwe ji xwe kiriye, di bin ronahiya awîzeyên krîstal ên lobiye de, şemal û endama wê çêtir dixuye. Pêşîrên wê yên vekîşiyayî sînga wê dike navenda bal û nêrînê. Hêt, çîp û ling mîna stûnên antîk, bi bedewî, dirêj in.

Keçik; xweşikiyeke asîl, lê hinekî hov. Bedewiyek ku bi ava hênîk a gêdûgên Welatê Çiyan mezin bûyî. Delaliyek ku ji ba, bahoz, berf û hênîkahiyên çiya û zozanên welatekî dûrî dinyê hatiye pê. Sikûnet û aramiyeke sirtiî. Jinîkek ku, ez bawer im, dikare ji yana merivan biqulibîne ser xewnên bihuştê. Yan jî be-revajiyê wê, jiyanê li merivan bike dojah?

Piştî ku ew du serî şekir dixe nav qehwê, bi kevçî tev dide û jê hinekî vedixwe, ew bala xwe ber bi min dike û bi çavên pirstîjî, ji min dipirse, "Çawan, we li vî bajarî hinekî wîjdanê xwe rehet kir?"

Wîjdan, rehetiya wîjdanê...

Zimanê ku ew pê dipeyive, zimanekî kîbar ê xwendeyan e. Ew zimanê resmî yê Welatê Mezin baş dizane, baş bi kar tîne. Lê meriv ji şeweya gotina hin peyvên fam dike ku ew ziman ne zimanê wê yê yekemûn e. Bêşik, zimanê wê ji zimanê min ê jihevketî yê vî welatî gelekî çêtir e, lê bi qewlê zimanzanan "aksana" wê jî heye. Ez bi zimanê xwe yê şehetî bersiva wê didim, "çima tu weha dipeyivî? Gotinên te mîna tîrên jehrîn in... Me dil kir, em li nik hevalên xwe yên rewşxirab bin, piştgiriya xwe nîşan bidin. Çi xirabiya vê heye?"

"Tu xirabiya wê nîn e, lê tu feyda wê jî nîn e. Sibe, dusibe hûn ê vegerin, em ê bimînin."

Ez gotina wê dibirim, "sibê, na, ne sibê jî, niha, piştî çend saetan em ê vegerin", dibêjim.

"Belê, hûn ê vegerin... Heye ku hûn li welatên xwe çêla gera xwe, behsa dijwarî û zehmetiyan jî bikin, lê piştî demekê hûn ê her tiştî ji bîr bikin û vegerin odeyên xwe yên teng û tarî yên nivîsînê. Hûn ê vegerin nav çîrokên xwe yên tarî yên dûrî me, dûrî mirovan, dûrî mirovahiyê. Lê xwîn, wê mîna berê, li vir, li wî aliyê din ê welêt, biherike, şidet, qîrîn, girîn, gazin, hawar, kîn û nefret ê dewam bike."

Gava ew dipeyive, bedena wê jî, li gora rîtmaya gotinên wê, dilive. Ew dest û tiliyên xwe, li gora tempoya gotinan dilivîne. Lê aramî û bedewiya rû, tu carî, naguhere.

"Ū hûn ê, mîna her carê, romanên xwe yên nefestari, bedbîn binivîsîn û biafirîn."

"Lê gotinên te li hev nakin", ez, ji bo ku ew bêhtir bipeyve, dibêjim, "tu çêla şidet, kîn, nefret û xwîna ku li vî welatî diherike dikî û me jî bi bedbînî sûcdar dikî..."

"Na, ez we sûcdar nakim, bi tenê tiştekî ku hûn nabînin, ji bîr dikin, bi bîra we tînim. Ez ne bawer im ku di gotinên min de dijberî hene. Edebiyat, roman divê ronî be, ronahî bireşîne. Ji ber ku jiyan tarî ye. Ronahî û tarîti... aha ev tişt in ku di hemû tarixa edebiyatê de bûne meseleyên sereke, esasî... ronahî û tarîti... Helbet hûn bi destana Gilgamiş dizanin, ne welo, hûn pê dizanin?"

Ji dêla ku ez bersiv bidimê, ez ji qedeha xwe hinekî şaraba sar vedixwim, bi meraq lê dinihêrim û li hêviya wê dimînim.

"Vegotina herî kevn a însaniyetê Gilgamiş e, ne welo?" Bi awayekî gelekî taybetî û aksaneke xas ew dibêje "ne welo". Ew gotinê dibêje, li min dinihêre, ji min pejirandinekê dipê û bêtir ku li bersiva min bipê, gotina xwe didomîne, "di destana Gilgamiş de, gelo şerê Gilgamiş bi kê re ye, li hember kê ye? Hûn ê bersiv nedin, ez bibêjim, li hember tarîtiyê. Vê beşa daristanê bînin bîra xwe; Gilgamiş dikeve nava daristanê, daristan tarî ye, hinekî din dere, tarî ye, hinekî din, dîsan tarî ye, hertim tarî ye, lê ew dere, dimeşe. Heta ku Gilgamiş xwe bi ronahiyê bigihîne, ew dimeşe. Aha edebiyat, kaniya edebiyatê ev e, weha dibêje; şerê ronahî û tarîtiyê. Ronahî û tarîti, evçend basîd. Eger hûn qaşilên berhemên edebî jê bikin û xwe bigihînin kakilê, hûn ê bibînin ku pîrsa bingeîn a berhemeke bedew a edebî ronahî û tarîti ye. Pîrsek ku ji rojên Gilgamiş heta îro nehatiye guherîn. Lê îro kî bala xwe dide wê vegotina kevnare ku kaniya bingeîn e? Na, hîç kesek bala xwe nadê, ji berevajiyê herkes bi çavekî nîzm û biçûk li vê destanê dinihêre. Di edebiyata we ya bedbîn û teorîyên we yê edebî yê gelekî bilind de cihê vê destanê nîn e. Di edebiyata we ya pîr bedew de ku hûn diafirîn, navê vê destanê *folklore* e. Folklor jî, bi qewlê we, jixwe ne edebiyata bedew e. Ev

celeb vegotin, ya barbaran e. Bi qewlê we, çeşneke passe. *Deja vu...* Ne welo? "

Ez, bi tenê, bi ûsil, bêyî ku wê eciz bikim, dikenim. Şênîyên lobiye niha hîn kêmtir bûne. Dengê musîka kemançeyekê, giran, hêdî, tê. Lampayên hin aliyên lobiya fireh vemirîne. Aliyekî rûyê keçikê, niha, di bin siya tarîtiyeke tenik de ye. Tarîtî û ronahiya ku ew behs dike, niha, li ser rûyê wê ye. Ew, niha, hîn bedewtir dixuye. Lêvên wê dilivin. Bi livandina lêvan, bi vegotina gotinan, bi hevaltiya dengê kemançe, ew hîn spehîtir dixuye. Garsonê bejndirêj, hêdîka, tê nik masa me û dipirse, ka em tiştekî dawîn dixwazin, -ji ber ku ew ê barê bigirin. Keçik dîsan qehwe dixwaze. Ez jî. Xewa min tê, xewa ku li ser çavê min e, nahêle ku ez, çêtir, li keçikê guhdarî bikim. Qehwe dê baş be.

"Li wir, li cihê ku deng ji quwetê ketiye, bê stran maye; çiya bê mij û dûman, deşt bê zevî û bê hêşinahî maye; beden bê taqet, dil bê hêvî, mêjî bê hiş maye; jin, heywan, tebiyet stewr mane; Gilgamiş, li wir, li wî welatê ku di nexşeyan de navê wî nîn e, hê, dijî. Ronahî û tarîtî, şerê wan li wî welatî dijî, welatê ku îro di nav xwînê de ye, lehiya xwînê wî mîna pelekî fireh ê dara gûzê a qedîm daye ber xwe û dibe, welatê ku dengê ba û baran, berf û seqemê li ser kaviên wî, mîna straneke şînê, vizînî dike, welatê ku rû û awirê însanên wî yên qemerî, mîna kaniya avmiçiqî, bêhevî maye, bêçare ketiye, welatê ku tarîxa wî ji miriyan, şehîdan, qehremanên ku di newalan de, bînav, bêgor, ketine, hatiye pê. Lê hûn ê ji kû, bi çi quwetê bala xwe bidin wan deran!.."

Niha, bi van gotinên keçikê re, ez wê tirsê ku danê êvarê bêhna min diçikand, dîsan, hîs dikim. Ez hinekî eciz dibim, lê wekî din jî, ez nizamim çima, ez dixwazim, ew bipeyive. Di wê navberê de garson digihê hawara min. Keçik gotina xwe dibire. Garson, mîna berê, bi rêzdarî, fîncanan datîne, qedeh û fîncana valabûyî yên masê werdigire û dere.

Bêyî ku ez wê tirsê hundirê xwe nîşan bidim, "welat, welat-parêzî, tarîx, qehreman, qehremanî, şer... ez ji gotinên weha zêde

hez nakim" ez, bi ken, li rûyê wê, li navenda çavên wê, dinihêrim û dibêjim, "herçiqas bi qasî te nebe jî, ez bi serpêhatiya bextê reş ê welatê te dizanîm. Lê ev gotinên ku tu niha, mîna şaîrekê, li pey hev rêz dikî, pirî caran dibin kemîn. Heye ku ew carina alîkarî li dilekî aloz, ruhekî birîndar dîkin, lê piraniya caran ew nîrekî gelekî giran in, dahf û xefk in, deriyê dojahê ne, deriyê welatê mirinê, yê Hadesê ne..."

Ew dengê xwe nake, bi qasî çendekê li min, bédeng, dinihêre, paşê vedigere ser fîncanê, du serî şekir dixê, tev dide, jê çend qult vedixwe, piştî ku ew fîncanê datîne ser masê, mîna berê xwe ber bi paş dike, lingên xwe davêje ser hev û "eger ez bi dilsoziya we bawer nebûma, ez ê nehatima vê derê û bi we re nepeyiviyama" dibêje, "piştî vê şevê, ez ne bawer im ku em ê careke din hevdu bibînin. Îşev, ez bawer im, wê bibe cara yekemîn û dawîn. Lê hûn divê tiştekî bizanibin, ew dûrahiya ku hûn tê de dijîn, we jî însanan, însaniyetê, bûyeran jî bi dûr dixîne. Hades, hûn dibêjin... Hades, jî bo we, îro, bi tenê gotineke metaforîk e. Jixwe we jî, ez bawer im, bi wê mana metaforîk gote. Ne welo? Lê ez ji we re bibêjim, Hades îro rastiya me ye, rastiya wî welatê dûr e. Ew welat îro Hades e. Hadesek ku ji mirinê hatiye pê, bi mirinê dijî û bang li mirinê dike û herkesî ber bi xwe dikişîne..." Ew çavên xwe ji min direvîne, li dora xwe dinihêre, bi qasî çendekê, keserek li ser rû, ew li hemû aliyên lobiya ku niha êdî vala ye, dimeyzîne û hinekî xwe dizîvirîne, jî pencereyên gelekî fireh li derve, li cadê dinihêre. Cade vala ye, ne kesek, ne jî taksiyek. Ew vedigere ser masê, fîncanê, çavên wê li ser fîncanê, pêçiya tiliya mezin a destê rastê li dora devê fîncanê digerîne, "Hades li wir e", dibêje, "Hades bang dike. Herkes dere... Jîr jî çû. Ez ê jî herim..."

Ez êdî napeyivim. Ji ber ku keçik hew bi min re dipeyive. Ew difikire, bi dengê gelekî nizm ku bi zehmetî bi min digihê, ew di nav serpêhatî, hîs û pêjnên xwe de digere. Li lobiye kes ne-maye, dengê musîkê hatiye birîn. Li der, li aliyê din ê penceran berfê dest pê kiriye. Kuliyên berfê yên spî ku mîna stêran dibi-

riqin, hêdî hêdî, ber bi jêr dibin. Lê ez jê re behsa berfê nakim, naxwazim meşa wê ya deng, pêjn û hîsan têk bidim.

"Çû" keçik, çavê wê hê jî li ser fîncanê, dibêje, "bi reve rev çû. Şeva dawîn, şeva payizê ya bi ba, zelal, şeva aram, şeveke mîna xewnan. Ew şeva ku niha bûye xewnek, ji xewnekê pê ve ne tu tişt e. Şeva ku bi lampayên bûlwaran hinekî ronî bû. Bi ronahiya hundirê bedenê şewqtiş bû. Şeva ku wî ji pencerê li derve, li dinyê, li dûr, li dinya herî dûr a gerdûnê dinihêrî. Şeva ku welatê Hadesê olan dida. Wê şevê ez peyivîm, giriyam, li ber geriyam, lê ew çû. Jîr çû. Nêrîna wî li ber çavê min, dengê wî hê li ber guhê min, mîna ku ew ji xewnekê derkeve û bikeve hembêza xewneke din, wînd a bû û çû. Ji min mepirse ka Jîr kî bû... Jîrê ku evîndar bû, vegirê evîn û dilan bû, Jîrê ku jîr bû, çû... Me, min û wî behsa dolan dikir. Paşê, bi gaziya Hadesê, gotina dolê qulipî ser tolê. Şeva dawîn, berî ku ew here, min, bi germahiya bedenê, gotina tolê qulipand ser tovê. Lê Jîr bi ser ket; tol ma, dol çû, tov jî berî niha bi du heftan çû. Jîr çû. Mîna tîrêjên tava danê êvaran, pêlên deryayên li qiraxan, bayê li nav daristanan, berfa li ber tavan, mîna wan, Jîr wînd a bû û çû. Dûr e êdî. Dûrahiyeke bêpayan kete navbera me êdî. Veqetîn, kesera veqetînê, xizîn; qedera me, qedera min. Ez li milekî dinyê, ew li milekî. Ne dengê, ne xeberek. Lê ruh yek e, ruh bûne yekgirtî. Ne çûyina payizê, ne hesreta zivistanê, ne payina biharê û ne jî dûrahiya havînê. Dil dizanin, ew ê ji bo çi hilbavên. Hades bang dike, dîsan olan dide... Ez ê jî heşim..."

Ez hew dikarim xwe rabigirim, "binihêre, berf dibare" ez dibêjim û gotina wê dibirim, "li spehîtiya berfê binihêre."

Ew li xwe wardiqile, serê xwe dizîvirîne, bi qasî çendekê, li derve dinihêre, "spehîti", ew, bi ken, dibêje, gava ew li min vedigere, "helbet spehîti... bêguman ji lobiya germ a xalîçeraxistî xweş e. Lê ew, serhildêrên ku bi olana Hadesê rabûne govendê, niha çi dikin, li kû ne, wan li wî welatê çûyin û nehatinê stariyek peyda kirine?" Ew radibe û ber bi pencerê dere. Çakêtekî reş ê

dirêj û pantolonên hinekî teng ên cawtarî lê ne. Bi qasî bîskekê ew, destên wê di berîkên pantolonan de, ji pencerê li derve, li berfê dinihêre. Ez ji cihê xwe nalivim, hişê min li ser gotinên wê, ez jî li wê dinihêrim. Dinya hinekî –heye ku bi barîna berfê re, heye ku bi lêdana berbangê re– ronî dibe. Ew vedigere ber masê, lê rûnane. "Ez êdî herim", ew, mûna ku di xewnekê de be, dibêje.

"Tu dizanî" ez, hêdîka, dibêjim û radibim ser piyan. Min jî êdî ne taqeta sohbetê, ne guhdar kirinê ne jî fikirînê heye. Mêjiyê min ê, jixwe westiyayî, niha, bi temamî, ji hev ketiye. Lê ez li wê, li wî rûyê xort û ciwan dinihêrim; kenekî zirav û kîbar, kenekî balkêş. Nêrîneke xurt, bixwebawer, nêrîneke ziravbihîstiyar. Şopeke hêviyê, payinê, çûyinê, şopeke daxwaz û hesretê. Û li pey perda nêrînê keserek, kesereke bêgaviyê, dudilîbûnê.

"Mere", ez dibêjim.

"Na", ew, bi ken, dibêje, "ez êdî herim, ez westiyam û min tu jî westandî."

"Mebesta min ne niha ye, mere wî welatî..."

"Ew welat... ew welat... serê xwe pê m'êşîne" ew dibêje û ji deriyê fireh ê hotêlê derdikeve.

"Ez navnîşana xwe, jîmara telefona xwe bidim te, heye ku rojekê hewce be", ez dibêjim û pê re derdikevim derve, nav berfa ku hêdîka dibare.

"Na, spas" ew dibêje, "ne hewce ye, êdî tiştek ne hewce ye" û ew ji min xatir dixwaze, hêdî hêdî, di nav berfê de, dere û winda dibe.

8. Sûzenî

Baz.

Li paytextê Baz, li nik Baz. Çar meh bi dû wê êrîşa gund re li paytextê Welatê Mezin.

Baz vegeriyaye. Ji Welatê Çiyan, ji mirin û kuştinê, ew do vegeriyaye bajarê mezin.

Li ber destê sibeyeke sayî, em li ber deriyê mala Maderê ne. Baz pê li zengilê mala Maderê dike. Deng ji hundir, mala Maderê ku li taxa kexana bajêr e, nayê. Baz dîsan pê lê dike. Deng nîn e. "Were", Baz, esebî, dibêje, "were derî veke Mader, deriyê jiyana min, were..."

Di vî danê sibê de jî dîsan xwîn heye; Baz bi xwîn e, rûyê wî, destê wî, kirasê wî yê spî bi xwîn e. Porê wî belavbûyî, pêşiya palto û çakêtê wî û sînga wî vekirî ye. Çavên wî yên westiyayî sor bûne; bûne mîna du findên pêketî. Sê şopên sor ên pencên neynûkan li ser rûyê Baz dixuyin. Xêz kûr in. Li dora lêvên wî jî xwîn heye.

Çi bûye? Çi qewimiye?

"Derî veke", Baz, bi qasî çendeke dirêj, pê li zengilê dike û îcar bi dengê bilind dibêje, "Mader, jina qebraxa, derî veke... Mader, ez ketime bextê te, derî veke..." Lê derî venabe. Baz hinekî ji derî bi dûr dikeve, serê xwe radike û li jor, li pencereyê eke fireh dinîhêre û diqîre, "Mader... Mader..." Bi dû çend carên qîrînê re, ew dîsan tê ber derî û îcar bi destan li derî dixê, "veke, qehb keça qehban, veke qehbika hemû bajêr, hemû welêt... veke, diya min veke..."

Derî venabe. Piştî ku teseliya Baz dikeve, ew, hêdîka, xwarî erdê dibe û li ber derî, li ser totikan rûdine. Ew niha çi bike? Ber bi kû de here? Ew dîsan, bêrawest, vegere Welatê Çiyan û dakeve hembêza şeva tarî? Ew dîsan bibe hevalê xwîn, mirin û kuştinê? Bikuje, xwe bide kuştin? Ma ew hê nû ji deverên mirin û kuştinê nehatiye? Ew niha çi bike, li kîjan derî xîne, li ser kê biqîre, kê bikuje, derd û kulê hundirê xwe ku wî dikoje, ji kê re bibêje, li nik kê bi zarîn bigirî?

Nalet li te be jîyan! Xwedê bela xwe bide te qeder, siûd! Siûda teres, bênamûs!

Dinya ronî dibe, tûrêjên tavê xwe bi kolana teng û dirêj ku mala Maderê lê ye, digihûrîn. Kolan vala ye, bi tenê çend segên tiral, bêdeng, serê wan li ber wan, digerin. Ji maleke hinekî dûr dengê zarokekî tê. Ji dûr ve hin dengên otomobîl û taksiyên bajêr tên. Rojeke nû, ronî lê hinekî sar, bi germahiya ronahiyê lê sayiya zivistanê, dest pê dike.

Baz, serê wî di nav herdu destên wî de rûniştî, difikire; li xwe, li lawên xwe, jîna xwe, jîyana xwe, kirin û gotinên xwe û li qe-dera xwe difikire. Baz; westiyayî, ji riyeke gelekî dûr, bi hêviyên mezin, hatî. Baz; kûpê kerb û hêrsê, çavsor, mêrkuj, lê niha gelekî ziravbihîstiyar, gelekî sûzen. Gelekî sist, gelekî sil. Xwezî wî hemû berikên baretta ku niha di bin çengê wî de ye, îşev, di serê wê de vala bikira, mêjiyê wê belav bikara û jê, her û her, xelas bûya. Lê wî cesaret nekir, na, ne ku cesaret nekir, gunehê wî pê hat. Guneh? Bi rastî guneh? Na, ne guneh jî, basîreta wî hate girêdan, mîna ku dest û lingên wî li qeydan ketibin, ew welê bêtevger ma. Heye ku Baz tirsîya jî. Tirs?

Baz ji berîka paltoyê xwe yê reş pakêta cixarê derdixe, cixareyekê vêdixe û jê çend nefesên kûr, gelekî kûr dikêşîne. Tilîyên destê wî yê çepê di nav porê wî yê kurtqusiyayî de, ew, li ser hev, cixarê dibe devê xwe. Nefesên cixarê, dûman û bêhna wê germahiyeke xweş tîne pê. Mîna ku Baz pê, hinekî, sakîn dibe. Bi dû cixara yekan re, ew cixareyeke din ji pakêtê derdixe û bi cixara destê xwe wê vêdixe.

Baz çareyekê divê. Ji Baz re çareyeke misoger divê da ku ew bikaribe mij û dûmana li dora jiyana xwe ji holê rake, şêl û bêla dora xwe biqulibîne ser zelaliyê. Weha, bi vî awayî nabe, hîç nabe. Baz ne merivê van halan e. Bi gotineke wî bi hezaran însan dikarin bên kuştin, bi tevgereke wî qedera gelek tiştan dikare bê guhertin. Lê li vê siûda teres binihêre ku ew nikare hakimî jiyana xwe be, nikare li mala xwe desthilat be.

Û Baz? Kî ye ev Baz? Ji kû tê? Eslê wî kî ye, çî ye? Belê, ne bi tenê jiyana wî di nav mij û dûmanê de ye, herweha rojên wî yên bihurî, zarokatî, xortî û jiyana wî ya derbasbûyî jî di nav mij û dûmanê de ye. Ne bi tenê ji bo jiyana wî ya îro, lê herweha ji bo jiyana wî ya do jî zelalî divê. Zelaliyeke diyar, mîna tîrêjên vê roja nû ronî.

Piştî cixara çaran Baz dîsan radibe ser piyan, lingên xwe yên tevizî li ba dike û bi qasî demeke dirêj pê li qumçika zengilê derî dike. Carekê, du car, sê car. Deng nûn e. Eger Mader neçûbe û neketibe hembêza yekî teres, hingî divê ew li malê be. Berî ku Baz were malê, ew çûbû kerxanê, bi hêviya ku Mader li wir be. Lê Mader ne li wir bû. Kesên kerxanê, bi çavên heyirî li Baz, li xwîna ser rû û kincên wî nihêrîbûn û gotibûn ku Mader çûye malê. Lê Mader niha bersiv nade, jina qehbika qehban, jina kerxanan nayê û derî venake!

"Mader!..." Baz, bi dengê gelekî berz, diqîre, "Jina kerxanan, jina kuçan, were, derî veke!" Paşê jî ew dest pê dike, derî dide ber pehîna. Car bi car. Bi qîrîn. Hin kes, bêyî ku tiştekî bibêjin, ji derî û penceran, li Baz dinihêrin. Tevî ku Baz wan dibîne, ew derî dide ber pehînan. Ne xema Baz e. Kî dinihêre bila binihêre. Le eger yekî xurt, yekî bixwebawer heye, de bila ew tiştekî bibêje, bi tenê devê xwe veke. Hingî ew ê bibîne! Baz dest pê dike îcar, hem bi pihînan, hem bi gurmistan, li derî dixê.

Hingî ji paş derî dengê tê. Baz disekine. Piştî ku Baz disekine, derî hêdîka vedibe û Mader, jina êdî pîr, êdî gelek qelew û gulover, di nav kirasekî tenik ê tûlîn ê şevê de, dixuye. Xew li ser

çavê Maderê ye. Ew tiliyên xwe li ser çav û kîsikên gulover ên binçavan digêrîne û li Baz dinîhêre.

"Wey, wey, wey... lawê min, zabitê min, mêrê min ê mêrxas, egîdê min ê esebî hatiye", Mader, bi ken, dibêje. "Min diviya fam bikira ku bi tenê lawê min, qehremenê min dikare vê qîrê qîrê, vê teşqelê bîne pê. Were hundir, were cem Madera xwe, were hembêza min were, were ku ez te bihebînim, were..."

Gava Baz Maderê dibîne, dengê wî tê birîn. Ew, bêdeng, bi awireke gelekî tûj, li Maderê dinîhêre û ji derî dikeve hundir.

"Ev çi halê te ye?" Mader, bi nermahî, bi destê Baz digire û dibêje, "Çi bû, çi qewimî, çima tu weha di nav xwînê de mayî?"

"Çima te derî venekir", Baz, hinekî esebî, ji dêla ku bersiv bidiyê, dibêje, "Bi saetan e ku ez li ber derî me. Te çi dikir?"

"Min çi dikir?" Mader dikene, "ez radizam, bi xeweke kûr, min westa rojê giran ji ser xwe davêt", bi dengê gelekî nerm, mîna dengê dayikan, dibêje, "dengê te nehate min, eger min bi-bihîsta, ma min yeka te dikir dudo? Were, lawê min, were."

Mader bi destê wî digire û ji derencên hundir ên mala ku ji du qatan hatiye pê, ew hildikişin jor. Oda wê ya razanê ku gelekî fireh e, li qata jor e. Mader li pêşî, Baz li pey wê, ew dikevin oda razanê. Hilmeke giran û germ ku em ê bibêjin, ji bêhna xwîdan, parfûmên erzan ên hinekî tîrşokî hatiye pê, bi difnên Baz dikeve. Ode germ e, germahiyek ku hewcedariya Baz gelekî pê heye, bi ser odê ketiye. Baz çavên xwe, devê xwe digire, li pê, çend caran, nefes digire û dide.

"Mader, ez mirim", Baz, bêtî ku çavên xwe veke, dibêje, "Ez mirim, Mader."

"Na, na, tiştêk bi te nebûye, niha di hembêza diya xwe de tu tiştêkî te wê nemîne", ew dibêje, xwarî erdê dibe, pêlavên Baz ji lingên wî derdixe, radibe ser piyan û radihêje paltoyê wî, "tu wê niha bibînî, ez ê sîng û berê xwe bikim melhem û te pê bicebirînim."

"Jiyana min têk çûye Mader", Baz, hê jî çavên wî girtî, dibêje, "jiyana min herimiye."

"Niha mepeyive", Mader dibêje û cil û bergên Baz jê dike, "paşê, paşê..."

Piştî ku Mader, bi destên xwe yên hoste Baz tazî dike, demanç a Baz a baretta ku di nav qewdeke reş a çermîn a neqîşandî de ye, datîne ser masa biçûk a li kêleka textê razanê, ew jî kirasê xwe yê tenik ê şevê ji xwe dike, tazî dibe, dîsan, bi destê Baz digire û wî ber bi serşoka ku li kêleka oda razanê ye, dibe. Di serşokê de, Mader, bi aveke germ, serê Baz dişo, çend caran wî sabûn dike û dişo. Baz xwe dide ber avê, her cara ku dest û tiliyên qelew ên Maderê li ser bedena wî digerin, bi nalîneke zirav, ew û bedena wî sist dibe. Esebiyeta wî ya bêpayan hinekî dadikeve. Bi qasî bîskeke dirêj, ew li serşokê, di bin ava germ de dimînin. "Av," Baz dibêje, "ax, av..." Av; zelaî, aramî, sikûnet. Av; rehmet, bereket, jîyan. Av; xurtî, mezinahî, bêpayanî. Av; dermanê ruhê birîndar, bedena heram, dilê gemarî... Av.

Bi dû serşokê re Mader, bi pêjgîrên paqij ên spî por û bedena Baz zuwa dike, bi nermahî, mîna ku bi destê zarokê bigire, bi destê Baz digire û wî dibe ser textê xwe yê fireh, nav nivînan. Nivînên Maderê hê germ in, hê jê bîhn û hilma bedena fireh a Maderê tê. Baz li ser nivînan dirêj dibe, du balgîv datîne ser hev, pişt a xwe didiyê û ji Maderê cixareyekê dixwaze. Piştî ku Mader cixara wî vêdixê û didiyê, ew jî tê li kêleka Baz dirêj dibe, destê xwe yê rastê li ser sîng, zik, berzik û "serbilindahiya" Baz ku niha mîna tiliyeke biçûk dixuye, digerîne û "de bibêje", dibêje, "çi qewimî, kê rûyê te weha kir, kê weha cesaret kir?"

Baz bersiv nadiyê. Bi qasî çendekê ew, nefes li pey nefesê, cixarê dikişîne. "De ji diya xwe re bibêje", Mader, dîsan, bi israr, dibêje, "derd û kulên xwe bibêje, deriyê dilê xwe veke."

"Jina min... jina min a qehb..." Baz, gotin bi gotin, dibêje. Lê ew nikare dawiya gotina xwe bîne. "Jina min...", Baz hewl dide xwe ku gotina xwe bidomîne, lê nabe. Ew kelegirî dibe, rûyê xwe ji Maderê ba dide, bi qasî çendekê bêdeng dimîne û paşê jî, ji nişka ve, digirî. Bi deng, pihêt. Dirêj.

Baz digirî!

Madera ku Baz hîç weha nedîtîbû, şaş dibe. Mader çi bike, çi bibêje? Ew, bêdeng, serê Baz datîne ser zik û berzika xwe ya têrbez û destê xwe di nav porê wî de digerîne. Mîna axa ku bi zelzelê ketibe, hemû bedena Baz, bi kela giryê, diheje. Hêstir ji çavên wî dibarin. Ew digirî, carina dikuxe, carina dipişke, girî di qirikê de dimîne, lê ew xweziya xwe dadiquîtîne û bi zarîn digirî. Bi qasî demeke dirêj, ew welê digirî. Paşê, hêdî hêdî, kela wî dadikeve. "Tu nizanî ev jina teresbav çi bi serê min de tîne," Baz, hêdîka, bêyî ku serê xwe rake, dibêje. "Ez nizanim ka ez çi bikim... Na, na, ez dizanim ez ê çi bikim, ez ê wê bikujim. Xeynî vê tu çare nîn e, bi tenê kuştin dikare min jê xelas bike..."

"Kuştin ji çi re bûye çare, kurê min?" Mader, bêyî ku gotina wî bibire, bi nermahî, dibêje.

"Çare ye, ez dizanim, çaxa pêwist be, kuştin û mirin çare ne..."

Mader serê Baz ji nav şeqên xwe radike û serî dixê navbera herdu pêşîrên xwe yê gelekî mezin. "Ez ê te bihebînim," ew dibêje, "lê mirin û kuştin ne tu çare ne... mirin, windabûn e, windabûna her tiştî ye. Kengî windabûn dikare bibe çare? Lê jîyan, ez dizanim, jîyana herî kirêt, herî bêgav, herî bêçare, dikare bibe çare. Ji ber ku tê de hêvî heye; çilkên hêviyê, tovên hêviyê, her-tim, di her şertî de, tê de hene..."

Bi qasî çendekê Baz, welê bêdeng, serî, rû, dev û pozê wî di navbera pêşîrên Maderê de, dimîne. Sînga wî, hêdî hêdî, radike û dadikeve. Bêhneke ecêb lê xweş ku hinekî dişibe bêhna sêvan, ji nav pêşîrên Maderê tê. Paşê ew serê xwe ji pêşîrên Maderê dikişîne û dîsan mîna berê, du balgîv dide paşla xwe û ji Maderê cixareyekê dixwaze. Mader, bi pêşîrên xwê yê gelekî stûr ku heta navzik ber bi jêr dibe, rûn û bezên gulok gulokî yê nav-teng, hêt û şeqan, radike, cixareyekê ji pakêta Baz derdixe, vêdixe û tîne didiyê.

"Êvar bû", Baz, ji cixarê çend hîlman dikişîne, bi çavên şil ên sorbûyî li Maderê dinihêre û dibêje, "na, ne êvar bû, ber bi êvarê

bû. Yanî do, ber bi êvarê bû, ez gihîştîm bajêr û çûm malê. Bi kêfxweşî, bi heyecan. Di berîkên min de, ji bo wê dêlika dêqehb, bi qasî du kulman zêr, gerdenî, gustîl, guhar, bazin, ku di nav kîsikên biçûk ên hevrişimî de bûn. Di destên min de jî, ji bo kurên min, cil û berg, pênûs û defter, saet û cuzdan ku di nav pakêtan de bûn... Gava ez gihîştîm malê, dêqehb bi tenê bû, hê zarok ji dibistanê nehatibûn. Çaxa ez ji derî ketim hundir û çavê wê bi min ket, mîna ku ew cinekî, cinawirekî bibîne, welê çavên wê beloq bûn û ew mat ma. Bêyî ku ew bikene, xêrhatinî li min bike yan jî were û pakêtan ji destê min werbigire, ew welê li hember min, hinekî dûr, mirûzkiî, rawesta û bi qasî bîskeke bi nêrîneke vala, yan jî tirsîyayî, li min nihêrî. Tu gotin ji devê wê derneketin. Ez peyivîm, min halê wê û zarokan pirsî. Wê bi tenê, "baş im, baş in" got. Ma tu dê alîkariya min û van pakêtan nekî? min gotê. Bêdeng, ew hat û rahişt hin pakêtan û ew birin û danîn salonê. Ji wir jî ew çû midbexê, kozika xwe ya abadîn!.. De tu bibêje, eger tu bî, çi bikî?"

Mader bersiv nadiyê, dewsa bersivê, ew xwelîdanka ku li ser masa biçûk a kêleka textê razanê ye, nîşanî Baz dide.

"Min dengê xwe nekir", Baz didomîne, "piştî ku min pêlav û paltoyê xwe ji xwe kirin û pakêten mayî yên destên xwe danîn salonê, ez jî li pey wê çûm midbexê û min ji berîka xwe ya çakêt kîsikekî biçûk ê zêran derxist û dayê. Kîsik jî alîkarî nekir, wê kîsik wergirt, lê bêyî ku wê veke, ew danî ser masa midbexê. – Çima tu weha dikî? Min, bi nermahî, gotê. Wê jî gotina min li min veğerand; çima tu weha dikî? Min ji tecrubeyên xwe dizanibû ku dermanê wê kîsik û zêrên tê de bûn. Min kîsikekî din derxist, dayê û paşê, gotin bi gotin, min got; –binihêre, ji mêj ve ye, ez ne li van deran im, ez ji riyeke gelekî dûr tîm, ez ji mirin û kuştinê, şewat û tofana agir tîm, ji deverên gelekî dûr ên kîn û nefretê, şer û pevçûnê tîm. Ez westiyayî me, bedena min, laşê min, mêjî û heşê min, can û ruhê min westiyayî ye. Meke, xira meke. Îhtiyaciya min bi îstirehetê, germahî û sikûnetê, nermahî û nêzîkahiyê heye.

– Îhtiyaciya min? me? ya me bi çi heye? wê, bêyî ku li min binihêre, got. Ez hew dikarim li vir, bi tenê, bê mêr, bê pişt, bi mehan, bi salan, li zariyên te binihêrim, li mala te qerwaşiyê bikim. Îhtiyaciya min bi kîsikên zêran nûn e, bi mêrekî, bi hevalekî, bi însanekî heye...

– Tu rewşa min dizanî, min got, li wan deran, di nav zinar, çiya û geliyan de, ez ne di nav kêf û henekan de me. Ji bo dewlet, millet û welatê xwe, ez li wan deran im, hertim bi talûka mirinê, hertim di nav xwîn û xwîdanê de, hertim tî û birçî, bêxew û bêrawest.

– Dewlet, millet û welat, wê got û dîsan dubare kir, dewlet, millet û welat... ez? em? Pêşî mal tê, paşê yên din...

– Bibire, em dîsan dest pê nekin...

“Min gotina wê birî. Devê wê yê jahrîn dîsan vebûbû. Tevî ku min dixwest ku ew bipeyiviya, hîç taqeta min nûn bû, min li zirte zirtên wê guhdarî bikira. Ez hewcedarê gotinên nerm, bihîstiyar û germ bûm. – Em paşê bipeyivin, min gotê û ez çûm serşokê. Min kuwet tijî ava hinekî germ kir, bi dermanê kefê min kef da avê, tazî bûm û ketimê. Û ez fikirîm... Tu dizanî, ez li çi fikirîm?.. ji kerema xwe cixareyeke din bide min...”

Mader radibe, ji aliyê din ê odê cixarê tîne, lê îcar tevî pakêt û niftikê. Piştî ku ew cixareyekê vêdixwe û dide Baz, ew pakêt û niftikê datîne ser masa biçûk û bêdeng, bi daxwaza berdewamiya gotinên Baz, li Baz dinihêre. Baz cixarê dikişîne, carekê li odê, têkberên rengîn ên odê, carekê li Maderê dinihêre. Mader; êdî pîrejin, êdî gelekî qelew, fireh, kûpa rûn û bezê. Mader; hêtên fireh û stûr, navşeqekî kûr, mîna geliyên bêbinî, bîrên kûr û tarî, pêsîrên sistbûyî yên mezin û daketî, mîna pêsîrên dayika cin û pêriyên kitaba ku Baz hê di Mala Zarokên Sêwiyan de dixwend. Mader; rûesmer, çavreş, lêvtarî, her derê bedena wê bi mû û pirçên reş tijî. Mader; tevî van yekan hemû, hê jî kaniya şehwet û hezkirinê, hosteya beden û kela bedenê. Mader; qedera Baz.

“Min bedena xwe ya westiyayî heta stûyê xwe noqî avê kir, çavê xwe girt û ez fikirîm. Ez, kite bi kite, weha fikirîm; ev çi hal

e?.. Ez desthilat im, di destê min de hêz û quweta gotin, kirin û guhertinê heye. Ez tiştan, bûyeran, pêwendîyan, însanan, dever û welatan û herikîna wext û dewranan, diguherînim. Mora min li ser eniya gelek kesan, gelek qederan e, ez baş pê bawer im, mora min ê li pêşketin û guherîna welat, wext û tarîxê jî bikeve. Ma ya girîng daxwaz û best, zanîn û şixul nîn e? Ma ez, bi daxwaz û best, bi zanîn û şixul, li pey hedefên xwe nîn im? Ma ne ji ber vê yekê ye ku ez bihêz im, desthilat im, fermanدار im? Belê welê ye, belê, gotina min quwet e, quwet û hêza min jî çeka min e. Loma jî ez hêzdar im, çekdar im. Ma min bi kirin û şixulê xwe îspat nekiriye ku qelsî, dudilî, sistî, sûzenî ji min, ji jiyana min dûr in. Hingî ev qelsî û sistiya min a malê çi ye? Çima dema ez lingê xwe davêjim vê malê, hîsên dudilîtiyê bi ser min de tên, tîrên sûzeniyê li dilê min dikevin? Çima ez, Bazê welatê kûvî û hovan, bi vê jînika hanê nikarim? Çima ew daxwaz û bestên min ên miqedes, zanîn û şixulên min ên jîr û jêhatî li vê malê pere nakin? Çima ez, kumandarê hêzên herî zîrek ên hemû dinyayê, belê hemû dinya, li vê malê, li hember vê jîna segbav, dibim mîna pepûkekê û dilê min, mîna pepûkekê, bi helke helk, hildavê? Belê, bi qasî çendeke dirêj, di nav wê ava germ de ku xewa min dianî, ez weha kûr, dudilî, sûzen, sil, fikirîm... heta ku ji derve dengê zarokan hat. "

Baz destê xwe yê çepê li ser sînga xwe digerîne, bi dîqet li pirçên sînga xwe dinihêre û hin tayên spî, bi carekê, bi lez, dikişîne. Porê wî, simbêl û rîha wî, pirçên sîng û bedena wî spî dikin. Tayên spî, roj bi roj, zêde dibin. Jiyan dere, dinya diherike. Umir dere... Baz cixarê dibe devê xwe û li pencera fireh a odê ku bi perdeyên tarî yên sor hatiye girtin, dinihêre. Welê dixuye ku roj baş hilhatiye. Tîrêjên rojê di navbera perdeyan re xwe bi hundir digihînin.

"Zarokên min, jiyana min, her tiştên min hatibûn", Baz, cixarê di xwelîdankê de ditefîne, balgîvên piştê xwe rast dike û dibêje, "min, bi lez, serê xwe şuşt, xwe zuha kir, di destê min de pêşgîr,

tevî kiras û derpê ji serşokê derketim. Kurên min li midbexê, ken
 li ser rûyê wan, li hêviya min bûn. Min ew hembêz kirin, maç
 kirin, bêhn kirin. Xwediyo, min çiqas bêriya wan kiribû! Wan
 çiqas bejn avêtibû, mezin bûbûn! Piştî ku min hal û xatirê wan
 pirsî û me bi hev re pakêtên wan vekirin, ez çûm oda razanê da
 ku kincên xwe li xwe bikim. Ode paqij bû, textê fireh vegirtî, li-
 hêf û balgîv, bi dûzan li serê bûn. Bi xeyala ku ez ê li wir raza-
 ma, min taximekî kincên nû, gomlegekî spî yê nû li xwe kirin,
 porê xwe hinekî şeh kir, simbelên xwe çekirin, demançe bi paşla
 xwe ve kir, qirawateke hevrîşimî jî bi stûyê xwe ve kir û ez ji odê
 derketim, –zarokno, de em herin, min got. Ji midbexê bêhna şîv
 û xwarinan nedifûriya, dêqehbê tu tişt hazir nekiribû. Ez birçî
 bûm, zarok birçî bûn. Zarokan cil û bergên ku min anîbûn, bi
 kêfxweşî, li xwe kirin, xwe dan hev û li ber derî rawestan. Lê ji
 diya wan tu tevger nedixuya, ew li midbexê bi tişteki, bêguman
 hîç û pûç, mijûl bû. Min deng lê kir, –ma tu ne birçî yî, tu bi me re
 nayî? Wê, bi kurtî, got, na. Min zarok girtin û em daketin restora-
 na sîteyên leşkerî. Li restoranê, li ber pencereyeke gelekî fireh û
 dirêj ku li çemê bajêr dinihêrî, em rûniştin û me şîveke yekta ku
 ji xwarinên têkel hatibû pê, xwar. Restoran germ bû, li der lam-
 payên bûlwarên bajêr diçirisîn. Şewqa lampayan jî li ser ava çem
 ku bi nazdarî diherikî. Zarokan her qala xwe, xwendin û dersên
 xwe, heval û mamosteyên xwe, dijarî û zehmetiyên xwendinê
 kirin. Kurên min êdî mezin bûbûn û wan bavê xwe, kar û şixulên
 bavê xwe meraq dikirin. Bêguman wan dizanibû ku ez zabit im,
 mensûbê ordiyê me. Lê wan baş nizanibû ka ez bi çi karî dadi-
 ketim. Çima ez weha, bêyî xeberekê yan jî nameyekê, ji nişka ve,
 winda dibûm û bi mehan li wî welatê jîbîrkirî yê dawiya dinyayê
 dimam? Diya wan, dapîrên wan jî, sebebên vê, baş nizanibûn. Bi
 tenê wan hemûyan dizanibûn ku ez bi şixulên girîng û giran ên
 dewletê radibûm. Ewçend. Wê êvarê jî min tu bersiveke diyar
 neda wan. Min bi tenê ji wan re got; –ez diwestim, li wan deran,
 ji we dûr, gelek diwestim, –hîngî çima tu ewçend li wan deran

dimînî, tayina xwe ji wir ranakî? Kurikê mezin, di dereke sohbeta me de, pirsî. Min ê çi bersiv bidayê? Ez mecbûr im, ji mecbûriyetê ye, min, bi dîqet li wan, li çavên wan nihêrî û got. Bi kêf û henek me xwarina xwe xwar, bi kêf û henek em ji restoranê derketin û bi kêf û henek em hatin malê. Lê kêf û henekên me, gava em ketin hundir, xelas bûn. Û qiyamet hingî rabû...”

Ji nişka ve Baz ji text peya dibe, radibe ser piyan, îcar bi xwe, cixareyekê ji pakête derdixe, wê vêdixe û ber bi pencerê dere. Li ber pencerê, ew radiweste, perdê hinekî hildide li kolanê, xaniyên li hember û li dûkanên kolanê ku êdî vebûne, dinihêre. Dinya ronî ye, tevî ku hê zivistan e, ronahiyeke zelal a danê sibe-han îro heye. Dûkandarekî li ber dûkanê, li ser kursiyekî biçûk rûniştiye, cixare dikişîne û diponije. Jinikek û zarokekî li aliyê çep ê kolanê dixuyin. Zarok li pêş jinikê direve, jinik jî dilezîne. “Li vê aramiya rojê binihêre”, Baz, ji Maderê re, lê bêyî ku xwe bizîvirîne, dibêje, “evçend aram, sakîn, sade... lê ya tevliheviya min? Çima ev aloziya kambax a li dora jiyana min, çima!..”

Bi qasî bîskekekê Baz, welê rawestiyayî, cixare di dêv de, li ber pencerê, dimîne û li der dinihêre. Paşê ew, hêdîka, dizîvire û li Madera ku hê jî li ser nivînan e, dinihêre. Çavên Baz, niha, dîsan, şil in. “Hingî, gava em vejeriyan malê, qiyamet rabû” Baz, li pê, rûyê wî ber bi Maderê, pişt a xwe dide dîwarê pencerê û dibêje, “dêqehbê xwe hazir kiribû, li benda me bû... - Ez dixwazim, niha, li hember lawên te, bi te re bipeyivim, wê, dîsan pirûzkirî, ecizbûyî, got.

– Em paşê dipeyivin, min, bi nermahî, got.

– Na, niha, eşkere, bi zariyan re, divê em meselê safî bikin, ez hew dikarim xwe rabigirim. Bi mehan e ku ez li hêviya vê rojê me... em ê bipeyivin.

Dengê wê bilind dibû, her ku diçû wê dengê xwe bilindtir dikir. Ez ber bi midbexê çûm, ew jî li pey min. Zarokan fam kiribû ku pêlên esebiyetê bilind dibûn û loma ew çûn salonê. Li midbexê, meke, min, xweragirtî, gotê. Min her israr kir ku ew

dengê xwe bibire. Lê wê her dewam kir, her, divê em vê meselê hal bikin, got. Dawiyê min jî, kîjan mesele, got, tu behsa kîjan meselê dikî?

– Mesela çûyin û windabûna te, mesela te û jinan, mesela te û jina kerxanê, mesela laqaytiya te û malê, mesela bar û zehmetiyên malê, lawên te, mesela tenebûnê... mesela tirsê...

Tirs? Min ew meseleyên din hemû fam kiribûn, lê ev tirs çi bû? – Tirs çi? min, dîsan, jê pirsî.

– Tirs ku zarok sêwî bimînin, mîna te bêbav, sêwî û stûxwar mezin bibin.

Min hew xwe ragirt, ez li ser wê qîriyam, bibire, heywan, bibire!

– Na, ez ê nebirim, wê, bi qîrîn, li min vegerand, ma rastiya te ne weha ye? Çima tu ji rastiya xwe rû badidî? Tu ne sêwî yî, bêbav, bêmal î? Çima tu dixwazî lawên te jî weha bin?

Hingî dinya, dîsan, li ber çavên min tarî bû. Hingî dîsan birûskên nefret û hîdetê di dil û mêjiyê min de vedan. – Ker, keça keran!.. min gotê û sîleyeke sert lêxist. Mîna ku ew hazirî vê yekê bû, wê xwe hinekî da alî. Paşê wê bi nefret, bi kîneke bêpayan, li min nihêrî, awireke gelekî tûj ji min veda û got..."

Baz gotina xwe dibire. Rûyê xwe ji Maderê ba dide, dîsan dizîvire pencerê, perdê hinekî hildide, li derve dinihêre, perdê dadixe, li oda fireh, dest bi meşê, çûyin û hatinê dike. Ew, bejn-dirêj, tazî, zikê wî hinekî derketî, bi gavên giran, serê wî li ber wî, dere û tê, dere û tê.

"Wê got", Baz vedigere ser cihan, xwe dirêj dike û dibêje, "– ker kurê keran, kurê bêkes û bêesilan... û wê, mîna pisîngeke kûvî, xwe avête ser min... êdî çi bû, çi qewimî, nayê bîra min. Lê piştî demekê, ez bawer im, demeke dirêj, bi qîre qîra kurikan, ez li xwe warqilîm. Her derê midbexê di nav xwînê de bû. Kurik, mîna ku bi tayê ketibin, çavtirsîyayî, li ber deriyê midbexê, diheziyan û dikirîn qîre qîr. Herçî ez bûm, li erdê bûm. Na, ne li erdê, belê li erdê, lê li ser wê dêqehbê rûniştî. Di destê min de

demançe, min bi qibûrê demançê, lê dixist. Ji dêlikê hew deng derdiket, ji devê wê yê jahrîn êdî gotinên jahrîn dernediketin. Dev, rû, serî, cil û bergên wê di nav xwînê de bû. Destên min, demança di destê min de, di nav xwînê de bûn. Ez rawestiyam, hêdîka, ji ser wê rabûm, ber bi kurikan hatim. Kurik reviyam, çûn ketin salona fireh ku bi şewqa heyvê ronî bûbû. Min demançe xist berîka çakêtê xwe, li midbexê destên xwe dan ber avê û ez jî çûm salonê. Kurik, di hembêza hev de, li ber pencerê, diricifîn. Ez ber bi wan çûm da ku wan hembêz bikim, lê qîrîn bi wan ket. Bêdeng, ez zîvirîm, hatim ber derî, min pêlav li xwe kirin, palto jî avêt ser milên xwe û ez ji derî derketim. Heta ber destê sibê, welê sergêj, serserem, ez li ber peravên çem ku bi lampayên bûlwaran ronî bûn, geriyam. Paşê jî lingên min, ez anîm vê derê, mala te..."

Hingî, piştî ku ew gotina xwe xelas dike, hêdîka, serê xwe radike û li Maderê dinihêre. Ji çavên Baz çend rondik ber bi jêr dibin. "Lê min şaşî kir", ew, çavên wî yên şil li Maderê, heşê wî li derekî din, dibêje, "min ê çend gule jî bera serê wê bida..."

"Na", Mader dibêje, hinekî xwe ber bi Baz dike û Baz ber bi xwe dikşîne, "divê tu bizanibî, mirin û kuştin ne tu çare ye... tu dê jî hîn bî, ne tu çare ye..."

"Çare ye", Baz dibêje û bi alîkariya tevgerên Maderê, serê xwe dixwe navbera pêşîrên Maderê. Lê cihê Maderê, rûniştina wê ne rehet e. Ew cih li xwe rast dike, xwe û Baz, welê, serê wî di nav pêşîran de, li ser nivînan, dirêj dike. Baz hê kelegirî ye, hê hişê wî, hîs û pêjnên wî li dereke din in. Mader, bi nermahî, Baz dikîşîne ser xwe, şeqên xwe yên qelew vedike û bi herdu destan, hedî hêdî, stû, pişt û hêtên Baz mist dide. "Lawê min, kurê min, birîndarê min, de bisekine, ez te bihebînim", Mader dibêje. Pêçiyên Maderê yên qelew ku bi bez girêk girêkî bûne, li ser pişt, navteng û hêtên wî digerin. Lê Baz ê ku hê kelegirî ye, xwe nalivîne, nikare xwe bilivîne. Piştî bîskekê, Mader, bêyî ku rabe, hedîka, Baz ji ser xwe diqulipîne kêleka xwe. Baz, çavgirtî, herdu destên xwe dibe bin serê xwe, lingên xwe dirêj dike û welê dinive. "Aha welê,

aha welê", Mader dibêje û lêvên xwe yên qelew ên rengtarî dibe stûyê Baz. Ji stû heta berzik, Mader, bi hunermendiya hosteyeke yekta, geh Baz radimûse, geh dimuje. Hêdî hêdî. Bi germahî. Bi lêvên şil. Serê wê di navbera şeqên Baz de, ew, li dora berzikê, bi qasî demeke dirêj dimîne. Heta ku Baz di xew re dere. Belê, west, sersemî, bêxewî, hêdîka, Bazê ku bi hilma jinekê, tavlê, hişyar dibû, dike nav pêlên xewê û wî dibe.

Saet derbas dibin. Wext digihîje êvaran. Gava Baz ji xew hişyar dibe, di nav nivînan de, ew bi tenê ye. Mader nîn e. Lampaya biçûk a şevê li kêleka serê wî vêketî ye. Baz di nav nivînan de, hinekî, xwe dide hev, balgîfa kêlekê jî datîne ser ya xwe, piştî xwe didiyê, lingdirêjkirî, rûdine. Serê wî, bedena wî diêşe. Janeke zirav stû, mil û piyên wî diêşîne. Baz radihêje pakêta cixarê ku li ser masa kêlekê ye. Hingî ew kaxiza li ser pakêta dibîne. Mader e, wê, bi destxeta xwe ya şaş û xwar ku bi zehmetî tê xwendin, nivîsiye; Lawê min ê sêwî, îsrehet bike. Her tişt li malê heye. Xwarin û vexwarin li midbexê heye. Ez ê dereng werim.

Baz bi gotina "lawê min ê sêwî" aciz dibe. "Dêqehb, jîna kerxanan!" ew dibêje, "ma dêqehb yek e?" Ew, nefes bi nefes, hêdî, cixarê dikişîne. "Li vir ev dêqehba ku ji rûn û bez fetisiye, li wir jî ew dêqehba ku bi kîn û nefretê miriye", Baz, dîsan, dibêje, yan jî em ê bibêjin, difikire. Ew dêqehba hanê; jixwerazî, maxrûr, pere û zêrperest, mal û milkperest. Xwedê wê, dîn û îmana wê pere, zêr, mal, milk, bêtî xwe ne li kesekî din, ne jî li tiştekî din difikire, xemxur, laqayt, çikûs. Ne welat û millet, ne dewlet û ordî, na bi tenê ew. Bi tenê ez. Ez, ez, ez. Menfeata min, jiyana min, rehetiya min. Her tişt divê mîna wê be, bi daxwaza wê be. Her tevger, pêwendî, xebat, şixul ê li gora dilê wê be. Li mala xwe, midbexa xwe, lixwekirina xwe paqij, lê dilgema, ruhherimî. Bêwîjdan, sar, dengsar, awirsar, ruhsar, mîna marekî jahrîn ku bi merivan ve dide. Û li vir jî ev dêqehba hanê; ehmeq, saf, ji dinyayê, ji hal û hewalê însanan dûr, zana û hosteya bi tenê tiştekî, xwarin, vexwarin, razan û şeqên xwe vekirin. Kî dimire, kî dimîne, çi dibe,

çi diqewime? Ne xema wê ye. Têrxew, têrxwar, soxe, beraza rûn û bez, beraza ku ji xwarinê, kutanê û mijandinê qet têr nabe...

Baz, esebî, ji nav cihan derdikeve, li saeta ser masê dinihêre û dere qata jêrîn, midbexê. Ew lampa midbexê pêdixe, li midbex, masa û kursiyên dora masê dinihêre û paşê dere ber sarincokê û deriyê wê vedike. Çavên sarincokê, tevî qûşxanene pehn, heta dev tijî xwarin, sebze û meywe ne. Baz devikên qûşxanên biçûk vedike, li wan dinihêre û ya herî biçûk ji sarincokê derdixe; di qûşxanê de eprax hene. Baz qûşxanê werdigire û dere ber masê, li ser kursiyekî rûdine, epraxan, bi dest, sarî, dixwe. Yek bi yek, giran giran. Perdeyên midbexê jî, mîna yên oda razanê, girtî ne. Ji derve dengê hin kesan û otomobîlan tê. Piştî ku Baz hemû epraxan dixwe, ew radibe, tasek av jî vedixwe û ber bi telefona ku li dîwarê midbexê hilawestiye, dere. Ew telefona reş a biçûk dixe destê xwe û pê li qumçikên hejmaran dike; ew telefonî Zabîtê Simbêlqît dike. Lê gava dengêjinekê bi guhê wî dikeve, rûyê wî tîrş dibe. Belê, jîna Zabîtê Simbêlqît e. "Ez im, ez", Baz dibêje û bêyî ku dirêj bike, gotinê dibire, "ka Mamo bide." Bi qasî çendekê, Baz, bêdeng, radiweste. Paşê, "na, ez ne li malê me", dibêje, "na, ez ne li Mala Zabitan im jî... ez li derek din im, dev jê berde... meqîre..." Rûyê Baz sor dibe, bi dengê bilind gotina xwe dubare dike, "meqîre, ez dibêjim... belê, ez jî dixwazim bi te re bipeyivim. Niha, vê êvarê... hingî sibê, hingî sibê em hevdu bibînin... na, ne li wir, li aliyê din ê meydana, li paş bustê General Serdar kafeteryayek heye, li wir... temam? Saet nehê sibê... hingî saet deh... baş e?.."

Piştî ku Baz telefonê digire, "bênamûs, teres" dibêje, "tu rast- tiyan mebe, ji min veşêre, bêşeref..."

Baz ji midbexê derdikeve, hildikişe jor, dîsan, dere oda razanê. Niha jê re hinekî sar e. Bêyî ku ew kincên xwe li xwe bike, ew paltoyê xwe davêje ser milên xwe û dere li ber dolabeke dirêj disekine. Şûşeyên vexwarinê yên Maderê û qedeh di dolabê de ne. Ew devê dolabê vedike, li şûşeyên rêzbûyî dinihêre, ji nav

wan radihêje şûşa votkayê û qedeheke biçûk tijî dike û bi carekê qedeh bi ser xwe ve dike. Ew qedeheke din tijî dike û vedigere aliyê serşokê. Di şerşokê de, piştî ku ew lampê pêdixe, ew li ber neynika dirêj a şerşokê radiweste û li xwe, li rû û serçavê xwe dinihêre. Koşeyeke neynikê heta nîvê neynikê şikestî ye, lê perçeyên şikestî ji hev neketine. Sûretê baz ê neynikê jî, şikestî, li Baz dinihêre.

Sûretê şikestî, rûyê şikestî. Awirê şikestî.

Sê xetên kûr ên sor li ser rûyê Baz, di binçav, li ser poz û hinarikan, vebûne; şopên pencên dêqehbê. Cênîk û porê baz êdî spî dikin. Qermîçokên eniyê niha kûrtir dixuyin. Di bin çavan de yek- du kîsikên biçûk hatine pê. "Tu kî yî?" Baz li sûretê hember xwe dinihêre û diqîre, "bibêje, kî yî tu, sûretê şikestî, rûyê birîndar..." Ev rûyê dirêj, ev çavên biçûk... çavên mîna yên bazekî. Çavên nêçîrekê? Çavên nêçîrvanekî? Eniya vekirî, pozê hinekî dirêj ê daketî, çenga dirêj û fireh. Ev rû, ev awir bi yê kê dişibe? Bi yê bav û kalan? Ka bav û kal, ew li kû ne, kî ne? Bi yê ap û birazî, xal û xwarzî? Ka ew kî ne? Bêkes... sêwî... kurê bêkes û bêesilan! Belê, eynî weha, eynî mîna ku ew dêqehb, car bi car dibêje; bêkes, bêesil. Rastî weha ye...

"Kî yî, tu kî yî?" Baz diqîre, paşê ji qedeha destê xwe çend qultan vedixwe, îcar bêdeng, li neynikê dinihêre û difikire: Bifikire, di wan roj û şevên te yên bêxew, wext û saetên te yên hêrî dijwar de, tu qet fikirî ka tu kî yî. Te qet ji xwe, ji kesekî din pirsî ka tu kî yî, ji kû têyî. Der û dora te qîmet didin te, ji te hez dikin, bi rêz û rêzdarî, gelek caran jî bi xof û saw, nêzîkî te dibin; Tu; zabitê xurt, wefadar, jîr, bêtirs, sozdar. Tu; nêrîneke xurt, rêçûyîneke xurt û qehîm, qameke xurt û rast, bîr û baweriyên xurt û metîn, fikrên xurt û zelal ên bêguman, bêşik. Dinya û jiyaneke xurt a ji sûzeniyê dûr. Belê, herkes, doralîyên te weha difikirin. Lê tu, tarîxa te? Rûpelên tarî yên vê tarîxê, xaçerê û qelîşekên nediyar ên vê tarîxê? Wextên nenas ên vê jîyanê? Qonaxên di ser re gavkirî yên vê dinyayê? De bibêje, tu kî yî! Bersiv bide rûyê şikestî, kî yî tu!

Baz, bi dîqet, dest û rûyê xwe dişo. Gava av bi şopên pancan dikeve, ew dişewitin. Baz bi destmalekê, hêdîka, rûyê xwe zuwa dike, careke din li neynika şikestî dinihêre û vedigere oda razanê. Li odê, ew dere ji dolabê şûşa votkayê derdixe, palto datîne ser kursiyekî û vedigere ser cihan. Ew qedehê dîsan tijî dike û li ser cihan, piştî xwe dide balîfan û dirêj dibe. Baz westiyayî ye, westa şeva çûyî, westa rojan, mehan, salan Baz sist kiriye. Piştî sê qedehên din, Baz, dîsan, di xew re dere û hêdîka, dikeve nav kûrahiyên xewê.

Piştî demeke dirêj a xewê, Baz, bi dengê xure xureke bêpayan hişyar dibe. Mader hatiye, li kêleka wî radize. Baz xwe xwarî masa biçûk dike û li saetê dinihêre. Rojeke nû dest pê kiriye. Rojeke nû, jiyaneke nû. Rojeke nû, tecrubeyên nû. Îro, ew ê îro zabitê simbêlqît ku jê re bavitî kiriye, riya qedera wî ya îro daye ber wî, bibîne. Piştî nîvro, saet diduyan jî ew ê here qerergeha ordiyê, nik general û serzabitên xwe yên berpirsiyar. Baz ji ser textê razanê, hêdîka, bêtî ku Maderê hişyar bike, tê jêr û ber bi serşokê dere. Lê jê re sar e. Oda razanê, qata jor niha hinekî hênik e. Ew, bi gavên dîqet, vedigere odê. Li ser kursiyê ku Baz palto danûbûyê, niha cotek gore, derpê, kirasekî spî yê rîs, gomlegekî paqij ê spî hene. Baz rûyê xwe ber bi Maderê dike û lê dinihêre. Mader; bîrbir, dilsoz, wefadar, dê, dost... Baz cil û bergan werdigire û dizîvire serşokê. Ew bi tenê, bi qasî demeke dirêj, li pê, dimîze, dest û rûyê xwe dişo, li neynikê, li xwe, li sûretê xwe yê birîndar û şikestî dinihêre. Gelo ew rîh û simbêlên xwe yên hinekî dirêjbûyî jêke, yan hinekî di ser re biquşîne? Baz dev jê berdide. Jixwe, piştî demeke kurt, ew ê dîsan vegere wan deverên kambax ên jîbîrbûyî, deverên rîh û simbêlan. Lê ew ê çawan niha, bi van şopên pancan, here der? Xelk, kesên ku wî bibînin, ê çi bibêjin? Ew li dora xwe dinihêre, dolaba biçûk a serşokê vedike û lê dinihêre. Dolab bi şûşe û tûpên bêhn û kremên Maderê tijî ye. Baz çavê xwe li wan digêrîne û paşê ew pûdrayên Maderê ku bi çend celeb rengan in, dibîne. Ew pûdrayeke tarî li

rûyê xwe dide. Baz cil û bergan li xwe dike û dîsan, bi gavên gelekî giran, tê oda razanê, dere ber kursiya ku kincên wî li serê ne, pantolon û çakêtê xwe li xwe dike, kamera barettayê, tevî demançe û qewd, bi piştê xwe ve girêdide, radihêje palto û ber bi derî dere. Lê li ber derî, ew radiweste. Gelo ew weha bêxeber here? Ma ew Maderê hişyar neke? Ew jî, mîna ku Maderê kiribû, jê re çend rêzan binivîse û deyne ser masê? Mader, bi xure xur, radizê. Damarên stûyê wê reş dikin, li ser lêva wê ya jor mûyên reş, mîna simbêlan, dixuyin. Bi qasî bîskeke Baz difikire, paşê radihêje demançe, gundorê demançe vedike, jê berikekê derdixe û wê datîne ser masa biçûk. Belê, berikek, ne name, ne silav, ne hişyarkirin, ne jî gotineke din, bi tenê berikeke tijî, tazî.

Baz pêlavên xwe yên li ber derî li xwe dike û dere.

Gava Baz, bi texsiyekê, ji aliyekî paytextê mezin, taxa kerxanê, ber bi aliyê din ê bajêr, meydana mezin a Mala Zabitan tê û dikeve hundirê kafeterya li kêleka meydana, saet tam dehê sibê ye. Li kafeteryayê hê kesekî din nîn e. Kafeterya nû vebûye. Zabîtê simêlqît hê nehatiye. Baz li koşeya herî hundir, li kêleka pencerê ku li meydana dinihêre, rûdine û ji garsonê ku pê re heta ber masê tê, dipirse ka şorbeyeke wan a germ heye. Belê, heye. Baz jê şorbeyekê dixwaze û pakêta cixarê derdixe. Bi tenê cixareyeke wî maye. Ew wê vêdixe û li der dinihêre. Meydana fireh, li aliyê din ê meydana Mala Zabitan, busta bêpayan stûr a General Serdar her li cihê xwe ne. Dinya diguhere, wext dere, bûyerên nû diqewimin, lê ew hertim mîna xwe, li cihê xwe ne. Gerçî niha piştê General Serdar bi Baz e, lê ji bîst û çend salan û vir ve, ew her li vê meydana rê nîşanî welêt, dewlet û millet dide. General Serdar, serdarê Baz, hê rêberê Baz e jî. Şeva zewaca Baz dikeve bîra wî. Şeva ku General Serdar jî hatibû. Êvara dîlan û zewacê, şeva gerdegê... bi hêvî, coş û kel dest pê kiribû û bi xwîn, lê ne xwîna ser çarşefên spî yên textê razanê, xwîna bedenên ciwan, xelas bûbû.

"Xwezî ew dêqehb hingî bimiriya û ez jê xelas bûbama", Baz difikire. Ew nemir, eger xencer hûnekî din jî kûr biçûya, ew ê bigihûsta dile wê. Lê nebû. Piştî deh rojên nexweşxanê, ew, tevî bav, Zabitê Simbêlqît û hin nasên xwe yên din, vegeriya malê. Wan mesele aş kirin, ser bûyerê girtin û ew li hev anîn. Xwezî ew li hev nehatina! Sar, sar, sar. Hertim sar. Hertim biyanî, hertim dijmin, –ji wan çiyayiyên Welatê Çiyan jî xerîbtir, dijmintir... Lawekî wan hate dinyayê, hêviya heyameke germ hate pê, lê nebû. Dîsan sar. Piştî çend salan kurekî din. Lê dîsan na. Hertim sar. Heta çaxa Baz şeqên wê vedikirin û dikete nav kûrahiyên wê û jê re, bi gotinên nerm, germ mîna mercanan, dinehwirand, heta hingî jî sar. Sar û dijmin. Ji dijminên li wan çiyan dijmintir. Dijmina li malê, dijmina herî xirab!..

Şorba Baz tê. Baz çend parî nan dixe nava şorbê û bi kevçî dikeve ser şorbê ku jê hilm û dûmaneke germ difûre. Hingî Zabitê Simbêlqît ji derî dixuye; kin, jar, porweşiyayî, esebiyeteke diyar li ser rû, di nav cil û bergên sivîl ên kevn û jihevketî de. Gelo ev camêrê hanê kintir bûye? Baz ji cihê xwe radibe, destê xwe yê rastê dirêjî wî dike û li hember xwe cih nîşanî wî dide. Ew bi destê Baz nagire, rûtiş, li hember Baz rûdine. Ew deng nake. Baz jî deng nake. Bi qasî çendekê, ew welê bêdeng, li hev dinihêrin. Çavên Zabitê Simbêlqît ketine kortê, fera çavên wî yên belek vemiriye. Simbêlên wî yên qît ku spî dikin, niha, ziravtir in. Çermê rû û gewriya wî tijî qermîçek in. Li ser bîbikên çavên wî yên westiyayî çirîskên hêrs û kerbê dixuyin. Ev însan, bi tenê ev kalê hanê bi serpêhatiya Baz, bi hemû jiyana wî dizane. Evî jê re bavitî kir, ev lê xwedî derket, vî ew xist ser vê riya fetloke. Naxwe ev kalê perpitî bû ku Baz ewçend qedr û qîmet didayê, gotineke wî nedikir dudo. Îro, niha, divê ew bipeyive, devê xwe yê qefaltî veke û her tiştê ku ew pê dizane, kit bi kite bibêje.

"Tu jî şorbeyekê naxwazî? Germ e..." Baz, bi nermahî, jê dipirse.

Ew bersiv nade, bi tenê, li Baz, li rû û rûçikê Baz dinihêre.

"Nexweşiya te çawan bû? Min bihîst ku dilê te niha çêtir e..."

Bersiv nîn e. Ew bi tenê awireke gelekî tûj, nêrîneke kîndar, lê xizîn, ji Baz ve dide. Gotin bêkêr e, Baz rûyê xwe jê ba dide û vedigere şorbê û şorbê kevçî dike. Baz şorbê xelas dike, devê xwe bi destmaleke kaxizîn paqij dike û dîsan lê dinihêre. Hingî Zabitê Simbêlqît devê xwe vedike, hingî qîrîneke tîz ji devê wî derdikeve;

"Law... Ev çi halê te ye? Tu dê kengî însan bî, law..."

"Sakîn be", Baz, sakîn, dibêje.

"Sakîn?.. Ez ê sakîn bim! Law, tu dizanî te keçika masûm xistiye çi halî! Law, teres, lawê teresan, ma meriv weha dike? Me tu mezin kirî, me keça pepûk da te ku tu van tiştan bînî serê wê? Serserî, law... te keçik xistiye komayê... law bêwîjdan, meriv bi dijminê xwe weha nake!"

"Sakîn be, we ew da min û mala min şewitand... lê bibire.."

"Ez ê sakîn bim!.. Em ê dengê xwe bibirin, her tiştê te, her gunehê te veşerin û bêdeng bimûnin! Law, ev cara çendan e, bibêje, cara çendan e?.."

"Qîre qîrê meke... ez nehatime vê derê ku li qîre qîra te guhdarî bikim... Ji bo tişteki din ez hatim... Tu ji min re bibêje ka ez kî me, çi me, ji kû me, dê û bavê min kî ne, tiştên ku te ji min re negotîne, niha, kite bi kite, ji min re bibêje..."

"Pêşî tu bersiva min bide, teres! Çima tu weha dikî? Çima tu dixwazî vê masûrnê bikuji? Tu nizanî ku hingî ez ê jî mêjiyê te belav bikim? Law kûçik!.."

"Binihêre", Baz, tasa şorbê û teyfika nên ji ber xwe dide alî, herdu destên xwe datîne ser masê û dibêje, "cara dawîn ez dibêjim, bibire, sakîn be... û ji min re her tiştî bibêje..."

"Gava tu li wê pepûkê dixî, baş e, ne welê? Çima tu hingî sakîn nabî, segbav, seg, lawê segan, bênamûs, lawê bênamûsan!..."

Hingî ew perda reş ku çavên Baz vedigire, dîsan, çavên wî reş dike. Mîna ku zelzeleyekê bi hemû dil, mêji û bedena wî ketibe,

ew xwe dide hev, di ser masê re, xwe hinekî xwar dike û bi destê xwe yê rastê, bi hemû quweta xwe, sîleyeke gelekî pihêt li navenda rûyê Zabitê Simbêlqîst dixe. Dengêkî toq ji sîlê derdikeve. Zabit di cih de dikeve, lê ew hêz dide xwe, radibe, dîsan rûdine û bi çavên beloq, şaşmayî, li Baz dinihêre. Ew welê dinihêre, bi tenê, sabît, bêdeng, dinihêre. Ew diheze, herdu levên xwe dixe devê xwe û wan gez dike. Rûyê wî niha bêpayan zer bûye, mîna ku hemû xwîna wî hatiye rêtin, mîna ku hemû bedena wî hatiye hingavtin, ew welê qamrast dinihêre. Paşê ew roniya qels a çavan jî vedimire û ew, hêdîka, ditewire erdê.

9. Xew

Kevok.

Kevoka jîyanê. Kevoka strana jîyanê. Kevoka jîyana Welatê Çîyan. Kevoka çîyayên Welatê Çîyan. Belê, Kevok li Welatê Çîyan, li ser çîyan.

Belê, em vegerin ser Kevokê.

Ji mehan nîsan e, destpêka nîsanê ye. Ji wextan berbanga sibeyeke ronî ye. Berf hêdî hêdî dibare. Em di navenda zincîrên çîyayên gelekî bilind, di bin geliyekî gelekî kûr ê Welatê Çîyan de ne. Di nav vî geliyê ku bi tenê di çîrok û efsanan de heye, em li meqerekî serhildêrên Welatê Çîyan, li ber qorekî însanên çekdar in. Qor ji bîst û çar kesan hatiye pê; hivdeh mêr, heft keç. Di qorê de, ji aliyê dawîn, li rêza heftan ew, yanî Kevok, qamrast, rawestayê. Em li ber Kevokê radiwestin û lê dinihêrin. Kevok, niha, ne ew Kevoka beşên romanê yên çûyî ya paytextê Welatê Mezin e. Ne Kevoka wê şeva hez û hezkirinê ya Jîr e, ne jî Kevoka wê şeva sohbeta hotêlê ye. Niha ew qulipiye ser însaneke din, însaneke nû. Niha cil û bergên wê, yên van deveran, yên van gelî, zinar û çiya ne. Em cil û bergên Baz ên şevê bînin bîra xwe; şalekî fireh û delingteng, kirasekî pîdirêj û fireh, şapikekî fireh, goreyên rîs û coteke pêlavên qehûm ên ji bo kevir û kepiran. Yanî cil û bergên belengazên Welatê Çîyan. Yanî kincên serhildêran, kincên kesên şerwan, rêwî û rêwîngan. Niha Kevok jî di nav van cil û bergan de ye. Lê hîn tiştên wê ji yên Baz zêdetir in; hejmara kirasên wê dudo ne, coteke lepikên rîs ên rengîn di destên wê de

ne, goreyên wê yên rîs ên neqîşandî ku heta ajnûyan derdikevin du cot in û pêlavên wê jî coteke potînên hundirpembû yên zivistanê ne. Şarekî rengîn ê risandî jî li serê wê ye. Belê, cil û bergên Kevokê germtir in. Ji ber ku berf li erdê ye, tevî ku dinya, hêdî hêdî, çile û zivistanê li pey xwe dihêle, di nav van çiya û geliyên efsanewî de, hê berf dibare, hê sar û seqema berf û pûkê ye.

Guherînen Kevokê ne bi tenê cil û berg in, niha Kevok ne ew Kevoka pordirêj e. Porê wê niha gelekî kurt in û li ser rûyê wê tu şopa krem, boyax û rengan nîn e. Kevok; di nav cil û bergên serhildêran de porkurt û gulîqusiyayî, sade, zelal. Û tiştêkî din; di destê Kevokê yê rastê de keleşkofeke lûlekurt û sivik ku jê re dibêjin "kûbî" heye. Û ji herdu aliyên, çeperast, du rext, tişî berik, li ser sînga wê ne. Li kêleka rextan jî, li herdu aliyên kemera wê ya navtengê du narincok hene. Kevok; şervan, çekdar. Kevok; niha serhildêr.

Mîna hevalên xwe yên din ên taximê, Kevok jî, qamrast, sîng, serî li pêş, rawestayê û li kumandarê taximê guhdarî dike.

Ew rêwî ne, ew ê herin.

Roja ku ew hemû, tevî Kevokê, li bendê bûn, hatiye; ew ê bi rê kevin û ber bi aliyên hundir, kûrahiyên Welatê Çiyan herin. Ew ê dirêjî dilê welêt bikin. Kumandar, bi dengêkî gelekî berz, gotin bi gotin, behsa meş û çûyinê, çêla çiya, gelî, newal, berf, berfende, ba, bahoz, bager, heywanên dirinde û talûkeyên din ên ku li pêş wan, li ser riya wan in, dike. Riya wan dirêj e, gelekî dirêj. Bi qasî sê rojan divê ew bimeşin, bêwest, bêrawest divê ew her li rê bin, —da ku ew xwe bi qonaxên xwe yên şer û pevçûnê bigihînin. Kumandarê bejndirêj, simbêlboq li hember wan sekinîye, çavên wî li wan, dipeyive; çile çû, zivistan dere, bihar tê. Yanî wexta şer û pevçûnê, êrîş û lêdanê, mirin û kuştinê tê. Ev bihar, ev havîna ku tê, divê bibe wexteke nemir a derb û êrîşên xedar ku dijmin tu carî jî bîr neke. Dijmin divê di bin derb û êrîşan de gêj bibe, bifetise, divê dijmin fam bike ku ev ax, ne axa wan e. Lê her tişt, pêşeroj, hêvî, quwet, şerê pîroz ên rojên bê,

belê her tişt bi vê çûyînê girêdayî ye. Eger ew vê çûyînê, bêzîrar, bê qeza û bela, bi serfirazî, bi ser xînin, hingî ew dikarin her tiştî bibin serî. Hingî ew ê bi ser kevin. Biserketî li pey vê meşe ye.

"Biserketin", kumandar dibêje û gotinên xwe xelas dike, "biserketin ji bo me, ji bo tevgera me ya çekdar, ji bo welat û gelê me!" Qor jî, bi yek dengî, "biserketin" dibêje.

Kevok, rûyê wê bi kuliyan berfê şil, germahiya heyecanê di bedena wê de, "biserketin" dibêje.

Kumandar, cara dawîn, li wan bîst û çar kesên xort dinihêre. Nefesa kumandar li ber devê wî gulokên tenik ên dumanê tînin pê. Bi qasî çendekê ew welê bédeng, li wan dinihêre û paşê gotina xwe ya dawîn dibêje; hingî em bi rê kevin.

Û ew bi rê dikevin.

Yek bi yek, mîna libên tizbiyekê li pey hev. Çekdar, mîtralîyoz, çekên giran ên roketan, keleşkov, demançe, narincok bi wan re. Barsivik, hema çi bigire di piştê hemûyan de çanteyekî biçûk ê piştê, di navbera her yekê de bi qasî deh mîtro mesafe. Qorê bîst û çar kesan, bi leza birûskê, bi dûzan, bêyî ku ahenga meşê têk bide, di nav xwe de dibe sê kom; pêşmêr yan jî em ê bibêjin rêber, koma navîn û koma dawîn. Pêşmêr; nasdar û şarezayên van deveran, jîr, jêhatî, rêberên taximê. Koma navîn; kumandar, serekên din ên taximê, şervanên herî bijarte. Koma dawîn; xêşim, nûgihîştî û bargirên çekên giran, tevî çar egîdên şareza û xwedîtecube. Koma dawîn, koma ku Kevok tê de ye. Kevok; xêşim, nûgihîştî, hê şagirt, hê di destpêka şervaniyê, hal û hewalê meş û çûyînê dijwar de.

Kevok bi rê dikeve. Çavê wê li ser ling û tempoya meşa kesê li pêş wê, Kevok dere. Dilê Kevokê bi heyecan hildavê. Xwedêyo, meşa yekemîn! Çûyina welêt, vegera welêt! Bi vê celebê, bi çek û pûsad, bi çekdar û serhildêran! Di vê berbanga zelal de, bi vê berfa spî ku hêdî hêdî dibare, di nav vê hewa paqij de, di bin vî esmanê çîkî aram û şîn de! Her der aram, her der spî, her der gewher.

Şervan ji meqerê, şervan û serhildêrên bêhejmar ên mayî yên meqerî, hêdî hêdî bi dûr dikevin û ber bi jor, ber bi sînga çîyan hildikişin. Geliyê ku ew tê de bûn, meqerê ku ew, bi mehan, hewandibû, heval û hogirên wan ên van warên veşartî yên dawîya dinyayê, niha li pey dimûne. Kevok bêyî ku tempoya meşê xira bike, bi lez, serê xwe dizîvirîne û li gelî û meqerê, li serhildêrên meqerê ku hê jî dest li wan dikin, dinihêre. Ev bûn çend meh ku ew li vir, di vî geliyê kûr, cihê jîbîrbûyî yê dinyayê ye? Du meh? Sê meh? Çar meh? Ev şikeft, ev ziving ku bûn war û mala wê, bûn rûpela yekemîn a jiyana wê ya nû... Ev çemê ku gelî seranser dibire û niha di bin pûşiyekî spî yê qeşa û berfê de, nexuyayî, diherike... Ev darên gûz û çaman ku niha bi kirasekî spî bûne pardarên jiyana spî ya gelî... Belê, Kevok li vir hînî prensîbên jiyana nû ya şervaniyê bû, li vir wê hevaltiyên nû yên qehûm ku bi hûmên man û nemanê ava bûne, anîn pê, hogirên jiyana serhildanê nasîn. Li wir wê, cara yekemîn, çek hilgirt, demançe teqand, berikên keleşkova biriqî di sînga çîyan de vala kir, hilkişiya lûtkeyên çîyan, bi saetan, du saet, pênc saet, heft saet, deh saet di nav zinar, gir, kaş, gêdûg û bihurên newal û geliyan de meşiya. Li vir wê, cara yekemîn, nan pêjand, savar danî ser agirê êzingan, tevî deh, bîst, sîh, çil hogirên xwe, savara pirî cara rijî, da ber kevçîyan.

Pişî ku Kevokê, li paytextê mezin ku êvaran, bi çirîskên lampayên bûlwaran ronî dibû, biryara xwe ya çûyina Welatê Çîyan da, tevî çend kesên din, bi dizî, ew raste rast hat van deverên gelekî asê ku li ser tixûbên welêt in. Ji wê rojê û vir ve, ew, bi dû hêviyan, her, li vir ma. Hêviyên wê, yan jî sebebên ku Kevok xiste ser van riyan, eger em bi kurtî bibêjin, ev bûn; Jîr, dîtina Jîr, pê re bûyîn, pê re jiyaneke yekgirtî ya serhildanê parve kirin. Sebeba dudoyan; welat, vegera welêt, di welêt de bûyîn, pê re, tê de bûyîn, jiyîn, beşdariya raperîn û hişyarbûna welêt... di nav van çend mehên jiyana vî geliyê de ku bi temrînên leşkerî û siyasî derbas bûn, Kevokê Jîr nedît, ne bi tenê nedît, şopa Jîr jî rast ne-

kir. Mîna ku Jîr ê, ji nişka ve, lê derbûya û bihata, welê çavên wê li ser qelîşek, bihur û riyên pir tengên fetloke yên newalê, Kevok hertim li hêviya Jîr ma. Lê Jîr nehat. Jîrê ku dev ji her hiştî berda û kete nav refên serhildanê, nedixuya. Hinan gotin ku Jîr bûye kumandarê taximeke serhildêran û li aliyê din ê tixûban e, hinên din jî gotin ku Jîr di nav pêlên serhildanê yên aliyê başûr ê welêt e. Yekî jî got ku Jîr, li welatekî cîran, di meqerê rêberiya tevgera azadîxwaz de ye. Lê carekê jî wê bihîst ku Jîr di kemînekê de şehît ketiye. Herçend wê bi vê xeberê bawer nekir jî, gava wê xeber bihîst, dilê wê guviştî. Heta îro, heta vê roja çûyînê jî Kevokê Jîr nedîtiye. Lê Kevok bi hêvî ye, eger Jîr sax be, eger Kevok sax bimîne, ew ê wî, rojekê, bibîne.

Lê hêviya wê ya dudoyan, îro, bi cih dibe; ew dere welêt, ew xwe dirêjî dilê welêt dike. Azad, serbest, serbilind. Belê wê ev roj jî dît... Ma Kevokê û Jîr, di wan roj û şevên bedawîn ên paytextê ronî de, her û her behsa vê rojê nekiribûn? Kitabên ku wan xwendibûn, şîrên ku wan jiber kiribûn, ne li ser vê roja azad, serbest û ronî bûn? Ma wê hertim nedixwest xwe bi kûrahiyên rastiyan, bi esasên însanbûnê, hilavetina dil û coşa ruh, bi sebebên alozî û diwariyên jiyanê bigihîne? Ma ne ew bû ku hertim dil fikir bê qeyd û şert bijî, bê sînor û asteng bifikire, bê endîşe û sûzenî hemû deng û pêjnên têkel ên jiyanê seh bike û bê şik û guman hez bike. Belê, hez bike, hemû celeb û texlîdên hezkirinê nas bike. Celebên kel, heyecan, best û sewdayê binase. Binase, bi alîkariya van tecrubeyên bêpayan ên van rojan, di nav temrîn, çûyîn û hatina pir dijwar, rev û meşa man û nemanê, jiyanê şer û pevçûnê, bikemile, xwe binase, însan û însaniyetê binase, welatê xwe binase. Belê, Kevokê her ev xwestibûn, her van dixwaze.

"Fermo", Kevok dibêje û hinekî dilezîne, "fermo Kevo-ka çîyan, fermo, ew roj hat, fermo, îro êdî roj, roja îspatkirin û nîşandanê ye, fermo..."

Taxim mîna marekî reş î dirêj, çîv dide xwe û di qûntarê çîyan re ber bi jor hildikişe. Tevî ku ew gelek in û barê wan, çek

û pûsadên wan ên giran hene, ew gelekî çapik, zû, bi ahengeke tekûz, dimeşin. Çist û çalak, bi tempoyeke pihêt û tekûz, bêyî ketin û rawestandî. Di nav berfê de tu rê naxuyin, lê rêberên ku bi şixulê xwe dizarin, rê li ber xwe rast dikin û dimeşin. Rêber hem rê li ber taximê rast dikin hem jî rê vedikin. Li gora pêşmêran şixulê Kevokê hêsantir e; ew bi tenê dide pey şopa kesên li pêş xwe. Li ser şopa hevdeh kesên ku li pêş wê ne, ew di nav berfê de dimeşe. Lê tevî vê yekê ew bi zehmetî dimeşe. Ling heta ajnûyan di nav berfa nerm de ne. Rakirin û danîna lingan ne hêsan e. Çûyîn û meş ne hêsan e. Hilkişîna çiyayên asê ne hêsan e. Hê di destpêkê de bêhna Kevokê diçike. "Kevok, xwe rabigire, ez ketime bextê te, xwe rabigire", Kevok li çiyayên serî li esmanan ku li pêş wê bilind dibin, dinihêre û dibêje, "ev gava man û nemanê ye, hebûn û windabûnê ye. Biserketin divê, Kevok, biserketin..."

Hewa paqij, dinya ronî ye. Taveke zelal, bi tîrêjên rengîn, li pey çiyân, hêdî hêdî, bilind dibe. Kuliyên berfê ku bi giranî ber bi jêr dibin, bi şewqa tîrêjan, mîna mircanan dibiriqin. Tîrêjên ronî bi ronahiya berfê ve dibin yek û şewqeke nedîtî tînin pê. Dinya çikî sayî di nav behra şewqê de pêl dide. Şewq, pêl bi pêl, hemû dinya vedigire.

Lê dinya sar e. Her ku ew ber bi jor bilind dibin, her gava ku ew ber bi kaş û lûtkeyên çiyân davêjin, dinya hêniktir dibe. Bayekî sivik ku bi hilkişînê hîn bêtir dibe, rûyê Kevokê dibire, bêhna wê diçikîne. Kevok, pihêt, nefes digire û dide. Gerçî barê Kevokê ne zêde ye; keleşkova destan, du narincok, rextên li ser sîngê û çantê piştê. Di çante de jî tiştêkî zêde nîn e; çend tîke goştê qelî, nan, hinekî penêr, hinekî helaw û şekir, du defter, pêûs, destmalek, kevçiyekî bahûn, kêreke biçûk û hin tiştên din ên pêwist. Hevalên wê tu barekî zêde nedane wê.

Serê taximê niha hew dixuye. Ew ketina nava zikê çiyân. Kevok bi tenê çar, pênc kesên ku li pêş wê ne, dibîne. Li pey wê jî pênc, şeş kesên din tî. Çiya, zinar, dar, ber, dahl, li ber Kevokê li kêleka wê, dûmeneke bêpayan a efsanan tînin pê. Dinya, jîyan,

welatê wê, di bin vê berfê de, çiqas şêrîn e, çiqas delal e! Kevokê tu carî texmîn nedikir ku ev çiyayên evçend sawtijî, di eynî wextê de, evçend bedew û spehî ne jî.

Çiya, çiyayên welatê wê; pira navbera erd û esmanan, pira hezkirin, xewn û xeyalên evînê. Çiyayên wê; dermanê dilên birîndar, ava gewriyên zuwa û tî, nanê birçî û neçaran, kaniya her tiştî, avzêya zelaî, paqîjî, aramî û rastiye. Belê, çiyayên wê; kaniya co û çemên bêserî, bereketa ax û dinyayê, bereketa av û behran, strana teyr û tûr, şalûr û bilbilan, stariya şêr û piling, hirç û guran, hêlîna teyrê elo û baz, başoke û sêmiran. Çiyayên Welatê Çiyan; ji sedan, hezaran salan û vir ve kal, bi heyecana raperîna do û îro xort, nemir, li ser tixûban serbilind, serhildêr, warê serhildêran, gotina li ser zimanê dengbêjan, peyva nivîskî ya şaîran... ev çiya, ev çiyayên asê, spehî... ev çiyayên ku niha qulipîne ser warê hêviyê, bûne hêvî...

"Qeda li te keve dinyayê" Kevok, çavê wê li ser şewqa spî ya çiyan, dibeje, "dinya, çima tu van çiyan nabinî, dinya nebixêr!" Şewqa hawîrdor çavên Kevokê digire, ew nikare zêde li dûr binihêre. Ew li pêşiya xwe, li ling û şopên kesê pêşiya xwe dinihêre. Ji ber bextê çê, kesê pêşiya wê xortekî gelekî girs, çapik û şareza ye. Kevokê xort ku em ê jê re bibêjin Rênas, carina li meqerê didît. Rênas dihate meqerê, çend rojan dima û paşê dîsan winda dibû û diçû. Welê dixuya ku Rênas, gundiyekî ji van deveran bû. Kevok, bisemt, dide ser şopa lingên Rênas û dimeşe.

Di nav bêdengiyêke kûr a hawîrdor de, taxim dimeşe. Bi tenê dengê lingên wan ku di nav berfê de şopên kûr vedikin û carina jî dengê teyr û tûran bêdengiyê xira dike. Û carina jî kîvroşkine reş û spî û simorine belek, ji dûr ve, direvin û di nav dar û zinaran de winda dibin. Taxim niha dikeve nav dahleke gelekî kûr û boş. Meş diwartir dibe. Devî û devîçirkên boş li ling, çîp û cil û bergên wan digerin. Lê berfa nerm niha alîkariya wan dike û nahêle stiriyên devîçirkan rê li wan bigire.

Ew dimeşin. Kevok dimeşe.

Saetek, du saet. Sê saet... Spêdê spî li wan dibe danê sibê, danê sibê diqulibe ser nîvroyan. Tav hiltê, tîrêj bêhtir dibiriqin. Taveke ji germê dûr, bêruh û sar, lê bi rengên têkel ên sor û zer, bilind dibe. Ew dimeşin. Dahl û devî diqedin, dar û daristan tên. Dar û daristanên ku ji spîndar, bî û berûyan hatine pê, xelas dibin, gir û mitikên spî tên. Li pey gir û mitikan kaş û zinar tên. Li pey kaş û zinaran taht û lûtkeyên çyan ku di nav mij û dûmane de ne, tên. Ew dimeşin. Ew her hildikişin, rê û şiverê li ber xwe rast dikin û ber bi hedefên nas, bi qesta çyan, derin. Ji cihên herî asê, di kêlekên newal û bihuran re, li ser tahtên qeşagirtî, ew derin. Ji hin heywanên biçûk ên çiya û dahlan pê ve, ne însanekî, ne mehlûqatekî din dixuye, di nav tenêtiya bêdawîn a çyan de, ew her dimeşin.

Kevok diweste, ji taqetê dikeve. Lê ew derin. Bîstekê, hema bi qasî bîstekê wan bêhna xwe veda! Gewriya Kevokê zuwa dibe, ew êdî bi zehmetî nefes digire û dide. Niha bapûkeke sert quweta wê ya dawîn jî dişikîne. Her hewldana nefesekê, her gaweke nû dibe şikesteke dijwar. Na, ew hew dikare here. Lê ew çi bike? Rênasê gewdegirs ê li pêşiya wê, mîna ku ew hê nû bi rê ketiye, her welê, bi lez, bi tempoyeke tekûz, dimeşe. Kevok divê li pey wî be, tempoyê xira neke. Lê çawan? Lingên Kevokê giran dibin. Hişê wê dere. Lê tiştê herî dijwar nefes e. Nefesa wê, bi temamî, diçike, mîna ku kezeba wê were devê wê, mîna ku ew ketibe bin aveke kûr, welê bênefes dimîne. Na, nabe. Ew, hêdîka, ji rêzê derdikeve, xwe dide alî da ku li ser berfê, welê peregende, rûne. Lê nabe. "Xwehê, nabe" keça biçûk a hinekî gulover ku li pey wê tê, dibêje, "bikeve rêzê, bilezîne, eger tu li van deran rûnî, êdî tu yê winda bî, kes li hêviya te nasekine û tu hew dikarî xwe bi taximê bigihînî... zûka! Bilezîne."

"Ez hew dikarim", Kevok, bi hêza xwe ya dawîn dibêje, "hûn herin..." Hingî Rênasê li pêş wê li wan vedigere. Rênas rewşê têdigihê, tê nik Kevokê, "Xwişkê nabe, xwe rabigire", bi ken, dibêje, "ez bawer im, piştî bîskekê, piştî vî girî, em ê li cihekî nêz

bisekinin, bi destê min bigire û bimeşe..." Kevok, bêgav, bêdeng, bi destê rastê yê Rênas digire û hinekî li pey wî, dîsan, dest bi meşê dike.

Lê heta kengî? Kevok hew pê dizane. Xewa wê tê, ew dixwaze razê, dest ji meşê, çûyinê, welêt, her tiştî berde û bikeve nav xewa kûr. Ew çawan dere, ber bi kû dere, ew hew têdigihê. Heta ku taxim li kêleka qûntarekî asê radiweste, ew welê sersem, gêj, destê wê di destê xort de, dere. Çaxa taxim disekine, Kevok di cih de, xwe berdide erdê, hildiweşe nav berfê û welê bi qasî çendekê, li ser piştê, dirêj dibe. Nefes, çima nefesa wê weha diçike? Kevoka ku bawer dikir, ew ê kêmanî, bêrawest, bi qasî qonaxa rojekê bimeşe, çima weha, di nav çend saetan de sist bû, ji hev ket? Kuliyên biçûk ên berfê li ser rûyê wê dihelin. Kincên wê, bedena wê şil in. Tîrêjên xurt ên tavê rûyê wê hinekî germ dike. Berf, tîrêj, tav, bapûk, lûtkeyên çîyan, mij û dûmana lûtkeyan, germahiya bedena wê ku bi meşê hatiye pê, heyecana wê, tîrsa wê, serma ku niha bi ser wê de tê... Têkel e, her tişt di nav têke-liyeke nedîtî de ye. Bi dengê Rênas ku alîkariya wê kir, ew çavên xwe vedike. Rênas, simbêlên wî yên palik şil, rûyê wî bi ken, li ber serê wê sekiniye û jê re tiştêkî dibêje. Kevok xwe dide hev, hinekî radibe û li ser berfê rûdine.

"Were çay vexwe, çaya germ..." xort dibêje. Kevok radihêje tivinga xwe, bi alîkariya tivingê radibe ser piyan û dide pey xort. "Çima weha bû?" Kevok dipirse, "çima ez weha qels ketim?" Xort dikene, "ne xem e" dibêje, "bi ber xwe mekeve, tu yê jî, mîna herkesî, hûn bî, bedena te hê xêşim e, lê bi wextê bedenê hûnû vê tebiyetê bibe, pê re bibe yek. Em niha li cihên gelekî bilind in, ji ber vê yekê ye ku nefesa merivan tê birîn."

Kevok li dora xwe dinihêre. Ew niha li lûtkeyê çîyayekî gelekî asê ne. Çend tehtên fireh ên çiyê çiya dibirin û di bin tehtan, di qoziyekê de jî sê şikeft, di nav hev de, hene. Endamên taximê, peregende, li ber devê şikeftan rûniştine. Li kêleka devê şikefta herî mezin agirekî gur ê êzingan hatiye dadan û li dora êgir jî xelekek

ji şervanan hatiye pê. Rênas û Kevok ber bi êgir derin. Piştî ku ew tîr ber êgir, Rênas vedigere û bi derine dere. Kumandarê taximê û du serekên din jî li dora êgir in. Ew cih şanî Kevokê dîkin. Gava Kevok rûdine, şervanek tasek çaya germ dide Kevokê. Kevok lepikên xwe derdixe, çayê werdigire, bi lez, vedixwe.

"Welê meke, xwehê", kumandar jê re dibêje, "bi lez vemexwe. Seh bike, qayide yek: Di serma û pûkê de, gava tu agir, germ û germahiyê bibînî, tu carî melezîne. Bi talûke ye. Bi dîqet, hêdîka nêzîkî li her celeb germahiyê bike." Kevok dengê xwe nake, niha hêdîka, çaya xwe vedixwe. Devê şikeftan bi çend qor kevirên reş, hinekî lêbûne, ji hundir jî bêhnê ka û pûşê tê. Welê dixuye ku ev şikeft qonaxên li ser rîya şervanan e. Şervanên ku li dora êgir rûniştine, mîna ku ew derketine seyrangehê, bi ken, bi hev re dipeyivin. Tu şopa west û zehmetiyên meşê li ser rûyê wan naxuyê. Kumandar cixareyekê di nav pêçiyên xwe de dipêçe. Piştî ku ew cixarê dipêçe û wê bi çiqilekî êgir vêdixe, vedigere ser du şervanan û "ji şikefta zad û zexîran hinekî savar û goştên konserwekirî derxin, paşê jî dîsan mîna berê, serê zexîran, qe-hûm, bigirin û wan veşêrin" dibêje, "berî ku em herin, divê em zikê xwe tijî bikin. Riya me hê pir dirêj e."

"Riya me hê pir dirêj e..." Tirsek dikeve hundirê Kevokê. Ew ê bikaribe bimeşe, xwe bigihîne tempoya taximê? "Kevokê, heyranê, xwe, min riswa meke", ew difikire û destên xwe dirêj gulokên êgir dike. Şervan, kom bi kom, peregende, rûniştine. Hinên wan çay vedixwin, hin cixare dikişînin, hin jî çekên xwe paqij dîkin. Kevok, hinekî bêhnvedayî, li wan dinihêre; şervanên xort, xurt. Di şerê man û nemanê de bêtirs û dawiyê pirî caran şehîd. Şehîdên bênav, bêgor û goristan. Fedakar. Dilên ku bi tenê ji bo welat, ji bo gel, ji bo vê axa pîroz hildavên. Dilên ku bi vê axê ve hatine girêdan, bûne yek. Evîndarên vê axê, van çîyan. Serhildêr; hêviya sibê, qehremanên tarîxa sibê, maxrûrî û pesnên rojên bê. Ronahiya tîrêjên tava vî welatê girtî, belengaz û bêpişt, çirîskên şeva tarî ya van çîyayên asê yên bêrê û bêrêwî. Navê

wan; şervan, serhildêr, bi tenê hewqas. Bênavên ku jiyanekê nû ji bêgavî û mirinê ava dikin. Law û keçên miriyên ku di nav van gelî û newalan de serî danîne, li ser van zozan û çiyên xwîna xwe rijandine. Law û keçên ku li ser şopa bav û kalên xwe ne.

Çavên Kevokê tên girtin, xewa wê tê. Serê wê hêdî hêdî dikeve ber wê. Lê ew bi dengê kumandar çavên xwe vedike. "Qayide dudo", kumandar, bi ken dibêje, "gava şixulek nûn be û xew were, hingî fersend divê nereve. Pênc dedîqe, deh deqîqe, ferq nake. Xewa kêliyêkê jî merivan zînde dike... Here hundir û raze, heta savar hazir dibe..." Kevok, tasa vala datîne kêleka xwe, bi kêfxweşî, radibe û dere hundirê şikeftê. Çar kesên din jî, du keç, du xort, li kêlekên hev, li ser ka û pûşan, dirêj bûne. Kevok, bi lez, dere aliyê hundir, çantê xwe yê piştê ji xwe dike, tivinga xwe datîne ber dîwarê şikeftê û xwe li kêleka xortekî dirêj dike û bi carekê dikeve nav xeweke kûr.

Piştî çendekê yek tê û Kevok û yên din hişyar dike. Savar hazir e. Ew xwe didin hev û ji şikeftê derdikevin. Niha li ber devê şikeftê din jî agir hatiye dadan. Sê xelekên fireh li kêleka agirê, li dora savarê, hatine pê. Kevok dere cihê xwe yê berê û rûdine, kevçiyê xwe jî çantê derdixe û ew jî, mîna hevalên xwe, savara ku li ortê, di nav tepsîyeke fireh û kûr de ye, kevçî dike. Bi lez, mîna gurekî birçî. Savara germ, lê bêtam, germahiyekê dixê hundirê Kevokê. Hingî kumandar dîsan "qayide", dibêje, "qayide sisê; di meş û rêçûnê de xwarina zêde zirar e, bedenê giran dike, nefesê diçikîne. Zikê xwe merepisîne, hindik bixwe."

Bi dû valabûna tepsîyê re, şervan xwe didin alî û dîsan li dora êgir dicivin. Kumandar cixareyeke din dipêçe û li şerwanan, li Kevokê dinihêre. Tevî ku tav heye, tevî ku ew li kêleka agirê gur in, dinya sar e. Kevok diricife. Hewayeke sert mîna devê kêrê nefesa Kevokê dibire. Destên Kevokê, rûyê wê germ dibin, lê bedena wê sar e. Ew hinekî din nêzîkî êgir dibe. "Navê te Kevok bû, ne welê?" kumandar jê dipirse. "Belê", Kevok, bi kurtî dibêje. "Ez bêjim te", kumandar didomîne, "siûda te gelekî

baş e. Tu carî, tu wextî, ev çiya, hewa van çiyân di van mehan de evçend nerm, zelal û aram nebûye. Tu carî rojeke van çiyân bê ba û bager, pûk û bahozê nebûye. Tu bi şans î..." Kevok dengê xwe nake, bi tenê, "belkî" dibêje. "Na, na, welê ye", kumandar, cixara xwe dikişîne û dibêje, "çiyayên bav û kalan ji te hez kirin, bi aramî xêrhatinî li te dikin... tu dê hîn bî, hînî zimanê çiyân, zimanê vê tebiyeta asê, zimanê ba û bahozê bî. Lê qayideyeke din ku tu divê hîç ji bîr nekî; li serê van çiyân divê tu ji guran gurtir bî ku tu bikaribî bijî. Ji bîr meke, ji guran gurtir..."

Wexta rabûn û meşê dîsan tê. Taxim li ber şikefta mezin dici-ve. Şopên lingan di ser berfê re, bi bataniyeke fireh tîr paqij kirin, agir tîr tefandin, çal vedibin û serê êgir bi berfeke pir tîr girtin, devê şikeftan paqij dibe. Cil û berg tîr şidandin, çek û pûsad tîr girêdan. Taxim hazir e. Kumandar û du serekên din ên taximê li pêş taxima ku bi sê koman rêz bûye, radiwestin. Kêmanî nûn e, herkes li rêza xwe ye. "Ji niha û pê ve rîya me dijiwartir dibe", kumandar dibêje, "talûke jî bêhtir in. Gerçê ez ne bawer im ku em pêrgî dijin bîn, lê helikopterên wan dikarin werin. Hayîdar bin, li xwe, li rêza xwe, li hevalên xwe hayidar bin. Xwe sist mekin. Ji vir û pê ve êdî rawest jî nûn e. Heta ku em xwe bigihînin qonaxa şevê, em ê nesekinin. Qonaxa bê li paş vî çiyayê hanê ye." Kumandar bi destê xwe yê rastê çiyayekî gelekî dûr nîşan dide. Gotina wî "vî çiyayê hanê" ne rast e, çiya ne çiyayê hanê ye! Dîsan tirsek dikeve nava Kevokê. Ew ê xwe çawan bi wî çiyayê gelekî dûr bigihîne, çawan heta wan deran here? Çiya, pişt û lûtkeyên çiyân, mîna hev, di nav zikê hev de, mîna taxima çekdar, rêz dibin. Çiyayên mîna hev, lê bêdawîn, bilind, asê. Kevok, careke din, li çiyayê dûr, li qonaxa şevê dinihêre. Eger ew di texmîna xwe de şaş nebe divê ew niha ber bi jêr herin, paşê dîsan hilkîşin çiyayê hember, piştî lûtkeyê çiyayê hember jî ew divê xwe bigihînin aliyê din ê çiyê. Xwedêyo!

"Hingî em derin", kumandar dibêje.

Û ew derin.

Û Kevok bi rê dikeve û dere.

Dîsan sê kom, dîsan mîna berê. Dîsan Rênas li pêş, keça gulover li paş Kevokê. Dîsan mîna marekî fetloke, şiv bi şiv. Dîsan di nav şewqeke bêpayan, li ser gewheriyeke berfê ya hevrişimî ku pêl bi pêl dibiriqe.

Kumandar û ew du kesên serek ku pê re ne, di nav komên taximê de derin û tên. Gava ew tên ba koma dawîn, kumandar nêzîkî Kevokê dibe û jê re dibêje, "qayideyeke din; helaw bixwe, çend kevçî helaw ê te bêhtir zînde bike... Û qayida esasî, herî esasî, li rê, di meş, di berf û pûkê de raneze, tu çi dikî bike raneze, xwe gez bike, penc bike, biqîre, biqîje, bigirî, xwe birîndar bike, tiliyên xwe jêke, kêr li xwe xe, çi dikî bike, raneze. Li van çiyên mirin bi xeweke şêrîn, bi razaneke nerm û bedew tê. Di nav berfê de mirin xayin e, kirasê xewê li xwe dike, tê û dixapîne... Ji bîr meke, divê razan nûn be, hîç nûn be..." Û bêyî ku kumandar li bersivê bisekine, dimeşe, lê piştî çend gavan dîsan disekine û vedigere ser Rênas, "Rênas, bila çavê te li Kevokê be", dibêje.

Ew derin, îcar ber bi jêr. Tevî ku lingên Kevokê werimîne, ew xwe xurt û zînde hîs dike. Li pey Rênas, ew, bê zehmetî, ber bi jêr dibe. Lûtke, teht, şikeftên ku jixwe bi zehmetî dixuyan li pey dimînin. Zinarekî asê li pey dimîne. Daristaneke biçûk ku ji darê qehûm û stûr ên çînanan hatine pê, li pey dimîne. Ew di cihekî gelekî teng re ku milekî wî tahtekî qeşagirtî, milek jî valahiya newaleke bêbinî ye, derbas dibin. Saetek dere, du saet derin. Taxim, kom û Kevok, bêyî ku tempoya meşê xira bikin, di nav lezeke tekûz de, dimeşin. Danê êvarê taxim, dîsan, di bihurekî teng re, dest bi hilkişînê dike. Hingî, bi hilkişînê re, Kevok ji taqetê dikeve. Dîsan bêhna wê diçike, lingên wê giran dibin. Li derekê, lingê wê yê rastê dikeve çalekê û ew dev û rû dikeve erdê. Rênas tê hawara wê. Ew bi destê Rênas digire û radibe ser piyan, xwe dide hev, tivingê digire û dîsan dest bi meşê dike. Lê nabe. "Şekir bixwe", Rênas dibêje, "çend serî şekir bixwe... û ji devê xwe nefes megire, ji difnan, difnan..." Kevok du serî

şekir davê devê xwe, dimije û dimeşe. Lê piştî bîskekê ew dîsan dikeve. Îcar ew bi xwe radibe. Kevok radibe, dimeşe û dikeve; radibe, dimeşe û dikeve.

Komên pêşî êdî naxuyin. Ji koma dawîn çendên din jî, mîna Kevokê, bi zehmetî, bi ketin û hilweşînê, dimeşin. Kêfa Kevokê tê; di qelsî û sistiyê de, ew ne bi tenê ye. Ew her hildikişin. Ro, tîrêjên rojê li pey çîyan winda dibin. Bapûk sertir dibe. Sar e, hemû bedena Kevokê niha şil e. Ew hem xwîdan dide hem jî, jê re, bêpayan sar e. Hewa hişk mîna xencerekê ko gewriya wê dibire. Lingên wê, potînên wê niha bûne barê bergîran, mîna van çîyan stûr û giran bûne. Her cara ku Kevok hewl dide lingekî xwe rake, mîna ku ew çiyayekî ji van çîyan ji axê rake, welê, diweste, diêşe. Lê ew dimeşe, tevî her tiştî ew dere.

Nêzîkî lûtkeyê çiyayê ku ew hildikişînê, li derekê, keçikeke ku bi du rêzan li pey Kevokê ye, dikeve û hew dikare rabe. Bi qasî bîskekê ew radiwestin û dixwazin alîkariya keçikê bikin. Lê keçik nikare rabe. Rênas, Kevok û çend şervanên din li ser keçikê ne. "Mesekinin", Rênas dibêje, "hûn bimeşin, li pey nemûnin..." Kom dest bi meşê dike. Rênas û du şervanên xort li nik keçikê dimûnin. Piştî bîskekê, Rênas û yên din xwe bi komê digihînin. Keçik niha li ser piştê şervanekî xort ê girs e. Gava Kevok keçika jixweveçûyî li piştê şervan dibîne, li milekî dilê wê bi keçikê dişewite, li milekî jî ew şerm dike. Lê ecêb e, li milekî jî kêfa wê tê ku kesa li piştê şervan, ne ew e, yeke din e. Ew ê li ber xwe bide, bimeşe, here, tevî her tiştî, tevî her zehmetiyê xwe bigihîne qonaxa dawîn. Ew ê bimeşe, bapûk ê nebe asteng, ji berevajiyê, jê re bibe heval; berf ê nebe kemîn, bibe mehfûreke spî û tenik ku rê şanî wê dide; sar û serma hawîrdor ê nebe kefen, bibe hênika hiyeke tenik a zozanan; lingên wê dê nebin qantarên giran, ew ê bibin mîna lingên sivik û çapik ên van kîvroşkên ku li vir, li wir, dixuyin û bi hostehî direvin. Kevok ê bimeşe; dengê bapûkê dê bibe straneke kevnar, bihur û qelîşekên zinar û çîyan ê bibin deriyên vekirî yên sêrîn ên efsane û çîrokan û rê bidin Kevokê.

Belê, Kevok ê bimeşe. Kevok kêfxweş e ku ew hê dimeşe. Kevokxemgir e ku hevaleyê wê hew dikare bimeşe. Piştî evçend meşê, niha, hişê Kevokê dere. Na, ne hişê wê dere, xewa wê tê. Wext gihîştîye êvaran. Êvar wexta xewê ye. Kevok ê raze. Na, ew ê bimeşe. Kevok xwarî erdê dibe, kulmek berf digire û pê rûyê xwe dişo. Hinekî bêhna wê vedibe. Lê lingên wê? Çima lingên wê weha tevizîne? Çima ling hew dilivin? Kevok ê bimeşe, divê bimeşe. Lê ling narin, mîna ku lingên wê jêbûne, pê re nîn in, Kevok hew hakimî lingan e. Cil û bergên wê jî, niha, mîna ku ew ji hesin hatibin pê, welê giran bûne. Ev çi giranî ye ku ji her milî bi ser Kevokê de tê? Na, xîret divê, "Kevok, xîret" Kevok dibêje. Lê xewa wê tê. Xew çavên wê digirin. Heye ku ew bikaribe çavgirtî, di xew de jî bimeşe. Xîret... Ew dikeve, di-tewire nav berfê û bêlebat dimîne. Xew tê, xewa narîn, nazenîn, nerm, aram. Lê bi dengê ve Kevok hişyar dibe. "Kevok, hişyar be Kevok!.." Rênas e, Kevok, çavên wê niha vekirî, li Rênasê ku li ber serê wê sekiniye dinihêre. Rênas e, Rênasê ku rîyan dinase, bi hal û hewalên rîyan dizane. Rênasê ku ne mîna Kevokê xeşîm e. Kevok dikene û dîsan çavên xwe digire. "Kevok rabe", Kevok dengê Rênas seh dike, dîsan çavên xwe vedike. Gava ew çavên xwe vedike, Rênas şeqameke sert li rûyê wê dixê, "rabe" dibêje. Şeqameke din tê, yeke din. Kevok hinekî hişyar dibe, bi zehmetî "hûn herin", dibêje, "xewa min tê, hûn herin." Rênas du şeqamên din lê dixîne, wê bi herdu destan dihejîne, li ber wê, piştî, li ser çogan rûdine, bi herdu destên wê digire û wê davêje ser piştê xwe.

"Raneze", Rênas, bi qîrîn, dibêje, "raneze, rîya me zêde nemaye, bipeyive, zimanê xwe, lêvên xwe gez bike, raneze..."

Wext dere, ew derin. Xew tê, xeyal tê, xewn tê. Ew derin. Bi tempoyeke tekûz, bi gavên fireh, Kevok li piştê Rênas, ew derin. Kevok dere, di navbera xew, xewn û zinar û çîyan de dere û tê. Ew çiqas derin, wext çiqas dere? Kevok hew pê dizane. Gava Kevok, ji nû ve, çavên xwe vedike, ew di nav şikeftê de ne.

Kevok li ser ka û pûşan dirêj bûye. Rênas û çend kesên din jî li dorê ne. "Tu bijî Kevok", Rênas dibêje, "em bi ser ketin, em hatin... çavên xwe veke... megirî..." Hingî Kevok li xwe werdiqile ku ew digirî. Ji nişka ve ew dengê xwe dibire. Bêhna agir û dûmana êzingan bi difnên Kevokê dikeve. Kevok xwe hinekî dide hev, dixwaze rabe ser piyan. Lê hişê wê dere. Bedena wê diêşe, her derê wê teviziye, westiyayî ye. Lê ya herî xirab lingên wê diêşin, na naêşin, ling dişewitin, mûna ku di nav êgir de bin, welê dikizirin.

"Min bibin ba agir", Kevok, gotin bi gotin, bi giranî, dibêje. "Na", dengêkî dibêje. Kumandare, ew jî niha hatiye cem Kevokê, "tu bijî Kevok, îmtihana te yekta bû... lê divê ji agir dûr bî." Rênas, di destê wî de sîtileke kûr ku tê de berfeke pir heye, tê ber serê Kevokê. "Niha piştî bîstekê tişteki te dê nemîne", Rênas, bi ken dibêje û potînên Kevokê ji lingên wê derdixe. Piştî potînan, ew goreyên qalin ên rîs jî derdixe, delingên şapikan heta ajnûyan hildikişîne û bi berfê lingên Kevokê miz dide. Şewateke nedîtî, bêpayan dilê Kevokê vedigire. Ew dixwaze bigirî, biqîre. Ew dixwaze bimire. Kevok lêvên xwe gez dike, heta ku jê tê lêvan di nav diranan de diguvişîne. Lêvên wê di nav xwînê de dimînin. Xwîn dikeve gewriya wê. Bi qasî demeke dirêj masaj welê dewam dike. Piştî masajê jî Rênas herdu lingên Kevokê dixê nav sîtileke tijî av û lingan, hêdî hêdî, bi dest û tiliyên xwe yên qelew, mist dide. Bi qasî demeke dirêj Rênas straneke kevnare dinehwirîne û lingên Kevokê, bi dîqet, mist dide. Strana Rênas ku gotinên wê baş nagihên guhê Kevokê, xewa Kevokê tîne û ew dikeve nav xeweke nerm.

Piştî demeke çend saetan, Kevok bi dengê nalînekê hişyar dibe. Li kêleka wê du kesên din, keçek û xortek, razane. Xort dinale. Der û dor tarî ye. Li aliyê çepê Kevokê, lampayeke biçûk a gazê, li ser dîwêr, vêketiye. Ew li aliyê dawîn ê şikefteke gelekî kûr in. Bataniyeke germ li ser Kevokê ye. Bêhneke giran a ka, pûş, şewat û xwîn û mîzê şikeft vegirtiye. Li aliyê wan ê rastê

çend qor êzing li kêleka dîwêr dixuye. Li dûr, li ber devê şikeftê ronahiyeke zirav a agirekî dixuye û dengin ji wir tê.

Kevok diji, heyret Kevok ji xewa şêrîn a bêveger hişyar bûye!

Kevok, bisemt xwe dilivîne û hêdîka radibe ser piyan. Lingên wê bi pêşgîrên germ hatine rapêçandin. Cil û berg, taxim û rextên wê lê ne. Ew, hêdî hêdî, gavekê, du gavan davêje. Belê, ew dika-re bimeşe. Hêdîka ew xwe digihîne ber devê şikeftê, nik êgir, nik hogirên xwe. "Xwehê were", yek dibêje û li kêleka xwe cihekî jê re vedike. Kevok rûdine. Mîna ku ew bircekê lêkin, şervanan çend qor êzing danîne ser hev û agirekî gur dadane. Gulokên êgir li hev digerin û bilind dibin. Çavên Kevokê li Rênas û kumandar digerin. Lê ew naxuyin. "Tu çawan î?" ew şervanê ku cih şanî Kevokê kir, jê dipirse, "baş î?.. Çayekê jê re bînin."

"Belê", Kevok dibêje, "ez baş im, çêtir im."

Êvar qulipiye ser şevê. Berf sekiniye, nabare. Şeveke sar û bêdeng dest pê kiriye. Lê dinya ronî ye. Li jor, li esmanan stêrk diçirisin, li jêr, li erdê berfeke boş û bêdawîn a spî leylan dide. Cihê ku ew tê de ne, li jor nêzîkî stêrkan, kendalekî berwar e. Stêr ewçend nêzîkî wan in! Bi qasî deh şikeftan di nav kendal de, veşartî, li pey hev, dixuyin. Li ber devê hin şikeftên din jî agir hatiye dadan. Hin şervan di bin stêrkên zêrîn de, mîna siya van çiyayên qedîm, li ber şikeftan derin û tîn. Bergeheke bêpayan li ber Kevokê ye. Kevok êşa lingên xwe, westa bedena xwe ji bîr dike. "Welatê min", ew difikire, "welatê min ê neçar, bêkes..." Çiya, çiyayên spî, gewher, mîna hev, her mîna xwe, bêguher, mekanên dayîm û abadîn ên rêwî û kerwanên cihê û têkel. Do, pêr, pitikpêr hinên din, îro em, sibê, dusibê kesên ku li pey me tîn. Rêwî cihê, rû û rûçik cihê, cil û berg cihê, dewr û dewran cihê, lê mekan eynî, reng eynî, zivistan eynî. Sar û serma eynî. Berf eynî, stêr eynî. Ronahî eynî. "Welatê min, hêstirên pêşîn ên evîna min... gotinên dawîn ên evîna min a niha windabûyî" Kî hat, kî çû? Kê tu vegirtî, kê ji te hez kir, kê ji te nefret kir? Te kî hewand, heband, hembêza xwe ji kê re vekir, te kî di hembêza

xwe de bir gorê? Tarîxa te? Zîmanê tarîxa te? Zîmanê van çîyan? Kî dibêje ku tu dê winda bî, ji tarîxê, ji rûpelên jîyanê xatir bixwazî? Fermo, ez hatime, di hembêza te de me, tevî coşa evîna xwe, kefenê mîrîna xwe, bîr û hişê xwe, nezanî û xeşîmiya xwe, ez hatime. Fermo, min bihewîne, min bihebîne, min bikuje... "Welatê min ê belengaz, êdî tu dîzanî, fermo", Kevok, çavên wê li ser stêr û gupikên çîyan, difikire.

Şervanek zerîkek çaya germ tîne û dide Kevokê. Kevok çayê vedixwe. Piştî çayê jî, yekî din çend pahrî nan û teyfikeke tijî savara germ tîne û didiyê. Savar tijî tîkeyên goşt e. Kevok, hêdî hêdî, nan û savarê jî dixwe. "Xwehê, li vê bedewiya çiyayên ronî bimeyzîne", şervanê kêleka Kevokê dibêje, "li dara dinyê, xweşiya herî xweş aha ev e. Aha ev çiyayê stare ye, stara herkesî, her tiştî, her mexlûqetî. Kî ku ket tengahiyê, ew berê xwe dide van çiyayên wefadar... Xwehê bimeyzîne..."

Çiya, star e, wefadar? Kevok dengê xwe nake. Kevok kesên ku li dora êgir rûniştine, dijmêre. Ew heşt kes in. Sisê keç, pênc xort. Ken li ser rûyê wan e. Dûnana cixarê tevî dûnana êgir dibe. Mîna ku ew bi roj pê de nemeşiyabin, mîna ku ew ne li ser riya şer, pevçûn û mîrînê ne, welê kêfxweş û zînde, ew dipeyivin, henekan dîkin. Hemû xort in, umrê wan di navbera hijdeh û bîst û pêncan de ye. Xort; xurt. Belê xort; xwîngerm, çavbêtirs, bixwebawer û jîr. Jîr? Ka Jîr? Tu li kû yî Jîr? Tu jî ketî nav newalên van çîyan, hilkişiyayî gupikên bi mij û dûman ên van çîyan? Te jî xwe sist kir, tu jî ketî?

Bi dengê stranekê Kevok li xwe werdiqile. Şervanekî zirav û dirêj ê simbêlpalik ku li aliyê din ê êgir, li hember Kevokê rûniştîye, dest bi straneke zîz kiriye. Dengê wî nerm, awaza wî giran e. Bêyî ku ew dengê xwe bilind bike, hêdîka, dibêje û bi gotinên gelekî zelal û sade, çêla çiya, welat, tebiyet û axê dike. Tu hey ax, hey zinar, hey çiya, ew dibêje, ji bîr meke, kesên ku ji bo te, di şer de, hatin kuştin, bi guleyên xedar ketin erdê ji bîr meke, hejmara wan bêhejmar, yek bi yek di hişê me de, navê wan li ser

dilê me, ji bîr meke, bi bir bîne, bi navê wan bang li wan bike, bi evîna xwe wan bihebîne, xwîna wan hê germ, nefesa wan bi bayê zozanan li hawidor, tu hey ro, hey stêr, hey heyv, tu şahid î, ew stêrên vê axê, heyva vî zinarî, tava vî çiyayî, siûda vî welatî, hey, ji bîr meke...

Xwezî Kevok ê niha bikaribûya gotinên vî şervanî binivîsanda. Ev stran, ev gotin yên şervan in? Yan hinên din jê re gotine? Yan gotinên straneke kevnare ne? Awaz û şêweyê gotinê kevn e, lê ne gotin. Şervan hinekî bîhna xwe vedide, çendekê bêdeng dimîne, paşê dîsan dest pê dike:

Hey tu, hey em, em birîndar, em pêşeng, em qurban, xwîn diherike, ji tarîxa me, ji me, em ketî, em rabûyî, em hişyar, em efsane, em pesn û pesndar, em dil û dildar, na, na, em ji bîr nakin, ne xwîna rijiyayî, ne tava germ, ne tîrêj û çiriskên ronî, em in em serhildêr, em dostên te, dostên qedîm, tu hey ax, hey zinar, hey çiya...

Strana şervan mîna lorînekê bi guhê Kevokê tê. Kevok giran dibe, xewa wê tê. Li milê din ew dixwaze li şervan guhdarî bike, gotinên wî baş seh bike. Lê xew zora wê dibe. Gava serê wê dikeve ber wê, şervanê kêlekê wê hişyar dike, "rabe, sibehê rojeke hîn diwartir li benda me ye, here raze", dibêje û wê dişîne nav şikeftê. Kevok, xew li ser çavan, dere cihê xwe yê berê, tevî cil û berg, rext, pêşgîrên li lingên wê girêdayî, dirêj dibe, bataniyê davê ser xwe û radizê.

"Kevok, xwehê, Kevok..." Kevok bi dengê Rênas hişyar dibe. "Xwehê, Kevok, hişyar be, berbang li me hiltê, rabe, em ê bi rê kevin." Gava Kevok rûyê biken ê Rênas dibîne, rûyê wê jî dike, "spas, Rênas" dibêje. Rênas dikene û ber bi aliyê hundir ê şikeftê dere. Kevok, hêdîka, xwe dilivîne û hinekî radibe. Bedena wê, her derê laşê wê diêşe. Lingên wê? Ew lingên xwe dilivîne. Belê, ling dilivin. Ew lingên xwe ber bi jor, ber bi jêr dike. Kêfa wê tê. Tevî ku ling jan dikin, ew bi lingan dikare. Kevok radibe ser piyan, xwe dide hev, goreyên xwe yên zuwabûyî pê

dike, bi zehmetî potînan dixê lingên xwe yên werimî, doxîna şa-pikên xwe zexm dike, kembera xwe ya dirêj girêdide, şarê xwe davê serê xwe, tivinga kêlekê jî werdigire û derdikeve derve. Lê ji nişka ve, mîna ku derziyek ketibe çavan, welê çavên wê jan dikin; şewqa hawîrdor çavên wê digirin. Ew çendekê, li ber devê şikeftê, çavgirtî, dest û pêçiyên wê li ser çavan, radiweste, paşê, hêdî hêdî, çavê xwe vedike. Tevî ku berbang hê li wan hilnehatiye, tav û tîrêjên tavê hê nexuyayî ne, dinya spî dike. Dinya dîsan di nav şewqa spî de ye. Bayekî hûnik rûyê Kevokê mîna kêrê dibire. Dinya îro sartir e, ba zêdetir e. Heye ku ji ber bilindahiyê be. Heye ku gava ew ber bi jêr dakevin, dinya hinekî germtir be. Kevok diricife.

"Qayideke din", dengê li kêleka Kevokê dibêje. Belê, kumandar e. Ew, bi ken, li Kevokê dinihêre, "rojbaş" dibêje, "belê, qayideyeke din, binçavên xwe, enî û doralîyên çavê xwe tenî bike. Ev şewqa berfê pir xeter e, dikare çavan kor bike. Do dest-pêk bû, lê îro xeter e. Teniya êzingên şewitî tedbîrek e." Kevok ji kumandar re jî dibêje "spas. Spas ji bo alîkariya te..."

"Alîkariya çi? Dev jê berde, em ê hîn gelek caran arî hevdu bikin, pişt bidin hevdu. Ev jî qayideyeke jiyana şervaniyê ye. Tu îro çawan î, lingê te çawan in? Lê ez bêjim te, tu qehreman î. Tu mîna pilingan hilkişayî çîyan, tu bijî... niha xwe bide hev, haziriyê bike, piştî bîskeke em ê bi rê kevin."

Lê ew bi qasî saeteke din jî li ber şikeftan dimînin. Şervan derin paş gir û kevîran û pêdiviyên xwe bi cih tînin, tên li dora agirê dadayî rûdinin, çayeke germ û taseke ava bi şekir vedixwin, nanê hişk û dimsê konserwekirî dixwin, di ser de, heft konserwe dims jî kevçî dikin, cixare dikêşînin, çekên xwe kontrol dikin û paşê radibin ser piyan. Gava ew radibin, Rênas, tasek di destan de, tê ba Kevokê, "vê vexwe" dibêje, "serûm e, ev ê te xurt bike, ji vî bayê xuyaye, îro dinya dê gelekî xedar be, zimanê bê îro ne dostane ye." Kevok serûmê vedixwe û paşê dere dikeve rêza xwe.

Kumandar û du kesên pê re, dîsan, li pêş wan, li wan dinihêrin. "Li vir riya me vediqete", kumandar dibêje, "em dibin du bir, donzdeh bi donzdeh. Ev yanzdeh kesên ku ez ê niha navê wan bibêjim, divê ji rêzê derkevin û werin li aliyê çepê bikevin rêzê." Kumandar, bi dengê berz, navan dibêje. Navê Kevokê û Rênas jî tê de ye. Bi leza birûskê, ew yanzdeh kes jî rêzê derdikevin, qorekî nû tînin pê û li hêviya dengê kumandar disekinin. "Ez ê jî bi vê koma nû re bim, ev herdu bira dê bi koma berê re... Xwe bişidînin, serwest û xurt bin, ji vizîna dengê bayê xuyaye, îro dijwar e, pir dijwar. Lê em bêgav in, em divê bi riya xwe de herin. De ji hev xatir bixwazin, em bi rê dikevin. Biserketin..."

Biserketin...

Ew bîst û çar şervanên ku heta vê derê bi hev re hatine, niha, ji hev vediqetin, hevdu hembêz dikin, ji hev xatir dixwazin û "biserketin" dibêjin.

Û ew bi rê dikevin. Û Kevok bi rê dikeve.

Lê belê, hê di gava yekemîn de ba hêza meşa Kevokê dibire. Tav hê hilnehatiye. Heye ku piştî bîskeke dinya nermtir be? Heye ku bi hilhatina tav û tîrêjan, ba raweste, dinya germ bibe? Lê eger tav hilneyê, dinya weha girtî bimîne? Kevok herdu aliyên şarê serê xwe jî qirika xwe derbas dike, şar heta devê xwe ber bi jor dikişîne û dimeşe. Rênas, mîna do, li pêş wê ye. Lê li paş wê niha keçikeke nû ya dirêj û hinekî qelew heye. Piştî êşa bîskeke, dîsan bêhna Kevokê diçike. "Na", Kevok dibêje, "na, ez ketime bextê te, na, min rezîl meke." Çima ew ber bi jêr nabin? Eger ew ber bi jêr bin, heye ku ba bisekine? Ew di paleke çiyê de, nêzîkî gupikan, sererast dimeşin.

Ba zêde dibe. Dinya venabe. Tîrêjên tavê naxuyin. Berfeke kepekê ya sert dest pê dike. Berf tozan dike. Ba berfa kepek ku dibare û berfa li ser axê tevî hev dike û jê bagerên giran tîne pê. Şîdeta ba zêdetir dibe. Ba difîkîne. Belê, ba, mîna marekî, difîkîne. Xofeke giran dikeve hundirê Kevokê. Tempoya meşê tekûz û bilez e. Rênas, bi gavên fireh, mîna ku ew di govendekê de be,

bi rîtm, dimeşe. Kevok divê mîna Rênas bimeşe, mîna wî gavên xwe bavêje. Kevokê, bi mehan, li van deran, di wê newala bêbinî de temrîn kiribû, çûbû û hatibû, di bin berfê de mabû, di nav berfê de jêrr bûbû, birçî mabû, tî mabû, lêvên wê, tenê bedena wê qelişibûn. Ma ew temrîn, ew cefa, ew hînbûn ne ji bo roja îro bûn? Ma ew ê, niha, îro, neyên alîkariya Kevokê? "Kevok xîret", Kevok, bideng, dibêje, "xîret, xwe sil meke, tu însan î, însan bi her tiştî dikare, zora her celeb zehmetiyê dibe. Xîret, tu dê zora berfê, pûkê, ba û seqemê bibî, xîret, tu dê bi ser kevî..." Lê gotina wê ya dawîn di devê wê de dimîne. Ew dikeve erdê, nav berfê. Rênas lê vedigere, lê ew "na", dibêje, "ez ê rabim tu bimeşe..." Ez ê rabim, ez ê bimeşim, ez ê zora tebiyetê bibim, bibim... Kevok gavek davêje "bibim" dibêje, gaveke din, dîsan "bibim..."

Ew derin, li ser rûyê çiyayê bêdawîn, ber bi çiyayên nû, dimeşin. Ba xurttir dibe, li der û dorên şervanan, mîna pilingekî serê van çiyayên çîv dide, mîna marekî dişive, mîna derbeyeke xedar, li bin guhê teht û kendalan dikeve, dengê ecêb, tişî saw û xof, derdixe, ber bi her alî diferqize. Ba dibe bahoze, bager. Ba berfa erdê radike, tevî berfa ku dibare, jê gulokên sert û stûr ên bahozê tîne pê û li ser rû, çav û eniya şervanan diteqe. Ba mîna gûzanekê rûyê şervanan, rûyê Kevokê dibire. Berfa xedar dev, poz difnên Kêvokê tişî dike, nahêle ew nefes bigire. Ba nahêle Kevok çavê xwe veke. Ew ê çawan bimeşe? Ew ê çawan bimeşin? Kevok, dîsan, dikeve nava berfê, lê, bi carekê, radibe. "Ber bi paşkî" Rênas diqîre, "ber bi paşkî bimeşin, ba ji pêş tê, xwe bizîvirînin û welê bimeşin"

Rênas şaş e. Rênas, Kevok û yên din xwe dizîvirînin û welê paşkî dimeşin. Lê ev celeb meş jî bêfeyde ye. Ba û bager ji her alî radibe, ji her alî êrîşa ba, berf û pûkê tê. Kevok diqefile, cil û berg, şar, rû, serçavê wê tişî berf e. "Rênas" Kevok, bi qîrîn dibêje, "Rênas, ma em nikarin hinekî bisekinin?.." Rênas baş ténagihê ka Kevok çî dibêje, ew tê ba Kevokê. "Em bisekinin", Kevok, li ber wî, bi qîrîn, dibêje, "em bisekinin, heta ba disekine, heye ku ba bisekine?"

"Na", Rênas dibêje, "na, na... ku em sekinîn, em ê hemû biqerisin, li van deran tu starî nîn in, divê em heta êvarê bimeşin... bimeşe, heta ku ji te tê bimeşe, rawest nîn e, bimeşe..." Piştî gotinê Rênas ber bi aliye paş dere, ji kesên ku li pey Kevokê tên re jî eynî tiştî dibêje û vedigere cihê xwe.

"Na", Kevok dibêje, "na, na..." Heta êvarê? Bi çi awayî? Bi çi şeklî? Çawan?

Taxim dimeşe, Kevok dimeşe. Bi ketin, rabûn, hilkişîn, bêhnvedana kêliyekê, piştî, pêşkî, ew, hêdî hêdî, derin. Saetekê, du saet, heye ku sê saet, çar saet... Lê bager zêdetir dibe, her tiştî dide ber xwe û tevlîhev dike. Berf jî zêdetir dibe. Ba berfa tozan li hev digerîne û geremoleke welê tîne pê ku şervan nikarin çavê xwe vekin. Bager mîna deveyeke hêç dikeve, vizîna bagêr olan dide. Kevok, bi temamî, ji taqetê dikeve. Cil û berg, bi temamî giran dibin. Beden giran dibe, ling giran dibin, çav giran dibin. Dîsan xewa wê tê, hişê wê dere. Sar, pûk, seqem. Xwedêyo! Xwedêyo! Çiya, hawar çiya! Qeda bi te keve çiya! Xwedê bela xwe bide te çiya, ba, bager, berf! Çiya, hawar çiya, ez ketime bextê te çiya! Niha taxim ketiye ser kaşekî û bi hezar zehmetî ber bi jor hildikişe. Kevok çi bike, dikare çi bike? Gavekê, du gav. Na, nabe, Kevok disekine nefes digire û dide, dîsan gavekê du gavan davêje. Lê li derekê ew hew dikare here. Ew, li pê, radiweste, nefes digire, hinekî xwe dide hev da ku gavekê bavêje. Lê dewsa gavavêtinê, ew ditewire nav berfê. Û ew hew dikare rabe. Hemû hêz û taqeta wê hatiye birîn. Hemû bedena wê teviziye, ew êdî tu tiştî hîs nake, tu deng, tu pêjn bi guhê wê nakevin. Rênas tê ber serê wê "rabe" dibêje, "rabe, rûniştin talûke ye."

"Ez dizanim", Kevok, bi dengê gelekî zîz, dibêje, "lê ez hew dikarim, hûn herin, ez bi qedera xwe razî me, tu here..."

Şervanên ku li pey Kevokê tên, di kêleka Kevok û Rênas re, dibihurin û derin. Kevok û Rênas bi tenê dimînin. Taxim winda dibe. "Rabe" Rênas, bihêrs, dibêje, "mîna dînan mepeyive, rabe, zû rabe." Kevok hewl dide ku rabe, hêdî hêdî, bi alîkariya Rênas,

radibe ser piyan. Lê ew hê di gava yekemîn de, dîsan, dikeve. Ba, bager, berf, mîna şeqamekê, li ser rûyê wê diteqîn û ew hêla dibe. Kevok hew dikare bipeyive, bi destan "here" dibêje. Rênas xwarî ser wê dibe, destê xwe yê çepê davê bin stûyê wê, serê wê hinekî radike û bi destê rastê çend şeqamên gelekî pihêt li ser rûyê wê diteqîne. "Ez derim û tîm", Rênas dibêje, "li vir, li hêviya min be." Kevok, di pey re, li Rênas dinihêre. Mîna ku wî nû dest bi meşê kiribe, mîna ku hîç barê wî nûn be, bi gavên fireh, mîna kîvroşkên van çîyan, mîna stêrên van esmanan ku di nîvê şevê de dixuricin, Rênas dilezîne, di kaş re hildikişê û winda dibe.

"Aha weha", Kevok xwe di nav berfê de dirêj dike û bi kêfxweşî dibêje, "aha weha... bi tenê, li ser çiyayên xeyalkirî, di bin berfê de... Aha weha, heta vê derê... ez heta vê derê hatim, min heta vê derê anî... Aha weha, oxir be hogirên min, bi xatirê we hevalên min... Aha weha..." Kevok çavên xwe digire. Di bin guhê wê de vizîna bayê ye. Berf, kuliyên berfê li ser rûyê wê dihelin, na nahelin, diqerisin. Tevizîna bedena wê, dest, pî, ling, hiş û mêjiyê wê zêdetir dibe. Xeweke nerm, şêrîn bi ser wê de tê. Belê, aha weha, jîyan û mirin, mirina ku li ser axa sar a berfê, bi berfê tê, jana ku bi tevizîna tê. Erd sar, esman sar, di navbera ba û bapûka sar, xew û xewnên germ de. Di navbera jiyîn û mirinê de. Aha weha, bêrê, bêkes, bêgav, bêhêvî, ne kes û însanekî, ne teyr û tûrekî, ne gul û kulîlkekê, ne şîr û stranek, li dara dinyayê bi tenê, di nav berfa bêdawîn, kefenekî spî yê boş de, lê mesûd, lê mîna şewqa berfa do ronî, dilronî. Aha weha, xew tê, gav bi gav, pêl bi pêl, xew tê.

Lê qîrînek wê ji xewê vedigerîne; "rabe." Rênas e, tevî du şervanên din, Rênas vegeriyaye. "Na", Kevok, bi zehmetî, ecizbûyî, dibêje, "çima tu hatî, hûn vegeriyan!" Rênas û herdu hogirên wî, bi lez, Kevokê ji nav berfê radikin, her yek ji milekî Kevokê digire, Rênas jî, bi sîleyên xwe yên fireh û giran, çar-pênc şeqeman li Kevokê dide. Na, Kevok nikare li piyan bisekine. Ew wê

li ser berfê dirêj dikin, herdu şervan potînên Kevokê ku qerisîne, bi hezar zehmetî ji lingên wê derdixin û îcar lingên wê bilind dikin. Rênas, îcar, bi qûndaxa tivinga xwe ya G-3, dikeve ser lingên Kevokê. Derbeyek, du derbe, sisê, çar, pênc, şeş. Rênas lingên Kevokê, bi derbeyên tivingê, dihinciqîne. "Zû kin, bilezînin", ew dibêje, "pêşî naylonê raxin, paşê jî bataniyan li ser naylonê, bilezînin." Piştî ku şervan naylon û du batanî li ser berfê radixînin, Rênas, "Kevokê li milekî dirêj bikin, ez ê jî li milekî dirêj bim, çante û tivingên me, hinekî nan, helaw, çend destmal û hin pêşgîr jî bixin navbera me herduyan û naylon û bataniyan rapêçin" dibêje, "herdu milên bataniyan jî baş bigirin."

Kevok û Rênas dikevin nav bataniyan, serê wan, der û dorên wan tînin girtin. Dengê lingên şervanan bi dûr dikeve û winda dibe. Ew herdu, niha, li kêleka hev, li ser berfê, di nav bataniyan de, dirêj bûne. Dinya hew spî ye, hew berf û bapûk rûyê wan dibire, kuliyên berfê li ser rûyê wan diqerisin. Lê vizîna û fîtika bagerê di bin guhê wan de ye. "Kevok bipeyive, tiştêkî bibêje", Rênas dibêje. Nefes û hilma Rênas germahiyekê direşîne ser rûyê Kevokê. Kevok çavên xwe vedike, ew çavên Rênas, simbelên wî yên qeşagirtî dibîne. "Tu dê biçûyayî", Kevok dibêje.

"Dev jê berde, Xwehê, bipeyive, behsa xwe bike..."

Kevok çavên xwe digire û "bira" dibêje.

"Xwehê, bipeyive, behsa xwe bike, xwehê..."

"Ez", Kevok dibêje, "ez, ez Kevok, kevoka bajarê mezin, kevoka gundê me, moi, şagirta zimanê fransîzî. Ez, ezekê, du ez, sê ez... un, deux, trois... ez, hêvîdar, bendewar, ez ehmaq, ker..." Kevok nikare bidomîne, "Rênas, xewa min tê" dibêje.

Xew tê, na, ne xew, pêşî xewn tê, xeyal tê. Gundekî bi dar û ber. Daristan, av, co, gol, çem. Dengê çivîk û teyran. Xaniyên bi kevirên reş lêbûyî. Dinya ronî, germ, qije qija tavê. Bêhna gul û çiçekan ku ji hawîrdor difûre. Li jêrî xaniyan, li kêleka bexçê rengîn kaniyeke avê û li berê jî hewizekî lêkirî. Darên bî û spîndaran ku ber bi esmên dibin. Kanî û hewizî hênîk a bin siya

daran. Kevok û çend zarokên din li kêleka hewizê ne. Kevok lingên xwe dixe nav hewizê. Germahiya ten û bedena wê hinekî dişikê. Diya Kevokê ku tevî hin jin û pîrejînen din, di bin dareke gelekî bilind de rûniştiye, bi çavên gelekî germ, nerm, li Kevokê dinihêre. Kevok dikene. Diya wê dikene. Kevok tê ba diya xwe, "Dadê" dibêje. "Dadê qurbana te, kevoka min" diya wê dibêje û Kevokê dixe hembêza xwe. Kevok serê xwe datîne ser sînga diya xwe, pêçiya xwe ya mezin dixe devê xwe, pêçî dimije û hêdî hêdî dikeve xewê.

Kevok, hêdî hêdî, dikeve xewê.

10. Xwîn

Di Welatê Çiyan de du çem hene. Du çemên fireh, kûr û dirêj. Du çemên navdar ên hemû herêmê. Du çemên kevna ku di ders û tarîxên însaniyetê de jî qala wan dibe. Navê yekî Çemê Rojhilatê ye, navê yê din Çemê Rojava. Belê, yek di zikê rojhilatê welêt de dizê û ber bi aliyê jêr ê welêt dibe. Yê din jî ji rojavayê welêt dizê û ber bi jêr dibe. Herdu jî, bi çiv, bi fetl û fetloke, di zikê welêt de digerin, di nav çiya û geliyan re diherikin, dar, dahl û daristan li pey xwe dihêlin û li aliyê jêr ê welêt digihîjin hevdu. Qedera herdu çeman li jêrê welêt dibe yek. Herdu çemên boş li jêrê welêt, di beriyê bêsêrê de dibin, aveke bêpayan mîna deryan.

Çemên Rojhilat û Rojava. Û qedera wan.

Baz û Kevok. Û qedera wan.

Di vê rûpela nû ya romana me de, eger em wê hevdişîna çolê nehesibînin, Baz û Kevok, cara yekemîn, mîna çemên Rojhilat û Rojava, pêrgî hevdu tên. Kevok ji milekî, Baz ji milekî. Lê li çeperên gundekî aliyê jêr ê Welatê Çiyan, ew rûberê hev dibin.

Weha;

Em ê niha, di vî rûpela nû yê qedera Baz û Kevokê de, herin berbangeke biharê ya Welatê Çiyan û xwe bigihînin Kevokê, xwe bigihînin meşa dirêj a Kevok û hevalên wê. Belê, em ê ji Kevokê dest pê bikin. Pêşî em ê herin nik Kevokê.

Destpêka berbangeke bihnfûrî ya biharê ye. Tîrêjên danê sibê hê lênedane. Stêr hê, bi temamî, wînda nebûne. Ronahiyê hê bi misogerî zora tariyê nebiriye. Lê rojeke nû dest pê dike. Û di

vê destpêka roja nû de şervanên serhildêr ên Welatê Çiyan hê dimeşin. Ji êvarê û vir ve ye ku ew dimeşin. Dinya, hawîrdor, esman, zelal û aram e. Stêrên dawîn ên şeva bihurî hê jî, bi renekî helesor, diçirisin. Darên peregende yê dahla ku şervan tê de dimeşin, bi rengên têkêl, dibiriqin. Giya û nefelên ku bi xunavê şil in, bi qasî du bostan, serî hildane û li lingên şervanan digerin.

Şervan, Kevok û hevalên wê, bi qasî bîst kesan e. Ew bi meşeke bi ûsil, ne giran, ne jî bilez, derin. Rûyê wan, çek û pûsadên wan, bi renekî qemerî û belek, dibiriqe. Destê wan, tilî û ney-nûkên wan dibiriqin. Şeşên wan keç in, yê mayî mêr. Şervan; bi qasî bîst kesên ku cil û bergên mîna hev li xwe kirine, mîna hev dimeşin, mîna hev nefesê digirin û didin, mîna hev li der û dorên xwe dinihêrin, mîna hev dikenin û mîna hev dipeyivin. Serhildêr; bi qasî bîst kesên ku qedera wan bûye mîna hev. Hema çi bigire li piştê hemûyan çanteyekî piştê heye. Şal û şapikên mîna hev ên rîsîn li wan in. Serhildêrên keç şarên rengîn ên gundiyên navçê li serê xwe girêdane. Şervanên mêr jî celebeke kolosên devetûkî dane serê xwe. Navtenga hemûyan bi pişteke fireh û rengîn hatiye rapêçandin û di ser piştan re jî rext hatine girêdan. Rext ne bi tenê li ser piştan, herweha li ser sîngan jî, bi çeprastî, hatine girêdan. Rextên çermîn, bi xwelivandina wan, dibiriqin. Gorên rîs ên rengîn ku heta çogan tên, li lingên wan in. Û ling di nav pêlavên ku ji çerm û kawicikên sivik çêbûne de, bi hêsanî, mîna ku ew bireqisin, xwe dilivînin. Di dest yan jî piştê hemûyan de çek hene; tiving, keleşkov, çekên roketan, mîtralyoz. Û di piştê piraniyên wan de jî demançeyên giran û dirêj. Û di ber kember û palaskayên wan ên çermîn de jî narincok. Narincokên mirinê ku bi rîtma meşê dilivin.

Ew, bi hêsanî, di nav dar, ber, devî û giyan de, rê li ber xwe rast dikin û derin. Tevî ku barê wan giran e, lingên wan çapik, hoste û sivik in. Mîna ku wan govend girtibe, welê bi dûzen, bi rîtmeke lihevhatî, bi tempoyeke sivik ew derin. Diyar e; ew rênas in. Diyar e; ew bi hewalê vê celeb meşê dizanin. Diyar

e; ew bi zimanê van deveran, bi zimanê van dar û dahl, çiya û geliyan dizanin.

Bi qasî bist şervanên serhildêr. Yek ji wan Kevok e. Yekî din jî Rênas. Herdu li qorê pêşîn, li kêleka hev, Rênas hinekî li pêş, dimeşin. Di meşa berbanga vê sibeya geş a biharê de Kevok, bi minet, bi dilxweşî, li Rênas û meşa wî dinihêre. Rênas mîna firîşte-tekî bi heybet, bi giranî pê li erdê dike û dimeşe. Mîna zinarekî, mîna çiyayekî rast, maxrûr û bilind, tevî meşa dirêj, tevî çek û barên giran, Rênas qam dide û dirêjî riyên nenas dibe. Mîna çemekî biharê ku bûye lehî, ew, bisemt, bihemd, diherike. Eniya wî ya fireh, çavên wî yên reş, rûye wî yê qemerî, simbêlen wî yên bor, carina, bi avêtina gavan, diçirûse. Firîşte, firîşte-tekî ku qulipiye ser şekil û sûretê însanan. Firîşte-tekî bêdeng û di rabûn û rûniştina xwe de nefsbîçûk. Firîşte-tekî ku çendîn caran Kevokê ji mirin û windabûnê, asteng û zehmetiyê, şerm û şermezariyê xelas kiriye. Firîşte-tekî ku ji dewr û dewranên bihurî hatiye û hemû serpêhatî û tecrubeyên bav û kalan, bi gotinên xwe yên kêr û kirinên xwe yên bêhejmar û bêpayan, berpêşî Kevokê û hevalên wan ên din dike. Rûyê Kevokê ê geş li ser Rênas û meşa wî ye. "Bira" Kevok, bi ken dibêje, "tu birayê min ê man û nemanê yî, Rênas..."

"Tu jî xweha min" Rênas, bi ken, bi awirekî henekan, lê vedigerîne.

"Rênas, ez henekan nakim, gotina min ji dil e, eger tu nebûyayî, tu carî min ê nikaribûya xwe bi biharê bigîhanda... soz, rojekê, gava me keys dît, ez ê, ji bo te, xwarineke bêpayan çêkim. Ez ê, ji bo te, şîra herî bedew a hemû cîhanê binivîsim... eger rojek ji rojan tu bizewicî, ez ê serkêşa govenda daweta te bim..."

Rênas dikene, li dewsa ku ew tişte-tekî bibêje, bi tenê dikene.

"Te ez jî dijminê herî mezin ê cîhanê, ji sar û sermê, berf û seqemê xelas kirim. Te ez jî dijminê herî hov, herî dijwar, ji tebiyeta hov ku bûbû cinawirekî û ketibû pey min, xelas kir."

"Dev jê berde, tu yê jî rojekê alîkariya min bikî, min xelas bikî... dev jê berde û li peşiya xwe binihêre, dîqet bike, tu li derê neqelibî..."

"Te ez xelas kirim, jiyana min ji mirinê rizgar kir, te jiyana min li min vegerand. Te jiyaneke nû da min..."

"Kevok, dev jê berde, ev çendîn car e ku tu dibêjî. Bes e, bibire."

"Te ez ji dijaminê herî dijwar xelas kirim..."

"Bibire... Dijminê herî dijwar ne tebiyet e, însan e, ji bîr meke, însan dijaminê herî dijwar ê însan e..."

Kevok dibire, hew dipeyive. Rênas hinekî dilezîne û ji Kevokê bi dûr dikeve. Kevok di pey re li bejn û bala wî dinihêre. Vî hevalî ez xelas kirim, Kevok difikire. Eger ji wî nebûya di wê berf û sermayê de dest û lingên min ê biqefiliyana, ew ê bişewitiyana, ez ê biqerisiyama. Heye ku ez ji mîna gelek hevalên din, niha, ji dest û mîl yan jî ji pî û ling seqet bimama. Ez ê di bin berfendeyan de bimama, bandevên zivistanê dê bibûna kefenê min, ez ê di zixûr û nişîvan re gêrî gelî û newalan bûma. Wî ez xelas kirim. Wî gelekên din ên mîna min xêşim xelas kirin. Lê mîna ku wî hûç tiştê nekiribe, weha sade, weha nefsbîçûk dijî, weha hertim dere hawara ketiyan, bêçareyan. Xwedayo, tu wî nexînî, tu wî bêçare nehêlî, bêgav nekî. Ez? Ez ê çawan ji bin çêyiya wî derkevim? Di vê jiyana şervaniyê de ku hertim bi mirin, şer, bêgavî û bêçaretiyê rapêçayî ye, ez ê çi fersendê, çi îmkanê bibînim ku bikaribim ji bin çêyiya wî derkevim?

Ew roja bêtar a ba, berf, bager û bandevê tê bîra Kevokê. Kevok ji xwe ve çûbû, ketibû xewê, xewa mirinê. Mirinê zora wê biribû. Lê piştî demeke gelekî dirêj –heye ku piştî wextekî dirêj ê çend rojan– gava Kevokê çavê xwe vekiribû, di nav tariyekê de, cotek çavên ku mîna lûlûyan dibiriqîn, ditîbû. Belê, çavên Rênas dibiriqîn. Belê, Rênas li kêleka wê bû, wî ew, di bin berf û bandevê de bi tenê nehiştibû.

"Xwedêyo, umrekî dirêj bide wî," Kevok, hêdîka dibêje.

Li pey Rênas, li ser riya ku Rênas vekiriye, Kevok, bi gavên sivik dimeşe. Gavên wê biûsil, bisemt in. Nefesa wê dirêj, meşa wê rehet e. Heyret, Kevok difikire, heyret, min ê ev roj jî bidîtina! Ez ê bikaribûna weha bi saetan di nav zinar, çiya, dar, dahl û geliyan

de bimeşiyama! Heyret, ez newestiyame, birçî nebûme, tî nebûme, hişê min nare, jî êş û jan, şerm û kerban nagirîm. Heyret bedena min natewire, dil û mejiyê min natevize. Heyret, ez keça malbateke dewlemend, delaliya bavekî awukat, diyeke keça eşîran, ez keça bajarên mezin, dibistan û xwendegên bilind, şagirta xwendin û edebiyata fransîzî, niha, di nav vê hawîrdora hov û sawtîjî de bi hêsanî derim; ev dest û tiliyên min ên nermik ku bi tenê radihiştin defter, kitab û pênuşan, niha, bi hişkahi, xwe spartine çek û silahan. Lêvên min ên terikî, porê min ê kurt ê gemarî, lingên min ên werimî, bedena min a neşûştî... Bira jî kengî ve ye ku min xwe neşûştiye? Ev bêhna gemarê, hilma giran a west, xwîdan, şikeft û zinaran... Heyret ez jî, hêdî hêdî, dibim mîna vî qehremanê gundî yê li pêş min, ez jî mîna wî êdî bi deng û pêjnên vê tebiyeta tenê û hov dihesim, pê re dibim yek, dibim perçeyek jê. Û ev daristana ku niha bi bayê xwe yê sivik rûyê min mist dide, ku min hembêz dike, bi ba, deng û pêjnên xwe dikeve ruhê min, dikeve nav xwîna min, ku bedena min, dil û ruhê min dike perçeyek ji jiyana xwe... Heyret min ê bikaribûya ev jî hîs bikira... Heyret, ez êdî dikarim li strana bayê şevgura sibê guhdarî bikim, dengên ku ji kûrahiyên dil û ruhê van çiya, newal û geliyan tê bibihîsim... Oui, c'est moi q'est ici...

Şervan dimeşin. Dinya ronî dibe. Tîrêjên tava rojhelat, hêdîka, xwe bi dar û devîyan, pel û çiqilên wan digihûnin. Dar kêmbibin, ronahiya li pêş şervanan bêhtir û xurtir dibe. Û piştî keliyekê, jî nişka ve, dahl xelas dibe. Kevok heyirî dimîne. Dahla boş ku bêdawîn dixuya, niha, bi carekê, xelas dibe. Mîna ku yekî sêrek li dar xistibe. Tebiyet... tebiyeta fetl, fêz û xapînok... Û bergeheke nedîtî ya bihuştan li ber wan tê raxistin. Kevok û hevalên wê, niha, gihîştine qûntarên rêzeke çiyayên bilind. Bi qasî sed mîtroyan ji wan bi dûr, çemê mezin ê Rojhilatê, mîna devekê ku bi hêç ketiye, bûye lehiyeke bêpayan û diherike. Li pey çem, rûbarê wî aliyê çem jî taximekî nû ya çiyar, ber bi esmanan, bilind dibin. Hawîrdor, dar û deviyên doralî, di nav

hêşinahîyeke çîkî tarî de, mîna bûkeke nazenîn, bi hênikahiya bayê sibê, hêdîka, dilivin. Her der hêşîn e, çiya, pişt û qûntarên çîyan di nav hêşinahîyeke boş de ne. Li serê çîyan hê jî berf heye. Rengekî gewher ê serê çîyan, bi lêdana tîrêjên tavê, bilindahîyan vedigire. Rengên esmana şîn, darên hêşîn û berfa spî dikevin nava hev û mîna yaqût û lûlû diçirisin.

Xwedayo, Kevok, hêdîka dibêje û li dora xwe dinihêre, ev bedewî, ev xweşî, ev sikûnet û aramî... Ev tebiyet, ev ecêbî. Hem bedewî, hem saw û tirs... Ev tebiyeta hanê ku mîna cinawirekî her tiştî dadîqultîne, lê di eynî wextê de mîna dayikeke diloan hembêza xwe vedike û her tiştî di hembêza xwe de dihevine, dihebîne. Min ê bihara van çîyan jî bidîta, biharê jî ez ê li van deran bûma! Ka ew tûla spî ya berfê li kû ye? Ev cil û bergên kesk û şîn ku niha tebiyetê li xwe kirine. Ev rengên jiyanê, rengên roja nû, wext û demên nû. Rengên vejînê. Ev çem û avên ku hemû astengên didin ber xwe û diherikin, ev gul û kulîlkên ku tevî hemû zehmetîyan, niha, dibişkivin û xwe bi rengên têkel dixemilînin. Ev giya û nebatên ku zikê axa reş diqelişînin û mîna ku bixwazin xwe bi esmanan bigihînin, serî hildidin. Û ev teyr û tilûr, dengê wan, xwendina wan, strana wan a aza û serbest, firîn û cambaziyên wan ên esmanan. Tebiyet û welatê aza, erd û axa aza, çiya, çem û geliyên aza.

Çend gotinên destana Gilgamiş dikevin bîra Kevokê; tu dê geliyekî û tê de çemekî mezin bibînî. Di navbenda gelî de jî wê dareke çîkî kesk ku pel û çiqilên wê ji dara çamê ya herî hêşîn jî hêşîntir hebe. Di binê darê jî kaniyeke boş heye... Çima niha Gilgamiş tê bîra Kevokê? Gilgamiş û ev der, Kevok difikire. Heye ku warê Gilgamiş ev der be, heye ku wî di destana xwe de çêla vê derê dikir?..

Çem, bi gure gur, diherike. Co û goncalên biçûk ku ji hêlîna berfê tîna pê, di zikên çîyan re ber bi jêr dibin û xwe digihînin çemê boş. Çem herdu aliyên çîyan di navberê de dibire û gêdûkeke kûr û fireh tîna pê. Bergeha ku niha li ber şervanan

raxistî ye, wan mat dihêle. Şervan, mîna Kevokê, li kêleka dahlê radiwestin û li der û dor, li bergeha xewnan dinihêrin. Bi qasî bîstekê ew welê rawestayî, bêyî ku bi hev re bipeyivin yan jî tiştekî din bikin, guhê wan li ser dengên têkel, li hawîrdor dimeyzînin. Kevok, bi gavên sivik, çavên wê li ser der û dorê, hêdîka, dere cem Rênas ku jê bi qasî çend gavan dûr bû. "Rênas", Kevok, bêyî ku lê binihêre, dibêje, "ez dixwazim bigirîm."

"Çima?" Rênas, hinekî heyirî, dibêje, "îcar çima?"

"Îcar jî ji bo vê xweşiyê, vê bedewiyê..."

"Na, niha megirî, hûn bi qasî kêliyekê riya me heye. Em li pey nemînin..."

Piştî bîska rawestîne şervan, dîsan, paralelî çem, di kêleka dahlê re, bi rê dikevin. "Naxwe tu van deran dinasî?" Kevok ji Rênasê ku li kêleka wê dimeşe, dipirse.

"Belê" Rênas dibêje, "ev bihara çaran e ku ez tîmê ve derê. Hatina vê derê nîşana şer e. Îro, ji îro û pê ve şerê xedar dest pê dike, şerê man û nemanê..."

"Îro?"

"Belê îro, yanî gava ku em gihîştin vê newalê. Piştî vê newalê, li pey çiyên êdî gund in. Gundî ne, leşker in, şer e... di van rojan de, ji her aliyên tixûbên welêt bi qasî du sed, sê sed komên weha yên şervanan dirêjî nava welêt dibin. Tu yê, ji îro pê ve, li her derî, dengê tanq, top, mîtralyoz, tiving û helikopteran bibihîzî. Şervanî îro dest pê dike... mirin, kuştin, rev û êrîş îro dest pê dike, xîret û xurtî, hunermendî û zîrekî îro dest pê dike...."

Kevok dengê xwe nake. Sawek dikeve hundirê wê. Ew diricîfe. Lê na, ev hîs, ne hîsa sawê ye. Heyecan e, belê heyecanek wê digire. Ev dengên hanê yên tebiyeta bihuştin û li pey van çiyên dengên şer, pevçûn, mirin û kuştinê. Ev bêhnên bijarte yên tebiyetê ku ji hawîrdor difûre û ji îro pê ve bêhnê çek û barûdê, xwîn û xwîdanê ku dê dora wan rapêçe. Hîseke xerîb bêhnê wê diçikîne. Tirs e, belê, ev hîsa tirsê ye. "Ez westiyam", Kevok, serê wê li ber wê, dibêje.

"Riya me zêde nema. Ev e, em gihîştin qonaxa xwe" Rênas, bi lez dibêje û di ser kortalekê re qevaz dide, "li cihê hanê, di binê wan qûntarên çîyan de çend ziving hene. Em ê li wir rawestin..."

Kevok zîz dibe. Ew baş nizane ka çima, lê melûlî û kela giriye tê û bêhna wê diçikîne. Ew ê bigirî. Ew ê rûne, li pey bimîne. Ew ê dîsan şermezar bibe. Na, na, na... Dengê Rênas digihe hawara wê. "Lê meraq meke û metirse", Rênas jê re, dibêje. Kevok bala xwe dide ser gotinên Rênas da ku ew xwe ji pêlên hûsên zîr rizgar bike. "Xwe sil meke..." Rênas didomîne, "xwe rabigire, hal û hewalê şer tiştekî din e. Çaxa mirov dikeve nav qada şer, gava agirê şer dor li mirovan digire, mirov jî dibe tiştekî din. Mirov xurt dibe, dilê mirovan qehûmtir, mêjî jîrtir dibe. Şervan di şer de dibe şervan. gulokên agirê şer dil, mêjî û bedena mirovan terbiye dike. Lê bi şertekî, gerek e ku mirov her daîm serwext be, çavvekirî û hişyar be... ji bîr meke, serwextî û hişyarî..."

Bi qasî çendeke din ew, ber bi jêr, dimeşin. Kevok hew dipeyive. Çavên wê geh li ser lingên Rênas, geh li der û dor, ew dere. Ji nişka ve, ew li kêleka çem, li ber lingên qûntarên çîyan, disekinîn. Hingî, gava ew xwe ber bi qûntaran dizivirînin, ew devê çend zivingên ku di zikê qûntarên çîyan de ne, dibînin. Zinar û lat ber bi çem xwar dibin û devê zivingan vedişêrin. Heta meriv neyê ber devê zivingan, ne mumkin e ku meriv bikaribe wan bibîne. Niha ew hatine, gihîştine cihê xwe, qonaxa nû ya li ser riya xwe. Gava hemû kom digihe ber devê zivingan, serekê komê, yekî kin, qut, qelew, simbêldirêj, rûqemerî ku em ê jê re bibêjin Kumandar Çiya, bi dengê berz, "em ê li vir rawestin" dibêje, "çek, pûsad û çanteyên xwe deynin, bi qasî çend saetan em ê li vir bin, bêhna xwe vedin. Hûn niha serbest in, bi dûzan li zivingan belav bin..."

Gelek kesên komê, tevî Rênas, Kumandar Çiya dinasin. Lê ne Kevok. Cara yekemîn e ku Kevok wî dibîne. Pêr êvarê, gava Çiya û çend kes pê re hatin geliyê ku Kevok û hevalên wê lê bûn, hingî Kevokê ew dît. Kesên ku bi Çiya re hatibûn, birya-

ra serekiya Hêzên Çekdar a Tevgerê ku Çiya mîna kumandarê leşkerî yê komê tayîn dikir û riya çûyinê dida ber komê, gotin, şîva êvarê xwarin, çaya xwe jî vexwarin û çûn. Çiya ma. Hingî Kevokê, cara yekemîn, Çiya nasî. Çiya, xortekî sîng û milfireh, serîmezin, çavbiçûk, birû û mijangqalind, niha, ji du rojan û vir ve, kumandarê wan ê nû ye. Kevok êdî hînê vê jîyanê bûye; her roj yek dere, yekî nû tê. Her roj ew li dereke ne, bi şev dimeşin, bi roj radizin. Hema çi bigire navê hemûyan ji navên tebiyetê ye; Zinar, Çiya, Deşt, Asman, Roj, Stêr, Hîv, Şevdêr, Ronahî, Helesor, Keskesor, Heyveron, Şikêr, Lehî, Gulistan, Kulîlk,... Mîna navê Kevokê; Kevok... Kevok êdî hîn bûye; kes ji kesî napirse ka ew kî ye, çi ye, ji kû ye, çi kiriye, ji kû tê... Gava yek ji wan vediqete û dere, kes napirse ka ew çima û ber bi kû dere. Gava biryar û fermanên "jor" tên, kes napirse ka ew çi ne, çawan in. Kevok êdî dizane; ferman ne ji bo axaftin û nûqase ne, ew ji bo kirin û bicihanînê ne. Jiyana wan ne jîyaneke normal a xelkê ye. Jiyana wan bidizî ye, veşartî ye. Jiyana wan, a şevê ye, ya xweparastin û êrîşê ye. Pariyekî nan, çend tîke goştê qelî, narincok û guleyekî demançe yan jî yê tivingê hertim bi wan re ye. Nan, goştê qelî ji bo roj û wextên xirab ên birçîbûnê ne. Narincok û gule jî, gava dor li wan teng be û êdî tu rê û çare nemîne, ji bo întixarê ne.

Jiyana wan; mûyekî zirav li ser Pira Siratê ya man û nemanê.

Kevok keleşkova xwe ya destan, çantê xwe yê piştê datîne kêleka xwe û li ser tahtekî rûdine. Rênas û hinên din ber bi zivîngan derin. Lê Kevok nare, ji zivîngan hinekî bi dûr rûdine. Tîrêjên tavê niha gelek hîlbûne. Hênika hiya sibê niha qulipiye ser germahiyeke sivik. Di bin tîrêjên ronî yên tavê de co û çem, dar û ber, lat û zinar diçirsin. Refekî teyrên mezin ên belek ji milê pêşîn ê çîyan bilind dibe, di ser gelî re difirin û derin. Çend teyrên ku bi başoke yan baz dişibin, di aliyê jêrê newalê de, li ser çem difirin. Bêyî ku ew bidin baskan, xwe bilivînin, welê sakîn, mîna mûyekî, diherikin. Kevok, bi qasî çendekê, li wan dinuhêre. Baz di leyîstokekê de ne. Ew bi hewa dikevin, hildibin û ji nişka

ve, bi leza birûskê, xwe ber bi jêr, ber bi çem berdidin. Û gava ew digihin ber perê çem, bi qasî demekê, ew li ser çem, hêdîka, difirin û paşê dîsan baskên xwe li ewran dixin û bi hewayê dikevin. Heye ku teyr çivîkên xwe yên bifirêketî hûnî firîne dikin. Heye ku teyr jî xêrhatînî li biharê, jiyana nû dikin. Heye ku ew jî, mîna vê tebiyetê, mîna vî çemî, bi vejîna jiyane, har bûne.

Kevok rextên sînga xwe jî ji xwe dike û wan datîne nik keleşkovê. Bi lêdana tîrêjên tavê taht hinekî germ e. Ew radihêje çentê giran, devê çente vedike û jê nan û goştê qelî ku tê de ne, derdixe. Ew nanê sêlê vedike, tîkeyên goşt dixê navê û hêdî hêdî, parîbi parî, dixwe. Ew west û birçîbûna xwe niha hîs dide. Ling, çok, mil, stû, hemû bedena wê niha jan dike. Piştî ku ew nanê xwe dixwe, ew radibe ser piyan, ber bi ava coyeke ku li kêlekê diherike dere, xwe xwarî avê dike, mist bi mist, ji ava sar a mîna cemedê vedixwe. Destên wê ji sêrmê diqerisin, gewriya wê ditevize. Piştî ku ew şarê serê xwe derdixe, dest û rûyê xwe jî dişo, dest û rûyê xwe bi şarê rengîn zuha dike û ew vedigere cihe xwe û rûdine. Hevalên wê, her yek bi derekê de belav bûne. Rênas, Çiya, serekê siyasî naxuyin. Welê dixuye ku ew ketine şikeftan û radizin. Ev çi aramî ye, Xwedêyo, Kevok difikire. Ev çi hizûr e ku ji van dengê av, teyr, tilûr û pelên daran tê pê! Kevok dîsan radihêje çente û jê deftereke biçûk û pênuşeke sor derdixe. Ew hêdîka bergên sor ên defterê mist dide. Germahiyek bi ser wê de tê. Deftera Kevokê ya spî û xêzkirî; ji bo nivîsîna deng, pêjn û hîsên ku di hundirê Kevokê de pêl didin. Ne ji bo nivîsîna rapor û serbûriyên leşkerî yên jiyana şervaniyê, lê ji bo serbûriyên pêjn û hîsan. Mîna şîreke dirêj, mîna destanekê ku ji şîreke dirêj a pexşanê hatiye pê. Kevok dikene û rûpelê yekemîn ê defterê vedike. Di rûpelê yekemîn de, li aliyê jêr ê rûpelê, bi destnivîseke gelekî bedew, xwar û zirav, bi pênuşeke sor, weha hatiye nivîsîn; Ez Kevok... Kevoka çiyayên bilind... Kevoka Welatê Çiyan, welatê mirinê... mirin, mayin, kuştin... gotinên ku ez herî zêde dibihîsim... Mirin, kuştin, şewat û hilweşîn, li vir bûyer û kirinên herî hêsan

in, bi hesanî li vir tîn pê. Çima? Mirin bûye mîna nan û avê, hewa û nefesê... Çima? Însan, jiyana însen li vir erzan e, zahf erzan... Çima? Jiyana li vir ne pîvan e, pîvan mirin e... Çima?

Li herî jêrê rûpelê jî, bi tîpên mezin, di nav neynokê de, weha hatiye nivisîn; TIRS... EZ NAXWAZIM BITIRSIM... EZ NAXWAZIM BITIRSÎNIM...TIRS... HÎSA HERÎ XIRAB, HERÎ DIJWAR A ÎNSANAN...

Kevok rûpelê duyemîn vedike û rêzên vê rûpelê dixwîne. Di rûpelê nû de, bi rêzên şîrê, di bin hev de, weha hatiye nivisîn; JÎR... Tu li kû yî? JÎR, ez hatim, tu li kû yî? Ez ketime bextê te, rûyê dilovan, bibêje, tu li kû yî? Ez, dîna darê dinyayê, li vir im. Tu li kû yî, dîno, dîne darê dinyayê? Te digot tol, her û her tol. Fermo, evindarê xewnan, xewna min a dîn, fermo, tol. Fermo, ez li vir im, tu li kû yî! Ax tu, mêrxasê xewnan, rebenê xewan. Ax ez, rebena xewna xewnan, terkesera xewan.. De were lawê hêrs û kerban, xwe ji serê vî çiyayî, ji nav vê daristanê berde û were. Min, terkesera xewan, dîla xewnan hişyar bike. Deng bide min, dilê min, ruhê min vejîne. Vejîne, ronahiya stêran, tîna tavê, lebata alemê û dengê bedena min, ruhê min vejîne... Bîne bîra xwe, dîne reben, şeva dawîn bîne bîra xwe. Şeva ku di nav pêlên tol, tov û dolê de diçû û dihat. Şeva ku beden dinaliya, dil lava fikir. Bibêje dîno, hingî dengê min, olana dilê min digihîşte te, bibêje... Bibêje, ma dil li ber te negeriya, ma çav rondik nebarandin, ma dengê sûzen deng li te, li şevê, li bêdengiya hawîrdor nekir? Bibêje JÎR, dîne evînan, deng çi digot, bedenê çi digot, min çi digot? Ax tu, dîno... tu çûyî, mîna hingûra êvarê, mîna stêra ber destê sibê, tu çûyî... belê, mîna stêra esmanan tu xuriciyî û winda bûyî... JÎR, fermo, ez li vir im... Tu li kû yî, bibêje, tu li kû yî JÎR!..

Piştî ku Kevok rêzên rûpelê dixwîne, tevî kesereke kûr, çend dilop hêsir ji çavên wê gêr dibin. Kevok, hêdîka, Jîr, dibêje. Jîr were... Jîr were... Ez hatim, de were. Min guh neda dê û bavê xwe, nas û xizmên xwe, ez hatim. Ew li girî û şînan, li kesera windabûna min, lê ez hatim. Min guh da dengê dilê xwe, dengê nexuyayî yê dilê te. Ez hatim. Herkes li vir e, herkes tê û dere.

Lê tu li kû yî? Bi tenê me. Kes nîn e, hawîrdor tenha, der û dor vala. Ez hatim, ez derim. Çek, pûsad, rext, ferman, meş, tem-rîn û deftera min. Deftera min; yadîgara xewnên te. Tav hiltê, tav dere ava. Roj tèn, roj derin. Lê tu, biranûna te, xewna te her zînde. Ne jîbîrkirinek, ne windabûnek. Jîndar. Binihêre, dinya vedije. Bibîhîze, vîçe vîça teyrana e, fizîna bayê ye, xuşe xuşa avê ye. Bihar hatiye. Her tişt jîndar, mîna te, mîna roj û şevên me... Bîne bîra xwe, te digot "tol", min digot "tov." Te digot "tol", min digot "dol." Jîr, nezano, bêhayo, tola te bû tov, tov bû dol. Dol, belê tov qulipî ser dolê. Tova şopên te di hundirê min de hêşîn hatin. Tovê zîl da, bû dol. Lê dol mezin nebû, Jîro, mezin nebû. Di emeliyetxana doxtorekî dilsar û bêwîjdan de, min dol kuşt. Min dol da kuştin. Dola min û te... Belê, min eva hanê jî kir, min perçeyekî ji beden, dil, mejî û ruhê xwe jêkir –da ku ez bikaribim bêm ba te, da ku ez xwe bigihînim te, da ku em bi hev re bin. Jîr, ez hatime, Kevok hatiye... Tu li kû yî?

Kevok digirî.

Di vî danê sibê de, li ser tahtê sert, janeke kambax a hest û hesreteke mezin li ser dil, bîranînên rojên bihurî yên cîhaneke din li hiş, çavên reş bi kel, Kevok digirî. Lêvên terikî, bi kela giriyê, dilivin, rûyê ku bi tav, berf, baran û bayê qemerî ye, diheje, di ruh de dengên jîyaneke din olan didin. Û bi hemû beden, dil, can û ruhê xwe, bédeng, bi şermokî, bisemt, Kevok digirî.

Kevok rûpelên defterê digire, defterê dixê çentê xwe, radi-be ser piyan û ber bi avê dere. Ew dîsan dest û rûyê xwe dişo, kulm bi kulm avê li rû, enî, stûyê xwe dike û bi qasî çendekê welê, li ser totikan, li kêleka avê radiweste. Kevok, heyirî, li avê dinihêre. Evçend zelal, di bin kahniya ava zelal de ku bi xurtî diherike, xîç û kevir dixuyin. Li der û dorên avê kulîlkên têkel ên rengîn serî hildane. Mozeke hingivîn vedinişe ser kulîlkan. Çend pilpilîngên belek li dora Kevokê difirin. "Ez westiyame", Kevok dibêje, radi-be ser piyan, ber bi tahtê ku li serê rûniştibû vedigere, radihêje çek, çente, rext û tiştên xwe yên din û ber bi zivîngê

dere. Li ber devê zivinga pêşîn, li aliyê hundir, li kêleka du şervanên jin, ku şarên xwe avetine ser xwe, tevî cil û berg, postal û rextên piştê, mîna hevalên xwe ku peregende, welê çog di nav zik de, şarê xwe yê rîs davêje ser xwe û xwe li erda zuwa, dirêj dike. Bi yek carê, gava serê xwe datîne ser çente piştê, di xew re dere û ew jî, mîna hevalên xwe, dest bi xure xurê dike.

Gava Kevok bi dengêkî hişyar dibe û bi carekê xwe dide hev û derdikeve derveyî zivingê, êdî wext danê êvarê, piştî esran e. Ew jî, mîna şervanên din, di bin lata zinarekî de cihekî xewle dibîne, pêdiviyên xwe dike, dere ser avê, dest û rûyê xwe dişo, pişt û rextên xwe girêdide, şarê xwe davê serê xwe û vedigere ber devê zivingan. Hingî bêhneke germ bi difnên wê dikeve. "Şorbe", Kevok dibêje û dikene, "bêhna şorbê, şorba germ..." Bêhna şorbê ji der û dor difûre. Çar şervan li ber devê zivinga mezin, li dora agirekî gur, li pê sekinîne. Yek ji wan, keçeke bejndirêj, rûdirêj, difndirêj û jar ku jê re dibêjin Şîlan, bi heskekê, beroşa mezin a li ser êgir tev dide. Kevok, bi ken û kêfxweşî, dere cem wan. Bedena wê, pişt a wê diêşe, lê bêhna şorbê her tiştî pê dide jîbîrkirin. Kevok dere ber beroşê, xwe hinekî xwarî beroşê dike û şorbê bêhn dike. carekê, du caran, sê caran... Şorbe, şorba nîskan... Bêhna şorbê Kevokê vedişîne, bi dengêkî zînde, ji keça bejndirêj re, "xwehê" dibêje, "ka heskê bide min, ez jî dixwazim alîkarî bikim..."

"Jixwe ew keliyaye", Şîlan dibêje, "me xwê û îsot jî xistiyê, lê xwezî hinekî rûn jî hebûya" û heskê dide Kevokê. Agir, şorbe, bêhna şorbê, rûyên xort ên geş û kêfxweş bawer û maxrûr, dinya paqij û zelal, tebiyeta aram, rengên jiyan û cîhanê. Niha Kevok kêfxweş e, bêpayan dilxweş e.

Dengêkî berz bang li şervanan dike, "werin, şorbe hazir e..." Şervan tî. Yek bi yek, kom bi kom, bi kêf, henek, axaftin, di destên wan de taseke kûr yan jî teyfîkek, tî, ji Kevokê para xwe ya şorbê digirin û derin. Beroşa mezin û fireh a alîmunyûm heta dev tijî şorbe ye, bi kêmanî têra pêncî kesî dike. Piştî cara

yekemîn, careke din jî şervan tîn, tas û teyfikên xwe yên naylon tijî dikin û derin. Piştî hemûyan jî Kevok ji çente xwe teyfika xwe ya kûr a naylon û kevçiyê xwe derdixe, teyfikê tijî şorbe dike û li kêleka êgir rûdine û şorbe kevçî dike.

Piştî ku ew, tevî nan, şorba xwe vedixwin, derin ser avê û av vedixwin, hemû, bi dengê Çiya, tîn ber devê zivingan û mîna du qorên li pey hev, rêz dibin. Rûyê wan li pêş, qama wan rast, ti-ving û keleşkovên wan di destên wan de, ew li Çiya, kumandarê siyasî û du rêberên din ku li hember wan rawestiyane, dinihêrin. Piştî xew û xwarinê, ew, niha, dîsan, vegeriyane ser rastiya xwe; rastiya leşkerî. Cidî, guh li ser dangan, çav li ser kumandaran, bi nîzameke leşkerî, ew niha radiwestin. Kevok di qorê yekemîn, rêza dudiyar de ye, li kêleka Rênas ku li pêşiya hemûyan seki-niye. Kes napeyive, xwe nalivîne.

Bi tenê niha dengê bayê danê êvarê, teyr û çivîkan û çem tê bihûstin. Çemê boş, dirêj û fetloke. Çemê kevnare yê însaniyetê niha, bi tîrêjên qels ên danê êvarê rengîn, çiv dide xwe û mîna ku lehiyek rabûbe, welê xurt, li kêleka şervanan, diherike. Çemê ku niha qet kesek nizane ka ji kû tê u ber bi kû de dere, niha, dîsan, bêrawest, bêguherîn, her mîna xwe, ber bi diyarên nenas, ber bi deverên xerîb dere. Çem, kî hatin, kî çûn? Kîjan beg, mîr, keyser, împarator û serekî xwe bi ava te ya hênîk şûşt, bi dengê xuşîna te kete xewan, bi herikîna te, herikî û kete nav rûpelên tarî yên tarîxê? Kî? Û niha? Ev şervan? –ku law û keçên te ne, bi ava te mezin bûne, bi xeyala ava te perwerde bûne?

Bêdengiya kêliyekê, bi dengê Çiya, xira dibe. "Emê niha bi-kevin rê", Çiya dibêje, "riya me zêde nema. Li pêş me, bi tenê qo-naxek heye. Piştî wê jî êdî qada şer e. Ez hêvîdar im, sibê, vî çaxî em gihîştibin gundên milê din ê çîyan. Haya we divê jê hebe; ji niha û pê ve, her gava ku hûnê bavêjin, gava şer e. Gav divê xurt, qehîm, bidîqet û zane bin. Bila guhê we li ser her celeb deng û pêjnan, çavê we li ser heval û hogirên we bin. Hûn divê bizani-bin, li pey her çiya, zinar, lat, kevir û darê dikare dijmin hebe.

Helîkopterên wan, ji niha û pê ve, dikarin li her derî xuya bikin. Bi tevî bin, berik hertim divê di devê çekan de be, narincok divê hertim hazir bin..."

Çiya radiweste, bi dîqet li wan dinîhêre, yek bi yek, çavê xwe li ser hemûyan digerrîne û paşê, bi qîrîn "hûn hazir in?" dibêje.

"Belê", şervan, bi yekdengî, dibêjin. Pirs û bersiv dubare dibe.

"Hûn hazir in?"

"Belê..."

"Hingê em bi rê dikevin..."

Û ew bi rê dikevin. Di kêleka qiraxên çem re, ew ber bi jor dibin. Tav û tîrêjen tavê niha çûne ava. Tevî ku hê danê êvarê ye, dinya hinekî tarî bûye. Ewrên tarî yên mezin esman vegirtine û bi lez xwe dilivînin. Ew di ser çiyên re, ji başûr, ber bi bakur diherikin. Kevoka ku şal û şapikê xwe bi keys kiriye, rextê xwe rast kiriye û qinabên sola xwe şidandiye, bi hêsanî, di nav giyan, di ser kortal, kevir û devîyan re, diherike. Rênas, îcar jî, li pêşîya wê ye. Rênas dîsan jê re rê vedike. Çiya, çiya, çiya. Her der, her alî bi çiyên rapêçayî ye. Zincîrên çiyên her li pey hev, di zikê hev de, dirêj dibin û derin. Çemê Rojhilatê jî di zikê çiyên de. Bi dehan av, tîşik û kanî di berpala, sermilk, pişt û qûntarên çiyên de dizên û diherikin. Bi sedan şikêr, zinar, lat, taht, li vir, li wir, tene pê û hevgirtina zincîrên çiyên temam dîkin. Herçî gewrî, zixur, bihur, gêdûg, gelî, newal, ziving û şikeft in, ew jî bêhejmar in. Û dar û devî û dahl û daristan... Kêwroşk li der û dorên wan, bi lez, direvin. Xezal, bi çavpêketinê, bi leza birûskê, serê xwe radîkin, bi nazenîn, bi tirs, maxrûr, direvin. Simore hildikişin ser daran. Jiyanekê nû dest pê kiriye; berf heliyaye, pûng, rihan, giya, gul, kulîlk serî dane. Keskesora rengan dinya dixemilîne û ew derin, bi ûsil, bêyî ku bizanibin ka çi li pêşîya wan e. Ew, gav bi gav, dikevin zikê çiyên û derin, ber bi qada şer, ber bi mirin, man yan nemanê....

Çiya, Kevok, hêdîka, ji xwe re, li deftera xwe û şîrên tê de difikire, dimeşe û dibêje; çiya, dost, dijmin, heval, neyar, çiya... ez

di hembêza te de me, ruhê min, bedena min teslimû te. Çiya de rê bide min, de rê bide me. Çiya, rê bide, ez destana keder û hiznê, strana liberxwedan û serhildanê bibêjim. Bes e keder, bes e hizn û tarîti... Bihêle, ez strana ronahî û azadiyê binehwirînim. Çiya, binihêre, ez hildikişim ber bi lûtkeyên te, ber bi dil û mêjiyê te. Çiya, ax ev axîn, ax ev zarîn, ev girîn. Ax ev qîrîn, çiya. Deng tê te? Çiya, cîhan û jîyanê bi te dest pê kirin, bi te di bin avan de man, bi te vejîyan. Çiya, jîyana min, jîyana me vejîne. Çiya, ez ketime bextê te çiya, bi dar û berên xwe, bi av û çemên xwe, bi hêrs û kerbaxwe, bi coş û kela xwe, min, me, hebûna min, hebûna me vejîne, çiya. Çiya, ev destana liberxwedanê, ev strana azadiyê, ya te ye; ev dîlî, ev bindestî, ya te ye; ev tarî, ev ronahî, ev serma, ev germahî, yên te ne; ev sebir, ev sebat, ev lebat, ji bo te ne; ev nîfir, ev pesn, ev gotinên min ên xêşim, ên te ne çiya, çiya...

Gotina dawîn hinekî bideng ji devê Kevokê derdikeve. Rênas dizîvire ser Kevokê û "te bang Çiya kir?" dibêje.

"Belê", Kevok lê vedigerîne, "lê ne Çiyayê serbend, çiyayê ku me di hembêza xwe de dihewîne..."

"Çiyayê ku me di hembêza xwe de dihewîne", Rênas, bêyî ku ji gotina Kevokê tiştekî fam bike, dubare dike û jê bi dûr dikeve, dimeşe.

Bi qasî çendেকে dirêj, ew welê li kêleka çem, dimeşin. Paşê ew dikevin nav dahleke gelekî bor. Piştî meşêke dijwar a nav dahlê, ew tîn ber çem û radiwestin. Li cihê ku ew radiwestin, herdu perên çem gelekî nezîkî hev in û bi alîkariya latên ku ji herdu milan xwe xwarî çem kirine, hema çî bigire per digihên hevdu. Şervan, yek bi yek, ji vî milê çem dipengizên milê din ê çem û bi vî awayî ew derbasî aliyê din ê gelî dibin. Bêyî ku ew rawestin, di zikê dahl û çiyê de, ew ber bi jor hildikişin. Gav bi gav, nefes bi nefes, dar bi dar, lat bi lat, zinar bi zinar, ew hildikişin. Bi qasî saetekê ew dimeşin. Saetek dibe du saet, du saet diqulipe ser saeta sisiyan. Dinya, bi temamî, tarî dibe. Ronahî nûn e, stêr nûn in, heyv nûn e. Şervan hîn bêhtir nêzîkî li hev dîkin û dimeşin. Berî

ku ew xwe bi serê çîyan bigîhînin, baran dest pê dike. Pêşî peşk bi peşk. Paşê bi xufe xuf û bi xuşînî. Lê ew dimeşin. Cil û bergên wan şil dibin. Kiras û êlegên wan şil dibin. Dest û rûyê wan şil dibe, lê ew derin. Bêrawest, bêmole.

Êvar ber bi şevê dere, êvar diqulipe ser şevê, ew derin. Bi ahenk, bi tempoyeke sivik, bi gavên fireh. Di bin barana boş de, di warekî xapînok û fetloke de. Di nav dar û dahlên sakîn û bêdeng de. Dinya sar dibe, bayekî gur dest pê dike. Lê heyret, germ e jî. Kevok xwîdan dide. Li milekî şiliya baranê, li milekî jî şiliya xwîdanê. Xwîna Kevokê, di rehên wê de, ji ber germahiya bedenê, bi lez diherike. Na, xwîn naherike, ji bervajiyê, xwîn di rehên wê de, ji ber baran û sermê, qerisiye. Gelo agirê wê heye? Ew bi tayê ketiye? Çima nefesa wê weha rîtm û tempoya xwe winda kiriye? Çima dilê wê weha pihêt hildavê? Ev şilî, dilopên baranê ne, yan yên xwîdanê? Kevok tişteki hîs nake, tişteki nabi-hîze. Ew bi tenê dimeşe. Meş, meş, meş.

Lê gava şervan xwe digîhînin serê çîyan û bi qasî kêliyekê di ser çîyan re derin û paşê, gava ew xwe ber bi jêr berdidin, hingî, li kêleka kupikên çîyan, li deveke ku bi şikefteke gelekî mezin dişibe, kom radiweste. "Em ê li vir, bi qasî bîskekê, rawestin", îcar ne Çiya, lê Rênas, di nav şervanan de digere û bi dengê xwe yê gur dibêje, "lê ne zêde, bi qasî bîskekê. Hûn serbest in..."

Kevok, bi zehmetî, xwe digîhîne ber latekê, çentê xwe yê piştê, keleşkova xwe datîne kêlekê û li ser tahtê şil, welê mîna ku ew hilweşiyayî be, lingên xwe dirêj dike û rûdine. Nefesa wê çikiyayî ye. Deng jê dernakeve. Bi tenê ew, bi dirêjî, bi kûrahî, nefes digire û dide. Ew niha bi dengê dilê xwe yê ku bi lez hildavê, di-hese. Piştî demekê, gava hinekî bêhn tê ber wê, ew ji çentê kêlekê çend serî şekir derdixe, davê devê xwe û wan dimije. Dinya çikî tarî ye. Baran dibare. Ew bi destan, çend caran, rûyê xwe paqij dike, lê bêfeyde ye. Paşê, dest û piyên wê welê li ber wê ketî, bedena wê sist, çavên wê tên girtin û ew di xew re dere.

Gava Kevok bi dengê keçîkekê, Şîlanê, hişyar dibe, ji navberê çiqas wext bihuriye? Kevok pê nizane. Di tariya şevê û barana xuşe xuş de, ew fersend nabîne ku li saeta xwe binihêre. Jixwe wext jî nîn e. "Bilezînin", îcar Çiya diqîre, "bilezînin, berî ku roj li me hilwere, divê em xwe bi qonaxa xwe bigihînin, bilezînin." Ew hemû bi lez, li kêleka zinêr, mîna berê, dikevin rêzê. Yek ji kumandaran tê û wan, yek bi yek, dijmêre. Paşê, bi dengê Çiya, ew dîsan bi rê dikevin; "em derin..."

Ew derin. Di nav dar, dahl, daristan, lat, zinar, kevir, co û avan de, di ser pişt çîyan re, ew, ber bi jêr, dimeşin. Di tariyê de, di bin baranê de. Lê beriya ku rojeke nû dest pê bike, li ber destê sibê, ew digihên qonaxa xwe ya dawîn. Cihê ku ew niha hatinê, li ber lingên çîyan, li kêleka çemekî boş, çend şikeft in. Dinya, hêdîka ronî dibe. Baran hêdîka radiweste. Ew hemû, yekser, derin şikeftan û li şikeftan belav dibin. Ew westiyayî ne. Ew bêxew in. Ew rêwî ne. Wan rawest divê, bêhnvedan û xew divê...

Dîsan şikeft. Ew ji şikeftekê derin şikefteke nû, ji qonaxekê qonaxeke nû. Heta kengî?

Ew, bêdeng, bisemt, bi dûzaneke şayan, li şikeftan belav dibin. Dîsan xew, dîsan xure xura xewê. Li kêleka hev, tevî cil û berg, pêlav û gore. Çente mîna balîv, şar û pişt mîna lihêv. Çek û rext li kêlekê. Di nav bêhneke giran û genî de. Di tariyeke sawtijî de. Bi tenê. Li cihê herî dûr ê cihan, însan û însaniyetê.

Lê Kevok, îcar, nakeve xewê. Ew dike nake, xewa wê nayê. Ew radibe ser xwe, hêdîka çentê xwe yê piştê digire û ji şikefta nizm û tarî derdikeve. Dinya ronî dibe. Rojeke nû dest pê dike. Çiya niha li pey mane. Li pêşiyê jî beriyeke serrast a bêdawîn dixuye. Ê çem, Çemê Rojhilatê. Çemê ku hertim bi wan re ye, hertim li pey wan e, hertim tevî wan diherike. Dinya sakîn e. Bi tenê dengê çem û dengê çivîk û teyran tê. Bi qasî çendekê, Kevok, kulmeke ronahî li ser çav, rû û eniya wê, li kêleka devê şikeftê rûniştî, li dangan guhdarî dike. Ev aramî, ev hizûr... Ev beriya bêpayan. Berî... belê, berî nîşana gava nû ya meşa wan e.

Piştî çiyar berî tê û di beriyê de jî şer. Gelo ewê welê be? Kevok li nobedarê hanê yê dûr ku piştî xwe daye lata zinarekî û bi lûleya tivinga xwe dilîze, dinihêre û difikire, ma ewê wisan be? Kevok serê xwe dixwe nava destên xwe, bi awireke giran, bi çavên ronî, li bergehê dinihêre. Ev welat, ev çem, ev ronahiya hanê ya tîrêjan, ev çiya û daristanên li pey, ev esmanên niha vekirî... Ev hemû çi ne? Hêvî? Bêhêvî? Ronahî? Tarî? Hêz, quwet? Qelsî, sistî? Mayin? Mirin? Û çima?.. Çima ev hemû tişt?.. Kevok radihêje çentê û jê dîsan defter û pênuşa xwe derdixe. Ew defterê hembêz dike, wê dixwe nava pêşîrên xwe û mîna ku ew zarokeke berşîr bilorîne, ew welê, tevî defterê, xwe dilivîne. "Deftera min" Kevok, zahf hêdî dibêje, "hêviya pêşeroja min, zimanê xem û keserên min, kaniya cesareta min, quweta min, heza min..." Kevok defterê vedike. Rêz, kite, hevok, gotin. Rûpel bi rûpel. Lê peregen-de. Hemû bi destnivîseke gelekî bedew nivîsî. Kevok dikene, belê, wê, ji niha ve, bi qasî bîst rûpelan nivîsiye.

Kevok rûpelekî nû vedike, pênuş di destê rastê de, li bergeha hember dinihêre û difikire. Piştî kêliyêkê, ew, hedîka, rêza xwe ya yekemîn dinivîse; *Şikeft, devê şikeftê û berî... Piştî rêza yekemîn, ew, kite bi kite, didomîne; tu dê tirêjên nûzayî yên royê, giyayên şil, beriya hêşin a mirinê ji devê şikefta nîzm bibînî. Bi tenê ji wir. Bi qasî ku tu dikarî ji wir bibînî. Tu dê, bi tenê ronahiya tava qedîm bibînî, ne titekî din. Bi tenê ew ronahî dê li ser eniya te, li ser rûyê te biçirûse, ne tişteki din. Dilê te dê bi wê ronahiyê germ be, ne bi tişteki din. Ewê nefesê bide te, ne tişteki din. Ronahiya tavê, bi tenê ronahiya tavê dê bêhna axê, bîhna dar, ber û giyan, rengê beriya şil ku leylandide, bi te bigihîne. Heke tu bijî, ewê, car bi car, gav bi gav, te, beden, mêjî û dilê te vejîne, bi tenê ew û ne tişteki din... heke tu wê winda nekî, heke ew te winda neke...*

Rûpelekî nû. Pêlekî nû yê hîsan. Berî ku gava nû ya îro dest pê bike. Gotinên Rênas ên rê dikevin bîra Kevokê, "îro her tişt dest pê dike..." Ji îro re hazirî û tevdîr divê. Kevok rûpelên defterê digire, defter û pênuşê dixwe çente, radibe pê û dikeve şikeftê.

Lê xewa wê nayê. Ew, li kêleka çar şervanên ku bi xure xur radizên, dirêj dibe, serê wê li ser çente, şar heta sîngê li serê, çavên wê li banê tarî yê şikeftê, ew difikire.

Ew difikire, –heta ku xew tê û wê hembêz dike.

Xew, têrxewî. Haziriya herî girîng a rojê, ya şevê...

Gava Kevok ji xew hişyar dibe û çavê xwe vedike, tiştê pêşîn ku ew dibîne, tîrên ronî yên tavê ne ku ji devê şikeftê xwe dirêjî hundir kirine. Devê şikeftê di nav şewqeke bêpayan de ye. Şewqek ku germahiyekê direşîne ser merivan. Kevok xwe dide hev û ji şikeftê derdikeve. Ew niha der û dor, hûn çêtir dibîne. Cihê ku ew lê ne, hê jî, li bilindahiyên, di nav çiyên de, bi daran rapêçayî ye. Ji ber vê ye ku meriv dikare bi tenê pêşiya xwe, hemû berî, çem û hawîrdor, bi hêsanî, bibîne. Lê Kevok niha rûyen nû li doralî dibîne. Û ne yek, ne dudo, ne sisê, heye ku bi qasî pêncî kesî, heye ku sed kes, sed û pêncî kes. Tevgereke boş li dar e. Çûyin û hatin xurt e. Çek û pûsad tijî dibin, rextên dagirtin, dûrbîn paqij dibin. Ev şervanên hanê kengî hatin? Ji kû, çawan? Çawan Kevokê hatina wan nebihîst? Heye ku gava Kevok û hevalên wê hatin, ew li vir bûn?

"Rojê te bi xêr!"

Rênas e, gava Kevok xwe dizîvirîne ser deng, ew rûyê geş û bejnaşeng û dirêj a Rênas dibîne. "Rojbaş" Kevok, bi ken, dibêje, "Ev kengî hatin, Rênas?"

"Ev tîrên û derin... ev cih, qonaxa dawîn a ser tixûban e. Şervan hertîrên tîrên û derin... Li gora xeberan şerên mezin li doralîyên gund û zivîngên jêr hatine pê... Şerê giran dest pê kiriye. De zûke, Kevok, emê herin. Li ber devê şikefta hanê hevalan savar çêkirine. Savara germ a bigoşt!.. Here, bixwe û paşê were ber şikefta hanê ya jêr. Emê li wir bicivin û herin..."

"Ber bi kû?"

"Ber bi şer... Zûke..."

Û Kevok zû dike. Bi dû kêliya pêdivî, xwarin û vexwarinê re, Kevok xwe digihîne koma hevalên xwe û dikeve rêzê. Hingî

Kevok bi tiştêkî kêfxweş dibe. Ew kumandarê rojên xwe yên zivistanê, li wir, li ber hevalên wê rawestiyayî, dibîne. Ew kumandarê bejndirêj û simbêlboq ku li desta zivistanê ya berf û pûkê serekî dikir. "Rojbaş, Kevok" Kumandar, bi dengê xwe yê gur û vekirî dibêje û dikene.

"Rojbaş..." Kevok, bi ken, dibêje, lê gotinê temam nake, di-sekine. Bira navê kumandar çi bû? Na, Kevok navê wî nizane. Heyret, piştî ewçend tiştên ku hatin serê wan, hê jî Kevok navê vî zilamî nizane.

"Çekdar" Kumandar, mîna ku bîr biribe, dibêje, "navê min Çekdar e. Bikeve rêzê, îcar jî emê bi hev re bin. Lê bi hêviya ku îcar ji ya cara zivistanê çêtir be."

"Belê, bi heviya çêtiriyê..."

Piştî desta ku niha gihîştiye sîh kesan hazir dibe, kumandar Çekdar dest bi gotara xwe dike. Gotara ku Kevok ji zivistanê dizane, bi gotinên zelal, tempoyeke giran û balkêş; dijiwarî, şer, qehremanî, evîndarî, welat û gelevînî, tarîx û tarîxa nû ku niha tê nivîsîn, xurtî û zîrekî, dijmîn û xirabiyên dijmîn, rizgarî, têkoşîn û perûya dawîn a jîyanê, şehadet... Bi dû gotara xwe ya dirêj re, "niha, çek û pûsadên xwe kontrol bikin, xwe amade bikin" kumandar dibêje, "piştî nîv saetê em ê ji vir bi rê kevin..."

Piştî nîv saetê ew bi rê dikevin. Kevok bi rê dikeve. Bi meşa ku em niha baş pê dizanin. Di kêleka qûntarên çiyar re, paralelî çem û beriyê, ber bi aliyê rojhilat. Saetek, du saet, her mîna berê ew dimeşin. Lê piştî saeta duduyan meş girantir dibe, pesdeng û bisemtir dibe. Hejmara rêberên destê zedetir dibe. Deste bêhtir guh dide kamuflajê. Keşîfdar derdikevin rê, derin û tîn. Rênas jî ji rêzê derdikeve, ber bi pêşî û paşî, bi dîrejahî, dere û tê, xeberên keşîfdar, rêber û paşmêran dibe û tîne. Bi dirêjiya meşê re, niha, dengê teyr û tilûran jî kêmtir dibe. Lawir hew dixuyin. Tevî ku hê milek wan çiya û daristan, milekî jî çem û berî ye, hêdî hêdî, li milê berî rengê hawîrdor jî diguhere. Ax dixuye. Erdên qiraç dixuyin. Erdên çandiniyê, qode, tîr dixuyin. Şikêr û qûçên ku bi

destên merivan hatine lêkirin, dixuyin. Milê beriyê hê jî hêşin e, lê êdî ne hêşinahîyeke bor û boş.

Mîna şervanên din Kevok jî têdigihe, ne bi tenê dibîne, herweha hîs jî dike; ew, niha, dikevin nav heyameke nû, dinyayeke nû. Dinyayek ku ji dinya ku ew jê dertên cihê ye. Dinyayeke bêdeng, sawtîjî, xapînok. Kevok li saeta xwe dinihêre. Sê saet bûye, sê saet in ku ew ketine rê. Niha jî tiştêkî nû li beriya bêpayan tê pê, ew hêşinahîya qels xelas dibe û dewsa xwe dihêle taritiyekê. Tarîtiyekê ecêb, reşahiyeke nenormal. Kevok, bi dîqet, bi hizirîn, li milê beriyê dinihêre. Dûrbîna hevala ku li pêş wê dere, jê werdigire û bi dûrbîne dinihêre. Hingî Kevok vedicinîqe. Tarîfî, ya şewatê ne. Reşahiya ku ew niha dibîne, ya agir û şewatê ye. Erd şewitî ye. Dar û ber şewitî ne, giya û hêşinahî, kevir û lat, her tişt şewitî ne.

Ew dimeşin. Ew, hêdî hêdî ji çîyan bi dûr dikevin, nêzîkî li çem û beriyê dîkin û dimeşin. Niha ew di kortaleke fireh û kûr de ku li kêleka çem, paralelî çem e, derin. Bi tenê serê wan niha dixuye. Lê ew dibînin. Kevok dibîne. Rastiya ku wan behs dikir, rastiya vî welatê mirinê li ber çavê wê ye. Darên kevnare, mezin şewitî ne! Guleyên topên hawanê di gewdeyên wan de teqiyane. Darên abadîn hilweşiyane. Şopên çekên law, topên hawanê, mîtralîyozên mirinê, li her derî dixuyin. Heta li ser kevir, qûç, zinar û latan! Heta kevir, kuç, zinar û lat jî şewitî ne, reş bûne! Li erdê bi navê hêşinahîyê tu tiştêk nemaye, her tişt, her der şewitiye. Mîna komirê, her der reş e. Her der hilweşiyayî, terkkirî ye. Dar, devî, çand bi gulokên êgir şewitî dinya tenha, aram. Ne kesek, ne teyrek. Însan nîn in, tevgera însanan nîn e, hez nîn e, sewda nîn e. Her der, her tişt mirî. Bi tenê şopên kînê, şopên nefretê hene. Û qîrîn. Û gazîn. Û qîrîn û gazîna bêdeng ya tebiyeta ku bi reşahiya şewatê reşa xwe girêdaye.

Reşahî. Reşahiyeke ku bi destê însanan hatiye pê.

Hîseke têkel –xof, tirs, sûzenî, matî, silî– bi ser Kevokê de tê. Pêl bi pêl. Mîna ku Kevok bi pêla vê hîsê bifetise, gewriya wê tiş dibe. Kevok dixwaze bigirî.

Deste giran dibe. Hin deng tèn, dengên hin lawir û teyran. Deste, bi pergala xweparastinê, belavbûyî, radiweste. Dengê ecêb ku bi dengê teyran dişibe, nêzîktir dibe. Piştî bîskeke, ji milê pêşîn ê kortalê, du pêsmêr, jîneke navsal di navbera herduyan de, dixuyin. Rênas, tevî Kevokê, sê kesan hildibijêre û ew ber bi kesên ku tèn, derin. Piştî ku ew digihin hev, kumandar Çekdar jî xwe digihîne wan, bi destan, bang li wan dike. Ew hemû bi hev re, derin, ji şervanan hinekî dûr, li cihekî xewle, rûdinin. Jinik li wan dinihêre. Bi rûyekî qermiçî, bi çavên zahf vekirî, bi awireke vala. Cil û bergên wê yên kevn çiriyane, di lingên wê de, hema çi bigire pêlav neman. Pêlav terişiyê. Çekdar, Rênas, Kevok û yên din, bédeng, li hev dinihêrin. Bi dû bédengiya bîskeke re, "Dadê" Çekdar dibêje, "tu ji kû têyî? Çi qewimiye?"

"Ez ji gund tēm" jinik, sakîn, kite bi kite, dibêje, "ji gundê li paş çem... bi tenê gundê me mabû. Lê ew jî şewitî. Wan ew jî şewitandin..."

"Kê?"

"Wan... wan şewitand... ard, zad, zexîrê me jî şewitandin... ew çend xaniyên xerbende yên gund jî şewitîn... gund nema, gundê bav û kalan çû, mala min nema... mala min, mala min..."

"Ew li gund in?"

"Na, ew çûn, berî niha bi çend rojan ew çûn... çend roj in ku ez li rê me... li lawê xwe digirim... lawê min, kurê min, mala min, lawên min, mala min..."

"Dayê" Rênas dibêje û dixwaze jê tiştekî bipirse, lê Çekdar dengê wî dibire, bi serê xwe, dev jê berde, bihêle, dibêje.

"Mala min... kuro, kurê min li kû ye? We kurê min dîtiye? Mala min... sê kurên min hebûn... sê şêr, sê mêrxas, sê çiya... yek mir, wan yekî, mezinê hemûyan, li meydana gund kuştin. Yek bi xwe re birin. Biçûkê hemûyan jî reviya, ber bi van deveran, ji bo ku tevî we bibe. Kuro, kurê min li kû ye? Ew hê zarok e, umrê wî hê çardeh e. Mala min, mala min..."

Kevok destê rastê yê jinikê dixe nava herdu destên xwe, destê wê mist dide. Lê jinik lê nanihêre. Na, jinik lê dinihêre, li hemûyan dinihêre, lê mûna ku ew wan nabîne, mûna ku ew çavvekirî di xewekê de be, welê ew dipeyive.

"Kurê min bibînin, kurê min bînin, mala min... mala min..."

Kevok cewdikê avê dide jinikê. Hingî jinik hê, wan ferq dike, mûna ku ew nû bi hebûna wan varqilîbe, ew li wan dinihêre. Ew matara werdigire, hinekî av vedixwe û dîsan dide Kevokê. Qermîçokên enî û rûyên wê kûr in. Rehên stû û gewriya wê reş dikin. Lê ew, sakîn e. Li ser rûyê wê ne şopên endîşe û keserê, ne jî yên kîn û nefretê dixuyin. Ew ji berîka fîstanê xwe yê rengîn ku di nav tozê de maye, çend şekirên rengîn û qulqulî derdixe û wan dirêjî Kevokê dike.

"Ev şekirên kurê min in, min jê re veşartine. Bidinê."

"Na, Yadê, tu bidiyê, gava te kurê xwe dît, tu bidiyê" Çekdar dibêje û li Rênas vedigere, "bila yek Yadê hilde û wê bibe meqerê, heye ku kurê wê li wan deran be... Em divê herin..."

Ew pêşmêrên ku jinik anîbûn, destên xwe dibin ber devê xwe, dengê mûna dengê teyran derdixin û radibin, derin. Deste jî, bi dangan, radibe, bi rê dikeve, destê ber bi aliyê rojhilat, jinik, tevî şervanekî, ber bi aliyê rojava. Gava destê bi dûr dikeve, Kevok hê jî dengê jinikê dibihîze, "mala min, mala min..."

Mala min, Kevok jî, hêdîka dibêje û dimeşe, mala min... em rêwî, em rêwing. Ev şewat, ev mirin. Mala min... ev jîyan, ev cîhan, ya jîbîrbûyî, ya neçar, ya bêkes. Mala min, ev jîyan ê weha dûrî cîhanê, dûrî însan û însaniyetê bişewite? Bimire? Mala min, mirin, qayideyên xas ên mirinê ku li vir tên pê. Rê û xaçerêyên mirinê yên vî welatê bêpişt, tenê, reben... Mala min, axa şewitî, erdên şewitî, darên şewitî û mirin û mirî. Mirin û miriyên ku bi destê însanan li dar dikevin. Însan, mala min, însan, hişê însanan ku bi her tiştî qadir e, desthilat e, dikare her tiştî bike. Mala min, kêf û kêfxweşî, tirs û saw, keser û xizîn, hêrs û nefret, xurtî û cesaret û hemû xususiyetên însanan. Mala min, hemû ji bo mirinê,

kuştinê, şewat û hilweşandinê, mala min. Pîrejîn, mala min, rastî, rastiya însanan, rastiya vekirî, eşkere, bêneqş û bêderew. Mala min, rastî; şewat, mirin û mirî. Miriyên me, mala min. Ho mirin, ho şewat, qeda bi we keve! Mala we bişewite, mirin, şewat!..

Kevok digirî, hêdfika, bêyî ku kesi pê bihesîne, serê wê li ber wê.

Çem û kortala ku destê te de dere, hêdfî hêdfî, ji çiyar bi dûr dikeve. Tevî ku ewr li esmanan hene, dinya ronî ye. Çima ew weha di vê ronîya rojê de derin? Serekên wan, bêguman, bi tiştina dizanin. Kevok, sist, hingavtî, dilşikestî, dimeşe. Li dereke ku herdu perên çem mîna gewriyekê, bi kevirên nava çem, mîna pîrekê, digihê hev, destê, yek bi yek, zahf bi dîqet, derbasî milê din ê çem dibe. Ew hew dipeyivin. Ew mesafa navbera xwe gelekî zêde dikin û dimeşin. Gava Rênas di ber Kevokê re derbas dibe, ew bi destan girne mezin ku li ber wan bilind dibin, nîşan dide. Riya wan ber bi giran e. Piştî bîskekê, ew, ji dûr ve, gundekî dibînin. Gundekî kavi, xaniyên wî xirabe. Gundekî tazî, vala. Gundekî şewitî. Dîwarên hilweşiyayî yên gund, gewdeyên darên şewitî yên doralî reş dikin.

Destê nasekine, her di rîya xwe de berdewam dibe. Heta ku ew xwe digihînin girên bilind. Gir, tijî zinar û lat in. Ne darek, ne deviyek dixuye. Bi tenê kevir û taht. Lê ji bo xwe veşartin û parastinê yekane. Di zikê girên bilind de zahf qelîşek, bihurên biçûk, çeperên kûr û spartekên qewîn hene. Çekdar, Rênas û sê kesên din ku li pêşîya hemûyan rawestiyane, bêdeng, bi dest û pî, destê di navbera qelîşekan de belav dikin. Kevok, Şîlan û du şervanên mîr dikevin bin qelîşekê. Ew çentayên xwe ji xwe dikin û rûdin. Şervanekî simbelzirav paketêke cixarê ji berîka xwe derdixe, dirêjî wan dike, bi xwe jî cixareyekê derdixe û bi heste, di nava kefa destê xwe de vêdixe û di nava kefa destan de wê dikişîne. Kevok nakişîne. Ew çentê xwe dixê bin serê xwe û li ser tahtê serrast pal dide. Heta ku Rênas tê nik wan, ew, welê paldayî, di nav dengên şervanan û dengê çemê ku li dûr diherike de, li dengê hîsên xwe yên têkel guhdarî dike.

Rênas bangî wê dike "Kevok were" dibêje. Kevok radibe û dere nik Rênas ê ku hinekî ji wan dûr sekiniye. "Keleşkova xwe ya kubî û dûrbînê jî bîne." Rênas dibêje. Kevok wan jî hildide û tê. "Koma we çar kes e, tu dê berpirsiyara komê bî" Rênas, bi lez dibêje, "em niha gelekî nêzîkê gundekî ne. Eger tiştek neqewime, em ê êvarê dakevin gund. Were."

Kevok dide pey Rênas û ew bi hev re hildikişin serê zinaran. Çaxa ew digihin gupikên zinaran, li wir, Kevok çend kesên din jî, tevî Çekdar, dibîne. Hemû li wir, li paş latekê ku bi dişibe çepereke qehûm rûniştine. Yek ji wan hinekî rabûye ser piyan û bi dûrbînê li pêş dinihêre. Rênas û Kevok tên nik wan. Li kêleka wan, Rênas hinekî xwe bilind dike, bi destan bangî Kevokê dike û dixwaze Kevok bi dûrbînê binihêre. Kevok dinihêre. Gundek dixuye. Gundekî neşewitî ku ji panzdeh, bîst xaniyan hatiye pê, ku tê de jiyan heye, di bin şewqa tavê de xuya dike. Hin zarok di navbera xaniyan de baz didin. Hin mirîşk û dîk, bi tiralî, li hewş li ber xaniyan digerin. Li aliyê jêr ê gund dewar û pez diçêrin. Ker, hêstir, hesp dixuyin. Du kalemêr, bêyî ku haya wan ji tiştekî hebe, li ber dîwarê xaniyekî, li ser totikan, rûniştine û cixare dikişînin. Jineke ciwan, di destan de sîtilek, ber bi jêr dibe. Hinekî nêzîkî zinaran, di nav bostaneke zahf fireh û dirêj de, sê zîlam dixebitin. Li kêlaka gund, li milê jêr, kaniyeke boş diherike. Herdu aliyên kanî bi darên bilind ên bî û spîndaran tijî ne. Di ber kanî û daran re riyeke fireh a gund ber bi jêr dibe. Li dûr, çem û ava çem, bi tîrêjên tava danê êvarê leylan dide.

Hemû gund, hemû bergeha gund û doralîyê gund, niha li ber çavê Kevokê ye. Rênas, bi tiliya xwe, cihekî li gund nîşan dide. Kevok li wê derê jî dinihêre. Xaniyekî dirêj û nizm ku ji kevirên reş lêbûye, dixuye. Hewşeke fireh a malê heye. Li hewşê, jinikeke tiştina dişo. Cil û bergên ku wê şûştine, li kêleka xênî raxistî ne. Lê li milê din ê xênî jî bi tenê kirasekî spî raxistî ye. "Te kiras dît?" Rênas, hêdîka, ji Kevokê dipirse.

"Belê" Kevok dibêje.

"Ew kirasê spî, ji bo me, hatiye hilawestin. Ew nîşan e, nîşana talûkê ye. Talûke li der û dorên gund e, leşker li doralî ne, em ê bipên..."

"Li kû, li vir?"

"Belê, li vir, ma wekî din cih heye? Em ê bipên, heke leşker neyên, em ê êvarê dakevin gund. Jixwe ew werin, rewş diguhere."

"Rewş diguhere?" Kevok gotina Rênas, bi celebê pirsê, dubare dike. Lê Rênas bersiv nadiyê.

Kevok û Rênas jî li kêleka Çekdar û yên din, li ser taht, rûdin. Kevok li rûyê wan ê qemerî ku niha bi tîrêjen tavê dibiriqin, dinihêre. Li ser rûyê tu kesî ne endîşe û tirs, ne jî guman û pirs heye. Ji berevajiyê, kêfxweşî û rehetî li ser rûyê wan dixuye. Dido ji wan, di nav kefa destan de veşartî, cixare dikêşînin. Çekdar, lingdirêjkirî rûniştî, ji komê re, bi gotinên xwe yên qelew, behsa van deveran û ehlê van gundan dike. Bi best, bi coş.

Piştî bîskeke Kevok, hedîka, xwe dilivîne, xwe hinekî bilind dike û li gund dinihêre. Pêşî bi çavan, paşê jî bi dûrbînê. Gund li wir e, hinekî ji wan bi dûr, di jiyana xwe ya rojane de. Xanî, bexçe, dar, kanî, bax, bostan, rê û xaçerê dixuyin. Ax dixuye. Axa reş û hêşîn a bibereket. Axa Welatê Çiyan. Axa Kevokê. Bêdengiyekê bi ser hawîrdor de girtiye. Ji bilî dengê peregende yê lawir û teyr, dengê sivik ê ba û avê, tu dengên din nayên bihîstin. Berî, lat û zinarên kêlekê, dar, devî, giya di nav bêdengiyekê de ne. Bêdengiya şikestin û ketinê? Bêdengiya têkoşîn û rabûnê? Belê ax dixuye, Kevok difikire, axeke avis a biharê. Axeke bêzar û bêziman. Axeke hêvîdar. Axek ku aramî û hizûr jê difûre...

Aramiya vî gundî çiqas bi aramiya gundê Kevokê dişibe! Ji gundê zarokatiya Kevokê heta gundê hanê yê îro... Kurtebiriya jiyana Kevokê. Qedera wê weha ye, dê weha bibe? Heye ku gund qedera wê ye. Heye ku jiyana wê weha ye; gund, fîstan, cil û bergên rengîn ên gund, lez û beza li pey kahrik û berxikan, selikên tijî yên fêkiyên gund, danê êvaran ên dotina şîrê pez, şîrê bizin û dewaran, req û beqên kanî û avan, paşê, piştî gund,

xwendina destpêk, navîn û bilind a bajarên mezin, jiyana gihiştî ya perwerdeyî û bîrbirinê, bîrbirina evîn û celebên evînê û dîsan gund. Yanî ax û dîsan ax. Yanî destpêk û dawîn... Mîna ku Kevok li gundê zarokatiya xwe binihêre, zîz û bihûstiyar, li gund dinihêre. Kevok, keça xama, bedena ciwan û germ, gula nûbişkivî, di vê roja germ û ronî de, bi dilekî germ, li cihekî asê, li gundê welatê xwe dinihêre û li gundê zarokatiya xwe, li dê û xismên xwe, li jiyana bextewar a wî gundî difikire.

Lê hingî, ji nişka ve, dengêk tê. Dengêkî ku bêdengî û aramiya hawîrdor, yekcar, têk dibe. Dengêkî xurt, saw û xoftijî. Kevok tu tiştî nabîne. Kes tu tiştî nabîne. Lê deng tê.

"Xwe bidin alî, xwe veşêrin" Çekdar dibêje, çekê xwe hildide û ber bi jêr dibe, "helîkopter in, helîkopter tên... Bilezînin, bilezînin..."

Tevgerêke xurt dikeve nav şervanan. Bi lez û bez, her yek bi dereke de dere. Bi carekê hawîrdor, der û dorên zinaran vala dibe, mîna ku tu kes tê de nîn be. Kevok nagihê ku xwe bera jer bide û here nik hevalên xwe. Ew, Rênas, Çekdar û du şervanên din dikevin nava qelişekeke kêleka tahtê ku ew lê bûn. Çekên wan di destên wan de, li kêleka hev, li ser totikan, ew dipên. Deng xurtir dibe, perde bi perde, bilind dibe. Lê heyret, tevî ku deng nezîktir dibe, Çekdar, Rênas û yên din sakîn in. "Kevok metirse", Çekdar dibêje, "dengê helîkopteran ji gelekî dûr, ji kîlometreyan tê bihûstin û ew gelekî bilind difirin. Eger mirov xwe baş veşêre, ew nikarin kesî ji me, ji jor, bibînin..." Lê deng her ku diçe nêzîktir dibe. Piştî bîskeke ew nikil û perwanên helîkoptereke mezin û kesk, li bilindahiyên esmanan dibînin. Paşê jî gewde dixuye. Helîkopter, mîna cinawirekî, hêdîka xwe dilivîne, giran giran li ser gund, der û dorên gund çerx dibe. Perwane dizîvirin. Nikil, ji dûr ve, mîna serê marekî dixuye. Marekî jahûn, marekî mirinê. Bi dû helîkoptera yekemîn, yeke nû dixuye. Piştî wê jî yeke nû. Hersê helîkopter, bi qasî çendêke dirêj, li ser gund, girên ku şervan tê de ne, çem, dahl, der û dorên gund difirin û paşê, hêdî hêdî, yek bi yek, winda dibin.

"Rênas, zûke, ji hevalan re bibêje", Çekdar, bi lez, jarjorên keleşkova xwe datîne ber xwe û dibêje, "bila kes xwe nelivîne, bêtî gotina min, bila kes bi derekê de nere. Bila herkes çek û pûsadên xwe hazir bike û bipê..." Rênas, mîna marekî di kepiran re diherike û winda dibe.

Hingî dengêkî din tê bihîstin. Dengêkî, mîna dengê motorê. Çekdar hinekî xwe bilind dike û bi dûrbîne li aliyê ku deng tê dinihêre. Bi qasî kêliyêkê ew, bédeng, dinihêre, paşê, "belê", dibêje, "mîna ku min texmîn kir... leşker tên... kamyon û cemseyên leşkerî tên gund..." Deng zêdetir dibin. Herdu şervanên din jî, li kêleka Çekdar, bi dûrbînê, dinihêrin. Kevok xwe nagire, ew jî bi meraq, bi dûrbînê, dinihêre. Belê, kamyon in. Kamyonên leşkerî yên xakî. Yek, dido, sisê, çar... Di navbera herdu kamyonên pêşîn û paşîn de jî cîpeke biçûk a leşkerî. Kamyon di kêleka dahl û daran re, li ser rîya gund, giran giran, ber bi gund tên. Kevok dûrbînê dizîvirîne ser gund. Di gund de niha tevgerêk dixuye. Gundî dilezînin. Zilamên nav bostanan ber bi gund direvin. Jinîkek ku li ser milên wê du sîtil hene, bi lez, dikeve hewşê mala xwe, sitilan li hewşê datîne û direve hundir, derî li ser xwe digire. Du jinên din, bi destên du zarokan digirin û dilezînin malê. Kalemêrekî, gopal di destan de, li pey jinîkekê, dikeve hundirê malekê û derî digire.

Kamyon tên. Gund vala dibe. Herkes dikeve hundir û derî digire. "Qijik tên, qijikên reş..." Rênas e. Rênas vegeriyaye û li kêleka Kevokê, li gund dinihêre. Dengê wî bi heyecan e. "Rênas bilezîne", Çekdar jê re dibêje, "bila roketavêj û mitrolyoz werin vê derê, bila herkes hazir be... bilezîne..."

Kamyon tên û li meydana gund disekin. Pêşî şeş leşker û bi qasî deh gundiyên ku alîkarî û rêberiya leşkeran dikin, ji kamyona pêşîn peya dibin û çekên giran di destên wan de, li koşeyên meydanê belav dibin. Paşê leşkerên din peya dibin. Bi kincên leşkerî yên xakî û deqdeqî yên kamuflajê. Bi çekên giran ên şewat û kuştinê. Bi postalên çermûn ên dirêj. Bi tevger û le-

batên xurt, qehûm, jixwerazî û bixwebawer. Nemaze cil û bergên wan; cil û bergên şer, şewat, lêdan û kuştinê. Yên tirs û xofê. Yên fermanên leşkerî. Cil û bergên sar, xerîb ku ji însan û germahiya însên gelekî dûr in. Xofeke kûr dikeve hundirê Kevokê. Ji sedî zêdetir leşker ji kamyonan peya dibin. Paşê jî du zabit ji jîpa biçûk peya dibin. Zabit, bi destan, hin cih û warên gund nîşan didin, tiştina dibêjin. Û leşker di nava gund de belav dibin.

Dinya ber bi esrê dere. Çend ewrên gewher ên tenik di nav esmanê çikî şîn de xwe dilivînin. Ro û tîrêjen rojê li pey şervanan, hêdî hêdî, ber bi jêr dibe. Sorahiyek hêdîka, hawîrdor vedigire. Tîrêj li ser çem diçirsin. Tav li ser kevîrên reş ên xaniyên gund dibiriqe. Pelên daran ku bi bayê piştî nîvroyê, xwe, hêdîka dilivînin, sor dikin. Teyr difirin. Çend hesp û canû li dûri gund, li zeviyên gund, dihîrin. Û li gund, di navbera xaniyan de leşker dibezînin. Û saw û tirs gund, der û dorên gund vedigire. Û leşker dikevin malan. Û qîrîn û qîjîn û hawar dest pê dike. Leşker ehlê gund ji malan derdixin û tînin meydana gund. Bi darê zorê, bi lêdan.

Keç, jin, zarok, kal, pîr, mêr, xort, hemû, li meydana gund tîn civandin. Kal û pîr li erdê ne. Mêr, jin û xort, dest û serê wan li ber wan, li piyan in. Bi qasî sed, sed û pêncîkesên reben ên gund, tirs li ser rû û çavên wan, niha, li meydana gund civiyane. Yek ji zabitan derdikeve pêş, destekî wî li ser qibûra demançê, maxrûr, potînên reş ên dirêj heta çogan lê, bi qîre qîr, tiştine ji koma belengaz a gundiyan re dibêje. Bi qasî çendekê ew dipeyive.

"Ehmeq" Rênas, vegeriyaye, dibêje, "ehmeq, lawê ehmeqan..." Rênas dikene, "ew welê bawer dike ku gundî ji zimanê wî fam dikin... ehmeq... ew bi zimanê xwe dipeyive, ew bi rojan jî bipeyive, gundî jê tiştekî fahm nakin. Ew hê tînegihîştîye ku gundî bi zimanê wî nizanin..."

Piştî ku zabit gotara xwe ya dirêj xelas dike, leşker çar xortên gundî ji rêzê derdixin û wan direjî erdê dikin û bi tiving û qûndaxên tivingan dikevin ser wan. Leşker li wan didin. Jin diqîrîn.

Keç digirîn. Du pîrejîn hewl didin, xwe bavêjin ser xortan. Lê leşker bi milên wan ve digirin û wan davêjin aliyekî din. Ji nişka ve yek ji xortan ji nava lepên leşkeran xelas dibe û dest bi bazdanê dike. Hingî dengê teqînekê tê bihîstin. Xort di cih de radiweste. Li pê, bi qasî çendekê ew radiweste û paşê, bi gavên giran, bêtî ku vegere û li paş xwe binihêre, ber bi aliyê ku wî dê baz da, çend gavan davêje. Hingî dengê teqîneke din tê. Di pey re jî dengê teqînên li pey hev. Xort, berbixûn, dikeve erdê û hew radiibe. Lê mîna ku tu tişt nebûye, leşker, di nav qîrîn û qîjînê de, şixulê xwe didomînin; ew li xortan dixin.

Kevok, heyirî, matbûyî, tirsîyayî, li pey zinaran, bi dûrbînê, li bûyerên ku li ber çavên wê diqewimin, dinihêre. Kevok, niha, ordî û leşkerên ordiya maxrûr ku hevalên wê hertim behs dikirin, dibîne; kamyonên wan ên xoftijî û zirxîn, cil û bergên wan ên şer, çek û pûsadên wan ên mirinê, tevger û awirên wan ên tûj dibîne; deng û qîrînên wan ên bêperwa dibihîze. Qîrîna wan olan dide, bêtî ku Kevok gotinên wan fam bike, dengê wan dibihîse, olana dengê wan mîna ku di dilê wê de lêbide, hîs dike. Mîna ku qîrîna wan dilê wê dide ber zompan. Dilê Kevokê diguvêşe. "Mala min..." Kevok, bi hêdîka, zîz, dibêje.

Piştî ku leşker li xortan dixînin, îcar, ew hemû mêr û xortên gund derdixin pêş û bi darê zorê, li erdê, li hember zarok, dê, dapîr, jin û xwehên wan, wan bi çarpiyî, mîna heywanan, digirînin. Bi qasî çendekê, gundî, welê, bi dest, pî û çogan, li erdê, li dora meydana gund dizîvirin. Leşker jî bi qûntarên tivingan li wan dixin. Paşê zabit, bi qîrîn, fermaneke din dibêje. Hingî leşker gundiyan li hev siwar dikin û digirînin. Gundî, bav, kur, ap birazî, xal, xwarzî, kal, nevî, li hev siwar dibin û li meydana çerx dibin. Û keç, jin, pîrejîn û zarok digirîn.

Û Kevok, bi keser, "mala minê..." dibêje.

Hingî tiştek diqewime. Tevgera gund radiweste. Dengê leşkeran tê birîn. Û hêdîka deriyê jîpê vedibe û zilamekî bejndirêj, lihevhatî, ji jîpê peya dibe. Zilam, bi giranî, peya dibe, bi gi-

ranî, gav bi gav, tê meydanê û li dora xwe dinihêre. Zilam di nav cil û bergen sivîl ên gundiyên navçê de ye. Simbêlên wî û hinekî jî riya wî heye. Bi hatina wî zabit, qamrast, li ber wî radiwestin.

"Baz", Çekdar, şaşbûyî, dibêje, "ew Baz e. Ez wî dinasim, ew Baz e..." Bi lêvbûna navê Baz, tevgerek dikeve nava şervanan. Şervan dikin piste pist... Baz... serekê mirin û kuştinê... Baz, kumandarê vî şerê kambax... Baz, navê efsanewî yê gola xwînê...

"Heyret, Baz jî hatiye, Baz jî tevî wan e!"

Hingî çavê Kevokê, cara yekemîn, bi Baz dikeve. Kevok, tir-seke bêsalox di hundirê wê de, bi dûrbînê, li Baz dinihêre. Baz, niha, bi bejn û bala xwe, li ber çavên Kevokê ye; zilamekî bejndirêj ku umrê wî li dora çil-çil û pêncan. Maxrûr, giran, awireke hişyar, jîr. Çima Baz? Mîna teyrê baz dirinde û goştwar? Dûrbîn û xurt? Teyrê baz; li bilindahiyên esmanan, baskvekişiyayî, sîng û nikil ber bi nêçîrê, maxrûr? Gelo çav? Çavên biçûk mîna çavên teyrê baz? Baz; bal, bejn, qam, lihevhatî, xurt. Û mîna şervanan qemer.

"Ev fersendê ji destê me neçe", Rênas, xwe nêzîkî kumandar Çekdar dike û dibêje, "em divê tiştê bikin. Baz, zabit, leşker, hemû di nav menzîla me de ne. Em dikarin hemûyan bikujin..."

"Lê cihê me ne qehîm e. Helîkopter ê werin. Em nikarin ji vir bazdin û xwe bi milê din, bi çiyên bigihînin. Ew jî wê me hemûyan bikujin..."

"Na, Çekdar, bira, ez bi mintiqê dizanim. Heke em bi derbeyekê wan hemûyan bikujin û bi carekê bilezînin, berî ku helîkopter bîn, em xwe bi çem û çiyên digihînin... Em lêdin... ma em ji bo kemînê nehatibûn? Li vê fersenda baş bimeyzîne ku serekê wan jî bi wan re ye..."

"Ez nizanîm... ez ne bawer im" Çekdar, bi dûrbînê, li doralî dinihêre û dibêje, "em bimeyzînin ka çi dibe..."

Li meydana gund, Baz napeyive. Ew li dora xwe dinihêre, bi qasî çendekê li gund, li gundiyan, li der û dorên gund mêze dike û paşê destê xwe yê rastê hil dide û xaniyên gund nîşan dide.

Hingî agir dest pê dike. Hingî agir dibare. Leşker, bi destûra Baz, bi leza birûskê, dibin sê qor. Qorek, li meydanê, dor li gundiyan digire. Qorek li doralîyên gund çavnêriyê dike. Û qora sêyemîn dikeve hewşên xaniyan. Ev qora ku em ê bibêjin bi qasi sîh kesan e, bi çekên law, agir li malan dibarînin. Agir, gulok bi gulok, ji devê çekên wan ên mezin derdikeve û bi malan dikeve. Xanî, mal dişewitin. Derî, pencereyên xaniyan, banên wan ên bi ax û ka, axur û kadînen wan dest pê dikin û dişewitin.

"Mala minê", Kevok dibêje...

Hewş, hefşo dişewitin. Dar, ber, dahl, devî dişewitin. Giya, pûş dişewitin. Gund û doralîyên gund dibe bendera êgir. Di vî danê êvarê yê bihareke geş de dengê çekan hawîrdor vedigire. Teq û reqên çek û guleyan di zikê tebiyetê de olan didin. Olana dengê çek û guleyan di ser gund, dar, dahl, çem û zinaran re bilind dibe. Hemû berî bi dengê çekan tijî dibe. Hemû esman bi dûmana şewata xaniyan tijî dibe. Agir zêde dibe, xurttir dibe. Dû û dûnan bilindtir dibe. Reşahiyek bi ewran dikeve. Bêhna şewat û pîşoyê her derî difetisîne. Her der dişewite; darên spîndar û bî, deviyên boş ên kurt, gul û kulîlkên çarmedor dişewitin. Teyr û tûr didin perwazan û direvin. Lawir direvin. Seg, pisîk, ker, cahş, hesp, canû, pez, bizin, kahr, berx, dewar, mirîşk, dîk direvin. Bi tenê gundî nikarin birevin. Ew, welê, di navbera çembera êgir de, li şewata xaniyên xwe temaşe dikin.

"Mala minê", Kevok, dilşikestî, matbûyî, bi hêrs, bi kerb, dibêje...

"Mala minê", Çekdar, Rênas, şervanên din, bi kesereke kûr, dibejin...

Çend pîrejîn li kêleka koma gundiyan, li meydanê, xwe da-vejin erdê û dest bi qîrîn û hawarê dikin. "Ha ho!.. Ha ho!.." ew dibêjin. Dengê hahoya wan olan dide. Olana deng, bi dûzan, heta zinaran tê. Bi tenê haho tê bihîstin, ne gotinên din, lê bi tenê haho... Qîrîn, car bi car, bilind dibe, ji nişka ve tê birîn û careke din dest pê dike, bilind dibe. Qîrîn, qîrîna pîrejînan; dengê janê,

jana dil, jana gelekî bêpişt, jana salan, sed salan. Qîrîn, mîna ava lehî û çemên ku li tu bendan guhdarî nake. Qîrîn; dengê ketinê, şerpezetî û bindestiyê, dengê keser û xizînê. Qîrîn; olana hawareke bêhêvî. Hawar, hawar, qîrîn, stranek, strana mirinê. Strana şewat û windabûnê. Straneke sar, sawtijî. Strana Welatê Çiyan...

"Mala minê", Kevok, digirî û dibêje, "mala min, strana Welatê Çiyan, mala min..."

Rênasê ku di navbera Kevok û kumandar Çekdar de ye, ji hêsan, mûyên simbelên xwe dixwe. Bedena wî dilerize. "Çekdar, bira" Rênas dibêje, "rê bide, li ber çavên me gundekî dişewitînin, însanên me diperçiqînin. Rê bide, em hemûyan bikujin..."

Bi ser gotina Rênas, şervanên din jî piştgiriya wî dikin, "ew nikarin xelas bibin", dibêjin.

"Gelo em ê bikaribin hemûyan bikujin?" Çekdar, çavê wî, bi dûrbîne, li ser tevgera gund, dipirse, "bi derbeyekê wan bikujin û xwe bi lez vekişînin?.."

"Belê", Rênas dibêje, "meraq meke, heta helîkopter werin, em di nav çîyan de ne..."

"Lê em gelekî dûrî çîyan in?"

"Na, na, em xwe digihînin çîyan..."

"Hingî hazirî bikin. Baz... hedefa yekemîn Baz e. Kî dê lêxe?"

"Ez", Rênas dibêje, "ez ê bi guleyekê mêjiyê wî belav bikim." Şervan, bi lez, dest bi haziriya êrîşe dikin. Dido bi dido, sisê bi sisê, li der û dorên bilindahiyên giran, li cihen ku bi çeperan dişibin, rûdinin û lûleyên çekên xwe ber bi gund dikin.

"Li gundiyan hayîdar bin", Çekdar dibêje, "Baz, zabit, kamyon, leşker û gundiyan parêzger hedef in. Divê yek xelas nebe. Piştî berika Rênas, gulebaran bikin." Rênas simbelên xwe ba dide, çend caran tiliyên xwe digire û vedike, stûyê xwe diqirpîne, tivinga bi dûrbîn a sûlkastê ji hevalê kêleka xwe werdigire û li nîşanê rûdine. Ew bi dûrbînê rê li ber lûlê rast dike, çend caran bi dirêjî nefes digire û dide, pêçiya dirêj a destê wî yê rastê, hêdîka, dere ser lingê tivingê. Lê ew ling nakişîne, radiweste.

Baz xwe dilivîne. Ew dere nik zabitan û bi wan re dipeyive. Paşê ew, dîsan, ji zabitan hinekî bi dûr dikeve. Hingî Rênas, bêsebir, tafilê, pê li lingê tivingê dike. Hingî dengê teqîneke kûr û dirêj zora hemû dengên dibe. Lê berik li Baz nakeve. Çaxa Rênas pê li ling dike, Baz jî, xwarî erdê dibe û tiştêkî ji erdê radike. Bi teqînê re jî Baz xwe davêje erdê.

Rênas "heywax" dibêje û dîsan pê li ling dike. Baz, li erdê, xwe gêr dike. Bi teqîna tivinga Rênas re, dengê çekên şervanan qiyametê radike. Dengê roketavêj, mîtralyoz, keleşkov û tivingan der û dorên gundê ku jixwe dişewite, dike cehenem. Sê guleyên roketavêjan di zikê sê kamyonan de diteqin. Perçeyên kamyonan di hewa de difirin. Leşkerên şaşbûyî di bin barana gulan de, mîna pelên payizê, diweşin erdê. Herdu zabit jî di hêwirin erdê. Di bin gulebaranê de leşker nikarin dest bibin xwe. Gulebaranê bêrawest yekcar leşkerên şaşbûyî ji desthilanînê dixîne. Leşkerên ku dor li gund girtine, nizanin çi bikin. Pêşî ew ber bi xaniyan direvin. Ji ber şewata xaniyan, ew, dîsan, ber bi zeviyan direvin. Lê gule digihîjin wan. Leşker, yek bi yek, hêla dibin erdê. Bi tenê sisê ji wan digihîjin ser kaniyê û xwe davêjin paş kaniyê. Lê roketavêj der û dora kaniyê jî dikin cehenem.

Kevok, mîna ku ew ji xwe ve çûbe, bi keleşkova xwe ya kubî ku niha dibiriqe, gule dibarîne. Gava gulebaran dest pê dike, deng mîna dengê ewran bi guhê Kevokê tê. Ewrên ku gure gur dikin, ewrên ku dê bi ba û bahozê bibarin. Lê gava ew ketina leşkeran dibîne, hingî ew bîr bi dengên dibe, hingî ew dibîne ku deng, yê mirinê ye. Leşker, şaşbûyî, tarûmar, peregende, hewl didin, bi derna ve birevin. Lê ber bi kû? Ber bi xaniyan? Ber bi bostan û zeviyan, ber bi dar û dahlan? Her der dişewite. Leşker di nava hev de, bêtî ku bîr bi tiştêkî bibin, dilezînin, -heta ku berikekê yan jî çend berik di serî û bedenên wan de qulên xedar ên mirinê vekin. Kevok dibîne; leşker, heywan, gundî, bi qîrîn, dikevin. Hinên wan, piştî ketinê, dîsan, radibin ser piyan, dil dikin gav bavêjin, çend gav jî davêjin, lê bi teqîneke nû, dîsan

dikevin. Hinên wan jî, bi dengê teqînê re, mîna teyrekî, bi firê dikevin û paşe hêla dibin erdê. Dest, pî, mil, ling, serî, her yek bi derekî de difire. Û deng, dengên têkel, dengên gelekî ecêb jî wan bilind dibe. Kevok "mala min", dibêje û gule dibarîne. Hemû bedena wê di nav xwîdanê de, gewriya wê bi bêhna şewat û barûda şewitî, girî li ser çavan, "mala min" dibêje û kubiya ku niha germ bûye, diteqîne.

Heta kengî? Kes pê nizane. Lê bi dengekî Kevok, Rênas û yên din li xwe vardiqilin; "zû, mintiqê terk bikin... zû em mintiqê vala dikin. Zû kin, zû kin..."

Şervan, bi lez, xwe didin hev, çek, pûsad, çente û têkberên xwe berhev dikin û jî zinaran ber bi jêr dibin. Şervan, bi gavên revê, baz didin. Ber bi çem, ber bi çijan. Belavbûyî. Peregende, di navbera wan de mesafeyeke gelekî fireh. Kevok dide pey Rênas. Kevok dar, ber, kevir, xîç, çal, kort dide ber xwe û direve. Keleşkova ku agir dibarand di destê wê de, beden, serî û gewriya wê bi tayek nediyar ketî, ew dilezîne û "mala min" dibêje. Mala min, di vî danê êvarê de mirin, şewat, barûd, berik, windabûn. Hesret, keser, tirs û xwîn. Daxwaz, best, kîn û nefret, mala min, kîn û nefret, rehên vî welatê bêçare, bêkes, vî welatê bêyom ê mirinê... Bireve, bilezîne... rev, lez, bez... qedera vî welatê xwînî. Dû û dûmana êgir li pey, ewr û tîrêjên ronî li pêş, bireve, Kevok, bireve. Ka teyr, ka aramî, ka hizûr? Bilezîne, Kevok, bilezîne. Û ew stran, strana mirinê, strana şewatê, mala min. Rûyê wan, rûyê însanên ketî, bêçare, bêgav. Rûyê însanên ku dimirin, mala min, rûyê însanên ku di nav xwînê de digevizin, mala min... Ka hêvî, ka ronahî? mala min...

"Kevok bilezîne", Rênas vedigere û diqîre ser Kevokê.

Kevok dilezîne. Lê deng tên. Ji ewran, ji esmanan. Kevok dilezîne. Lê deng ji Kevokê bileztir in.

"Kevok bilezîne, helîkopter tên..."

Deng tên. Helîkopter tên. Dengêki tîz mîna fitikê tê. Bi dû dengê fitikê re dengê teqînekê tê. Kevok direve.

"Kevok, çaxa dengê fîtikê tê xwe xwarî erdê bike..."

Dengê fîtikê cardin tê. Kevok xwe davêje erdê. Teqîneke bêpayan tê pê. Kevok, ji erdê, li dora xwe dinihêre. Bi qasî sed, sed û pêncî mîtro jê bi dûr, dûmaneke gur ji erdê radibe. Kevok ji erdê radibe û direve. Dengê fîtikê dîsan tê. Îcar pêl bi pêl, raste rast ber bi Kevokê. Kevok xwe, dîsan, davêje erdê. Teqîn. Kevok diji? Kevok çi hîs dike? Kevok xwe dilivîne. Na, tiştek pê nebûye. Ew li cihê ku dûman jê radibe, dinihêre. Du, sê şervan li erdê ne. Yek ji wan, dengê keçikekê ye, diqîre, "lingê min, lingên min" dibêje... Kevok çi bike? ber bi şervanan here? Di cih de razayî bimîne? Rabe û bireve? Ew nizane, hîç nizane. Lê ji nişka ve, ew dîsan radibe ser piyan û direve. Dengên têkel ên fîtikan, ji nêz û dûr, xurt û sivik, her tên. Ji teqîn û dûmanê êdî kes kesî nabîne. Lê Kevok diji, tiştek pê nebûye. Kevok dikene, "tiştek bi min nebûye" dibêje. Na ew nabêje, diqîre, tiştek bi min nebûye. Dîsan dengê fîtikê, lê îcar gelekî ji nêzîk, pêl bi pêl, tê. Kevok dikeve erdê. Dengê teqîn û hilweşînekê ji pey Kevokê tê. Hinekî dûrî Kevokê dareke gewdefireh dişewite. Bêhneke giran a şewat û barûdê bi difnên Kevokê dikeve. Ew li pêşiya xwe dinihêre. Çem ne dûr e, eger ew bikaribe carek, du carên din jî bireve, ew ê xwe bi çem bigihîne. Hin hevalên wê gihîştine qiraxên çem. Ew ê jî bigihê. Ew radibe ser piyan û bi hemû quweta xwe baz dide. Mîna xezalekê. Mîna teyrekî difirim, Kevok, bi kêfxweşi difikire. Rev, firîn û dîsan dengê fîtikê. Niha ewçend ji nêzîk, ewçend bi quwet.

Bi vî dengê dawîn Kevok hew radibe. Mîna ku yekî destê xwe xistibe hundirê wê û hemû hêz û quweta wê jê standibe, welê, Kevok bêteqet dikeve. Bêhna wê jî hinekî diçike. Gelo ew birîndar bû? Êşekê, bi tenê êşeke zirav di kêleka wê de heye. Gelo ev êşa birînê ye, êşa ketin û rabûnê ye? Germahiyek bi ser wê de tê. Germahiyek jê dere. Xwîdan? Xwîn? Kevok destê xwe davêje navtenga xwe, cihê ku êş jê dertê. Destê wê şil dibe. Xwîdan? Na, xwîn. Destê Kevokê di nav xwînê de dimîne. Xwîn. Li ser axa reş, na, ne axa reş, axa hêşîn xwîn. Xwîneke tîr û sor, hinekî tarî.

Kevok dikene, ez birîndar im, dibêje. Ji êşa zirav pê ve dereke wê jan nake. Ew xwe dilivîne, ling, dest, serî, bedena wê dilive. Hişê wê li cih e. Kevok dikene. Ax, axa reş a Welatê Çiyan. Axa kevnare, axa qedîm. Axa şer û pevçûnan. Axa axîn û gaziyan. Axa strana mirinê, gotinên keserê. Kevok niha pê dihesê; Kevok westiyayî ye. Axa westiyayî, axa mûsîbet. Axa bi xwînê avdayî. Axa xewnan, axa tarî... Ewr, esman û ax û li ser axê Kevok û xwîn. Xwîna Kevokê.

Paşê dinya tarî dibe. Tîn û ronahî, taqet û hêz ji Kevokê bi dûr dikevin. Dengên fîtike, qîrîn û çekan ji jê bi dûr dikevin. Bêdengî tê. Şev tê. Aramî perda xwe dikişîne. Bêdengiya tarî tê û Kevokê hembêz dike. Dinya dikeve nav bêdengiyeke kûr. Tarîti hawîrdor vedigire. Ji bêdengî û tarîtiyê pê ve êdî tu tişt nîn e.

Kevok di nav bêdengî û tarîtiyê de winda dibe.

11. Tirs

Baz û Kevok.

Hevdîtina wan a ecêb a li gundê ku dişewitî. Di nav agir û şer de. Yekem car, –eger em cara pêşîn a koç û zayinê ya berî umrekî nehesibîn.

Û çemên Welatê Çiyan. Çemê Rojhilatê û Çemê Rojava. Çemên ku di zikê çiyan de dizên û ber bi jêr, ber bi av û deryayên nenas diherikin. Bi çîv, bi fetloke. Nazenîn. Har. Carina aram, carina boş. Çemên ku wext û heyaman, dewr û dewranan didin ber xwe û diherikin.

Çemê Rojhilat û Çemê Rojava; çemên ku di beriyeke bêserî û zer de digihên hevûdu, dibin yek û bi hev re diherikin deryayên dûr û di zikê deryan de winda dibin.

Niha, di vê gava nû ya serpêhatiya Baz û Kevokê de, heyameke nû dest pê dike. Heyamek ji heyamên bêhejmar, bedawîn ên çeman. Wext, bi dû ketina Kevokê re du meh e. Cih, ew garnîzona leşkerî ye ku Baz mîna meqer bi kar tîne. Ew garnîzona leşkerî ku em, di beşên bihurî yên romanê de, tevi Baz, tê de bûn.

Niha em, dîsan, li wê garnîzonê ne. Li zêrzmînên garnîzonê, cihê zîndan û îşkencexanan. Garnîzon neguheriye, her mîna xwe ye. Lê insanek tê de zêde bûye; Kevok. Kevok niha li garnîzonê ye.

Kevok li garnîzonê girtî ye.

Kevok li garnîzonê, di odeyeke biçûk û tarî de hepis e.

Kevok li garnîzonê, di odeyeke biçûk û tarî, li zîndaneke genî, di bin îşkencê de ye. Îro roja dawîn a Kevokê ye. Eger Kevok îro

nepeyive, li xwe mîkur neyê û nebe hevala leşkeran, Kevok ê were kuştin. Jê re weha hatiye gotin.

Em niha li nik Kevokê ne, li oda teng û tarî ku Kevok tê de ye. Ode vala û tazî ye, tê de ji textekî razanê yê hişk û xwaro-marî û li ser jî doşegeka pûş a bi xwîn û xwîdanê gemarî pê ve tu tişt nîn e. Bêhn ji oda Kevokê tê, bêhneke giran a xwîn, mîz, xwîdan û hilmê. Kevok pê nizane, lê ev bûye bi qasî du mehan ku ew li vê odê ye. Ji roja ku leşkeran ew, birîndar, xewirî, di nav xwînê de, ji qiraxên çem hîlanîn û vir ve, Kevok li vê oda tarî ye. Oda Kevokê, warê wê yê nû; bişîşkan Kevok li vir derman kirin. Ew li vir li jîyanê vegeriya, wê li vir çavên xwe vekirin û fam kir ku ew hê dijî. Li vir wê axîn kişand û got, "xwezî ez bimirama û neketima destên van." Birîna wê ya kûr û xedar a navtengê li vir qamûş girêda û hêdi hêdî cebirî. Wê, li vir, piştî ku ew hinekî sax bû, îşkenceyên bêhed û bêhesab ku ne hewce ye em niha çêla wan bikin, dîtî. Oda Kevokê ya genî, ya binê erdê yê garnîzonê, oda ku tu carî ronahî nabîne, tu carî hewa paqij nastîne. Oda ku jê bêhna kîn û nefretê, mirin û kuştinê tê. Oda ku bi tenê gava zabit û leşker tên, ronî dibe. Oda ku bi tenê tirs, xof û sawê vediguhezîne, ku ji tirsê hatiye pê û ji bo tirsê ye. Oda ku girtiyan, hêdî hêdî, diqulipîne ser heywanan, ser lawirekî tirsîyayî. Oda Kevokê; pêşî salên xwendinê yên bajarê mezin, paşê wext û demên azadiya serê çiyayên bilind û niha jî ev oda hanê ya teng, ya bêgav. Oda Kevokê; dîwar, bi tenê dîwar. Dîwarên ku ji kevîrên reş ên fireh û çimentoyê lêbûne. Dîwarên ku deng difetisîne, pêjnan dixeniqîne, dîtîne kor dike. Li pey van dîwaran çi heye, kî heye, çi wext e? Ronî ye, tarî ye? Kevok pê nizane. Lê bi tenê ji pişt dîwaran deng tê, dengê qîrîn, qîjîn û lêdanê. Dengên ku dengan, pêjnan, hisan dikuje. Dîwar; nobedarên ketin û jibîrkirinê. Dîwarên ker-kor-lalbûnê. Dîwarên genî û kufikî ku bi saw diqîrîn. Dîwarên ku hertim, her gav, her deqe, her saniye diqîrîn; girtî, tu bêgav î, tu dê bikevî, tu dê wînda bibî, tu dê bitirsî, tu dê serî deynî, girtî, tu dê tu nebî, tu dê dîlê/a mîn û

me bibî, ez û em ê xwediyên te bin, tu dê bi tenê destê xwe bidî min û me, bi tenê min û me mist bidî... ez, em, bi tenê ez û em, bêyî min û me hîç kesekî din nîn e... Dîwarên ku diqîrin, dîwarên jiyana nû ya Kevokê û hîsên wê yên ev du mehên dawîn; ketin û hilweşîn, têkçûn û windabûn.

Îşkence û lêdanên ku Kevokê dîtine? Kitekit ne hewce ye, lê îşkence û lêdanên herî xirab, herî xedar ku însanekî dikare bifiki-re. Her celeb, her texlît û hertim ji bo ku girtî bikeve, hilbiweşe, winda bibe, riswa bibe...

Kevok niha diheje, ditirse. Kevok birîndar û nexweş e. Kevok ketî ye; birîndar ketiye, sil ketiye, dîl ketiye. Stûyê wê, bazindên destên wê, lingên wê reş bûne. Neynikên dest û lingan reş bûne. Lêv terikî ne, qelişî ne. Bedena wê ya nîvtazî westiyayî ye. Hemû bedena wê jan dike. Hemû bedena wê gemarî bûye. Çil-ka hîseke xweşî û bêhnfirehiyê di bedena wê de nemaye. Çavên Kevokê girtî ne. Du leşkerên nobedar, berî niha bi çendekê, hatine û çavên wê bi destmalekê girêdane. Keçikeke ciwan û bedew, bedeneke ciwan û bedew, çavgirtî, dîlketî, di zîndanên de, di destên serhengên zîndanên de. Li dora Kevokê niha çar kes hene. Piştî ku nobedar ji odê derketine û çûne, ev çar zabit hatine. Çar zabitên îşkencehez, îşkencexwaz. Çar zabitên Welatê Mezin, welatê General Serdar ku bi şixulê xwe dizanin, ku pisporê lêdan, tirsandin û îşkencê ne. Sê zabit û serekê wan.

Serekê wan; Baz... belê, Baz ê ku em dinasin...

Baz û zabitên din, li pê, li Kevoka nîvtazî dinihêrin. Li ser Kevokê kirasekî tenik ku lîme lîme bûye, heye. Pêşîreke Kevokê heta nîvî li der e. Mil û piyê wê, hêt û çîpên wê tazî ne. Mûyên pî, mil, çeng û çîpên wê dirêj bûne. Kevok; beden tazî, çav girtî. Zabit Kevokê, niha, di bin ronahiyeke xurt a lampayekê de, bi kite kit, dibînin. Lê Kevok wan nabîne. Destmala ku li ser çavên wê hatiye rakêşandin, wê hîn bêhtir tazî dike. Ew xwe hîn bêhtir tazî hîs dike. Belê Kevok ketî ye. Dîlbûnê, bêgavî û bêçaretîyê, jan û êşê Kevok xistiye. Kevok, bêhêvî, tirsîyayî, teslîmbûyî,

li ser kursiyeye textîn rûniştiye û li dengan guhdarî dike. Çav nabînin, lê guh dibihîsin. Niha guh in, dema guhan e. Ji van tecrubeyên du mehan Kevok pê dihesse ku kesên ku hatine hundir, çar in. Kevok pê dihesse; ev çar kesên ku niha ketine hundir, ne leşker in. Ev zabit in. Kevok fam dike; wexta biryarê, biryara man û nemanê hatiye.

Kevokê biryara xwe daye, ew ê bimire, belê, bimire û xelas bibe. Jixwe Kevoka berê, ji jiyana Kevokê ya bihurî tu tişt nemaye. Kevok êdî ne tu tişt e, hew berxika diya xwe, kevoka gundê zarakatiya xwe, nazenîna bajarê mezin a Welatê Çiyan, delaliya Jîrê windabûyî, kevoka çiyayên bilind e. Jixwe tu pêwendiya Kevokê bi cîhan û jiyana re nemaye, kes êdî bi hebûna wê, jiyana wê ya vê derê nizane. Jixwe her rojeke wê ya vê zîndanê mirin e û ew her roj, gav bi gav, dimire. Hingî mirina rastîn ji vê jiyana jixwe mirî çêtir e. Hingî mirin xelasî ye, rizgarî ye.

"Kevok", yek ji zabitan nêzîkî lê dike, tê, li ber serê wê disekine û bi zimanê resmî yê dewletê dibêje, "navekî xweş... Kevok, teyrê bedew, çivîka nazenîn, lê terorîst, serhildêr, keleş... Kevok û kirinên wê... xirakirin, hilweşandin, kuştin, mêrkujî... Te çend leşker kuştin, Kevok?.. Kevok napeyive. Kevok nasitrê... Wext hat Kevok. Tu, bi xwe, biryara xwe bide. Du rê li ber te hene; tu dê bipeyivî, alîkariya me bikî û bijî. Yan jî tu dê nepeyivî, alîkarî nekî û bimirî... Îro, roja te ya dawîn a vê derê ye. Du riyên vê roja dawîn hene; riya mirinê û riya mayinê. Biryara xwe bide..."

"Na", Kevok, hêdî hêdî serê xwe radike, lêvên xwe yên zuwa û terikî bi zimanê xwe şil dike û bi zimanê zabit dibêje, "tiştê ku ez bipeyivim nîn e. Min nû dest pê kiribû, ez nû ketibûm qada şer. Ez bi tişteyê nizamim... min bikujîn..."

Dengê Kevokê dilerize. Rûyê wê vedikişê. Destên wê yên ku li ser çogên wê ne, dihejin. Mîna ku ew bi tayê ketibe, bedena wê, carina, diricife.

"Me li van gotinan guhdarî kirine. Dev ji van gotinan berde, rastiye bipeyive û meqer û kozikên serhildêran nîşanî me bide",

zabitekî din, bi dengekî hinekî hêrîstir, dibêje, "tu kes bi hebûna te nizane. Tu mirî yî. Eger tu alîkarî nekî, tu dê bimirî, bimirî..."

"Min bikujîn, daxwaza min ev e, min bikujîn..." Kevok rûyê xwe li gora dengên dizîvirîne û dibêje, "min..." Lê ew nikare bîdomîne. Kela giriyê, yan jî tirsek, hêrsek, yan jî kerbekê gewriya wê tijî dike. Dengê wê tê birîn. Deng ji devê wê dernakeve, lê di mêjî de olan dide; ez dixwazim bigirîm, kela giriyê... bihêle Kevok, bihêle, bila hêsir biherikin, bila hêsir tirsî te birevînîn, bila giraniya tirsî rojan, heftan, mehan ji te bi dûr kevin, bihêle, bila hêstir mîna pilpilingan sivik, tenik, zelal, fireh, gêr bibin, bila hêsir tariya tirsî biqulibînîn ser şewqê... Deng olan dide; serê min diêşe, mêjiyê min, ruhê min, bedena min diêşe. Dev ji min berdin, min bikujîn... Hûn ji min çî dixwazin!.. Ez hêstîra Xwedê, bextreşa Xwedê. Ez ketime, ez birîndar im, ez mirime... hûn ji min çî dixwazin! Dadê, ez ketime bextê te Dadê, were, were hawara min... Dadê, ev ji min çî dixwazin! Ne şev e, ne roj e, Dadê, ez ketime binê bîreke kûr, jê derketin nûn e. Dadê sar e, dinya sar e, jîyan sar e, ev ên hanê sar in, ev zîndan sar e, dil sar e, beden sar e... Her tişt sar e, Dadê li Kevoka te sar e, min germ bike. Dadê, min hilde û bibe yan ji van re bibêje, bila ew min hildin û bibin, bila min bikujîn... ez mirinê dixwazim, bi tenê mirinê, ne tiştê din...

"Bişeyve, Kevok, tiştê bibêje."

"Ez... çî... " Kevok nikare bişeyve. Ew digirî. Pêşî hêdîka, paşê bi deng. Bi qasî çendekê.

Zabit dengê xwe nakin, bi sikûnet li giriyê wê guhdarî dikin.

Paşê, piştî bîskê, destekî, hêdîka, bi milê wê yê rastê digire. Kevok vedicîniqê û diqîre. Dest, hêdîka, vedikêşe.

"Keça min", niha, dengê nû ku Kevokê hîç nebihîstîye, dişeyve. "Keça min", dengê xwediyê dest dibêje, mîna ku bilorîne. Dengê sakîn, nerm, giran, zelal.

Dengê Baz...

Baz, li paş Kevokê, li pê, disekine û gelekî sakîn "keça min, metirse..." dibêje, "niha baş li min guhdarî bike. Tu divê alîka-

riya me bikî. Ma te ne guneh e? Di vê ciwaniya xwe de tu ketiyî ser van riyên şaş. Li gora ku tê gotin, tu keçikeke xwende yî, bavê te awukat, malbata te nas e. Bipeyive, tiştên ku tu dizanî, bibêje. Bi tenê hewqas, ne zêdeyê wê. Bi tenê bipeyive. Hingî tu dê biî, hingî tu dê dîsan vegerîjyanê..."

"Ez çi bipeyivim? Ez bi çi dizanim?"

"Li xwe mîkur were, li xirabiyên ku tu bûyî şîrk, li fikrên şaş ku tu pê xapiyayî... Bipeyive, bibêje ku dewlet yek e, mîlet yek e, serek yek e, ala yek e, Xweda yek e, bibêje ku te şaşî kiriye, bibêje ku tu ji riya rast, riya evîn, biratî, wekhevî, xweşî, rindî, selametiye derketiyî û ketiyî ser riya şaş a xirakirin, hilweşandin, perçiqandin, perçekirin, şewitandin û kuştinê, bibêje ka ew li kû ne?.."

"Ez nizanim, me neşewitandiye, me nekuştîye..."

"Keça min, ma te hê fam nekiriye ku em û hûn nûn e, bi tenê em û yê me heye. Bi tenê em û yê me, welatê me, ala me, serekê me, ordiya me, dewleta me, mîletê me, namûs û heysiyeta me, hebûn û yekîtiya me, yê me, bi tenê em û yê me... Keça min, tu dê niha bipeyivî?"

"Ez bi tişteki nizanim..."

"Hingî dirêj mekin" Baz, dîsan, sakîn, dibêje, "vê umrê xwe temam kiriye, ji odê derxin..."

Ecêb e, lê ev gotinên ku fermana Kevokê radike, rehetiyekê direşîne ser dilê Kevokê. Heta meriv dikare bibêje, Kevok bi gotinan kêfxweş dibe, dilê wê hinekî fireh dibe. Du zabit, her yek ji aliyekî, bi milên Kevokê digirin, wê radikin û ji derî derdixin. Ew Kevoka ku nikare baş bimeşe, di navbera xwe de dikişînin. Ew derin, bi qasî çendekê, ew raste rast derin. Paşê ew ji derencena ber bi jor dibin, paşê dîsan rast derin û bi dû demekê re, ew derdikevin derve.

Bayekî hênîk û paqij rûyê Kevokê difirkîne. Kevok kêfxweş e. Wê bêhn û hilma genî li pey xwe hîştîye, zîndana tarî, lêdan û îşkencê li pey hîştîye, êdî kes ê nikaribe Kevokê ewçend ketî,

ewçend tazî, ewçend tirsıyayî bibîne, kesê şopên birîn, xwîn, lêdan û îşkencê yên bedena wê nebîne. Kevok ê, êdî, xwe ewçend gemarî, qirêjbûyî, hîs neke. Xelas, her tişt êdî xelas. Jiyan weha ye, evçend e; hîsdar, bihîstiyar, nekemilî, biserneketî, şikestî û mirazqurmiçî. Jiyan weha ye; hêvî bi ser nakevin, însan bêtaqet dikeve, bêgav dimîne, bêhêvî dere, lê kêfxweş, rehet, heyret, lê belê kêfxweş... Kevokê nedixwest weha be, lê jiyan weha ye. Kevok, bi dev û difin, nefes dikişîne, hewa paqij ku wê ewçend bêrî kiribû, dikişîne hundirê xwe. Gelo niha roj e, şev e? Ew li kû ne? Cara dawîn, gava wê tebiyet bi çavan dîtibû, bihar bû, dinya hişyar dibû. Niha? Havîn? Payiz? Kevok, niha qapûtek li ser milê wê, li pê, radiweste, lingên xwe, lingên ku hema çî bigire hîç nelebitîne, dilivîne. Dinya sayî ye, ne baran, ne berf, ne jî tîneke germ a tavê heye. Bi tenê bayekî sivik ê hênîk di nav porê kurtqusiyayî û gemarî yên Kevokê de xwe dilivîne. Kevok hinekî diricife. Sar e? Yan tirs e, tirs a dil? Yan nezanî ye, nezaniya vê gavê?

"Jîpê bînin ber derî..." Ew dengê nerm dipeyive, lê niha hinekî sar û esebî.

Piştî kêliyekê deng tên. Pêşî dengê motora erebeyekê, paşê dengê jîpekê û piştê jî dengê zabitan. Hin kes derin û tên, dipeyivin, tiştina dibêjin. Seg diewitin. Hespek, du hesp dihîrin. Li pey deriyan yan jî dîwaran hin dengên têkel, qalind, zirav, tevlihev, dengên însanan tên. Carina deng radiwestin, carina, dîsan, bilind dibin. Ew kî ne? Deng çî ne? Lê guhê Kevokê ne li ser deng a. Ne xema Kevokê ye êdî. Kevok xelas dibe, ji her tiştî, ji her dengî...

"Siwar bin, em ê herin", dîsan, ew dengê hanê dibêje. Dîsan herdu zabit bi milê Kevokê digirin û wê dixin nava jîpê û her yek li milekî wê rûdine. Jîp bi rê dikeve, hêdî hêdî.

Xwezî wan niha çavên Kevokê vekirina û Kevokê bika-ribûya, di darê dinyê de, careke din, dinya, bi çavên vekirî, bidîta. Gelo ew ji wan tika bike? Na, ew ê tika neke, tu tiştî ji wan

nexwaze. Ew, ew in. Kevok jî Kevok. Hewqas!.. Niha êdî jiyana wê ber bi windabûnê dere. Jiyana wê, niha, di vê dema kambax de, di destê wan de ye. Hewqas! Ne xem e, bila weha be. Jiyana Kevokê ya bêdeng, ya şikestî. Êdî ne hêvî, ne daxwaz, ne jî miraz mane. Êdî tiştekî ku aîdê Kevokê ye, nemaye. Niha bi tenê ev zabit, ev jîp, ev çûyin û ev bayê hênîk û sivik ê hanê heye. Ne xem e. Kevokê dil kir ku bi ser keve, jîyanê bineqîşîne, xwestir bike, binivîse, bixwîne, hez bike, ji kaniya evînê vexwe. Belê wê dil kir, lê nebû. Ne xem e, êdî ne xem e. Wê xwest... ew roj û şevên wê yên xwendina bajarê mezin, paytextê General Serdar, serdarê van zabitan. Her rojek, her şevek bêpayan xweş, bedew, spehî. Bi coş, bi heyecan... Ew xwendin, ew munaqêşe, ew hêvî û daxwazên nûbişkivî, zelal, ew bedenên şil ên piştî hezkirinê, ew meşên di bin barana xunavê û tava havînê de, ew tilî û pêçiyên ku li ser bedenên digeriyan, nemaze ew daxwaz, ew xwestekên hanê... Belê, Kevokê xwest, dil kir... Xwezî niha Jîr jî li vir, li nîk wê bûya. Xwezî niha ew herdu bi hev re bimirana û wan bi hev re serê xwe daniya ser axa sar. Ne weha ji hev dûr, her yek li milekî çiyayên Welatê Çîyan. Ma qewlê wan jî ne weha bû, ma di berf û baranê de, di sar û sermê, tîn û germê de, ew ê bi hev re nebûna? Lê nebû. Belê, dilê Kevokê bi şîn e, şîne konê xwe di dilê wê de vegirtiye. Xwezî ew weha bi dilbirîni neçûya, weha ji taqetê ketî, şikestî, birîndar neçûya. Xwezî wê ew şewat, gund, mirin û kuştin, hawar û qîrîn nedîtibûya, nebûya şahidê hilweşîna dar, mal, xanî û însanan. Xwezî ew nebûya qurban, nebûya celad. Lê nebû, lê êdî ne xem e.

Wê xwest, wê dil kir. Wê, bi qasî hêz û quweta xwe, li dijî şer, şer kir. Lê şer zora wê bir. Belê, ew niha pê dizane; ne gotin û bawerî, ne daxwaz û hest, ne dua û niyaz dikarin rê li şer bigirin. Şer, qayideyên şer; çek, pûsad, gule, berik, serhildêr, leşker, kemîn, kozik, êrîş, nobet, hêz û quwet. Û ketin û hilweşîna însanan, yek bi yek, kom bi kom, bênav, bêgor, bêkes, bêşîn, bêtaziye. Û rondikên çavan li pey hilweşiyayîyan, hîsên tolê. Û keser

û kesera ku diqulipe ser daxwaza tolhildanê û dîsan lêdan, kuştin, hilweşîn... şer, belê, şer. Xwezî weha nebûya. Xwezî Kevokê bikaribûya rê lê bigirta. Lê nebû. Lê Kevok niha mesûd e, belê, mesûd. Kenek li ser rûyê wê, çavgirtî, hişê wê li dereke din, di nav zabitan de, ew dere.

"Keça min", ev dengê nerm, dîsan, ji aliyê pêş ê jîpê dibêje, "tu dê bipeyivî?"

Kevok, bi deng, li xwe werdiqile. Bersivek divê, lê çi? Hîç, hîç tiştêk. Kevok divê ji mirinê rû banede. Kevok, Kevok difikire, li xwe lava dike, Kevok, ey heyran, ezbenî, xwe sil meke Kevok. "Tiştê ku ez bipeyivim nîn e", Kevok, bi tilî û pêçiyên xwe dilîze û dibêje.

"Baş e, keça min, hingî em li ser riya rast in, tu dê bimirî..."

Deng, ewçend nerm û sakîn e, mîna ku deng dilorîne, mîna ku ew behsa mirin û kuştinê nake, lê jê re çîrokek ji Hezar û Şevêkê dibêje.

Ew derin. Heta kengî, heta kû, Kevok hew pê dizane, hew xema wê ye.

Lê em ê bibêjin, piştî saetekê jîp disekine û hemû, yek bi yek peya dibin. Kevok jî, bi alîkariya zabitan peya dibe. Hewa hinekî sar e. Ji dûr ve deng tên. Tiştê yekemîn ku Kevok hîs dike, bêhna pûş û giya ye. Ji hawîrdor bêhna tebiyetê difûre. Kevok dest, mil û lingên xwe dilivîne. Dest, mil, pî û ling niha azad in. Lê ne çav. Gelo ew rahêje destmalê û wê ji ser çavên xwe bikêşîne? Yan jî ew ji wan rîca bike? Na, ne ew, ne jî ya din. Ne xem e, êdî... Ling û beden li dora wê derin û tên. Xwediyê ling û bedenê çend kes in? Ew ê çi bikin, wê çawan bikujîn? Ne xem e. Kevok, hinekî, dikene. Lêvên wê yên dirêj û fireh, hinekî vedibin. Lêvên wê; mîna keskesorekê xwar, terikî, qelişî, lê nerm, fireh, jîndar. Lêvên wê; hem şox mîna lêvên jîneke heweskar, hem masûm mîna lêvên zarokekê. Kevok; tevî şer, birîn, lêdan û girtîbûnê xweşik, bedew. Porkurt, bejndirêj, zirav, nav teng, ling, çîp dirêj, zarîf. Kevok; rûyê ku niha dibiriqe, zirav, narîn û hinekî dirêj,

bêvil û lêvên lihevhatî. Kevok; bedeneke ciwan mîna şitil, hêtên vekîşiyayî, pêşîrên hinekî stûr, lê bêpayan xweşik.

"Çavên wê vekin", dengê nerm, yanî Baz dibêje.

Yek ji zabitên ku li dora Kevokê ne, di paş re destmala ku qehîm şidiyayî ye, vedike. Çavên Kevokê vedibin. Bi qasî kêliyêkê Kevok, çavgirtî, radiweste, paşê çavên xwe hêdîka vedike, çend caran diqirpîne û li dora xwe dinihêre. Dinya tarî ye. Na, ne tarî ye, lê êvar e, yan jî şev e. Lê hawîrdor ecêb ronî ye, mîna rojê. Pêşî Kevok, bi leza birûskê li kesên dora xwe dinihêre. Çar kes in, dudo di nav cil û bergên resmî yên zabitan, dudo jî sivîl. Paşê ew serê xwe ber bi jor dike û li esmanan, li stêr û heyvê dinihêre. Stêr diçirsin, heyv dikene. Kevok dikene, lêvên wê, bêsemt, vedibin û ew dikene. Evçend stêr û evçend nêz. Kevok destê xwe yê rastê hildide û mîna ku ew stêrekê bigire, kevanek li hewa tîne pê. Heyv, evçend ronî. Heyveron, mîna sêniyeke zêrîn. Şeveke nerm, narîn. Hinekî ba. Bayekî sivik ku hêdîka xwe dilivîne, mîna ku ew stranekê binehwirîne. Û di bilindahiyên şeva narîn de heyv, li jor, li herî jor hilawestî. Bêdeng. Ewçend dûr, ewçend nêzîk. Heyv... dinya di cumbuşa ronahiya heyvê de. Kevok dikene. Li vî bextê çê binihêre", Kevok, çav bêrawest li ser stêr û heyvê, difikire, ez ê di vê şeva bêpayan bedew de bimrim... Heyv, heyva nazenîn, heyva gundê zarokatiya min, ji-yana min a zarokatiyê. Çawan min destê xwe li ba dikir, çawan min dixwest, ez xwe bi te bigihînim, bi coş, bi kel, bi te re yek bim. Heyv, îşev ez bi te re dibim yek. Heyv, tu dibî kefenê min.

Kevok li dora xwe dinihêre. Hawîrdor bêdeng e. Gelekî dûrî wan, li milê jêr, bajarekî di nav ronahiya lampan de dixuye. Li milê jor jî reşahiyên hin xanî û avahiyên dixuyin. Li wî milî hin reşahiyên din jî ku bi tankan dişibin, dixuyin. Tank, lûleyên dirêj ên tankan. Yek, dudo, pênc, deh? Bîst? Çil, pêncî? Kî dizane. Dîsan tirsek bi ser Kevokê de tê. Hingê Kevok li kesên dora xwe vedigere. Hemû zabit, li dora wê rawestiyane, bêdeng, lê dinihêrin. Kevok jî, yek bi yek, li wan dinihêre. Yek, dudo, sisê

û kesê çaran ku hinekî ji yên din bi dûr rawestiyaye. Kesê çaran! Çavên Kevokê, dîsan, vedigerin ser kesê çaran, ser çavên kesê çaran. Ew? Baz? Navê efsanewî, kumandarê navdar, mêrkujê bixof? Ev kes, ew e? Kevok vediciniqe, hinekî ber bi paş dere û bi bal û dîqet li kesê çaran dinihêre.

"Belê" Baz, bi dengê henekî, dibêje, "ez bawer im, te ez nasîm. Belê, texmîna te rast e. Belê, ez jî li wî gundî bûm, leşkerên min, zabitên min, gundiyên min hatin kuştin. Du zabitên min li ber lingên min ketin, xwîna wan pişkiya ser min, cil û berg û rûyê min. Tu dizanî ka tahma xwînê çawan e? Ez bi tesadufî xelas bûm. Ji we, ji guleyên we. Ez ji mirinê xelas bûm, lê tu xelas nebûyî... Lê belê, hê jî riya xelasiyê li ber te ye, bifikire..."

Kevok, matbûyî, li Baz dinihêre. Ev dengê nerm û ev mêrkujê hanê, xwediyê vî dengî. Ecêb. Nermahiya deng, mîna ku keserek, xizînek tê de veşartiyê û ev canî, mêrkuj, xwînrij. Hukimdarê xwînê, kumandarê ku hukimdariya xwe, hêza xwe bi xwînê ava kiriye û bi xwînê nîşan dide. Kesê ku bi xwînê dijî, jiyana wî bûye xwîn, xwe bi xwînê îspat dike. Ew dikene, Baz dikene! Ew li Kevokê dinihêre û dikene. Kevok ditirse. Kenê Baz mîna tîrekê dilê wê hindigivîne. Kevok, welê rawestiyayî, mîna ku cin dîtibe, mîna ku şeytanqûnî bûbe, li Baz dinihêre.

"Tu çi dibêjî?" Baz, gavekî ber bi Kevokê davêje û dipirse. Kevok bi paş ve dere. Baz lê dinihêre, kûr, baldar, lê bi awireke nerm. Bejna Baz dirêj e, hinekî bi ser bejna Kevokê dikeve. Baz tê nik Kevokê û destê xwe yê rastê davêje ser milê wê yê çepê. Bêhneke tîrşokî bi difnên Kevokê dikeve. Û germahiyek. Germahiyê ecêb ku Kevok jê tiştekî fam nake, vediguheze rû û bedena Kevokê. Ev nefret e, Kevok difikire, ev germahî divê nefret be. Ev rû, ev însan bi tenê dikare nefretê bîne pê, belê bi tenê kîn û nefretê... Lê ev awirê nerm, dengê nerm? Ev çavên biçûk ku bi ronahiya stêr û heyvê, bi ken dibiriqin?

Baz û Kevok. Baz; teyrê nêçîrê. Kevok; çivîka nêçîrê. Baz; leşkerê dewlet, welat, ala û serekê dewletê; parêzger û çavnêrê

dîsîplîn, nîzam, pergal û dûzanê; xwedî hedef û armanc, mewkî û cih. Baz; her tişt ji bo wî û dewleta wî, serek û mewkiya wî; her tişt ji bo dîsîplîn û qayideyên wî. Kevok, herçî Kevok e; li pey azadiyan, li pey fikr û pêlên nû, ji disîplîn, pergal û nîzaman dûr, ji wan azad; çavên wê li guherîn û pêşketinê... Baz û Kevok, niha li hember hevdu. Çav li çav. Çav bi çav. Yek serdest, hakim, ya din bindest, ketî. Lê çav li hev dinihêrin. Nêrîna çavan; raste rast, ji hemû kesp û kospan dûr, diyar, sade, tazî. Nêrîna çavan; tevî xwîn û nefretê, hilweşîn û kînê, germahî..

"Keça min, tu çi dibêji?" Baz, dîsan, gelekî nerm, melûl, li kêleka wê rawestiyayî, dipirse.

"Ez hîç tiştekî nabêjim, min bikujin..."

"Baş e, hingî tiştekî ku ez bikaribim bikim, nûn e. Baş e, wê bikujin..."

Kevok çavên xwe digire, serê xwe hinekî bilind dike û dipê. Lê tiştek naqewime.

"Çavên xwe veke" zabitekî dibêje. Ew dîsan çavên xwe vedike. Niha zabitek hatiye û li hember wê sekiniye. Di navbera wan de bi qasî gaveke biçûk mesafe heye. Kevok hilma zabit a giran hîs dike. Zabit ji kêleka xwe demançaya xwe derdixe. Gava ew demançe derdixe, demançe li hewayê dibiriqe. Smith-welso-neke lûledirêj û gundorî niha di destê rastê e zabit de ye. Zabit, hêdîka, gundora demançe vedike û ji çavên gundorê berikan, yek bi yek, derdixe. Paşê ew, bi tenê berikek dixwe gundorê, gundor digire û bi destê xwe yê çepê, çend caran, gundor dizîvirîne û "demançe şeşberik e" dibêje, "tê de bi tenê berikek heye. Ez ê tetikê bikişînim. Car bi car, heta ku berik dikeve ber derziya dîkê demançe û di eniya te de diteqe û qaf û mêjiyê te belav dike. Tu û şansê xwe..."

Kevok dengê xwe nake, wext hat, ew difikire, wexta çûyinê hat, metîn be Kevok, xwe bigire. Mirin, mirin e. Îro yan jî sibê, yan jî dusibê. Para min îro ye. Metîn be...

"Keça min", Baz dîsan dibêje, "bi te guneh e, dev ji vê sewdayê berde, bipeyive, tiştekî bibêje."

Kevok napeyive, difikire, hûs dike ku ew ketiye rê û dere. Çûyin... Ez derim, Kevok difikire, welat, welatê neçar, reben, bêpişt, ez derim. Li ser axa te, heye ku li ser axa gorên bav û kalan, ez derim. Bayê hênîk ê şevê strana te bi guhê min dixîne, stêrên te, heyva te li çûyina min dest dikin. Ez derim, mîna bav û kalan. Lê tu dimûnî, mîna heyamên bav û kalan. Diya keseran, xem û xizînan, bistrê, li pey min bistrê û hêstir bibarîne. Min xwest ku ez bijîm, ez te vejînim. Belê, xewn bû, xeyaleke şêrîn bû, lê min dil kir, tu pê bizanibe. Ez derim, min bixemilîne mîna bûkekê, min hembêz bike mîna zarokekê. Dayik, dayê, dadê, axa birehmet, diya germ, min ji bîr meke, min bihewîne, ez têm, ez derim...

Zabit demançê rast dike, wê dibe ber eniya Kevokê, devê sarê lûlê, bi giranî, dibe ser eniya wê û radiweste. Zabit, ji tecruban, bi şixulê xwe dizane. Ew welê disekine.

"Keça min, tu dê bipeyivî?.."

Deng ji Kevokê dernakeve. Ew çavên xwe digire, qamrast, dest û tilî di nav hev de guvaştî, radiweste. Dilê wê hildavê, pihêt, tep, tep, teppp...

"Hingî bikuje" Baz dibêje.

Hingî zabit tetika demançê dikêşîne. Dengekî tîz, toq, derdikeve, çîqqq... Kevok, bi tevgera demançê vê bi qasî gavekê, ber bi paş ve dere. Kevok dilerize, mîna ku ew li ber mirinê be, diricife. Hemû bedena wê dere û tê. Ew dengê hilavêtina dilê xwe dibihîse. Dilo!.. Ew dengên din jî dibihîse. Kevok pê dihise: Ew nemiriye. Çavên wê hê jî girtî, ew nefes digire û dide. Na, ew nemiriye. Jiyan. Ji mirinê veger. Nefes, hewa, tebiyet, deng, pêjn, dil, mêjî, hiş, hûs... jîyan... Kevok çavên xwe vedike. Ew, Baz. Ewana, zabitên mirin û kuştinê. Mirin ev e, Kevok, hinekî bi kêfxweşî, difikire. Ne zêdeyî vê, bi tenê ev. Çûyin, çûyina bêveger... Xwe rabigire, careke din, tetikê demançê, teqîn û tu dê herî... hewqas. Aliyekî rûyê wê niha bi şewqa stêr û heyvê dibiriqe. Rûyekî ecêb xweş mîna ku ji tarîxê, ji dewr û dewranên kevnare vegeriyaye. Mîna melayikekê. Rûyekî nerm, aram, razî,

bi her tiştî razî. Bêvila wê ya biçûk, difnên wê yên biçûk. Eniya wê ya vekirî, porê wê yê ku ji aliyê rastê dibiriqe, lêvên wê yên nerm ku niha, tevî ku şev e, bi hemû bedewiya xwe dixuyin, çengê we yê hinekî dirêj, lê lihevhatî. Û çavên wê, çavên wê yên ku niha heta bîbikan dixuyin, dibiriqin.

Baz li çavên wê, pir bi dîqet, dinihêre. Çav, nêrîna çavan ku hîç bi tiştêkî din naşibe. Nêrîna çavan, pêwendiya çavan, mîna ku çemek ji çemên vî welatê musîbet ber bi deryan diherike, xwe digihîne deryan, mîna birûskeke ku vedide û di zikê dareke kevnare û qehûm de diteqe. Baz li rûyê ciwan ku tevî vê êş û ezebê hê jî aram e, dinihêre. Rûyê Kevokê; matbûyî lê mexrûr, westiyayî lê serbilind.

"Keça min, înad meke, bipeyive" Baz, gelekî nerm, kite bi kite, li ber guhê Kevokê, dibêje.

Ji Kevokê deng dernakeve.

"Hingê bikuje..."

Zabit, dîsan, gundorê çend caran dizîvirîne, lûla demançe datîne ser eniya Kevokê, tiliya xwe dibe ser tetikê û radiweste.

"Keça min, heyfa te ye, bipeyive..."

Kevok napeyive, mîna heykelekî kevnare ku ji dewr û dewranên kevn, pir kevn mabe, welê rawestiyayî, çavgirtî, îcar destên wê di piştê wê re li hev gerandî, radiweste.

"Bikuje..."

Zabit, hêdîka, tetikê dikêşîne. Bi kişîna tetikê, Kevok hil-diweşe erdê. Bi qasî çendekê ew welê hilweşiyayî, li ser axa hinekî şil, dimîne. Lê ew diji! Îcar jî ew diji! Îcar jî demançe vala çû! Tirs, ji tirsê ew ketiye erdê, divê weha be... Tirs, demançe, mirin, çûyin... Kevok hew dikare xwe rabigire. Ew digirî, bi çerm, bêdeng, li erdê digirî. Baz tê raserî wê, destê xwe dirêj dike, bi destê Kevoke yê rastê digire û wê ji erdê radike. Baz, pir bi nermahî, dîsan, li çavên Kevokê dinihêre û "tu dê bipeyivî, ne wisan? Keça min?", pir bi nermahî, dibêje.

Kevok nikare bipeyive, deng jê dernakeve. Ew, bi tenê, bi awayekî erênî, serê xwe dihejîne.

12. Jan

Baz û Kevok.

Meşa me ya li ser riya serpêhatiyên Baz û Kevokê didome. Roj, meh, demsal, sal, wext, dewr, war, cih, civat, îklîm, reng diguherin, lê meş dewam dike. Meşa li ser riya serpêhatiyên Baz û Kevokê divê di nav dewr û dewranan de here û were da ku dengê hilavêtina dilê xwediyên serpêhatîyan bê bihîstin, kite kitên rû û awir, pêjn û hîsên wan bên diyarkirin. Meş divê, bi çîv, fet-loke, xwar, carina rast, bidome da ku rengên serpêhatîyan ku mîna rengên keskesorekê ne, bixuyê. Bihîstin divê. Pêhesîn divê. Deng û pêjn, hîs û bihîstiyarî divê. Reng û tahm divê.

Baz û Kevok; niha herdu bi hev re. Li Welatê Çîyan, li se-rejêrekî çîyayên bilind. Di dawîya şeveke sayî û destpêka rojeke hênîk de.

Ew derin; Baz, Kevok, sê zabit, bi qasî bîst leşker û heft gundiyên ku alîkariya wan dikin. Ew hemû, bi hev re, li pey hev, derin. Di nav cil û bergên gundiyên Welatê Çîyan de, bi çek û pûsadên giran. Ew derin, ber bi jêr dibin.

Çawan? Ji bo çi?

Berî bersiva van pirsan, em wextekî bihurî ku di beşê duyemîn ê romanê de –em ê jê re bibêjin beşê Şewatê– mîna çemên vî welatî bi xizîn diherikî, bi bîr bînin; terk û reva gundiyan, gundê valakirî, çîyayên gundiyan, çûyina wan a şevê, baran, serma, west, leza wan a di nav zinar, çiya, şikêr, bihur û geliyan de bi bîr bînin; binê gelîyê kûr, şikeft û zivingên geliyan, zivis-

tana gundiyan a şikeftan, bihara wan a tebiyeta harbûyî û êrîşa leşkeran bi bîr bînîn; û mirinê, mirina ku bûye qedera vî welatî, însanên vî welatî û agir û şewatê bi bîr bînîn. Dengê bêrawest ê mîtraloyoz, topên biçûk û çekên lawan bi bîr bînîn. Em bi bîr bînîn; ka cewrikekî biçûk çawan ji nav mij û dûmana agir û şewata şikeftan derket; ka kurekî biçûk çawan bi dû cewrikê re, mîna cewrikekî, ji nav agir derket. Çawan zarokek, mîna serpêhatiyên çîrok û destanan, ji pey mij û dûmanan derket û xwe gihand dinya û jiyanê. Şaşbûyî, lê bi rûyekî sakîn. Û zabitekî simbêlqît ê kinik û jar ku li zarok xwedî derket, destê xwe bir serê zarok de anî, lê nihêrî û keniya û bi zimanê xwe ku zarok hîç tiştêkî jê fam nekir, gotinên aram û rind jê re gotin...

Em bînîn bîra xwe; ew zorak, Baz bû.

Niha jî, Baz, dîsan, bi dû –em ê bibêjin– bi qasî çil salan re di eynî deverê de ye. Ew ber bi eynî cih, war, gelî û şikeftan dere, –lê bêtî ku haya wî ji do hebe, bêtî ku ew bikaribe do bi bîr bîne. Bazê do; zarokekî ku ji agir, şewat, çek, pûsad û mirinê xelas bû, ji nav şikeftan derket. Bazê îro; kumandarê kuştinê ku agir, şewat, çek, pûsad û mirin kiriye hunera xwe ya jiyanê û ber bi şikeftan dere. Do; madêra îro ya li pey mij û dûmana wext û dewran. Do; siya îro, siyeke xurt ku hertim bi îro re ye. Do; maziyeke tarî, lê wext û heyamek ku bi heyama nû re jî diji, pê re ye, jîndar e. Do û îroya Baz; ji şikeftekê ber bi şikeftekê, ji mirin û kuştinê ber bi mirin û kuştinê.

Mîna niha. Niha em jî bidin pey Baz, Kevok û yên din û bi wan re herin. Ew ji çiyayên bilind ber bi jêr, ber bi newal û bihurandarin. Qor bi qor, yek bi yek. Li pêş rêber û gundiyan rênas hene. Li pey wan Baz, du zabîtkî û bi qasî deh leşker hene. Li pey wan jî Kevok, li pêş wê zabitek, li paş wê du gundî û bi qasî pênc leşkeran. Yê mayî jî qorê dawîn in. Em cil û bergên wan, lixwekirin û tevgerên wan, çek û pûsadên wan dinasin. Ew leşker in, endamên ordiyê ne, lê niha tiştêkî wan bi leşkeran naşibe. Ew mîna gundiyan devêr, mîna serhildêrên navçê ne. Rîh û simbêl-

berdayî, rûyên neşûştî, qam û balên xurt, awir û nêrînên tûj, şal û şapikên kevnare, pêlav û postalên qehûm ên çiya û zinaran. Laş û bedenên xwîdandayî, hilmketî, gemarî. Ruh û dilên sar mîna kevir, tarî mîna binê axa reş a sar.

Ew derin. Em jî bi wan re. Di nav qoran de, em werin nik Kevokê. Kevok; dîl, ketî, bi her tiştî razî. Niha porê wê ji wan rojên zîndanê dirêjtir, qama wê rasttir, awirê wê jîndartir, tevgera wê xurttir. Lê niha bêgavtir, bêçaretir, sûzentir. Weha; piştî ku Baz, di wê şeva ronî ya lîstika mirinê de, Kevoka tirsîyayî û jixweveçûyî ji erdê rakir, bi destê wê girt û ew xiste jîpê, rûpelekî nû yê jîyanê li ber Kevokê vebû. Rûpelekî nû ku hîç bi rûpelên do naşibe, hîç ne mîna wan e. Rûpelê nû; mukir, îtiraf, peyivîn, cih û warên serhildêran nîşandan. Kevokê rêza yekemîn a rûpelê nû nivîsiye û ew niha li ser rîya nivîsîna rêza duwemîn e.

Rêza yekemîn a rûpelê nû bi çîroka jiyana Kevokê hate nivîsîn. Wê, kite bi kite, zahf vekirî, rast, bêderew, bi qasî ku dihate bîra wê, ji Baz û zabitan re, li garnîzona leşkerî, bi rojan, geh serê wê li ber wê û çav li ser destên li ser çogan, geh serê wê ber bi pencera odê û çav li ewr û esmanên ku ji odê dixuyan, li ser kursiyekî hişk rûniştî, behsa çîroka xwe, serpêhatiya jiyana xwe kir; zarokeke malbateke mezin û xwedî nav û şan, xwedî mal û milk, xwedî gund. Li darê dinyê zarokeke tenê ya malbateke dewlemend, ne bira, ne xwişk, bi tenê, lê tevî gelek xal, mam, met, xaltî, dotmam, kurmam, keçxaltî, kurxaltî, keçmet, kurmet... Bavekî awûkat, diyeke gundî, nexwende. Bavekî zana, têgihîştî, xwedî cih û mewkî, pêwendî û îmkan, ji siyasetê dûr, lê dostê dewletê, xwedbîn, pêwendîya wî û Kevokê sar lê tu carî ji Kevokê rûnebadayî, çikos lê ji bo Kevokê comerd. Bavê Kevokê; kenê wî, henekên wî, rabûn û rûniştina wî û gotinên wî yên bi ûsil ku Kevok hê jî jê hez dike. Bav; bavê ku Kevokê jê re digot bavo, tirsok, ziravqetiyayî, hertim li pey hatin û îmkanên dewlemendtirbûyinê, merivê bayê, li gora bayên siyasî, civakî tevger û tevdîr, bisebir, sebatkar, xebatkar, ziravbîhîstiyar, xwedî cil û bergên paqij, simbêlên zirav, porê şehkirî, bîryantînkirî, bédeng, bisemt.

Dê, ku Kevok jê re dibêje Dadê, diyeke nexwende, gundî, ji maleke giregir. Dê; bêdeng, sakîn, bi dîn û Xwedê bawer, ji halê xwe razî, bi qederê bawer, bi qedera xwe razî; her tişt li gora daxwaza Xwedê diqewime, her tişt li gora nivisîna qederê tê pê. Xwedê û qeder; kaniya jiyan û hebûna wê, kêfxweşî û mesûdiya wê, tirsok, ji hal û hewalê dinyayê dûr, ji şer û pevçûn, xire cir û qîre qîrê dûr, ji doza huwiyet, ziman, çand, welat, gel dûr, gelekî dûr. Dadê; madera yekta, diya bêpayan germ, kaniya evîna Kevokê, şefqat, delalî, germahî, nermahî, çavên germ ên nerm û şewqtijî, hembêzeke germ, ramûsanên rûyekî spî yê hinekî gilover, porê spî, guliyên dirêj. Dadê; madera zimanê zikmakî, zimanekî şêrîn, zimanê lorînê, nehviradinê, zimanê çîrok, serpêhatî, destan, şîn, taziye, dawet, dîlan, stran û govendan. Gotinên yekemûn ku bi guhê Kevokê ketine, Kevokê ew fam kirine, "berxika min, kevoka min..." Û stranên bêhejmar ên li ser kevokan. Û kevokên rengîn ên bêhejmar ên gundê ku Kevok tê de mezin bûye, zimanê diya xwe hûn bûye, xwe nasiye...

Jiyana zarokatiyê ya Kevokê li gund. Lêberîjiyana gund, zayin û hatina Kevokê. Koç. Kevokê, bi qasî ku diya wê jê re gotiye, di serpêhatiya jiyana xwe de çêla koç û welatê çolê jî kir; çol, germahî, qûm, toz, tîn, tîrêj, tav. Çol; dûrî welêt, çiya, dar, dahl, zozan û geliyan. Ji dinyayê dûr, ji însan û însaniyetê dûr, bêwelat, bêkes, ne însan, ne şênî, bi tenê leşker û barakayên germ mûna agir ên leşkerî, ne sî, ne dahlde, ne ba, ne baran, ne teyr û tilûr, ne heywan û lawir, bi tenê qûm, toza qûmê, babilîsk û tofana qûmê. Çol, çoleke bej, bêav, mirî, stewr... Bi qasî ku diya wê, bavê wê jê re gotine. Li wir, li çolê zayin û çavê xwe li dinyayê vekirin û bi qasî du salên pêşîn ên jiyana Kevokê. Du sal, du salên ji agir, ji germa agir ku diya Kevokê hertim jê re behs kiriye.

Û jiyana gund; lê pêşî kew û kevok. Li her aliyên gund, qep qeba kewan, xwendina kevokan, ferxên wan ên kewik, sor, spî, birdikî, reş û her celeb kew; kewên gozel, kewên ribat û celab, bestî û serdar, kewên qoç û dar û deviyan, mêkew û marî. Nêçîra

kewan ên rojdest û şevdestan, kewgîrvanên ku li pal, mitîk û pozikên bilind davan vedidin, mêkewên ku dibin qupik û derin ser hêkan. Nemaze dengê kewan, qeb qeba wan, xwendina wan. Kew û kevokên rengîn ku zarokatiya Kevokê neqîşandine. Û zaroktiya wê; zarokatî, salên pêşîn, ken, henek, kêf, kêfxweşî. Li gora ku diya wê gotiye, kenê Kevokê, keçikeke şên, kêfxweş, li daran dinihêre û dikene, li teyr û tilûran dinihêre û dikene, li însanan dinihêre û dikene. Mesûd. Rûyekî ronî, geş, şên. Gotinên pêşîn; dadê, bavo, ez, ro, nan, av, bi zimanê dadê, bi zimanê însanên gund. Deng û pêjnên taybetî yên gund, yanî terbiye û perwerdeyiya yekemîn a Kevokê. Û dengê Kevokê, strana yekemîn ku Kevokê, tevî diya xwe, li ber kaniya gund, di bin siya darên spîndaran de gotiye, "ez kevok im..." Dengê zirav, xweşik, nerm mîna qedîfe. Kevok; keçikeke biçûk a bedenxweş, kêfxweş, dengxweş, çavxweş. Û stranên gundiyan, stranên ku şevên wê tijî kirine, rojên wê geş kirine, stranên ku bangî heyv û stêran, av û çeman, teyr û tilûran, şivan û gavanan kirine, stranên ku bi nefes, hîs û awaza van hemû tişt tijî bûne.

Kevokê, bi kitekit, herweha bi kêfxweşî, behsa zaroktiya xwe û gund kir, heye ku bi qasî rojek û du şevan, yan jî du şev û du rojan. Û Kevokê behsa jinên gund, careke din, kir; keç û jinên gund, sade, samîmî, rehet, bermalî, xwediya malê, mader a malê û her tiştî, bargirana malê, malbatê. Loriyên wan ên germ, nerm, dilsoj, paqij ku ruhê zarokan terbiye dike. Wexta strana keç û jinan; bêrî, bêrîtî, wexta dotina pezan, danê êvaran gava ro, mîna sêniyeke sor a zêrîn dere ava û pez ji çêrê tî, hingî wext, wexta strana bêrî û bêrîvanan e. Strana bêrî û bêrîvanan; hêza jiyaneke tenê, belengaz, jibîrbûyî. Keç û jin; di nav cil û bergên rengîn de serkêşên govend û dîlanan, mazûvanên malan. Keç û jinên zarokatiya Kevokê; dilgermî, dilpaqijî, dilhebînî, şefqat, fedakarî. Ew keç û jinên ku Kevokê wan hew bibîne; sade, paqij, masûm...

Jiyana gund; bav li bajêr, ew û diya xwe li gund. Dawiya heftan hatina bavê wê û nêçîr, hesp, canî, berx, kahr, kew, kevok,

teyrên baz, eylo, başoke. Hehecîkên dûvmeqes, quling û leglegên ku biharan dihatin... Ev hemû jiyana Kevokê bûn.

Bi dû re Kevokê behsa salên xwe yên bajêr, salên xwendin, dibistan û xwendegehan kir, dîsan bi kitekit, lê ne mîna jiyana zarokatiya xwe; sal heft û destpêka xwendin û dibistanê. Koça ber bi bajêr, jiyaneke nû ya bajarvaniyê. Mala wan a fireh a bi hewş, bexçe û di hewşê de celeb bi celeb darên biber, gul û rehan. Demsalên xwendinê li bajarê mezin, havînan li gundê biçûk. Xwendin. Lê pêşî bi zimanekî xerîb peyivîn. Berî xwendinê li dibistanê peyivandin, bi zimanekî din, bi zimanekî ku Kevokê, hema çî bigire, hîç nebihîstiyê. Ne bi zimanê dadê, lê bi zimanekî biyanî, xerîb. Li gora mamostan û bavê wê, bi zimanê medeniyetê. Hînbûna peyivandina vî zimanî. Gotinên bavê wê; "Kevoka min, divê tu baş bi vî zimanî hîn bî, ji wan jî baştir hîn bî da ku di civatê de, di nav însanan de cihekî te, giraniyeke te çêbe." Û pirsiyara Kevokê, "çima ne bi zimanê dadê, ne bi zimanê me?.." Pirsiyarên bêbersiv. Pirsiyarên dil, mêjî, ruh. Û salên xwendinê, avahiyên sar ku bi kevirên reş ên nehît lêbûne, dîwarên sar ku bi siwaxa spî reşahiya keviran veşartiyê, sinifên fireh û sar ku tê de çil, pêncî şagirt rûniştine, mamosteyên sar ku hertim mîna şûrekî hilawestî li ser serê wan in, "zimanê xwe rast bike! gotina xwe rast bike! Devoka xwe rast bike! Dengê xwe rast bike!..." Salek, du sal, sê sal, çar sal, pênc sal, deh sal. Hînbûna zimanê resmîyê xwendin û xwendegehan. Bêhtir, kûrtir hînbûn, çêtir, xweştir hînbûn. Her xwendin, her hînbûn. "Keça min, Kevoka min, hîn be, li pey wan nemûne..."

Bi dû zimanê resmî yê Welatê Mezin re jî zimanekî din, fransîzî. Zimanê ku li gora bavo, ji zimanê Welatê Mezin jî medenîtir e. Zimanê ku demeke dirêj li Welatê Mezin jî serdest bûye. Piştî dibistana yekem û navend, kolejeke taybetî ku bi fransîzî ders dide, bi ders, kitab û ferhengên fransîzî, bi mamoste û kargerên fransîzî. "Ma fille, petite fille, il faut apprendre bien ce langage, bien, bien, ma kevok..." Salên gihîştî yên umrê Kevokê û ziman

û edebiyata fransizî, Hugo, Stendhal, Balzac, nivîskar, ronakbîr
 û alimên şoreşên fransizî, Flaubert, romanên Flaubert "Madame Bovary" û "L'education sentimentale." Flaubert; "Madame Bovary? C'est moi..." Dîtinên nû, baweriyên nû, fikrên azadî, serbestî, wekhevî, şoreşgerî... Şaîr û nivîskarên destpêka sedsa la me, Perse, Vallery, Eluard, Char, şaîr û nivîskarên resîdansê, liberxwedana li hember faşîzmê... Ango navên ku Baz û zabitan hîç nebihîstine. Ê Perse; *Grand age, nous venons de toutes rives de la terre. Notre race est antique, notre face est sans nom. Et le temps en sait long sur tous les hommes que nous fûmes.* Ê Eluard, *la liberté... Sur les champs sur l'horizon / Sur les ailes des oiseaux / Et sur le moulin des ombres / J'écris ton nom...* Ê şerên azadiya gelên bindest li Afrîka, Asya Dûr, Amerîka Latînî. Ê Fanon; Les damnés de la terre... Ê bavê wê; "Kevoka min, tu bî, tu nekevî ser riya şaş û li hember dewletê ranebî. Dewlet mezin e, kes nikare serî rake û bi ser keve, bixwîne, guhê xwe ji gotinên şaş û pûç re bigire û bi tenê bixwîne..." Ê Eluard; *Sur l'absence sans désir / Sur la solitude nue / Sur les marches de la mort / J'écris ton nom...* Bavê Kevokê; "Kevoka min, delala min, dev ji van sewdan berde, bav û kalên me jî, car bi car, serî hildan, lê çû havilî bi dest nexistin, bêhavlî e, bêfeyde ye..." Ê Hugo; *L'hymne, a ceux qui sont morts pour la patrie* Bavê Kevokê; "delala min, gavên xwe bi zanîn, bi hizir bavêje, guhdarî bike, serhişk mebe, serî hilnede..." Ê Hugo; Şan û mezinahî bi te dikeve / Welatê delal û abadîn, / Şan û şeref bi wan dikeve / Yên ku qurbana te bûne, / Di nav ax û xwînê de...

Kevokê ev hemû tişt, geh bi zimanê Baz û zabitan, geh bi fransizî gotin. Paşê ew hat ser salên xwe yê xwendegêha bilind a ziman û edebiyata fransizî li paytextê welêt. Salên ku haya me jê heye, em pê dizanin. Çaxa wê, bi saetan, çêla paytextê bajêr û jiyana xwe kir, wê, bêguman, Jîr ji bir nekir. Belê, wê behsa Jîr jî kir. Jîr; bahozek ku hat û çû, bahozek ku dil, ruh, mêjî û bedena Kevokê da ber hênikahiya bayê gur ê evîn û sewdayê. Bahozek ku por, rû, stû, dest û bedena Kevokê, bi nermahî, bi hişkahî, fir-

kand. Jîr; xortê jîr ê hertim bendewar, hertim çavên wî yên reş li riyan, dilê wî yê jîr bi liyan. Jîr; xwediyê sozê, xwediyê dolê, belê dolê, xwediyê tovê, belê tovê û xwediyê tolê. Gotinên Jîr ên şeva dawîn ku em pê dizanin. Çûyina wî, di berbangeke sibehekê de bêveger çûyin. Bi çavên şil û rûyekî melûl. Jîr rûyê xwe ji Kevoke direvîne û dere. Kevok; li ber derî rawestiyayî, tayên gumreh ên porê wê di devê wê de, dile wê guvişî, kelegirî, şaş, sil, dudilî. Jîr, mîna siyeke hungirên êvaran, bêdeng, winda dibe û dere. Qîrîna Kevokê; Jîr mere, mere wî welatê bêyom ê mirinê... bêdengî, bêdengiyeke boş ku hemû cîhanê vedigire. Lê hilavetina dil, hûlîrîna destan û hêstirên çavan li pey Jîr.

Jîr? Çi bi serê wî de hatiye? Ew li kû ye, çi dike? Xwedê dizane ka ew li kû ye, çi pê qewimiye. Çûyin, ew çûyin.

Dol, tov? Dol û tovê germahî divê, dilhebînî divê, ronahî divê. Dol û tovê cotedil divê. Dilekî fer ê sar, zîz û şikestî dê çi bi dol û tovê bike?

Bi dû re şevên xewn û xeyalan, fikr û gumanan. Fikr, felsefe, daxwaz û bestên însan, însaniyetî, Welatê Çiyan, tevgera wê derê, Jîr, pê re bûyin. Kevok weha ye, însaneke weha ye; hertim li hêviya dengê ye ku dikare dilê wê yê sûzen û gerok haş bike, li hêviya vebûna deriyekî ye ku dikare ronahiyekê bireşîne ser ruhê wê yê lêger, li hêviya gotinên destanekê ye ku dikare mêjiyê wê yê li pey bersivan bihedinûne, dewlemend bike. Kevok weha ye.

Paşê girtina dolê, qurmiçandina malzarokê, qusandina por... û rê û çûyin. Ber bi Welatê Çiyan, ber bi çîyan, ber bi tevgera serhildêran. Rojên wê yên çîyan, jiyana wê yên şervaniyê. Kevokê ew jî, dîsan, kite bi kite, hema çi bigire, roj bi roj, hemû gotin, bêyî ku tiştekî veşêre.

Rêza yekemûn a rûpelê nû weha hate nivîsîn. Belê, nivîsîn. Baz û zabitên li dorê, piştî vegotina Kevokê ya bi qasî hefteyekê, ev hemû serbûriyên ku wê qal kir, pê dan nivîsîn jî. Wê nivîsî, bi hewes, bi daxwaz, mîna ku ew di deftera xwe ya jiyana serê çî-

yan de binîvîse, welê, sade, samûmû û zelal, ev hemû tişt nivisîn. Bi qasî sih rûpelî, bi destnivîs, bi pênuşeke hişk a reş ku pêçiyên wê diêşand, bi zimanê Baz, lê carina, rêzine jî bi fransizî û bi zimanê xelkê Welatê Çiyan.

Paşe, rojekê, kengî bû, niha nayê bîra Kevokê, lê rojekê, danê sibê, piştî taştê, Baz û ew herdu zabitên ku hertim bi Baz re ne, hatin oda Kevokê. Di destê zabitekî de teyfikeke tijî fêkî, ew li dora Kevokê, li ser kursiyên odê rûniştin. Piştî hal û xatirpîrsînê, piştî gotinên Baz ên gelekî nerm, Baz jê re, bi nermahî weha got, "keça min, niha em gihîştine cihekî nû ku jê re gaveke nû divê. Bi semt, bi zanîn, qewlê me, jiyan û pêşeroja xwe bide ber çavên xwe û bersiva min bide... Xwedê çend e?"

"Yek e", Kevokê, bêrawest, bersiv dayê.

"Bav çend e?"

"Yek e", Kevokê dubare kir.

"Dê çend e?"

"Yek e."

"Dewlet çend e?"

Kevok, bi qasî çendekê sekinî, lê bersiv dayê, "yek e..."

"Baş e, keça min, serek çend in?"

"Yek e." Kevokê, bêyî ku bifikire, bersiv dayê.

"Ala çend in?" Baz, ji bersivan kêfxweş, dîsan, bi nermahî, pirsî.

"Yek e..."

"Welat çend in?"

"Yek e."

"Baş e, keça min, pir baş e..." Û pirsiyarên din, li pey bersivên Kevokê, li pey hev, hatin; marşa dewlet, millet û welêt çend in? Namûs û heysiyet, ar û şerefa welat û millet çend in? Û pirsiyarên herweha...

Kevokê bersiva xwe, her, dubare kir; yek, yek e...

Piştî vê gavê, gaveke nû dest pê kir. "Gelekî baş e, keça min", Baz, bi kêfxweşî, got, "niha me li ser tiştên bingehîn li hev kir.

Piştî vê jî me ger û seyran divê. Tu divê cih û warên keleşan nîşanî me bidî. Cih, war, star û kozikên ku tu jî tê de bûyî. Gund û zome, gundî û xelkê ku alîkariya we dikirin... Tu divê van tiştan hemûyan bikî, îmtihaneke baş bidî ku baweriya me, bi temamî, bi te were û tu jî mirinê xelas bibî... baş e?"

Kevok li benda daxwazeke weha bû. Wê jî tiştên ku wê bi-hîstibûn, ji tecrubeyên xwe yên jiyana şervaniyê dizanibû ku gava şervanek dîl dikeve, jê daxwazeke weha tê kirin. Ji lewre Kevokê, ji Baz re, bi tenê gotina Baz dubare kir, "baş e..." Bi hêsanî, bi rehetî, bêyî tu şik û gumanê. Ji lewre yek ji qayidiyên şervaniyê ku Kevok fêr bûbû, car bi car, jê re hatibû gotin, weha ye; gava şervanek dîl dikeve, divê ew, bi qasî sê heftan li ber xwe bide û nepeyive, cih nîşan nede. Lê piştî sê heftan, ji bo xelasiyê, ew dikare cih nîşan bide. Di nav van sê heftan de şervan ew hemû cih, star û asêgehên ku şervanê, şervana dîlketî dinase, vala dikin. Qewlê şervanan, jiyana şervaniyê weha ye. Loma Kevokê, bi hêsanî, gote "baş e..."

Niha ew, em, li rê ne, ber bi star û asêgehên serhildêran derin. Bi qasî hefteyekê ye ku ew li pey cih û warên serhildêran e. Berî vî danê sibê, di nav hefteyekê de, wan avêtin ser çar star, kozik û qonaxên serhildêran. Lê destvala, bêhavl, bêyî ku ew kesî tê de bibînin. Herwekî ku Kevokê texmîn dikir, hemû war vala, valakirî bûn. Niha ew li ser riya asêgeheke nû ne ku Kevokê gotiye û kite bi kite, ji wan re behs kiriye. Kevok, hema çî bigire, emîn e; ev asêgeha nû dê, mîna yên berê, terkkirî be.

Kevok weha bawer dike.

Riya wan gelekî dirêj e. Ew nîvê şevê ketine rê û hê jî li rê ne. Pêşî bi jîpên leşkerî ji garnîzonê, heta ber qûntarên çîyan. Ji wir peyatî, di kaşa piştî çîyan re, ber bi meqerê Baz û leşkeran ku di hembêza çîyan de ye. Ji wir jî di serê çîyan re, di nava bihurên dirêj û çivdayî de, di zikê dar û daristanan re ber bi jêr, ber bi geliyên kûr ên çîyan.

Baz dere –mîna bav û kalên xwe ku wî nedîtine û haya wî ji wan nîn e– zinar, gir, pal, pozik, kuç, kaş, çal, dar û devî, av û co li pey xwe dihêle û dere.

Kevok dere –mîna wan rojên xwe yên şervaniyê– li ser piştâ zinaran, di riyên teng, xuloxwar û fetloke de, li ser kevir, qîş û xîç, kelem, strî û diriyan dere. Ber bi gelî û newalên ku Kevokê, tevî hevalên xwe yên şervan, tê de xewa çavên xwe aş kiribû, zora westa bedena xwe biribû. Ber bi cih û warê ku bav û kalên Baz, bi hêviya vegera mal û gundê xwe, bi hêviya çûyina biyanian, xwe tê de veşartibûn.

Heyv niha çûye ava. Stêr çûne ava. Lê ro, tîrêjên royê hê naxuyin. Li hawîrdor mijeke tenik heye. Şiliya payizê ketiye erdê. Dinya sayî ye. Deng nîn e, bêdengiyeye kûr û xoftijî li dora wan e. Bi tenê carina hin teyr, hin kund vîçe vîçê dikin. Bayekî sivik ê payizê, hêdîka, pelên daran ku êdî di payiza umrê xwe de ne, yek bi yek, diweşîne.

Em li nik Kevokê ne. Kevok, bêdeng, di navbera zabit, leşker û gundiyên çekdar de, destvala, di nav cil û bergên kevn ên gundiyan de, mîna mêran lixwekirî, dere û li bêdengiyê, bêdengiya ruh û mêjiyê xwe difikire. Ev çi jîyan e, ew difikire, çima weha ye, çima weha bû?.. Ev bêdengî, ev geremolî, ev tevlihevî, ev pêlên dudilîbûnê ku hundirê wê, mîna deryayeke harbûyî, diçelqîne... Kevokê çi winda kir? Kevokê çi qezenc kir? Ax, niha Dadê li vir bûya! Ax niha li vir yek hebûya, hin hebûna, Jîr hebûya, hevalên wê yên kitab, ders û xwendegehê hebûna, ew li vir bûna û Kevokê bikaribûya bi wan re bipeyiviya, hal û hewalên xwe ji wan re bigota. Sohbeta jîdil, germ, bi girî, zîz. Çiqas hewcedariya Kevokê pê heye, niha. Xwezî ew netirsiya, xwezî wê ji mirinê çav baneda û neketa vê rewşê. Dawiya vê rewşê? Kutahiya daxwazên van? Piştî vê gavê dê çi were? Kevok ê çi bike? Ew bi çi ders û hunerên xelasiyê dizane? Ew xwe bikuje, qesta revê bike? Stariyek? Parêzgerê? Merivek? Kevok, westiyayî, bêhnçikiyayî, tirsiyayî, dere û difikire.

Ba porê Kevokê li ba dike, hênikahiyek dev, lêv û difnên wê dibire. Ez nikarim, Kevok, devgirtî, difikire, na, ez nikarim, piştî vê asêgehê dê yeke nû were, piştî wê jî yeke nû. Min tevgerek, lebatek, livandinek divê. Dengê divê, hawarek, olanek divê. Lê çawan? Ev çekdarên li pey min, li pêş min, çekên van, lûleyên dirêj û sar ên çekên van ku ji bo mirin û kuştinê ne, ku bi tenê mirin û kuştinê tînin bîra merivan, ku bi tenê tarî û tarîtiya mirinê bi bîra merivan dixînin. Na, ez nikarim, ne hêza min, ne taqet û hewesa min maye. Mirin, bi tenê mirin maye...

Gava Kevok, Baz û yê din xwe digihûnin bin lingên çiyên û destpêka gelê, tîrêjên tavê jî, hêdî hêdî, hiltên. Dinya hêdî hêdî ronî dibe. Kom û qor niha gihîştine bin newaleke kûr, dirêj, fetloke ku tê re çemekî zirav, seranser, diherike. Der û dor bi çiyayên asê rapêçayîye. Piştî û sîngê çiyên tijî dar, daristan û dahl in. Çemê ku niha li ber wan e, xwe li ba dike û bi nermahî diherike. Hin qelîşek û tîşik, li vir, li wir, devê çem dibirin û di nav zinar û giran de winda dibin. Tîrêj bilind dibin, çiya, dar, daristan, av, çem dest pê dikin, hêdî hêdî, bi şewqeke sivik a zêrîn dibiriqin. Darên kevnare û qehûm ên bêber, darên çaman ku niha di nav mijeke tenik de, mîna avahiyan dixuyin, bi rengê kê gelekî taybetî ku Kevok baş jê dernaxe ka çi reng e, dibiriqin. Dinya hê jî sayî, hê jî bêdeng e. Ev bêdengî, ev aramî, ev zelalî, ev xweşî! Berî niha bi demekê, çaxê Kevok, tevî şervanan, li vir bû, doralî dîsan weha zêrîn, weha bihuştî bû, niha jî. Kevok li der û dora xwe dinihêre; di serê çiyên re çend teyrên mezin didin baskan û difirin. Cotek kîvroşk, ji koma merivan gelekî dûr, didin çarpiyan û direvin. Ji mirin, kuştin, şewat û hilweşînê çiqas dûr! Ji dehşet, şîdet, kîn, nefret û rikê çiqas dûr!

Lê ev însan, ev şer, ev kîn û nefreta van însanan? Lê daxwaza vê kîn, nefret û şideta ku vî welatî vegirtiye? Ev xwîna ku diherike? Ev dil û ruhên ku bi xwînê tînin avdan, ji xwe re xwin kirine kaniya jînê?

Kevok, Kevok difikire, Kevok, êdî dev ji van fikran, gumanan berde, êdî te ne fikr û guman, ne jî endîşe hewce ye, tu êdî xerîb î, xerîbeke pênc peran a jiyanê, a însanan, a civatê, êdî nexweşî û xirabî, nerindî û kirêtî, bi tenê xerîbeke windabûyî, ev dûmen û bergehên îro êdî xeyaleke kambax û kesertijî ya ruhekî mirî ne. Tiştê ku tu dikarî niha bikî, ev e; hêvî bike, dil bike, dua bike ku ev asêgeh jî valakirî be, tê de kesek, bi şaşî, nîn be...

Kevok weha difikire, weha hêvî dike.

Lê?..

Lê; piştî ku hemû qor xwe digihûnîn newalê, Baz, zabit, du gundî û du leşker li hev dicivin. Bi qasî çendekê ew, bi hev re, di dahldeyeke pala zinarekî de, dipeyivin. Paşê yek ji leşkeran tê û Kevokê dibe ba wan. Baz û yên din, li wir, li ser kevira rûniştine. Baz, di nava lepê wî de cixareyek, li nik xwe, cih nîşanî Kevokê dide. Kevok rûdine. Baz, gelekî baldar, gelekî manîdar, bi qasî kêliyêkê, cixara xwe dikişîne, li Kevokê dinihêre û bêdeng dikene. Baz raste rast li çavên Kevokê dinihêre. Germ, nerm. Mîna nêrîna bavekî yan jî hezkarekî. Germahiyek di hundirê Kevokê de dilive.

"Keça min, binihêre," Baz, bi ken, dibêje, "em gihîştin gelî, geliyê mirinê. Ne wisan? Ji vî gelî re dibêjin geliyê mirinê, ne wisan?" Kevok dengê xwe nake, hinekî ji nêrîna Baz şermîn, li ber xwe dinihêre. Baz, careke din, dipirse, "ne wisan, keça min?"

"Belê", Kevok dibêje.

Çavên Baz li ser Kevokê ne, dîsan bi qasî bîskekê ew lê dinihêre û cixarê dikişîne. Paşê ew li zabitê kêleka xwe vedigere û "hinekî goştê qelîbidin Kevokê" dibêje, "wexta me jî bo xwarin û xwirîniyê nîn e, hinekî goştê bidinê." Ew dîsan li Kevokê vedigere, "keça min, niha bibêje, cihê ku we xwe spartibûyê, li kû ye?"

Kevok destê xwe yê rastê hildide û aliyê jêr ê gêdûgê nîşan dide.

Baz li gundiyan dinihêre. Gundî serê xwe, bi mana belê, dihejînin. "Naxwe cih di dilê gelî de ye. Hingî de rabin, xwe bidin

hev, çek û pûsadên xwe bişidînin. Ji niha û pê ve êdî deng nîn e, em ê bi nîşanan tevgera xwe bimeşînin... De rabin, zûkin, bilezînin, berî ku tav li me hilwere, em xwe bigihînin cih. Zûkin, zûkin..."

Ew radibin, xwe dadiweşînin û bi rê dikevin. Gava ew bi rê dikevin, Baz dizîvire ser zabîte nik xwe û "Kevok ê li cem me be" dibêje, "lê hayîdar be..."

Bi leza birûskê ew hemû xwe didin hev, li çek û pûsad û rextên xwe dinîhêrin, bêdeng, di nav pergaleke gelekî tekûz de, dîsan, qor bi qor, ber bi jêr, ber bi dilê gelî derin û di demeke kurt de xwe digihînin doralîyên cih. Baz, zabitek, gundiyeke, du leşker û Kevok xwe didin pişt pala zinarekî. Ji wir asêgeh, niha, mîna bergeheke bihuştî dixuye. Asêgeh, çend şikeft in, şikeftên ku di zikê hev de, li kêleka hev in. Li milê din ê çem, ji çem hinekî dûr, li ber lingê zinar û giran. Tu deng, tu pêjn ji hawîrdor nayê. Tu tevger, tu lebat, tu nîşana jiyanê li der û dorên şikeftan naxuyê. Bêdengiyeke kûr heye. Ji bilî dengê nerm ê ava çem tu deng nîn e. Ev bêdengiya ku tu gotin nikare salix bide, ev rengên mor, binevîşî, zer û sor ku bi hev re rengêkî nû yê nedîtî li dar dixin, ev bîhnên têkel ên dar, ber, çiya, av, pel, giya û axê, ev hemû bi hev re, hîseke ecêb, bihîstiyariyeke gelekî zirav tînin pê. Ê li serê çiyar jî tav, ronahî, tîrêj ku gav bi gav, pêl bi pêl, lê gelekî hêdi, giran, bilind dibe, pêtên çiriskên şewqê li vir, li wir tîne pê û desthilatî hemû rengan, hemû deveran, hemû hawîrdor dibe.

Qorên koma Baz, bi çapikî, bi lez, bi hostehî, bêdeng, der û dorên şikeftan radipêçin û li pişt kevir, çeper, pal û girikan, çekên wan di destên wan de, lûleyên çekan ber bi şikeftan, li pê, rûniştî, li ser totikan, dirêjbûyî, dipên.

Payin, payina şer, pevçûn û kuştinê. Her saniyekê, her deqeyekê mîna umrekî. Payneke giran...

Piştî payina bi qasî çendekê, tişteke ku ne di hesab de ye, diqewime. Ji devê şikefteke ku hê jî di nav mijeke tenik de ye,

reşahiya merivekî, mîna sî, dixuye. Reşahî, hêdî hêdî, ji mij bi dûr dikeve û ber bi aliyê çem ve tê. Merivek. Reşahî diqulipe ser însanekî. Însanekî qemer ê bejndirêj, baldar, qamrast, xort, simbêldirêj. Însanekî di nav cil û bergên şervanan de. Şervanek.

Li vir, niha, do dubare dibe. Do; xortekî ji xisim, nas, bav û kalên Baz –heye ku bavê Baz– di berbangeke sibê de ji şikeftê derket û hate ber çem, –bêyî ku haya wî ji tiştekî hebe. Îro; şervanekî ji şervanên tevgera serhildayî, di vî spêdê sayî û ronî de, ji şikeftê derdikeve û tê ber rexê çem, –bêyî ku haya wî ji tiştekî hebe. Do; serpêhatiya xortekî çiyayî ku nayê bîra Baz. Îro; serpêhatiya şervanekî ku bi fermana Baz tê pê.

Bi diyarbûna şervan, Kevok şaş dibe. Hemû bedena wê diricife, germahiyek bi ser wê de tê, gewriya wê tişî dibe û hêdîka "heywax" dibêje. Heywax, na, na, nabe, na... Çima? Çima ev li vir e? Çima weha bêtevdîr, bēnobedar? Çima? .. na, na...

Herçî Baz e, kêfxweş dibe. Baz, çavên wî yên biçûk li serhildêr, dikene, "were" dibêje, "were keleşê baqil, were..."

Şervan xwe digihîne ber çem, li wir, li piyan, disekine, li hawîrdor, li esmanan dinihêre û paşê doxîna şalê xwe vedike û rûyê wî ber bi Baz, Kevok û yên din, bi qasî kêliyekê, mîz dike. Piştî ku ew dimîze û çend caran xwe dadweşîne, ew doxîna xwe girêdide, li ser totikan rûdine û dest û rûyê xwe dişo, bi qasî çendekê, bêyî ku bilezîne. Bi dû re ew radibe ser piyan, bi milên şapikê xwe rûyê xwe zuwa dike û ber bi şikeftan dizîvire da ku vegere şikeftê. Lê hingî do, dîsan, dubare dibe.

Hingî dengê teqînekê tê. Eger em bi gotinên do bibêjin, hingî dengê teqînekê hawîrdor vedigire. Hingî dengê teqînekê, car bi car, car bi car, di nav gelî, zinar û çiyana de olan dide. Hingî bi dengê teqînê, bēdengiya hawîrdor diqelişe û teyr û tilûr, ji nişka ve, difirin û bi dûr dikevin. Şervan, serrû, dikeve erdê, lê piştî kêliyekê radibe ser piyan û bi gavên bezê, ber bi şikeftê dere. Hingî dibe gurmîna çekan, teqîna agir. Şervan, careke din, dikeve erdê û hew radibe.

Hingî Kevok, bi qîrîn, radibe ser piyan û dixwaze ber bi çem, ber bi şervanê ketî here. Lê zabit û gundiye kêlekê, qehûm, bi pî û milên wê digirin û wê di kortala pala zinêr de didin rûniştin. Gundî û leşkerê jî li kêleka wê rûdinin. Kevok hew tiştêkî dibîne, bi tenê dibihîze.

Bi destpêka vê gurmîna gumreh, ji devê şikeftê jî dengê teqînê tê. Teqîneke xurt, boş. Û teqîna herdu milan, bi hemû quweta xwe, dest pê dike. Bi roketavêj, keleşkov, mîtralyoz, çekên law, tivingên dirêj ên nîşanê. Bêwest, bêrawest. Bi saetan. Ro hiltê, taştê diqulibe ser danê sibê, teqîn dewam dike. Danê sibê diqulibe ser nîvro, gurmîn dewam dike. Nîvro hêdî hêdî ber bi esrê dere, teqîn dewam dike. Ji milê şikeftan, ji devê şikefta mezin agirêkî boş, tevî qîrîn û nîda, dibare.

Ew çend kes in? Çawan ew dikarin weha, bi vê şidetê, gule bibarînin?

Lê ber bi danê êvarê, mîna ku do qewimî, çaxa ku ro di ser çiyên re, ji aliyê rojhilat ber bi aliyê rojava diqulibe û li milê rojava yê çiyên ber bi jêr dibe, hingî leşkerên ku xwe dirêjî devê şikeftan kirine, bêhejmar narincok davejin hundirê şikefta ku jê agir dibare. Narincok, li pey hev, bêrawest. Paşê jî, ji gelekî nêzîk ve, çekên law ku mîna hûtên ku agir ji devê wan dere, dest bi agir barandinê dikin. Hingî agirê ku ji devê şikeftê dibare, hêdî hêdî, tê birîn.

Agir tê birîn. Deng tê birîn. Qîrîn tê birîn.

Hingî agirê ku ji paş dar, kevîr, pal, bilindahî, şikêr, zinar û kozikan dibare, hêdî hêdî, tê birîn.

Dinya dîsan dibe aram. Hawîrdorê ku qulipiye ser cehnemê, dîsan, dikeve nav bêdengiyeke kûr.

Baz cixareyeke nû ji pakêtê derdixe, vêdixe û jê çend nefesên kûr dikişîne. Ji pişt pala ku ew lê ne, çavên wî, bi bal, li ser şikeftên dûr ku hê jî jê dûman radibe, bêdeng, ew cixare dikişîne. Ji rû û rûçikê wî, ji awir û tevgera wî tiştêkî fam nabe. Gelo ew kêfxweş e? Memnûn e? Xemgîr e? Bikeser e? Baz çi difikire?

Baz çi hîs dike? Ew bi tenê cixare dikişîne. Herkes, Kevoka ku niha rabûye pê û xwe daye kêleka pal û li şikeftan dinihêre, zabit, leşker, gundî, li cihê xwe, bêdeng, bêlebat, rawestiyane û li hêviya fermana Baz in. Baz nalezîne, êdî tu lez ne hewce ye. Bi dû cixara yekem re Baz cixareyeke din jî derdixê û vêdixê.

Deng tune, hîç tune. Bêdengiyê ecêb kûr, ecêb giran, mîna kefenekî, der û dor vegirtiye.

Piştî ku Baz cixara xwe ya duwem jî dikişîne, ew jî piştî pal derdikeve û yek bi yek, cih bi cih, kozik bi kozik, li der û dor dinihêre. Ew çavê xwe li zabit, leşker û gundiyan digêrîne, paşê destê xwe yê rastê ber bi leşker û gundiyan ku xwe gihandine herdu kêlekên devê şikeftê, radike û şikeftê nîşanî wan dide. Leşker û gundî, cot bi cot, her yek jî milekî devê şikeftê, dikevin hundir. Cotek, du cot, sê cot... çend leşker jî li ber devê şikeftên din radiwestin. Piştî bîskekê du leşker, di navbera wan de cendekek, leşkerek jî destan, yê din jî lingên cendek pêgirtî, di devê şikeftê de dixuyin. Ew derdikevin derve, tên û cendek li cihekî rast, di navbera şikeft û çem de, datînin erdê. Piştî ew dîsan vedigerin şikeftê. Berî ku ew bikevin hundir, jî devê şikeftê du leşkerên din ku bi dest û lingên cendekeke din girtine, dixuyin. Û cendekekî din. Cendekekî din. Cendekekî din. Hejmara cendekan dibe şeş. Baz, Kevok, zabit û kesên din ên li dora wan, bêdeng, li vê tevgera bêdeng a mirinê dinihêrin. Şeş cendek û şervanê ku li ber çem kete erdê. Heft mirî, heft kuştî.

Zabit, leşker, gundî li ser cendekan dicivin. Zabitek jî koma civiyayî vediqete û tê nik Baz. Ew Baz xewle dike, hêdîka, jê re, bi qasî cendekê tiştina dibêje. Baz lê guhdarî dike, paşê jê re çend gotinan dibêje û vedigere tê ber pala zinêr. Zabit jî vedigere, dere ser cendekan. Li ser cendekan, zabit demançaya xwe dikişîne, tê ser cendekekê û sê berik bera laşê dirêjkirî dide. Paşê zabit eynî tiştî li ser cendekekî din jî dike.

Hingî Kevok hew xwe radigire, ew jî cihê xwe derdikeve, ber bi cendekan dere. Leşkerek dil dike, wê bide sekinandin, lê Baz, hêdîka, "bihêle" dibêje, "bihêle, bila here.."

Kevok, bi gavên giran, hişjêçûyî, matbûyî, mîna ku ew di xew de be, xwe diqelibîne avê, derbasî milê din ê çemê zirav dibe û dere ser cendekan. Bêdeng, çavşil, ew li dora xwe, li zabit, leşker, gundiyan dinihêre û paşê li kêleka cendekê pêşîn, li ser totikan rûdine. Niha heft cendekên însanan, xort û ciwanan, di bihara umrê xwe de, li kêleka hev rêzkirî, dirêjkirî. Heft însanên ku hê berî niha cendekê jî dijiyan. Cendekê pêşîn ku Kevok li kêlekê rûniştiye, keçikek e. Rûyê wê di nav xwînê de maye, aliyekî çengê wê perçe bûye. Aliyê çep ê porê wê kiziriye. Lêvên wê, serçavên wê bixwîn e. Kevok, hêdîka, bi milê şapikê xwe serçav, lêv û rûyê wê paqij dike. Bi qasî cendekê Kevok, mîna ku hîpnotîze bûbe, bêdeng, li keçika kuştî dinihêre. Paşê Kevok radibe ser piyan û li cendekan dinihêre, yek bi yek. Li kêleka wan, giran giran. Cendekê dudiyan, xortekî girs e ku milê wî yê rastê ji qolincê qut bûye. Cendekê sisiyan, şervanekî bejnîkurt û qalind e ku serê wî perçe bûye, rû, serî ji hev ketiye û mêjiyê wî ji qafika perçekirî ya serî dixuye. Cendekê çaran, keçikeke kinîk e ku mîna di xewê de be, razayî, li serê tu şopê birîn û xwînê nexuyaye. Cendekê pêncan... Cendekê pêncan!

Cendekê pêncan!..

Kevok, "na" dibêje û diqîre, "na, Rênas, na... na!.."

Belê, rastî weha ye; cendekê pêncan ê Rênas e. Rênas ketî ye, mirî ye, kuştî ye. Rênas; bejndirêj, simbêldirêj, balşox, mezin, bilind. Rênas; şervanê fedakar ê roja teng, egîdê berf û pûkê, sar û sermê. Rênas; heval û hogirê man û nemanê, dostê ku Kevok ê di dawet û dîlana wî de serkêşiya govendê bikira. Janek, janeke gelekî zirav, gelekî xurt hemû bedena Kevokê, hemû dil û mêjiyê wê, seranser, tafilê, kûr, dibire. "Rênas", Kevok, pir hêdîka, bi awazeke tenîk a lorînê, dibêje, "Rênas... Rênas..." Rênas, niha, çavgirtî, rû di nav tozê de, lê li ser rû çilka xwînê nexuyayî, radize. Tişteki bi ser, rû û çavên wî nebûye. Mîna ku ew di xewê de be, mîna ku ew xewnekê dibîne, welê sade, masûm, bêhay û bêguman, ew radizê. Kevok li kêleka wî rûdine û hêdîka serê wî

datîne ser çoka xwe. Bêdeng, bêqîrîn, bêgazîn û bêtevger. Hingî Kevok dibîne; ji navtenga Rênas hê jî xwîn dere, hûr û pizûrên wî derketine der. Bêhneke tirşokî, bêhneke giran a xwîn, xwîdan û barûdê bi ser cendekê Rênas ketiye. Kevok destê xwe yê rastê li ser rû, çav, gum û eniya Rênas digerîne, hêdîka, mîna ku ew zarokekî mist bide. Rênas radizê, sakîn, êdî ji derd û xeman, endîşe û keseran, lez û bezan, şer û pevçûnan dûr, êdî ji her tiştî dûr. Rênas dere, bêdeng, bêpêjn, bênefes, çavgirtî, her tiştî terk dike û dere.

Ecêb e, lê di vê dema bêpayan zîz, bêpayan keserkûr, bêpayan jantijî de heyv dikeve bîra Kevokê. Kevok li rûyê Rênas ê aram dinihêre û li heyvê, li gotina destana kevnare difikire; egîd jî, rênas jî mîna heyvê ne, pêşî ew mezin, fireh dibin, dibiriqin, şewq didin, paşê wînda dibin û derin...

Rênas dere. Mîna heyvekê, mîna vê tava ku niha, di vî danê êvarê de dere ava.

13. Awir

Baz û awirê Baz; carina nerm, kesertîjî, bi hizin; carina jî tûj, sert, bixof, carina reş, tarî mîna mirinê.

Kevok û awirên Kevokê; hertim nerm, melûl, bi mij û dûman, mîna xewnekê.

Nêrîn, li yekî din, li yeka din nêrîn; zimanê hîs û pêjnan, zimanê dil û ruh; riya dîtîn, keşfîkirin û nasîna însanekî din. Nêrîn; birûska ku di navbera dilê însanan de vedide.

Çêla me niha li ser nêrînê ye. Em niha, li ber deriyê malek ji malên lojmanên leşkerî ne. Li bajarê herî mezin ê Welatê Çiyan, li taxa leşkerî, di apartmaneke leşkerî ya lojmanên zabitan. Em ê bibêjin, wext, niha, bi qasî mehekê bi dû şewat, mirin û kuştina newala mirinê re ye. Em li ber deriyê malê, li nîk Baz in. Baz ê ji derî bikeve hundir. Wext şev e, wext gihîştîye nîvê şevê. Li der baran e, baraneke himbiz bi dengê gur dibare. Dinya sar e.

Baz, di vê şeva hanê de, ji ku tê? Em pê nizanin, lê kincên wî, îşev, ne cil û bergên serê çiya ne, ne jî yên resmî yên zabitan e. Kinc, taximekî reş ê sivîl e. Baz, kilît di destekî, çenteyekî biçûk ê reş di destekî din de, li ber deriyê apartmana ku di qata çaran de ye, rawestiyaye û hêdîka nefes digire û dide. Bi qasî çendekê ew welê bêdeng radiweste û paşê, hêdîka derî vedike û zahf bi dîqet dikeve hundir, bêdeng derî digire. Hilmeke germ, bêhneke xweş bi difnên Baz dikeve. Mal, germahiya malê, tevî her tiştî hizûra ku mal dide merivan. Baz pêlavên xwe yên reş ên sivîl derdixe, bi hêdîka, cotek şimikên çerm dixê lingên xwe û ber

bi hundirê malê gavekê davêje. Lê ji hundir dengêk tê. Dengekî xweşik. Dengekî stranê.

Dengê Kevokê.

Belê, Kevok li hundir, li vê malê ye. Kevok hê ranezaye. Kevok distrê, bi zimanê xwe, bi dengekî zîz, hêdîka, dibêje.

Baz, li holê, radiweste, xwe dide ber koşa holê û oda razanê û ji wir li deng, li zimanê biyanî û xerîb ku Baz, ji bilî çend gotinan jê fam nake, guhdarî dike. Ev deng, ev ziman, ev gotinên ecêb û xerîb ku Baz tînegihê, lê car bi car, wext bi wext, dibihîze û lê guhdarî dike. Dengê zimanê van însanan, vî welatê lanetkirî. Ev çend sal in ku Baz vî dengî dibihîze? Deh sal? Bîst sal? Bîst û pênc sal? Ji roja yekemîn a wezîfa zabitiyê heta îro. Ji bîst salan zêde. Ev deng çî dibêje, çêla çî dike?

Dengê Kevokê, nerm, zîz, tê; bi tenê deng, ne rû, ne beden, ne nêrîn, niha bi tenê deng tê guhê Baz. Dengê keçeke xama, keçeke xerîb. Straneke xerîb, gotinên xerîb. Ev stran, a kê ye, ya çî ye, behsa çî dike? Dengê ku hêdîka, bêyî ku bilind yan jî nizm bibe, diherike, niha zîz e, bikeser e. Stran behsa hiznê dike? Ew behsa mîrîn û kuştinê, agir û şewatê dike? Behsa kambaxî û malwêraniyê dike, behsa tî û birçiyar, birîndar û ketiyan dike? Dengekî evçend nerm, evçend zîz, mîna ku gotin bi jan û keserê hatine hûnandin.

Baz piştî xwe dide dîwêr, serê xwe bilind dike, çavên xwe digire û guhdarî dike. Roja ku Baz dest bi zabitiyê kiribû, wî ev zîzî, ev nermahî, ev hîsa xerîbî û dûrbûnê ku bi wasita dengê stranên van însanan belav dibû, bihîstibû. Li serê çiyar, di nav gelî û newalan, di şevên tarî û şevgura destê sibehan de, li vir, li wir, wî ev bihîstibû. Lê niha, li mala wî, li lojmanên zabitîtan, li garnîzona leşkerî jî ew vî dengê kambax ku hîseke ecêb û xerîb tîne pê, dibihîze. Belê, li mala wî. Deng gihîştîye mala wî! Xwediya deng? Ev keça xort ku niha li mala wî ye? Baz li wê, li rûyê wê difikire. Rûyekî esmer, mîna rûyekî ji destan û efsanan hatibe, mîna rûyekî heykelekî antîk ku xwe li hember ba û

bahozên wext û dewranan ragirtiye. Rûyekî sade, mîna rûyekî periyan masûm, lê tijî sir û sihêr, mîna maskekê. Devê wê, lêvên wê û gotinên ku niha ji wan lêvên xweşik ên lihevhatî derdikevin. Ev deng û ev gotinên ku Baz hertim mîna deng û gotinên dijminekî dîtîbû û bihîstîbû, niha, ji mala wî bilind dibin!

Deng dilorîne. Baz, çavgirtî, lê guhdarî dike. Ev deng û xwediya vî dengî ku ketiye nav kûrahiya dengan û hatina Baz, vebûna derî û ketina Baz a hundir, çi bigire, nebihîstiye. Dengê ku hîsên nû di hundir û ruhê westiyayî yê Baz de pêlên nû tîne pê: Pêlên hîsên çi? Tirs? Xerîbî? Dûrahî? Dijmînahî? Germahî? Çi? Baz pê nizane, lê pê dihesê ku ew westiyayî ye. West, bi tenê west; bedena wî ya westiyayî, mêjiyê westiyayî, bîranînên xwîntijî yên jiyana wî, qedera wî ku Baz xiste ser riya teres a vî welatê teres, roj, meh û salên wî yên di bin stêrên zêrhêlî yên vî welatî, li deşt û zozanên hov ên van însanên hov, di şevên tarî, tijî felaket û têrtirs ên van diyarên wehşî yên jîbîrbûyî. Bêhna van a ecêb, tahma van e ecêb, rabûn û rûniştin û lixwekirina van a ecêb, tevger, fikir, peyivîn û gotina van a ecêb ku ji yên Baz gelekî cihê ne. Û dengê van e ecêb, gotinên van ên ecêb. Baz westiyaye.

Lê ev dengê xerîb ku bi tenê aîdê vî welatî ye, çi dibêje? Tevî ku Baz, bi salan û vir ve, di nav van hemû tiştan de ye, di nav van de, di dil û ruhê van e sirtijî de dijî, ew hê jî nizane ka ev dengê hanê, ev gotinên dilsoj ên vê keçikê çêla çi dike. Baz evçend dûrî van e! Na, ew evçend nêzîkê van e, heta dengê van ji mala wî bilind dibe, lê tevî vê yekê ewçend jî dûr, –ku Baz bi gotinan nizane, mana wan tînahî. Herçend bi kûrahî, bi her awayî di nav rastiya kirêt a vî welatî de lê evçend jê bi dûr. Mîna vê keçika hanê. Ev keçika ku mîna ava kaniyên vî welatê teres zelal, mîna tîrêjên yekemîn ên tava serê van çiyayên malmûrat zînde, kî ye, çi ye? Ev keça ku di kûrahiya çavên wê yên delal û ronî de hertim çilka tirs û xofê dixuye û niha, bi xêra Baz hê dijî, çi difikire, çi hîs dike? Ruhê vê keçika ku bi zimanê Baz, pir bi başîlê bi dengê hînekî ecêb, hinekî xerîb, dipeyive, çi dibêje, dilê wê ji bo çi hildavê?

Hol, midbex, ber deriyê midbexê û oda razanê tarî ye. Ji hundir, aliyê oda rûniştinê şewqeke gelekî jar dixuyê. Lê deng xwe li tariya şevê dipêçe û belav dibe. Tariya şev û malê giraniya deng û gotinan hîn zêdetir dike. Baz, hêdîka, bi gavên giran, ber bi hundir dere. Gava ew di ber oda razanê re dibihure û digihê ber deriyê oda rûniştinê, hingî ew Kevokê dibîne. Kevok li erdê, li ser doşgeke raxistî, fîstanekî sade û dirêj lê, li ber pencerê rûniştiye. Li ser masa oda rûniştinê ku hinekî ji Kevokê dûr e û li ser piyê dirêj ê pencerê çend find vêketî ne. Findên spî û sor ronahiyeke sivik direşînin ser odê. Wê pişt a xwe daye dîwarê spî yê pencerê, serê xwe ber bi pencerê kiriye, lingên xwe kişandine ber zikê xwe, destên xwe di ser çogên xwe re biriye, ji pencerê li der dinihêre û hêdî hêdî, bi dengê lorînê, bi dengê westiyayî, distrê. Mîna ku ew ji xwe ve çûye, mîna ku ew ne li dinya ye. Welê ew li der dinihêre. Nêrîna wê? Hesret? Daxwaz? Keser, jan? An jî kêfxweşiya ku ew hê jî diji?..

"Kevok", dibêje Baz, hêdîka. Lê welê dixuye ku Kevok deng nabihîze.

"Kevok", Baz, careke din, hinekî dengê xwe bilind dike û dibêje.

Hingî Kevok vediciniqe. Dengê ecêb ku Baz jê fam nake, ji devê wê derdikeve. Tafilê stranê dibire, xwe dide hev û radibe ser piyan. Li ser rûyê wê tirseke bêpayan kûr, "na" ew dibêje û xwe dide kêleka pencerê.

"Metirse Kevok" Baz, bi ken, dibêje, "metirse keça min... ez im."

Kevok ditirse, li pê, destên wê li pêş wê, di nav hev de, ew diheje. Baz, gavek, du gavan, ber bi wê davêje, "Kevok, navekî çiqas xweş..." ew dibêje. Lê Kevok, çavên wê bêpayan şaşbûyî, bêpayan beloq, çend gav ber bi aliyê din ê pencerê davêje, -da ku ew xwe ji Baz bi dûr xîne. "Navekî gelekî xweş", Baz dubare dike, lê ew nikare gotina xwe bidomîne. Wî gotinine nerm ku dikare tirs a Kevokê birevîne, divên. Lê çi? Bi çi gotinan, bi çi zimanî? Nêrîna ecêb a Kevokê germahiyek -heye ku çilkeke germahiya şefqatê- di

hundirê Baz de tîne pê. Baz, welê bêdeng, jê hinekî bi dûr, li pê, radiweste û lê dinihêre. Xwezî ew neketa hundir û Kevok ji xewna wê ya taybetî hişyar nekira, ji gotinên wê yên ecêb ên strana ecêb bi dûr nexista. Niha ew çî bibêje jî bêkêr e. Gotin êdî nikarin wê sihêra odê ku tesîr li Baz jî kir, li wî, li wê, vegerîne. Ev keça narîn, ev keça kûvî, zana û têgihîştî, bi tirsê, veciniqî. Gotin hew lê tesîr dikin... Bi qasî çendekê, Baz, kenekî nerm li ser rûyê wî û Kevok, tirseke mezin li ser rûyê wê, welê li pê rawestiyayî, hinekî dûrî hev, li hev dinihêrin.

Paşê Baz, bi gavên giran, bi seriyekî giran, vedigere midbexê, lampa midbexê vêdixê, dere û devê sarincokê vedike, jê şûşa dirêj a votkayê û şûşa biçûk a leymonatayê derdixê, wan datîne ser masa midbexê, ji dolabeke midbexê qedehê derdixê û vodka û leymonatayê dixê qedehê. Ew qedehê werdigire û dil dike ji midbexê derkeve, lê berî ku ew derkeve, mîna ku ji nişka ve, tiştêkî nû hatibe bîra wî, ew vedigere ber sarincokê, devê wê vedike, ji çavikeke sarincokê çend serî qeşa digire û bi destan wan dixê nav qedehê. Hingî Baz vedigere oda rûniştinê. Kevok hê li pê, li cihê xwe, rawestiyayî ye. Baz dengê xwe nake, bêdeng dere û li ser dîwana dirêj û fireh rûdine, qedehê datîne ser masê, çakêtê xwe yê reş ji xwe dike "li der gelekî baran heye, hevalan ez heta ber derî anîm, baran zahf e" dibêje, çakêt datîne kêleka xwe, ji berîka hundir a çakêt pakêta cixarê derdixê, jê cixareyekê vêdixê û didomîne, "êdî zivistan hat, zivistaneke nû, zivistanek ji zivistanên bêhejmar ên mîna hev, zivistaneke nû ya vî welatê terrr..." Ew gotina xwe dibire, naxwaze bidomîne û ji qedehê çend qult vedixwe. Hingî destika demança wî ku di ber wî de ye, li kêleka kembera wi ya pantolon, dibiriqe.

Kevok, welê li pê, lê dinihêre. Bêdeng, bi rûyekî sar, bêruh, mîna rûyê heykelekî. Lê bi nêrîneke kûr, nêrîneke lêger, pirstijî, dudilî, sûzen. Belê bêdeng; bêdengiyek ku êdî bûye jiyana Kevokê, ew êdî, ji wê roja mirina Rênas û vir ve, li nik însanan, insanên ku ew xistine ser vê riyê, her bêdeng e. Ji carên kêr ên

pêwist pê ve, dilekî bêdeng, ruhekî bêdeng. Mîna axa bêdeng a vî welatî, mîna berbanga bêdeng a rojên gundê wê, mîna însanên ketî û kuştî yên rojên wê yên bihurî, mîna vê mala sar û bêyom a lojmana leşkerî...

Baz çend qultê din jî vedixwe, cixare dikişîne, "westiyame", dibêje û hêvî dike ku Kevok tişteki bibêje. Lê deng ji Kevokê dernakeve. Baz lê dinihêre. Kevok; porê niha dirêjbûyî, nêrîneke masûm, çavên reş ên ronî, hûç çavan naqirpîne, çavên kûr, gelekî spehî, tirstijî, kesertijî. Çavên xerîb... Baz qedehê xelas dike, radibe, dere midbexê û piştî bîskeke, bi qedeheke dagirtî vedigere. Piştî ku ew li ser dîwana fireh rûdine, "çima tu hişyar î?" dibêje. Kevoka ku hê jî li pê ye, bersiv nadiyê. Ji der dengê barana boş tê. Ronahiya tenik a findan li ser dîwarên odê xwe li ba dike. Li odê, ji dîwaneke dirêj û fireh, maseyeke dirêj, du kursî û doşeka ku Kevokê li ber pencere raxistiye, pê ve, hema çi bigire, hûç tişteki din nîn e.

"Rûne", Baz, votka xwe vedixwe û dibêje, "metirse, ez te naxwim, rûne... ez dixwazim hinekî bi te re bipeyivim..."

Kevok, bêdeng, li ser doşekê rûdine, çokên xwe dikişîne ber zikê xwe, fîstanê xwe yê dirêj berdide ser lingên xwe, çengê xwe datîne ser çokan û li Baz dinihêre. Findên li ber pencere û li ser masê, ji herdu milan, ronahiyekê didinê. Rûyê wê yê hinekî dirêj ê narîn, xêzên li ser rû û enî, kortikên li dora çavan dixuyin. Porê wê yê reş û dirêj, niha, li ser milên wê, bi şewqê, dibiriqin. Kevok, niha, ji her carî zêdetir, qemerî dixuye.

"Ew çi stran bû, te digot?" Baz, bi ken, piştî çend qultên din, dibêje, "dengê te gelekî zîz bû..."

Kevok bersiv nadiyê. Baz qedehê datîne ser masê, ji cixarê nefesekê dikişîne û israr dike, "ez bi tenê meraq dikim... Metirse... stranê behsa çi dikir?"

"Dadê, diya min ev stran digot", Kevok, bêtî ku li Baz binihêre, çavên wê li ser tiliyên wê yên dirêj, dibêje, "bavê min dawiya heftan dihate gund. Her êvara yekşemiyê ew vedigeriya

bajêr. Wê êvarê, êvarên yekşemîyan, gava Dadê ez dikirîm xew, wê ev stran digot. Gotinên stranê gelekî kevn in. Hingî gava Dadê digot, min stran fam nedikir. Wê serê min datanî ser çoka xwe, li dûr dinihêrî, mîna ku ew li dereke din, li dinyayeke din be, digot. Min li devê wê, li lêvên wê yên ku bi dûzen, bi aheng dilivîyan, dinihêrî. Gotinên ku ji devê wê derdiketin, gotinên gund û çîyan bûn. Mîna ku hênkahiya bayê zozanan, ronahiya berbanga sibehan di nav wan gotinan de veşartî bû... Carina wê stran dibirî û ew disekinî, gotin diqurmiçîn. Sekinandina wê û bêdengiya ku bi sekinandinê dihate pê jî perçeyek stranê bû. Stran çêla koçekê dike. Koça gundekî. Jinîkek xwedî zarokeke dergûşê ku li gund maye, li pey koçê, li pey evîndar, dê û xweh, bav û kalên xwe, vê stranê dibêje. Gotinên wê yên sade û zîz bi xem û keser in. Dadê ev stran digot, pêşî hêdîka, paşê mîna destanekê û paşê jî bi girî... Ev strana Dadê ye..."

Kevok radiweste, bêhna xwe dide, "Dadê", dibêje, lê dewam nake, disekine. Bêdengiyekê dest pê dike. Bêdengiyek kûr. Baz jî napeyive, bi tenê votka vedixwe û li Kevokê dinihêre. Ji der dengê xuşîna baranê tê. Findeke li ber pencerê, heye ku bi quweta bayê ku ji qelîşkekê xwe digihîne hundir, li ba dibe. Kevok bi tilî û pêçiyên destên xwe ku li ser çokan e, bêdeng, dilîze. Baz cixare dikişîne, lingên xwe hinekî dirêj dike û li Kevokê dinihêre; Kevok, keçikeke nermik, nazik, hinekî tirsok, hinekî şermok, heye ku ji ber rewşa ku ew tê de ye. Nermik, lê di eynî wextê de asî, maxrûr, têgihîştî. "Xwezî ev keça hanê ne çîyayî bûya, ne ji van deran bûya." Baz difikire, "xwezî min ew weha di vê rewşê de, nas nekira, ne mîna dijmînekê, lê mîna dostekê min ew nas bikira..."

"Dadê", Baz, piştî çendekê bêdengiyê xira dike û dibêje, "Kevok, li min baş guhdarî bike... heta demekê, demeke gelekî dirêj tu nikarî diya xwe, bavê xwe, heval û dostên xwe, nas û xizmên xwe bibînî, bi wan re pêwendî deynî yan jî herî dereke din. Zûtirîn wext tiştên weha ji serê xwe derxe û ji xwe bi dûr xîne, da

ku tu bikaribî hinekî rehet bikî. Heta demeke dirêj, tu ne tu yî, tu ne Kevok î, tu tune yî... Heta demeke dirêj jiyana te weha bi dizî û veşartî ye. Ji bîr meke."

Kevok dengê xwe nake, mîna ku gotin ne ji bo wê ne, ew welê bêtevger, bêawir, li pêçiyên xwe dinihêre.

"Rewşa te ne baş e", Baz, piştî qultekê, didomîne, "rewşa min ne baş e... Serek û amîrên min dixwazin ku ez te teslîmî wan bikim... Mîna te bi sedan kes hene. Yanê kesên ku dev ji sewda serhildanê berdane û niha bi me re ne, bi dewletê re, ji bo dewletê dixebitin û alîkariya me dikin. Piraniya wan di hepisxanan de ne. Çaxa hewce be, em wan ji hepisxanan derdixin û bi xwe re dibin êrîşan. Hinên wan ên bijarte jî bi me re ne, lê ew, şev û ro, li rê, di nav şer de ne. Her roj ew dimirin û dikujin... Rewşa kesekî ne mîna rewşa te ye. Bi zanîn min tu anî vê derê da ku ez bikaribim te biparêzim... Te ji mirinê xelas bikim. Eger tu rastiyê bipirsî, ez jî nizanim çima, lê gunehê min bi te hat... Çaxa min, cara yekemîn, tu dîtî, ez nizanim çima, lê di hundirê min de tiştekî mîna pêta çirîskeke vêket. Dilê min razî nebû ku keçikeke mîna te xwenda, têgihîştî û... û xweşik, spehî û xama were kuştin... Lê niha amîrên min te dixwazin... Bi îhtîmaleke mezin ji bo kuştinê... Tu hew bi kêrî wan, bi kêrî tiştekî têtî... Tu bibêje, em çi bikin?.."

Kevok bersiv nade, dewsa bersivekê, ew li findeke li ber pencerê ku xelas dibe, dinihêre.

"Kevok", Baz, hinekî esebî, dibêje, "Kevok, ez westiyayî me, mêjiyê min, dilê min, ruhê min westiyayî ye... Serê min diêşe, eniya min diêşe, min mewestîne, bibêje, em çi bikin?"

"Ez nizanim", hingî Kevok rûyê xwe vedigerîne ser Baz û zahf hêdî, dibêje, "ez naxwazim bibim bar. Jixwe tiştekî din ku ez bikaribim bibêjim, bikim nûn e. Amîr rast dibêjin, ez bi kêrî tiştekî nayêm. Jixwe ez mirime. Eger tu dil dikî, min teslîmî wan bike..."

"Na, min hin tişt, ji wan re, gotin. Ez bawer im, heta demekê, ew îkna bûn. Tu dê bimînî, lê heye ku tu, carina, bi me re derkevî êrîşan."

Piştî gotinê, Baz radibe ser piyan, dere midbexê û bi qede-
 heke nûdagirtî vedigere odê û tê û rûdine. "Kes divê te nebîne,
 tu tune yî, xwe hînê vê yekê, vê hîsê bike... Jiyana te niha ketiye
 ser riyeke nû û heta mirinê, ez bawer im, ew ê weha dewam
 bike... Navê te, paşnavê te, cil û bergên te, her tiştên te dê bîn
 guhertin", ew dibêje û li Kevokê dinihêre, bi bal, bi dîqet. Ev bê-
 dengiya vê keçikê, ev maxruriya wê çi ye, ji kû tê? Baz, cixare di
 dev de, difikire, hiş û mêjî, beden û ruhê wê bi çi mijûl e, çi difiki-
 re, çi hîs dike? Xwîn, tola xwînê? Kîn, nefret? Kel û coşa şîdeta
 ku însanan dîl dixîne? Şer, pevçûn, kuştin? Sil û sûzeniya tirs û
 xemê? West? Belê west, heye ku west, heye ku keçik jî westiyayî
 ye, mîna Baz westiyayî, dil, beden û ruhekî westiyayî. Kî dizane,
 heye ku ev ruhê xerîb, nenas û westiyayî alîkarî li ruhê westiyayî
 yê Baz jî bike da ku Baz aloziyên ruh û mêjiyê xwe aş bike? Lê
 xwezî ev keça hanê ne ji vî welatî bûya. Di vê dema şer, pevçûn
 û kuştinê de, ev tişt, ziman, dê, bav û kalên vê keçê dibin barekî
 giran, kospeke giran. Lê her çi be jî, hewcedariya Baz pê heye,
 bi keçikek, jinikek, hevalek, dostek ku ew dikare pê re bipeyive,
 bixwe, vexwe, razê heye. Hewcedariya ruhê wî yê westiyayî pê
 heye. Ji bo ruh, dil, mêjî, ew mecbûr e... Belê Baz ê navdar, xurt,
 fermanîdar, -bi gotina amîrên wî- Baz ê ku mîna pola qehûm e,
 hewcedarê vê yekê ye. Dilê wî yê ku hîç kesekî, ji derve nikare
 bibîne, ruhê wî ku hîç kesek bi hewalê wî nizane, hewcedar e.

"Kevok" Baz, çend qultên din vedixwe û dibêje, "tu dikarî wî
 çentê min ku li holê ye, ji kerema xwe, bînî."

Kevok, bêdeng, radibe, dere ber deriyê derve, çente hildide
 û tîne, dide Baz. Paşê jî ew dere û dîsan li cihê xwe rûdine. Baz,
 hêdîka, qumçika çente vedike, jê hin kaxiz, dosye û defter der-
 dixê û defterek ji nav wan dikişîne û wê dirêjî Kevokê dike, "fer-
 mo, deftera te, deftera şîrên te..."

Pêşî Kevok tînegihê ka Baz çi dibêje, çi dike, lê paşê çaxa ew
 li deftera destê Baz dinihêre ew rengê defterê dinase. Deftera
 Kevokê!.. Heval û hogira wê ya serê çîyan, zimanê derd, xem,

xwestek, arzû, miraz, jan, keser, hesret, fikir û hêviyên wê. Deftera ku Kevokê, carina, bi qelemên cihê, têkel, tê de rêzine basîd, mîna şîrên basîd dinivîsî. Rêzên ku ji dil û ruhê wê dihatin û wê nikaribû bi kesekî din re bipeyiviya. Deftera ku hin sir û esrarên Kevokê tê de veşartî bûn. Deftera ku rehetiyek, ferehiyek dida Kevokê, bêhna wê ya çikiyayî vedida. Belê, ev deftera Kevokê ku gava Kevok birîndar ketibû, tevî çentê Kevokê, winda bûbû. Niha, defter li vir, li mala lojmana leşkerî, di vê nîvê şeva şilî de, li ber wê ye! Û Baz, ji hemû însanên vê dinyê Baz wê berpêşî Kevokê dike!

"Fermo", Baz, bi ken dibêje, "mîn lê nihêrî, rûpelên ku te bi zimanê me nivîsîne, xwendin, yên din jî hinên din xwendin. Tê de tiştêkî xeter nûn bû. Şîrên te xweş in. Tu dikarî wê bigirî û bîdomînî. Heye ku bêhna te teng be, heye ku şîr alîkariya te bike."

Kevok radibe û tê ber Baz, ji destê wî defterê digire û dibêje "spas." Bi kurtî spas. Lê hingî Kevok heye ku cara yekemûn, bi awireke din, bi bal û nêrîneke din, li Baz dinihêre. Kevok dere û li cihê xwe rûdine. Ew deftera xwe, mîna ku ew zarokekê hembêz bike, welê dixê hembêza xwe. Careke din, ew, dilgerm, dibêje spas.

"Şîrên te xweş in" Baz dikene û dibêje, "ez jî, herwekî ku te aniye zimên, mîna ku ez di xewê de bim, xewnekê bibînim, vî welatî dijîm, dibînim û dibihîzim. Lê te, bi rastî, xweş taswîr kiriye."

Hingî Kevok, bi dengêkî gelekî nerm, "na, ev welat, însanên vî welatî ne xewn in" dibêje, "tiştên ku mîn nivîsîne, ne xewn û xeyal in. Gund, dahl û daristanên ku dişewitin, însanên ku dimirin û tînin kuştin, qîrîna ku tê bihîstin, rastî ne, rastiya vî welatî ne."

"Lê mîna xewnekê, ne wisan?" Baz, ji bo ku Kevokê bide peyivandin, dibêje.

"Na, ne mîna xewnekê, mîna felaketekê, mîna qiyametekê. Ev hemû rast in, rastî ne. Ev welat, ev însan, ev dever hemû dijîn, reh û rêçên wan, nav û şanên wan, tecrube û tarîxa wan hene...

Ev rastî ne. Min, li vî welatî, rastî ye, kuştin jî. Rastiyeke welê ku her mirinek, her kuştinek rastiye, rastiya vî welatî, rastiya Welatê Mezin, rastiya me hemû însanan, rastiya însaniyetê jî, hinekî din, dikuje, rastiyeke welê ku tevî kesê mirî, kesê destxwîn jî dikuje..."

"Ma tu ji min re nabêjî, ka çi bi serê Jîr de hat?" Baz, bi meraq, lê bi awirê nerm ê Kevokê û bi gotinên wê yên dirêj kêfxweş, dipirse, "Jîr ê ku te ji me re behs kir, ku tu di defterê de dinivîsî?"

"Ez nizanim", Kevok, ji nişka ve, mîna ku ew li xwe werqilî be, bi kurtebirî, dibêje û radiweste.

"Tu dibêjî, ew jî hatiye kuştin?"

"Ez nizanim..."

"Te hêvî heye ku tu, careke din, li darê dinyayê, wî bibînî?"

"Ez nizanim." Kevok dibêje, bi qasî bîskeke bêdeng dimîne, paşê didomîne, "na, ez ne bawer im..."

"Ji min re bibêje, te jê hez dikir?"

"Belê", Kevok, bi dengê misoger, qetî, dibêje.

"Te çawan jê hez dikir, te çi dikir, te jê re çi digot, hezkirina te çawan bû?"

Kevok bersiv nadiyê. Baz, bi gotina xwe poşman, radihêje qedehê, jê hinekî vedixwe û kaxiz, dosye û defterên li ser masê, dîsan dixê çente, devê wê digire û datîne ber lingê dîwanê.

Hingî Kevok tiştekî nepayî, hêdîka, dibêje, "çima hûn me mîna ku em hene, mîna ku em dijîn, qebûl nakin? Çima hûn me rehet nahêlin û dixwazin her û her me biguherînin?.."

Baz dikene, "keça min, naxwe me li hev kiribû, em û hûn tune. Em heye, bi tenê em, hûn jî em in, em jî em in. Ne wisan?"

"Lê..." Kevok, bi gotina xwe poşman, dibêje, "lê ev însanên vî welatî dixwazin mîna xwe bimûnin, bi reh û rêçên xwe, bi tarîx û huwiyeta xwe bijîn, ne tiştekî din, ne daxwazeke din. Ma ev daxwazeke gelekî mezin e?"

"Ev hemû lîstik in, lîstikên dijmin... dev ji van berde û careke din gotinên weha divê ji devê te dernekeve... Tu, niha, ji min re

bibêje, me li hev kiribû, ne wisan, bi tenê em heye, em hene, ne wisan?"

"Belê", Kevok dibêje û rûyê xwe ba dide, ji pencerê, li der dinihêre.

Baz li qedehê dinihêre. Qedeh dîsan vala bûye. Findek li ser masê jî xelas bûye. Di xwelîdanka li ser masê de bi qasî çend qûnçikên cixarê civiyane. Baz dil dike rabe û here midbexê. Lê ew nikare, hişê wî dere. Ew westiyayî ye, serê wî, mîna ku biteqe, diêşe, xewa wî tê. Ew dîsan rûdine, bi westa xwe hesiyayî, lingên xwe dirêjî dîwanê dike û li wext, şev û rojan difikire. Niha saet çendê şevê ye? Yek, dido? Kîjan roj e? Ev keçik kî ye, li kîjan alî ye? Dost? Dijmin? Na, ez divê ranezim, Baz difikire, ez, bi tenê, carina tîm vê malê, cem vê keçikê, razan nabe. Ez divê wê binasim, kûrahiyên dil û ruhê wê binasim. Li pey vê maska sade, paqij, saf û xweşik çi heye, divê ez bibînim. Na, razan nabe. Lê hingî vodka divê, vexwarin, cixare divê. Jê bixwazim? Na, nabe. Bila west, bila xew were, lê ez Baz im, razan nabe. Dijmin an dost, nas an nenas, divê ez li çavên vê keçika xerîb, li lêv, ken, beden, hêt, çîm, dil û ruhê wê binihêrim. Ez divê wan memikan gez bikim, bimijim, bikevim nav sîng û berên geş û teseliya westê, çara şikestinê û dermanê xurtiyê li wir bibînim. Ez dizanim, hizûr li wir e, di nav lêv, stû, guh, sîng û ber, hêt û çîm, ten û bedena ciwan de ye. Di nav wî dilê xerîb, ruhê nenas de ye. Ez divê li wir razim...

Ji nişka ve, Baz, "Kevok, keça min, were" dibêje, "were cem min, li vir, li kêleka min rûne." Kevok dengê xwe nake. "Were ba min, destê xwe bide min", Baz, dîsan, mîna ku ew lava bike, hêdî, dibêje. Lê Kevok naçe, xwe nalivîne, bi tenê, bi tirs, bi çavên lavatişî, li Baz dinihêre. Dîsan ew çav, ew çavên reş û ronî ku mîna findan şewq didin! Dîsan ew tîrsa kambax ku niha hatiye û di nav kûrahiya çavan de rûniştiye!

"Metirse, keça min" Baz, bi xîreteke dawîn, lê hinekî şermkirî, dibêje, "ez ê te nexwim, metirse, were ba min, destê xwe bide

min. Destê xwe bide min, di vê baran û serma, şev û tariyê de, nermahiyek, germahiyek bigihûne min... Kevok, westiyayî me, serê min diêşe, destê xwe bide destê min ê sar, min hembêz bike, germahiya xwe bide min, bigihûne min... Tî me, ava xwe bide min, birçî me, xwe bide min... Ez dixwazim te, bedena te, her tiştê te binasim, di nav pêşîrên te de razêm, hişyar bibim, tê de winda bibim... were." Baz, careke din, lê îcar bi qîrîn, dibêje "were!..."

Paşê, ji nişka ve, Baz gotinê dibire. Ev çi gotin in? Ew difikire, ez serxweş im, Baz, tu serxweş î, tu nizanî ka tu çi dibêjî, guhê te gotina devê te nabihîse! Ew, bêdeng, li Kevoka ku rûniştiye û bi tirs, li wî dinihêre, mêze dike, lêvên xwe, bi zimanê xwe şil dike, lêvan vedike, dixwaze tiştêkî bibêje, heye ku tiştêkî bipirse, lê gotin ji lêvan dernakeve. Dîsan bêdengiyek dadikeve ser odê, ji bilî dengê baranê êdî tu deng nîn e. Bêdengî kûrtir, firehtir dibe. Baz dinihêre; westiyayî, serxweş, gêj. Baz dinihêre; hêvîdar, hewesdar, arzûdar. Baz dinihêre; tî, birçî. Û çavên Baz, hêdî hêdî, tên girtin û ew, welê li ser dîwanê dirêjbûyî, dest bi xire xirê dike.

Bi razana Baz re, Kevok, deftera wê di destan de, bi lez, radibe pê û dere midbexê. Bi qasî çendekê, ew li pê, li dora xwe, li mase û kursiyên li dorê, li pencera midbexê, li dolab, ocax û sarincokê dinihêre. "Ev çi hal e!", Kevok, dibêje, "Xwedayo, ev çi hal e, ez ketimê?..." Kevok dere ber ocaxê, devdilkî qûşxana şîva xwe ya êvarê ku li ser ocaxê ye, hildide, dîsan devdilkî datîne ser qûşxanê, dere ber sarincokê, deriyê sarincokê vedike, li fêkî û sebzeyên tê de dinihêre, vedigere ber masê, li şûşeyên Baz ên li ser masê dinihêre û paşê rûdine. Ew serê xwe dixê nava herdu destên xwe û bi deng, "ev çi hal e?" dibêje... Çare divê, rê divê... Defter tê bîra wê. Defter... Ew radibe, dere defterê ji kêleka ocaxê werdigire û tê, dîsan, rûdine. Ew, bi heyecan, bi germahiyeke bêpayan, tirsiyayî, dudilî, rûpelên defterê vedike. Destnivîsa wê, xwar, xweşik. Bi zimanê Welatê Mezin, bi zimanê Baz. Carina bi fransizî. Rêzin jî bi zimanê diya wê. Deftera wê; rêzên nekemilî,

zimanê hîsên germ, çoş û keserên teze, birînên xedar. Hîs, fikir, guman û pêjnên peregende. Rasterast, bêyî ûslibeke tekûz.

Niha jî rêz divên, nivisîn divê.. Derman di defterê de ye!.. Kevok radibe, dere ber sarincokê, destê xwe dibe ser sarincokê û ji wir sê pênuş werdigire û vedigere ber masê, li ser kursî rûdine. Bi lez, ew rûpelekî vala ji rûpelen dawin ên defterê vedike û bi eynî lezê, bi pênuşeke sor "ev çi hal e!" dinivîse. Ew eynî cimlê, çend carên din jî, li pey hev, dubare dike. Ew hinekî radiweste, lê paşê, bi leza birûskê, eynî cimlê dinivîse. Careke din, careke din, heta rûpel bi eynî cimlê tijî dibe. Ew rûpelekî nû vedike û bi eynî lezê, "ez dimirim, ez difetisim" dinivîse, "ez minime, ez fetisîme... xwînê ez kuştîme, tirsê ez fetisandime. Xwîn, tirs, xwîn û tirs bûne qedera min... ez çi bikim? Ez perçe bûme, ez wînda bûme. Jiyan vemiriye. Perçeyên jiyana min, di taritiyê de, peregende, belav bûne. Her yek li dereke. Xew nîn e, xwarin nîn e, dost, heval nîn e, kar, şixul, jiyan nîn e, rû û rûçik nîn e. Ez ê çawan bikaribim van perçan, mîna perçên cêrekî şikestî ku bûye hezar perçe û belav bûye, bidim hev? Ez bi kû de herim? Ez çi bikim? Ez dikarim çi bikim? Ev çi hal e? Her der xwîn e, her der mirin, kuştin, birîn e. Her der tirs e. Ez ditirsim. Xwîn û tirs min dikujin. Ev welat min dikuje, ev însan min dikujin. Ez dimirim..."

Mîna ku tiştek bi bîra Kevokê ketibe, ew radibe pê, dere ber dolaban, ji dolabekê, teyfikekê derdixe, tê qûşxanê vedike, bi kevçiyê teyfik tijî xwarin dike û tê rûdine. Ew defterê hinekî ji xwe bi dûr dixwe, teyfikê datîne ber xwe û bi kevçî, bê nan, bê av, zahf bi lez, xwarin tê de dixwe. Bêrawest. Paşê, piştî ku ew teyfikê vala dike, bi eynî lezê, teyfik bi dûr dixwe, defterê dikişîne ber xwe û li cihê ku maye, li ser rêzeke nû, "Ez kî me?" dinivîse, "ez kî me? Dijmin? Xayin? Çima ez weha bûm? Çima ez ketim vî halî? Ez li wî difikirim, li wan difikirim. Ez dizanim, ew, ewana êdî ji min hez nakin, êdî ez ne hevala wan im, Kevoka wan im. Ez dizanim, ew, ewana, niha, ji min nefret dikin. Belê, nefret, nefreta ku bûye qedera vî welatî, qedera me hemûyan. Baran

dibare, dinya sar dibe, çiya şil dibin, berf ê bikeve erdê, lê ez hew bi wan re me. Kî me ez? Xayin? Xayina welat, dewlet, ala, ordî, millet, şervan, tevgera serhildanê? Xayina baran, tav, berf, heyv û stêran? Xayina dol, tov û tolê? Porê min dirêj bûye, birînên min cebirîne, niha, îro, na do, xwîn li min ketiye, ez heme, ez dijîm. Ez dizanim, ev xwîna ku niha ji min dere, jîyan e, jîyana min e. Ez dijîm, lê xayin, mîna xayinekê, xayina her tiştî, her kesî.. Xayina jîyan û dinyayê...”

Kevok dest bi girî dike, destên xwe ji defter û pêncûsê dikişîne, destan dibe ser rûyê xwe, mîna ku ew dil bike ku rûyê xwe binase, rûyê xwe hinekî mist dide û digirî. Hêdîka. Ew rondikên çavan li ser rûyê xwe belav dike, bi rondikan rûyê xwe mist dide. Paşê ew destên xwe dibe ser devê xwe, tiliyên şil ên destan li ser lêvên xwe digerîne, destan ji wir, ber bi jêr, ber bi stû, mil, çeng, pêşîr, zik, navzik û berzikê dibe û digirî. Bi qasî çendekê, herdu destên wê, li ser berzikê, nav lingan, ew digirî. Belê, ev xwîna ku niha lê ketiye, jê dere, ne mîna xwîna mirinê ye. Ji bervajiyê, ev, xwîna jîyanê ye, îspata jîyanê ye, nîşana vejandina jîyanê ye. Lê jîyaneke çawan? Ew êdî çi jî bike, bêfêde ye, carekê jîyana wê herimiye.

Ew roja ku cara yekemîn xwîn lê ketibû, niha, bi kitekit, tê bîra wê. Koleja fransizî, li dersxanê, danê sibeyekê. Ew, tevî hevaleke xwe, rûniştî. Germahiyek ku di nav lingên wê de tê pê. Û şiliyek. Mîna ku bêhneke germ, ecêb jê difûre. Mîna ku ew ketibe hemamê, mîna ku jê ava germ a hemamê dere, mîna ku kursiyê ku ew lê rûniştiye, der û dorên wê, hemû dersxane di nav wê ava germ de dimîne. Mîna ku herkes lê dinihêre. Gerçî Kevok fam dike ka çi pê diqewime, lê ew şerm dike, mîna ku ew bikeve binê erdê, fedî dike... Ders xelas dibe, herkes ji dersxanê derdikeve, lê ew û hevala wê ya kêlekê ku Kevok jê re behsa xwîne dike, ji cihê xwe ranabin. Kevok, ji şerm û tirsê, newêre, rabe. Mamosta fransiz li wan, bi çavên pirstijî, dinihêre, tê ber wan û disekine. Hingî hevala Kevokê, bi ken, bi serê xwe, Kevokê

nîşan dide û jê re, bi gotineke kevnare, "regles" dibêje, paşê jî gotina xwe didomîne, "menstruation, menstrue..." Mamosta pîr a çavşîn û pordirej dikene û Kevokê hembêz dike, bi kêf, bi şef-qat... "Mon petite fille..." mamosta dibêje, "tu dibî kanî, kaniya jîyanê, madêra jîyanê. Pîroz be..."

Xwîn, xwîneke -bi qewlê mamostayê- pîroz, xwîneke tîr, hinekî reş, tarî. Her meh, her car, çend roj... Xwîna ku xewn, xeyal, fikir û mirazên nû tîne pê. Xwîna ku tevgereke germ, heyecan û bestijî di hemû bedenê de tîne pê. Xwîna ku şitila ciwaniyê av dide, xamahiya har dike. Pêşî esebiyet û west, paşê xwîn, paşê daxwaz, best, hêvî... mîna guleke nûbişkivî, mîna kulîlkên rengîn ku di destpêka biharan de ji nav berfê serî rakin. Hêviya Kevokê ya mehan, ya salan; rojekê hîsên bêpayan xurt ê dilê wê vegirin, dengên, gotinên pêyanan şên, şûh û geş ê mêjiyê wê tijî bikin, dil ê yek bin, beden ê yek bin, bi sikûnet, ji lez û bezê dûr, bi coş, bi meraq, germahî û ronahiyek ê hundirre Kevokê tijî bike, ji tilî heta por, heta serî, mêjî, hemû bedena Kevokê ê bi wê germahî û ronahiya xurt biçelqe, bişewite, carek, du car, deh car... û rojekê xwînê bisekine, hew were. Mehek, du meh... Zikê Kevokê dê mezin bibe, mehek, du meh... tê de tovek ê hêşîn were, zarokek ê were pê. Zarok ê xwe bilivîne, dest pê bike, pihîn bavêje. Xwîn ê neyê, lê zarok ê mezin bibe û were. Zarokeke din. Maleke germ, bi dengê zarokan. Jiyanekê mesûd, serfiraz... Hêviyên Kevokê yên her meha piştî xwînê... Hêviyên ku niha qurmuşî ne... Û xwîna ku li tu tiştî guhdarî nake û niha jî jê dere, xwîna ku hêviyên wê, bi temamî, jê dibin.

"Ev çi hal e!" Kevok, destên wê di nav lingan de, dibêje û digirî "ji kû heta kû!..."

Ew ê çi bibe, Kevok? Kevok, bideng, dibêje, dîsan ji nişka ve, mîna ku ew di xewê de be, radibe pê, teyfikê dîsan tijî xwarin dike û vedigere ber masê. Ew xwarinê, mîna ku ew ji xela hatibe, welê bi lez, dide ber kevçiyên û di nav bîskekê de teyfik, dîsan

vala dike. "Ew ê çi bibe?" Kevok, careke din, ji xwe, dipirse, ev hal, ev hewal? Ne roj, ne şev. Weha girtî li vir, di nav van çar dîwaran de, bi tîrsa mirin û windabûnê, bi nezaniya bûyer û tevgerên dinyayê. Ne rojname, ne radyo, ne telewizyon, ne saet, ne neynik. Bi tenê çend kitabên ku hin zabitan li ser tarîxa Welatê Mezin û li ser jiyana General Serdar nivîsîne û du kitabên biçûk ên marşên leşkerî yên Welatê Mezin. Bi tenê leşkerekî bejndirêj û gelekî jar ku carina, bi kilîdê derî vedike, dikeve hundir û jê re nan, fêkî, sebze, goşt, rûn û şîr tîne. Bi tenê, di vê mala bêperde, bêmobîlya, bêruh de, rûniştin, ji penceran li der, li malên zabitan nihêrtin û di oda vala ya razanê de, li ser textê hişk, tevî cil û bergên wê yên riziya, razan. Bi tenê stranên Dadê û bav û kalan ku Kevok xwe dispêre. Û fikir û guman, xem û keser... Û li der nobedar, li her aliyên lojmanan leşker. Û Baz ê ku carina, weha nîvê şevê, serxweş, demançe di ber de, tê, rûdine, çend gotinên vala dibêje û –ne li oda razanê– li ser dîwanê radizê û di berbanga sibê de, bêyî ku ew Kevokê hişyar bike, radiibe û dere. Bêyi tu gotinê, bêyî îzah û sohbetê.

Lê îşev? Çima îşev weha bû? Çima îşev ew weha zahf peyivî, wî weha xwe eşkere kir, niyeta xwe diyar kir? Naxwe tiştê ku ew dixwaze, ev e? Lê çima weha? Çima weha jar, ketî, şikestî, westiya, ku gunehê merivan pê tê? Ew û Baz! Niha, li malekê! Eger kesekî, berî niha bi demekê jî ev yeka hanê bigota, herkesî dê pê henekên xwe bikira. Kê dê bawer bikira ku ew û Baz ê, weha, li malekê bûna, li malekê razana!..

Kê dê bawer bikira ku Kevok ê, ji ber tîrsa kambax, ji ber daxwaza jiyana kambax, vê rewşa kambax qebûl bikira? "Çima Kevok", Kevok, bi girî, hinekî dengê xwe bilind dike û dibêje, "çima tu ve yekê qebûl dikî? Çima tu gava dawîn navêjî û xwe ji vê kirêtiya ku her rojeke wê mirinek e, xelas nakî? Masiya ku li keleşestê ketiye, çi dibe, Kevok, çi pê diqewime? Dawî? Dawiya vê tenêtiyê, tînetiya dil û ruh, dawiya vê bîdengiya tenêtiyê, dawiya dengê baranê, dawiya vê payina bîdeng?"

Kevok radibe pê, bi gavên zahf giran, hêdî hêdî, ji midbexê derdikeve, dere salonê. Baz li wir, li ser dîwanê ye, li ser kêlekê, rûyê wî li ser balîfa dîwanê, bi xire xir radize. Kevok, hêdî hêdî, dere û li ser serê wî disekine. Find vemirî ne, bi tenê yeke li ser masê ku ber bi xelasbûnê dere, ronahiyeke gelekî qels direşîne ser rûyê Baz. Ev kî ye? Kevok, bêdeng, bêlebat, lê bi bal û dîqet, li Baz dinihêre û difikire, Baz? Kî ye Baz? Baz; mirin, kuştin, şewat, tirs, kîn, nefret, xwîn... Ji van pê ve? Belê, axa sar, kevirê sert ê sar, mirina sar, tarîtiya sar a mirinê. Belê, peyayê şevê, peyayê ku ji ronahî û berbangên ronî gelekî dûr e. Baz; jan, keser, qîrîn, nalîn... lê ji bilî van?

Kevok hinekî din xwar dibe û li rûyê Baz dinihêre. Ev rû, ew difikire, gelo ev rûyê ku niha, sakîn, aram di xew de ye, rûyê mêrkujekî ye? Çima xew weha dike û rûyên têkel, yên xwînrij û masûman, yên tawanbar û mazlûman, yên hemû celeb, hemû texlîd însanan diqulipîne ser rûyekî sakîn, aram? Çi ferq niha di navbera vî rûyî û rûyê Rênas, Rênasê ku Kevok bû sebeb mirina wî de heye? Eynî enî, eynî çav, eynî rengê qemerî, hema çi bigire eynî simbêl, eynî masumiyeta li ser rû... Lê ev Baz e!.. Kevok, ev Baz e!.. Kevok, dest bibe xwe... xwe sil meke, xwe riswa meke...

Kevok hinekî ji Baz bi dûr dikeve, derbasî aliyê din ê masa salonê dibe û difikire. Her tişt dikare di nav bîskekê de biqewime û biqede, bi tenê hinekî xurtî, hinekî cesaret divê. Bi qasi çilkekê. Kevok, hinekî xurt be... Demançê Baz niha ketiye bin wî. Lê ma Kevok nikare mîna birûskê wê ji wir derxe, dayne ser eniya Baz û demançê di serê wî de vala bike û paşê jî xwe bikuje? Kevok dizane ka meriv demançê çawan bi kar tîne, ew dikare bi hêsanî pê li tetikê bike. Xîret Kevok, çendîn caran te ev tişt aniye bîra xwe, çendîn caran tu li mirin û kuştinê fikirîyî. Çendîn caran te ceribandîye. Lê niha, niha wext e, hinekî xîret... Lê çima Kevok niha evçend sist e, tirsok e, çima rahiştina demançê, pêlkirina tetikê niha evçend dijwar e? Eger ev yeka hanê evçend zehmet be, ma ew nikare here midbexê û ji wir kêreke dirêj a midbexê hilde

û were û kêrê, carekê, di dilê vî kesê mêrkuj de daçikîne û kêrê di dilê wî de, heta ku jê tê, bi kûrahî, bizîvirîne? Carek, careke din, careke din heta ku bedena wî bibe mîna seradê. Û paşê Kevok kêrê deyne ser rehên qewdikê destê xwe, çavên xwe bigire û rehan bibire? Û xwîn, îcar xwîna mirinê, jê here? Xîret Kevok!..

Lê Kevok ditirse. Kevoka tirsok!.. Çima Kevok evçend ditirse? Çima jiyana kambax, niha, evçend şêrîn bûye? Kevok, hewl bide, Kevok, rahijiyê!.. Kevok çend gavan ber bi Baz davêje, dîsan, tê li ber serê wî disekine. Bi qasî çendekê ew welê disekine. Finda dawîn jî xelas dibe, ronahiya dawîn, bi xîreteke dawîn, xwe dilivîne û dimire.

Baz, bi rûyekî gelekî aram, sakîn, xire xirê dike.

Kevok ji Baz rû badide, vedigere, kela giriyê di gewriya wê de, dîsan dikeve midbexê, dere ber masê, li ser kursiyê rûdine, radihêje defter û pênûsê û di rûpeleke nû de, bi destnivîseke xwarûmaro, dinivîse; "ez ditirsim... Ji bilî tirsê ez bi kêrî tiştêkî, tu tiştî nayêm..."

14. Hafiza

Baz. Kevok.

Wext.

Wext dere; saet derin, roj derin, hefte derin, meh derin, demsal derin.

Baz û Kevok li ser riya jiyanê derin.

Mîna hemû însanan, gelek aliyên têkel, xusûsiyetên têvel û tiştên taybetî yên Baz û Kevokê ku li ser riya jiyanê derin, hene, –ku ne hewce ye, em niha wan dubare bikin. Lê sê çem, tevî gelek tiştên din, sê çemên rengîn hene ku hertim di jiyana Baz û Kevokê de, bi şêweyekê, hebûne; herdu çemên Welatê Çiyan û çemê paytextê Welatê Mezin. Sê çem; ku mîna jiyana Baz û Kevokê hertim li rê ne û derin, ku hertim bûne pardarên qedera wan, hertim di jiyana wan de şopên wan dixuyîn.

Mîna niha.

Niha em li payitextê Welatê Mezin in, nezîkî çemê dirêj ê bajêr ku bajêr ji milekî heta milê din, seranser, lê bi çiv dibire. Em li ba Baz in, pê re ne. Baz li payitextê bajêr e. Baz ji welatê xwîn û mirinê vegeziyaye û hatiye bajarê xwe, bajarê zarokatî û xortiya xwe, bajarê jiyana xwe ku mal û zarokên wî lê dijîn. Wext, dawiya biharê ye. Payiz, zivistan li pey mane. Bihar li pey dimîne. Havîn dest pê dike û Baz li payitextê welêt e. Ji bo civînan, şewirandin û pêwendîyan. Ji bo dîtina herdu kurên xwe. Dîtina Maderê, –heye ku ji bo dîtina hin keç û jinên din. Ji bo dîtina jiyana bajarê mezin, bajarvaniyê. Ji bo jiyanê, jiyanêke normal a mîna jiyana insanên normal.

Niha, ji wextan, taştîya rojêke nû ya gelekî ronî ye. Em li malkê ne ku ji bo me nas e, mala Maderê. Em li midbexa wê ya nas in. Mader li midbexê, li ber maseya firaqan a kêleka ocaxê, li pê rawestiyaye û hin sebze, xiyar, bacan, îsot hûr dike. Li ser Maderê kirasekî tenik ê şevê heye. Hemû bejna wê ya kurt, bedena wê ya qelew û girs, pêşîrên wê yên stûr ku heta navzik daketine, hêtên wê yên gelekî fireh, çîpen wê yên mîna stûnan, bezên bedena wê ku girêk girêkî bûne, rehên gelekî tarî yên çîp û lingan û mûyên çîp û lingan ku gelekî reş dikin di nav kirasê tenik re dixuyên. Porê wê yê kurtqusiyayî û belavbûyî, niha, bi rengêkî leylaqî, henekirî ye.

Mader taştê hazir dike. Li ser masa midbexê çend celeb penêr, zeytûn û reçel, tevî du teyfikên fireh, du fîncanên mezin, kêr, çetel, kefçiyên çayê hene. Mader ê xwurîni bike. Bi Baz re. Ji pencera midbexê ronahiyeke çîkî spî xwe dirêjî hundir dike. Ji radyoya biçûk û pembe ya midbexê ku li kêleka pencerê ye, dengêkî qalind ê stranvanekî mêr bilind dibe. Stranvan straneke gelêrî ku hema çi bigire bi marşên leşkerî dişibe, bi maqamekî xurt, bilind dibêje. Gotinên qelew ên stranê ku li ser qehremaniya şan û şerefê ne, midbex tijî dike. Mader, bi kêreke dirêj a midbexê, xiyarekî dirêj, tûzî bi tûzî, jêdike û wan dixê nav teyfi-keke dirêj û vêl, nik îsot û bcanên hûrkirî.

Saeteke biçûk a dîwêr ku bi rengêkî pembe neqîşkirî ye, wextê nîşan dide; 07:33. Serê sibê, destpêka rojêke nû. Piştî ku Mader şixulê xwe yê li ber masa firaqan xelas dike, ew teyfikê digire û dere ber masa midbexê ya xwarinê. Hingî Baz, xweşûştî, kurbûyî, porê wî yê kurtqusiyayî şil, saqoyekî dirêj ê sibê lê, kenek li ser rû, dikeve hundir û "rojbaş" dibêje, "rojbaş Mader, diya rojên min ên xweş..."

"Rojbaş," Mader, bi ken, lê vedigerîne, "rojbaş, lawê rojên min ên geş..."

Baz tê û li ser kursiyek ji kursiyên li dora masê ku li koşa pêşîn a masê ye, rûdine. "Min rîha xwe qusand," ew dibêje, "îro

rojeke girîng e, ez ê herim cem amîrên xwe. Heye ku ez li wir, hin generalên din, hin navên din ên efsanewî jî bibînim... heye ku General Serdar jî. Civînên girîng têne pê."

"Navên efsanewî, generalên efsanewî ku bi salan e, li jiyana me hukim dikin," Mader, bi germahî li rûyê qemerî yê Baz dinihêre û dibêje, "navên efsanewî, hemû mîna hev, mîna ku hemû ji qalibekî derketine, yek dere, yekî din tê, lê hertim li mala me, heta li midbexa me hukim dikin" Mader, bi qesta dengê radyoyê, bi tilî, radyo nîşan dide. "Dewsa çayê, min neskafe çêkir" ew dibêje.

Baz bersiv nadiyê, radihêje nanê li ser masê, pariyekî jêdike, perçeyeke penêrê spî dixê navê û dibe devê xwe. Piştî ku ew nan dixwe, du lib zeytûn û hinekî xiyar jî pê re davê devê xwe, "neskafe baş e" dibêje, "tu nizanî li wan çiyar, kepir û gêdûgan, daristan û dahlan ez çiqasî bêriya çayeke teze, qahweyeke tahl dikim!.. her tişt li milekî, lê bêrîkirin li milekî. Bêrîkirin, li jiyane, li xwarineke germ, vexwarineke sar, li şênîyên şên, li sînema û tiyatroyên şox, li jin û keçên şeng, li bedeneke nerm, li sohbeke xweş, gereke xweş, li xeweke xweş, xewneke xweş, li germahiya mija çayeke teze, tahma qahweyeke xweş bêrîkirin..."

Mader fîncana Baz û ya xwe tijî qahwa hazirkirî dike, çay-dankê ku tê de qahwe çêkiriye, dibe datîne ser ocaxê û vedigere. Mader pîr bûye, qermîçokên rû, enî, stû kûrtir, kîsikên binçav firehtir, rehên stû û gewrî tarîtir dixuyin, Mader ketiye, Baz li Maderê dinihêre û difikire. Mader pîrtir dixuyê. Lê mîna ku ew eynî tiştî difikirin, "tu kal dixuyê," Mader, berî ku Baz tişteki bibêje, siya endîşekê li ser rû, ji Baz re dibêje, "tayên porê te, mûyên simbelên te, niha, bêhtir spî dikin. Do êvarê min baş ferq nekir, lê niha di roniyê de, ez çêtir dibînim..."

"Belê," Baz dibêje, radihêje pariyekî din ê nan, tevî penêr û du serî zeytûn, parî dibe devê xwe, bi qasî bîstekê, di nav fikir û gumanan de, nan dicû, paşê, dîsan, li Maderê dinihêre û gotina xwe dubare dike, "belê, ez kal dibim... Jiyana min a wî welatê te-

res ê mirinê ne hêsan e. Ez nikarim derdê xwe ji kesekî re bibejim, herkes min ji pola, ji hesin dizane, herkes min mîna makîneyeke tekûz dihesibîne, lê jiyana min a wan deran, wî welatê cehenemê çetin e, zehmet e... Mirin, kuştin, şewat, birîn hertim li der û dorên min in, kîn, nefret, tol, çêr, dijîtî, berberî, her celeb kirêtî, hertim, li kêleka min in... Çiya, zinar, kepir, dar, dahl, daristan, gelî, gêdûg, şikeft, berf, baran, pûk, ba, tîn... Jiyana min di nav van de derbas dibe. Û şev, jiyana şevê ya dûrî ronahiyê ku hîs û pêjnan, daxwaz û xwestekan dikuje... Meyne bîra min, ez naxwazim li wê jiyane bifikirim, li serê bipeyivim, çêla wê bikim."

"Lê tu dikarî derdên xwe ji min re bibêjî, ji min re behsa wî welatê tarî bikî, ne welê? Ma ez ne Madera te me?"

"Bêlê belê, lê ez naxwazim hertim li wî welatî bifikirim, gava ez li wê jiyane, li zehmetî û astengên wî welatî ku hîmên esasî yên wê jiyane ne, nafikirim an jî bahs nakim, mîna ku ew gelekî dûrî min in, ji min bi dûr dikevin, welê ez hebekî rehet dikim... Nefikirîn û nepeyivîn, ji fikirîn û peyivîne çêtir e..."

"Hingî bibêje ka do êvarê çawan bû, tu memnûn bûyî?" Mader, ji bo guherandina babeta sohbetê, dibêje, ji fîncanê çend qult vedixwe, bi ken, li Baz dinihêre û çavê xwe yê rastê diqirpîne, "çawan bû, baş bû?"

"Belê" Baz, hedîka, hinekî şermazarî, lê bi ken, dibêje, "belê, gelekî baş bû. Gelekî ihtiyaciya min pê hebû..." Şeva çûyî ya do; li oda razanê ya Mader, di nav bêhn û hilmên giran ên bêhn û lewanteyên têkel de, li ser cihê Maderê yê bi çarşef, lihêf û bahlîfên rengîn ên bi neqşan hûnandî, li ser an jî li kêleka bedena Maderê ku jê bêhneke giran a lewanteyên têkel difûriya. Şeva çûyî; Baz, çavgirtî, destên wî li ser laşê qalind ê Maderê ku çermê gamêşan bi bîra Baz tîne, bedena wî li ser bedena pîr, qermiçî û fireh a Maderê, bêdeng, bêheyecan, bêcoş, hişê wî li derekî din, di nav Maderê de. Hatina piştê, valabûn. Pêl bi pêl. Bi qîrîn. Mîna ku jê lehîyek rabe. Bi lerizîn, bi lezîn. Şeva çûyî; hewldana careke din, lê tevî her celeb xîretê, tevî dest, tilî, pêçî û ziman,

bêhavil û hingî zimanê Maderê. Zimanê hoste, xwedantecrube yê Maderê, dev, lêv û ziman, germ, kûr, dirêj, fireh. Li ser bedena Baz, bost bi bost, tilî bi tilî. Bêyî lez û bezê, hêdîka, car bi car. Germahî û kûrahiya devê Maderê, zimanê ku mîna marekî diliwe. Hingî, piştî xebat û lebateke gelekî dirêj, careke din valabûn. Bi qasî bîskeke kurt, bi lerizîneke sivik, îcar bêdeng. Û bi dû re jî serî di nav pêşîrên stûr ên Maderê de, hinekî bêhnçikyayî, xew û xire xir. Bi tenê hewqas.

Baz ku niha, li midbexa germ û bi bêhna qahwê tijî, rûniştî, do hatiye. Bi balafirê, ji bajarê mezinê Welatê Çiyan, bi qirawateke tarî, gomlegekî spi û kincên sivîl ên reş. Pêşî Mala Zabitan, mêvanxana Mala Zabitan û li wir odeyeke fireh a xweşraxistî û paqij. Paşê çend telefon, ji çend zabitên hevalên xwe re jî bo hînbûna rewşa payitext û hevdîtînê, ji du jinan re jî bo şevbihurkên şehwetijî, ji qerargeha navendî ya ordiyê re jî bo hînbûna wextê civîna girîng, ji nexweşxana leşkerî ya bajêr re jî bo hînbûna wextên ziyaretê, ji kurên xwe re û jî Maderê re. Telefona herî dawîn jî bo Maderê. Bi dû razan, xweşûştin, kurbûyin, lixwekirina cil û bergên paqij û kewandî yên zabitan û du qedeh cîn-tonîkê re, li jêr, li aşxana Mala Zabitan, şîva êvarê, tevî du hevalên zabit ku li payitextê welêt li kar in. Çend qedeh ji şarabeke sor a yaqutî. Û çêla "wan deran û wan însanan"; Bêhna xwînê ji wir tê, xwînê ew welat vegirtiye, şidetê ew welat hîpnotîze kiriye. Rindî û xirabî, başî û kirêtî ketine nava hev, tu pîvan neman. Xwîn diherike, bêpayan, ji her milê wî welatê kambax. Hevalên min, zabit û leşkerên min, gundî û alîgirên min li nik min dikevin û dimirin. Her cara ku hevalekî min dikeve, kîn û nefreta min zêdetir dibe, hêrs û kerba min kûrtir dibe. Daxwaza tolhildanê, qelandinê hîn bêhtir dibe. Kîn û nefret alîkarî dikin, belê alîkarî dikin ku meriv felaketan, wahşetan nebîne, nebihîse û nepeyive. Ez hîn bûme ka meriv çawan xwe li keriyê, kûranyê, lalbûn û nezaniyê datîne, çawan meriv dikare zora xwîn û bêhna xwînê bibe, çawan meriv dikare hînî rewşa herî xirab, herî neînsanî bibe. Bi xêra kîn û nefretê. Daxwaza tolê,

kela kîn û nefretê, yanî riya herî hêsan, riya herî baş a hînbûna jana şewat, mirin û kuştinê ye, meriv pê hînî korbûnê dibe... Lê li milê din, mirin, kuştin, nefret her tiştî, her însanî diguherîne. Ez hîn bûme, ez dizanim ka meriv çawan dikare zora nefret û kela nefretê bibe. Ez bawer im, ez hîn bûme. Ez diguherim, ez guherî me. Bi tecrubeyên salan, ez hîn bûme. Min dil nîn e ku ez niha çêla vê yekê bikim, lê bêhn bi wî welatî ketiye.

Sohbeteke bi vî terhî ya şîvê. Sohbeteke têkel, peregende, vajî. Hîs, nêrîn û fikrên têkel, tevlihev û peregende. Piştî şîvê jî, li meyxaşaneyê hinekî loş, hinekî bêdeng a li kêleka çemê paytext, du qedeh votka. Hingî li wir, di bin ronahiya lampeyên bûlwarên kêleka çem ku li hundirê barê dixin, çêla arzû û besta jin û keçan; pîrî caran tu hişyar dibî, bedena te guvîşîye, rep bûye. Tu bi bedena xwe nikarî. Beden diqîre, dixwaze, tiştêkî ku hema çî bigire hinekî jî kevirê nermtir dixwaze. Beden bûye birceke zêrîn, maxrûr, bilind, serbilind û dixwaze. Beden qulîpiye ser cinawirekî. Beden dixwaze hemû bend û qeydan bişikîne, hemû cil û kirasan biçirîne, mîna hespekî rewan serî bigire û here. Lê rojin hene, beden çilmisiye, beden bûye şikefteke genî ku tê de jîyan nîn e. Lê dûrbûn, tunebûn, hesret, best, daxwaz bedenê har dike, beden hêç dibe û bi çolan dikeve...

Piştî meyxaşanê jî, bi taksî, mala nas û germ a Maderê û Mader ku êdî, bi şevan, naçe kerxaşê. Ê bedena pîr a Maderê ku bedena har, lê gelekî westiyayî ya Baz, hinekî, aş dike.

"Mal? Mal û zarokên te" Mader, hinekî reşel dixê ser pariyek nan, dide Baz û bi nermahî jê dipirse, "Tu dê malê çî bikî? Tu dê nerî mala xwe?"

"Na," Baz dibêje, nan datîne kêleka xwe, ji fîncanê hinekî qahwe vedixwe, libekî zeytûn dixê devê xwe, serê xwe ber bi pencerê dike û dibêje, "Na, ez ê nerim. Kurên min ê werin Mala Zabitan. Ez ê bi wan re bipeyivim. Ez bavê wan im, ez ê li wan binêrim, wan xwedî bikim... Lê çîroka min û wê jinê êdî xelas. Ez, niha, li Mala Zabitan, li mêvanxanê dimînim, heta ku ez

malekê peyda bikim û raxînim. Ez hew dixwazim rûyê wê jîna meymenet ku dinya li min kir zîndan, bibînim. Sibê, dusibê ez ê bi awûkatekî re bipeyivim da ku şixulê min bigerîne. Ez ê wê berdim, jê xelas bibim... Jixwe tu pêwendiya me nemaye. Ez pê re napeyivim. Hew. Êdî bes e. Zehmetî, derd û kulên min têra min nake, di ser de derd û kulên wê jî! Na, bes e..."

Baz li saeta li ser dîwêr dinihêre, ji nişka ve, radibe pê, "ez kincên xwe li xwe bikim" ew dibêje, "ez dereng nemînim. Îro karê min zahf e." Ew ber bi jor dibe, dere hundir, oda razanê ya Maderê ku jê hilm û bêhneke giran tê û bi lampayeke çikî sor hinekî ronî ye û derpî, gore, kiras, gomleg û pantolonên xwe, hêdî hêdî, bi dîqet, bi dûzan, li xwe dike. Madera ku pê re hatiye odê, alîkariya wî dike. Piştî ku Baz qirawata xwe ya reş a leşkerî bi xwe ve dike, ew dere ber neynikê û porê xwe yê kurt, bi şehekî reş ê biçûk ê Maderê şeh dike. Ew li xwe dinihêre, bi bal, bi dîqet... Gelo ew kal bûye? Gelo ev xezên kûr ên li ser enî, ev qermîçokên li dora çavan, ev çermê rû ku hinekî sist bûye, ev hemû nîşana çi ne? Jiyana dere. Wext dere, mîna vî çemê kevnar ê paytextê Baz, diherike û dere.

Lê ew...

Ew tê bîra Baz. Germahiyek dikeve hundirê Baz. Baz dikene, li eksê xwe yê neynikê dinihêre û bideng dikene. Bi qasî bîskekekê. Ew, bi ûsil, simbêlên xwe jî şeh dike, mijang û birûyên xwe, bi tiliyan, rast dike û niha, bi serbilindî, bi serfirazî, li xwe dinihêre. Baz... kumandar, desthilat, gotina wî ferman. Baz, jîr, zana, têgihîştî, tevî her tiştî biserketî. Biserketî? Gelo?

Lê ew.

Baz ji neynikê bi dûr dikeve, tê cem Maderê, "Mader" dibêje, destê xwe davêje ser milê wê û didomîne, "ez ê ji te re tiştêkî bibêjim, lê şaş mebe, min dest bi xwendina şîran kiriye. Şîrên li ser aşq û sewdayê, şîrên ku qala evîne dikin..."

Mader, hinekî şaşbûyi, "bi xêr be" dibêje, "ev jî tiştêkî nû ye!.. Kurê min ê sêwî û şîr!"

"Belê," Baz, bêyî ku îcar, ji gotina Maderê ya kurê min ê sêwî eciz bibe, dibêje, "belê, ez dixwînim. Û tiştekî din, min dest bi nivîsînê kiriye. Gerçî ne şîr, raporek, raporeke leşkerî, lê nivîsîn."

"Kurê min, ev ne elametê xêrê ne," Mader, çakêtê Baz ê leşkerî tîne, çakêtê pêdigire û dibêje.

"Tiştekî din, min dest bi guhdarîkirina musîkê kiriye, ne musîka radyoya midbexê, lê musîka klasîk" Baz, milê xwe dixe çakêtê paqij ê hakî, çakêt li xwe dike û dibêje.

"Ax lawê min... welê dixuye ku tu ji rê derdikevî, ji riya ku tu dizanî, tu nas dikî... Ev tiştên ku tu dibêjî, elametê dilhebînê û merhemetê ne. Tu ji riya xwe ku lê dilhebînê û merhemet nîn e, derdikevî..."

"Na," Baz, dîsan dere ber neynîkê, qirawata xwe rast dike, qumçîkên zîvîn en çakêt digire, çavên wî li ser rûyê wî yê neynîkê, dibêje, "na, ez dikevim ser riya xwe... niha, cara yekemîn..."

"Gidî, tu bi xewna evînê neketibî?" Mader, ji paş ve tê, ji milên Baz digire, rûyê wî ber bi xwe dike û dibêje, "ev gotin, ev kirin, elametên nexweşîya sewdayê ne. Gidî tu li wan çiya û çolan bi taya hezê neketibî?"

Baz, bi ken, li çavên werimî yên Maderê dinihêre, "ez nizanîm" dibêje, "ez ê vê hîsa nû çawan bi nav bikim, ez nizanîm, lê ev çendek e ku hîseke nû di hundirê min de pêl dide û roj bi roj xurttir, firehtir dibe. Êdî ez nizanîm ka evîn e, kîn e, west e, nefret e, birçîbûn e, sergêjî ye... ez nizanîm, lê tiştekî weha, cara yekemîn e ku bi serê min de tê. Berê, tu carê, min hîseke weha nas nedikir. Niha ew diqewime. Heye ku ne hezkirin be, ez nizanîm."

"Kurê min," Mader, ji Baz bi dûr dikeve, dere li kêleka textê razanê rûdine û dibêje, "kurê min ê bêkes, min derdê te fam kir... Hîs, hîsên herî berevajiyên hev jî nêzîkê hev in. Ez ji tecrubeyên xwe yê jîyanê dizanîm. Were, hîs û deng û pêjnên hîsan ji min bipirse. Tu bawer î ku ez bi daxwaza dilê xwe ketime kerxanan, bi hez û best, her roj, şeqên xwe vedikim û deh, panzdeh, bîst mêrên qerase û nenas dikişînim ser xwe? Na, kurê min, na, hîs

bûn sebeb. Evîn çi ye? Nefret çi ye? Şev û roj çi ne? Tarî û ronî çi ne? Ma yek nûn be, ya din dikare hebe? Ez ji te re bibêjim, nefret û evîn, şev û roj, tarî û ronahî cêwî ne. Ferqa wan, mesafa navbera wan bi qasî mûyekî nediyar e, bi qasî tayekî spî yê porê te ye..."

Mader, kûrahiya fikir û gumanan li ser rû, cidî, radibe ser piyan, dere ber lampa sor, wê ditefîne, ji wir dere ber pencerê û perdeyên rengîn ên pencerê ku girtî ne, dikêşîne û vedike. Rona-hiyeke xurt dikeve hundir. Bi qasî çendekê Mader ji pencerê, li jêr, li kolanê dinîhêre û ji wir, bêyî ku li Baz vegere û lê binîhêre, "ez ji te re bibêjim," dibêje, "min dizanibû ku tu dê li wî welatê tirsê bi taya evîne bikevî û min hêvî dikir ku tu bi taya evîne bikevî..."

"Çima" Baz, dere ber textê razanê, demança xwe ya baretta ku li ser masa biçûk a kêleka textê razanê ye, hildide, wê bi kembêra xwe ve girêdide û hêdîka, li koşa text rûdine, stû û milên xwe hinekî xwar dike û dipirse, "çima?"

"Ji ber ku evîn xewn e, xeyal e" Mader dibêje û vedigere, tê kêleka Baz, li pê, destê xwe dibe serê wî, tiliyên xwe di nav porê wî de, bi nermahî, digêrîne û dibêje, "ji ber ku evîn, xewna kesên bêgav û bêçareyan e. Ji ber ku evîn xeyala însanên ku di nav zehmetî, nexweşî û dijwariyan de ne. Ji ber ku evîn, riya nû û nediyar a kesên ku dev ji riya xwe berdidin e. Ji ber ku ew welatê ku min hîç nedîtîye, lê bi qasî ku ez pê dizanim, welatê bêgav û bêçareyan, welatê zehmetî, nexweşî û dijwariyan e. Ji ber ku xewn û xeyal, nan û ava însanên welatê weha ne. Ji ber ku însanên weha riyên nû û ronî, xeyala riyên nû û ronî divên. Ji ber ku tu jî êdî însanê wî welatî yî, qulipiyî ser însanên wî welatî, bêyî ku tu ferq bikî... Dinya weha ye, kurê min, dinya bi dor e, ne bi zor."

"Na" Baz serê xwe hinekî bilind dike, li Maderê dinîhêre û dibêje, "na, ez ne ji wan im, rast e, ji bîst salan zêdetir e ku ez di nav wan de me, lê ne ji wan im. Ji bîst salan zêdetir e ku ez, bi sixul û xwîdan, murin û kuştinê, dixebitim, hewl didim ku wan bikim însanên ji me, biqulipînim ser me..."

"Ez nizanim" Mader li kêleka Baz rûdine û dibêje, "heye ku gotina te rast e. Lê tiştê ku ez dizanim, dinya bi dor e, ne bi zor. Zor nikare dewsa dorê bigire, kurê min ê jîr û têgihîştî. Ma tu dikarî, bi zorê, rûyê bayekî gur bi dereke din ve badî, an şevê bikî roj, dora wan biguherî, stêr û heyvê biqulibî ser tavê? Ruhê însanan jî weha ye. Ruh, bi zorê, terbiye nabin..."

"Ez divê rabim" Baz dibêje û radibe ser piyan, "ez dereng dimînim."

"Min gotina xwe hê xelas nekir" Mader radibe pê û dibêje.

"Ez divê herim..."

"Heta jêr, ez ê bi te re werim" Mader dibêje û dide pey Baz û gotina xwe didomîne, "ez ê ji te nepirsim ka kî ye, çi ye, çawan e, çi qewimiye, lê min gelekî dixwest ku tu bi tayeke weha xurt bikevî. Ji ber ku te hewcedariya tecrubeyeke weha, na, ne tecrube, nexweşiyeyeke weha hebû. Ji ber ku nexweşiyeyeke weha ruh, dil û hîsên însanan derdixe pêş. Ji ber ku însan, heta niha, ji bo te, ne însan bûn, jina te, zarokên te, ez jî tê de, em hemû, ji bo te, wasite bûn, alet bûn, diranên çerxa nêrîn û qayideyên te bûn, em hemû diranên kêra pergala mezin bûn, pergala ku tu jê re xizmetê dikî. Ji ber ku ji roja ku min tu nasî û vir ve, tu carî, te însanan, dil, ruh û hîsên însanan nedît û te xwe neêşand ku tu bibînî. Lê niha, tu dê bibînî. Ji ber ku taya evînê, tayeke hîsî, tayeke însanî ye. Lê ji niha û pê ve tu dê insanan bibînî, serê xwe bi rabûn û rûniştina wan, bi fikir û gumanên wan, bi gotin û serpêhatiyên wan, bi daxwazên wan, bi hîs û bihîstiyariyên wan biêşînî. Ji ber ku evîn, nexweşiyeyeke însanî ye, însanan dike însan. Ji ber ku..."

Lê Mader hew dikare gotina xwe bidomîne. Baz niha, pêlavên reş ên boyaxkirî jî di lingan de, li ber derî ye. Baz, çente wî yê reş û kumê zabitan di destê wî yê rastê de, bi destê çepê derî vedike û gavek davêje der. Lê berî ku ew derkeve û here, ew li Maderê vedigere, "spas" dibêje.

"Min nedixwest van gotinan bibêjim, lê îro dor hatê. Ez hêvî dikim, min tu neşikandibî?" Mader destê xwe dibe milê Baz û dibêje.

"Na, ez derim" Baz dibêje, "lê ez ê îşev an jî sibê êvarê werim. Hingî em dipeyivin."

Baz ji derî derdikeve, rûyê xwe ber bi aliyê rojava yê kolana teng dike û dimeşe. Ew dengê deriyê ku li pey wî tê girtin, dibihîze. Bi gavên giran, çente di destan de, Baz dimeşe. Tav û tîrêjên tavê hawîrdor, kolan, dûkanên li ser kolanê, esman xistine nav cumbuşa ronahiyê. Însanên têkel, di nav cil û bergên têkel, bi çûyin û meşên têkel, derin, tên, li ber dûkanan radiwestin. Belê, jiyana bajar û bajarvaniyê –ku Baz ewçend bêrî kiribû.

Lê ew, Kevok.

Xewa wê, rûyê wê yê di xew de. Berî îro bi çend rojan, cara dawîn, gava Baz, derengê şevê, çû malê, Kevok di xew de bû. Li ser dîwana ku Baz hertim li serê radiza. Li ser piştê, bataniyeke kesk heta zik li ser wê. Li ber du findên ku êdî xelas dibûn. Xewa wê; sakîn, aram, paqij, bêdeng. Li ser rû ne şopa endîşê, ne ya tirsê. Nefesên bi aheng ên sivik. Porê dirêj ê reş ku hinekî dibiriqî. Ronahiya qels a findan ku li ser rûyê wê yê paqij diliviya. Çavên bêpayan xweş girtî, qapaxên lihevhatî yên çavên girtî, mijangên zarîf girtî. Bêvil û difnên biçûk ên lihevhatî, zirav, nerm mîna qedîfê ku di bin ronahiya qels de hinekî şewqdayî. Rehên zirav ên cênîk û hinarikan. Stûyê dirêj, sînga hinekî vekirî, pêşîra aliyê çepê ku heta nîvî dixuya. Pêşîrên teze yên vekîşiyayî, memikên ku mîna hirmiyeye mezin a kemilî, ku jê bêhna hirmiyê dihat, navbera memikan ku dibiriqî, ku bang li daxwazên hez û şehwetê dikir. Hilma teze û xweş ku ji sîng û berê wê, ji beden û laşê wê difûriya. Hingî pêldana germahiya hundirê Baz. Hingî daxwaza mistdana wî rûyê ronî. Bi hêdîka. Bi nermahî. Bi hebînî. Hingî germahiya janneke zirav di hundirê Baz de. Çima ev keça hanê, keça windabûyî, şaşbûyî ewçend ditirse, ji min, ji însanan, ji dinyê ditirse? Çima ew dilê xwe, bedena xwe venake, nikare veke? Daxwaza denglêkirinê, peyivînê, daxwaza destdanê, mistdanê. Daxwaza jiyîn û jiyanê. Tevî her tiştî. Ronahiya ku li ser rû dilîst, siyên ku li ser rû dixuyan. Ronahî û sî; du milên

jiyanê? Bêdengî, tenêti, kûrahiya hûsên bêdeng. Daxwaza ramûsanê, ji rû, ji çavan, ji enî, ji dev û lêvan û di lêvan de rawestin. Bi qasî bîskekê, na, bi qasî çendeke dirêj, na, bi qasî demeke dirêj. Bi saetan, bi rojan. Li wir mayin, li wir mirin. Di nav wê bêhtengî, wahşet, xwîn û xwîdanê de, ew hîsa kûr a ronî, ew daxwaz ronî, ew pêla ronî.

Û tirsê wê. Carekê jî, gava Baz li ser dîwanê, di xew de bû, qîrîn, qîrîna wê. Hişyarbûna Baz û ew. Kevok, li salonê, di nav cil û bergên rîziyayî, heye ku bêhnketî de, li pê. Bi çavên vekirî û beloq. Bi çavên ku birûska tirsê tê de vedabû. Nefesên kûr, rabûn û daketina sîngê, memikên gulover, vekîşiyayî. Pêşîr, memik. "Çi bû, çi qewimî?" Bêdengî. "Here oda xwe û raze..." Bêdengî. "Were cem min..." Bêdengî, çend gav bi paş ve. "Çi bû?" Hingî; "deng tên, dengên qîrînê tên..." Baz, di dîwanê de rûniştî, cixare di dev de, "kes naqîre, tu diqîrî, te xewn dît, here raze." Ew, li pê, bêpayan bêçare, bêpayan tirsîyayî, "na, ew, birîndar diqîrîn, kesên ku xwîn ji wan dere, diqîrîn..." Nêrîna wê; çavên şet, mêzekirineke şaş, şet. Hingî germahiya -heye ku- merhemetekê di hundirê Baz de, dilnermahiyek, "keça min, tu gunehî, tiştêk nabe, te kabûs dît, here raze..."

Hingî, piştî çûyina wê ya odê, cixare di dev de fikirîn, eynî mîna ku niha Maderê jê re got, li nefret û evînê, li şidet û merhemetê fikirîn. Belê li nefreta ku jiyanê wî xwariye, li şideta ku ew kiriye dîlê tarîtiya şevê. Û gotinên şikestî û masûm ên keçeke tirsîyayî, nêrîneke rûçikî û sade, mîna nêrîna zarokekî, tazî, bê-mask, bêfen û fort, bêxirûr. Kabûs... jiyanê keçikeyê birîndar ku qulipiye ser kabûsekê. Jiyanê wî? Gelo jiyanê wî bi xwe?

Baz kolana teng a mala Maderê li pey xwe dihêle û tê kuncê bûlwareke gelekî fireh. Taksîyên bêhejmar, kamyonên biçûk, mezin, fireh, jîp û her texlîdê, otomobîla derin û tên. Qelebalixekê boş li herdu milên bûlwarê, li ser piyaderên fireh ên bûlwarê, bi lez, derin. Di vê sibeha ronî de ev şênî! Baz hinekî li ser piyaderê dimeşe, paşê li kêleka stûneke hesînî ya lampeyê bûlwarê

disekine û destê xwe hildide da ku taksiyek raweste. Taksiyek radiweste, Baz deriyê kêleka şofor vedike, dikeviyê, rûdine û "em ê herin nexweşxana leşkerî" dibêje.

Ew bi rê dikevin. Trafîkeke boş a erebe û merivan, mîna barana biharê, hemû kolan, bûlwar, cade, kuçe û bajar dagirtiye. Evçend însan, girseyeke evçend stûr ku niha baz didin, dilezînin. Baz, ji pencera taksiyê, çente û kum li ser çokên wî, bi meraq, hinekî şaşbûyî, li herdu milên piyaderan, temaşe dike û li wan û jiyana wan, li xwe û jiyana xwe difikire. Haya kê niha ji Baz heye? Kî dizane Baz kî ye, çi dike? Kî qîmetekî xuyayî dide şixul, lez û bez, fedakarî û wefakariya Baz? Ji bîst salan zedetir e ku ew li wî aliyê welêt, aliyê jibîrbûyî yê cehenemekê, tevî mirin, kuştin, şewat û tirsê, bi şev û roj, dixebite. Wî jiyana xwe, ji bo welat, dewlet, millet, yanî ji bo van însanên ku niha dibezînin û dilezînin, ji bo ku ev rehet bikin, bi rehetî, bêtirs bijîn, bixwin û vexwin, herimandiye. Ne şeva wî maye, ne roja wî, ne jiyaneke wî ya civakî maye, ne mala wî, ne dostekî wî, ne yareke wî. Her tişt, her tişt ji bo van însanan feda bûye. Lê kî pê dizane! Encama vê fedakariyê? Hîç, hîç tiştêk. Bi tenê meaşekî mehane û hatineke hûr, bi tenê îmkân û fersendên jiyaneke bidizî ya şevê. Bi tenê navekî efsanewî yê tirs, xof, kîn û nefretê. Lê însan, mîna însanekî jiyîn, mîna însanên din pêwendiyêke însanî? Mîna van însanan bi rojê çûyina kar û şixul, êvaran çûyina bar, meyxane, sînema, tiyatro, aşxane, kerxanan? Li maleke germ tevî zarok, jin, mêvanan şevbuhêrkeke germ? Ger û meşên êvaran li kêleka çemê bajêr? Bi kincên sivîl ên medenî çûyin û hatin, xwarin û vexwarin? Eşq, hezkirin û razan? Xwendina şîran, guhdarîkirina musîka klasîk? Li gora daxwaza dil û ruh kirin, bihîstin, fikirîn û tevger? Azadiyêke jiyane, serbestiyêke însanî?

Na, ev tişt ji bo Baz û jiyana wî nîn in. Ji bo wî û jiyana wî, demançe û berik, çek û pûsad, garnîzon û lojmanên leşkerî, cîl û bergên leşkerî û yên serhildêran, xwarin û vexwarinên tîrş, tûj, sar, genî yên leşkerî yên konserweyan, şevên êrîş û kuştinê, ro-

jên razan û şewatê, pêwendiyên dizî yên mirinê hene. Çiya hene, zinar, lat, kaş, gelî, newal, çol, berf, pûk, ba, bahoz, tav, tîn, rev, lez, bez, barûd, xwîdan, toz heye. Tirs heye. Şidet heye. Dûzaneke tekûz, destûreke misoger heye. Hertim, her gav, her roj –heta mirinê. Ew keç û jînên jiyana wî ya xort, ew roj û şevên şehwetijî ku wî bi wan keç û jinan re derbas dikirin, niha li kû ne, li kû mane? Li pey wan bedenên şox, li pey qul û qelîşekên bedenên afata dil û ruh, niha, çi maye? Ew deng û gotinên narîn û nazik ên keç û jinan ku agir bi ruhê wî, bi bedena wî dixistin, niha, li kû mane? Ew jiyana wî ya xort a destpêka zabitiyê ku mîna îro ronî bû, ew heyecan, coş, daxwazên wî yên xort ên wan rojan ku mîna tîrêjên tava îro dibiriqî, diçirisî, li kû ye, li kû ne?

Na, ronahî, şewq, ji bo Baz, qedexe ye. Jiyanêke ronî, kirinên ronî, bedenên ronî, qul û qelîşekên nerm, germ û tarî ku di ronahiyê de dibiriqin, diçirsin, ji bo Baz, qedexe ne. Ji bo wî, qayide hene, dîsîplîn, parastin, dûzan û pergal heye. Ji bo wî ordî, dewlet, millet, ala, şan û şerefa wan û General Serdar heye. General Serdar; li jor Xwedê, li jêr ew. General Serdar; porê reş, simbêlên reş ên bor, rûyê gulover, unîformayên leşkerî, nêrîna bazekî û desthilatiya hemû welêt, hemû şexs û kesan, hemû cih û waran. Baz, aîdê General Serdar e, aîdê malbata General Serdar, yanî ordiyê ye.

Hîseke welê bi ser Baz de tê ku ew dil dike, niha, pencerê veke, biqîre û bibêje, "hûn, ho şênîyên ku weha bi lez û bez derin, weha xemxur, sersar, bêmesûliyet qîma xwe bi vê jiyana dûrî mirin û kuştinê tînin û li tu tiştî, li tu kesî nafikirin, ez ji bo we dixebitim, min ji bo we evçend tişt kirine..." Lê dewsa ku ew biqîre, ew vedigere ser şoforê simbêlboq ku bi dîqet, çavên wî li ser erebeyên li pêş, taksî dajo û jê dipirse, "tu dizanî ka ez kî me?"

Şofor, ji vê pîrsa nişka ve şaşbûyî, bi lez, çavekî li Baz digerrîne, "na" dibêje, nêrîna xwe dizîvirîne ser ajotinê, "ez te nas nakim, lê ji kincên te diyar e, tu zabit î."

"Tu nizanî ku ez ji bo te dixebitim?"

"Ji bo min?" şofor, hinekî ecizbûyî, pirsra Baz lê vedigerîne, "çima tu dê ji bo min bixebitî?"

Baz bersiv nadiyê. Dirêjkirin ne hewce ye. Ew, dîsan, bêdeng, li der, li şênîyên li ser piyaderan dinihêre. Niha çem jî li ber wan dixuye, ew jî bûlwara ku xwe dirêjî ber bi çem dike, derin. Bê feyde ye, Baz difikire, bêkêr e û tiştê herî xirab, ez nikarim bi kesekî re bipeyivim, nikarim ji yana xwe, şixulên xwe, kirinên xwe, fikr û hîsên xwe ji kesekî re bibêjim, bi kesekî bişêwirim. Herwekî ku ez jî mîna Kevokê girtî me, ketî me, windabûyî me... evçend tenê... evçend xerîb... Xerîb? Belê, xerîb, ji bilî hin zabît û kumandaran, hin endamên ordiyê, kî dizane ka ez kî me? Ez çi difikirim, çi dixwazim? Belê, xerîbê xwe, bajarê xwe, mal û zarokên xwe, van bûlwar û kolanan, vî çemê hanê, vê ji yana boş a paytext. Berî bîst, sî salan ne weha bû, lê niha, ez xerîb im, xerîbê jiyanê... Mîna wê... Mîna keça ku ji mirin, agir û mij û dûmana kuştinê derket û hat û kete mala min, ji yana min. Keça çiyayî, keça xwenda ku dikare bi fransîzî bixwîne, binivîse û şîîran bibêje, ku hê jî, tevî her tiştî, jê bêhnna teze ya jiyanê tê. Keça ku bi bêdengiya xwe ya kûr, nêrîna xwe ya melûl û zîz, dengê xwe yê nermik, bedena xwe ya şox, dilê xwe yê sirtijî, ruhê xwe yê girtî, veşartî, gotina xwe ya nenas tesîreke evçend ecêb kir. Keça birîndar, şikestî û xerîb.

Tav, tîrêjên tavê, niha, li ser ava çem, şewq didin. Şênî, jin û zarok, kal û pîr, di qeraxên çem de, li ser riyên teng ên parkekîrî, digerin. Ew, hêdî hêdî, niha, paralelî çem, derin. Baz avahiya spî ya nexweşxana leşkerî dibîne. Ew çavên xwe digire, serê xwe datîne piştê cihê rûniştinê û li dangan, dengê radyoya taksî, dengê trafikê, klaksona otomobîlekê, şênîyên li kolanan, dengê zarokê ku digirî, guhdarî dike, -heta ku taksî li ber deriyê mezin a nexweşxanê radiweste. Baz hin pere dide şofor, ji taksîpeya dibe, kumê xwe dide serê xwe, xwe dide hev û dere hundir. Li ber derî, li korîdora gelekî dirêj ê nexweşxana spî, însan, dîsan, bi lez û bez, derin û tên. Ecela van çi ye, lez û beza van ji bo çi ye? Baz

dizîvire dûkana kulîlkan ku li aliyê hundir, li ber deriyê mezin e û li wir desteyeke mezin a gulên sor ên nûbişkivî dikire, paşê dere ber resepsiyonê û ji xanima resepsiyonîst beşê nexweşiyên dil dipirse. Xanûm jê re dibêje, lê mîna ku ew bi Baz bawer nebe ku Baz jê fam kiribe, ew ji pencera resepsiyonê serê xwe derdixe, bi dest ji aliyê çep ê hundirê korîdora dirêj nîşan dide. Baz spas dike û çavê wî li ser şênîyên ku derin û tîn, lewheyên nexweşxanê ku li dîwaran e û cih nîşan didin, dere. Di destekî de desta gul, di destekî de ji çante. Piştî bîskekekê Baz dizîvire aliyê çepê yê korîdorê û dikeve ser kolaneke gelekî teng, heta ku ew tê nik asansoran. Bi asansorê ew derdikeve qata pêncan, li wir jê peya dibe, dikeve saloneke dirêj. Hemû nexweşxane, her der spî ye. Niha bêhneke tund û giran bi difnên Baz dikeve. Bêhna dermanan? Bêhna nexweşan?

Baz, li ber devê salonê, pêrgî hemşîreyekê tê û jê oda dehan dipirse. Hemşîra pîr, qelew û kin, bi tilî ode nîşanî Baz dide. Baz, bi gavên giran, zahf giran, ber bi odê dere. Gava ew digihê odê, bi qasî bîskekekê, li ber odê radiweste, xwe dide hev, qirawata xwe rast dike, nefeseke kûr digire û dide, paşê dikeve hundir.

Belê, ew e, Zabitê Simbêlqît. Zabitê Simbêlqît; însanekî kal, jar, kurt, bi qasî mistekê mayî. Porweşiyayî, lê hê ji bi simbêl, hê ji simbêlqît. Çavgirtî, heye ku razayî. Bi tenê, li ser cihan, li odeyeke spî, ronî û tazî ya nexweşxanê. Li dîwêr bi tenê lewheyek, General Serdar. Baz, hêdîka, bi gavên giran dere û li ser kursiyê ku li kêleka text e, rûdine. Ev însanê kal û nexweş ku ji Baz re bavîti kir, lê xwedî derket, hertim çêyiya wî xwest. Û cara dawîn, cara ku Baz xwe ranegirt û lêxist. Pihêt, zahf pihêt. Ev kurtedem. Çavên vî însanê hêja yên matbûyî, tirsîyayî û hêlabûna wî. Hêrs. Hêrs û kerba tarî ku her tiştî bi merivan, bi Baz dide kirin. Hêrs û kerba kambax! Lê ji ber bextê çê hingî ev însanê gelekî jar, diljar, nemir û Baz nebû sebeba mirina wî. Eger ew bi-miriya, hingî Baz ê ji serevdeyên wê dêlik û dêqehba ku jina wî ye, na, jina wî bû, xelas nebûya, heta mirinê. Heye ku Baz hingî

ji ordiyê jî bihata avêtin û biketa girtîgehan. Ma Baz çi xirabiya vî însanî ditibû, dîtiye?

Baz, hêdîka, bi destê Zabitê Simbêlqît digire û radimûse. Hingî Zabit çavê xwe vedike. Ew pêşî hinekî şaş dibe, paşê kenek li ser rûyê wî tê pê. Baz kumê xwe derdixe, desta gulan datîne ber lingên Zabit, radihêje destê din jî û herdu destan radimûse. Zabit, dilgermiyeke bêpayan kûr, li ser çavan, li Baz dinihêre. Paşê hêrs dikeve çavên Zabit û çend rondik ji herdu çavên wî gêr dibin. Kela giriyê gewriya Baz jî tijî dike, lê ew xwe radigire. Bi qasî bîskeke, ew, welê bêdeng, destên Zabit di nav destên Baz de, li hev dinihêrin.

"Li min bibihure" Baz bêdengiyê xira dike û dibêje, "min efû bike... ez gelekî li te fikirîm, li te difikirîm, hertim..."

"Ez jî li te," Zabit, bi dengekî gelekî qels, dibêje, "kurê min, tu çawan î? Behsa xwe bike, ez jî rojnameyan bûyerên wî welatî dixwînim. Rewş çi ye, halê te çi ye?"

Zabitê Simbêlqît gotinê nayîne ser wê bûyera qahwexana li hemberî Mala Zabitan. Baz jî hew qal dike, lê ew dil nake qala "wan deran" jî bike. "Halê te çawan e" Baz jê dipirse, "emeliyet çawan derbas bû?"

"Westiyayî me. Çar rehên dil guherandin, qapaxeke nû pê ve kirin. Lê hew hêviya min heye... ez li vir, li vê odê me. Hew min hêvî heye ku ez bikaribim ji vir derkevim..." Zabitê Simbêlqît ku niha balîfekî daye paşla xwe, hêstirên çavên xwe bi destan paqij dike, bi nêrîneke balkêş, li Baz dinihêre. Piştî biskekê, ew, bi destê Baz digire, wî hinekî ber bi xwe dikişîne, destê xwe dibe stûyê wî û "kurê min, min ne dixwest weha be" dibêje, "min nedixwest jiyana te weha be, zewaca te weha be, hal û hewalê te weha be. Min tu ji mirinê xelas kirî, lê ne ji bo vê rewşê, min dil kir ku tu bi wê keçe re bizewicî, lê ne ji bo şer, qîrîn û pevçûnê."

"Ez dizanîm," Baz, bi daxwazî, serê xwe ber bi wî dike û dibêje, "te tu carî xirabiya min nexwest, lê jîyan weha ye. Ne tu pê dikarî, ne jî ez... herçî halê min e, ez nikarim derewan bikim û

bibejim baş e, lê ez dijîm. Li wan deran jiyîn jî bi serê xwe hune-
reke mezin e. Ez dijîm."

"Ez dixwînim. Ez dibihîzim... na, naguhere, tu tişt naguhere. Kî dibêje ku wext, heyam, însan û hîsên însanan diguherin, rast nabêjin. Her tişt mîna xwe ye. Di dema me de jî weha bû. Xwîn diherikî, meriv dimirin, gund dişewitîn, axîn û zarîn bi esmanan diket, kîn û nefretê merivan difetisand. Eynî mîna îro. Em bi ser neketin kurê min... Ez nizamim ka min, bi firehî, ji te re, çêla wan derankiriye? Ez jî li wir zabit bûm. Me dil dikir ku em wan deran biguherînin, medeniyetê, zanîn û însaniyetê bibin wan deran, wê jiyana hov biqulibînin ser jiyanekê yekgirtî ya hemû welêt, welatekî mezin, pêşketî, dewlemend û xurt bînin pê. Lê niha ez dizanim ku em bi ser neketin. Zahf xwîn rijiya kurê min, zahf însan ketin, zahf çem bi rengekî zahf sor, zahf wext herikîn. Mina îro. Ez nizamim çima, lê ew neguherîn, em neguherîn. Xwîn ranewesta, mirin û kuştin xelas nebû. Bajar guherîn, kinc, cil û berg guherîn, tank û top, erebe û otomobîl guherîn, balafir û telefon guherîn, lê însan mîna xwe ma, rik, kîn û îrada însan herwekî xwe ma..."

Baz hinekî din kursiyê xwe tîne ber textê razanê, ew dîsan destên Zabitê Simbêlqît dixê nav destên xwe, wan radimûse, car bi car, paşê, bi nêrîneke lavatiî, li çavên Zabit ku di korteke kûr de ne, dinihêre û jê dipirse, "te çawan ez xelas kirim, ji kû, li kû?"

Zabit çavên xwe digire, serê xwe ber bi jor dike û axînekê dikişîne, "mepirse, kurê min" dibêje, "mepirse, zahf wext çûye, hew tê bîra min..."

"Ez ketime bextê te, ji min re bibêje, bi qasî ku tê bîra te. Ev pîrsa hanê, pîrsa jiyana min e, pîrsa ku min ji tu kesî nepirsiye, ji kesekî re negotiye û hertim ji xwe pîrsiye û tu bersivê wernegirtiye. Bibêje, bîne bîra xwe..."

"Hiş nankor e, kurê min, tişt zû ji bîr dibin. Belkî jî loma însan naguhere. Nayê bîra min, li wan deran, di nav wê xwîn û agirî de bû. Zahf gund, dar, dahl, devî, daristan, gelî, newal, şikeft

dişewitîn, zahf dû û dûman ji wir bilind dibû. Zahf jin bî, zarok sêwî, însan bêgund, heywan bêwar diman. Gunehê min bi zarokan, zarokên biçûk ên sêwî dihat, gunehê min bi te hat. Lê nayê bîra min..."

"Yanî tu dibêjî... yanî ez ji wan deran im" Baz li saeta xwe dinihêre û hêdîka, lê bi heyecaneke diyar, dipirse, "yanî bav û diya min, ne di qezayeke trafikê de mirin? Li wan deran... ez sêwî mam? Bav û diya min ji wan in? Ez ji wan im?.."

"Na, na, ez weha nabêjim, lê nayê bîra min. Tu leşker î, tu ji ordiyê yî, tu lawê ordiyê yî... Bavê te, diya te ordî ye. Ji bîr meke. Êdî ji min mepirse, eziyetê bi min meke, mêjiyê min ê westiyayî, hişê min ê windabûyî nikare tu bersivê bide... lê Xwedê şahid e, min tu carî xirabiya te nexwest..."

Zabitê Simbêlqît çavên xwe digire û hew dipeyive. Gelo Baz bipeyive, jê tiştên din jî bipirse? Na, diyar e ku Zabit naxwaze, heye ku siheta wî jî dest nade. Baz, dîsan, li saeta destê xwe dinihêre, bi qasî çendekê li Zabit fedike, paşê dîsan herdu destên wî digire û wan radimûse, hêdîka, "spas," dibêje, "ji bo her tiştî berxwedar bî."

Zabit napeyive, çavê xwe venake. Sînga wî radibe û dadikeve, mîna ku ew di xew re here, bi dûzan, ew nefes digire û dide.

"Ez divê bigihim ser civîneke girîng" Baz dibêje û radibe pê, "lê ez ê sibê dîsan werim, di xweşiyê de bimîne..."

Zabit gotinên Baz dibihîze? Baz tînagihê, li ber derî, careke din, li Zabit dinihêre, kumê xwe dibe serê xwe, çante di destan de, ew derdikeve, bi lez, bêtî ku li der û dorên xwe binihêre, ji salonê derdikeve, dere qata jêr, di korîdora dirêj re derbas dibe û xwe davêje derve, ronahiya rojê, tava tîn. Niha? Piştî gotinên Zabit?

Baz kî ye?

Bibêje Baz, tu kî yî, Baz, li ber deriyê mezin ê nexweşxanê rawestiyayî, bideng, ji xwe dipirse. Ew li dora xwe, li însanên ku derin û tîn, otomobîl û taksiyên ku tîn û li ber derî radiwestin,

dinihêre. Ronahiyeke xurt çavên wî dityesîne, apoletên kincên wî, nîşana zer a li ser kumê wî û qumçikên çaketê wî, bi şewqê, dibiriqin. Ew ji derî bi dûr dikeve, ber bi jêr, ber bi qeraxê çem dere. Cihê ku ew ê heriyê, Qerargeha Bingehûn a Leşkerî, hinekî dûrî nexweşxanê ye. Wî dil heye, peyatî, di kêleka çem re, here. Ew bi rê dikeve, bi gavên lezê, serê wî li ber wî, dengên cihê yên kes, wext, cih û diyarên cihê di guhê wî, dilê wî di nav pêlên dudilîbûnê de, ruhê wî, mîna vî çemê ronî, bi gotin, bûyer, agahî û pêwendiyên nû çelqiyayî, dimeşe.

Hafiza, ew difikire, rojên bihurî, wext, dewr û dewranên derbasbûyî û gotinên Zabit, gundên ku dişewitîn, însanên ku dike-tin, jinên ku bî diman, zarok, kur û keçên ku sêwî diman. Hiş? Lê ev gotinên hanê, yên do ne? Yên hafizayeke kal, bîreke westiyayî ne? Hingî gundên ku îro dişewitin, însanên ku îro dikevin, jin û zarokên ku îro li pey miriyên xwe hawar dikin? Ev tiştên ku Baz her roj dijî, şahidî lê dike, tê de ye, çi ne? Hafiza do? Rastiya îro? An jî راستiya do, îro, pêr, sibê? Ew dahl û daristan, gelî û şikeftên bîra Baz. Gelo Baz, kok û rehê Baz li wan deran veşartî ne? Gidî tu ji wan deran nebî? Baz, bideng, dîsan, ji xwe dipirse. Çima tişteke nayê bîra Baz? Çima hafiza Baz nikare xwe bi milê tarî yê zarokatiya xwe bigihîne? Baz; li derekî nenas ê dinyê, cihekî bênav ê vî welatî hatiye dinyê, bav û diyeke wî yên nenas hebûne, lê li cihekî nas mezin bûye, li dibistan û xwendegêhên ku îro jî hene û li vî bajarî ne, xwendiyê, perwerde bûye. Lê mala wî? Rehên wî? Warê ku ew lê hatiye dinyê? Cih û warên wî? Mala te Baz? Baz dipirse, mala te, li vê darê dinyê, li kû ye?

Baz radiweste, cixareyekê, ji pakêta berîka xwe ya hundir, tevî hesteyekê, derdixe, cixare vêdixwe û dikêşîne, bi kûrahî. Avahiya ku niha li hember wî, ber bi esmanan bilind dibe û portreyeke General Serdar ku li ser cawekî bêpayan mezin çêkirî ku hema çî bigire hemû dîwarekî avahiyê tijî dike, cihê civînê ye. Avahî; warê Baz ê nas, navenda pêwendiyên leşkerî, plan

û programên leşkerî. Avahî; dilê dewlet û ordiyê, rehê esasî yê hukimdariya General Serdar. Avahî; bav, dê, mal û warê Baz. Hewqas! Lê Baz ê careke din jî bi Zabitê Simbêlqît re bipeyive. Heye ku Baz bikaribe hin tiştên diyar, misoger jî devê wî derxe.

Heta ber devê deriyê hesin ê avahiyê, Baz cixareyeke din jî dikişîne, li ber devê derî, ew careke din, xwe dide hev, li kinc, apolet, qumçik, pêlav û qirawata xwe dinihêre û paşê dikeve hundir. Hundir, hema çi bigire bi qasî derve ronî ye. Li her derî ala rengîn hilawestî ye. Li ser dîwaran portreyên mezin ên General Serdar hene. Serhengêk tê nik Baz, li hember disekine, bi sertî, silava leşkeriyê didiyê û paşê, "em li hêviya we bûn, fermo" dibêje û dikeve pêş Baz. Baz û serheng, bêdeng, di korîdoreke kurt de derin, paşê dizîvirin aliyê rastê, jî wir jî dîsan korîdoreke dirêj, seranser, dibirin û di dawiya korîdorê de ji deriyekî fireh dikevin hundir. Baz salonê dinase, salona konferans, brîfîng û civînên şewirandinê. Gava Baz dikeve hundir, zabitên ku li hundir in, jî bilî çend kesên ku li jor, li podyûmê, li pey maseyeke dirêj û li jêr, li rêza yekemîn a kursiyan rûniştine, radibin ser piyan û li çepikan dixînin. Ji bo Baz. Ji bo kumandarê efsanewî yê "wan deran." Ji bo zabitê ku jî mirin û kuştinê tê. Ji bo lawê dilsoz û fedakar ê dewlet û ordiyê ku tirsê herî mezin a "ewana" ye.

Baz, şermokî, li saeta xwe dinihêre. Wext, ne zêde, ne kême. Mîna her carê Baz di wextê xwe de hatiye, mîna her carê, bi dûzan, qayide, dîsîplîn, bi cidiyet û xesasiyet û tekûz. Baz, bi serê xwe, kenê maxrûrî û baweriyê li ser rû, spasî zabitan dike û rasterast ber bi podyûmê dere. Gava ew jî nêrdewanan hildikişê jor û tê ber masê, qama xwe rast dike, sînga xwe derdixe pêş û silaveke sert dide zabit û generalên ku amîrên wî ne û li pey masê rûniştine, paşê bi eynî sertî û cidiyetê ew silav dide zabitên ku li salonê rûniştine. Zabitek jî pey masê radibe, bi destan, cih nîşanî Baz dide. Baz, yek bi yek, destên zabit û generalan diguvişîne û dere li ser kursiyê nîşandayî rûdine.

Salona ku perdeyên hemû pencerên wê girtî ne û hinekî tarî ye, digel qerebalixê, bêdeng e. Bi qasî sed û pêncî zabitên resmî, di nav cil û bergên paqij û resmî yên ordiyê de rûniştine. Li rêza pêşîn, bi qasî deh generalên ku rutbeyên wan ji hev cihê ne, rûniştine. Hingî çend zabit, deriyê salonê vedikin, bi lez, li paş, li kêleka zabitine din rûdinin. Generalekî bejndirêj, bi berçavik ku li kêleka Baz rûniştiye, radibe pê û dere ber kursiyê bilind ê xeberdanê û xêrhatinî li zabitan dike, "civîna me ya giştî ya salane dest pê dike" dibêje, berçavkên xwe yên tarî ji çavên xwe derdixe, li salonê dinihêre û gotina xwe didomîne, "herwekî ku hûn dizanin, civîn ê du roj dewam bike. Ev civîn ji yên bihurî gelekî muhîmtir e. Em niha gihîştine qonaxa çareserkirina gelş û problemên li ber me. Me hêvî heye ku civîn alîkariya vê yekê bike..."

Generalê ku ji bo Baz tîmsala xurtî û fedakariyê ye û di şeva daweta Baz de, heta dawiyê pê re bû, bi qasî çendeke dirêj bi vê şeweyê, li ser qayide, metod, rapor û biryaran, bi dengê kûr, gotinên dirêj dike. Paşê jî ew bang li generalekî din ku li pey masê rûniştiye, dike û gotinê dide generalê qelew, kin û qut. Generalê kin dest bi axaftinê dike. Guhekî Baz li ser dengê General, ew defter, kaxiz û dosyayên çente derdixe, wan li ber xwe radixe û bi pênuşeke sor, kêleka hin rêzên ku wî dinivisîne, stêrkekê çêdike. General dipeyive, Baz difikire. Gotinên General ku pere-gende, bi guhê Baz dikevin; stratejî, parastin, qayide, dezgah, xefik, paqijî, yekîti, dijmin, lîstik, dek û dolab. Dengên ku di mêjiyê Baz de olan didin; ew der, ewana, mij û dûman, şikeft, şewat, hafiza, bîr, wext, dor-zor, çima...

Û ew, Kevok, dengê wê, gotinên wê; "ji ber bîr û baweriyên cihê, dîn û olên cihê, ziman û huwiyetên cihê divê meriv nebe dijminê merivên din... meriv bi huwiyetek, dînek û zimanek tê dinyayê û pê dijî. Sûc û gunehê merivan di vê de çî ye?"

General dipeyive; me tevdîrên nû, çek û pûsaden nû, qanûnên nû, mafên nû yên awarte, balafir û helîkopterên nû divên...

Piştî ku General xeberdana xwe ya gelekî dirêj xelas dike, ji salonê dengê tîz ê çepikan bilind dibe. Bi qasî bîskekê, herkes li

pê. General, kêfxweş, serbilind, li cihê xwe rûdine. Hingî navê Baz tê xwendin. Baz, defter, dosye, kaxiz di destan de, radibe pê, hêdîka, ber bi mîkrofonê dere, tiştên destên xwe li ser refê kursiyê radixîne, mikrofonê rast dike û li general û zabitên ku rûniştine, dinihêre. Baz gelekên wan dinase, bi hinan re xwendiyê, bi hinan re xebitîye. Li ser çav û rûyê hemûyan meraq, di nêrîna wan de rêz û rêzdariyek dixuye. Hemû qamrast rûniştine, bi nêrîneke sert û xurt li Baz dinihêrin û dipên. Ew çi dipên? Li xeberên mirin û kuştinê? Li serfirazî û biserketinên ordiyê? Li wahşet û mêrkuj, xirabî û kirêtiya serhildêran? Belê, Baz, ji nêrîna wan derdixe, ew li hêviya xeber û mizgîniyên baş in.

"Ez bi xebereke baş dest bi gotina xwe bikim," Baz dibêje, li kaxizên li pêş xwe dinihêre, serê xwe radike û didomîne, "mizgîniya min li we; em bi ser dikevin, dewlet û ordî bi ser dikeve. Li her alî desthilatî dikeve destê dewlet û ordiyê. Em vî şerî jî qezenc dikin. Xelk tê aliyê me, serhildêr kêmtir dibin, quweta wan kêmtir dibe, seha, war û cihê ku ew xwe tê de dilivînin, tengtir dibe. Êrîşên me, mîna pêlên deryayeke heybetdar, hertim li ser wan in. Quwet di destê me de ye, em bi ser dikevin."

Bi dû vê gotina dawîn a Baz re, çepikeke bêpayan xurt hemû salonê tijî dike. Bi qasî bîskeke. Paşê Baz, bi baldarî, çavê xwe li salonê digerrîne, bi dengê gelekî nerm, mîna ku ew diponije, "lê min hin pirs jî hene" dibêje, "pirsine ku ez ê di dawiya xeberdana xwe de bînim ziman." Baz dest bi hejmar û reqeman dike; ji du sed hezarî zêdetir leşker, bêhejmar garnîzon û qereqolên leşkerî, bêhejmar tank, top, çekên giran ên şerên mezin, bi qasî pêncî helîkopterên şer, bi qasî heftê balafirên şer, organîzasyona xurt a polîsan, rêxistinên ewlekarî û mixaberatê, sîxurên ku di nav refên serhildêran de dixebitin, bi qasî sed hezar gundiyên "wan deran" ku çek hildane û li ba ordiyê, li dijî keleşan şer dikin, bi sedan xortên ku dev ji serhildanê berdane, li xwe mukir hatine û niha di nav refên ordiyê de şer dikin. Pêwendiyên xurt, tekûz, pihêt... Kî dikare xwe li hember vê quwetê rabigire?

Bi qasî saetekê, bi vî awayî, Baz behsa stratejî, taktîk û êrîşan, tevî nav, cih, war, hejmar, kes, civat û pêwendîyan, kite bi kite, dike. Paşê di dawîya xebirdana xwe de, ew hinekî radiweste, dîsan, bi dîqet, li zabitan dinîhêre, "lê" dibêje, "mîn lê-yeke biçûk heye, gelo wexta guherandina vê siyasetê, vê nêrînê nehatiye? Ji bîst salan zedetir e ku ez di nav wan de me, bi wan re me, li dijî wan şer dikim, wan jî dijminan diparêzim. Ez dikarim îdiaya bikim ku ez wan dinasim. Tecrubeyên min ên bîst salan, nemaze yên demên dawîn hin pîrs di serê min de anîne pê. Bêguman em ê di vî şerî de jî bi ser kevin. Bêşik em ê îcar jî piştî wan bişkînin. Lê? Lê heta kengî? Em ê zora wan bibin, lê em ê bikaribin bawerîyeke germ bidin wan, wan bikin dostên xwe? Bêguman em ê zora çek, tiving û şerê wan bibin, lê em ê bikaribin zora stran, destanên wan ên ji bo me, nenas, bibin? Zora dengê wan stranan bibin, gotinên wan ên sirtîjî, pise pisa wan a bêpayan xurt, efsane û çîrokên wan ên serhildanê bibin? Quweta wan a herî mezin aha ev tiştên hanê ne; zimanê wan, gotina wan, destan û çîrokên wan, ruhiyeta wan a -ji bo me- nediya. Hêza wan, ne çek, şer, pevçûn û mirin e, lê ev tiştên ku ez qalê dikim, in. Em ê bikaribin xwe bi van tiştan, kûrahiyên van tiştan bigihînin û zora wan bibin? Me do kuşt, em îro dikujin, lê em ê bikaribin ruhê wan ê nediya, îsyankar, nenas ku bi bayê sibê û hingûra şevê, tava rojê û ronahiya heyvê di nav çem, kanî, çiya, zinar, dar, daristan, gelî, newal û esmanên wan de digere, bikujin?.. Pîrsên min ev bûn... Gelekî spas..."

Lê niha deng nûn e, çepik nûn e. Hema çî bigire hemû, bi heyret, li Baz dinîhêrin. Baz, bêdeng, çavê wî li ser kaxiz û dosyan, dere û li cihê xwe rûdine. Bedengiyeke gelekî kûr hemû salonê vedigire. Kes napeyive. Piştî bîskeke, Generalê Bejndirêj, bêyî ku ew jî cihê xwe rabe, navbirekê dide civînê. General, zabit jî salonê derdikevin. Salon vala dibe. Lê Baz jî cihê xwe ranabe, ew kaxizên xwe dide hev, wan dixê çente, jî qedeha pêşîya xwe

çend qult av vedixwe û rûdine. Lê hingî Generalê bejndirêj tê nik wî. Baz radibe ser piyan, qamrast radiweste. "Were" General dibêje, "bi min re were." Ji paş podyûmê, ew, General li pêş, Baz li pey wî, dikevin koridorekê û li ber deriyê yekemûn ê korîdorê radiwestin. General, bi kilîdê, derî vedike, ew dikevin hundir, odeyeke gelekî ronî. Ode li çem dinihêre û hemû pêşiya odê, bi pencere û cam, vekirîye. Ji odê bergeheke gelekî xweş a çem û milê din ê bajêr dixuye. Ode gelekî xweş raxistî ye, palkursiyên çermûn, maseyeke gulover a ji cam, xalîçeyeke tarî li odê raxistî ne. Li dîwarê paş masê jî General Serdar. General dere paş masê û li ser kursî rûdine. Baz, li pê, qamrast, çav li pêş, herdu destên wî ber bi jêr, li ser pantolonên hakî, bêdeng, radiweste. "Tu dizanî," General berçavkên xwe derdixe, herdu destên xwe datîne ser masê, bi dîqet, li Baz dinihêre û dibêje, "tu mîna kurê min î. Gerek were bîra te, ez hatibûm daweta te jî. Tu dizanî, piştî mehekê wexta terfiyên ordiyê ye. Ji niha ve ez ji te re bibejim, tu dê terfî bikî. Û em ê cihê te biguherînin. Tu li wan deran gelekî westiyayî. Te bêhnvedan divê. Me jî kurên mîna te, lê zînde, divên. Bila haya te jê hebe, fermo here."

Baz dibêje "spas," herdu pêlaven xwe yên reş li hev dixê, li silavê disekine, paşê dizîvire da ku ji odê derkeve, lê gava ew digihê ber derî, "bira, halê mala te çawan e?" General, jê dipirse, "halê jin û zarokên te?"

Baz radiweste, dizîvire, qamrast, li General dinihêre, lê bersîv nade. "Dibêjin ku tu narî mala xwe, rast e gelo?" General dîsan dipirse.

"Rast e" Baz, bi kurtahî, dibêje.

"Here mala xwe, nav zarokên xwe" General, bi dengê fermî, dibêje, "vegere mala xwe û ji niha ve hazirîya vegerê bike, tu dê wan deran terk bikî. Fermo."

Baz destê xwe davêje destikê derî ku derkeve, hingî General dîsan dipeyive, "bira, ji bîr meke, wê keça ku li ba te ye, teslîmî kumandarê garnîzona bajêr bike, -niha, zûtirîn wext."

Hingî Baz, mîna ku birûskek di dilê wî de vedabe, di cihê xwe de radiweste, germahiyek bi ser wî de tê. Ew welê, bêtevger, dimîne, xwe venagerîne, rûyê xwe nazîvirîne, welê, disekine.

"Ji bîr meke" General gotina xwe dubare dike.

"Lê..." Baz dibêje, lê hew ji devê wî gotin derdikeve. Ew dîsan dibêje "lê..."

"Me li lê'ya te guhdarî kir. Lê nîn e, tu dê wê keçê teslîm bikî... Hewqas..."

15. Rêwing

Baz û Kevok, bi hev re, di nav trêneke şevê de.

Baz û Kevok, mîna gelek carên din, li rê. Di kompartimaneke biçûk a trêne de.

Serpêhatiya Baz û Kevokê; ji rêwîtiya trêneke leşkerî ta rêwîtiya trêneke reş a şevê. Lê ne Baz pê dizane, ne jî Kevok. Do; rêwîtiyeke dirêj a trêne, berî niha bi bîst û çend salan. Riya sirgûneke girseyî û dirêj, ber bi welatê çolê. Hingî Baz, zabitekî nû dest bi kar kirî û berpirsiyarê kompartimaneke fireh, germ û girî yê trêne. Di kompartimanê de însanên têkel ên Welatê Çiyan, li ser riya sirgûnê. Di nav wan însanan de bav û diya Kevokê. Niha haya Baz jê nîn e ku ew kesê ku di wê germa trêna sirgûnê de hat û jê av xwest, bavê Kevokê û jîna wî ya bihemil diya Kevokê bû. Niha haya Kevokê jê nîn e ku kumandarê koça bav û diya wê –ya berî destpêka umrê wê– Baz bû. Îro; dîsan trêna rêwîtiyeke dirêj.

Baz û Kevok; du nasên hevdu, berî ku ew, mîna du însanên têgihîştî, di rewşeke nexweş de, pêrgî hev bîn. Trêna; pêwendiyêke nexuyayî ya jîyan û serpêhatiyên jiyana wan. Baz û Kevok; du însan, mêrek û jinek. Lê du dijmin? Du dost? Belê, pêwendiyêke nediyar di navbera jiyana wan de. Lê pêwendiyêke çawan?

Belê, em di trêneke dirêj, kompartimaneke biçûk a çarkesî de, nîvê şevê, derin. Tevî Baz û Kevokê. Li ser riya pêwendiya jiyana wan. Nîvê şevê ye. Wext, wextê razan, xew û xewnan e. Lê şevronî ye. Şeveke ronî ya havinekê. Stêrên bêhejmar, li milê din ê

pencera kompartimanê, li derve, li esmanan, diçirisin. Heyveke nîvçe, mîna ku serê xwe xwar kiribe û li stêran nobedarî dike, dibiriqe. Mîna çarşeveke tarî, mîna pîneyên cilekî, hin ewr, li hin milên esmên, dixuyin. Trên, bi dengêkî xoftijî, di hembêza şevê de, şeva ku mîna xalîçeyê hewrîşimî hawîrdor rapêçaye, bi xuşîn dere. Bi tenê dengê trêne tê bihîstin. Ji bilî wî ne dengê, ne pêjnek.

Trên dere, şev dere. Baz û Kevok derin. Baz û Kevok li hember hev, li kêleka pencera fireh a kompartimanê rûniştine. Di kompartimana çarkesî de, bi tenê ew rûniştine. Ronahiyeke qels a lampayeke şevê, di ser serê kevokê re, kompartimanê hinekî ronî dike. Cil, berg û kincên wan sivîl in. Pantolonekî bej ê keten, gomlegekî pîkin ê zerikî û cotek pêlavên sivik ên havînê li Baz in. Baz gomlek bera ser pantolonan daye da ku demança pişta wî, bareta kuştinê nexuyê. Fîstaneke dirêj û rengîn ê keten li Kevokê ye. Di lingên wê de jî cotek pêlavên sivik ên sporê hene. Ew hişyar in, lê napeyivin, deng ji kompartimanê dernakeve. Baz çavên xwe girtine, lingên xwe hinekî dirêj kirine, serê xwe biriye paş palkursiya fireh ku ew lê rûniştiye û difikire. Herçî Kevok e, li hember Baz, li ser palkursiyê, wê lingên xwe kişandine ser palkursiyê, destekî xwe daye ber pencerê, deftera wê di hembêza wê de, li der, li stêr, heyv, ewr û esmanan dinihêre. Baz û Kevok li hember hev rûniştine, lê li hev nanihêrin, her yek di dinya xwe de, li xwe, deng, bûyer, hîs, qewimandin û pêwendiyên xwe difikire. Niha wext, wextê fikirîn û fikiran e. Welê dixuye ku fikirîn, niha, di vê şeva bêdeng û ronî ya havînê de ji peyvandin, nêrîn û gotinê çêtir e.

Gelo ew çi difikirin? Çi hîs dikin? Li kîjan dengan guhdarî dikin? Dilê wan ji bo çi hildave? Ew ji kû tên, ber bi kû de derin?.. Emê niha bersiva van pirsan çawan bidin?

Heye ku weha, raste rast, hinekî peregende, hinekî tevîhev;

Baz, em li ba Baz in; belê weha, ez derim, em derin. Ez û ew, keça sirtijî ku derketiye ser riya min û riya min ber bi dereke

nediyar dizîvirîne. Êdî kî çî dike, çî dibêje ne xema min e. Êdî temam, êdî xelas, her tişt xelas. Belê weha, eynî mîna ku Maderê digot, "ji bo jîyanê, jîyînê gav divên. Nûbûn, guherîn, daxwaz û jîyaneke birûmet gavên nû, tevgerên nû divên. Hinekî xurtî, hinekî xîret, hinekî cesaret divên. Girtî, tirsok, kole, diranên çerxeke xoftîjî nikarin gavên nû bavêjin, tevgerên nû bînin pê, nikarin xwe ji qeyd û zincîrên tirs, xof, şerm, pîvan û qayidan rizgar bikin û rizgar bibin. Dilê tirsok sînga spî nabîne..." Mader, xwezî tu jî niha li vir bûyayî û te lawê xwe yê sêwî bidîta. Êdî ne qayide û pîvanên ku ez kirim dîl, ne jî tirs û nîrê ku li ser stûyê min bû, hene, mane. Xelas. Ez azad im, rizgar im, serbest im, mîna stêrikek ji van stêran, mîna heyva ku li der dibirîqe. Hew. Hewqas. Min sînor, qayide û pîvan dane ber lingan. Min di sînorên nexuyayî yên zahf qehîm, zahf qetî re gav kiriye. Sînorên ku dil û ruhê min kiribûn nav qalibekî, êdî nîn in, min ew rakirine, hilweşandine. Mader, xwezî tu jî li vir bûyayî. Mader, li min bibuhure ku min xebera reva xwe ji te re negot, lê ez ê li te bigerim, kite bi kite, her tiştî ji te re bibêjim. Ez dizanim, hingî kêfa te dê were. Lê ne niha. Niha xeter e. Piştî ku min, me di sînorên xeter re jî gav kirin. Sînorên nexuyayî, dijminên min, dijminên jîyana min. Sînorên nexuyayî, mîna sînorên nediyar ên wî welatî, mîna çiya û zinar, gelî û newalên wî welatî. Gavkirina sînorên nexuyayî? Şixulê herî dijwar ê jîyana min a ku tijî dijwarî ye, ji gavkirina sînorên gelî, newal, bihur, gêdûg, av û çemên wî welatî jî zehmettir. Gavkirin, gav bi gav, bost bi bost, bi şev û roj, meh û sal, zivistan û havîn, umir û jîyan, -da ku meriv bikaribe, ji nişka ve, xwe li milê din ê sînoran bibîne. Mîna niha. Niha ez êdî li milê din ê sînorên nediyar im.

Mader, min ji te re negot, ezê ji te re bibêjim, lê ma tu dizanî ka wan, serek û amîrên min ji min çî xwestin? Vê keçika ku niha li hember min rûniştiye û li der dinihêre, keça ku min navê wê neda, lê ji te re behs kir. "Tu dê wê teslîm bikî," wan got. Qetî, ji qanûnê qehîmtir. Û wan dil hebû, min ji wî welatî jî bi dûr xî-

nin. Piştî bîst û çend salan, piştî evçend xwîn, xwîdan, jan, ezab, keser û xebatê. Piştî evçend ders û tecruban. Rast e, ez westiyayî me, jiyana min tevlihev e. Rast e, hêvî, miraz û hîsên min şikestî ne. Lê sebeb çi ye, kî ye? Mîna ku hîç tiştek nebûye, neqewimiye, ew tîn, dibêjin "spas" û min ji wir, ji ba û bahoz, berf û baran, tav û tîn, teyr û baz, co û çem, dar û dahl, gelî û newal, heyv û stêr, deng û pêjn, nan û av, jin û mêrên wan deran bi dûr dixînin. Bîst û çend salên min ên wan deran? Jiyana, xwîn, xwîdan, jan, keser, xem, xeyal û tecrubeyên min ên wan deran? Jiyana ku min li wan deran derbas kiriye, ava kiriye? Pêwendiyên min? Kesên ku bi gotina min, kirinên min bawer in û bi gotina min jiyana xwe davên talûkeyan, derin mirinê? Na, min maf nûn e ku ez van tiştan bipirsim, hîs bikim. Min bi tenê mafek heye; îtaat. Ezê keçikê teslîm bikim, ji heval û hogirên xwe yên man û nemanê rû badim, umrê xwe, jiyana xwe ya bîst salan bidim bin lingan û bêdeng, di şeveke tarî de, mîna dizekî, mîna keleşekî, wan deran terk bikim û herim!.. Na, êdî hew, êdî bes!

Kevok, em werin nik Kevokê; em weha ber bi kû derin? Ev zîlamê hanê ku weha, tafilê, guherî, min bi kû de dibe? Tiştekî ji min re nabêje, bi tenê, "hew, bes, êdî bes e" dibêje. Em derin, ev hefteyek e ku em li rê ne. Pêşî bajarê mezin ê Welatê Çîyan. Nîvê şevekê. Dîsan ev, Baz, ji nişka ve li malê. Ev zîlamê hanê ku niha çavê xwe girtiye û Xwedê dizane ka li çi difikire, li malê, şaşbûyî, westiyayî, cixare di dev de, çente di destan de, demançe li ber. Mîna her carê serxweş, lê bi nêrîneke nerm. "Zû ke, zû xwe bide hev, em derin." Bi kû de? Hîç, bersiv nûn e, "em ê herin, ez divê te ji mirinê xelas bikim, ez divê xwe ji mirinê xelas bikim. Zû ke, emê herin, bilezîne." Hazirkirina çenteyekî biçûk û di tariya şevê de birêketin. Bi jîpeke leşkerî, heta bajarekî nêzîk, mîna niha, di zikê şevê de. Li wir li otêlekê, di odeyên cihê de, hin pêwendiyên wî yên dizî, hin telefon, kirîn û guherandina cil û bergan û dîsan rêwîti. Ji wî bajarê ber bi bajarekî din, dîsan otel, ji wir jî yekî din, bi vî terhî, gav bi gav, bajar bi bajar, cih bi cih, mîna ku ew

dixwaze şopa xwe winda bike, rê li pey xwe bide windakirin. Bi jîpên leşkerî, otobosên sivîl û trênen dirêj. Lê çima? Çi bi vî însanê dîn, dilê dîn qewirniye?

Baz; û Mader, xwezî te bizanibûya ka Zabitê Simbêlqît li nexweşxanê çi got, gotinên Zabitê Simbêlqît, "zahf xwîn dirijîya, kurê min, li wan deran zahf jin bî, zarok sêwî diman... gunehê min bi te hat..." Zimanê min nagere ka ez çawan bibêjim. Ez, ewana. Ez, ji wan deran? Ez, ji wan? Hingî ev jiyana min? Ev kirin, tevger, xwîn û xwîdana ku ez dirijînim? Hemû derew? Hemû pûç? Jiyana min, umrê min, jiyana û umrekî derew û pûç? Heye ku ez bikaribim bi te re bipeyivim, lê ezê ji zarokên xwe re çi bibêjim? Ez kî me, aîdê kê me? Van hîsên kambax, vê dudilî û sûzeniya ku ez xistime, şikandime, niha jî, di vê şeva ronî de jî, bêhnê li min diçikîne. Bi van hîsan ez hew dikarim rahêjim tiştêkî, xwe tiştêkî bihesibînim, hew dikarim razê, hew dikarim bi şixulekî rabim. Lê êdî bes, hew... êdî bi xatirê her tiştî, êdî payin, rawest, fikirîn, bi qasî saniyekê jî zêde ye. Hatina min a paytextê êdî bû dilopa dawîn a qedehêke tijî av. Ez niha, mîna qedeha tijî, di ser re derim. Ez derim, bi xatirê we dibêjim û derim; bi xatirê te jiyana leşkerî û hemû umrê min ê heta vê rojê; bi xatirê we garnîzon û qerekol, lojman û malên leşkerî; bi xatirê we hêviyên min ên rojên destpêkê, mirazên min ên jiyana leşkerî, xeyalên min ên rojên bê -yên piştî jiyaneke dirêj a leşkeriyê; belê, bi xatirê we, leşker, zabit, general, kumandar, disîplîn, destûr, bername, qayide, şan, şeref, mirin, kuştin, şewat, dijmin, îşkence, tade, zor, şidet; bi xatirê te, jiyana şevê, jiyana tarî, çûyin, meş, êrîş. Bi xatirê te, her tiştê ku aîdê jiyana min a heta îro ye... Mader, xwezî tu li vir bûyayî, ev tiştên ku ez niha lê difikirim, ev gotinên ku ezê niha bibêjim, ji bo te ne, ezê, -eger tiştêk bi serê min de neyê û ez bikaribim bi saxî ji vê revê jî xelas bibim- wan ji te re jî, rojekê, bibêjim; niha ez bîr dibim, bi tecrubeyên xwe, bi bûyerên nû, dikarim rê, hedef û armancên çê û xirab ji hev derxim, ez bawer im ku ez dikarim, ez dikarim niha li pey kîjan

hedefê çi daxwaz û xwestek heye, têbigihêm, niha ez li riyên nû digirim, bi cesaret, cesareta ku te hertim behs dikir, dikevim ser rîyeke xumamî ku dawîya wê dikare mirin be, lê bila weha be, tevî her tiştî min niha xwe daye ser rîyeke nû, gelekî nû, ez riyên kevn li pey xwe dihêlim, pirên kevn dişewitînim. Trêna min dibe, ji rê û pirên kevn bi dûr dixîne. Ez ji te re bibêjim, eger min weha nekira, hê jî, ezê niha di nav wê gola xwînê de bûma. Ma te hertim nedigot "kurê min, tu dîn î." Ez ji te re bibêjim, ez dîn im û dînîtiya min îcar bi kêr hat, ji bo vê gava nû, rîya nû dînîtî diviya.

Kevok; Ev rîya ku em niha lê ne, bi kû de dere? Dawîya wê dê çawan xelas bibe? Kevok! tu çima vê yekê meraq dikî? Rê bi kû de dere, bila here, çi diqewime, bila biqewime. Ji te re çi? Te çi şixul pê ketiye? Ma her tişt, jixwe, ji bo te, xelas nebûye? Ma te hê jî hêvî heye ku tişt ê ber bi başbûnê herin? Na, xwe mexapîne. Rastiyê bibêje, bibêje ku tu winda yî, tu mirî yî û tu nefret dikî. Belê, Kevoka ku ji gotina nefretê nefret dikir, niha ji her tiştî nefret dike. Weha ye. Nefret, ji van însanan, ji hemû însanan, gotinên wan, ken û henekên wan, rabûn û rûniştina wan, fikir û gumanên wan, kîn û nefreta wan, berberî û hesûdiyên wan, derew û fortên wan, şer û pevçûnên wan, çek û pûsadên wan, mirin û kuştinên wan, kozik û kemînên wan, dek û dolabên wan. Nefret, ji vî welatî, ji wî welatî, ji berbangên sibehan, hingûrên êvaran, nîvê şevan, çiyayên serî li esmanan, newalên binî li ceheneman, berfa xopan, barana tofan, tav û tîna çolan, reng, tahm, xweşî û nexweşiyên hawîrdoran. Nefret, ji vî, ji wî, ji wan, ji ewana, ji hemûyan, ji herkesî. Nefret, bêhtir ji tirsê, ji xem, keser, sûzenî, silî, kabûs, xof û sawê, lê tirs, herî zêde tirsê kambax. Hingî? Bibêje Kevok, hingî tu çima meraq dikî?

Baz; hingî, ev roja konferansa girîng a serekiya ordiyê, li payitext. Hingî, Mader, hingî biryar. Hingî hejîn, ricifîn, digel tîn û tava rojê. Sar, na carina sar mîna serma zivistanê, carina germ mîna tîna wê roja germ. Cixare, bêhn û tahma cixarê, dûmana cixarê. Axaftin, peyivîn, deng. Pêlên dengê di mêjî û ruh de.

Lê, lê, lê... bikuje, bikuje, bikuje, ne carek, ne du caran, ne deh caran, ne sed, ne jî hezar caran... bikuje, bi tenê bikuje. Lê dawî, lê dawîya kuştinê? Lê ma em nikarin vê mesela ku bûye kaniya xwînê, bi riyeke din, bi şeweyeke din çareser bikin? Na, na, na... "Tu dê dev ji wan deran, ji wan, ji wê berdî." Hewqas. "Tu dê wê teslîm bikî." Hewqas. Ez kî me? Hîç kesek, ne tiştek, bi tenê diranekî çerxeke mezin. Baz, kumandar, desthilat, gotina wî qanûn, lê di nav çerxê de bi tenê diranek. Derdên min, hîs û fikrên min, daxwazên min, şexs û şexsiyeta min? Xema kê? Ne xema kesekî. Hingî biryar, hingî têgihîştin, lê bi derengî, piştî umrekî. Danê êvarê, piştî roja yekem a konferansê, li ber çem. Ava çem a şewqdayî, tîrêjên sor ên tavê, esmanên vekirî, giya û çimên biriqî yên bexçeyên qiraxên çem, kevirên reş ên raxistî yên piyaderan û rûyên însanên têkel, cihê. Fikir û guman; me çi kir, em çi dikin? Min çi kir, ez çi dikim û ezê çi bikim? Û gotinên Zabitê Simbêlqît û Mader, gotinên te û gotinên Kevokê di guh de, di mêjî de. Kela giriyê. Kela hêrs û kerbeke ecêb giran. Kela hîseke nenas. Nayê bîra min, lê heye ku çend rondikên çavan. Gavên giran li qeraxên çem. Gav, gavên nû. Belê gavên nû, li ser riyeke nû. Gav bavêje! Metirse! Cesaret! Hingî biryar. Hingî rehetî û hizûreke nenas, hingî ji esebiyet, xem û gumanên ku bûne tora pîrhevokekê û jiyana min dîl girtine, dûr, gelekî dûr, cara yekemûn, piştî demeke gelekî dirêj.

Kevok; ezê êdî ji kê re çi bibêjim? Ezê çawan qala xwe, jiyana xwe, Jîr, çûyina xwe, jiyana xwe ya wan deran, mirin û kuştinê, agir û şewatê, Rênas, egîdê ku ez bûm sebaba mirina wî, hevalên Rênas ku ji rûye min, ji ber tîrsa min hatin kuştin, jiyana xwe ya nû bikim? Çawan, bi çi zimanî, kengê? Kî dê lê guhdarî bike? Agir, cihe ku dikeviyê, dişewitîne. Agir, şewat, mirin û kuştin xema kê ye? Kuştina keç û xortan, şewata dahl û gundan, mirina ruh û mêjiyê min xema kê ye? Xem, jan, keser û hizna ku min dikuje, min difetisîne, xema kê ye? Ev agirê ku ketiye dilê min ê bêhizûr û şikestî, ev pêtên ku di hemû bedena min a westiyayî,

mejiyê min ê tevlîhev, serê min ê gêj de diteqin, xema kê ye? Tirsê min a ku ez dîl xistime, xofa min a ku ez kirime riswa, niha, xema kê ye? Ez niha, mîna xewekê, mîna xewnekê, di nav vê şeva ronî ya sihêrîn de derim, bi derine nenas, heye ku ber bi mirinê. Veqetîn, çûyin xema kê ye? Kesek, ji bilî Dadê, kesek... ez divê binivîsim. Nivîs, rêz, rûpel, bi tenê ev, hevalên min in, bi tenê ev ji hal û hewalê min fam dikin.

Baz; mirin, Mader, mirin. Mirin û kuştin. Bikaranîna mirin û kuştinê ji bo armanc û hedefan, ji bo parastina welat, dewlet, millet, ala, şan, şeref û serbilindiyê, ji bo nîşandana hêz û quwet, desthilatî û hukumdariyê, ji bo avakirina yekdengiyê, ji bo perçiqandina deng, daxwaz û armancên din ên cihê. Xwîna ku ji mirî û kuştîyan diherike, qîrîna ku ji wan bilind dibe, li kolan û cadeyan, kuçeyên teng û bûlwarên fireh, li çiya û zinar, deşt û zozanan, di bin dîwar û qûntar, gelî û newalan, di nav dahl û daristan, şikeft û zivîngan de. Bi şev û roj, di berf û serma, germ û tavê de. Jiyana ku li ser mirin û kuştinê ava bûye. Jiyana min, jiyana hevalên min, jiyana "malbata min a mezin" ku ji herkesî cihê ye, parêzger û nobedarê her tiştî ye, hakimê her deverê ye, ne di nav herkesî de, lê li ser herkesî ye. Mirin û kuştin, -heye ku riya herî hêsan. Lê ji mirin û kuştinê rû badan? Riya herî dijwar, ez niha têdigihim, pê dizanim, gava herî zehmet. Ew, serek û amîrên min, ji min raporên şer, pevçûn, mirin û kuştinê dixwazin, ne yên parastina jiyîn û jiyane. Belê kuştin, belê bikuje, bikuje, bikuje, lê heta kengê, heta çi sînorê?

Kevok; lê ez dijm, ez rûniştîme, difikirim, vê heyva ronî, van stêrên ronî dibînim, germahiya wan, şewqa wan his dikim. Na, ne rast e ku ez ji her tiştî nefret dikim. Na. Ezê çawan ji van stêran, ji vê heyvê nefret bikim? Ji vê stêra ku niha, li ber çavê min, dixuriçe, nefret bikim? Na, ez nefret nakim, lê ezê binivîsim, nefretê jî binivîsim; nefreta ku di zikê tarîtiyê de tora xwe hûnandiye û mîna nêçîrvanekî hosteînsanan û ruhê însanan vedigire, însanan diqulipîne ser nêçîr û nêçîrvanan, însaniyetê dike lîstikeke nêçîr

û nêçîrvaniyê binivîsim; însanên ku di nav nefretê de dijîn, di-
 nya wan bi tenê ev e, ji nefret, kîn, mirin û kuştinê, zor û şidetê
 hez dikin, binivîsim; însanên ku jiyan qulipandine ser dinyayeke
 mekanîk a destûr, zagon û qayideyan binivîsim. Ezê, eger da-
 wiya vê rêwîtiyê mirin nebe, rojekê, vê deftera xwe deynim ber
 xwe, bi tiliyan rûpelekî nû vekim, pêûseke sor li ser rûpelê vala
 bigerînim û dest bi nivîsînê bikim. Bi gotinên sade û germ, kurt
 û zelal, bi gotinên ku bi jan û hiznê hatine hûnandin. Rêz ê werin
 pê, rûpelê ê tijî bibin, defterê ê bê dagirtin. Deftereke nû, yeka nû.
 Bi gotinên ku ji agir û şewatê xelas bûne, şahidên mirin û kuştinê
 ne. Belê, ezê binivîsim, geh bi zînanê Dadê, geh bi zîmanên din,
 wî welatî, dilê xerîb, şerpeze û nenas ê wî welatê, welatê Dadê
 yê bextreş binivîsim. Tolê, ezê tolê, tola ku Jîr behs dikir, tola ku
 bûye nîrê stûyê vî welatî, wî welatî, tola ku mîna jahrekê hemû
 reh û damarên welêt û însanên welêt vegirtiye, binivîsim. Ezê
 tirsê, tirsê xwe, tirsê vî welatî, wî welatî, însanên tirsok ku her
 roj bi awayekî dilivin, xwe dilivînin, binivîsim. Ji bo ku ez ji bîr
 nekim, hertim bi bîr binim, ezê binivîsim. Ji bo sebrê, sebra ku
 Dadê, gotina Dadê, strana Dadê hînî min kir, ji bo sebra dilê xwe,
 ezê binivîsim. Ezê nepeyivim, bêdeng bim, mîna vê şevê. Lê ezê
 binivîsim, gotinan bireşînim ser kaxizan, mîna ronahiya ku ji vê
 şevê direşe. Ezê ronahiyê, ronahiya vê heyv û van stêran, rona-
 hiya hezkirin û evînê, ronahiya ku di kûrahiyên ruhê însanan de
 ye, binivîsim. Ezê tarîtiyê, tarîtiya şev û peyayên şevê, tarîtiya
 kîn û nefretê, tarîtiya ku di kûrahiya ruhê însanan de veşarti-
 ye, binivîsim. Mîna Gilgamiş, mîna destana Gilgamiş. Mîna şerê
 ronahî û tarîtiyê ku di destana Gilgamiş de qal dibe.

Baz; rûpelekî nû. Jiyanê nû. Heyameke nû. Belê, ez, niha, li
 ser vê riyê me. Ezê êdî her tiştî ji bîr bikim, ne welat, dewlet, mi-
 let, xelk, ala, ordî, general, zabit, General Serdar, ne jî şan û şere-
 fa van hemûyan ê were bîra min. Ev hemû dê êdî ji bîr bibin. Ev
 trêna ku min dibe, ez dizanim, di eynî wextê de, min diqulipîne
 ser însanekî din jî. Însanekî nû di jîyan, dem û heyameke nû de.

Îro, heye ku îro, îşev, roja herî girîng a jiyana min e. Vegera vê riyê hew heye. Vegera vê riyê bi tenê mirin e. Em binihêrin ka çi dibe. Hîsên min ên niha? Ew çi ne? Rehetiya ku ez jiyanekê xwînî, xwîn xwar li pey xwe dihêlim? Perda nezanî û jîbîrkirina ku ez dixwazim, dil dikim? Pêla xewê ku bi ser min de tê? Kêfxweşî, mesûdî, mesûdbûyin? Xewn, xeyal? Dermanên nedîtî yên derdên sêwîtî û tenêti, birînên jan û keserê? Gelo evê jî bikevin jiyana min?.. Mîna vê keçika ku deftera xwe, bi tenê deftera xwe hembêz dike û jê hez dike. Ev keça ku hertim bi şermokî, bi tirs û xof, li min mêze dike, dê çilkeke kêfxweşî û mesûdiyê bi min bigihîne? Jin û keçên ku min bi best û daxwazeke bêpayan û mezin dîtine, nasîne, bêhejmar in. Min laş û bedenên wan, ten û hêtên wan, ruh û dilên wan nasîn. Lê tu yekê hîseke weha kûr ku ez nizanîm ka çi ye, di dil û ruhê min de, mîna vê keça hanê, nanî pê. Tu yekê bedena min evçend nehejand, evçend tesîr li dilê min ê teres nekir, xwîna min evçend nekeland. Lê sir, sira vê yekê çi ye? Ez divê jê bipirsim, kite bi kite pê re bipeyivim, jê fam bikim... Lê gotina Maderê, "evîn, hîsa germ a evînê, stariyek e, revêk e, xeyaleke xweş a dilbirîn, sûzen, rêwindayî û rêwingan e." Mader, gidî gotina te ne rast be? Gidî ev keça hanê ku napeyive, lê dinivîse, kêr dixwe û vedixwe, bi nazenîn xwe dilivîne, porê xwe yê dirêj şeh dike, bi rûyê xwe yê aram û sakîn tesîreke mezin li însanan dike, bi awireke tirstijî, lê maxrûr dinihêre, carina dibe zarokek, carina dibe zanayek, carina jî dibe ewanek, ne xewnek, ne xeyalek be?

Kevok; Dadê, xewa min tê, ez westiyame. Dadê, min bêriya te kiriye. Dadê, ezê te, dîsan, bibînim?

Baz; belê, weha bêxeber, ji nişka ve. Windabûn. Mader, ez li rê me, ez rêwing im, rêwingê jîyanê. Jixwe umrê min weha dest pê nekir, jixwe jiyana min ne rêwingî ye? Ez li ser riya reveke bêveger im, li ser riya xeter, riya rîsk û talûkan. Lê ezê li te bigerim, te bibînim. Kî dizane, tu niha çi difikirî? Kurên min çi difikirin? Zabitê Simbêlqît ku min soz dabûyê da ku min ew bidîta,

niha, çi difikire? Ordî, zabit, general, heval û hogirên min ên şer û pevçûnan niha çi difikirin? Ez dizanim, hin ê bibêjin, "Baz xayin e, reviya û çû, li ordî, dewlet, wezîfe û berpirsiyariyên xwe îxanet kir û reviya." Hin ê bibêjin, "Baz mirî ye, hatiye kuştin, şehîd e." Hin ê bibêjin, "heyf." Hin ê bibêjin, "çê bûye." Rast e, min nan û ava dewletê û ordiyê xwar û vexwar, rast e, dewlet û ordiyê ez xwedî kirim, mezin kirim, rast e, dewlet û ordî bûn mala min, malbata min. Lê heta vê derê, êdî hew. Kî çi dibêje, çi difikire, êdî, ne xema min e. Lê kurên min, bi tenê lawên min ên bêguneh, ê çi bifikirin? Xayin? Bavekî xayin? Bavekî revok, bizdok û tirsok?

16. Ronahî

Baz û Kevok, li deverên ronahiyê, di nav ronahiyê de.

Lê pêşî agahiyeke pêwist. Agahiyek ku hema çi bigire rê li nivîsîna vê romanê vekir. (Heye ku bi xêra vê agahiyê yan jî bi hênceta wê, ez, vebêjê vê romanê, li ser nivîsîna vê romanê fikirîm.) Agahiyeke weha; di ser çuyîna min a Welatê Mezin û paytextê wê re –ku min di beşeke çuyî de qal kir– gelek wext derbas bûbû. Ew welat, bûyerên wî welatî, nivîskarê girtî, însanên tirsîyayî yên wî welatî û ew keça bedew û bîrbir ku min li paytextê welêt dîtibû, carina dihatin bîra min û min ew meraq dikirin, lê tevî vê, ez li ser riyeke din bûm, bi qewlê gotineke kevnare, serê min li ser balîfeke din bû. Min romanek ku dê çêla sedsaleke xwînxwar, zilamekî sûzen û şikestî, evîneke qurmiçî, dewr û dewranên nezêlal, bajar û welatên têkel bikira, dinivîsî. Zehmetiyên nivîsînê bêhn li min çikandibû. Rojeke germ a ji wan rojên min ên herî bêhteng û bêkêr ku ez bi tenê diponijim, danê sibê, telefona oda min a xebatê lêket. Xanima sekreter a Navenda Yekîtiya Nivîskaran bû. Li ser nav û navnîşana Yekîtiya Nivîskaran ji min re nameyek hatibû. Gelo wan name bişanda ser navnîşana min an ez ê daketima bajêr û biçûma Navendê û name ji wir werbigirta? Jixwe roj stewr bû, tiştekî hêja ku min li oda xebatê bikaribûya binivîsa yan bikira, nûn bû. Ez daketim bajêr, çûm Yekîtiya Nivîskaran û min name wergirt. Li ser zerfa biçûk a spî, bi fonetîka fransîzî, tîpa yekemîn a pêşnavê min, mezin,

û hemû paşnavê min hatibû nivîsîn. Li pêş jî, bi fransizî, Mr. Di bin navê min de navê, bi tenê navê Yekîtiya Nivîskaran hatibû nivîsîn. Hemû bi destnivîseke xwar, lê xweşik, bi pênuşeke reş.

Min spas kir, ez ji Navendê derketim û çûm kafeterya kêleka Navendê. Tevî fîncaneke zahf mezin, tê de qehweyeke zahf tahl, ez li kêleka maseyeke biçûk rûniştim û min devê zerfê vekir. Tê de kartpostaleke tûrîstîk hebû. Lê milê paş ê kartpostalê, bi fransizî, bi pênuşeke sor, hin tişt hatibûn nivîsîn. Tîp û rêzên gelekî hûr di nav hev de bûn, ji bilî hin parantezan, ne paragraf, ne nuxtik, ne jî vîrgul hebûn. Welê dixuya ku kartpostal bi lez hatibû nivîsîn. Pêşî min tu tişt ji nivîsîn û kartpostalê fam nekir. Di destpêkê de ne navê min, ne jî navekî din hebû. Di binî de jî hîç navek nîn bû. Gelo kartpostal, bira, ji bo min hatibû şandin? Kê ew şandibû? Û ji kû? Bersiva pirsê dawîn li ser zerfê bû. Min li mohra li ser zerfê nihêrî. Kartpostal, berî wê roja min a stewr bi qasî deh rojan, ji Welatê Mezin hatibû şandin. Lê kê ew, çima, şandibû?

Min sê serî şekir xiste nav qehwa xwe, qehwe tevda, hinekî jê vexwar. Tahir û bêhna qehwê ez hinekî hişyar kirim.. Piştî çend qultên din, ez, dîsan, li kartpostalê vegeciyam. Min rêzên xwaromarên kartpostalê, kite bi kite, gelekî giran, xwendin. Hingî min bîr pê bir, rêz, bi ihtîmaleke mezin, rêzên destana Gilgamiş bûn. Li paş kartpostala ku hê jî li ba min e, kite bi kite, weha hatibû nivîsîn;

"Lorsque Gilga(mes) Eut oui cette (adresse) Obtemperant Aux paroles (de l'Homme-Scorpion) Il prit Le Chemin du Soleil Quand il eut parcouru Dix kilometres Profonde était l'obscurité Sans la moindre lumière Il n'y pouvait rien (voir) Devant lui ni derriere Quand... Quand il eut parcouru cent dix kilometres Apparut un rayon de soleil Quand il eut parcouru cent vingt kilometres Ce fut le plein jour... (Je suis sur le chemin du Soleil J'ai besoin de votre aid Est-que vous vouliez nous aider Je vais vous ecrire encore...)"

Belê, kartpostaleke weha tevlihev, zehmet. Lê ez têgihîştibûm, rêz, yên Gilgamiş bûn. L'homme scorpion yanî dûpişk-

mirov di wê destanê de bû. Kî dê ji wî welatê tirs û xoftijî kart-postaleke weha, ji bo min, ku tê de çêla destana Gilgamiş dibû, binivîsa? Nivîskarê ku girtibû? Yek ji wan heval û nasên ku me li paytextê dîtibûn? Yek ji nas û dostên min ên wî welatî? Na, hîç yekek ji wan. Ew bû, bêguman ew keça ku şeva dawîn, li paytext, pêrgî min hat, ev kartpostal nivîsibû. Bi tenê wê çêla Gilgamiş û ronahî û tarîtiya ku di destana Gilgamiş de qal dibe, kiribû. Belê, ew bû, keça pordirêj, çavxweşik, balnarîn, bejnnazenîn û hizinbaz. Lê çima wê, niha, kartpostaleke weha ecêb, bênav, bêtîşan, şandibû?

Piştî ku min qehwa xwe vexwar, ez ji qehwexanê rabûm û min berê xwe da kitabxana mezin a qraliyetê da ku bikevim pey rêzan. Li kitabxana bêpayan mezin û dewlemend, min çar celebên fransîzî yê Destana Gilgamiş peyda kirin. Min ew ji xanima resepsiyonê ku alîkariya dîtina kitêban kir, wergirtin û daketim salona bêdeng a xwendinê. Keça çavşêrîn a wî welatî di kartpostala xwe de behsa l'homme scorpion kiribû. Min diviya li wê beşa destanê binihêriya. Yek bi yek, kite li ser kite, min li hemû celebên nihêrt. Dawiyê min rêzên keçikê dîtî. Rêz, eynî mîna ku keçikê nivîsibû, di celeba Nînovayê ya destanê de bûn. Celeba Nînovayê ku bi sernavê "L'épopée de Gilgames" çap bûbû, ji zimanê akadî hatibû wergerandin. Rêzên ku keçikê, hinekî perege, nivîsibûn di tableta nehan a destanê de bûn, -ku qala ronahî û tarîtiyê dikir. Welê dixuya ku keçikê ev rêz, ji ber dizanibûn, an jî çaxa wê ev rêz nivîsibûn, kitêb li ba wê bû.

Ez têgihîştibûm; keçikê dixwest, bi van rêzan, wê sohbeta me ya balkêş a paytext bi bîra min bîne û bi vê riyê, xwe bi bîra min xîne. Lê çima? Bersiv, di paranteza dawîn a rêzan de bû. Ji ber ku paranteza dawîn, ne rêzeke destanê bû. Di destanê de rêzeke weha nîn bû. Keçikê ew lê zêde kiribû. Jixwe gotin û lihevanîna paranteza dawîn ne mîna rêzên destanê bûn. Belê, gotinên dawîn ên kartpostalê, yê keçikê bûn; (*Je suis sur le chemin du Soleil J'ai besoin de votre aid Est-que vous vouliez nous aider Je vais vous*

ecrire encore...) Yanî, ez li ser riya ronahiyê me. Min hewcedarî bi alîkariya we heye. Gelo we dil heye ku hûn alîkariya me bikin. Ez ê careke din ji we re binivîsim...

Wê, welê dixuya, hewcedarî bi alîkariya min hebû. Loma wê ev kartpostal, bi vê şeweyê, nivîsîbû. Rewşa wê ne baş bû û ew ne bi tenê bû, ji ber ku wê digot nous ango em. Hingî, piştî ku min sirê kartpostalê fam kir, di wê salona fireh de, li ber mase û kitabên Gilgamiş, kesereke zirav bi ser min de hat. Ez êşiyam, bi hal û hewalê wê êşiyam. Lê di kartpostalê de ne nav, ne nav-nîşan, ne jî hejmara telefonê hebû da ku min bikaribûya pê re pêwendiyekê bianiya pê. Tişteki ku min bikaribûya bikira, nîn bû. Ez diviya, bêgav, li hêviya xebera wê bimama.

Di nav wê kesera zirav û nediya de, li salonê, min li bergê kartpostala rengîn nihêrî. Deryayeke çîkî hêşîn, hema çi bigire, hemû kartpostal vegirtibû. Li milekî deryayê, çîvanaveke stûr, zîkek di deryayê de vekiribû û stariyeke keştî û botan anîbû pê. Peravên deryayê yên zer, heta bi heta, dirêj dibûn û diçûn. Giraveke hêşîn a biçûk, hinekî ji peravê dûr, dixuya. Çend keştiyên babirk û botên spehî di navbera girav û peravê de, li tengavê, digeriyan. Kartpostal ronî bû, di esmanan de ne reşahiyek, ne jî ewrek dixuya.

Belê, agahiya pêdiviya, weha bû.

Niha em ji agahî, kartpostal, rêzên lê, bergehên xweşik ên kartpostalê li milekî bihêlin û vegerin ser serpêhatiya Baz û Kevokê. Em vegerin deverên kartpostalê, ba Baz û Kevokê.

Baz û Kevok, li Welatê Mezin, li milê deryayan e, li qiraxên deryayeke kevnare ya çîkî hêşîn, li havîngeheke mezin a hinekî ji peravê dûr. Em ê bibêjin, wext, bi qasî sê heftan piştî rêwîtiya wan a trêne ye. Wext êvar e. Baz û Kevok li şaneşîna fireh û dirêj a havîngehê rûniştine. Havîngeh ku bi boyaxeke spî, seranser, hatiye sîwaxkirin, bi du qatan lêbûye. Şaneşîn li jor, di qata duwemîn a xênî de, mûna nikilê bazekî, xwe dirêjî jêr, deryayê dike. Havîngeh li ser girekî ji girên qiraxên deryayê ye. Li dorê

tu avahî nîn e. Li milê rastê, hinekî ji havîngehê dûr, dahlek û li kêleka dahlê jî sîteyeke havîngehan heye. Li jêr, li milê çepê havîngehê, civateke biçûk, nîvgund, nîvbajar, ku ehlê wê bi masî û masîvaniyê debara xwe dike, niha, di nav ronahiya lampayên şevê de, şewq dide. Li pêşiya havîngehê, li ser derya ku niha bi aramî xwe dilivîne û şewq dide, keştî, celeb bi celeb, diçirisin. Çivanek û tengav, hema çî bigire, tijî keştî ne.

Belê, em li Welatê Mezin, li deverê ne, ku ji deverên Welatê Çiyan û Welatê Çolê gelekî cihê ye. Welatê Mezin; li milekî Welatê Çiyan, li milekî Welatê Çolê, li du milên din derya û li milekî jî deşt û beriyê bêdawîn. Welatê Mezin; welatekî fireh, piralî, pirrengîn. Em niha li ber deryayê ne, li havîngeha ku Baz û Kevok tê de ne.

Êvara germ nû dest pê kiriye, êvar niha siya xwe radixe ser hawîrdorê. Roja germ û ronî çûye ava, stêrên bêhejmar ên vî welatî hê hilnehatine, heyva ku dinya dixê nav cumbaşa ronahiyê hê nexuyaye. Lê êvar hatiye, rojêke germ a din ji rojên germ ên Baz û Kevokê ku hema çî bigire, mîna hev monoton in, diqulipe ser şevê û rojêke nû. Piştî rojêke tijî keft û leftê, dinya westiyaye, civata jêr a kevnare westiyaye, keştî û mazûvanên keştiyan westiyane. Baz û Kevok, jixwe, westiyayî ne. Dinya westiyayî û bêhnêçikîyayî niha bêdeng e. Ne dengê motorên bot û keştiyên mezin, ne dengê otomobîl û erebeyên ku bêrawest di riya mezin a kêleka gund de derin û tîn, ne jî dengê şênî û qerebalixên boş ku ji bo havînê hatine van deveran, niha heye. Bi tenê ji dûr, ji aliyê gund hin dengên zarokan tê, ji aliyê sîteyê dengê melodiya piyanoyekê ku geh bilind dibe, geh nizm û zîrav dibe, ji aliyê deryayê dengê sivik ê motorên keştîne masîvanan û dengê xirçe xirça xwelivandina filûqe, kelek û kodan tê. Ji hawîrdor jî dengê mêş, moz, beq û lawirên şevê tê. Dengê mêş û mozan, teyr û tilûran mîna straneke şevê, perde bi perde, xwe bi hawîrdor digihîne. Deng, dengên têkel ên aramiyê ne. Dengên har ên jiyana rojane hatine birîn.

Baz û Kevok, li hember hev, li kêleka maseyeke dirêj, rûniştine û bêdeng li deryayê, li ronahî û şewqên ku li ser avê, li der û dorên gund dibiriqin, dinihêrin. Herdu jî bêdeng in. Şîva ku Kevokê çêkiriye, li şaneşînê, hatiye xwarin, firax û teyfiq rabûne. Li ser masê çend texlîd fêkî, di nav sêniyeke fireh de, du qedeh, du şûşe, yek a votkayê, ya din a cînê, du surehî, yek a avê, ya din a ava portakalê, du pakêt cixare, xwelîdankeke nîvtîjî û hin kitab hene. Şûşe li ser masê ne, lê Baz nikare vexwe. Baz nexweş e, serê wî diêşe. Nexweşiya wî ya mîgrenê ku mîna siya wî li pey wî ye, zora wî biriye. Xirqeyekî tenûk li ser milên wî, destekî wî li ser caxên şaneşînê, ew, bi dîtineke nezêl li ku ji nexweşiyê hatiye pê, li keştiyên masîvanan ku ji dûrahî û kûrahiyên deryayê tên û dikevin tengavê, dinihêre. Bêdeng.

Belê, wext, wextê bêdengiyê ye. Wî her tiştê pêwîst ji Kevokê re gotiye; ew jî, niha, mîna Kevokê, revokekî şer û pevçûnan e. Wî mal û zarok, malbat û ordî, şer û pevçûn, zabitî û kumandarî li pey xwe hiştiye û ketiye ser riya bêveger; ew ê, bi hev re, terkî welêt bikin, zûtirîn wext, di fersenda yekemûn de, ji ber ku ew êdî dijmin e, xayin e, dijmin û xayinê her kesî, herkes dijminê wî, mîna Kevokê. Ne ew, ne jî Kevok hew dikarin li vî welatî bihewin, ew direvin. Herkes li pey wan e, ordî, rêxistinên bêhejmar ên ordî û dewletê, sîxur, polîs, berdevkên sîvîl, bajar bi bajar, war bi war, mal bi mal, li wî, li wan digerin. Hemû rê hatine birîn, hemû pir hatine şewitandin, bi tenê riyek maye, çûyin, terkkirin. Lê heta ku ew rê, îmkân û fersend bibînin, ew ê li vir, li vê havîngeha hevalekî Baz ê zabit ku Baz di wextê xwe de gelekî çêyî lê kiriye, dizî, veşartî, bimîrîn, —da ku pasaportên wan ên sexte çêbin, bilêtên wan bên kirîn û ew terkî welêt bikin, ber bi welatên xerîb û nenas. Kevok êdî bi her tiştî dizane, êdî ew û Kevok mîna hev in, êdî ne nêçîr, ne jî nêçîrvanî maye.

Baz behsa her tiştî, her kesî, ji Kevokê re, kiriye; Zabitê Simbêlqît ku jê re bavîtî kiriye, Madera hêtfireh ku jê re bûye hem dê hem jî yar, jîna wî ya çavbirçî û pozbilind ku dinya lê heri-

mandiye, zarokên wî yên stûxwar ku hezkirineke germ ji bavê xwe nedîtine, jin, keç û qahbikên şox ku Baz, li vir-li wir, dem bi dem, car bi car, hemû bedenên wan ên şil û tazî mist daye, zabit, têkoşer û egîdên bêtirs ku hertim bi Baz re bûne û bi gotina Baz çûne mirinê, şervanên kevn ku dev ji serhildanê berdane, li xwe mukir hatine, ketine bin hîmaya Bazê ku li wan xwedî derketiye, ji ewan re bavîti kiriye, çend hevalên wî yên zabit ku niha bi quweta diravan alîkariya wî dikin, pere û îmkanên wî yên gelekî kêr ku wî ji xwarin û vexwarina xwe biriye û civandiye û hemû umrê wî yê tenê ku bi qayideyên leşkerî, bi jiyaneke tijî dîsîplîn a leşkerî hatiye risandin. Belê, Baz, kite bi kite, çêla her tiştî kiriye, -ji bilî du tiştan; tevger û pêwendiyên wî yên neyînî yên mirin û kuştinê û zarokatî û xortiya wî ya -em ê bibêjin- balkêş.

Ew niha li vir in, bi roj û şev, hertim. Li hundir, di odeyên cihê, carina li qata jêr, salona havîngehê, pirî caran li jor, li midbex, odeyên razanê û li şaneşîna fireh û dirêj, li ber derya û esmanên bêdawîn, di germ û hawa giran a havînê de. Bi tenê carina, çaxê zahf pêwist be, Kevok derdikeve der, dadikeve gund, pêdiviyên jiyana wan a rojane dikire û hildikişe jor, warê revokan.

Lê tiştê herî xirab ku niha qewimiye; Baz nexweş e. Bazê ku niha, ji ber nexweşiyê, ji ronahî, şewq, lampe û çirayan direve, baş nabîne û carina vedireşe, nikare vexwe. Lê vexwarin û cixare kêşandin; ji bo Baz rîyeke din a revê, ji bîr û hiş, û bîranîn, fikir û gumanan. Ji bihîstina dengên dewr û dewranên bihurî yên umrekî kambax, ji sûzenî û gumanên jiyaneke ku ji nişka ve ketiye ser rîyeke nû, bi dûrketin. Ji endîşe, telaş, tirs û xofê, ji êş û jan, keser û hizna serpêhatiyên xwînaxar revîn. Belê, vexwarina votka, cîn û tonîkê, qedeh bi qedeh, şûşe bi şûşe, saet bi saet, roj bi roj, da ku xwîn, şer, pevçûn, çek û rastiyên din ên ku jiyaneke tevlihev rapêçane, li pey mij û dûmana vexwarinê bimînin.

Lê vexwarin niha, dema herî pêwist, nabe. Niha wextê bêdengiya fikr û pêjnan e. Çima weha bû? Baz, bêdeng, difikire. Ji kû heta kû! Di nav salek, du salan de. Ji nişka ve li ser rîyeke din

ku ji hemû umrê çil û çend salan cihê. Niha tevger nîn e, fikirîn, ponijandin heye, tirs û endîşe heye, xweveşartin, xwepayin heye. Rev heye. Hemû tiştên ku Baz hîç nedinasîn, tiştên ku ji bo hinên din hebûn, niha, ketine jiyana wî, bûne şîrîkên jiyana wî. Jiyana wî ku hertim li ser riya mirin, veqetûn, şer û hilweşînê bû, niha, ketiye ser riya tirsê. Baz ditirse! Bazê ku şev qulibandibû ser şeweyê jiyînê, şer dikir, serekiya şer, pevçûn, şewat, hilweşîn, mirin û kuştinê dikir, niha ditirse. Bazê ku tirseke bêpayan vediguhezand hemû hawîrdor, bi tenê navê wî, bi tenê gotina Baz, tirsek dixist ruh û dilê însanan, niha, li ser riya revê, nexweş, ketî, tenê, ditirse!

Baz rûyê xwe dizîvirîne ser masê, cixareyekê ji paketê derdixe, vêdixwe û jê gulpekê dikişîne.

"Cixare jî ne baş e", Kevok hingî dibêje, "cixare dê te biêşîne..."

Mîna ku hingî Baz bîr bi hebûna Kevokê biribe, li xwe werdiqile, bi baldarî, lê dinîhêre, "eger ez cixare jî nekişînim, ez ê biteqim" dibêje, "tu nizanî ka ez çi hîs dikim, çi di mêjî, ruh û dilê min de pêl didin. Ez mecbûr im, ez ê, mecbûr, cixarê bikişînim."

Kevok dengê xwe nake, çavê xwe jê dide alî û qedeha ber xwe dibe devê xwe û li dûr, li deryayê dinîhêre. Baz jî li wê, li profîla wê ku niha ji kêlekê dixuye û dîsan qulipiye ser profîla zarokekî. Çaxa Kevok rûyê xwe dizîvirîne, porê wê hêldibe. Mîna hespekî rewan, mîna pêleke deryaya hember. Heyret, Baz difikire, ev keçika ku hertim ditirsiya, hertim li ser rûyê wê şopa tirsê dixuya, niha, aram e, yan jî aram, sakîn dixuyê. Porê wê ku niha baş dirêj bûye, niha, dibiriqe, rûyê wê ku bi sûzenî vekişiyayî bû, niha, sakîn e, lêvên wê ku bi tirs diliviyên, niha, dikenin. Ken, heyret, ken jî, wê rojekê, xwe li ser vî rûyê ciwan, lê keserkûr, nîşan bida! Ev keça ku hema çi bigire hîç napeyive, niha, roj bi roj, vedibe, dibîşkive; tevî ku ew dernakeve der û kesekî nabîne, porê xwe şeh dike, xwe dişo, çavên xwe kil dike, fîstanên spehî li xwe dike, bêhneke xweş jê difûre û bêhtir serbest, aza, şox, xwe dilivîne, bi coş, mîna ku bi şehwetê ketibe, radihêje pênûsê û dinivîse. Bejn û bala wê niha bêhtir li-

hevhatî dixuye, rû û awirê wê narîntir, pêşîr û hêtên wê bedewtir dixuyin. Gerdeniya wê ya zîvîn ku ji stû ber bi nav memikan dirêj dibe, wê diqulibîne ser jîneke xewnên abadîn.

Û heyret, ew niha bêhtir bala xwe dide Baz, li wî û nexweşiya wî difikire.

"Tu nizanî ka min di zarokatî û xortaniya xwe de çi kişandiyê", Baz, ji nişka ve, bêyî ku li Kevokê vegere, dibêje.

"Tu hinekî av dixwazî?" Kevok jê dipirse û bêyî ku li bersiva wî bisekine, qedeha wî tijî av dike û didiyê. Kevok dil heye ku Baz bipeyive.

"Ne dayikeke min, ne bavekî min hebû..." Baz qedehê werdigire, jê çend qult av vedixwe, wê datîne ser masê ji cixara xwe nefeseke kûr dikişîne û hêdîka, mîna ku ew bifikire, dibêje, "ne bira û xweheke min, ne ap û xalekî min, ne met û xaltiyê min hebû. Ne jî malek û warekî min. Tune bû, hîç tiştê, hîç kesek nîn bû..."

"Çima?" Kevok, bi baldarî, lê dinihêre û dipirse, "çima çi bû? Çi bi serê wan de hatibû?"

"Ez nizanî, ji min mepirse, hişê min ê teres, hafiza min a nankor min nagihînin bersiva vê pirsê ku min jî hertim ji xwe pirsîye. Bav û diya min, reh û rêçên min hertim li pey perda tarî ya nenasî û nezaniyê dimînin. Lê ez bi tenê bûm, ne kesekî min, ne reh û rêçên min, ne tarîx û huwiyeteke min hebû. Gava ez zarok bûm, min bîr bi tarîx, huwiyet û tiştên weha nedibîr, lê min dayikek, bavek û germahiya wan dixwest, bi hemû dilê xwe, dil dikir. Dayikeke pordirêj û dilgerm, bavekî simbeldirêj û rûgeş hertim dihatin xewnên şevên min ên sêwî. Dayikek ku min bikaribûya serê xwe bixista nav pêşîrên wê, bêhna pêşîr û bedena wê ez sermest bikirama û di nav wê germahiya hembêzê de di xew re biçûma. Bavekî ku bi destê min bigirta, rê, cih, war, kes û kom nîşanî min bida, bi nêrîna xwe tesîr li min bikira, rêz û rêzdariyê mezin bianiya pê. Lê ew nîn bûn. Diya min, bavê min, her tiştê min Mala Zarokên Sêwî bû. Pêşî ew der, paşê jî

ordî. Ordî û perwerdeyiya ordiyê bû bav û diya min, her tiştê min. Di salên min ên dibistan, xwendegeh û Akademiya Leşkerî de herkes, dawiya heftan, diçû malên xwe, nik bav û dê, hezkar û evîndarên xwe, lê ne ez. Xwendegeh, Akademî vala dibûn, lê ez dimam. Herkesî ji dilhez û dilsozên xwe re name dinivîsîn, lê ne min. Heval û dost, nas û xismên her kesî dihate serdana hevalên min ên xwendegeh û Akademiyê, lê ne serdana min."

Baz, bi keser, cixare dikişîne, kursiyê ku lê rûniştiye, hinekî, rast dike, bala xwe dibe ser keştî û lampayên keştiyên deryayê ku bi şewq dilivin, bi qasî çendekê bêdeng dimûne û paşê, dîsan, ji nişka ve, giran giran, gotina xwe didomûne, "ez bi tenê bûm, pêr jî, do jî, îro jî. Ruhê min, mêjiyê min, dilê min bi tenê bû. Di ode û park û bexçeyên hêşîn ên zarokatî, şevên zîz ên xortanî, rojên hînbûn û perwerdeyî yên dibistanê, şevên tijî axîn û nalîna bedena nûhişyarbûyî yên xwendegehê, di dersên şer, pevçûn, êrîşî dijmin û parastina welêt ên Akademiya Leşkerî, heta di hembêza jin û keçikên cîlwebaz ên salên min ên zabîtî de, ez tenê bûm. Di destpêka zabitiya xwe û zewaca xwe de jî ez bi tenê bûm. Jina min, tu rojan, heta di wan demên ku ew, bi agirê şehwetê, ji xwe ve diçû jî, ji min re nebû jin, nebû heval û dost. Tu kesekî min nîn e, ji bilî herdu kurên min ên dilpak kesekî min, li vê darê dinyayê, nîn e."

Baz radiweste, cixare dikişîne û difikire; evçend zîzî, kela giriyê, zehmetiya peydakirina gotinên keserê, dijewariya axaftin û peyvînê, gotin û vegotinê. Heyret, ev ê jî bihata serê Baz ku her tim dizanîbû ka wî dê çi, çawan, bi çi gotinan, bigota. Gelo ji nexweşiyê ye ku ew weha sist bûye, bi zehmetî dipeyive, xwe îfade dike? Baz radihêje qedehê, ava tê de vedixwe, cixareyeke nû vêdixwe, kursiyê xwe hinekî ber caxan dike, herdu destên xwe di ser caxan re dirêj dike, "di Akademiyê de", dibêje, "berî ku ez bibim zabit, hingî, çaxa baranê dinya dişuşt, an jî berfê dinya bi tûlekî spî vedigirt, hingî min ji pey pencereyên dersxanê yan jî yên salona razanê li der, li baran an jî berfê dinihêrî û 'li pey vê

bihar e' digot, bihar li rê ye, digot, ro, tav, tûrêj, kulîlk, gul, bêhn, xweşî, geşî, coşî, vejîn li rê ye. Ew bihara ku ez li hêviyê bûm, xewn û xeyala biharê ku bi germahiya hêviyekê hundirê min tişî fikir, daxwaz û miraza jiyana min bû. Piştî Akademiyê, xwendin û dersan, ez ê bibûma zabit û bihar ê bihata. Lê bihar nehat. Ez bûm zabit, bihar nehat. Min dest bi kar û şixulên girîng kirin, bihar nehat. Ez li wî welatê te yê mirinê bûm kumandar, serek, bihar nehat. Min her tişt kir, ji bo xizmeta dewlet û ordiyê, her tiştê ku însanekî dikare bi cih bîne, kir, lê bihar nehat. Ne baran sekinî, ne jî berf xelas bû. Berf û baranê, di derî û pencereyên mal û warên min, di gêdûg û bihûrên wî welatî, di qelişek û qulên dîwarên kozik û stariyên min re, xwe, her carê, bi min gihandin. Hertim. Di ser de ev çend salên dawîn ku bi lezeke nedîtî ya birûskê bi ser min de hatin, dewsa biharê, baran xurttir, berf girantir kir. Dor li min tengtir bû, heval, dost, pêwendî, jiyanekê normal roj bi roj, kêmtir bû, ez ketim nava geremoleke wisan ku ne min dikaribû qalê bikira, ne haya kesî jê hebû, ne jî xema kesekî bû. Rojên min bûn bêmane, rojan navên xwe winda kirin, rojên min qulibîn ser şeveke bêdawîn. Ez westiyam, gelekî westiyam, bi temamî, tenê mam, mîna navê xwe, bûm teyreki baz ê tenê.. "

Baz radiweste, çend nefesên din ji cixarê dikişîne, qûnçikê di xwelîndankê de vedimirîne, radibe pê, bêtî ku li Kevokê binihêre, tê li ber caxan radiweste, "ez niha têdigihêm, bi gelek tiştan dihesim" dibêje, "lê êdî dereng e, êdî tişteki çê ku ez bikaribim li vî welatî, niha, bikim, nûn e."

Paşê ew, bi qasî çendekê, bêdeng, li derya, gund, keştî û hawîrdor dinihêre. Şewq çavê wî digire, ew destê xwe yê rastê dibe aliyê çepê eniya xwe, wî alî hinekî diguvişîne û vedigere, "serê min gelekî diêşe, ez ê xwe dirêj bikim" dibêje û bi gavên giran ji şaneşînê derdikeve. Lê berî ku ew derbasî hundir, aliyê oda xwe ya razanê bibe, ew serê xwe dizîvirîne, li Kevokê, zahf bi nermahî dinihêre, "sibê, ez ê, mecbûr, dakevim gund" dibêje,

"min hewcedarî bi dermanên girantir heye û heye ku pasaportên me jî hazir bibin. Eger tu ji gund tiştêkî dixwazî, ji niha ve, lê bifikire."

Baz dere, Kevok dimîne. Êvara havînê hêdî hedî dere. Niha stêr, yek bi yek, carina bi hev re, carina li pey hev, bi şewqeke sivik dertên. Nû, teze, ciwan, zînde. Mîna her carê. Her şev eynî tişt; zayîn, jiyîn û mirin. Şeveke din dîsan. Dîsan, dîsan. Eynî mîna jiyana însanan. Stêr; şahidên jiyana însan, ya hemû însanan, hemû însaniyetê. Evçend dûr, evçend nêzîk. Evçend narîn, evçend sirtijî. Stêr, şewq û ronahiya ku ew direşînin ser dinya û însanan, hizûr û aramiya ku ew diyarî dinya û însanan dikin. Şewqa stêran; hêvî.

Hêvî?

Kevok, çavê wê li esmanan, li hêviyê difikire. Wê, îro, danê sibê li ser hêviyê, rêzine perege de di deftera xwe de nivîsibû. Ne bi mebesta stêr û şewqa wan, bi mebesta tiştêkî din. Kevok radibe pê, dere hundir, oda xwe, defter û pênûsa ku li ser masa biçûk a kêleka textê razanê ye, hildide, vedigere û tê şaneşînê. Lê tevî ku dinya ronî ye, stêr, bi çirisîn, hiltên, şaneşîn hinekî tarî ye. Kevok qumçika lampa şaneşînê ya li dîwêr ku li kêleka derî ye, pê lê dike. Şaneşîn ronî dibe. Kevok rûpelên defterê vedike. Deftera ku bûye sebra ber dilê wê, tijî dibe. Ji Kevokê re defterêke nû, hevaleke nû divê. Eger Baz, sibê dakeve bajêr, ew dikare jê re defterêke mezin a xêzkirî û du pênûsên sor jî bikire. Kevok rûpelek ji rûpelên dawîn ku wê tê de danê sibê rêzin nivîsîne, vedike û li rêzên ku wê nivîsîne, dinihêre; *Edebiyat; êş jan, keser, hêrs û hêvî. Edebiyat; wext, heyam, dewr û dewranên însanî. Edebiyat; li hember jibîrkirinê bi bîranîn. Edebiyat; tarîti û ronahî. Edebiyat; Gilgamiş. Edebiyat; giyyayê nemir, yanî hêvî.*

Hêvî? Gelo hêvî maye? Şev, xew, xewn. Dengên ku niha di şevê de tê bihîstin, dengên ku şevê vedigirin. Dengên ku xewnên însanan bi jan û keserê, kêfxweşî û mesûdiyê, endîşe û sûzeniyê dineqîşînin. Û dengê ku hêvî direşîne ser xew û xewnan û xeyal,

daxwaz û arzûyan tîne pê. Lê ka, çima dengekî weha niha bi guhê Kevokê nakeve, nayê xew û xewnên Kevokê? Çima ew di vê havîna germ de, li ber deryayê, nikare ji malê derkeve, nikare bikeve avê, nikare here gund, lê bi tenê weha li hundir rûdine, radize, dixwe, vedixwe, carina dinivîse, dixwîne û xewnên xirab dibîne? Çima xewn azadiyekê, hêviyekê bi wê nagihînin? Çima xewn jiyana wê ya jixwe veşartî, dizî û hepiskirî hûn jî dixin nav zîndaneke binê erdê?

Ka hêvî? Û ya herî girîng, ma Kevok hê jî heq, taqet û hewes heye ku li pey hêviyekê be?

Na, Kevok, bideng, dibêje, na. War û welatê min, hêviya min edî gotin e, gotina Dadê, gotina edebiyatê, gotina ku ji hêlîna hêviyê bi firê dikeve. Kevok rûpelên dawîn ên defterê dizîvirî-ne. Rêzên ku wê ev çend rojên dawîn nivîsîne, hema çi bigire hemû li ser edebiyatê, gotina edebî ne. Li derekê wê weha nivîsiye, "edebiyat; hêlîna hêviyê..." Belê, Kevokê xwe spartîye gotin û gotina edebî. Ew rûpelê herî dawîn ku vala ye, vedike, bi pênuşê, bi tîpên biçûk, "mirin, azadî û edebiyat" dinivîse. Bi qasî çendekê ew radiweste, difikire û paşê didomîne, "mirin; kesera herî kevn û herî nû ya însan û însaniyetê. Azadî; miraza herî kevn û herî nû ya însan û însaniyetê. Edebiyat; stariya herî kevn û herî nû ya însan û însaniyetê..."

Kevok dil dike ku bidomîne, lê pênuş hew dinivîse. Kevok dike, nake pênuş nanivîse. Ew radibe pê, çend lib tîrî ji gûşîya li ser sêniya fêkiyan jêdike, wan davêje devê xwe û dere hundir. Kevok pêşî dere midbexê, lampa midbexê pêdixe, li ser mase û der û dorên midbexê dinihêre, lê destvala ji midbexê derdikeve û ber bi oda xwe dere. Hingî, gava ew di ber oda Baz re derbas dibe, çavekî, ji deriyê vekirî, li odê digerîne. Baz, tevî kincan, li ser textê razanê dirêj bûye, çavgirtî, radize. Ronahiya midbexê mûna tirêjeke tavê, seranser, li odê dixîne û xwe digihîne ser rûyê Baz. Kevok li ber derî disekine û li Baz dinihêre. Baz, serê wî li ser balîfê, li ser kêlekê dirêjbûyî, lingên xwe ber bi zikê xwe

kişandiyê û sakîn, radize. Rûyê wî niha biçûktir, qermîçokên li ser rû û enî kûrtir dixuyin. Gelo Baz, ew navê efsanewî yê tirsê, niha, ev e? Dilê Kevokê pê dişewite. Gelo Baz, ji rûyê Kevokê, neketibe ser vê riya gelekî xeter? Gelo ev endîşe û telaşa ku hatiye û li ser rûyê wî veniştîye, tirs û xofa ku carina li ser rûyê wî diyar dibin, ne ji rûyê Kevokê be?

Kevok diçe oda xwe, ber masa biçûk a kêleka textê razanê, çaviya masê vedike jê pênûseke dirêj û kitabeke biçûk derdixe û vedigere şaneşînê. Kitaba biçûk, a Baudelaire ye, "Les fleurs du mal" Kevok ew, tesadufî, li dûkaneke sebze û fêkiyan a gund dîtîye. Heye ku tûrîstekî ew li dûkanê ji bîr kiriye. Lê her çi be jî, kitab, mûna dermanekî, bi kêrî Kevokê tê. Ev cara çendan e ku Kevok şîrên tê de dixwîne? Kevok li ser kursiyê nerm rûdine, çend libên din ên tiriye davêje devê xwe û li bergê paşîn ê kitabê dirihêre. Li ser bergê paşîn rêzine mezin hene. Lê rêza yekemîn, nemaze ya yekê; "*moi, mon âme est fêlée*" mûna ku Baudelaire ne behsa ruhê xwe yê dîn, lê yê Kevokê dike.

Kevok radihêje pênûsê ku rêzeke nû di cihê mayî yê defterê de binivîse. Lê hingî dengê qîrînekê ji hundir tê. Tafilê Kevok radibe û direve hundir, oda Baz. Baz, li odê, li pê, di destê wî de demanşa wî, şaşbûyî, xew li ser rû, rawestiyaye. Tirs û endîşeyeke vekirî li ser rûyê wî dixuye. Kevok lampa odê pêdixe û tê ba Baz. Xwîdan ji Baz dere.

"Min dengin, dengine nexweş bihîstin", Baz, matbûyî, bi dengêkî perçiqî, bi hezîn, dibêje.

"Na", Kevok, bi nermahî dibêje, "deng nîn e, tu kes nîn e. Derî hemû girtî û kilîdkirî ne. Belkî te xewneke nexweş dît."

"Belkî jî" Baz dibêje û destê xwe yê çepê, yê vala, dibe ber çavên xwe, "lampê bitefîne..."

Kevok, bi lez, diçe, lampê ditefîne û vedigere nik Baz, destê xwe dibe milê wî, "raze" dibêje, "tişteke tune, esebiyet e, tu westiyayî." Kevok, hêdîka, gav bi gav, Baz ber bi textê razanê dibe

û wî dirêj dike. Piştî ku Baz li ser cihan dirêj dibe, Kevok lihêfê, hêdîka davêje ser wî, demanç a wî ji destê wî digire û datîne ser masa biçûk a kêlekê. Kevok, bi qasî bîskekê, li ber serê Baz, li pê disekine û lê dinihêre. Ew ronahiya ku di deriyê vekirî re xwe bi hundir digihûne, niha, dîsan li ser rûyê Baz e. Rûyê wî yê bêhizûr, westiyayî, tirsîyayî ronî dike. Germahiyek ku meriv dikare bibêje, şefqat e, di hundirê Kevokê de tê pê.

"Tu tişteki dixwazî?" Kevok jê dipirse.

"Firek av" Baz, çavgirtî, dibêje, "tu bikaribî qultek av bidî min."

Kevok ji şaneşînê qedeha wî ya tijî av tîne û didiyê. Baz hinekî xwe rast dike, qedehê werdigire û jê çend qult vedixwe. Gava Kevok jê qedehê werdigire û datîne ser masa kêlekê, hingî Baz, hêdîka, bi destê wê yê çepê digire. Kevok destê xwe jê narevîne. Dest, di nav bêdengiyekê de, bi qasî çendekê, welê, germahiyekê ecêb, vediguhezînin hevdu. Paşê Baz, bêtî ku dest jê berde, destê Kevokê ber bi jêr dikişîne. Kevok, bêdeng, li kêleka textê razanê, li erdê, li ser çokan rûdine. Baz, bêdeng, çavgirtî, destê Kevokê, bi tilî û pêçiyên xwe, gelekî nerm, difirkîne. Hêdî hêdî. Kevoka ku niha li kêleka Baz rûniştiye, hilma hinekî tirsokî û giran a Baz dibihîze. Kevok serê xwe hinekî bilind dike, li Baz dinihêre. Nêrîna Kevokê ya vê êvara havîna deryayên Welatê Mezin; kelgirî, kerb, hêrs, endîşe, hizin, şefqat, dilgermî. Lêvên Kevokê dilivin, çav dinihêrin. Di çavan de şopeke keserê. Di çavan de pirs, daxwaz, payin. Pirsên çi? Daxwaza çi? Payina çi? Niha rûyê ciwan ê Kevokê bêpayan sakîn dixuye. Lê li ser rû jî şopên bêhejmar. Ken? Gelo ken jî dixuye? Lê tevî hemû şopan, digel hemû hîsê têkel nêrîneke jîndar, ciwan û ronî.

Baz çavên xwe venake, welê çavgirtî, dest, tilî û pêçiyên xwe li ser destê Kevokê, di nav tilî û pêçiyên wê de digerîne. Piştî bîskekê ew destê xwe ber bi jor, ber bi bazinda destê wê dibe. Pêçiyekê wî li şanîkekê dikeve. Di bazinda dest de şanîkek. Şanîka zayînê ya Kevokê; berî niha bi bîst û çend salan li Welatê Çolê,

sirgûn, koça ehlê Welatê Çiyan, kesên çiyayî li çoleke şewitî, di çolê de zabitekî nûgihiştî yê xort û hêvîtişî, ji girsa koçberan zîlamekî simbêlzirav û jina wî, zaroka wan a ku nû hatiye dinyê, taştêyeke ronî û zabitê nû dest bi wezîfe kirî li zaroka nûbûyî ku di hembêza bavê de ye, heyirî û hinekî şaşbûyî, dinihêre; "zarokek, pariyekî can... çavên wê yên biçûk hê baş venebûne, rûyê biçûk ê gulover ronî dike, difn mîna difnên kîvroşka dilerizin, destên wê yên biçûk dilivin, tilî û pêçiyên wê dilîzin, bêhneke germ, tirşokî ya taybetî ku zabitê xort hîç lê rast nehatiye, jê difûre. Zabit tiliya xwe ya mezin a destê rastê ber bi destê wê dike. Zarok tilî, pihêt, pêdigire û dixê nava destê xwe yê çepê ku di bazindê de şanîneke biçûk a rêş dixuye..." Zaroka do; Kevoka îro. Zabitê ciwan ê do; Bazê îro. Tilî û pêçiyên Baz, niha, li ser dest, bazinda dest û şanika bazindê digerin. Lê ne haya Bazê çavgirtî ji wê serpêhatiya berê heye, ne jî haya Kevokê. Jiyan, bi tesadufên xwe yên nediyar, nenas ku pirî caran meriv jê hay jî nabe, dewam dike.

Baz, mîna ku ew ji xwe ve çûbe, dewam dike, tilî û pêçî dilivin û ji bazind û şanikê ber bi jor, ber bi mil û stûyê Kevokê dibin. Kevok ne xwe dilivîne, ne jî deng dike. Ji berevajiyê ew hinekî din xwe nezîkî text dike. Gerdeniya stûyê wê ku di nav tîrê ronahiya kêr de dibiriqe, dengêkî zirav derdixe. Devê wê vedibe lêv dilivin, lê ew deng nake. Destê Baz ber bi jor, stû û gerdana wê dibe. Mil, stû, gerden, guh, di bin porê dirêj re. Car bi car. Bi nermahî, bi dûzan, hêdîka. Paşê binçenge, çeng û ew der; dev û lêv. Devê lihevhatî û lêvên dirêj û qelew, zuha, lê hêdî hêdî, şil. Tilî û pêçî li ser lêvan, mîna ku yekî kor bixwaze di xaçeriyekê de riya xwe bibîne. Lêv vedibin, tilî li ser lêvan digerin. Nefeseke kûr a Baz, careke din. Û dest tilî, pêçî. Lêvê jor, difn, gum, binçav, mijang, birû, serçav, enî. Por, porê şeng, gur, dirêj û mîna pêlên deryayê biriqî. Ji wir ber bi jêr, dîsan stû, gerden. Tenekî nerm, bedeneke şox û ciwan. Xetên vekîşiyayî yên

bedena keçikeke bedew. Dîsan enî, hema çi bigire bêxet, bêxêz.
Dîsan dev, lêv, nerm, şil. Dîfn, bêvil zirav, dirêj. Û çav, kanî, ka-
niya jiyîn û jiyanê, vejîn û nûgeşiyê, kaniya ku dinya jê dizê.

Hemû tevger bêdeng, di oda hinekî loş de.

Kevok, bêdeng, li Baz dinihêre. Baz digirî, bêdeng. Hingî kela
giriye zora Kevokê jî dibe. Kevok digirî, bêdeng.

17. Mirin

Baz.

Kevok.

Serbûriya Baz û Kevokê. Romana wan. Vegotina qedera wan.

Roman êdî xelas dibe, êdî kutahiya vegotinê tê. Vegotina serbûriya Baz û Kevokê ku bi mirinê dest pê kir, niha, bi mirinê xelas dibe. Kevok, di beşa yekemîn a romanê de, mir. Niha, di beşa dawîn a romanê de, dora Baz e. Em ê niha dîsan vegerin serî, wê roja salvegera hukimdariya General Serdar û êvara wê rojê ku Kevok hate kuştin. Em bînin bîra xwe; Kevok, li derveyî paytextê Welatê Mezin, li erdekî vala, li kêleka çemê bajêr, di bin ronahiya stêr û heyvê de, bi sê berikan, hate kuştin. Kesên ku Kevok kuştin, Baz, dest ji paş re kelemçekirî, hildan û ji wir, ji axa ku bû gora Kevokê, bi dûr ketin.

Niha, piştî gera me ya gelekî dirêj a li ser riya serpêhatiya Baz û Kevokê, em dîsan vedigerin destpêka romanê, nik Baz û kesên mêrkuj ku Baz hildane û dibin. Baz, di navbera kesên ku Kevok kuştin de, dere; zarokê mirinê ku bû hosteyê mirin û kuştinê, niha dîsan, ber bi mirinê, ber bi cihê ku ew jê hatiye, dere. Baz ku mîrê mirin û kuştinê bû, niha, bûye dîlê mirinê. Belê, Bazê ku bêtirs diçû ser mirinê, niha, piştî mirina Kevokê, ji mirinê ditirse, zahf ditirse.

Niha em li milê din ê bajêr in. Kevok li milê jor ê bajêr hate kuştin. Baz jî dê li milê jêr ê bajêr. Du hogirên qederekê, her yek li milekî bajarê ku tesîr li qedera wan kir, dimirin.

Lê berî ku em bikevin pey Baz û wexta wî ya dawîn a mirinê, min, vebêjê vê romanê, agahiyeke dawîn divê: Piştî kartpostala Kevokê min hew xeberek ji Kevokê wergirt. Ez li hêviya xebra wê bûm, carina diçûm Navenda Yekîtiya Nivîskaran, carina min telefon dikir da ku bizanibim ka nameyek, kartpostalek, xeberek, ji bo min, hatiye. Lê ne name, ne jî xeberek hat. Kartpostal bû pêwendiya dawîn a min û wê keça çavşêrîn. Digel ku min jê xeberek wernegirt, min xebra mirina wê di rojnameyeke wî welatî de xwend. Rojekê, em ê bibêjin bi qasî mehekê bi dû kartpostala wê keça xwendevana edebiyata fransîzî re, ez, ji bo şixulekî, çûm kitabxana taxa ku ez lê dimînim. Min ê şêfê kitabxanê bidîta. Ez hinekî zûtir –ji wextê ku me li hev kiribû– çûm kitabxanê da ku li hin rojname û kovaran binihêrim. Hingî, di salona xwendina rojname û kitêban de, min, bi tesadufî, di rojnameyeke rojane ya wî welatê mirin û kuştinê de, mîna xebereke gelekî biçûk, mirina wê û Baz xwend. Xeberê, tevî sûretên herduyan, navê wan hildida û çêla mirina wan dikir, her yek li milekî bajêr, li kêleka çem. Hingî, belê, ez dikarim bibêjim, hingî çîrîska nivîsîna vê romanê pêket.

Agahî hewqas.

Niha, çend sal piştî vêketina çîrîska romanê, em gihîştine dawiya romanê, herweha dawiya serpêhatiya Baz. Baz dere. Bêyî ku ew hay ji meşa xwe, gavên xwe hebe, sergêj, serî li ber, dimeşe. Piştî kuştina Kevokê, kesên mêrkuj ew li minûbusê siwar kirin, bi qasî çendekê, li der û dorên bajêr geriyan, paşê jî hatin vê devera ku ew niha tê de dimeşin. Niha ew dimeşin. Mîna meşa wan a aliyê jor ê bajêr. Baz û çar kesên pê re, bi hev re. Giran, aram, kereker, di nav sikûneteke bêpayan boş de. Ew herdu kesên ku serekên komê ne, dîsan, li nik minûbusê rawestiyane. Dinya bêdeng e. Baz bêdeng e. Kesên ku wî dibin, bêdeng in. Şev çûye, lê stêr û heyv, hê jî, bi rengê hêlesor, diçirûsin. Niha ji dengê lingên wan, dengê ava çem û dengê mêş û mozan pê ve tu deng nayê bihîstin. Dengê kûr ê bajêr jî niha hatiye birîn. Lê

lampayên bajêr, şewqa ku ji bajêr bilind dibe, hê jî, mîna ku ew rabûbin govendê, diçirsin. Lê bala Baz ne li ser stêr, heyv û şewqa lampayên dûr ên bajêr e, ne jî li ser dengên şevê. Her tişt perçe bûye, belav bûye, hîç tiştek bi misogerî, bi temamî, naxuyê, bi guhê Baz nakeve, Baz nabihîze. Mîna ku her tişt, hemû jîyan, niha, di nav xewek, xewnekê de be. Bala wî ne li ser tiştekî ye. Ew, bi tenê, bi zehmetî, bi hemû xîreta xwe ya dawîn, dimeşe. Bi tirs, tirseke vekirî, diyar û ecêb mezin. Tirsek ku wî heta niha hîç nas nekiribû, hîç bi tiştekî din nedima.

Çem, çemê ku di jiyana Baz de geh bi qencî, geh bi xirabî, cihê xwe yê qehîm wergirtiye, li vî milê jêr ê bajêr jî dixuye. Hinekî jî Baz û yê din dûr, bi şewqeke bêpayan spehî. Mîna ku stêr û heyv veniştine ser ava çem, mîna ku av û stêr û heyv, bi hev re, bûne yek. Dinya germ e, hawîrdor bi bêhneke têkel a giya, av, pûş û axê difûre.

Baz çi bibêje, çi bike? Baz lingên xwe peregende, sist, davêje û difikire. Baz dikare çi bike? Heta vê derê, jîyaneke evçend rengîn, çetin, têkoşer heta vê derê tê. Ji vir û pê ve, êdî tarî ye, mîna perda tarî ku li ser zarokatiya wî rakişiyaye. Baz çi dîtî, çi nedîtî, çi jîya, çi nejiya! Lê dawî, piştî evçend dîtî û jiyînê, êdî perda nedîtî û windabûnê ye. Êdî her tişt, hêviya zarokati û xortiyê, hînbûna ciwaniyê, geş û coşa jiyana teze, umrê xort, daxwaz û mirazên xort, derew, dolab, hîle, lîstik, fort, pesn, înad û arzûyên bilindbûn, hakimbûn, îdarekirin û desthilatiya her tiştî dibe kulêşeke pûşê ku ew niha pê li dike. Kî dê bizanibûya ku her tişt ê weha xelas bibûya? Şer, têkoşîn, west, xîret, zehmetî, geremol, xebat, xwîn, xwîdan, şîdet û lêgerîneke salan, lêgerîneke hemû umrekî êdî niha dibe tiştekî hîç û pûç, mîna vê kulêş û pûşên vî erdî. Li pey Baz çi dimîne? Bibêje Baz, Baz, bédeng, bêhnçikiyayî, kelgirî, difikire, bibêje, ji bilî herdu kurên te, li pey te çi dimîne? Bibêje, li pey wê heyecan, coş, kel, hez, evîn, hebînî, hêrs, kîn, nefret, şîdet, zor, berberî, dijîtî û dijminahiyê ku umrekî têkel neqîşandin, çi dimîne? Li pey wan salên dirêj ê wî

welatê mirinê, fedakarî qehremanî, şer, pevçûn, parastin, êrîş, xwîn û şewata ku bîst û du salên Baz, salên herî baş ên umrê wî tijî kirin, niha, çi dimîne? Belê, meşa umrekî bêkes –lê xurt, comerd, dilsoz– û gavên salên dirêj ên merivekî sêwî –lê wefakar, fedakar– niha, li vir, bi kutahî tên. Belê, umrekî bêkes, bi bêkesiyê dest pê kir, bi bêkesiyê, xelas dibe. Belê, welê ye, qurbanekî ku bû celad, niha, dîsan, mîna qurban, kelegirî, zîz, westiyayî, serî û dilêşiyayî, şikestî, dere. Tiştêkî ku ew bikaribe bike, nûn e, bikaribe bibêje, nûn e, hîç nûn e.

Ew, keça sihêrîn ku di dawiya umrê Baz de kete jiyana wî, dikeve bîra wî. Çavên wê, berî ku berik di serê wê de biteqin, tê bîra Baz. Çav, çavên Kevokê yên kurtedema herî dawîn; çavên ecêb vebûyî, biriqî mîna du serî elmas, çavên keseke şaşbûyî, razîbûyî, dîn. Çavên kesek ku tiştên herî bingeîn ên jîyanekê, mayin û mirinê, bi hev re, dijin. Çavên ku mirin û tîrsa mirinê, raste rast, zahf vekirî û diyar, veguhezandin dil û ruhê Baz. Çavên maxrûr, serbilind, lê tîrsiyayî, bêhêvî yên li ber pêla lehiya mirinê ku Baz tu carî bi wê ecebê nedîtibûn

Kevok ket. Stêr û heyv bûn şahidên ketina wê.

Baz ê bikeve. Ew pê dizane. Niha, heye ku piştî biskekê, ne zêde, lê piştî kêliyêkê. Mirina ku ew tê de dijiya lê jê ewçend dûr bû, niha, li dora wî ye, ewçend nêzikê wî ye. Mîna Kevokê, ew ê jî bikeve, bi destê heval û hogirên xwe yên man û nemanê. Stêr û heyv ê bibin şahidên ketina wî. Stêr û heyv; welê li wir li esmanan, li ser hemû wext, dewr, dewran û heyaman, li ser hemû kes û civatan, li ser hemû şev û tarîtiyan, welê ronî, birûskî, abadîn, nemir. Stêr û heyv; şahidên bêteref, bêdeng, bêzar û bêziman ê hemû jiyana wî. Ne bi tenê şahid, dost, heval û hogirên rûgeş û ronî ên hemû jiyana wî, heyînên wî yên herî bêzîrar ên umrê wî.

Ji nişka ve, niha, Bazê ku di nav pêlên dil û mêjyên xwe de, mîna hêlekanekê dere û tê, diqulipe û dere erdê. Lingê wî li kevîrekî ku ew nabîne, dikeve û ew ser rû dikeve. Axînek, bêsemt, jê radibe. Bêvil û eniya wî dişewite. Lê tiştê ecêb, li erdê, bêhna

pûş, giya û axê bi difnên wî dikeve. Ew hewl dide xwe ku rabe, lê nikare. Destên wî yên kelemçekirî, nahêlin ku ew xwe bilivîne. Bi qasî çendekê ew li erdê, welê êşiyayî, li ser kêlekê razayî, dimîne. Paşê dido ji wan kesên pê re, tîn, bi milên wî digirin û wî radikin. Eniya wî diêşe. Tişteki ron ê germ ji difnên wî ber bi jêr, di nav mûyên simbêlan re, ber bi lêvan dibe. Baz, bi zimanê xwe, ava tîr a li ser lêvê jor û simbêlan tahm dike, xwîn e, tahma hinekî tîrşokî ya xwînê ye.

Baz xwe dide hev, serê xe radike, pêşî li kesên ku li dora wî ne û bédeng lê dinihêrin, fedike, paşê li dûr, li çêm, li ronahiya ava çêm, li bajêr, şewqên ku li ser bajêr diçirisin dinihêre. Bi dû re jî li esman, li stêr û heyvê. Tevî êşa rû û enî, ew dengê xwe nake, welê, hinekî serbilind, dinihêre. Hênikahiyeke gelekî sivik a bayekî gelekî sivik û nediya, bi qasî bîskekê, li ser rûyê wî digere. Ji dûr, gelekî dûr, kûze kûza segekî bi guhê wî dikeve. Baz, sakîn, radiweste. Ecêb e, ketina wî, êşa enî û rûyê wî, xwîn û germahiya xwînê wî sakîn dike. Ecêb e, ew niha pê dihesê; ew tî ye.

"Cixareyekê bidin min", Baz, sakîn, nerm, çend caran xwîziya xwe dadiquftîne, zimanê xwe li ser lêvên xwe yên zuwa digerîne û dibêje. Lê ji kêşên doralî deng dernakeve, kes xwe nalivîne. Piştî bîskeke bédengiyê, Baz dubare dike, "cixareyekê bidin min..." Baz dipeyive! Ew bi dengê xwe diheyire. Deng, mîna olaneke bêpayan bilind bi guhê wî dikeve. Deng di mêjî, ruh û dilê wî de olan dide. Dengê ku piştî mirina Kevokê hatibû birîn, dengê ku piştî bîskekê dê were birîn, niha, deng dike, gazin dike. Gazin? Na, ne gazin. Ne lava û rica, ne ferman û emir. Olana deng, ne ji ber van celebên dangan e, olan, ji ber westa dil, mêjî û ruhê Baz e.

"Cixareyekê bidin min..."

Niha Baz demançan, demançeyên ku di destê wan de ne, du smîth-welson, walthereke almanî û barettayeke mîna demança Baz, dibîne. Demançe di destan de ne. Niha, ev demançeyên tazî, demança Baz ku hertim berik di dev de bû, girtina wî ya danê

wê sibeya deryayan bi bîra wî tînûn: Her tişt bi leza birûskê hate pê. Her tişt, ji ber êşa ku serê Baz tevizandibû, ew gēj kiribû, di nav mij û dûmanekê de bû. Her tişt li ber deriyê havîngehê dest pê kir –an jî vajiyê wê– her tişt li wir, li ber deriyê havîngehê xelas bû. Lê heyf, gava wan pênc kesên ku li ber deriyê havîngeha ku Baz û Kevokê xwe tê de veşartibûn, ji nişka ve, êrîş birin ser Baz, wî fersenda rahiştin û kişandina demançê nedît. Eger wî, bi qasî bîskeke, fersend bidîta, bi qasî qirpîna çavekî keys bidîta, wî dê teksîr nekira. Belê, ew ê bihata kuştin, lê wî dê hin ji wan jî bikuşt. Û heye ku hingî Kevok xelas bûya, heye ku di nav wê geremolê de, wê keys bidîta û bireviya. Lê nebû. Êşa serî, mîgrena kambax zora wî bir. Baz bû sebeb, eger ew, ji bo derman û dermanxanê û pirsîna pasaportan, daneketa gund, wan ê Baz nedîta û neketina pey wî û li ber deriyê havîngehê ew derdest nekirina. Baz bû sebeb, hem a mirina Kevokê, hem a xwe. Demança wî ya yekta ku wî, mîna yara xwe, hertim, bi xwe re digeland, hertim hîseke bawerî, xurtî, maxrûrî, desthilatî û zîrekiyê didayê, niha, li kû ye? Di destê kê de ye? Deftera Kevokê? Ew niha li kû ye, di destê kê de ye? Ew hatin girtin, her tiştê wan jî pê re. Li gund, gava ew daket gund, wî ji Kevokê re deftereke nû, mezin, xêzîn û bergsor jî kirî. Kevokê şîrên nû yên evîn û evîndariyê tê de binivîsa. Gava ew hate girtin defter û du pênûs jî di bin çengên wî de bûn. Di destek de kîsê fêkî, sebze, xwarin û vexwarinê, di bin çengê milê din de jî kîsê zirav ê defter, pênûs, derman, zerf û kaxizên nameyan. Bar sivik bûn, lê wan Baz jî dest xist. Heye ku loma Baz nikaribû dest bibira xwe.

Yek ji wan kesên doralî, cixareyeke pêxistî di destan de, tê, li ber Baz radiweste, cixare, bi rêz û rêzdarî, hêdfîka, dixwe nav lêvên Baz ku bi xwîn û xwîziyê şil bûne. Hingî çavên Baz û wî kesê bejndirêj û qelew pêrgî hev tên. Çavên Baz; sakîn, tirsîyayî, zîz, westîyayî, heye ku mîna çavên Kevokê. Çavên wî kesî; vala, çikî vala. Ne germahî û ronahî, ne jî hêrs, kîn, nefret, tirs, endîşe yan jî tişteki din, bi tenê vala. Gelo çavên min jî, li wî welatî, weha

bûn? Baz difikire. Gelo çavên kesên mêrkuj, xwînrij weha vala, bêhîs, bêtevger in?

Baz çend nefes ji cixara devê xwe dikişîne. Serê xwe hinekî ber bi jor radike. Xalîçeya stêran, sêniya zêrîn a heyvê li wir, li jor in. Ne ewrek, ne reşahiyek, tevî ku şev e. Kadiz bi çavê Baz dikeve. Li kêlekê jî çend stêr ên din ên stûr û helesor. Stêrek, ji dûr ve, jîndar, mîna birûskê, şewqtîjî, dixurice.

Gelo Baz bipeyive? Ew lava bike? Stran bibêje, mîna Kevokê, lê bi gotinên xwe, binehwirîne? Biqîre û bibêje, "na, weha nabe, jiyana min divê weha xelas nebe!.. weha bêşop winda nebe!.."

Na, ew tiştekî nabêje, nake, bi tenê cixarê dikişîne. Ew pê di-hese; dûmana cixarê, pêl bi pêl, ber bi hundirê wî dibe, pêl bi pêl, dil û mêjiyê wî sakîn dike. Nefeseke din, sakîn, çav li stêran û heye ku hinekî kêfxweş... Ev sikûnet, ev bêdengî. Ne deng, ne pêjn. Her celeb keftûleft, her celeb lebat û tevger li dûr, zahf dûr. Nefes, dûman di hundirê wî de, li ber çavên wî, pêl bi pêl, aramiyekê direşîne ser wî, ser hawîrdora wî.

Lê hingî dengê bilind dibe. Hingî dengê teqînekê aramiya hawîrdor diqelişîne. Hingî pêteke êgir di paş Baz re vêdikeve û bêdengiyê xira dike. Hingî agirek di stûyê Baz de vêdikeve. Hingî Baz, bi quweta êgir, diheje, diperpîte û li ser çogan dikeve. Hingî agir, pêl bi pêl, di hundir, dil, mêjî û bedena Baz de, belav dibe.

Lê heyret, cixare neketiye, hê jî di devê Baz de ye. Baz, li ser çogan, radiweste. Bi qasî çendekê, -ji bo ku rewşê têbigihê. Tiştekî tîr, xwîn, xwîna germ, di bin gomlegê wî yê havînê re ber bi jêr dibe. Gomleg, pantolonên keten şil dibin. Belê, Baz têdigihê, jê xwîneke boş dere. Lê cixare... Ew, çavên wî li esmanan, ji cixarê nefeseke gelekî kûr dikişîne. Dûman, pêl bi pêl, dere. Xwîn dere. Taqeta Baz tê birîn. Nefesa wî diçike. Baz li çemê ku niha li hember wî dibiriqe, dinihêre. Çem, pêl bi pêl, şewq dide. Na, weha nabe. Baz divê xwe bi çem bigihîne, Baz tî ye, divê ji ava çem vexwe, divê xwe berde hembêza çemê zelalê şewqdayî. Çem divê Baz, di hembêza xwe de, bibe, ber bi diyarên nenas.

Baz, bi hemû xîret û hêza xwe ya mayî, hewl dide xwe ku rabe. Lê zehmet e, destên wî ji paş ve, kelemçekirî ne. Lê ew divê rabe. Xîret, careke din. Ew lingekî xwe radike. Xîret. Hêdîka yê din jî, piştî kêliyekê, ew radike. Ew niha, li pê, rawestiyaye. Ew ê here, raste rast, ber bi çem, ber bi avê, ber bi şewq û ronahiyê. Janeke bêpayan bi ser wî de tê, ew, çend caran pihêt, diheje. Lê ew li pê ye, ew ê here. Bêyî ku ew li dora xwe, kesên ku li dora wî ne, binihêre, yan jî bizîvire, ew gavekê, ber bi pêş davêje. Gaveke din, yeke din. Yeke din. Lê hingî dengê teqîneke din hawîrdor vedigire. Hingî Baz disekine. Hemû bedena Baz, mîna ku beden ketibe ber pêlên lehiyeke biharê, dere û tê. Lê Baz nakeve, li pê, pihêt, pê li erdê dike. Cixare jî nakeve. Nefeseke din, dûman, pêl bi pêl. Jan, pêl bi pêl. Av, pêl bi pêl. Çûyin, dîsan, careke din, gav bi gav. Çem, ber bi çem. Hingî pêteke din diçirise. Hingî teqîneke din zikê bêdengiya tebiyetê û şevê diqelişîne. Hingî Baz dikeve. Hingî...

Hingî Baz, mîna Kevokê, li ser axa mader a havîna germ, ji erdê hew radibe.

Baz. Kevok. Serbûriya Baz û Kevokê. Romana wan. Vegotina qedera wan. Vegotina serbûriya Baz û Kevokê ku bi mirinê dest pê dibe û roman bi vegotina serbûriyên wan ên têvel ên tekel car bi car pêrgî hev tê û welê didome û paşê jî bi mirinê bi dawî dibe. Du însanên ji heman axê û siûdeke neçê, li ser eniya wan bê nivîsandin û wan bike endamê du eniyên ji hevdu cihê, wan bike dijber û neyarê hev. *Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê*, xwe dispêre destana herî kevnare ya însan û însanetiyê: Gilgamiş. Bi riya naveroka vê destana ewçend antîk û kevnare em hest pê dikin ku riya ronahiyê li ser riya tarîtiyê ye. Têkoşîn ronahiyê bi xwe re tîne, hêza evînê kambaxiya mirinê têk dibe.



ISBN: 978-605-772-864-7



9 786057 728647

40 TL (KDV'den muaftır.)

📖 selyayincilik 📱 selyayin 📺 selyayincilik

www.selyayincilik.com